Pertev, R. (2009) *Zarok û Çîrok: Destpêka Pedagojîya Kurdî,* İstanbul: Doz Yayıncılık.

Pîrbal, F. (2009) *Kurd Le Dîdî Rojhelatnasekanewe*, Silêmanî: Endêşe.

Prince, G. (2011) *Zaravên Vegêranê; Ferhenga Zaravan*, C. Mistefa (Wer.), Hewlêr: Wezareta Rewşenbîrî û Lawan.

Prym, E.; Socin, A. (1890) *Kurdische Sammlungen,* Petersburg: Commissionaires de l'Académie Impériale des Sciences.

Propp, V. (1928) *Morfologîya Skazki*, Leningrad: Academia.

Propp, V. (2009) *Morphology of the Folktale*, Laurence Scott ve Louis A. Wagner (Trans./Rev.), Austin: University of Texas Press.

Propp, V. (2017) *Masalın Biçimbilimi*, (3. Basım). M. Rifat-S. Rifat (Çev.), İstanbul: Türkîye İş Bankası Kültür Yayınları.

Rewşo, B. (1913) Çîrokê Kurmanca, *Rojî Kurd*, hej: 4, İstanbul, 31-32.

Ricoeur, P. (2012) *Kurmaca Anlatıda Zamanın Biçimlenişi*, Mehmet Rıfat (Çev.), İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Rimmon-Kenan, S. (2002) *Narrative Fiction*, (2nd edition), London and New York: Routledge Taylor and Francis Group.

Rousseau, J.J. (2011) *Emile ya da Çocuk Eğitimi Üzerine*, M. Baştürk-Y. Kızılçim (Çev.), Ankara: Kilit Yayınları.

Ryan, M. L. (2009) Handbook of Narratology, P. Hühn et al. (Eds.). *Space* (420-433), Berlin/New York: Walter de Gruyter.

Sagvan, U. (2018) Rêgezên Dramayê di Avakirina Çîroka Eyloyê Pîr da, *Kadim Akademi Sosyal Bilimler Dergisi*, C. 2, S. 2, 164-176.

Scheffel, M. (2009) Handbook of Narratology, P. Hühn et al. (Eds.), *Narrative Constitution* (282-294), Berlin/New York: Walter de Gruyter.

Schmid, W. (2010) *Narratology an Introduction*, A. Starritt (Trns.). Berlin/New York: Walter de Gruyter.

Sebrî, R. R. (2010) *Çîrokî Mindallan le Edebî Kurdî da; 1991-2005*, Hewlêr: Bilawkirawekanî Akademîyayî Kurdî.

Sencer, H. (2005) *Temel Naratoloji Kavramları Üzerine Bir İnceleme*, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, İzmir: Ege Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Sezer, M. Ö. (2016) *Masallar ve Toplumsal Cinsiyet*, (Altıncı Basım), İstanbul: Evrensel Basım Yayın.

Shen, D. (2013) The Living Handbook of Narratology, P. Hühn et al. (Eds.), *Unreliability*, Hamburg: Hamburg University. http://www.lhn.unihamburg.de/article/unreliability (View Date: 22 Jan 2019).

Stanzel, F. K. (1997) *Roman Biçimleri*, F. Tepebaşılı (Çev.). Konya: Çizgi Kitabevi Yayınları.

Talib, I. S. (2018) Chapter 4: Characters, *Narrative Theory: A Brief Introduction*, https://courses.nus.edu.sg/course/ellibst/narrativetheory/chapt4.htm (25.03.2019).

Tarduş, İ. (2015) *Bikaranîna Çîrokên Kurdî di Perwedeya Zarokan de*, Yayınlanmamış Yüksek Lisan Tezi, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü.

Temo, F. (1913) Çîrok, *Rojî Kurd*, hej: 1, İstanbul, 25-26.

Thompson, S. (1951) *The Folktale*, New York: The Dryden Press.

Tüfekçi Can, D. (2012) *Çocuk Edebîyatı Üzerine Bir Araştırma: Tanımlar, Türler ve Teoriler*, Yayınlanmamış Doktora Tezi, İzmir: Ege Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Xidir, R. R. (2012) *Teknîkî Gêrranewe le Romanekanî Ebdulla Serac da*, Hewlêr: Yekîtîyî Nûseranî Kurd.

Walton, K. (1990) Mimesis as Make-Believe, Cambridge: Harvard University Press.

Wood, J. (2010) Kurmaca Nasıl İşler?, E. Bodur (Çev.), İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Yivli, O. (2015), XI. Milli Türkoloji Kongresi Bildirileri, Sinan Çitçi ve diğerleri (Ed.), *Anlatı Grameri* (629-644), Cilt: 1, İstanbul: İstanbul Büyükşehir Beledîyesi.

**MASAL KAYNAKÇASI**

Akdağ, Z. (2016) *Çîrokên Gelêrî yên Kurdan; Herêma Semsûr û Rihayê*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Amedî, P. (2012) *Çûka Keko Peko*, İstanbul: Nûbihar.

Bedirxan, C. A. (2009) *Çîrokbêj – Çîrokên Kurdmancî*, İstanbul: Avesta.

Bozarslan, M. E. (2000) *Dîtinhezar*, Stenbol: Weşanên Deng.

Bozarslan, M. E. (2002) Gulê û Sîno, Stenbol: Weşanên Deng.

Bozarslan, M. E. (2009) *Ji Dînan Dîntir*, Çapa 2yem, Amed: Weşanên Deng.

Bozarslan, M. E. (2011) *Ilmê Tûrik*, Çapa 2yem, Stenbol: Weşanên Deng.

Cindî, H. (2015) *Hikyatêd Cimeata Kurda I*, İstanbul: Rûpel.

Cindî, H. (2015) *Hikyatêd Cimeata Kurda II*, İstanbul: Rûpel.

Cindî, H. (2015) *Hikyatêd Cimeata Kurda III*, İstanbul: Rûpel.

Cindî, H. (2015) *Hikyatêd Cimeata Kurda IV*, İstanbul: Rûpel.

Cindî, H. (2015) *Hikyatêd Cimeata Kurda V*, İstanbul: Rûpel.

Cindî, H. (2015) *Hikyatêd Cimeata Kurda VI*, İstanbul: Rûpel.

Elban, Y. (2017) *Carek ji Caran; Çîrçîrokên Şevbuhêrkan*, Dîyarbakır: Dara.

Fîdan, M. (2014) *Çîrokên Gelêrî ji Herêma Botan*, İstanbul: Weşanxaneya Berbang.

Îşler, Î. (2014) *Mîrza Mihemed û Çavreşa Qîza Mîrê Ereban*, Van: Weşanên Sîtav.

Mukrîyanî, M. (2017) Ebando, Dîyarbakır: Wardoz.

Omerî, B. (2013) *Carekê ji Caran: Çîrokên Gelêrî*, İstanbul: Avesta.

Öner, N. (2016) *Mîrza Mihemed; Gurzek Çîrok ji Herêma Serhedê*, İstanbul: Avesta.

Sadinî, M. X. (2011) *Çîrokên Gelêrî*, İstanbul: Nûbihar.

Sadinî, M. X. (2012) *Ji Kelepora Kurdî Pêkenok*, İstanbul: Nûbihar.

Sağnıç, F. H. (1999), *Çîrokên Kurdî*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî.

Serhedî, M. (2017) *Kêço*, Dîyarbakır: Wardoz.

Serhedî, M. (2017) *Sînosêwî*, Dîyarbakır: Wardoz.

Temel, M. S. (2014) *Reşokê Dirêj*, İstanbul: Nûbihar.

Tîmar, F. (2017) *Çîrokên Lawiran*, İstanbul: Weşanên Ar.

Wikander, S. (1996) *Antolojîya Tekstên Kurdî*, Stockholm: Weşanxana Orfeus.

Xamo, Z. (2014) *Hebû Tunebû…; Antolojîya Çîrokên Zarokan*, İstanbul: Rûpel.

# EK

# ANLATI ANALİZİ YAPILAN MASALLARIN METİNLERİ

## 1. TEZİN BİRİNCİ BÖLÜMÜNDE ANALİZ EDİLEN MASALLAR

### 1.1. Hayvan Masalları

#### 1.1.1. Şêr û Kergoşk

Dibêjin di wext û zemanekî pir kevn de şêrekî gelekî mezin û hêrsokî hebû. Ji ber ku ew pir mezin û pir xurt bû, loma jî li hemû lawirên daristanê çavsorî dikir. Tim dixwest hemû lawir bi emrê wî bikin.

Rojekê rabû bang hemû lawirên daristanê kir û ji wan ra got:

-Ji îro û pê ve ez mezin û serdarê we me. Bi bihîstina dengê min re divê hûn bi dor xurînî, navroj û şîva min ji min re bînin. Dema hûn neynin ez dê we ceza bikim.

Hemû lawir ji tirsan qutifîn. Çeqel hema di cih de xwe avêt ortê û dest bi şalûzîyan kir, got:

-Ey serdarê mezin, tu dixwazî şîva te tim çi be?

Şêr got.

-Ez rojê tamekê, xwarineka cihê dixwazim. Her roj ez eynî xwarinê qebûl nakim. Divê rojekê goştê ga be. Roja din yê pezkûvî ya jî yê xezalekê be. Divê hûn

têkevin dorê. Lê bi bihîstina dengê min re divê şîva min hazir be, yan na hûn dizanin ez dê çi bînim serê we!

Û dû re jî dêla xwe wekî qamçîyekî, rast û çep li erdê xist û xofeka mezin xist dilê wan û got:

-De zû herin hazirîya xwe bikin!

Çeqalê devbelaş dîsan xwe avêt ortê û got:

Hahoo, weleh mala me şewitî!

Helbet tu lawirekî jî nedixwest xwe bike qurban û ji şêrekî re bibe şîv. Çeqel got:

-Êm dê çawa bikanibin yekî ji nav xwe hilbijêrin û jê re bikin şîv?

Gamêşekî gelekî mezin dengê xwe bilind kir û got:

-Pir hêsan e. Em dê ji yê herî biçûk dest pê bikin û ber bi jor ve herin, heta ku dor digihîje yê herî mezin.

Bi van gotinên gamêş re, hemû lawirên mezin li dora xwe mêze kirin û dû re jî gişan bi hev re çavên xwe bera kergoşkê dan. Kergoşkê fêm kir ku nîyeta wan çî ye, loma jî bi xurtî berê xwe da wan û got:

-Baş e. Heger dê kergoşkek berî we hemûyan bibe qurban, wê gavê bila ew jî ez bim. Lê ez zarok û nevîyên xwe yên biçûk yekî jî nakim qurban, divê hûn vê yekê baş bizanibin. Û bi vî awayî biryar hat dayin ku dema şêr bixurre û dengê wî bê bihîstin kergoşkê here bibe şîva wî. Roja din bi hilatina rojê re xurînîyeka mezin hat bihîstin, deng di nava daristanê de olan da.

-Xuuurrr!

Kergoşk hemû şîyar bûn. Lê Pîra Kergoşkê got:

-Hîn zû ye, ne wexta rabûnê ye. Ji xwe re rakevin.

Û hemû kergoşk dîsan raketin. Bîstek derbas bû, dîsan xurîneka mezin hat. Lê ya îcar hîn bilindtir û hîn dirêjtir bû. Digot:

-XUURRrrrrr!

Hemû kergoşk ji xewa xwe ya şîrîn veciniqin û rabûn ser xwe. Lê belê kergoşka pîr dîsan got:

-Guh medinê û qet jî netirsin. Wa ye roj hilatîye, rabin xurînîya xwe bikin.

Û hemû kergoşk zû zûka, li pel û pincarên der û dorê belav bûn û zikên xwe têr kirin. Bîstek din derbas bû, roj bejneke din hilat, dîsan xurrînîyek hat bihîstin. Lê ya îcar hewqas pir bû ku erd û asîman dihejand, digot:

-XUURRRrrrrr! XUURRRrrrrrrrr! XUURRRrrrrrrrrr!

Hemû lawirên daristanê ji tirsan bizdîyan. Lê Pîra Kergoşkê qet guh nedayê û çêra xwe domand. Ew hîn ji xwe re weha hêdî hêdî diçêrîya, hew carê bala xwe dayê ku ji her alî de lawir ber bi wê ve dibezin. Fîl gamêş mîh, bizin, pezkûvî, gakûvî û çeqel û yên din hatin li dora wê kom bûn. Hemû lê rabûn û pê de qîrîyan, jê re gotin:

-Şêr pir qeherîye. Ji serê sibê ve ye li benda te ye. Zû here zêde wî neqeherîne.

Pîra Kergoşkê bi dengekî sakin got:

-Erê erê ez dê niha herim. Min ji bîr nekirîye. De bi xatirê we. Bîstek din em dê dîsan hevûdin bibînin.

Weha got û ji ba wan da rê û çû.

Çeqelê ku tu carî bi zimanê xwe nikanîbû, serê xwe hejand û got:

-Ev kergoşk zir dîn e. Dike here bibe şiva şêr, dibêje em ê bîstek din dîsan hevûdin bibînin. De were nemire, de were neteqe!

Kergoşka me pir çû, hindik çû, bi rê de rastî bîreka pir kûr hat. Çû li ser devê bîrê sekinî û li jêr mêze kir. Dema sûretê xwe di avê de dît, guhên xwe mûç kirin, bi

pepikên xwe serê xwe hinekî xurand û ji xwe re got, a niha ez dizanim ez dê çi bikim. Û dû re jî da çindikan û dîsan rêya xwe domand. Çer şêr ew dît, xurrînî pê ket û bi hêrs jê re got:

-Tu pir dereng mayî!

Û dû re gava fêm kir ku şîva wî ev kergoşka biçûk e, tew bi carê de azirî, bi hêrseka mezin got.

-Tu pir biçûk î! Tu ji min re nabî parîyek jî. Ma ez dê çawa têr bibim?

Pîra kergoşkê bêyî ku xwe bitertilîne got:

-Ey serdarê hemû lawiran, ez dizanim ku ez biçûk im û tu nikanî bi min têr bibî. Lê ji ber ku ez ji bo şîva te ya îşev hatim hilbijartin loma ez hatim. Esas ez dê hîn zûtir bihatama, lê bi rê de şêrekî din bera min da, xwest min bixwe. Lê heta ji min hat min baz da û min bi zor xwe ji nav lepên wî xelas kir.

Şêr bi hêrs got:

-Kîjan şêr bû? Zû ji min re bibêje!

Pîra Kergoşkê got:

-Heta niha min qet ew li van deran nedîtîye. Lê yekî gelekî mezin bû. Ji te jî mezintir bû.

Li ser vê bersîva kergoşkê xurrînî bi şêr ket û got:

Te got ji MIN jî mezintir?

Kergoşkê got:

-Dibe ku jî li ber çavên min wer mzin xuya dikir. Lê belê yekî pir hêrsok û êrîşkar bû.

Şêr bi hêrs, dêla xwe wekî qamçîyekî, paş de û pêş de li erdê xist û got:

-Were zû wî nîşanî min bide. Divê ez vê yekê ji wî re nehêlim!

Pîra kergoşkê bi zanetî stûyê xwe xwar kir û got:

-Ew şêrekî gelekî mezin û stûr e, ez ditirsim ku te biêşîne.

Li hember van gotinên kergoşkê, şêr tew bi carê de dîn bû û got:

-Te got ew ê min biêşîne?! De zû bide ber min! Li ber çavên te, divê ez îro wî parçe parçeyî bikim!

Kergoşk ket rê û şêr jî da pê wê. Çûn, çûn heta ku li ser devê bîrekê sekinîn. Kergoşkê bi pepikên xwe yên biçûk binê bîrê nîşanî şêr da û got:

-Ew di hundirê vê bîrê de ye.

Dema şêr xwe bi ser bîrê de xûz kir û li jêr nêrî, ji nav avê şêrekî jî li wî mêze kir. Li ser vê, şêr gelekî qeherî, bijî li dora stûyê wî tîk bûn û bi xurînîyeka mezin diranên xwe qîç kirin.

Li jêr bijîyên şêrê din jî eynî wekî yên wî tîk bûn û wî jî diranên xwe qîç kirin. Şêr heta jê hat bi şêrê di bîrê de xurrîya:

-XUURRR!

Dengê wî di hundirê bîrê de olan da û wekî ku şêrê din jî ji binê bîrê lê vegerîne û bibêje:

-XUURRR!

Li ser vê, şêr hewqas qeherî ku hema got gurm û xwe avêt nav avê. Ser serî çû ket binê bîrê. Dema çû ket binê bîrê, dît ku şêrekî li wir tune ye. Ew tenê sûretê wî bi xwe bûye. Piştî wê, kergoşkê rabû bi lez û bez berê xwe da mala xwe. Dema zarok û nevîyên wê, ew li hember xwe dîtin gelekî dilşa bûn û hemû li dorê civîyan.

Wê jî rabû ji wan re qala serpêhatîya xwe kir û bi serbilindî got ku wê çawa şêr xapandîye û xistîye bîrê.

Hemû zarok û nevîyên wê bi cesareta pîrika xwe serbilind bûn û ew pîroz kirin.

Dema lawirên din bihîstin ku Pîra Kergoşkê çi anîye serê şêr, hemû matmayî man. Çeqelê ku tu carî bi zimanê xwe nikanîbû, dîsan xwe avêt ortê û got:

Min zanîbû ev kergoşk dekbaz e!

Û helbet çeqel di vê gotina xwe de ne neheq bû jî. Çimkî Pîra Kergoşkê bi cesaret û dekên xwe hem zora şêr bir û hem jî xwe û gelek lawirên din ji mirinê xelas kir.

### 1.1.2. Gur û Rovî

Dibêjin carekê gur û rovî bûn destbirakên hev û biryar dan ku bi hev ra bijîn. Lê di rastiyê de niyeta gur tiştekî din bû, ew ji xwe re li dû xizmetkar û xulamekî bû.

Rojekê her du bi hev re derketin nêçîrê, ji berbanga sibê heta êvarî vir de çûn, wêde çûn lê tiştek bi ber qîlên wan neket. Gur hem pir birçî bû hem jî ji hal de ketibû. Hema yekser berê xwe da rovî û jê re got:

-Ez êdi hew dikanim bigerim. Zû ji min re tiştekî xwarinê bibîne,ya na ez dê te bixwim.

Rovî berê xwe dayê ku gur henekan nake, bi rastî jî ew dê wî bixwe. Ji mecbûrî got:

-Li vî gundê jêr, li mala muxtêr du berx hene, heger tu bixwazî ez dikanim herim ji te bînim.

Kêfa gur gelekî ji vê pêşnîyarê re hat. Got:

-De rabe here zû bîne.

Rovî rabû çû ket koza kahr û berxan û bi rastî jî berxekî biçûk ji kozê derxist û bir danî ber gur.

Gur ket ser berxê xwe, giş xwar û dora devê xwe alast.

Lê têr nebû, xweat berxê din jî bixwe. bes ji dêlî ku dîsan ji rovî re bibêje," here berxê din jî ji min re bîne", lêxist ew bi xwe çû.  lê ew wekî rôvî ne jî ne jî kone

bû, ehlê malê û kuçîk tavilê pê hesîyan û tu nemabû ku wî bikujin. Bi zor û bi halekî xerab xwe ji nav lepên wan xelas kir û vegeriya ba rovî.. Rovî di dilê xwe da bi halê wî kenîya lê eşkere tiştek negot.

Roja din gur dîsa got ez birçî  me û dîsan doza xwarînê li rovî kir.

Rovîyê reben ji bêçaretî dîsan rabû çû ji gundekî din, icar jî du mirîşk dizîn û anîn dan gur. Gur ew jî di derbekê de xwarin.

Lê wekî roja din, dîsan têr nebû û xwest ku ew bi xwe here çend mirîşkên din jî bîne û zikê xwe baş têr bike.

Lê xwedîyê malê zû pê hesîya û dîsan baş lêdan, ew kut kirin, ji halekî derxistin kirin halekî din. Bi zûrezûr bi ax û of xwe giîhand ba rovî.

Roja sisîyan gur dîsan çû  bi gewrîya rovî girt û jê re got:

-Zikê min ji birçÎ na dike qurequrr, divê tu herî ji min re tiştekî xwarinê bînî, dema tu neynî jî dêlê ve ez dê te bixwim.

Rovî ji bêçaretî stûyê xwe xwar kir û got:

-Ez malkê dizanim, wê rojê golikek şerjê kirin û goştê wî kirin qelî. Ez dê herim ji te re hinekî bînim.

Gur got:

-Na, ya baş ew e ku ez bi te re werim, zikê xwe li wir têr bikim çêtir e. De zû bide pêş min, ez hew debar dikim.

Bi rastî jî mexzena malê tije xwarin û kûp jî tije qelî bû. Her du bi kêfa dilên xwe ketin ser qelîyê. Lê serê carê rovî tim diçû xwe di paca ku tê re ketibûn hundir re dikir û dihat ji bo ku bizanibe ew zêde qelew nebe kanibe dîsan di wê qulikê re derkeve.

Vê yekê bala gur kişand û ji rovî pirsî, got:

-Birakê rovî, ji bo çi tu tim diherî der û tê?

Rovî got:

-ez çavdêrîyê dikim, hela ka kes te ya na.

Gur got:

-Baş e, bila çavê te li der be. Ez bi xwe lingê xwe ji vir navêjim der heta ku vê qelîyê gişî neqedînim.

Tam di vê bîstikê de derîyê mexzenê got çîrk û vebû û xwediyê malê ket hundir.

Rovî bi yek çindikê re go xişt û di paceyê re baz da û xwe xelas kir.

gur jî da dû, lê ji ber ku wî pir xwaribû, zikê bûbû def û loma jî di paceyê de asê ma û nikanîbû birevîya.

Xwedîyê malê xwe gîhandê û ew di paceyê de girt...

lê rovî revîya, çû xwe gîhand daristanê. Ew gelekî kêfxweş bû ku wî xwe bi vî awayî ji destê gurê zalim xelas kiribû.

### 1.1.3. I. Pişîk û Şêr

Pişîkekê bi zexmê, gir hebû. Pir wêrek û çeleng bû. Gelek rind dizanîya şer bikira. Bi pişîk û mişkan re zêde şer nedikir. Dema bircî jî bimaya, gelek caran şerm dikir ku biçûya nêçîra mişkan. Jixwe gava dengê wî bihata, hemî heywanên piçûk xwe vedişartin. Ne tenê heywanên piçûk, gelek caran se jî, jê ditirsan xwe jê diparastin. Daxwaza wîya zêde nêçîra teyran û maran bû. Pişîkek reş, çavheşîn û bisimbêl bû.

Simbêlê wî gelek himbiz û dirêj bû. Gava ku mirov lê dinêrîya, pêşî simbêlê wî dixwiya. Gava xwe li ber nêçîra xwe diqeziland, pirça pişta stûyê wî gizir, guh û simbêlên wî mûç û çavên wî sor dibûn. Hemî endamên bedena xwe saz dikir û ji nişkêve xwe davête ser nêçîra xwe. Di vê tintêlêda bi hêsanî nêçîr ji destên wî nedifilîtîna. Di şerên dijminên xwe de jî, wisa sivik dixebitîya ku tu mecala derpan nedida hemberên xwe.

Ev pişîk bi tenê, bi serê xwe, ji geranê hez dikir. Zêdehîya gera wî li çol û çîyan bû. Deşt û zozan seyrangehên wî bûn. Carna du sê hefteyan jî, ji çîyan peyayê gundan nedibû. Dema bihata jî zû hêrs dibû.

Rojekê ji rojan, şêrekî fêris ji çîyayekî bilind de rastî vî pişîkî tê. Pişîk bi wêreke şahane xwe amadeyê girtina şêr dike. Pişîk li pişt puleke gîya de xwe bi cih dike û xwe diqelizîne. Hê xwe neavêtî, şêr pê dihese û jê dipirse:

-Hêy heywanê xwedê, tu çi kesî û ji kîjan malbatê yî? De were em bipeyvin û hev binasin.

Pişîk ji merdaya şêr şaş mabû û nezanî ka wê çi bike ku bi serfirazî ji merdaya şêr, xwe bi filitîne. Qasek hizirî û biryara xwe da, hat li ber şêr bi mêrane rawesta. Piştî kêfxweşîda yîn û pirsîna hal û hewalên şêr bersiv da û got:

-Ez şêr im û ji malbata şêran im.

Şêr:

-Belê, serê te, pirça te dişibe şêran. Lê çima ewqas hûrî?

Pişîk:

-Haho! Ewên ez di destê wan de me heger tu bûyayî nîvê min jî nedimayî.

Şêr:

-Ew kî ne û hêza wan çi ne ku hemnijadên min bibin û ew qas hûr bikin?

Pişîk:

-Ez di destê mirovan de me.

Şêr:

-Mirov çi ne û kî ne?

Pişîk:

-Mirov ew in ku hemnijadê te digirin, mîna min hûr dikin û dixin bin fermana xwe. Ne ku ez tenê me zêdeya heywanan, di bin ferwar û fermana wan de ne.

Her yek ji me bi awayekê ji wan mirovan re xizmetê dike. Bê weku peywira min girtin û kuştina mişkan e ku hesîneya wan xira nebe. Gava li nav malên wan mişkek dixwiyê mitliq ez qutanek pir giran ji destên wan dixwim. Bi vê jî ranawestin, demek dirêj jî min birçî dihêlin û ceza dikin. Ji ber ku ez ji hevalên xwe jêhatîtir im, cûdahîyek hindiktir ji min re nasîne. Jêhatîbûna min ew e ku ez maran jî digirim û dixeniqînim. Di navbera mirovan û maran de dijminîyeke kevnar û giran heye. Carna jî ez kewan digirim û nekuştî, ji wan re dîyarî dibim. Heger îro tu min li vî çîyayê bilind dibînî, saya van xizmetan e. Heger min ev xizmetên hêja, ji wan re nekirina, niha ez jî mîna pişîkên hevalên xwe, tenê nobedarê mişkan bûm û qet ji malan nedikarîma derketima. Tu here li wan hemnijadên xwe binêre, ka niha çi tintêl û hewalan de ne.

Şêr baş guhdarî pişîkî kir, serê wî tevlîhev bû û nezanî ka dê çi bike. Lewra heya niha dizanîya ku tu candar ji wî zeximtir û bi hêztir tune ye. Va ye, ev danasîna pişîkî dûv re zanîna wî bû, hêç hezra karekî wilo nedikir. Gelek hizirî her wekî pirsek nû hate hişê wî û ji pişîkê reş pirsî:

-Ma qey pencên wan mirovên tu jê dabaş dikî pir zexm in? An jî şirnik û diranên wan, ma pir tûj in?

Pişîk:

-Na, pencên wan hêç ne zexm in. Şirnik û diranên wan jî hêç ne tûjin. Bi destên xwe bi zor dikarin xwarin bibin devê xwe. Bi diranên xwe jî tenê xwerinê dicûn û dixwin.Em bêne li ser mijara şirnikan, yên mirovan ne şirnik in, jê re neynûk tê gotin. Bi neynûkan jî tenê bedena xwe dikarin bixwirînin û hindek karê sivik jî pê dikin.

Şêr:

-Nexwe ew bi çi şer dikin?

Pişîk:

-Padîşhê min tu dabaşa çi dikî? Ma ew bi dest û diranan şer dikin? Na, na, tu carî ew xwe nagirin ku bi destên xwe bi me re şer bikin. Yê min pir hêsan e. Bi kevçik û heskan li min dixin. Heywanên ji min mezintir jî bi çovan, gopalan û qamçîyan perwerde dikin. Bi cinawiran re jî bi çekên hesin yên dûravêj şer dikin. Çekên dûravêj yên wisa di destên wan de hene ku gelek dûr radiwestin û di bin kevirekî de, an jî di pişt darekê de xwe vedişêrin û bi wan çekan her canadaran dikujin an jî birîndar dikin. Carna bi hev re jî şerên giran dikin û hevdu diqelînin. Xwedê tu candarê nexe ber destên wan. Tenê vê hêvîyê ji Xwedayê mezin dikim. Bila me hemû heywanan ji teşqela mirovan biparêze. Nexwe mirov, heywanan hemî ramê bin fermana xwe bikin.

Şêr:

-Baş bû ku te ez bi vî karî da me hesandin. Êdî hêç kês nadim wan ku vê sitemkarîyê li candarên sitembar bikin.Tu dizanî ku ez padîşahê heywanan im. Parastina mafên heywanan li ser min pêwist e. Heya niha çira bi vê kirina bêwijdanî nehesame. Îro ez xwe gunehkar dibînim. Divê demek zû dest bi vî şolî bikim ku demek zûtir wan bê wijdanan perwerde bikim. An jî wan ji rûberên dinê winda bikim.

Pişîk:

-Na, Padîşahê min ev biryara te ne rast e. Lewra mirov bi merdayî nayne şerê te. Jixwe bi merdayî nikarin şer bikin. Ew bi fêlbazî, hîlekarî, sextekarî û nemerdî wê bi te re şer bikin. Lewra karên wan welê ye. Tu pir bizexm î. Ditirsim ku lepek bidin te û li pişta te siwar bin û heya bixwazin te bajon. Heger karekî wilo bînin serê te, firaza me hemîyan dişkê. Tika dikim, tu dev ji vê sewdeya bêçare berdî û me bêfiraz nekî.

Şêr:

-Mitliq divê herim wan bibînim. Ka ew çi ne û çawa candar in? Ji bo min xem kirin nexwaze. Lewra heya niha min dest avêtîye çi karî, bi hêsanî û di demek kurt de ser ketime. Di vî karî de jî ezê bi ser bikevim. Lewra hêza min ji hêza hemî

candaran zêdetir e. Heya îro tu candarê nekarîye bi min re têkoşîn bide û bi serkeve. Ev jî yek ji wan e.

Pişîk:

-Na, padîşahê min, ev ne ji wan candaran e. Di mirovan de, her wekî ku hêzekî nêhanî heye. bi her awayî ji te piçûktir im, lê  min rîpa mirovan dîtîye. Hilo guhdarê min be xwe mexe rîppa mirovan. Hatîye serê min bila neyê serê te. Ji dawîya te pir ditirsim. Ditirsim ku tu bikevîyê û êdî nekarî jê derkevî. Dîsa ditirsim ku wisa l ite bikin ti j imin jî hûrtir bibî û padîşahîya xwe jî winda bikî.

Şêr:

-Pişîkê dilovanê hêja tu ji min hêç metirse. Ezê mitliq ji bin vî karî derkevim. Tenê tu rîya wan nîşanî min bide û ji dûr ve guhdarê min be, da bibînî ka ezê çi binîme serê wan.

Pişîk:

-Heçî rêberîya te newêrim bikim. Ezê nîşana wan ji te re bibêjim. Lê divê tu bizanî ku gava çavên wan li te bikevin, wê xwe veşêrin. Ew jî bi awayekî wisa dê veşêrin ku çiqas tu li wan bigerî dê libek ja wan nebînî, lê her gav  wê ew te bibînin û wê sehya hemî bizavên te jî bikin. Dema wan mirovan kêsa xwe dîtin, wê nişkêve hingek l ite xin ku bi tu awayî êdî nekarî ji bin wê hingê derkevî.

Şêr:

-Dev ji van çîrokan berde. Heger te divê tu qencîyek li min bikî, nîşana mirovan ji min re bibêje. Ezê demek zûtir xwe bigihînim wan. Belkî candaran di demek kurt de ji destên wan û ji sitema wan rizgar bikim.

Pişîk:

-Madem tu ewqas îsrar dikî û daxwaza te jî ew e ku nîşana mirovan ji te re bêjim. Ezê vê yekê ji te re pêkbînim. Nîşana wan ev e: Erdê Xwedê li xwe beş kirine û her yekî tixubên xwe kifş kirine, ji çeman û newalan cûyên avê derxistine û av

birine li ser qada xwe. Bax, baxçe û rez danîne, welê kirine ku her alîyên qada wan kipkesk dixwiyên. Xanîyên bilind û gelek xweşik ji xwe re çêkirine û di wan xanimanan de rûdinin. Gelek rîyên baş jî, ji xwe re çêkirine. Ku bi hêsanî bi wan rîyan ve diçin û tên. Li dora xanîyên xwe gelek ked dane. Dîwar, sênc û rêyên gelek tekûz çêkirine. Bi kurtasî erda xwe kirine bihişt. Gava te ji dûr ve ev nîşanên wilo dîtin, bizane ku erdê mirovan e û gorê wî xwe amade ke. Lê tu gavî tevdîran ji destên xwe bermede û bawerîya xwe bi kurê mirovan meyne. Lewra bi xwe ji hev re jî paşkox û xayîn in. Qewîtî ji te ra.

Şêr, ev nîşane û nîv navnîşana han ji pişîkî hûn bû, bi şêrane xatir ji ppişîkî xwest, berê xwe da oxira xwe, rîya dûvedirêj da pêşîya xwe çû û din av çîyan de winda bû.

Pişîk gelek hizirî û ponijî bi xwe re: ‘’Dibe ku min rêyek çewt û şaş da pêşî şêr û bi tu awayî ji bin dernekeve. Na, na, çi ji destên min  hatî min ji şêr re kir û heya devê min ger amin şêr re got. Lê şêr ji kubarîya şêranî nehate xwar û bi ya min ne kir. Jixwe ji vê yekê zêde tu kar ji destê min dernediket.

II

Şêr û Ker

Şêrî, ew gotinên pişîkê, pirs û bersivên wan, mîna perda sînemayê di ber çavên xwe re dervaz kir. Hemî peyvên hatî gotin, lib û lib her yek di cîyê wî de hêjand û li ser vê yekê pir ponijî û ji xwe re: ‘’Gelo dibe peyvên pişîkê gişk rast bin û çewtî û şaşitî li bal min be? Na, na, ez ne şaş im. Lewra ez şêr im, xwidan hêz û mêr im, ne ku mîna pişîkê newêrek im. Wisa dixwiyê ku mirovan çavên pişîkê tirsandine. Pişîk bi wan nikare û ew, welê dizane ku di dinyayê de tu candar jî bi wan nikarin. Ji gotina pişîkê kifş bû ku: ‘’Bi kevçik û heskan li min dixistin’’ digot. Ew cinawirên bi kevçik û heskan bêne perwirandin, êdî çi mêranî dikarin bikin û gotinên wan yên derbarên wêrekî û newêrekî de bi çi hêjan e û nirxên wan gotinan çi ne? Belê û belê pişîk her karê li gorê xwe dibîne û her candarî li xwe dikemperîne. Hêmin e ku her candar jî welê ye.’’got û ji bo biryara pêkanîna vî karî çûna xwe bêtirs û pirs didomand. Şêr bi şêrane serê xwe bilind kiribû,  tenê li ppêşîya xwe dinêrîya,bi

gavên şidayî û bi biryarek ji dil diçû. Nişkêve dengekî sosretê ku heya niha nebihîstî hate guhên wî, veceniqî û qasek rawesta. Cardin û cardin jî ew dengê zirîna bilindê bêtirs, bêkes  hat. Şêr guhê xwe mûç kir û li nasîna wî dengî xebitî. Lê wec neda. Lewra tu car dengekî wilo nebihîstibû. Qasek din jî rawesta û biryara xwe da û: ‘’Çi dibe bila bibe, dibe ku mirov jî be, ezê herim xwedîyê wî dengî bibînim ka çi ye bizanim.’’ Ji xwe re got û çûna xwe bi gavên serbest ên şidayî domand. Şerê gonî, ji çîyayên bilind dakete gelîyê kûr. Lî wan cîyan nihêrî. Kerekî gir, li çem ji xwe re diçêra. Haya wî ji tu bûyerê tune bû û bi wî devê xwe yê mezin ew kerbeş ên bi sitrîk dihepişand. Şêrî gava li devê kerî û xwarina wî ya kerbeşan mêze kir, gelek tirsa. Hezir kir û mitliq mirov ev e û jê sehw kir. Lê çi dibe bila bibe diviya bû ki şerê wî bike. Şêr çû li ber deviyekê û bi alaza girtina kerî  xwe qelizand. Kerî bêhna wî seh kir û veciniqî. Qêrîn kir û got:

-Hey padîşahê heywanan! Hûn çi ji min dixwazin û çi doz li navbera min û we de heye? Ez heywanekî xizan û belengaz im. Ji kêr hatinê zêde, tu zîyana min nagihîje tu kesî. Jixwe Xwedê ez ji bo karkirinê afirandime. Heger karekî padîşahê min hebe heye? Bifermo ezê filhal pêk bînim. Heger ku hûn westane û nikarin li rê bimeşin, fermo werin li işta min siwar bin û padîşahê min heya ku dixwaze ezê bi dilekî xweş û bextiyarî û şanaz dibim. Heger derbarê min de yekî ewanîyek ji balayê bilind re kiribe, fermo ji min re bibêjin. Mitliq ezê rastîya wî ji we re ragihînim.

Ew dengê bihistibû, şêr dizanîbû ku dengê vî guhdirêjî ye. Lewra ji devê wî yê mezin û ji xwarin û hepişandina kerbeşên bi strîk û wê gewdê re ew deng normal bû. Şêr qasek rawesta û hizirî, heger ev ne mirov be, gelo mirov çawa ne û çi ne? Dibe ku mirov hê ji vî jî mezintir be, di hişê xwe re dervaz kir û ji kerê pirsî:

-Qey tu ne mirov î? Ez li pê mirovan digerim û dozek min bi wan re heye.

Ker kenî û got:

-Hey lolo! Padîşahê min pirsa kê dike û min diminînde kê? Hey malava! Qey tu nîşaneyê merivan bi min ve hene? Ma qey endamên beden amin dimîne tu endamên bedena mirovan? An jî deng, rabûn, rûniştin, tevger, xwarin, vexwarin û zanîna min qey diminîne yên mirovan? Na, mûyekî mirovan bi tenê jî b imin ve nîne.

Ez heywanekê rebenekê belengaz im û bê çare me. Ez wisa bê çare me ku qijik li ser serê min vedinişin û nikilan li serê min û çavê min dixin û dikin ku çavên min derxin, nikarim wan ji ser xwe biqewirînim.

Padîşahê min, ma mirov mîna min in? Na, ne mîna min in. mirov ew in ku li min siwar dibin. Heya kêfa wan tê min dajon û carna jî min dibezînin. Min dibine aşî, daran ê bêrîyê. Min birçî dihêlin, têhn dihêlin, bê xew dihêlin û din av germê û sirê de dihêlin. Bi kurtasî çiqas karên giran hene hemî bi min didin kirin û jîna eware û bed jî behra min e. Ev çêrîna min ya wwe dîtî, qencîyeke ku mirovan li min kirine nîmeteke ku dane min, ez berdame vî devçemî û ji xwe re diçêrim. Înca pêşberê vê qencîyê ka dê çi bi min bikin û çi j imin bixwazin. Hêvîya qencokaran im kum in ji destê van sitemkaran rizgar kin. Qencokar jî ji dinê xelas bûne an jî rastê min nayên nizanim. Dawîya temenê min wê çawa be, wê jî nizanim.

Gava kerê kerbejişxwar serpêhatîyên xwe şirove kir, şêr şaş bû û nezanî ka çi ke û çi bêje. Him tirsa mirovan kete dilê wî û him jî kîna wî zêde bû. ‘’ Nexwe qncîya mirovan ew e ku têkil nebe, an jî serbest berde. Ev kirin ji alî tu candaran ve nayê pejirandin. Ev sitemkarîyeke herî mezin eû divê candar ji vê sitemkarîyê bêne rizgar kirin. Wisa dixwiyê ku pişîk di gotinên xwe de mafedar bû.’’ Şêrî ev dabaşa di serê xwe de dervaz kir û ji bo êdî têkûz nasîna mirovan hindek jî pirs li kerê kir:

-Tenê miroveke, van siteman dike?

Kerê kerbejişxwarê belengaz:

-Na, ez xulam ne yek tenê ye. Çiqas mirov, min dîtine hemî jî, kêm û zêde mîna hev sitemkar in. Heçî derbarê min de, sitema wan heya asîmanê bilind çûye. Heger ne ez bim, kes nikare vê sitemê ragire.

Şêr:

-Ji bil siwarî û bar kirinê, karekî din jî bi te didin kirin?

Ker:

-Belê ez xulam. Carna bêder û carna jî bi cot b imin didin kirin. Yek jî karê ku ez zehf jê eciz im b imin didin kirin. Rûyê min ji we reş, li kêmasîyan menêrin, ji bo ku heywanekî barî yê herî zexm bigihîjinin carna jî, min bi mehînê re dicewitînin. Ev kar, min rezil û ruswa dike û ez nikarim din av heval hogiran de serê xwe bilind kim. Gava mirov ji hev eciz bin, an jî rikê wan ji hev bê, ji hev re ‘’ker û kurê kerî’’ dibêjin. Heya derecekê ji vî re ‘’belê’’ dikarim bibêjim. Lê carna ji hev re ‘’ hey kerê mehînan’’ dibêjin. Ez vê yekê ji hemî karan û ji hemî heqeretan girantir dibînim.

Şêr baş guhdarî van peyam û xeberên kerî kir. gelek guneha wî lê hat. Bi xwe, xwe jî gunehkar kir. Ji wê bizava derbarê kerî de kiri poşman bû. Ji bo edeb û nezeketa kerê şaş ma û bi xwe ra: ‘’Ez padişahê heywanan im. Ev edeb û nezaketa bi kerê re heye, min di tu candaran de ne dîye. Ji vî heywanê xebatker, şermoker, bi edeb, bi nezaket, bê zîyan, bê kîn, di fermana candaran de amade, bi her karî qayîl, çi bidinê dixwe, çi bibêjinê dike, ji dostê xwe re dost, ji dijminê xwe re jî dost, bêhinfireh û sernermê xweşxuy çi dixwazin û ez jê çi dixwazim? Tenê kêmasîyek wî heye; Dengê wî pir bilind, ji kûraya kovanên dilê wî tê û dixwaze ku dengê xwe bi dinê bide sehkirin. Mixabin heya niha tu candarî dengê wî sehnekirîye û derdê dilê wî nezanîye. Lewra ew jî di tintêl û hewalê xwe de dişewite û carna qêrînek jê diçe’’ got û di van karan de xwe jî gunehkar kir. Giranîya guneh û sitemkarîyê l inik mirovan dît û li ser biryara xwe rawesta û zanî ku heya mirov neyên oerwerde û îslahkirin, di cîhanê de ne rehetîya heywanan û ne jî rehetîya mirovan çêdibe.

Şêrî bexşandina kêmasîyan ji kerê daxwaz kir û xatir jê xwest, rabû, berê xwe de riya xwe û çû. Kerê reben li çûna şêr mêze kir, heya pêş çavên wî winda bû. Şêr çû li ser oxira xwe û ker jî ma kul xemên xwe. Ango şêr jî, tu dermanek ji derdê kerî re nedît û tu avek li agirê dilê wî nekir.

III

Şêr û Hêstir

Şêr, gelek çîya, banî, zozan, gelî, deşt û pesar li pê xwe hiştin, mîna karxezalekî dibezîya. Gava di çîyayên asmûê re dervaz dibû, ji ber lingên wî kevir

digindirîn. Ji dengê gindirîna keviran, hêwirze dikete çîyan û gelîyan. Tirs dikete nav candaran û serê xwe radikirin, lê dinêrîya ku şêr e, bi lez bez dihere. Hemî candaran jî zanîn ku şêr, ji bo karekî girîng dilezîne û xwe vedişartin. Şêr, ji rêlên talan, ji çîyayên asê, ji erdê bikevir û şikêr û ji avên boş xwe nediparast. Bi alaza gîhîştina rav û nêçîra xwe dilezand û dibezîya. Di vê çûna xwe de rastî çemekî mezin hat. Li qiraxê çem gelekî rawesta. Bi tu awayî nedikarî ji çem dervaz be. Ji bêçaretîyê, xewa wî hat û raket. Bi zirîna kerê şîyar bû. Lê nêrî ku kerekî ji kerê din hê zexmtir û girtir, ji jor de tê xwar û şa bû. Lewra dizanîya ew kerê emekdar, dê wî ji ava boş dervaz bike û li pê mebesta xwe here.

Piştî dervazbûna rexê din, ji kerê spas kir û dîsa bi êîyan û banîyan ket û dilezand. Ji ber lezgînîya xwe, nedixwest hêç raweste. Lê wisa westa ku nekarî êdî bilive. Ji bo qasek hesîne kirinê li bin sîya darekê rûnişt û paşê jî vezela. Piştî vezelînê xewa wî hat û qasekê raket. Şêr di xewna xwe de mirov didîtin. Mirov ji wan candarên heya niha ku dîtibûn, pir girtir û dest û lingên wan pir stûrtir, sermezin, dirandirêj û çavên wan pir sik bûn. Mirov li ser pişta wî siwar dibûn û dibezandin. Carna jî ji bin wan nedikarîya rabûya. Digeel vê yekê, yekî din jî lê siwar dibû û êdî nedikarîya bilivîya jî. Pencên xwe davêt wan, lê wan nedigirt. Dixwest ku bi diranên xwe, wan bigire û gez bike, diran di bedena wan de nediçû. Şêrek di wê re dervaz dibû, dixwest ku gazî ke dengê wî dernediket. Xwe bi mirîtî datanî, dîsa mirov ji ser ranedibûn. Şêr, peyman dida wan siwarên li ser pişta xwe ku tucarî bi wan re û bi têjikên wan re dijminî neke, bi tu awayî nedipejirandin. Didît ku mirov ji ser pişta wî ranabin, înca peymanek din dida wan hinek gencîne hene ku ew tenê pê dizane, heger ji ser pişta wî rabin, wê wan qencînan tev bide wan, dîsa wec negirt. Çiqas dem pêve diçû barê wî giratir dibû. Hate derecek welê, bêhna wî çika û êdî nedikarî bêhn bide û bistîne. Di vê tintêla giran de, nişkêve ji xew şîyar bû. Şêr din av xwîdanê de reş bûbû. Te digot bedena wî hemî bûye av. Şêr rabû li ser pîyan rawesta. Nedizanîya ka çi hatîye serê wî. Li derdorên xwe nihêrî, tu canderek nedît. Lê ji dûr ve dengên qirik û qijikan dihat. Ev jî ne çare bû ku li şêr siwar bin. Jixwe giranîya qirik û qijikan li şêr bandor nedikir. di vê şaşîyê de bû şêr xwe veweşand. Xwîdan peka wan deran. Bi veweşanê xwe ziwa kir. ppaşê qêrînek da û ‘’Ez im padîşahê heywanan, ez im şahê çîyan, ez im mîrê mîran. Ew çi heyîn e k udi xew de tê l imin siwar dibe û li

ser pişta min kêfê dike. Heger hunerek di bedena wî an jî wan de heye, bila derkevin holê.

Hêstirekê bêçare, ji karwanê veqeta bû li wir diçêra. Dema bi vî awayî dengê şêr bihîst, silikî û revî. Ji tirsa şêr û ji dijwarîya revê, lingê wî ricifî û şemitî, li ser pişta xwe ket , lingên wê mane evrazî. Êdî zanî ku ji pencên şêr filitîn tune û xwe siparte Xwedê. Şêr di tintêla revê de hêstir dît û zanî ku mirov ev e, ewê li ser pişta wî siwar bûye ev e, ewê candar têxe bin fermana xwe ev e, ewê sitem li candaran dike ev e, ewê hukim li cîhanê dike ev e, ewê serdestî li kesên bindest dike ev e û li ser wî pêwist e ku gerdûnê ji şerê wî bifilitîne, hizirî û berdayê.

Gava nêzîk bû û lê nihêrî, va ye li ser pişta xwe razaye û lingên wê evrazî mane. Tav dide nalên lingên hêstirî, pertav jê diçe û dide çavên şêrî tarî dike. Şêr qasekê li dora hêstirê digere û cîymb bê pertav dibîne û xwe amadeya girtina wî dike. Hêstir, dizane ji destê şêr filitîn tune. Di hêstirê de êare û hêza revê nemaye. Çavên xwe vedike şêr dibîne û çavên xwe dadide dîsa şêr dibîne. Hirehira şêrî guhê hêstirî tal dike û demek zûtir bi xwarina xwe qayîl e, da ji vî hewalî bifilite. Hêstir hêza xwe hemî berhev dike û ji şêr dipirse:

Ey mîrê heywanan hûn ji min çi dixwazin? Derbarê we de min çi çewtî kirîye, hûn min ceza dikin?

Şêr lê nihêrî, ewên di xew de li ser pişta wî siwar, sê çar lib bûn. Ev yeke û jê pirsî:

Ka hevalên bi te re û revîn, li kû ne?

Hêstir:

-Hêç hevalên min tune bûn ez tenê ji karwanê veqetabûm û li wir diçêram. Daxwaza mine w bû, demek zûtir xwe têr kim, herim bigîhijime karwanê xwe bi karwanê re ji vî welatî derkevim.

Şêr:

-Hên sê çar heval bûn. We dirûva xwe guherti bû. Min gelek hêvî û lava ji we kir hey amin pêşnîyara bertîlê jî li we kir, dîsa ez bernedam. Ma te ji bîr kirîye, ma qey ez derew dikim?

Hêstir:

-Na, haşa mîrê min zatê şahane tucarî derewan nake. Ez di vê mijarê de şaşîyekê dibînim. Dûn dabaşa raketina xwe dikin. Dibe ku hûn bi hinde xiyalan ve katibin xewek kûr. Ew xiyalên we ji xwe re çêkirî hatibin xewna we û hûn jî dizanin ku rast e, bi sedema vê yekê pêsîra min digirin. Ev kirin ji zatê we yê şahane re ne layiq e. Lewra ez jî heywan im hûn mîrê min in jî. Hêvî dikim hûn vê yekê baş bînin bîra xwe.

Şêr:

-Bibêje tu ji kîjan malbatê yî?

Hêstir:

-Ji malbatên mîna malbata min re ‘’melez’’ tê gotin. Lewra hêstir bi serê xwe ne malbatek in. Dibêjin ku pêşî me bi dijminê Xwedê re yekbûn çêkirîye. Xweda jî li me xezebê kirîye ku nesil li pê me nekeve û eslên me jî, ji heywanên têvel bin. Bê weku bavê min ker e û diya min mehîn e û têjikên min jî tune û nabin jî.

Şêr:

-Nexwe tu kurê kerê yê melez î. Ez bavê te baş dinasim û qencîyek wî jî li ser min heye. Bavê te pir xebatkar e. Gelek kêra candaran tê û herdem riya rast nîşanî candaran dide. Ew kerê bavê te, bi edeb û bi nezakete jî, bi mezinan re mezin, bi piçûkan jî hez dike. Xwezka candar hemî wekî bavê te bûna. Hêvîdar im, tu ji bavê xwe biborînî.

Hêstir:

-Spas mîrê min, hûn bavê min rind dinasin û min jî divê ku ez bigihijime bavê xwe. Berê: ‘’Kes nagihîje bavê xwe’’ digotin. Paşê ew derew derket. Rastî ew e ku

her kes ji bavê xwe diborîne, wekî kurê xwe nabe. Lê ez ne tê de me. Bi tu awayî nagîhijime bavê xwe. Dikarim bibêjim, ya bavê min fazîletek e Xwedê ji nik xwe dayê.

Şêr:

-Gava di tintêla revê de min tu dîtî, min dizanîya ew mirovên li min siwar yek jê tu yî û direvî. Min jî, di dilê xwe de got, ev karekî pir baş e. Jixwe ez li pêy mirovan digeram, him jî li ê wanên li pişta min siwar. Vaye baş rastî min hatin. An go ezê ‘’ bi kevirekî du teyran bikujim.’’ Dema derket ne wilo bû.

Him mirov nebû û ewên hatibûn ser pişta min qet nîn bûn, him jî kurê dostê min derketî. Ev yek ji bo min pir karekî berdilî bû. Doza siwarbûna pişta min, yeqîn im ku xewn e. Lewma bi xiyala mirovan ve ez nivistî bûm.

Berdilîya min ev e: bi saya te min xewn zanî çi ye û kurê dostê xwe jî nasî. Lê bi nedîtin û nenasîna mirovan jî xemgîn im. Dê ka derbarê mirovan de tu çi dizanî ji min re bêje?

Hêstir:

-Mîrê min, ma hûn li pê mirovan degerin? Ma çima wê napirsin? Ez wan bêbextan rind dinasim. Jixwe ez dîl, bende û girtîyê wan im. Ez pergala gîhandina barên wan im. Mirov ew in ku barekî giran li min dikin, dema kêfa wan bêtê, li ser barê min jî siwar dibin û çovan û qamçiyan ‘’Ço ço’’ dibêjin û min dajon. Gava dilê wan bixwaze peya dibin, barê min jî datînin, piştî wê yekê an min ditewilînin an jî çawa we dîtî ji bo demekî kin min serbest dihêlin. Divê bê zanîn, ev tewilandin û serbest hiştin, ne ji dilovanîya wan e, ji bo karê xwe dikin. Divê ez biçêrim û têr bixwim ku barên wan ragirim û ragihijînim. Ji bil wec û kêra xwe bi xwe mirov tu karî nahizirin.  Mirov çawa zorbetî, serdestî û sitemkarî l ime dikin, wisa li mirovên bê hêzên reben jî dikin. Mirovên hêzdar yên bêhêz jî mîna me, her yek di karêkî de didin xebitandin. Ji keda wan, tenî ji bo nejarbûna û nemirinê didin wan yên din hemî bi xwe dixwin. Vê jî bibêjim din av wan de kesên mirovperwer heya mirovên candarperwer jî hene. Lê hejmara wan hindik e û bi wanên sitemkar nikarin. Hey mîrê heywanan, naxwazim hûn bikevine rîpa wan. Lewra mirov bi fêl û fend in û bi

hezar awayî diçerixin. Wan bi xwe jî hey ani nikarine fêlên hev rast kin. Ji wê sewdaya we ditirsim ku, hûn bikeviine çerxa girdava mirovan û êdî nekarin jê derkevin. Dîsa ditirsim  ew xewna we dîtî rast derkeve, ew mirovên bextreş, we jî mîna min bar kin li we jî siwar bin. Heger karek wilo bête serê we, firaza me heywanan tev dişkê. Heger hûn bi ya min bikin dê hûn bifetilin, di çîya û rêlan de rûnin û mîrîtîya xwe bikin.

Şêr:

-Wisa dixwiyê, mirovan gelek çavên te tirsandine. Lewma gava tu dabaşa wan dikî lêvên e diricifin û nikarî dengê xwe bi hêsanî derxî. Divê neyê ji bîr kirin ez şêr im, padîşah û mîrê mîran im. Her candar, divê ramê fermana min be. Yek jî ev sîtem û zordarîya mirovan nikarim biejirînim. Divê sitembaran ji sitema sitemkar û zordaran rizgar kim. Çavên weza, sêwî û bêkesan l imin in.  Ango herkes bi çavên çaresazîyê l imin dinihêrin. Divê mirovan an bi qelînim an jî perwerde bikim.

Hêstir:

-Belê mîrê min, parastina sitembaran babeta mîran e. Perwerdekirina sitemkaran û zordaran babeta mîran e.rakirina bê dadîyê babeta mîran e. Pêkanîna dadîyê babeta mîran e. Çaresazkirina ji bo weza û bêçareyan babeta mîran e û van hemîyan jî hûn dikin. Bê zatê we, cîhan ji heywanan re heram e. ev jemî rast in û tu gotina min ji van re tune. Belê hûn mîrin, hûn şêr in û hûn padîşah in, ev jî rast. Lê mirov bi mîrane, şêrane û bi padîşahane nayên we. Ew bi xapandin, dafik, lêpên kesnedî û çekên dûravêj dê bêne we. Vî karî jî bi destik, ewan û bi kesalêsên xwe dê bidin kirin. Jixwe qaydên mirovan ev e bi vê fêlbazî û qelaşîyê li ser pîyan rawestane. Hûn dizanin ku di demên kevin de hakîmîyeta cîhanê di dest we de bû. Îro tenê dehlên talan û çîyayên asê di dest we de mane. Ango hakîmîyeta cihên xweş hemî di bin hukmê mirovan de ne û hemî jî bi qelaşî û sextekarî xistine destên xwe. Gotina kurê dostê we ji we re ev e.  Ji vir paş zatî şahane dizane.

Piştî qedena peyivîn hêstirê şêr bi destên wî girt, xatir jê xwest , jê re: ‘’Pir spas, ez bi gelek karan agahdar bûm. Van şor û gotinên te yên zanistî hêç ji bîr nakim. Ezê qasek li ser van gotinan bihizirim, bihêjînim paşê biryarek baş bidim.

Min j ite jî mîna bavê te hez kir. Xwedê tevî karî we be. Hêvîdar im tu tengasîyan nebînin’’, got û berê xwe da oxira xwe ya xeter, rabû û çû.

Piştî çûna şêr, hêstir kete xeteran. Bi xwe ji xwe re: ‘’Erê şêr çi mehlûqekî mîran bû. Mîsoger mîrîtî lê tê, mîrîtî tam layiq û babeta wî ye. ew nezaketa wî, ew dilovanîya wî, ew bênefsîya wî, ew giranîya wî, ew merhemeta li wî heyî min heya îro nedîtibû û nebihîstibû jî. Mîrîtî sed car lê pîroz be. Ev karê şêr dayî pêşîya xwe tam layiq û babeta mîran e. Lê qasî pê dizanim, karekî pir xeter e û bê ewle ye. divî şuxulê giran de ne ez bi tenê, divê heywan hemî jî arîkarîya şêr bikin. Heger em hemî arîkarî bikin, mitliq wê bi ser keve.

Mixabin di navbera me de yekbûn tune. Yek ji heywanên kûvî newêrek in, gava mirovan dibînin direvin. Hêç karên baş ji destên wan dernayên heywanên kedî jî mîna gel û refên bindest, çavên wan hatine tirsandin, îro derp ji destên wan dernakeve.

IV

Şêr û Ga

Şêr ji hêstirê cûda bû dîsa rîya dûvedirêj da pêşîya xwe, heya ji destên wî hat lezand. Lewra mebesta wî ew bû ku demek zûtir bi mirovan re rû bi rû be û ji wan gunehên wan bipirse. Şêr gelek çîya, newal û kendal li pişt xwe hiştin û di Germa rojê da dervazî keresihekê bû. Şêrê westayî, qasek li keresihê rûnişt hesîne kirin xwest. Piştî rûniştinê, ew pirs û bersiv û peyivînên navbera wî û hêstir de dervaz bûyî, lib û lib anîne bîra xwe û hêjandin.di van hêjandinan de muqayese di navbera peyivîna hêstir, ker û pişîkê de jî çêdikir. Di navbera peyivîn û peyvên hêstir, ker û pişîkê de guhertinek girîng nedidît. Li ser vê yekê gelek rawesta û pê sedemên hev girtina peyv û peyvînên her sê heywanan gera. Ev jî, ji alî mirovan ve hatibûn perwerde kirin. Mîna hev peyivîn û hizirina ne sosret e û di derenca dawî de normal e jî. Yê duduyan jî, dibe ku gotinên wan tev rast bin û misoger di mirovan de hêzek serdestên hêzan hebe.

Di vê tintilê da şêr çi bike?

Di her awa û karî de şêr, bi giranîya karê xwe dizane. Piştî peyivîna bi van heywanan re zanîn û agahdarîya wî zêdetir bû. Şêr gelekî hizirî, dîsa biryara xwe ya pêşî pejirand. Jixwe bi awayekî din jî nedihate hizirandin û ya rast ev bû, lewra şêr carek destpê kiribû û gelek candar jî pê hesa bûn. Diviyabû şêr vê yekê heya dawî bidomîne. Şêr piştî ejirandina biryara cara sisêyan, bi gumanek mezin ji cih rabû û bi alî gihîştina mebesta xwe ve bi gavên şidayî dest bi bizava xwe kir.

Di gera xwe de şêr, ji dûr ve gelek gund û bajar didîtin. Lê xwe ji wan averê dikir. Lewra dizanîya ku li gund û bajaran de gelek mirov hene. Di derbarê miovan de şêr xeşîm bû. Lewra hê tu mirov nedîtibû. Bi vê xeşîmî û nenasîya mirovan, yek car ketina nav koma wan xetere bû. Şêr bi vê yekê baş dizanîya. Ji şêr re ya rast di kenarekê de û li cîyekê tenha mirovek û du mirovan bibîne, wan baş binase, hêz, leb û fêlbazîyên wan baş bizane. Paşî li çareya serkevtinê binêre.

Di çûna xwe de şêr derkete serê çîyeyakî bilind. Li ber quntara çîyê û wê ve, deşteke fireh û dirêj xwiya dibû. Deşt mîna derya hêşîn dixwiya. Beşek ji deştê bax û baxçe bû, beşa din jî çandinî bû. Quntarên çîyan û banîyan jî hemî rez bûn. Ji dûr ve mîna bihiştê dixwiya.

Dema şêr ev deşta mezin a bi ruwek dît, gelek şah kêfxweş bû. Şêr, bi alaza gihiştina mebesta xwe, ji çiyê berbijêr daket. Çiqas nêzîkayî lê kir, deşt ew qas xemilandî û tekûztir dixwiya. Gava kete nava deştê înca kulîlkên rengîn jî didîtin. Li cem hev dîtina kulîlkên kesk, sor û zer gelek li şêr xweş dihatin û nedixwest ji cem wan rabûya. Lê peywist bû ku rojekê zûtir bigîhîje mebesta xwe. Ji ber vê yekê dilezand û bipeywist ji wan kulîlkên rengîn veqeta. Şêr di deştê da gelek çerixî, tenê dengê hinek canadaran mîna dengê bilûrê dihat. Şêr ew deng hemî jî dinasîn. Lewra tev jî dengên heywanên kûvî bûn. Şêr din av van deng û kulîlkan de dimeşa, nişkê ve dengekî bilind ê bitirs hate guhên wî. Şêr qasekî vewesta. Baş guhê xwe dayê, belê hêç nebihîstibû, nenasîbû û heyîna heywanek wilo jî nedizanîya.

Ji ber vê yekê ji wî dengê bi tirsa. Lê bi biryar li xwedîyê wî dengî gera. Carekê jî dît candarekî gir û strû dirêj li pêşber rawestaye û diore. Belê xwediyê wî dengî ew bû. Şêr; ‘’ Mirov jî ev e’’, got û xwe paş ve kişand, li ber qurmê darekê

qasek rawesta û xwe amadê girtina gê kir. Di vê tintêlê da ga ppê hesîya, gazî kir û got:

-Ey serdarê heywanan! Hûn ji min rebenê belengaz çi dixwazin û min ji cenabê we çi kirîye?

Şêr:

-Ezê te bixwim.

Ga:

-Ji bo çi min dixwî?

Şêr:

-Te li vir çi dikir? Te xwe ji cenga kîjan sitembarî re amade dikir? Tu çira diorîyayî? Bi vê orînê te gazî kê û kîyan dikir? Ew hevalên te yên mmîna te sitemkar li ku ne? Ez bersiva van hemî pirsan bê kêmasî û bê derew û vir ji te dixwazim. Paşî ezê biryara fermana te bidim.

Ga:

-Ez gelek birçî mabûm. Hatim, ketim nav van gul gîyayan hey amin têr xwar ez çêram. Em ga, gîyaxwer in ne goştxwer in ku sitemkar û cengawer bin. Tenê carna mirov me dixapînin û me berdidin hev.

Heçî ew orîn, ne gazîkirina hevalan bû lê ew şîn bû min dikir. Çîroka şîna xwe jî, ji serdarê xwe re bêjim: Gayekî heval destebiraê min hebû j imin girtir, ciwantir, qelewtir, strûdirêjtir û bedewtir bû û me gelek ji hev hez dikir. Hêç hewîya me bê hev nedihat. Zêdetir hewîya min bê wî nedihat. Lewra pir merd, ciwanmêr, wêrek û fedakar bû. Di hizra min de kêfa mirovan çûbû goştê wî lehengî. Sê sal berê îro, ew lehengê bê guneh, anîne li bin vê dara hûn li binî rûniştî, li ber çavên min pîyê xwe quta, quta heya can da. Dûre guran, goştê wî perçe perçe kirin û birin. Ji nihêrîn û bîzîkirina wan sitemkaran zêde ti ji destên min nedihat.

Çiqas rîya min bi vir dikeve, bêhna xwîna wî diçe keûyê min, ez qasekî şîna wî dikim. Jixwe şîna hev kirin di edetê me dewaran de heye.

Serdarê min çar meh bû rîya min bi vir neketibû. Îro ez pir birçî bûm. Hatim li vê hafa jêrîn, qasek çêram ji bo şîna hevalê xwe hatimhê min xwe negehande binê darê, ez bi orîn û borînan ketim. Heger serdarê min ev menzere bidîta dê ew jî bigirîna û heger zimanê min bizanîna îro ez îfade nedikirim.

Gava şêr, guhdarî van serêhatîyan kir, dilê wî şewitî, bêhîna wî teng bû, hêrsa wî hat û ji mirovan zêde bîzî kir. Nexwe ew mirov çi ne, çi dikin, çi nakin? Bi tu awayî mine w nenasîn. Her çi dibe bila bibe, ez pirsa xwe ji gayî jî bikim:

-Ma tu ne Mirov î, nexwe mirov kî ne û çi ne?

Ga:

-Serdarê min hûn pirsa mirovan dikin, ew jî ji min dikin? Anjî hûn min dinimînin mirovan? Hey lolo! Ezê rebenê bê newa li kû mirov li kû? Ez gîyaxwer im, sitembar im, mirov emekxwer û sitemkar in. Serdarê min ez ne mirov im. Hêsîr, dîl û girtîyê mirovan im. Di emir û fermana mirovan de me. Di kar û xebata mirovan de me. Di girtîxane û zindana mirovan de me û heywan im. Serdarê min, ez xulam, mirov ew in li heywanan sitem dikin, mafên înkar dikin. Mirov ew in heywanan serjê dikin, goştê wan dixwin. Mirov ew in ji bo goşt xwarina wan, bi navê qurbana ji Xwedê re heywanan serjê dikin. Mirov ew in heywanan didin xebatê keda wan dixwin. Mirov ew in mirovên hêzdar yên bê hêz dixebitînin û giranîya mafên wan ji xwe re hiltînin. Mirov ew in bê hêzan dihincirînin û diperçiqinîn. Mirov ew in bê hêzan dihincirînin û wan diperçiqînin.  Mirov ew in hev dixapînin û hev dikûjin. Mirov ew in ji hev çavnebarî û kumreşî dikin. Bi van gotinan, kirêtî, bedî û qirêjîya mirovan nayê hejmartin.

Serdarê min ê hêja, derbarê min de mirov çi ne, ji we re bibêjim. Baş bala xwe bidinê û guhdar bin.

Mirov, destên xwe davêjin guhên min digirin, dibin darekê bi navê nîr datînin ser milê min û bi min tenê jî qayil nabin, gayekî din jî tînin, serê nîr yê din datînin ser

milê wî, darekî duçîq, têxin navbera min û hevalê min. Ji vî darî re hinek ‘’hevcar’’ û hinek ‘’cot’’ dibêjin. Çiqê wî darî yê drêj li nevhende nîr ve girê didin. Çîqê kurt jî hesinekî bi navê gîsin li serî dixin. Wî çîqî digel hêsinê di serî de du bihost dixin li bin axê û bi daran û misasan me dajon. Bi vê xebatê, zevîya beyar dibe şov û ji wî karî re ji şovkirin dibêjin. Ev şovkirina han heya westana mirovan didomîne. Dema ew westan, ji kerama xwe, me berdidin û em ji xwe re qasekî diçêrin. Va ye ev çêrana min heya îro yek ji wan îkramên mirovan e. Heger rehmek bikeve dilê mirovan, bi vî awayî me berdidin. Ev berdan û çêran ji bo havînê ye. Heçî zivistanan me têxin zindanek teng, tarî, qirêj û bêhingirtî. Tenê ji bo ku em nemirin hindek kaya hişk bi me didin xwarin û carna jî ji bo mihandina wê kaya me xwarî, heya ser avê me dibin û bi me av didin vexwarin.

Serdarê min, heger dabaşa bedî, xirabî, nebaş, bê mafî, bê dadî û bê wijdanîya mirovan bikim, bi salan dawî lê nayê.

Şêr:

-Baş e jixwe tu baş î û maşîyên mirovan tune ne? An jî di nav wan de yên baş hêç dernakevin?

Ga:

-Serdarê min, li nik mirovan pîvana qencî û başîyê, wec girtin û kêrhatin wan e. Ji bil vê yekê, hêç nikarin bihizirin. Mirov, welê dizanin ku Xwedê, gerdûn ji bo wan afirandîye û ji bil wan mafê kesî êdî gerdûnê de nîne. Hemîn e di nav mirovan de yên baş û qencîkar hene. Lê ew jî mîna me di dest wanên sitemkar û zordaran de belengaz, reben û sitembar in. Gava ew mirovên baş, li ser me vê sitemkarîyê dibînin, dilê wan bi me dişewitin û ji kovana dilê xwe axîn dikêşin û carna jî ji hemî sitembaran re digirîn. Lê tu ji destên wan nayên. Hêvîdar im ku hukîmîyeta dinê bikeve destên wan.

Qe nebe candarên li ê me tên ew bikevine hêsanîyê û ji xwe re kêf kin.

Şêr, baş guhdarî gê kir û ew peyvên ji devê wî derdiketin baş di serê xwe de bi cih dikirin. Lê nihêrî ku her yek ji wan peyv û dabaşan, şîretekê dike û rîyan nîşanî

candaran dide. Şêr dixwest ku ga şalyarê wî bûya, da her dem ji van peyvên têgihdar wec bidîta. Piştî vê hizirînê şêr ji gayî re bextîyarîya xwe pêşkêş kir, rabû xatir xwest û çû ser oxira xwe.

V

Şêr û Hesp

Şêr dîsa gavên şidayî û şêrane davêt, di ser zinar û kendalan re diçû. Lê demek jî be, ew zanîn û camêrîya gayî ji bîr nedikir. Her gav ji xwe re hevaltîya gayî dixwest û di keser, kovana peyivîna wî de bû. Ew sitemkarîya li gayî hatibû kirin jî qet ji bîr nedikir. Şêr, ji bo bigihandina daxwaz û mebesta xwe ber zehmet û westana xwe nediket. Birçî, bê xew, bê av û bê hesîne dima. Lê nedixwest van karên piçûk bîra xwe bîne û xwe bi van re biewiqîne. Ji ber vê yekê şev û roj rawestan jê re tune bû. Her û her diçû. Carna vediwesta guhdarî dengan dikir. Li pê dengên nenas diçû. Heya xwedîyê wan dengan dinasîya, li wan dinihêrîya ku ne mirov in dev ji wan berdida û rîya xwe didomand. Çawan ji serî heya li vir hatî dabaşkirin, alaz û mebesta şêr ew bû, demekê zûtir rastî mirovan bê, bi wan re hesabê xwe bibîne, wan ji dil binase û di derbarê wan de çi peywist be bike. Piştî peyivîna bi ker, hêstir û gayî re hinek xwişîş jê re çêbûn. Ji bo duristkirina van xwişîşan divîya bû hinek alîker hebûna. Gelo mirov misoger ew qas bi hêz in? Ango zêde çavên wan heywanan ji xwe tirsandine û ew welê dibînin. Lewra yek ji yekî bitirse, wî pir bi hêz dibîne. Dizane hêza wî zêde ye. Lê nizane ka çiqas e. Şêr jî ji alîyekî ve rêya xwe didomand û ji alî din ve jî li dervaz kirina şaşîya xwe dixebitîya. Lewra dema ji pişîkî veqataye heya niha,  hê tu candarî kêfa wî xweş nekirîye. Agahdarîya şêr heya niha sitandî, hêç sitûn nedane ber dilê wî. Şêr him van bûyer û agahdarîyan têne bîra xwe, hêza xwe hemî digihîne hev dihizire û him jî bi gumanek giran dilezîne. Di nav van şaşî û hizirînan de şêr xwe gîhande quntara çîyayekî bilind ê bê dar. Gelek westayî bû canê wî qasek hesîne dixwest. Lê bi roj li vî çîyayê rûtal, rawestan bê ewle bû. Diviya bû demek zû xwe bigihîne rêlekê. Lewra xewa wî jî dihat. Bi wê westanê şêr dîsa lezand, heya xwe gihande rêlekê talan. Li binê darekê rûnişt. Dem bi ser re neborî ji xwe ve çû, qasek raket. Nişkêve bi qêrîn û hêwirzek giran bi xwe hesîya, rabû. Ji ber zêdeyîya qêrîn û zûrînê, pêşî nezanî kaç i deng in û xwe yê wan dengan kî ne û çi ne? Paşê baş guhdarî wan dengan û ew deng nasîn. Ev deng, dengên

torîyan bû. Gava şêr baş nasî, qêrînek şêrane ji devê xwe derxist. Piştî qêrîna şêr, ew deng hemî bi hev re bêhis bûn. Her wekî di wê rêlê de candarak jî nema û cardin şêr nivist.

Vê carê jî şêr di xewna xwe de mirov didîtin. Dîsa mirov gir û giran bûn. Dîsa sê çar lib li ser pişta şêr rûdiniştin û carna diajotin. Carna jî li ser pişta wî bi hev re xeber didan. Çare di destê şêr de nedima, gazî torîyan dikir ji wan re: Heey! Werin alîyê min bikin. Van mirovên sextekarên stemkar ji ser işta min rakin'' digot. Gava torî dihatin, pêşî kêfxweşî didane mirovan û diçûn ew jî li işta şêr siwar dibûn. Şêr nedikarî xwe rizgar bike û ne jî dikarîya birevîya. Hate tintêlek welê êdî nedikarîya bêhin  bide û bistîne. Di vê tintêlê da xwe guvaşt, hişyar bû da xwe rabû ser pêyan. Çawan rabû li hawîrê xwe nihêrî, lê hêç candar nedît. Ne torî hebûn ne jî mirov. Hêç dengên candaran jî nedihat. Te digot k udi wê rêlê da hêç candar nînin. Hemîne ku şêr zanî ew candarên dîtî nerast bûn. Dîsa xewn dîtibû. Ji tirsa dîtina mirovan şêr newêrîya nivista. Qasekî li ser pîyan gerîya.

Wê şeva tarî û di wê rêla talan de qet ranewesta da rê û çû. Çûna xwe heya tav germ bû domand. Heya wê demê xwe gihandibû nav çîyayekî bilind. Li rexê rêya karwanan şikeftek teniha hebû û şêr çû tê de rûnişt. Hinga pênc şeş mirov hatin û di rîya xwe re dervaz bûn û çûn. Pêşî di dilê şêr de hebû, ji wan rêwîyan pirsa mirovan bike. lê şerm kir. Lewra di hişê şêr de mirov ew qas hûr û piçûk nebûn. Ewên wan heywanên mezin, ramê bin fermana xwe kirî, divîya bû ku ji wan pir girtir û bihêztir bûya. Bi kurtasî şêr ji bil pir giraya mirovan zêde nikarîya tu bi hişê xwe ve danîya. Şêr, cardin hizirî û bi çewtîya xwe hesîya.

Lewra divîya bû hûr û mûr negotiba. Çi candar rastî wî bihata pirsa mirovan jê bikira. Nexwe divîya bû ki ji wan rêwîyên hûr ên sosret jî pirsa mirovan kiribûya. İştî vê hizirîna han, şêr hat eli ser rê li ê wan ket. Qederek çû gîhişte duriyanek, hemîne şêr nezanî ka ew rêwî bi kîjan rmyê de çûne. Bivê nevê dev ji rêçandina rêwîyan berda û dîsa hat, di şikevta xwe de rûnişt.

Heçî rûniştinê şêr rûnişt, lê lehzek ji derd û kulên gayî ji bîr nedikir. Nemaze ew dabaşa serpêhatî û rencîde kirina gayan, ne yên ji bîr kirinê bûn. Şerjêkirina gayê hevalê gayî, giriwan û goşt hûrkirina wî, bi orînan şînkirina gayî ji hevalê xwe re,

nemaze ew deng û bi du gayan heya êvarê cot kirin, şêr ev hemî anîn bîra xwe û di ber çavên xwe re dervaz kir. Gava şêr ev menzere di ber çavên xwe re dervaz dikirin, di xiyala xwe de ga didît ku serê xwe hiştîye ervazî û diore. Şêr baş guhdarî dengê wê orînê dikir ku ga resmen nifir li mirovan dike û ya perwerdekarê mezin! ‘’Ez bende me, ez bê hêz im, ez bi mirovan nikarim, tu ji bal xwe teşqelekê bi ser wan de bînî û xezeba xwe li wan bikî.’’ Dibêje. Şêr bi dengek xiyaliyên din bi ser xwe ve hat û da xwe rabû ser pîyan. Li wan deran baş nihêrî hêç candar nînbûn. Lê şêr ew deng, orîn û dîtina gayî dizanîya ku misoger e. Şêr êdî ji rûniştin û hizirîna xwe jî tu fehm nedikir. Şêr rabû qederekê li hawirê xwe mêzand û; ‘2Rêwî divê di rîya xwe de’’, got, dîsa bir ê ket û çû. Dîsa gelek çîya, banî, beroj, nizar, terezin, pesar û gelî li ê xwe hiştin û di gelîyekî re derket deştek pir mezin. Di deştê de, çandin, baxçe, dehl, rez, gîya û cûhên avê dixwiyan. Li alî din jî din av newalekê de bendek hebû. Gava li deştê bihata nêrîn, ev deşt bi van cûhan û bi wê bendê tê avdan, dihate zanîn. Nemaze di her kenar û cîyên deştê da kedeke giran dixwiyê. Şêr baş sehîya deştê kir û zanî ku ev deşt bi keda mirovan weza û heywanan ve hatîye holê û ew mirovên sitemkar ji giranîya vê keda delal a hêja bê sedem dixwin. Jixwe şêr jî ji bo vê yekê li vir e. Bêhina şêr teng bû û li vî alî û wî alî çavên xwe gerand û tu candar nedît. Şêr tam xwe amadeyî çûnê kir, di nepenekê da hîrehîra hespekê hat û şêr vewesta, qederek guhdarî kir, lê ev deng hêç nebihîstibû. Her wekî di vî dengî de beşek jî mîna dengê hêstir tê bihîstin, lê ev ne ew e. Şêr hêdî hêdî bi alî wî deng û nepenê ve çû. Dema ji dûr ve lê nêrî va ye candarek pir gir, zexm û qelew li wir rawesta ye û wî dengî derdixe. Şêr bi nêhanî qasek jî nêzîk bû, gava baş bala xwe dayê ku her du destên wî candarî qeyd kirî, destek wî bi tewlek zincir ve girêdayî û serê tewlê jî bi sikehek hesin ve di erdê de kutayî dît. Li vê menzerê gelek mêzand. Pêşî tu jê nezanî û xwe paş ve kêşa. Li bin darekê rûnişt, ev menzera hespî, di xiyala xwe de dîtina gayî û nifirên wî li ber çavên xwe re dervaz kir, her wekî ku zanî û biryar da: ‘’ Belê mirov ew e û him ji serdarê mirovan e. Xwedê fîzar û nifirên gayî bihîst û pejirand. Ji bo ku candarên sitembar ji şerên wî rizgar bike xezeb lê kir. Pêşî qyd xiste destan û bi zencîrê tewiland. Dibe ku perwirandin an jî ceza kirina wî ya paşî hiştibe hêvîya min va ye ez hatim’’ got û rabû bi alî hespî ve çû.

Şêr çû pişt tûmekê de rûniştû li ber hespî xwe qelizand. Nişkêve hêrîn ji hesp çû û şêr veciniqî. Di hêrîn û veciniqîna wan, her du bu hev hesan û deng li hev kirin.

Hesp:

Axayê min hûn çi j imin dixwazin?

Şêr:

-Ezê te bixwim.

Hesp:

-Sedem çi?

Şêr:

-Sedem sitembarî

Hesp:

-Qey hûn bervedarên sitemkaran in?

Şêr:

-Na, ew gotina te çewt e. Ez arîkarê sitembaran û bê kesan im.

Hesp:

-Va ye yek ji wan sitembar û bê kesan ez im

-Şêr:

-Ma qey tu ne mirov î? Nexwe Xwedê çira tu bi qeyd û zencîrê girêdayî?

Ez vê yekê baş dizanim. Tu mirov î, him jî ji wan mirovên sitemkar î. Te li heywanan û mirovên qencên sitembar zehf sitemkarî û zordarî kirîye û dikî jî.

Ew sitema te lig ayan kirî, gihîşte hedê dawî. Tu rabe pêş çavên gayekî hevalê wî şerjê ke, goştê wî hûr ke û bibe, bixwe, hê jî bila tu neyê serê te. Ez ji te re bêjim. Ji duh heya niha, hevalê wî gayê şerjê kirîyê pir rencîde bûyî l inik min û pêş çavên min l ite nifira wî pejirand, destên te bi qeyd û zencîrê girê da. Ez jî Xezeb im j ite re

şandim. Deka were înca xwe ji destên min û ji van pencên leheng bifilitîne, ka tu çawa mêrek î. Ne te tenê, ezê koka heval û hogirên te jî hemî biqelînim.

Hesp:

-Na axayê min, ez ne mirov im. Ew gunehên hûn dabaş jê dikin min nekirine û ez nikarim bikim jî. Lê mirov dikarin wan gunehan bikin. Xwedê ez bi qeyd û zencîrê girê nedame. Mirovan ez bi vî awayî girêdame. Ev jî, ne ji bo gunehek e. Hema kêfa mirovan hatîyê ez girêdame. Sibê jî dê bi awayekî din li min bikin. Ez heywan im. Lewra di van kirinan de nikarim hêç dengê xwe derxim.

Şêr:

-Te got ez ne mirov im?

Hesp:

-Belê belê, ez ne mirov im. Ez hesp im û mêrê mehînê me.

Şêr:

-Nebe tu zirbavê hêstirê bî?

Hesp:

-Belê ez ew im, saya mirovan ew rûreşî her li rûyê min e. Şêr ji xwe re; ‘’ Ev çi bû qewimî? Min dizanîya mirov di dest de ye. Tenê dê ifade wî bigirim. Dema derket, ew jî heywanekî bê guneh bû û hindik jî mabû, min gunehê wî bêxista stû xwe. Di vê mijara han de ez gelek westam û him jî rê û ronahî li ber xwe winda kir. Ca hinek pirsan ji hêsp bikim ka derî l imin venabin’’ , got û gazî kir:

-Hespê hêja! Berî her karî j ite bexişandina xwe tika dikim û daxwaza we jî, j imin çi heye pêk bînim. Ya duwem, derbarê mirpvan de çi dizanî j imin re bibêjî bextîyar dibim.

Hesp:

-Çawan axayê min jî dît. Ez girtîyê mirovan im. Ez di qeyda mirovan de me. Ez di zincir û tewla mirovan de me. Ez di çerxa xapandina mirovan de me. Axayê min çawa we ez dîtim, li wir tewilandî bûm, qeydkirî bûm û diçêrim. Qaşo ev qencîyek bû mirovan li min kiribû. Dema kêfa wan bi awayekkî din bê, min li cîyekî hişkê bê gîya û çêre girê didin. Anî hêç mafên min li ser wan nîne. Lê her mafê wan li ser min heye. Kêfa min ji çira bê ez nikarim bikim. Doza xapandinê ji we re bêjim. Mirov ji bo kêra xwe, min kêm xwê dihêlin. Gava kêfa wan tê min berdidin, an jî ez bi xwe difilitim û dema girtina min bixwazin, min bi xwê ya derewîn dixapînin û digirin.

Şêr:

-Mirov j ite çawa wec dibînin û tu çi ji wan re dikî?

Hesp:

-Axayê min hûn van pergalan dibînin? Belê. Gava kêfa mirovan bê çûna cîyek, dê vî zînî li ser pişta min şidayî girê din, vê gemê jî bêxin devê min, li ser zîn siwar bin û gemê bixwin destê xwe, bi qamçiyan min bajon, heya bigihîjine mebesta xwe. Carna jî min dibin pêşbazîyê. Heger kar kim, xwedîyê min pesnê xwe dide û perû distîne. Heger kar ne kim, kutan dixwim.

Şêr:

-Yek jî dixwazim mesela zirbaviya hêstira hîn bim.

Hesp:

-Ev mesele meseleya namûsê ye naxwazim dabaş kim.

-Şêr: Bê vê dabaşê rapora di derbarê mirovan de neqede. Divê tu vê jî bêjî da em jî mirovan baş binasin.

Hesp:

-Nexwe ezê wê jî, ji zatê we re bêjim. Rûyê min li ber we reş e, lê peywist e ez nikarim nebêjim. Qerwaşa we be mehîn bermalîya min e, ronîya çavên min e,

jinika min e û em gelek ji hev hez dikin. Birek canîyên me jî hene. Bê xwestina mehînê jî, bi destên zorê dibin didin ber kerî û hêstir jê çêdibin. Bi vî awayî em li nav alemê kepaze û rezîl dibin. Nikarim serê xwe di nav heval û hogiran de rakim. Qasî ez pê dizanim, di cîhanê de tu kes di hewalê min de tune. Ev yeka mirov di derbarênamûsê de b imin re dikin, dijmin bi dijmin re nake. Axayê min ez ji gewdê xwe jî şerm dikim. Lewra gava lê dinêrin dibêjin ku mitliq ev gewde bê huner nabe.

Axayê min, gava rdiwestim nişkeve hîrehîr j imin tê ji wî derdî ye. Gava di rojên gerim de rawestayî serê min di hêje ji wî derdê bê derman e. gava mehînê dibinîm, him hîrehir ji min tê, him jî diricifim, ew jî, ji vî derdê bê çare ye. Ji kirina mirovan ya hatî serê min bila neyê serê gurê çîyan. Ew candarên heya niha min dîtî, hemî jî serfiraz in. Ez tenê rezîlê bêfiraz im.

Axayê min, va ye çendî çend sal in ez di van keser, kovan kul û derdên xwe de dişewitim kes hay ji min nîne û axayên mîna we jî heya niha xweyîtî l imin nekirine. Ji van êş û elemên min re dermanek nedîtine. Agirên daran û candaran hemî derve nin, dixwiyên, yê min di hundir de ye naxwiyê. Di hezra min de, her kes li gewdê min dinihêre, welê gir, qelew, hilû û zinde dibînin û; ‘’mitliq xweyê vî gewdî serfiraz û bêxem e’’ , dibêjin. Axayê hêja! Ez jî dibejim xwezîka!

Şêr ji serî heya binî guhdarî hespî kir. ji van sitemkarîyan gelek bêhna wî teng bû. Serê xwe bi alî esmanan ve bilind kir, bi şêrane qêrî û: ‘’Ey bêçare hesp! Ji îro paş, ez hevalê te û derdê te me. Derdê te derdê min e, namûsa te namûsa min e, serfirazîya te serfirazîya min e. dibe ku heya nihai kes bi serpêhatîya te agahdar nabibe jî, çawa ez bi vê bûyerê agahdar nabûbûm. Divê tu hinekî jî bêhna xwe fireh bikî’’ got û bi çavekî şêrîn li nav çavên hespî nihêrî.

Hesp:

Malava, pêş çavên hemî candarên din, mirovan mehîn bi destê zorê destkêş dikirin, dibirin radestê kerî dikirin û ez di hewalê xwe de dişewitîm, deng ji kesekî nedihat. Belê hûn dûr bûn, agahdar nedibûn. Ez bi van karan baş dizanim.

Şêr bi awayî ‘’belê’’ serê xwe dihejand. Piştî van gotinan, hesp ji ciyê xwe rabû û bi alî şêr ve, bi evîndarî herikî. Şêr jî, ji hesp kêm nema û di nîvhendê de

gihîştine hev. Pêşî, singa xwe dane hev. Paşê bi evîn û hogirane hev ramûsan û xatir û xwestin.

VI

Şêr û Deve

Belê şêr ji hesp veqetîya û çû. Lê ew hêza berê tê de ne mabû. Gava rastî van heywanan hatibû û vir ve, roj bi roj kêm dikir û ji hêz de diket. Ev serpêhatîya hesp, yek car şêr şepirse kiribû. Şêr qederekê çû, germa rojê dayê gelek westa. Ji bo hesîne kirinê hilkişa çû ser çavkanîkê rûnişt. Destên xwe da ber rûyê xwe kûr û kûr ponijî. Vê carê têkilîya hesp û mirovan, pêş çavên xwe re dervaz dikir. Gelşa li navber mehîn, ker û hesp, baş dahûrand. Di vir de jî bê mafî, bê dadî, zordarî û sitemkarîya mirovan, bi awayekî vekirî li holê bû û dît. Di vî karî sosret de pir xerîbî hebû. Şêr di ponijîya xwe de: '' Ev çi kar e tê kirin. Hesp neqayil, mehîn neqayil, ker neqayil û di hezra min de manker jî neqayil e, mirov bi çi hêzê vî karî dide kirin an jî dike, nizanim?'', got û dîsa ponijî.

Ji tirsa dîtina xewnan, şêr, newêriya raketa û binivîsta. Qasek li wir rûnişt û tam hesine kir, rabû, xwe veweşand, kûrûşkên xwe rast kir û du sê car serhev bawişkî, paşê bizivî li alî çîyayê bilind hêdî hêdî meşa. Evraz pir tîk bû, şêr jî gelek westayî bû. Him bedena wî him jî raman û hişê wî têra ev qas xebatê nedikir û ketibû navê, êdî nedikarîya ji nav derketa. Şêr ji alîkî hildikişa jor, ji alîkî jî, ji bo tifaqên nû dihizirîya. Lewra li pêşî wî çi hebûn, karên çawa dê bêne rastî wî nedizanîya. Lê amadî ji bo tifaqên nû peywist bû. Xwezayî ew karên heya niha kirî û ew bûyerên heya niha dîtî, divîyabû bihejanda. Ji bo hejandina vê yekê jî rûniştin, hesîne kirin û ponijîn peywist bû. Şêr derkete şintila çîyayê bilind, ew der cîyekî welê bû ku gelek cih pêş ve dixwiyan û ew cih ji bo şêr kêrhatî bû, lewra him çareya çavenêrî û him jî çareya ponijînê hebû. Tenê kêmasîyek wê erdê li ber çavan dixwiya. Ew jî ji deştan û rîyan dûrbûna wê bû.

Ji ber ku ciyekî xweşkês û hakim bû, ew kêmasî jî di xwe de winda dikir. Şêr li şintilê qasek gera, li wan deran nihêrî, ji bêhina kulîlk, gul û gîyayî hilmek xweş kêşa hundire xwe şêr hêsan, dilxweş û bextiyar bû Dû re li ber wê hewaya hênik, li

ser kevirekî ferşîn û li ser dest û pîyên xwe veket. Serê xwe danî li ser her du destên xwe di derbarê bûyerên borî de hûr û kûr ponijî. Di veê ponijîna xwe de, ji hevdîtina pişîkî heya serpêhatîya hespî, di êav de dervaz kir.

Encama van bûyeran hemî ev bûn :

1.Mirov pir bi hêz e.

2.Raza bihêzbûna mirovan heya îro nehatîye pişkavtin.

3.Mirov sitemkar e.

4.Mirov zordar e.

5.Ew heywanên heya niha dîtî li ber mirovan bê çek û hêz in.

6.Çi candarên heya niha dîtî hemî nasiîn, tenê ew rêwîyên hûr û mûr nenasîn û bi wan re jî nepeyivî.

Şêr ji bo vê yekê gelek êşa û mafe jî welê bû. Lewra heger bi wan re bipeyivîya û ew binasîna, dê karê wî hêsantir û girantir bûya. Dibe ku mirov ew bi xwe bûna. Na, na mirov ne ew bûn. Lewra ew mirovên ku şêr di xew de didîtin pir gir bûn. Ewên di hişê şêr dejî cih girtibûn û ev heywanên gir jî ramê ber fermana xwe kirî jî, pir gir û pir jî sik bûn.

Piştî van pponijin û hêjandinan şêr gelek çelengtir û siviktir xwe zanî. Şêr rabû ppêşî hawirê çîyê sehî kir. Newal û kendalên wî, rê û pêyên wî, zinar û pesarên wî û dar berên wî hemî nasîn û zanîn, paşê din av newalek tenha de, hêdî hêdî daket jêr. Hê di nîveka çîyê de bû k udi binîya çîyê re karwanek dewan borî. Şêr,ji serî heya binî karwan dahûrand. Tenê li pêşîya deva ker nasî. Yên di jî du beş bûn. Yekem, gir û bedena wan xwehrovîço, devên wan çor, lingên wan pir dirêj û gorê kerî lingên xwe davêjin û diçin. Duwem jî mîna wan rêwîyan li ser du pêyan dimeşin, bejna wan têk, rast, kin. Lê bizava wan zêde. Şêr ji bona bi nêzîkayî dîtin û nasîna wan lezand.

Di vê navê re dengê şêrekî nexweş hate guhe şêrê me û li pê wî dengî ket û çû. Şêr xwe gehande cem deviyekê, din av devî de şêrek birîndar dît û çû ber serî rûnişt. Pirsa hal û hewalê libilib kir. çawa birîndar bûye, çawa xwe gihandîye vir, ev bûyera bed kengî qewimîye tev jê pirsîn. Wî jî bersiv didan û hate li ser dabaşa birîndarîyê. Tenê karî bibêje ku ‘’mirovan ez birîndar kirim’’ got û mir. Şêrê me ji vî şêrê jî wecek baş nedît. Tenê şaşîya wê zêde kir û ev bûyera han di serê xwe de hêjand; ‘’Nexwe mirov pir dijwar in, çawa bi pişîk, ker hêstir, ga, hespî karine, wilo b ime şêran jî dikarin. Dibe ku gotina pişîkî rast jî be.pişîk ji berî şêr be, mirovan pişîk girtibin bi hincirandin û cercere welê hûrik kiribin. Na, na ev hemî çewt in, mirov ew qas bi hêz e. ev şêr jixwe nexweş bû. Ez vî şêrî dinasim. Malbata wî hemî welê nexweşok bûn’’, got û bi vî awayî qederek ji dilminî de li ber dilê xwe û rabû dîsa bir ê ket û çû. Şêr heya xwe gihande rê hêç ranewesta. Li ser rê jî hêç candar tune bûn. Ew candarên ji dûr ve dîtibûn, zû ve derbas bûbûn û çûbûn. Heger li bal şêrê birîndar ne ewiqî bûya dê xwe bigihanda wan û dê bizanîya ka ew çi celeb candar û heyîn in. lê ew pêla han jî bi vî awayî bi ser şêr re derbas bû.

Şêr qederekê li wan deran çavenêrî kir û li pê mebesta xwe gera, hêç rastî rêç û şopekê nehat. Dîsa bêhan wî teng bû û çû binê darekê rûnişt. Piştî hesîne kirinê, çavên xwe li wabn cîyên dûr gerand, reşekî sosret li ber çavan ket. Rabû alaza wî rêket çû. Gava nêzîkayî lê kir, belê yek ji wan candarên li pê kerê dîtibûn ew bû, bi hostatî xwe tam nêzîk kir û hemî sehya hemî rexên wî kir. belê ew candar ne ji wanên din in. ew ji hemîyan girtir e. ji hemîyan siktir e. Hêç li erdê nanêre, iştî çêranê hemî li esmanan dinêre, her wekî ku gunehekî mezin kiribe, ji Xweda bexişandina xwe dixwaze.

Şêr li bejina wî ya bilind, li gewda wî ya gir û qerase, li stûyê wî yê xwar, li qûzaya pişta wî, li çoraya devê wî û i wê diruva bê sur, baş nihêrî û di ser de jî ponijî; ‘’Belê, mirov ev e’’, got. Lewra ji ber gunehkarîya wî, Xweda dirûva welê sik û bê sur kiriye û berdaye dinê, ji bo ku bibe lêpok û êdî kes gunehan neke. Belê bê guman wisan e, û ji bo girtin xwarina wî xwe li ber qelizand.

Şêr tam xwe amade kir û nişkêve xwe avête ser deveyê lê ne gihişte ser pişta wî û devê wî jî, tu derên devê negirt. Di bizava dudan de, devê gazî kir û gotê tu çi ji min rebenê dixwazî. Bi vî dengî, şêr xwe paşve kişand. Û bi dengekî bilind:

-Ezê te bixwim û dinyayê ji şerê te bifilitînim.

Deve:

-Ji bo çi û min ji din çi kirîye? Ji giranîya min zêde barê min li ser dinê tune.

Şêr:

-Ew sîtema te li heywnan kirîye qey ne bes e

Deve:

-Min sitem li kê kirîye? Heger ne hêcet e, dê hûn bibêjin.

Şêr:

-Berî herkesî li pişîkê, dû re bi rêzê ve li kerî, li hêstirê lig ê û li hespî. Qasî kum in dîtine ev mitliq yên nedîtî jî dê hebin.

Deve:

-Ev hûn çi dibêjin serkarê min? Ez ji van peyvan tu seh nakim û ez heywanekî bê çare me. Ew heywanên hûn dabaşa wan dikin beşek ji wan hevalkarên min in. Bê rêberîya kerê jixwe nikarim li rê biçim. Heger şirove kirin durist be, ez gewde m eker çavên min in. ezê çawa sitem li çavên xwe bikim?

Kurikê kerî hêstir jî hevalbarê min e û ji ber jêhatîbûna wî, bi cudahî kêfa min jê re tê û ez gelek jê hez dikim. Hesp û ga jî cînarê min in û çendêçend sal in ku em bi hev re cînarîyek xweşik derbas dikin û heya îro hêç dilê me ji hev nemaye. Di nav van de tenê pişîk bîyanî ye, ez wî nanasim. Hûn çawa min bi sitemkariya wan dostan gunehkar dikin. Yek jî ez heywan im. Ji heywanan jî heywanê gîyaxwer im. Jixwe tu car sitema heywanên giyaxwer nagihije tu candaran.

Şêr:

-Te, ez heywan im got, me ne welê bû?

Deve:

-Belê serdarê min, ez heywan im. Ji heywanan jî heywanekî reben, xizan, belengaz û sitembar im.

-Şêr:

-Ku wisan e, de ka were j imin re bibêje mirov kî ne?

Deve:

-Ha, ha! Serdarê min, hûn pirsa çi j imin dikin. Belê ez heywan im. Ji heywanan jî wê de me. Di bin fermana mirovan de me. Di bin bar û siwarîya mirovan de me. Dibin hinciranin û gindirandina mirova de me. Bê destûra mirovan yek lehze nikarim li cîyek rawestim.

Serkarê min fermo li tenişta min rûnin, ji we re dabaşa mirovan bikim. Mirov, candar in lê ne ji me ne. Devên wan hene lê ne ji devên me ne. Destên wan hene lê neji destên me ne. Pîyên wan hene lê ne ji yên me ne.  Zimaên waan hene lê ne ji zimanên me ne. Bi kurtasî tu yê me ji hev tune. Dibe ku gîyanê me jî ne ji hev bin.

Mirov ew in kum in bar dikin. Ew ji gorê hêza min, hê girantir li min dikin û min dajon. Hêç pirsa westana min nakin. Lê gava ew diwestin, tên li ser barê min siwar dibin, dîsa min dajon. Carna jî sandoqên mezin datînin ser pişta min û tê de radikevin. Gava kêfa wan bêtê ji kerema xwe peya dibin. Siwarbûn û peyabûn, barkirin û bardanînawan jî, be serê xwe mehrecaneke û wilo dikin: ji bo ku zehmetê nebînin, min vedizelînin erdê, bar l imin dikin û baş dişidînin, paşê min radikin. Bardanîn, siwarbûn û peyabûn jî welê ye. ev serbesthiştan min ya hûn dibînin keremek e li min kirine û dê heyfa wê j imin bistînin.

Serdarê min bi vî tenê jî ranawestin. Mirov ji bo kêfa xwe min devekê heval berdidin hev û em şer dikin ew jî b ime dikenin û kêxweş dibin. Baş bala xwe bidinê serkarê min, ez û deva heval çiqas hev biêşînin, ew hew qas şah dibin û bextîyar dibin.

Şêr:

-Karên din jî bi te didin kirin?

Deve:

-Kar kirin bi min ne zor e. Yê herî zor ew e ku, pûrta min ji min dikin. Min di hêlin tazî. Di germê de bedena min dişewite. De sermê de jî pir dicemidim. Bi kurtasî mirov min dihêlin tazî û pûrta min dibin ji xwe re dikin kinc. Ez li erdê sar radikevim, ew li ser pûrta min radikevinî av li ser barê min e, ez dikêşim, ew vedixwin. Xwerek dîsa li ser pişta min e, va ye bê dadî ev e…

Şêr ji dil guhdarî devê dikir. Devê dabaşa xwe qedand. Bi çavekî têrguman li nav çavên şêr nihêrî, daxwaza wî ji şêr; serwextbûna derd û kulên wî bû. Şêr jî bi van çavên têgihanê li êavên devê nihêrî. Her du jî qederek pêş hevdu ker û lal rawestan. Ew rawestan ne rawestanek dijminî bû. Vajîyê wî, rawestanek dostî yê bê kêmasî bû. Şêr çawa di bin bandora serpêhatîyên heywanên din de mabû, welê dibin bandora serpêhatîya devî de jî ma. Jixwe ev serpêhatî hemî jî, bi bandor inç misoger ew karên mirov tînin serê mirovan û ew karê mirov tînin serê heywanan, mirov gava van yekan dihizire, ji candarîya xwe şerm dike. Divê dinyayek welê bête sazandin ku êdî mirov ji mirovatîya xwe şerm neke. Ppiştî guhdarîkirina ewqas serpêhatî û dîtina van bi qasî bûyeran, divê êedî şêr bigihîje biryarek nû ya ji dil. Ji bo pêkanîna vê biryarê şêr rabû bi alî devê ve çû. Bi qudûmek şikestî, bi çavek nîvtirsîyayî û din av bêhêvîya giran de destê devê girt û bi çavên evîndarî xatir jê xwest. Piştî xatiran du sê car jî li pê xwe nihêrî û çû.

VII

Şêr û Pişîk

Vê carê ji şêr re cîyekî tenha dixwest ku bikare bi hêsanî baş biponije. Şêr bi alaza hêwiegeha xwe ya kevin birê ket û çû. Jixwe şêr westîyayî bû, Germa rojê jî dayê, êdî ji mecelê ket. Ji bo qasek hesînekirinê, xwe da ber zinarekî. Qederek veket û di xew re çû. Bi dengê ppişîkê hişyar bû. Gava şêrî pişîk li ber serê xwe dît gelek şa bû û kêfxweşî dayê. Piştî kêfxweşîyê, jê pirsî:

-Tu ji ku ve têyî û çi karê te li van deran heye?

Pişîk:

-Piştî veqetana me heya niha li te digerim.

Şêr:

-Sedem çi?

Pişîk:

-Min zanî tu ketî karekî zor û zehmet. Min got, xwe bigihînim alî. Lewra li pê mirovan ketin ne lkarekî hêsan e. de ka rabe, were li rex min rêne. Ji veqetana min heya niha kaç i hatîye serê te, j imin re libolib bêjî pir şa dibim. Lê melezîne. Baş bêhna xwe bide, hişê xwe baş berhev ke, paşê bi bêhna fireh dest pê ke.

Şêr bi şahî cîyê xwe rabû, toza xwe weşand, kûrûşkê xwe rast kir û çû li nik pişîkî rûnişt. Destê xwe avête stûyê pişîkî bi alî sînga xwe ve kêşa û serê wî ramûsa. Qederekê pirsa tintêl û hewalên hevdu kirin û dû re çi hatibû serê şêr, bê kêmasî hemî ji pişîkî re got. Ker, hêstir, ga, hesp û deve û ew peyivînên di navber wan de borî, çawa ketibû pê rêwîyan û drûvçn rêwîyan libolib ji pişîkî re dabaş kir. Lê bi nedîtina mirovan çi qas bandor bibû jî ji bîr nekir. Pişîkî gelek rind şêr guhdarî kir. Li wan gehînekên bûyeran baş nêrî û serê xwe hilanî ji şêr ra: ‘’ Te çend carek mirov dîtîye?’’ got.

Şêr xeyîdî berê xwe da pişîkî:

-Tu min virker dizanî. Her wekî ku ez j ite re derewan dikim dibînî, got û rabû çû.

Pişîk li pê ket û bi dengekî bilind; ‘’Hey! Şêrê çîyan meçe, vegere, were vê derê, ezê misoger ji we re bêjim’’ got û şêr vegera, hat li ber mîna pêt rawesta.

Pişîkê ji şêr re: ‘’Ew rêwîyên hûn jê dabaş dikin, welê hûromûr, mirov ew in. ne ku hûn li pê wan ketin we ew nedîtin. Wan xwe ji we veşartin û ji bo girtina we, amadiyên xwe dikirin. Heger hûn ji pê wan zû nefetilîbûna, dê wan hûn bigirtana. Ewên hûromûrên din av karwan de, ew jî meriv bûn û ez bi wan re bûm. Gava hûn ji çîyê dadiketin jêr, me hûn didîtin. Mirovan, hem ali ber we dafik vedan. Heger hûn bihatana, bi tu awayî ji dafikka wan rizgar nedibn. Ew rawestana li bal şêrê birîndar,

bû sedema rizgarîya we. Demek dirêj bendemana we rawestan, dîtin ku hûn nehatin, rabûn û çûn. Di vê re devekî xwe jî, li wir ji bîr kirin. gava li ber we dafik hate vedan, ji bo agahdarîkirina we, ez ji karwanê veqetam. Ji vê gavê heya niha ez li we digerim. Gava hûn bi devê re dipeyivîn, min ji dûr ve hûn dîtin. Lê ehay ez gihiştimê, hûn ji wê çûbûn. Wa ye me li vir hev du dît'' got.

Gava şêr ev mijar û dabaşa wan xeterên bê agahê wî li ber wî hatibû amade kirin, bi rasthatinî filitîna ji wan xeteran bihîst, ji nû ve tirsa. Lê nedixwest ku tirsa xwe bi pişîkî bide zanîn. Pişîk qasekî rawesta ûli wan deran qsek nihêrî. Paşî berê xwe da şêr û bi zimanekî dostane jê pirsî.

Pişîk:

Di van ger têkilîyan de, karên bit tirs hêç rastî te nehatiine, ku rastî te hatine çi ne? Heger j imin re bibêjî bextiyar dibim.

Şêr:

-Tenê diraketinê de du caran ez tirsîyam, ew jî j imin re ''xewn e'' gotin, tirsa min daket. Xewnên xwe ji pişîkî re qise kir.

Pişîk:

-Belê, ewên te dîtibn xewn in. Lê hinde xewn hene ku derdikevin. Ew jî an borîne, an ji manendê wan pêşde dedikevin pêşî mirov. Zehfê xewnan jî bê nirx in. Heçî xewn in ji dîtina wan zêdetir ji bîr kirina wan peywist e. Lewra di wan de giranîya xiyalan dixwiyên.

Şêr:

-Pirsek min heye, ezê j ite bikim.

-Pişîk:

-Fermo, guhadrê te me.

Şêr:

-Nizanim vê dabaşê dê j ite re çawa bêjim û çawa bipirsim. Pêşî li ser vê bûyerê hêç ranewesta bûm. Paşê min her wekî ahengek tevayî tê de dît û l imin girîng xwiya. Bê weku roja siftr min tu dîtî, te j imin re ‘’padîşahê min’’ got. Kerê jî welê got. Hêstir ji min ra; ‘’Mîr’’ got. Gayî çawa ez dîtim ‘’Serdar’’ bikaranî. Hesp li ser peyva ‘’Axa’’ rawesta. Heçî deve ji ‘’Serkar’’ wê ve neçû. Va ye îro tu bê rengdêr b imin re dipeyivî. Zanîna sedemên van bûyeran daxwaza min e.

Pişîk:

-Jixwe ez li vê yekê digeram û ditirsam jî. Roja tu j imin veqetayî heya niha, ez ji vê yekê dibizdam. Ji ber serneketina te, te roj bi roj hêza xwe winda dikir. Dem li dijî te dixebitîya. Çiqas roj pêşve diçûn, te xwe westayîtir didît û xebat kêmtir ji bert e diçûn. Ev yek di rûçik û bizavên te de dixwiya û li ser heywanan jî bandor dikir. Ji bo vê yekê, heywanan jî roj bi roj tu kêmtir didîtin û rutba te paş ve danîn. Heger tu vê riyê neşemirînî, rojekê zûtir ji vê navê dernekevî, qasî maye jî dê here. Dê tu bibî lêpokû bikevî binê sifrê. Di serî de jî min j ite re hêma kir bi mirovan re serî derxistin û rêçandina wan pir zor e. hilo guhdarê min be! Ji vir û wê ve êdî qavek jî mavêje. Here li ser textê xwe rûne û padîşahîya xwe bike.

Şêr ji peywendîya pişîkî re spas kir û ji bo ku pişîk, bûbû sedema geşta wî, dîtin û nasîna ev qas heywanên têvel, bextiyarîya xwe jî, nimand û devberdana ji rêçandina mirovan jî, pê da hesandin. Şêr qasekî rawesta, paşî serê xwe hilda û ji pişîkî re: ‘’Demek dirêj eku ji rêla xwe, ji hikimdarîya xwe û ji heval û hogirên xwe dûr ketime. Dixwazim herim bigihîjim wan. Cardin ezê ji bo vê dozê bêm û bikevim li pê mirovan ‘’ got û xatir xwest. Piştî xatiran her du dost ji hevdu veqetan, her yek bi alîkî ve çûn û destên xwe ji hevdu re hejandin.

VII

Şêr û Diz

Êdî şêr ji mirovan ditirsa û dizanîya k udi wan de razek veşartî heye. lê nedizanîya ku ew çir az e û dixwest ku bihewise. Ji bo bername çêkirina vê yekê dihizirîya. Di vê navê re derkete serê girekî û di ber de deşteke piçûk û xweşik. Qasek li deştê nêrî, dît ku ji gelî ve karwanek derket, hate nîvê deştê û barên xwe

danîn. Piştî bardanînê, heywan belavê wan deran bûn û çêrîn. Di nav karwanî de ew candarên hûromûr, yên pişîkî ji wan re ‘’mirov’’ gotibû jî hebûn. Hinekan bardatanîn, hinekan heywan dibirin çêrê, hinekan bar datanîn li ser hevdu û hinek jî bar ji hevdu vediqetandin. Bi kurtasî şêrî dît ku gerandina kar, di dest wan de ye. piştî hizirînê berbijêr xwe berda. Mirovan bi alî wan ve hatina şêr dîtin û hemî revîn. Çûn xwe veşartin. Gava şêr hat û kete nav baran ji wan candarên hûromûr kes li wan deran nedît, bêhna wî teng bû ji xwe westayî jî bû. Kêfa wî hat xwe li ber barekî dirêj kir. Qasekê wilo dirêjkirî ma û bi xew ve çû. Ji ber ku heywanên karwanî hemî ji berê ve nasî bûn, bi alîwan ve neçû.

Şêr wisa li ber bar nivîstî ma ji tirsa wî mirov nedikarîna xwedîtî li barên xwe bikirina. Gotinelk mezinan heye; ‘’ Şev hate kêfa diz hat’’ dibêjin. Va ye ew şeva me jî welê hat.

Derengê şevê mirovekî diz, hat li nav baran gera dît ku kesek li ber baran tune. Diz jî bi kêfa xwe kete navê li eşyayê di teqla xwe de sivik û di hêjana xwe de giran digera. Zehfê baran vekir, li hundurên wan nihêrî û qasek kelopelên giranbiha ji xwe re bijartin. Li yeê hê giranbihatir digera û li ber barekî rastî şêrê nivistî hat. Di welatê wan de postê şêran pir biha bû. Diz jî dizanîya postê şêr li ber wî barî hatîye dirêj kirin ji bo hilanîna post li ser barî de xwe qor kir. Nişkêve ‘’şêr’’ da xwe rabû. Di rabûnê de mêrik kete li ser pişta şêr. De dest mêrikê diz de tu çare nemabûn. Lewra bi çi awayî bibe bila bibe, gava ji ser pişta şêt de ket, bêguman jîna wî jî diqede. Çareya li ser pişt mayîn jê re dixwest, ew jî pê dizane. Nexwe mêrikê diz dê çi bike, ew jî hate bîra wî; her du destên xwe di bin stûyê wî re gihande hev û şidayî girt. Her du lingên xwe jî di bin zikan re gihîştande hevdu û xwe li ser pişta şêr qewîm girt. Wisa saxlem bû ku bi hêsanî jor de nakeve.

Şêr direvîya, şêr dibezîya, şêr radiwesta, şêr dida lotikan, şêr rawestayî xwe hilavêt. Yek jivan jî nedibû. Şêr lingên xwe li bin zikê xwe dida jê venedibû. Destên xwe davête lê nedigirt. Devê xwe davêtê nedigehanyê. Xwe vediweşand jê nediket. Dihizorîya nedizanî çi ye. gava şêr zêde dibezîya gewrîya wî, gva radiwesta gewrî û zik perva dişidand.şêr bi xwiyê siwarê xwe hesa ku beza zêde û rawestanê naxweze. Ew jî êdî bi bezek normal riya xwe domand.

Şêr herdu xewnên xwe anîn bîra xwe, belê ev bûyera îro bû wan gavan dihate xewna wî. Tenê hinek ferq d nav ber vê rastîyê û wan xewnan de hebû. Ew siwarê rastî yek e. Ew sê çarek bûn. Ev sivik e. Ew giran bûn. Şêr nizane ev çi ye, lê dizanîya ku ew mirov bûn. Şêr dibin wan de nikarîbû rabûya, lê vî xweş dibezîne. Wan li ser pişta şêr xeber didan, lê ev tu nebêje. Şêr, bi xwe ji xwe re: Dibe ev jî xewn be, ji pêpara xwe ne bawer im. Dibe ku mirov be li ser ppişta min û min dajo. Na, na! Ne mirov e ha! Kî dizane, dibe jî çawa din av wî çamê mezin re nekarîm derbas bim û bi peywistî siwarê kerê bûm, heya ji avê borîm. Belkî ev jî welê be. Lewra ji bil siwarîya wî tu xirabî l imin nake. Heger bixwaze dikare min bixeniqîne. Lewra bi hêsanî dikare gewrîya min bişidîne û heke hinek zêde bişidîne , êdî nefes amin dernayê û ezê bimirim. Na, na, diltêya wî nexirab e. Tenê karekî wî heye û divê bigihîjê, di vê derêre jî divê siwarî derbas be hew'' dibêje. Bi van jî hewya xwe tîne. Jixwe tu ji destan nayê û karê bike jî tune. Mêrikê diz li ser pişta şêr, hizirîna dawîya xwe dike. Heger diz li ser pişta şêr bikeve dê çi bête serî. Dibe bikeve jî. Lewma dest û lingên wî dê heya kengî li ber xwe bidin ûxwe ragirin. Mitliq ew dest û ling dê heya gehîne yekê vî barî ragire. Mêrik jî vê dizane lê karê bike nîne. Mêrik bi xwe xwe gunehkar dike û ji xwe ra: '' Erê, dizo! Berî her karî tu çira dizîyê dikî? Ma tu bixebitî qey ne çêtir e? hey dizê heram dê tu heya kengî vê bêwijdanîyê bikî? Ma ev dizî û bêwijdanîya heya niha kirî ma ne bes e? Ezê ji van re belê bêjim lê kirina îşev te kirî ew çi bû.

Te qasek kelopelên hêja ji baran derxist, êdî te çira çav berd postê şêr ku ev rîp bi ser te de bên? Ewê di dizîyê de çavbirçî be, dawîya wî ev e. Ewê li pê malê zêde bigere dawîya wî ev e. Ewê bi luqma xwe qayîl ne be dawîya wî ev e.'' got û bergehê encama xwe rawesta. Şêr bi yek weşê dihere. Şêr ku ve dihere ne şêr sizane ne jî siwar. Encama wan dê bibe çi? Ne şêr dizane ne jî siwar. Ev hewal dê heya kengî bajo? Ne şêr dizane nejî siwar. Di vî şixulê han de dê kî kar bike? N şêr dizane ne jî siwar.

Her du jî, ji hev ditirsin û yek bi tirsa yê din nizane. Di nava van tirs û heybetan de û bi yek weşê heya roja din tav gerim bû çû. Gava tav gerim bû, êedî şêr diwesta rêlekê ji dûr ve xwiya. Gava ew rêl dît şa bû. Ji bo hênikayîyê şêr bi alaza rêlê kir. Çiqas çû rêl nêzîktir bû. Mêrik jî dît ku şêr bi alîyê rêlê ve diçe. Gava şêr bi

keve nav rêlê mitliq dê mêrik li darekê bikeve û ji ser pişta şêr de gêrî jêr be. Mêrik jî vê yekê baş dizane û li pê çareyan digere. Mêrik xwe amadeyê revê kir û ma benda şêr, heya xwe bigihijîne serê rêlê. Gava şêr xwe gihand dara pêşîn, mêrik ji ser pişta şêr destên xwe avête çiqilê darê û rabû serî. Belçim û çeqilên darê wisa talan bûn ku mêrikê diz din ava rêlê de winda bû hêç nedixwiya.

Mêrik di dilê xwe de; ‘’Ox! Ez ji şêr filitîm’’ got. Dema lê nihêrî ku şêr, vay eli bin darê li ser dest û pê xwe veketîye û bi hêsanî bêhn dide û distîne. Mêrik jixwe: ‘’ Ev çi rîp e, ez ketimê û ev şêr j imin çi dixaze?’’ pirsî û bê bersiv ma. Mêrik: ‘’Ezê hewyê bikim hey aka çawa dibe’’ hizirî. Mêrik çawa derk serê darê, şêr jîî wisa li binê darê veket. Di vê deverê de hizirîna şêr ev bû: ‘’ Siwar mitliq ji bo karekî derket jor, heke here, dê siwar xwe jor de bavê je li ser piştê û dîsa bibezîne. Çawa li nav baran de jî welê kiribû. A baş ew e, qasek hasîne bike hey aka çawa dibe. Bi kurtasî şêr newêre bireve, diz jî newêre dakeve jêr û daxwaza her duwan jî ew e ku demek zûtir ji hev bifilitin.

IX

Şêr û Meymûn

Meymûnek, şêr li bin darê dibîne û tê atek jê re davêje titêl û hewala wî dike.

Meymûn:

-Çi tintêl û çi hewal?

Şêr:

-Ez li vir girtîme.

Meymûn:

-Eman destebira tu girtîyê çi û kê yî?

Şêr:

-Ez jî nizanim çi û kî ye, tenê dizanim ji hingor ve heyînek li pişta min siwar e û heya niha min dajo. A niha ji bo karekî derket serê darê, li wir ez benda wî me. Lewra bêdestûra wî newêrim herim.

Meymûn:

-Tu qaskî hewyê bike, ez herim lê binêrim ka çi heyîneke ku karîye l ite siwar be û bajo got û da qurmê darê ni alî jor ve hilkişa. Mêrikê diz wisa hezir kir k udi navbera şêr û meymûnê de peymanek hate danîn û meymûn hilkişa ku wî bavêje, şêr jî wî bixweç Mêrik çiqek ji darê şikinand, bi destê xwe girt û xwe baş veşart, heya meymûn baş nêzîk bû. Nişkêve bi destek destê meymûnê girt bi destê din bi daran lê xist. Qêr û hewar bi meymûnê ket. Şêr ‘’Nexwe mirov ew e’’ got û bi qêrîna meymûnê bi ser heşê xwe ve hat. A baş ew e, ez birevimç Hê ku mirov bi meymûnê re mijûl e, ez xwe rizgar bikim. An wiha gilî kirî,heger destên wî mirovî min bigire, dê min ji pişîkê jî hûrtir û piçûktir bike. Belê gotina pişîkê rast e pişîk ji makbata şêran e, him jî ya bi hêztirîn e. Lewra ewqas maye. Heger ji malbata me bûya ew qas jî nedima. Yek ji pişîk gelek bi hiş bû. Lewra ji minre got ku hê jî din av heywanan de hinek hêjana te maye. Heger lêgerana mirovan neşemirînî dê ew jî biçe. Va ye ew jî derket; ‘’meymûnê ji min ra ‘’destebira’’ got. Va ye rutba dawî jî çû’’ ji xwe re got. Mey mûn dun av qêr û xwînê de hişt û bazda. Şêr çawa ji wir revî, hêç li pê xwe nenêrî, bi bez çû din av rêlê de cîyekî tenha xwe veşart. Bêhna xwe wisa hêdî dida û distand ku guhê wî pê nedihesa.

Di vê dema hande şêr ji du bûyeran de xwe bextiyar dibîne. Yek jê ew eku ji destê mêrikê diz û ji siwarîya wî filitîye û bedena wî jî qasek hesîne kiriye. Ya din jî biryardana wî yê ku êdî tucar li mirovan negere û û ew cîyên li wan deran mirov hebin hêç neçe wan hawiran. Bi vî awayî dibe ku wê hêjana xwe ya din av heywanan de windakirî jî bibîne. Kî dizane belkî bigihije selteneta xwe ya berê jî. Digel vê bextiyarîyê tirsek wî jî hebû. Heger ew tirs jar û weza jî be, mêrikê diz gava ji revîna şêr agahdar be, dibe dev ji meymûnê berde, bikeve pê şêr û bibîne jî gava ev ponijîn ji şêr re çêdibe, nişkêve: ‘’Na, na, ew êdî min nabîne û li min siwar nabe.’’ Dibêje. Şêr di van hizirîn û ponijan de diçe û tê. Hew dibîne ku meymûn bi birînên xwe ve pêşber rawestaye. Şêr him şad dibe him jî ditirse. Şêr digel zanîna mitliq jî dîsa dipirse:

-Ew çi bû kî bû?

Meymûn:

-Malava te çira ji min ra ‘mirovek’ e negot?

Şêr:

-Mirov ew e?

Meymûn:

-Belê mirov ew bû. Him jî mirovekî diz bû.

Şêr:

-Diz çi ne?

Meymûn:

-Diz, naxebitin. Diz, hêç karên baş nakin. Diz, bêwijdan in. Diz, bê şerm in. Diz, ber xwe nakevin. Diz, bêkemal in. Diz, malê bîyanîyan didizin û dixwin. Ji bil van yekan hêç karên dizan nîne.

Şêr:

-Zêde dirêj meke, min zanî. Ew l imin siwar bûbû ku biçe welatekî din ji xwe re dizî bike û tam rast e. Tu wê bêje, bi ku ve çû?

Meymûn:

-Qasî dizanim, heya hiş li serê min bû ez dikutam. Di hezra min de piştî hişçûnê, ez avêtim jêr. Gava bi xwe hesam, kes li wan deran nîn bû.

Şêr:

-Hêç raneweste, were em xwe baştir veşêrin. Mitliq ew niha li me digere. Heger me bibîne dê te bikuteû ji bo çûna karê xwe dê li min siwar be.

### 1.1.4. Zîyareta Çavzer

Mîyek topal ji kerî paşve ma. Pêşî mîyê şaş kir û ne zanî ka dê çi ke. Lewma nedizanîya ji kîjan alî ve ahtîye û dê bi kîjan alî ve bi çûya. Kerî li ku ma û ku ve çû ev jî nedizanîya. Çend şev bûn ku ji ber êşa lingê xwe raneketibû û mîna gêjan li pê kerî diçû. Lingê wê, wê şevê, ji alî şivên ve hatibû derman kirin û êşa wê qasekî êmin bûbû û raketibû.

Mî di xewa şêrîn de mabû, şivên kerî rakiribû û biribû. Ji ber vê yekê, mîyê tu nedizanîya û şaş bûbû. Pêşî mîna serserîyan li wan deran bê sedem digera. Paşê bi xwe re hesa, zanî ku êdî çarenûsa wê guherîye û divê ji xwe re hêwirgehek bipeyidîne.

Ji bo peyidandina hêwirgehekê mî li wan der û beran digera. Nişkeve dengekî xerîb hate guhê û vewesta. Baş guhdarî kir û zanî ku dengê cewrikî ye.

Belê, ji bo jîna miyê seyek peywist bû û diviya bû ku vî cewrikî bibîne û xwedî bike, dê jê re bibe pişt û jîna herdukan jî rizgar be. Mîyê çawa ew deng nasî, ev yeka han jî zanî û bi tundî li cewrikî gera. Carna mî radiwesta û alîyê hatina deng tespît dikir, biwî alî ve diçû. Heya xwe gihande şeqîfekî kevir. Di binê şeqîfê de cewrikekî xweşik xwiya. Mî gelek lê xebitî, bi zehmetî û kotek ji binê şeqifê derxist cewrikê, pêşî cewrik mêjand û têr kir. paşê pê re peyivî:

-Tu kî yî

Cewrik:

-Nizanim.

Mî:

-Navê dîya te çi ye?

Cewrik:

-Nizanim.

Mî:

Kê tu xwedî kirî û kî pêşî şîr da te?

Cewrik:

Ma ne tu bûyî? Ew jî mîna te sipî bû, J imin pir hez dikir.  Tu jî, j imin pir hez dikî. Te ez ji wî cîyê asê rizgar kirim, anîm dame ber sînga xwe û ez mêjandim. Ez jî, j ite pir hez dikim. Êdî ji bal min meçe û tenê mehêle. Ez  guneh im.

Mîyê guhdarî cêwrikî kir, zanî ku cewrik du rojî ango sê rojî bû ye ku dîya wî ew winda kirîye û sê roje k udi şeqîfa kevir de birçî, bê dê , bê çare maye û ne xwe nas dike, ne dîya xwe, ne jî tu bîrê tê.

Mî dîsa pê re peyivî:

-Ezê pêşnîyarekê li te bikim. Ka tu çi dibêjî?

Cewrik:

-Bifermo!

Mî:

-Di vî welatê bîyanî de, ez jî bê kes im, tu jî. De were tu bibe kurê min û ez jî bibm dîya te. Ez û tu hevdu xwedî bikin. Heger em wuha bikin, dê j ime her dukan re jî baş be.

Cewrik:

-Jixwe tu dîya min î, ez jî kurê te me. Hêvî dikim êdî min neşemirînî. Min tenê mehêlî. Tenêtî ne xweş e. gava tenê dimînin pir ditirsim. Ber sînga te pir xweş e. Guhanên te jî rindin, şîr tê de heye. ka dîsa min bide ber sînga xwe, qey çi dibe? Piştî vê gotinê, serê xwe ranegirt û xwe avête situ cewrikî, da ber sînga xwe, qey çi dibe? Piştî vê gotinê, mîyê xwe ranegirt û xwe avête sitû cewrikî, da ber sînga xwe û serê wî alast, pişta wî mejend û mêjand. Paşê berê xwe dayê û got ku:

-Jixwe tu kurê min î  ez jî dîya te me. Êdî ez j ite venaqetim. Ezê her gav li nik te bim. Te bimêjînim  te xwedî kim. Dema tu mezin bî înca dê tu min xwedî kî. Ma ne welê ye?

Cewrik:

-Belê, welê ye, ezê li dayîka xwe binêrim û xwedî bikim.

Mîyê zanî ku cewrik tenê wê ji xwe re dê dizane. Bi vê yekê jî daxwaza miyê tê cih û ji herdukan re ya baş jî pêk tê.

Heya cewrik hinek firaja bû çend rojan jî li wir rawestan paşê dê û kur ji xwe re li hêwirgehekê geran. Di nav hêwirgehan de ji xwe re yekê zû de şemirandî neqandin û li wir rûniştin. Çavkanîyên ava sar û gerim, çêre û şikevtên xweşik hebûn. Ango ji jîna wan re çi peywist bû hebû. Cewrik roj bi roj mezin dibû, nema şîrê mîyê dixwar. Di demek nêz de cewrik bû seyekî fêris û kê ew didît jê ditirsa. Di nav wê qada xweş û têrav, têrgîya, ew jî gîyayê kesk û kulîlkên sor û zer de domek dirêj rawestan û ji xwe re kêf dikirin. Carna se diçû nêçîrê. Gava dihat, mî diçû pêşî, xwe davêtin sitû hev û qasekî bi hev dileyîstin. Ji rojan rojekê dîsa se çû bû nêçîrê û mî jî bêxem ji xwe re diçêra. Ji nişkê ve rovîkî ji wê ve hat, li ber mîyê rawesta û jêra got:

Tu li vir çi digerî?

Mî:

Ez di erda xwe da rawestame û niha jî diçêrim.

Rovî:

Na, na, ev erd ne ya te ye.

Mî:

Pa tu dibêjî erdê kê ye?

Rovî:

Ne ku ez dibêjim. Ji xwe zozanê axayê min e.

Mî:

Înca axayê te kî ye? de ka bêje.

Rovî:

Ma tu nizanî? Axayê min gur e. Va ye ez çûm. Ez û axayê xwe, emê sibê bên. Tu jî tapû û qoçanên xwe amade bike. Em bi hev re lê binêrin.Heger ne yê te be, angoqoçan sexte bin, emê koda zozanî j ite bistînin.Rovî piştî van gotinan rabû û çû. Mî ji tirsa bedena wê ricifî, serê wê qor bû, lêva wê sor bû, hêstir ji çavan dibarîyan û êdî nekarî biçêre. Bi xwe ji xwe re; Rovî dabaşa tapû û qoçanan dikir, ê baş e gur tucar tapû û qoçanan dinase? Na, tu tixûb ji gur re nîne. Ya duduyan jî rovî dabaşa kodê kir, ma ji bil goştê min, dê gur çi kodê bixwaze? Na, xwestinek wî yê din tune'' got û dîsa kete xema xwe ya giran. Mî di vî derd û xemê de bû û se derket, hat. Li tintêla mîyê nihêrî gelek tirsa. Ji xwe ''gelo çi bûye, çi hatîye serê dayîka min ya dilovan û çi qewimîye?'' pirsî  bi alî mîyê ve çû. Bi dilêkî xweş pate jê re avêt û pirsa hewal û tintêla wê kir. mî tenê diricifîya. Car din se:

-Dayikê çi qewimîye?

Mî:

-…

Se:

-Dayîkê tu çima diricifî û çima napeyivî, qey tu nexweş î?

Mî:

-Kurê min, îro rovîyek hat.

Se:

-Dayîkê! Tu çima tirsîyayî, rovî çi ye, hêjana wî çi ye, yên ji wî mezintir çi ne?

Ez heme û ez kurê te me. Sedema rawestana min ya li vir parastina te ye. her çi dibe bila bibe, ez têra parastina te heme. Tu j imin bê tirs, hinek dabaşa rovî ke. Rovîyekî çawa bû, çi demê hat, çi dikir? Van libolib ji min re bêje.

Mî:

-Bi kurtasî ji bo doza hêwirgaha me hatibû.

Se:

-Pêşî ji te re got çi û paşê dabaşa çi kir? Hemî ji min re bêje.

Mî:

-Çawam hat, ‘’tu li vir çi digerî’’ got. Min jî got k udi erda xwe de rawestame û diçêrim.

Se:

-Ji vê gotina ter a got çi?

Mî:

-Wî, ‘’na, na ev erd ne ya te ye. ne ku ez dibêjim û ji xwe zozan ya axayê min e.”

Se:

-Ne got axayê min kî ye?

Mî:

-Kurê min! Axayê wî gur e, gur! Kurê min heger sibê ez qoçanê vê erdê nedim nîşa wan, dê daxwaza kodê ji min bikin. Di bawerîya min de qoçan hebe jî wec nagire. Lewra gur û rovî kengî bi tapû qoçanan xebitîne ku îro bixebitin. Na kurê mine w hêcet in. Doza wan hemî standina kodê ye û koda wan jî çi ye, tu dizanî kurê min?

Se:

-Na, dayîkê ez ku dizanim?

Mî:

-Koda wan daxwaza can û goştê min e.

Se:

-Dayîka min ya dilovan, filîtîna ji vê teşqela han dê ew qas ne kotek be. Di hezra min de îro tu birçî mayî. Fermo tu biçêre û baş têr bixwe, da îşev tu rehet binivî. Em sibê zû rabin li çara vî karî binêrin. Dayika min, j ite tika dikim, hêç canê xwe yê delal meêşîne. Peyman be, sibê li ber çavên te ezê gurê bixeniqînim û tu jî bi temaşe kirina wî dilxweş û kêfxweş bî. Bi van gotinan, mî qasek êmin bû. Lê dilê wê de dîsa hinek xwişîş hebûn! Lewra mî jig uran pir ditirsinû wisa dizanin ku jig uran zeximtir, di dinê de hêç candar tune. Her çiqas mîya me hêza kurê xwe dizanîya jî lê nikarîya xwe ji vê xwişîşê jî rizgar bikira.

Se bi dilê germ û mî jî di navber dilsarî û germîyê de raketin. Se bi hêsanî heya sibê raket. Mîyê jî gel xewnên sosret didîtin û carna jî qêrek dide û şîyar dibû.

Sibehê zû dê û kur bi hev re rabûn. Piştî peyivîn û amadekirina bernama xwe, dest xebatê kirin. Li pêşber, cihekî kûr hebû. Gorê bernamê, ew cih bi dest û lingên xwe kûrtir kirin. Axa jê derketî, hemî paqij kirin û ji wir dûr kirin.

Welê kirin ku kolana nû nedihate zanîn. Se çû di wê kortê de veket. Mîyê jî qasek darik, gîya, pûş û pelaş anî avête li ser  wî. Ev kar, welê hate bikaranîn ku se, bi hêsanî bikare bizive. Piştî pêkanîna vî karî, bendemana hatina gur û rovî rawestan.

Nêzîkî nîvro gur û rovî bi hev re hatin. Ji mîyê re pate avêtin û rawestan. Gur li mîyê dinêrîya û şiqeşiq ji diranê wî dihat. Mî ji gur ditirsa û tirsa xwe vedişart. Rovî jî bi mîyê re dest bi peyivînê kir.

Rovî:

-Duh me dabaşa tapû û qoçanan kiribû, te amade kirin?

Mî:

Gelek lê geram lê min nepayidand. Di mala me de mişk pir in.

Di hizra min de mişkan ew qoçan hemî xwarine. Lewra hûrên kaxizan li wan kunc û qulêlan de gelek hebûn.

Rovî:

-Pa, dê tu çawan îspat bikî ku ev zozan yê te ye?

Mî:

-Ezê we her dukan bibim ser zîyareta xwe û web idim sondê. Heger we bi zîyareta min sond xwar, ezê koda we bidim. Heger ne, herne malên xwe.

Ji alî gur û rovî ve, ev pêşnîyar hate pejirandin û hemî tev de rabûn, çûne ser zîyaretê. Rovî ji bo sond xarinê du gav pêş de çû û di nav darikan re, zerçavên seyî dît. Xwe paş ve kişa û got:

-Ji zîyaretan bi zîyareta çavzer. Zarokên min hûr in newêrim herim ser.

Gur bi enîr qêr dayê. ‘’ Rovî! Sond bixwe! Sond bixwe Zîyareta çavzer ne bi nirx e û xenîbe te nabe ‘’ got lê rovî tam xwe paş ve kişand. Gur bi hêrs bezî ser, destekî xwe rakir, bi vî zîyaretî got û lê xist. Sey devê xwe avêt û nîv henda gewrîya gurî girt. Rovî ‘’de ka xenibî çawan w bibîn’’ got û ji cih bazda. Di du rahejan de gur mir. Dayîk û kur gihîştin daxwazên xwe.

### 1.1.5. Suwar û Mar

Dibêjin rojekê suwarek di ber qîşekî re dibihurî. Bala xwe dayê ku ji nav qîş hawar û nalenalek tê. Suwar merak kir û bi alî deng ve çû, hew dît ku wa ye marek di binê gomeyekî de maye û hawar hawara wî ye, dibêje "min ji bin vî kevirî xelas bikin!" Dema suwar nêzikayî lê kir, mar bi lavakirineka mezin ji suwar re got:

-Suwaro ez ketime bextê te, were min ji bin vî kevirî xelas bike!

Suwar bala xwe dayê kumarekî tu divê zîya ye di bin kevirekî de maye. Suwar tirsîya, jê re got: Tu mar î, bextê te tuneye, piştî ku ez te xelas bikim tu dikanî bi min vedî.

Mar lê vegerand û got:

-Soz, ez bi te venadim. Ku ru niha min ji bin vî kevirî derxî ez dê jî rojekê bi kêrî te bêm û çêyîyekê bi te bikim.

Suwar li ser van gotinên mar, daxwaza wî qebûl kir. Û rabû ew ji bin gome derxist lê suwar çer kevir ji ser pişta wî rakir , mar hema di cih de xwe avêt ser suwar û xwe li stûyê wî pêçand. Suwar mît û mat ma , jê re got:

-Te xêr e birakê mar, ma qey tu dikî bêbextîyê ni min re bikî û bi min vedî? Ma ne te soz dabû min, ku tu dê bi min venedî?

Mar bi gotinên suwar kenîya û got:- Ez mar im, ne biratiya min heye û ne jî bextê min! Ez dê bi te vedim û te bikujim!

Suwar got:

-Birakê mar ma ne tu dikira di bin kevir de bimirayî, min kevir ji ser pişta te rakir û ji mirinê xelas kiri Niha tu yê çawa rabî û bêbextîyê bi min ra bikî? Heger min alîkarîya te nekira, niha tu mirîbûyî. ma qey ev jî heqê çêyîya min e?

Mar got:

-Qet ne li ber min bigere û ne jî lavayîyan bike, ez dê bi te vedim û bi vî rengî jî maritîya xwe îspat bikim.

Piştî van gotînên mar, suwar bêtir tirsîya. Lê tirsê ew ji mirinê xelas nedikir, loma jî divê bi awayekî rêyek bidîta û xwe ji destê mar xelas bikira. Rabû ji mar re got:

-Ê baş e, jixwe wa ye te biryara xwe daye ku tu yê bi min vedî. Lê berî ku tu bi min vedî, ez dixwazim ez dixwazim ku em herin ba şerîeta qadîyekî. Qadî got çi min qebûl e. Dû re jî tu bi min vedidî venadî tu bi qîma xwe yî.

Mar got

-Em dê herin ba kê?

Suwar got:

-Hema em di rê de berê rastî kê hatin em dê wî wekî qadî qebûl bikin.

Mar pêşnîyara suwar qebûl kir û bi rê ketin çûn. Pir çûn hindik çûn, rastî gayekî hatin. Suwar dest pê kir û mesele ji ga re got:

-Gayê delal ew marê ku xwe li stûyê min pêçandîye di bin gomeyekî de mabû dikira bimira. Li ser soz û ehda ku dê bi min venede, min ew ji bin kevir xelas kir. Lê pîştî ku min ew xelas kir, rabû xwe li stûyê min pêçand û xwest ku bi min vede. Ma tu ji vê yekê re dibêjî çi?

Ga:

-Dema ez golik bûm we însanan dêya min pir didot û nedihîşt ku ez têr wê bimêjim. Dema ez mezin bûm û bûm ga, îcar we rabû ez xistim cot û nehîşt ku rojekê ez pişta xwe rast bikim. Bêyî cot, we gelek karên din jî bi min dikir. Lê niha ne cot bi min dibe û ne jî karên din loma jî we ez bera vê çola han dame ji bo ku gur û keftar min bixwin. Û dû re jî got:

-Maro pê vede û bikuje! Bextê însanan tuneye!

Suwar got:

-Ez vê şerîeta ga qebûl nakim. Ew ji xwedîyê xwe qeherîye û min jî di agirê wî de dişewitîne. Wa ye kerek li dera hanê diçêre, ka em herin ba wê, bila ew me ji hev bigerîne.

Mar got:

-Baş e em herin ba kerê jî.

Û rabûn çûn ba kerê. Suwar dîsan dest pê kir û got:

-Kera delal, em hatine ba te, ji bo ku tu min û vî marî ji hev safî bikî.

Kerê got:

-Xêr e, mesela we çî ye?

Suwar got:

-Ew marê han di bin gomeyekî de mabû û dikira bimira. Dikir gazî û hewar, alîkarî dixwest. Dilê min pê şewitî û min jî rabû ew ji bin kevir xelas kir. Çer xelas bû û nebû, hema di cih de xwe li stûyê min pêçand û got ez dê bi te vedim. Îcar em hatine ba te, ji bo ku tu yê heq û neheq ji hev bigerînî.

Derd û kulên kerê yên dema dahşiktîyê di cih de hatin bîrê kerê got:

-Çaxa ez dahşik bûm, we bi şev û roj we bar li dêya min dikir û lê suwar dihatin û we nedihîşt ku ez wê bimijim û zikê xwe têr bikim. Dema ez mezin bûm jî, îcar jî we rabû ez xistim bin bar. Tiştê we anîbû serê dêya min, we anî serê min jî. We hem barê herî giran li min dikir û ew ne bes bû, di ser de jî hûn li min suwar dihatin. Lê niha ez pîr bûme û êdî bikêrî bar û suwarbûnê nayêm, loma jî hûn xwedî nakin û we ez bera vê çola hanê dame, ji bo ku gur min bixwin.

û dû re jî ji mar re got:

-Maro pê vede bextê însanan tuneye!

Suwar dîsan got:

-Ez vê şerîetê jî qebûl nakim. Dibe ku xwedîyê kerê merivekî nebaş bûye û neheqî li kerê kirîye û ew jî radibe min di agirê wî de dişewitîne. ji ber vê yekê jî divê cara dawî em herin ji yekî din bipirsin ku wî jî heq da te, wê çaxê tu dikanî bi min vedî. Mar got baş e, em herin ji yekî din jî bipirsin. Pir çûn hindik çûn , rastî rovîyekî hatin. Suwar rabû mesele ji rovî re jî dûbare kir. Got:

-Birakê rov, ev marê hanê di bin gomeyekî mezin de bû, dikira bimira. Hawar hawara wî bû digot ji bo riza Xwedê werin min xelas bikin, ez mirim! li ser soz û bextê da min ku dê bi min venede, min rabû ew ji bin kevir derxist û ew ji mirinê

xelas kir. Lê çer xelas bû hema xwe li stûyê min pêçand û gotez dê bi te vedim. Em hatine ba şerîeta te, ji  bo ku tu me ji hev safî bikî.

Rovî hinekî fikirî û dû re got:

-Ji bo ku ez bikanibim biryarek adil bidim divê ez bûyerê ji serî de li cihê ku qewimîye bibînim. Heta ku ez bûyerê di cih de bi çavên serê xwe nebînim ez nikanim tu biryarê bidim.

Herduyan jî ev peyva rovî di cih de dîtin û rabûn berê xwe dan şûna bûyerê. Rovî got:

-Hela ka nîşanî min bidin bûyer çawa bûbû.

Mar çû xwe li ser kevirekî di nav qîş de dirêj kir. Dû re jî suwar rabû ew gomeyê mezin danî ser fitleya wî. Di cih de bû gazî û hewara mar û wekî destpêkê got:- Suwaro ez ketime bextê te, min xelas bike ez mirim.

Rovî got:

-Ho suwaro, ma ev çi ye di bin kevir de?

Suwar got:

-Ew mar e.

Rovî got:- Lê ev çi ye di destê te de?

Suwar got:

-Ev jî dar e.

Rovî got:

-Malneket, de lêxe bikuje ma ne neyar e!

Dema rovî weha got, suwar hema darê di destê xwe de hilanî û bera ser mar da. Yek,  dudu, sisê mar temam kir û berda.

Rovî ji suwar re got:

-Birako, ji bîr neke neyar tim neyar e, tu carî ji meriv re nabe dost û yar e!

### 1.1.6. Zirîn û Lotik

Di demên kevin de, guhaztin li ser pişta heywên bû. Giraniya guhaztinan di navbera heremên nêzîkî hevdû dedihatin kirin. Rê tekûz nebûn. Bi xetere û bêewle jî bûn. Zilamên newêrek û yên bê çek, nedikarîna biçûna karwanî. Nemaze kerwanîiya riya dûr. Di heftekî de, karwan du sed kîlometir li rê diçin. Ji riya dûr re her heymanên barî nikarin xwe ragirin. Ji bo riya dûr deve û ker tên tercîh kirin.

Gava zilaman alaza karwaniya ciyên dûr bikirina, du sê meh berî amadiya xwe dikirin; zilamên çekhilgir û cengawer ji xwe re hilbijartin. Heywanên barî çêtirîn pût dikirin. Ango pûta wan zêde dikirin. Barên xwe amade û hevalên xwe kifş dikirin.

Dibêjin ku carekê kerwanek bi vî awayî ku li jor hat dabaş kirin, xwe amadeyê riya dûr kir, bi rê ket û çû. Piştî şeş mehan gihişt wî bajarê ku jê re mebest bû. Ew barên bi kirê biribûn, radestên xwediyan kiribûn. Kelopelên xwe jî avêtine bazara bajêr, bi bahayek baş firotibûn. Piştî firotina malê xwe vêca ji xwe re malê gora bazara welatê xwekirîbûn. Mal erzan bi dest ketibû, tamayî kir û hêza xwe zêde mal kirîbûn. Ji hêza heywanan zêde bar li wan kir. Piştî bar kirina hemî heywanan, ber bi welatê xwe bizivîn.

Qasî mehekê riya wan ma bû ku bigihîjin welatê xwe, heywan jî, mirov jî gelek westabûn û li serçavkaniyekê baên xwe danîn. Piştî hesînekirinê heywan anîne ber barkirinê, lê kerek û deveke tu awayî nekarîn ku ji erdê rakin û bînin. Lewma him weza bibûn û him jî pir westabûn. Ji bêçaretiya xwe, ew ker û deve li wir hiştin. Heywanên din bar kirin, berê xwe dane oxira xwe û çûn.

Ker û deve qasî rojek din jî welê raketî man û dûre rabûn, dîtin ku karwan çûye  û ew li  wir mane. Deve helek tirsa û bi kerê re peyivî.

Deve:

-Erê, bira! Heval hemî çûne, ez û tu bi tenê mane.

Ker:

-Bila ew çûbin. Ji me re wiha êdî baş e û em serbest û azad in.

Deve:

-Ez biyaniyê vî welatî me. Ji ber vê yekê pir ditirsim.

Ker:

-Hêç metirse. Ez ji vî welatî me. Min cehşîtiya xwe li vir borandiye. Rehmet li miriyên we be, rehmetiye dayika min li vir za ye û ez li vir anîme dinê. Ew jî wilo pêk hatibûye: Hê ez di zikê dayika xwe de bûme, xweyiyek me hebûye. Pir baş û dilovan bûye. Rojekê di vira re dervaz bûye. Ji ber ku dayika min avis û giran bûye, dil nedaye ku biwestîne, şeva xwe li ser vê kaniyê borandiye. Rojan din dayika min zaye û ez anîme dinê. Diya min ev welat baş dinasiya. Vî girê han tu dibînî. Di pişt wê de zozanek pir xweş heye. Tev gul û giya ye. Ava sar jî tê de heye. Çawan xweyê wî zozanî jî winda bûye û kesekî jî xwedîtî lê nekiriye.

Dayika min bi vê yekê dizaniya û em çûn li wir bi cih bûn. Heya dayika min mir, em li wir man. Piştî mirina diya min, rojekê ez derketim serê vî girî û dilê min şewitî û ez zirîm. Zilamekî zirîna min bihîst, hat ez girtim, birim û ez firotim. Ango ez ketime rîpa zira xwe ya qirêj. Fermo em herne wê zozana xweş û heya temenê me hebe, em ji xwe re li wir hêsanî bijîn. Li wir ne karwanî heye, ne jî karwan û ne bar heye, ne jî barkirin. Ji van jî zêdetir, ne mirov têne wir, ne jî cinawir.

Deve:

-Tu gelek baş dibêjî. Lê heger zirîna te hat, dê disan serê me bikeve teşqelan. Pêşî ya baş ji me re ew e ku em çarekê ji zirîna te re bibînin. Gava ji zirîna te re çarekê bête dîtin, dibe kuserê me ji xaxê giran rizgar bibe. Heger ne, dîsa emê bikevin vê tintelê.

Ker:

-Na, na ji bo vê yekê divê xem tune be. Lewma zirînekê li ser min çiqas mal bû, ez pê hesam û xwe di vê mijarê de, derbarê me keran de gotinên mezinan hene: "Ker li cihekî, carek dikeve kurê" yek jî: "Gava kerîcarek di pirek dekun (qul) dît, êdî carekê jî li ser wê pirê re naçe" yekê din jî: "Heya ker cihê lingê xxwe nebîne, lingê xwe daynayne" dibêjin hemû jî rast in. Va ye mirovan em ker baş nasîne. Belê, ew kerên eslê xwe windanekirî, hê jî hemî welê ne. Deveyî bi van gorinan qinyata xweanî, bi hevre rabûn û çûne wê zozana xweşik. Gava deveyî wê zozana digel wan av û gul û giyan dît, bêhina wê fireh û dilê wêxweş bû. Deveyî berê xwe da kerî û spasên xwe jê re pêşkêş kir.

Deve:

-Ev zozanek pir xweş e. Heger domek dirêj ji me re bimeşe, emê tê deji nû ve ciwan bibin. Ji ite re spas ku te ez anîme vir. Min di temenê jîna xwe de ciyek wilo xiyal jî ne dikir.

Ker:

-Ji bo hizirîna te xem nîne. Heger bi ziliyet jî be em dikarin doza vî zozanî vekin û kar jî bikin. Loma ez li vê hawîrê ji dayîk bûme û di vê zozanê de min cehşîtiya xwe borandiye. Dayika min jî li vir cehimiye û îro jî va ye ez di vir de me. Gorî rêzika mirovan jî ev qada me ye. Bi dadgeha mirovan jî kes nikare ji me bistîne. Va ye gora diya min li ber kevirê jorîn e.

Deve:

-Tirsa min giran ji guran e.

Ker:

-Dibêjin di dema kalikên me de gur hebûne. Lê ji wan demên kevin ve heya niha tu kesî saloxê gurekî jî li vî welatî nedaye. Çawan ku min li jor jî gotibû: "Ne mirov têne wir, ne jî cinawir."

Devê:

-Nexwe ev qada hanê fireh, digel van zinar û latan, gul û giyan, dar û beran, mêrg û avan, şikevt û xaniyan hemî yên me ne û heya temenê me jî hebe dê ji me re bin?

Ker:

-Bêguman ji me re pişkdar jî dernakevin. Bese ku em bizanin bixwin û heger min zanîbûya bixwara, niha ez di vir de bûm û xwedî manker û cahşik jî bûm. Mixabin mine w hesaniya xwe û ev menal û samana han hemî kirê goriya zireke xwe. Her çi bû ye bûye, divê em nekevine pê. Di vê mijarê de gotinek mezinan heye: "Tiştê çû mede dû" dibêjin.

Ker û deve domek dirêj di vê zozanê de, bi dil xweşî û şademanî rawestan. Xwarin, vexwarin û vezelan. Rabûn, rûniştin û kenîn. Raketin, nivixtin û xewnên xweş dîtin. Çêrîn, veçêrîn û qelew bûn. Bezîn, bizivîn hêzdar bûn. Roj bi roj tintêla wan diguheriya.

Ker rojekê serê sibehê rabû deve xemgîr dît. Kerê xwest ku bi devê re bipeyive û çû li cem mexal hat.

Ker:

-Bira! Ez xemgîr dibînim. Ma tu nexweş î?

Deve:

-Na, ez ne nexweşim.

Ker

-Pa çi li te qewimie?

Deve:

-Hindek karên borî hate bîra min ez hizirîm.

Ker:

-Qey karekî nêhane, ma tu nikarî ji min re bêjî?

Deve:

-Heya niha bi bîra min nediket. Lewra ez birçî û weza bûm. Candarên birçî û weza, ji bil têrxwarinê, tu nakeve bîra wan. Va ye min têr xwar û serhatiyên min hatin bîra min. Ez ji te çi veşêrim, karekî mîna yê te hatibû serê min jî û nedihate bîra min.

Zozanekî dapîra min hebû. Ez di wî zozanî de ji dayik bûm. Gava ez hatime dinê, hê şîr nexwarî diya min mir. Ez li cem dapîra xwemam û mezin bûm. Dapîra min gelek jî min hezdikir. Ez bi ku biçûma çavên wê j imin nediqeta. Li ku pûlek giyayê xweş bidîta an diçiniya ji min re tanî an jî ez agahdar dikirim, diçûm û min dixwar. Ango ez delalê ber dilê dapîra xwe bûm. Her dem em li cem hevdû mexel dihatin, me li nav çavên hevdû dinêriya.Xwezika te bidîta çavên wê çiqas rind û nêrîna wê çiwas gerim bû.Niha jî dema ew çav û ew nêrîn têne ber çavên min , kirên ji kezeba min tê.. Salekê êş kete nav heymanan. Dapîra min nekarî xwe ji êşê rizgarke. Piştî mirina dapîrê, dinya li min teng bû. Êdî min ji xwarin, vexwarin û ji xwe jî tam hilnedida. Sazimana bedena min hemî herifî. Ji bo hewya xwe min her şol dikir, lê wec nedigirt. Êdî min zozan jî reş kir. Min nedixwest ku lehzek jî di wî zozanî de bimînim û radiqetam. Li ciyan digeram.

Rojekê derketime girekî li pêşî zozên ku di berda rêyek diboriya. Min qasek li rê mêzand. Paşî min dît ku karwanek jê ve tê. Adetek devan heye; gava deve hevdû dibînin lotikan didin. Dema min jî ew karwan dît lota min hat. Bi tu awayî min nekarî ez xwe ji lotikan rizgar kim. Min lotik dan û ez çûme nav kerwên. Hema mirov li min hatin hev, ez girtim û bar kirim. Ji wê rojê vir ve ji xwe tu dizanî û vaye, çawa tu ketî rîpa zirîna xwe, ez jî welê ketime rîp û teşqela lota xwe.

Heger heya karwan biboriya jî min lotik nedabûna, niha ez di wê qada mezinên xwe de rûniştîbûm û min kêf dikir. Ev qas kepazetiya giran jî, nedihat serê min û îro ez li vir jî nedibûm.

Ker:

-Nexwe, weywele û jarîtiyên te jî mîna yên min hene. Bi vî awayî baweriya min bi te neyê û bi te ewle nebim, ez ne bêmaf im. Gava lota te bê, dikarî serê me bixî teşqelan.

Deve:

-Na, bira! Çawan tu dizanî û dibêjî ne welê ye. Hinga ez xort, ciwan û tor bûm. Hêç neketibûme nav jînê. Xeşîm, ter û bê sehî bûm. Min ketin û rabûn nedîbû. Piştî ew qas xeteran, heger lota min bêt jî ma qey êdî ez dilotim? Na, bira êdî ez lotikan nadim.

Ker:

-Na, welê nabe. Gotinek mezinan heye: " Bira biratî, bazar biyantî" dibêjin. Ev gotin tam di cih de ye. Divê em baweriya hevdu bînin. Lewmaya min carna zira min tê, ya te jî lota te. Ji vê yekê çare divê.

Deve:

-Baş dibêjî lê çare çi ye?

Ker:

-Em di nav xwe de peymanekê çêkin û ji hevdu re sond jî bixwin ku ez nezirim û tu jî nelotî.

Piştî qedana peyman û sondê, bi hevdu re rabûn û çûne çêrê. Ew roj kêfa wan ji rojên din xweştir bû. Çend roj bi vî awayî, bi hevdu re borandin. Li her derên zozanên xwe digeran û diçûne serê gir, pêş riya karwanan ve jî carna karwan jî dihatin û diçûn.. Ne lota devê dihat û ne jî zirakerî. Tenê gunehê wan bi wan heywanên barkirî dihat û carna jî bedena wan hêsan dibû. Ji ber ku nedikarîna kêrî heywanan bên., ew hêsanî jî çû. Rojekê dîsa derketine serê gir, li pêş rê veqasekê raketin. Dû re karwanek hat li tanga wan rawesta û sehiya baran kirin. Di wê navê re ji nav karwên, kerek bi dengekî bilind zirî. Gava kerê me, zirîna kerî bihîst, xwe ranegirt û devêyi re "zirîna min tê" got. Deveyî çiqas tika û hevî jê kir wec neda. Gotinek hate bîra deveyî "Ku ker zirînekê bibihîze û ne zire, dê bidire" û helbestek jî

“Garana kert ê hebin nabe bê kerzirîn. Diwana zircahilan nabe bê dilbirîn.” Hate bîran û hewya xwe anî. Xwezayî (tabîî) kerê me jî bi dengekî bilind zirî.

Piştî zirîna kerî ji nav karwên du zilam hatin ker û deve girtin û birin. Her yek ji wa barekî giran li wan kirin û çûn. Gorî hêza wî barê kerê girantir bû. Qasî du rojan li rê çûn, ker xam bû û kete erdê. Lê nerîn ku êdî ker nikare bimeşe. Barê wan li heywanan belav kirin û ker jî danîne li ser pişta devê, dîsa riya xwe domandin. Gava karwan di çiyayekê asî re dervaz dibû, devê ji kerê re “lota min tê” got û hewar û zarîna kerê wec negirt. Destûra peyabûnê xwest ew jî nebû. Kerê bi tu awayî çara rizgarkirina xwe nedît û “ peywana li ser zirîna keran û lota devan, bi zor ev dawî jê dertê” got.

Belê, deve ji dil lotikî û bi du lotikan, ker ji ser piştê ket û heyabinê newalê gindirî.

### 1.1.7. Sê Mîh

Dibêjin hebû tunebû, sê mîh hebûn. Yek spî bû, yek reş bû û yek jî sor bû. Hersê jî yê hev bûn, bi hev re dijîyan û bi hev re diçêrîyan. Rojekê mîha spî got:

-Ez êdî naxwazim li vir û bi we re bijîm. Ez dixwazim herim ji xwe re xanîyekî lêkim û tenê bijîm.

Miha sor got:

-Ez jî naxwazim li vir û bi we re bijîm. vira hem ne xweş e û hem jî çêreya wê kêm e. Herkes ji xwe ra tenê bijî çêtir e. Miha reş mirûzê xwe tirş û tal kir û got:

-Ez wekî we nafikirim. bi ya min em hersê  bi hev re bijîn çêtir e. Em dikanin alîkarîya hev bikin, em hersê bi hev re xurttir in.

Lê belê  mîha spî û mîha sor li dij derketin, gotin na, em dixwazin bi  ten serê xwe bijîin. Mîha reş herçiqas israr kir û xwest ku e

ji hev neqetin, lê pere nekir, lê mîha spî û ya sor qebûl nekirin. Wan tim got na, divê em ji hev biqetin û bi tena serê xwe bijîn. Û rabûn ji hev qetîyan û her yekê

berê xwe bi derekê de kir. Miha reş pir çû hindik çû, bi rê de rastî kevirtiraşekî hat. Ji kevirtirêş re got:

-Hoste, ma tu nikanî hinek kevir bidî mini ji bo ez ji xwe re xanîyekî lêkim? Kevirtirêş got:

-Ez didim, çima nadim. Kerem  ke çiqas ji te re lazim e bibe.

Ji vê comerdîya kevirtirêş re kêfa mîha reş pir hat û rabû têra xanîyekî kevirên şehkirî girtin û ji xwe re xanîyek lê kir. Her du mîhên din jî ji xwe re xanîyên xwe lêkirin. Mîha sor xanîyê xwe ji qirş û qal û mîha spî jî ji kayê û ji pûş û pelaş lêkir. Rojekê gur çû li derîyê mîha spî xist û got:

-Ma destûr heye ez werim hundir. Bîstekê bi te re bipeyivim?

Mîha spî got:

-Na ez naxwazim tu werî hundir.

Gur qeherî û rabû bi hemû hikim û hêla xwe pifî xanîyê mîha spî yê kayîn û pûş û pelaşî kir û ew bi ser wê de hedimand. Dû re jî ew xwar. Piştî ku gur mîha spî xwar û şûn de çû li ber derîyê mîha sor sekinî bi dengekî hêlî ban kirê û got:

-Ma destûr heye ez werim hundir û bi te re hinekî bipeyivim?

Mîha sor ji tirsan qutufî û got:

-Na ez naxwazim tu werî hundir.

Gur pir qeherî û dîsa bi hemû hêza xwe pifî xanîyê mîha sor yê qirş û qalin kir û ew bi ser wê de hedimand. Û ew jî xwar. Piştî ku mîha sor jî xwar rabû çû derîyê mîha reş û bangî wê jî kir, got:

-Ma destûr heye ku ez werim hundir û bîstekê bi te re bipeyivim?

Mîha reş gelekî tirsîya û ji hundir bersiva wî dayê got:

-Ez ne destûrê didim te û ne jî derî li te vedikim. Ez naxwazim tu werî hundir.

Gur qeherî û dîsa bi hemû hêza xwe pifî xênî kir. Lê ji ber ku xanî bi keviraran hatibû lêkirin hilneweşîya. Rabû careka din pif kirê û careka din û careka din. Lê xanî her li cihê xwe bû û hilnediweşîya. Ji qehiran rabû bi pencan bi kevirên xênî ket, lê dîsan pere nekir. Xanî ne bi hewa diket û ne jî hildiweşîya. Dema dît ku bi pifkirinê nikane xênî xera bike har bû û bi xênî de hilperikî. Lê ji ber ku hemû kevirên şehkirî bûn, bi hêsanî nikanîbû pêde hilperike, d, nîvî rê de şemitî û got gurm û li erdê ket. Dema wekî zebeşekî got gurm û li erdê ket, zikê wî qelişî û mîha spî û mîha sor, berê kalîyan û dû re jî gotin çirp û ji zikê wî yê qelişî bazdan der, xwe xelas kirin. A dibêjin loma jî ji wê rojê û vir de ye mîh tu carî ji hev naqetin û wer bi hev re dijîn....!

### 1.1.8. Qertel û Kund

Dibêjin hebû tunebû, qertelekî şahê hemû teyr û tuyan hebû. Ew di ser çîya, banî û newalan redifirîya, çavên xwe li çûk û teyrên biçûk digerand û tavilê ew nêçîr dikirin. Rojekê li ser qotê dareka çamê ya bilind çavên wî li hêlîna dayika kund ket. di hêlîna wê de çar hêk hebûn. Şahê teyran gelekî kêfa wî hat. Tavîlê got guj û xwe bera ser hêlîna da û ji dayika kund re got:

-Roja tev bi xêr.

Kund lê vegerand û got:

-Roja te jî bi xêr, şahê hemû teyr û tûyan! Ez hêvî dikim ku tu ne birçî yî.

Qertel got:

-Erê ez birçî me û min nîyet heye ku çêlikên te bixwim. Hema çer ji hêkê derkevin ez dê wan bixwim!

Dayika kund got:

-Şahê hemu teyr û tuyan, ka were vê xerabîyê bi min neke. Em dikanin bi awayekî din li hev bikin. Heger tu dev ji çêlikên min berdî û wan nexwî, ez sozê didim te ji niha û pê ve ez tenê bi şev bifikirim û tenê mar û dûpişkan bixwim. û ez

dê hemû çûk û mişk û heywanên din yên biçûk jî ji te re bihêlim; çimkîew bi roj difirin û bi roj digerin.

Qertel got:

-Pir baş e, ez sozê didim te ez dê çêlikên te nexwim. Lê belê ez dê çawa bikanibim wan ji çûkên din bigerînim?

Dayika kund got:

-Ev yek dê qet ne zehmet be. Ji ber ku ew dê ji hemû çûkên dinyayê gelekî xweşiktir bin.

Qertel gotel "baş e" û firek da xwe û ji hêlînê bi hewa ket. Dîsan di ser çîya û newalan re bilind firîya û çavên xwe yên dûrbîn ji nêçîreka din gerand. Piştî demekê rojekê li ser qotê dareka çamê ya bilind çavên wî li hêlînekê ket. Di hêlînê de çar çêlikên biçûk yên spî boz hebûn.

Ji kêfa qîjînî pê ket û wekî tîreka ku ji kevên bipengize xwe bera ser hêlînê da ji bo ku wan bixwe.

Lê dema çû li ser hêlînê venîşt, çêlikan gişan bi hev re kirin qîjîn û viçevîç! Qertel bala xwe dayê ku hemû jî pir xweşik inç destê wî lê negerîya ku wan bixwe. Wi ji xwe re got:

-Ev çêlikên ewqasî xweşik miheqeq yên kundê ne. Ez wan naxwim.

Weha got û bêyî ku dest bide wan ji hêlînê firîya. Piştî demeka kin li ser serê dareka çamê ya gelekî bilind çavên wî li hêlîneka din ket. û hema dîsan got guj xwe bera jêr da. Di vê  hêlînê de jî çar çêlik hebûn lê ev çêlik pir pîsik bûn, heta wê gavê wî tu carî çûkên weha ne xweşik nedîtibûn. û gişan deng kiribûn hev û bi hev re diqîrîyan, digotin: "Kû- kûû! kûû-kûû-kûûû"

Qertel ji xwe re got:

-Temam! Ev çêlikên hewqasî ne xweşik ne mimkin e ku yên dayika kund bin. Ez dê wan bixwim. Û ew xwarin...

Tam di vê bîstîkê de dayika kund hat hêlîna xwe û kir qêrîn û hawar û got:

-Wey li min pepûkê! Kû....Kûûû! Wey li min pepûkê! Kû...kûûûûû! Şahê teyran, çima te li min weha kir! Te qewl û peymana xwe xera kir! Te çêlikên min xwarin! Ez a te pêpûk dê niha çawa bikim û bi ku de herim?

Qertel got:

-Min efû bike dayika kund. Te ji min re gotibû ku çêlikên te dê bibin çûkên dinyayê yê herî xweşik. Lê yên min xwarin çûkên dinyayê yê herî pîsik bûn, heta niha min tu carî çûkên hewqasî nexweşik nedîtibûn. Ji ber ku nexweşik bûn min ew xwarin...

Dayika kund hêsir barandin û got:

-Wey li min pe-pû-kê... kû-kûûû! Tu şahê hemû teyran î, lê tu hîn nizanî ku li ber çavên her dayikê zarokên wê li dinyayê yên herî xweşik û delal in.....!

### 1.2. Olağan Masallar

#### 1.2.1. Eliyê Bitenê

Ev çîrok ji me re torina mala Eleedîn begî, keça Hecî Mûsa begê rehmetî, Qemer xanimê gotiye. Xwedê wê bi zarowên wê re berxurdan bikit.

Eliyê Bi tenê mêrekî cesûr bû. Li halê dinyayê dinhêrt û digot: Heya ez dinyayê ava nekim nazewicim. Da rê û çû, ket dinyayê da bibîne çi heye, çi nîne. Pir çû hindik çû; rojekê giha welatekî. Xanî lê hene lê însan tê de nînin. Xelkê terka xaniyê xwe daye û bi çolê ketine. Golek jî di wî welatî de heye. Li golê ejdiharek heye, derdikeve xelkê dixwe. Du sêka dixwe êên mayî direvin. Eliyê Bitenê li ber wê golê rûdine. Ejdihar destê sibê derdikeve. Elî wî dikuje.

Elî radibe li serê çiyê agirekî mezin vêdixîne. Xelk agir dibînin û têne ser. Dibînin ko ejdihar kuştine. Kirine perçe perçe. Elî gote wan êdî netirsin, min ejdehar kuştiye, werin di welatê xwe de rûnin. Xelk hatin û di welatê xwe de rûniştin, Elî çû. Deng bi Eliyê bitenê ket.

Elî bi rê de dimeşe; dît du xort vane tên. Go, xortino hûn bi kû da lêrin. Wan go, me navê Eliyê bitenê bihîstiye, em lê digerin. Go, hûn Eliyê bitanê bibînin honê çi bikin. Gotin, emê bibin birayê wî. Go, ez im Eliyê bitenê. Bûn birayê wî û bi hev re meşiyan. Yek ji wan xewas, ê din stêrnas e. Pir çûn, hindik çûn gihaştin gundekî. Axayek tê de heye; pir giran e, pir zengîn e. Marekî mezin di xaniyê wî de ye; ji tirsa wî nikare rakeve. Kes jî nikare wî bikujê. Axa bihîst Eliyê Bitenê hatiye gundê wî, şand anî ba xwe, Go, îsal salek e, ez têr xew nakim. Îşev li cem min be ez hinekî rakevim. Elî go bila be, rabû êvarî birakê xwe şand balê. Ji êvarê li bendê ma heya xewa wî hat. Birayê din çû balê. Ew jî hat Elî bi xwe çû balê. Elî sekinî heta destê sibê. Axa û jina xwe di nav ciha de raketî ne.

Nihêrî mar ji dîwar derket; şûrê xwe avêtê, mar bû du perçe. Çaxê mar kuşt dilopeke xwîna wî pejiqî eniya axa. Elî go, heye ko gava hişyar bû bitirse. Dil kir wê xwînê bi serê şûrê xwe hilaniye û li ser serê wî sekiniye. Go, dilê wî ketiye jina min, dike min bikuje. Elî mar avêti bû bin text. Axa ew ne dît, gote Elî, tu here, birayê xwe ji min re bişîne. Ji birayê wî re go, birayê we xaîn e, hon nikarin wî bikujin, lê gava raket em dikarin wî bikujin. Lê mîna axayê ko kûçikê xwe kuşt û poşman bû em ditirsin tu jî poşman bibî. Axa go, dê hikayeta kûçikê axê ji min re bibêjin. Gotin: Axayek hebû; kûçikek bixwedî dikir. Kûçik cem axa gelek bi qîmet bû. Rojekê axa çû nêçîrê. Du sê xizmetkar jî pê ra. Axa tî bû; go xizmetkaran herin ji min re avê peyda bikin. Çûn, evek, ji dûr dîtin û jê re anîn. Axa dema dikir avê vexwe kûçik li tasê xist û av rijand. Axê go; herin ji min re dîsa ji vê avê bînin. Xizmetkar çûn av anîn.

Kûçik dîsa lêxist û av rijand. Axa hingî qehirî, lêxist kûçik kuşt, çaxê kuşt li ber ket. Go xizmetkaran, de min bibin wê avê pêş min bikin. We ev av ji kû anî. Çûn ser avê. Axa nihêrî li avê heywanekî mirî heye û genî bûye. Dona wî heliyaye û avêtiye ser avê. Av jehr e. Yek jê vexwe wê bimire. Axa poşman bû, lê çi fêde. Axa gote wan, baş e, hon li cem min bin, salekê bila Elî here. Ew man Eliyê bi tenê bi tena xwe çû. Elî pir çû hindik çû gihaşte gundekî. Roj jî, rojekê înê ye, herkes bihuriyê mala xwe û derî li xwe girtiye. Elî çû li deriyan kuta û ji xwediyan pirsî, go ev çi halê we ye. Xelkê got, niha yek wê bê û wê derkeve minarê û bang bide. Dengê wî hewqas qebe û bilind e ko ew deng bi guhê kê ket ewê di cih da wê ker bibe. Elî

deng ne kir; çû li ber deriyê minarê û li bendê sekinî. Gava mêrik hat û dikir hilkişe ser minarê hema bi sînga wî girt û got ê: Tu bi kû da terî? Mêrik lê vegerand û got: En der ne ciyê wî ye ko em herin nava hev, ciyê gulaşê hemama tarî ye. Mêrik ji ber deriyê minarê vegeriya bi aliki de çû; Elî jî li deriyên xelkê da u gote wan, deriyê xwe vekin, mela çû, tu talûke jî ne maye. Bi tenê hemama tarî pêş min bikin. Xelkê hemam şanî da. Elî berê xwe da hemamê. Ji dûr ve dû û dûmanekê xuya dikir; dûyekî reş û tarî, qey ji kana qirê derdiket. Mirov ne diwêrî nizingî wê bibe. Elî ber pê çû û ket hundirê hemamê. Di nav hemamê de tu av nîne, hema hilmek e, radibe û dike tarî.

Elî go, vaye ez hatim, ka tu kanî? Mêrik di nav dûmanê de xuya kir; çûn nav hev, gulaş girtin. Midekî hevûdin gerandin; dikirin ko kês li hev bînin. Dawiyê Elî mêrik avêt erdê, şurê xwe kişand ko serê wî jêke. Mêrik bext xwest û pêsîra xwe vekir û got: Elî biner ez qîz im. Elî çi bibîne, sînga qîzekê ye, ne kêm ne zêde; hema ji ser rabû û got ê: ji min re tewbe bike ko ji niha û pê de tu xerabiya xelkê nekî. Keçikê tewbe kir û çû. Xelkê gund ji sedeqa serê Elî re qurban şerjê dikirin. Elî ji wî gundî jî rabû û dîsa bi çolê ket.

Pir çû hindik çû gihaşte mêrgekê. Ciyekîçayir û çîman, gul, nêrgiz û lale û her çeşît çîêek tê de ne. Di nav wan re riyek dibore, şopê dewar û însanan lê hene; lê tukesî destê xwe ne daye giya an gulekê. Elî di dilê xwe de digot, “divêt di vî îşî de hikmetek hebê, ka ez binêrim çi ye” Elî li ser wê mêrgê rûnişt û li bendê ma.

Karwanekî bazirganan jê ve xuya kir. Karwanvaniyan serê hespên xwe girti bûn; li hespên xwe didan û ne dihiştin ko devê xwe bidin giya kulîlkan. Elî ber pê çû û got: Rêwînino bisekinin. Karwanvanî sekinîn. Elî gote wan: Ma hon çire wisa dikin; dewarên xwe vekin, hespên xwe biçêrînin, hon jî rahet bibin; sibe bi riya xwe de herin. Ma çi li we qewimiye?

Wan go: Ji bo xwedê, em di bextê de ne, berde em herin. Tu nizanî heke me ew vekirin çi ecêb li serê me digere. Heke me hespên xwe berda û giyayek ji vê solinê hate qetandin wextê em digehin qeraxa behirê; em tu tiştî nabînin, hema te dît hespê me pey hev dikevin avê û tê de winda dibin. Ev mêrgeke çift e; dibên seyrangeha keçên periyan e.

Elî go, li Xwedê û li min, hema hon rûnin û xwe vekin. Ez Elîyê Bitenê me. Gava wisa bihîstin ehlê karwên hespên xwe vekirin û rûniştin. Bû sibe bazirgana bar kir; Elî jî pê re. Gava gihaştin golê Elî gote wan, ji min re hespekî bigurînin û çermê wî bikin eyar.

Bazirgana eyarek çêkirin, dan Elî, xatir ji hev xwestin û di riya xwe de çûn. Elî pif kirê eyarê xwe,ew berda avê, lê siwar bû û çû. Pir çû, hindik çû gihaşte qeraxa din. Dî koşkek e, dora wê bax in, bexçe ne. Eyarê xwe di nav gulbinan de veşart û ket hundirê koşkê. Koşkeke mezin, bîst, sî ode tê de hene. Heryek bi rengekî raxistî, balgihine etlas û qedîfe. Oda mezinê malê jî xuya ye. Tê de kulînek heye; Elî ket ê û xwe veşart. Mideyek borî, kevokin hatin, danin penceran, pûrtên xwe ji xwe kirin, bûn pişk însan. Ew keçperî bûn.

Xanima wan hat, di oda xwe de rûnişt. Ên mayîn cêriyên wê ne. Ew jî hatin di dora wê de sekinîn; ji xanima xwe re gotin: Ya xanima me, ciyê ko em diçûn ê û me lê seyran dikir ji destê me çûye. Xanimê got: Ma çire? Cêriyan: Elîkî bi tenê heye, bi nav û deng e, hemî cihên xerab çêdike û dixwaze zilmê ji dinyayê hilîne. Di dinyayê de gelek tişt çêkirine. Elî rabû hespê bazirganan berda ser mêrga me. Xanimê got: Xwezka mi jî ew Elî bidîta, ka çi mêr e, çi pehlewan e?

Elî kulîn vekir, derket û got: Va me..... Xanimê gava Elî dît, dil pê ket. Got ê: Ya Elîyê Bitenê tiwê hergav holê bi tenê bimînî, ez û tu va em dibin dido. Min tu qebûl kirî tu bibî mêrê min. Tu ji min qebûl dikî ez bibim jina te. Elî go: Li ser serê min xanim. Lê melayek divêt ko mara me bibire. Yekê ji cêriyan kurkê xwe li xwe kir firî çû heta bajarekî Frengistanê. Dît melayek hilkişiyaye ser minarê bang dide. Hema mela hilgirt anî ba xanima xwe. Mela mara wan birî. Mistek zêr dan ê û mela vegerandin bajarê wî. Mela wextê bang dida qederê saetekê li ser minarê disekinî û digot, heye ko dîsa werin min bibin û mistek zêr bidin min. Mela çend rojan li bendê sekinî, gava dî kes ne hatiye; rabû elam da qralê Frengistanê. Mela çîroka xwe gote qral û wesfê Esmaperiyê da yê.

Qral, ji nedî ve kete eşqa Esma-periyê. Delal berda nav bajêr û got: Pira ko ji min re Esma-periyê anî ezê bav, bira an kurê wî bikim wezîe. Pireke şeytan rabû çû

ba qral û got ê: Heke te lawê min kire wezîr ez dikarim Esma-periyê ji te re bînim. Min ji te eyarek micewher jî divêt.

Tiştê ko pîrê dixwest dan ê. Pîr rabû micewher kirin eyarekî, lê siwar bû û berê wê da koşka Esmaperiyê. Pir çû hindik çû, rojekê gihaşte koşkê. Nihêrî çi koşk e, bexçeyek li ber e. Eyarê xwe di nav deviyekê de veşart; Laçikeke spî li serê xwe kir, tizbîhek girt destê xwe û ket hundirê koşkê. Pîrê gote cêriyan: Qîzê min ez pîreke xerîb im. Fortinê qayixa min bin av kir, ez ketim bextê we û Xwedê. Ez ji welatekî dûr im; min bikin mêvana xwe. Cêriyan, gote xanimê. Xanimê go: Hetanî ko Eliyê Bitenê ne hati bû cem me tukesî qesta me ne kir. Ev çendî û çend sal in me tu mêvan ne hewandiye. Kî zane ev pîr çire hatiye. Ji lingê wê bigrin û bavêjin avê. Di vê navê de Elî hat û bi mesela pîrê hesiya. Rabû gote Esma-periyê: Ma çi xem e, bila bimîne, ewê çi bike, qet nebe ji me re çîroka dibêje.

Pîr bû mêvana wan û ji wan re çîrok digotin. Elî hero li eyarê xwe siwar dibû, dikete behrê û ji xwe re nêçîr dikir; carina masî jî digirtin. Êdî pîr bû bû ji malê. Wextê Elî diçû nêçîrê bi xanimê re rûdinişt û her tişt digotin ê. Rojekê got ê: Xanima min ji min zêde ye, lê ezê bibêjim. Ez dibînim tu gelek hejî mêrê xwe dikî û hêj nizanî qeweta wî di çi de ye. Îşê dinyayê belû nabe; te dît rojekê kete tengasiyê; tiwê çawan arikariya wî bikî?

Ev gotin ket serê Esma-periyê. Êvar wextê ko Elî hate mal jina wî jê pirsî. Elî gote jina xwe: Qeweta min di şûrê min de ye. Heke şûrê min avêtin avê ez dimirim. Elî sibe rabû dîsa çû nêçîrê; Esma-periyê jî gote pîrê ko qeweta mêrê wî di şûra wî de ye. Elî nîvrokî ji nêçîrê vegeriya, taştê xwar û raket; westiya bû. Pîrê rabû gote Esmaperiyê: Xanima min, mêrê te raketiye; tu jî rabe em dakevin bexçê, tu jî hinek bihna xwe derînî, li wan gul û çîçeka temaşe bikî. Esma û pîrê daketin bexçê. Pîrê ji nîşka ve got:« Min tizbiha xwe ji bîr kiriye» û vegeriya koşkê; hilkişiya jor oda xanimê, rahişte şûrê Elî û ji pencerê de avêt avê. Wextê vegeriya bexçê Esma-perî li ber gulan sekinî bû û li wan temaşe dikir. Pîrê digot « Ev gul mîna te ye, Ew mîna Elî ye». Bi vî awayî gihaştin deviyê ko eyar lê veşarti bû. Pîr ji nîşkekê ve wek hespekî veciniqî ji ber deviyê xwe da paş û gote Esma-periyê: Ev çi ye xanima min. Esma-periyê xwe da pêş; li deviyê xwar bû. Devê eyar vekirî bû û micewherê tê de xuya dikirin. Esma-periyê destê xwe dirêj kir û rahişte cewahiran. Pîrê ji par re dehf da û

Esma xist nav eyar; devê eyar girt, berda avê û lê siwar bû. Pir çû, hindik çû gihaşte erdê qralê Frengistanê. Esker li qraxê rêz bû bûn û li riya pîrê dipan. Şanî bi welêt ket, lawê pîrê bû wezîr.

Esma-perî ket odekê û gote berdevkên qral, heke berî çil rojî qral bi ser wê de çû ewê xwe bikuje. Cêrî nêrîn wext dereng bûye, Elî ji xew hişyar nabe. Esma-perî ji bexçê venegeriyaye. Çûn lê geriyan, ne ew e, ne jî pîr e. Nihêrin kurkê Esma-periyê di cihê xwe de ye. Gotin, heywax nema kare vegere. Birayê Elî ê stêranas hergav li stêrka Elî dinihêrî û dizanî ko Elî di xweşiyê de ye. Rojekê dî ko stêrka wî vedimre. Rabû gote birayê xwe ê xewas: Birao, stêrka Elî dike vemire, de rabe em herin lê bigerin, ka çi lê qewimiye.

Rabûn bi rê ketin, pir çûn, hindik çûn gihaştin mêrga ko bazirgana hespê xwe lê diçêrandin. Mesele ji wan re gotin, saxlûxa Elî dan. Bazirgana îş nas kir; her tişt gotin birayê Elî. Hespek ji wan re gurandin kirin eyar. Her du bira lê siwar bûn, ketin behirê; gihaştin koşka periya.

Nihêrîn Elî dirêj bûye, rakrtiye, bihna wî li ber wî çikiyaye, wek miriyan e. Cêriyan got ko ev 15-20 roj in ko Elî di vî halî de ye. Mesela pîrê ji wan re gotin. Li şûrê wî geriyan; wextê kalan vala dîtin zanîn ko xiyanetî tê de heye û şûr avêtine avê. Eyarek dona genekê anîn, li behirê reşandin. Zikê behirê bû bû wek neynûkekê; her hiştên tê de xuya dikirin. Xewas ket binê avê behirê û şûr deranî. Wextê şûr li kalan vegerandin, rih bi Elî ket. Elî hişyar bû; pev şa bûn, gilî û gazindê xwe ji hev re gotin. Xwarin, vexwarin; xwe şiştin, veşiştin û wextê bû sibe, berê xwe dan oxurê, pişta xwe dan felekê; li eyarê xwe siwar bûn û ketin behirê.

Pir çûn, hindik çûn gihaştin welatê qralê Frengistanê. Bajarekî mezin û depdepe. Li rex bajêr xaniyek dîtin, xanîkî piçûk, wek xaniyê pîrê. Ji derî ve dan, silav li pîrê kirin û gotin: Yadê cihê mêrvana heye? Pîrê go: Xwelî li serê min, mal mala mêvana ye; rûye salê reş be.

Çend pere dane destê pîrê. Pîr çû ji wan re zad anîn. Xwarin vexwarin; cardî kêfxweşî dan pîrê û jê pirsîn, ka di welatê we de çi heye çi nîne. Pîrê mesela Esma-periyê ji wan re qise kir û got ji wî çil rojî sih roj çûne; dehên din mane, qral dike

bikeve gerdekê. Elî gote pîrê: Yadê tu rabe here cem qral, jê re bibêje ma tu çire deh rowê din li bendê bimînî. Îzna min bide ez herim cem Esma-periyê, hema îşev emê daweta te bikin. Rabûn destmalek tijî sêv kirin; Elî sêvek kola gustilê xwe tê de veşart.

Pîrê rahişte destmalê û çû serayê. Dergevan ew ne hişt ko bikeve hundir. Pîrê da ber qîra, qral pê hesiya û pîr anî cem xwe. Pîrê qiseta xwe gote qral. Qral go, ma çawa mi navê, bila be. Ji xwe pîrekê ew ji min re anî, heye ko pîreke din daweta me wê bilezîne. Pîr birin li ber deriyê oda xanimê; periyê deriyê oda xwe bi nîvî vekir. Pîrê destmala sêva wer kire odê. Gustilê Elî ji nav sêvê pekiya. Esma-periyê her tişt zanî. Rabû gote pîrê: Here bêje qral min qîma xwe pê anî îşev daweta me ye. Lê şertekî min heye. Pişttî dawetê divêt herkes vegere mala xwe û sê şeva û sê roja kes ji mala xwe dernakeve.

Pîrê baz da mizgînî da qral; xelata xwe bir, vegeriya ba Elî. Qral rabû delal berda nav bajêr. Delal bang dida digot; îşev daweta qral e, pişti dawetê divêt herkes vegere mala xwe û sê rojan dernekeve derve. Ji lewra bila herkes ji niho de ji bo sê roja paşroja xwe pêk bîne; çarşî, dikan di wan sê rojan de wê girtî bimînin. Xelk tev de çûn daweta qral. Dahol û zirna lêxist, jin û mêr ketin govendê. Elî û her du birayên xwe cilên pîreka li xwe kirin; bûne keçê pîrê û digel diya xwe ew jî çûn daweta qral. Nîvê şevê, dawet bilav bû, herkes çû mala xwe, bûk û zava bi tena xwe man. Elî bi birayêk xwe ve, xwe di kulînê de veşarti bû. Qral gote Esma-periyê: Te çire sih rojî ez di ezabî de hiştim. Ji roja pêşîn de me daweta xwe bikira ne çêtir bû. Ma hemîn tu ne ji min re yî. De rabe xanima delal em herin rakevin. Xanimê kir ko ne bihîstiye û rûyê xwe jê bada. Vê carê qral hinek madê xwe kir û dîda got: Ez dibînim, tu guh nadî min. Tu hêj li benda Elî yî. Elî li kû, tu li kû?

Wextê wilo go, Elî ji kulînê derket û go: Va me.... Qral gava çav bi Eliyê Bitenê kir hema ji tirsa mir. Esma-perî û her sê bira terka serayê dan; pîr jî bi xwe re birin, li eyarê xwe siwar bûn û vegeriyan koşka periyan. Elî du keçperî dan birayê xwe, wan jî daweta xwe kir.

Min çîroka xwe go ji te re; te jî ew xist cêbika xwe re.

### 1.2.2. Jin Jî Hene Jinkok Jî Hene

Carekê hebiye padişêk. Emir da ko kes li bajêr de ji mexribê pê ve çira vêketî nehîle. Rokê nihêrî ko di qesrekê de çira vêketî ye. Go wezîrê xwe: Haydê em herin binerîn binihêrin ew kî ye? Kêxistin çûn ber qesrê. Tê da qîz û xortek rûniştî ne. Merif hewes dike ko li wan binihêrie. Ew qîz û xortên han bi dor radikevin. Weqta ko dora xort tê keçik serê xwe dide ser çoka wî; xort ji xwe ra bi porê wê dilîze; nobeta keçikê da ji wer dike. Padişa zivirî, ji wezîrê xwe ra got: -Gelo kes heye ko dilê wan ji hevdû sar bike.

Wezîr got: Belê, itbarî (bawerî) bi pîreka nabe. Padişa got: Ti dikarî pîrekekê peyda bikî ko dilê wan ji hevdû sar bike. Wezîr got, belê.

Lêxistin çûn cihê xwe. Wezîr rabû pîrekeke heftê heştê salî dî ko daîm karê wê ew e. got: -Ti herî filan qesrê, tê da keç û xortek heye, ti dilê keçikê ji xort sar bikî, belkî xort bikuje were padişê bistîne.

Pîrê lêxist û çû. Çû cem keçkê. Weqta ko çav bi keçkê ket rûnişt û giriya, keçkê go: -Ti çima digrî dayê. Go: lawê dilê min bi halê te şewitî. Ancax ti liyaqekî wek padişa yî. Heyfa te ko ti jina vî xortê han î.

Keçikê hilda û jê ra go: -Lê ez çawa bikim.

Pîrê go: Êvarê ko xort hat, nobeta wî hat û raket, kêrekê bigir, li ser dilê wî xe. serê wî jêke. Padişa bê ber pacê serê wî jê ra bavêje, padişa te bistîne. Bû êvar, pîrê çû cem wezîr go: -Min sixul qedand, qet nesekinn, herin ber pacê, keçik serê xort jêke, ji we ra bavêje. Wezîr çû ji padişa ra wiha go, padişa go, haydê em biçin ber qesrê.

Çûn ber qesrê û li ber şibakê sekinîn. Nobeta xort hat, serê xwe kir ser çoka keçikê û raket. Keçikê kêrek lêxist û xort kuşt. Serê wî jêkir, di qesrê de avet cem padişa. Padişê serî hilanî û çû. Ji kerba xewa wî ne hat; heta bû sibe. Sibê şand keçik anî, da xeniqandin. Bîna wî pir teng bû, zivirî ji wezîrê xwe re go: Madam ko pîrek ewha bêbext in, ez va diçim ser behrê, çil royî nayim. Ez emr didim te ko pîrek di bajarê mi da ji heftê salî heta heft salî ko ti giştî, jêkî serê wa, heta pîreka mi û xwe jî.

Padişa lêxist û çû. Wezîr da eqlê xwe ko ez berî ko pîrekê xwe nekujim dilê mi naşewite. Ezê pîrekê xwe bikujim, paşê ê wan jî bikujim. Şûrê xwe hilanî û ber bi mala xwe lezand; gihîşt hundirê malê ewil lêxist jina xwe kuşt. Dor hat ser diya wî. Diya wî revî û ket pişt bavê wî. Bavê wî zivirî û jê ra got:

-Lawo xwedê xêr ke, ti dîn bûyî. Go: na ez dîn ne bûme; emrê padişah e. Rûnişt û mesela xwe ji serî heta binî ji bavê xwe ra got. Bavê wî go: madem ewha ye, bise heta ko padişa bê, ezê jê ra pirsekê bibêjim, egerko qebûl ne kir, bira te jî ji boyî min bikuje. Sekinî heta padişa vegeriya. Padişa hat û nihêrî ko kes ne hatiye kuştin. Go e ez bigîjim ciyê xwe ezê serê wezîr lêxim. Padişa hat ciyê xwe rûnişt û şand dû wezîr û go: -Min emir kir ko tu pîreka nehîlî bajarê min de, ez hatim min nihêrî ko te kes ne kuştiye, ezê ji boyî wan serê te jêkim. Wezîr hilanî û jê ra got: -Eger ko ti emir bikî pirseke min heye ezê ji te ra bêjim.

-Belê bibêje.

-Bavê min ne hişt ez kesî bikujim. heta min pîreka xwe jî kuşt, bavê min wezîrê bavê te ye. Min bêbextiya wî ne kir. Bavê min go, (Padişa hat pirseka min heye ezê jê rabêjim eger ko qebûl ne kir, bira wê çaxê te bikuje ji dêla wan va). Padişa şand dû bavê wî û anî. Bavê wî hat; padişa hêz da ser xwe û ji ber wî rabû. Wezîrê kal go: -Padişayê min ez xort bûm, emrê min bîst û di sal bûn. Karê min daîm nêçîr û seyd bû. Ez pir jî pehlewanekî baş bûm. Hesp, gurz û şûrê min mikemel bûn. Rokê ez li diharekê bûm, riyek di ber min re dihat û diçû. Mi jî xwe da bû ser rê û lê dinhêrî. Mi dî siwarek hat; hespê wî reş, cilê wî reş gurz û şûrê wî jî reş. Sazê wî devê wî da ye, nigê xwe avêtiye ser sûyê (stoyê) hespê xwe û li sazê xwe dixe û di ber mi ra derbas bû. Deyn ne kir û ne ştexilî, ne sebaxêrê di mi da. ez dilê xwe da pir qehirîm, mi go: (ez filankes bim ew bê sebaxêrê di ber mi ra derbas bibe). Min gurzê xwe hilanî û di destê xwe da ediland. Mi ji par ra serî da ser, mi nêzîkî lê kir û mi tu deng lê ne kir; ez ji par ra gihiştim-ê û min gurzek lêxist. Ne deyn kir, ne li mi zivirî, li sazê xwe xist û çû. Ez caedin ji par ra gihaştim-ê, mi gurzek dî lêxist. Li mi zivirî destek xwe avêt mi, ez hilanîm, li bi (bin) hêta xwe danîm. Hespê mi jî avêt yerdaxa xwe, pir, hindik, ez di bin hêta wî da mam. Mi pir kir qîrîn û fîzar. Mi go: (ji boyî xwedê, ez di bin hêta te de mirim; tiwê min berdî ezê ji te ra bibim xulam, heta tu sax bî ez terka te êdî nakim). Ez hilanîm û dam ser hespê mi, gurz û şûrê mi da destê mi,

go: Ez kû da biçim tu bide dû min, îşê min xeber nedî, xeber bidî ezê te bikujim. Ew çû mi da dû, nîvê şevê em gihîştin ber qesrekê; ew peya bû, serê hespê xwe da destê min, hilanî û ji min ra go: -Kuro ezê herim vê qesrê, ege heya du saeta ez hatim. ez hatim. Ez ne hatim, hespê min, bi terkiya min, xurca mi tijî zêr e; hilîn û ji xwe ra be, here.

Mi dî destê xwe avêt heqîba xwe, baqek sîngê hesinî jê deranîn û da ber qesrê. Yeko yeko ew kutan, pê da hilkişiya û çû. Pir çû, hindik çû, mi dî di qesrê da bû fîzar û gazî.

Qederê saetekê dewam kir wilo. Paşê mi dî go: (bigre). Weqta ko avêt mi girt, mi lê nihêrî ko heft serê merifan in. Ew bi xwe ji qesrê da peyayî erdê bû û ji mi ra go: Kuro siwar be, van seriya bigir ber xwe, bû sibe. Em çûn ser tirbeke nû. Ew peya bû û tirb veda, heya gihand ser merzel û devê xwe xist tirbê û kir gazî, go: mi heyfa te stand. mi heyfa te stand û zivirî ji mi ra go: tirbekê ji mi ra vede, mi jî ji tirsa, jê ra veda. Mi dî şûrê xwe deranî û kir ko xwe bikuje. Qêrîn ji min hat û mi xwe avêt ser dest û nigê wî, mi go: Ji boyî xwedê tiwê mesela xwe ji mi ra bibêjî. Hilanî û ji mi ra go: ez qîzek im, ev tirba han mêrê min bû, ev heft seriyê han pismamê mi bûn, dilê wa bi mi da hebû, mi ew ne distendin, rabûn lêxistin mêrê min kuştin. Mi jî wehd kir ko heya ez heyfa wî nestînim ezê wilo li dinyayê bigerim. Mi îro heyfa wî bi destê xwe hilanî, ez jî xwe bikujim; ko di pey wî ra tu mêra nekim û xwe kuşt.

Padişayê min jin jî hene, jinkok jî hene. Di nav bajarê te da nêzikî nîv lek jin hene. Qenc jî tê da hene, xirab jî tê da hene. Padişa jî rabû, wezîrê xwe efiw kir.

### 1.2.3. Ûsifê Tembûrvan

Hebû û sê lawên xwe. Hakim ji rojek ji rojan xwe fikirî û got: “Ez pîr bûme û lawên xwe min ne cerbandine, bi kêr tên na yîn.”

Rojekê ban lawê xwe ê mezin kir, jê re got: “Lawo, eger ez mirim, piştî ko ez bimirim tu birayê mezin î, tu ê bibî hakim li ser bajêr tu ê çi edaletê bimeşînî?” Lawê wîna jê re got: “Ko heçî tadayîya li min bike, ezê tadayiya lê bikim, heçî qencî bi min bike, ez qenciya pê bikim.”

Hakim jê re got: “Here!” Û bana lawê xwe ê navê kir. Ev xeber jê re got. Ewe jî wek brayê xwe ê mezin lê vegerand.

Hakim bana lawê xwe ê biçûk kir. Navê wî Ûsif e. Ev xeber jê re got, Ûsif li bavê xwe vegerand: “Heçî xerabiyê bi min bike, ez, qenciyê pê bikim, heçî qenciyê bi min bike, ezê sê qenciya pê bikim. Heger ez herim qehwa, ezê xesareta ehlê qehwa hemû bidim.

Bavê wî destê xwe li pişya wîna xist û jê dilxweş bû û jê re got: “Sibehê ez dixwazim ez û tu herine seyranê.” Sibehê her yekî hespek ji xwe re derxist ji tewlê. Hakim û lawê xwe Ûsif bi çolê de meşiyan.

Ji sibehê heyanî êvarê meşiyan. Ûsif ji bavê xwe re got: “Tu dixwazî me bibî kî derê? Bavê wîna jê re got: “Em va gihane qonaxa xwe.” Nêzîkî qesrekê bûn; gihane ber qesrê. Hakim giha ber dîwarê qesrê û ji qesrê re got: “Derî veke.” Derîk ji qesrê vebû, çûn hinduroyê hewşê. Ûsif nêrî ko hewşa qesrê bi zîv resif kiriye, sola xwe ji lingê xwe kir.  Bavê wî lê nêrî ko sola ji lingê xwe dike, jê re got: “Çima tu sola xwe ji lingê xwe dikî?” Got: “Yabo, eybe ji me re ko em bi qonderê pê li zîv bikin. Bavê wî jê dilxweş bû, kêfa wî gelek hat, çû hunduroyê qesrê. Nêrî ko du text têde danîne, her yekî ji wan li ser textekî rûniştin, nêrîn ku şîva wan hate ber wan. Kesî di qesrê de nabînin. Ûsif ma ecêbmayî.

Wê şevê razan. Sibehê hakim ji Ûsif re got:

-Tu çi bixwazî ji dinyayê, ev qesir ji te re hazir bike. De rabe, emê îcare herine mal.

Nêrîn ko hespên wan şidandî hazir bûn. Li hespên xwe siwar bûn, hakim ji qesrê re got:

-Ya bimbarek, nefsa me ez bêm, derî ji min re vemeke! Heya ko ne ev lavê min Ûsif be, derî ji tu kesî re vemeke.

Hatine mal. Çend rojeke man, hakim  nexweş ket, ji meclisa xwe re got:

-Heger ez mirim, lawê min yek ji malê mahrûm e.

Çend rojan ma, hakim mir. Piştî ko mir, lawê di wîna bi hev du nekirin, her yek ji wan ji hev re dibêje: “Tu mehrûm î.” Kes ji wan nizane kî mehrûm e.

Yekî ixtiyar di meclisa wan de heye, ji wan re got:

Ev îş kesek nikare safî bike ji xeyrî Zerîfa keşika şêxê Ereban. Gihan mala şêx, li bin konê wî rûniştin. Piştî sê rojan ji wan re got:

-Hon bi çi îşî hatine?

Hevala xwe jê re gotin. Şêx ban qîza xwe kir û mesele jê re got. Keçikê got:

-Ev îşê min e!

Keçikê ban birayê mezin kir, jê re got:

-Ez qîz bûm, di mala bavê xwe de bûm, lawê apê min heye, ez dixwestim, bavê min ez ne didamê ye, dilê min zehf li cem wîna bû û ê wîna jî li cem min bû. Rojekê yekî tacîr hat bin konê bavê min û ez xwestim ji bavê min. Xurcikek zêran ji bavê min re vala kir û di wê şevê de ez siwar kirim û ez birim gundê xwe. Mehra min birî û ez xistim odekê. Êvarê hat odê cem min, nêrî ko ez digirîm. Ji min re got: “Çima tu digirî? Tu ji min çêtir î, eger tu poşman bûyî, ezê te bibim mala bavê te.” Min jê re got: “Ez ne poşman im, feqet dilê min bi halê lawê apê min dişewite; ko xebera wî çêbibe ko te ez xwestime û birime, wê xwe bikuje!”

Gava ko ev xeber bihîst û tacîr ji min re got: “ Tu li min heram bî û li lawê apê xwe helal bî! Ew pereyên ko min da bavê te, qelenê lawê apê te-hesabekî min tu ji wî re anî. Here cem lawê apê xwe!” Ko bi min re hat heyanî nîzîkî gund û vegeriya, çû. Ez hatim mala apê xwe. Gava lawê apê min ez dîtim, kêfa wî pir hat û ji min re got: “Madem ê tacîr wilo şîr helal e, tu jî li min heram bî, here vegere cem ê tacîr!” Ez çûm cem ê tacîr.

Heke tu ê tacîr bûna, te xurcika zêran bi min bidana, te ê ji nû ve ez vegerandama, ji lawê apê min re?

Kurê hakim jê re got:

-Erê, ma însanetî me maye? Got; “Tu here!” - Ban birayê wîna ê navê kir û jê re got:

-Heke tu lawê apê min bûna û ez wilo bihatama cem te, te ê cardî ez bibirama ji ê tacîr re? Got:

-Êrê, qencî qenciyê nas dike! Keçikê ji wî re jî got:

-Tu here. - Ban ê biçûk kir, Ûsif û ev xeber hemîjê re got. Got:

-Heke tu ê tacîr an wek lawê apê min bûna, ez a wilo xweşik bi destê te kevim, te ê ez berdama? Ûsif jê re got:

-Na, çawan dilê min li te hebe û ez berdim, ezê xwe bidime kuştin û ez nahêlim tu ji cem min herî!

Keçikê got:

-Baş e. -Bana her du birayên wîna kir û ji wan re got:

-Birayê xwe ê biçûk mehrûm e ji malê!

Her sê lawên hakim vegeriyan, hatin mala xwe. Du sê rojan man, birayên xwe bi der ker kirin ji mal. Qesir bi bîra Ûsif re hatiye;

Ji xwe re di nav bajêr parsê dike. Gelekî perîşan bû. Çi mala ko diçiyê, jê re dibêjin: “Here, heger tu baş bûna, birayên te tu bi der ne dikirin.”

Rojekê li ber dîwarekî rûniştiye û bi halê xwe de digirî. Qesra wîna hat bîra wî; rabû ser xwe û ji bajêr bi der ket heyanî êvarê gihaşt qesrê. Ji qesrê re got:

-Ya bimbarek, derî veke!

-Derî jê re vebû, çû hinduro. Nêrî ko va hemam germ e, av sabûn hazir e; xwe şûşt. Nêrî ko bedlek cilê milûkî hazir bû jê re. Cilê xwe li xwe kir. Hat, nêrî ko textek hazir e; li ser textê xwe rûnişt. Şîva wîna hat ber wî, şîva xwe xwar û serê xwe danî û raza. Sê rojan di vê kêfê de ma. Piştî sê rojan ji xwe re got; “Ezê rabim, herim ber

birayên xwe de!” Nêrî ko hespek jê re hazir bû, zihn û gemê wêna hemî zêr in. Bi ser pişta hespê ket û berê xwe da bajêr.

Her du birayên wîna jî poşman b»ne û digirin û dibêjin: “Çawan me birayê xwe bi der kir? Bîst xulam li mala me hene, ew jî weke wana bûna û eyb e ji me re ko birayê me parsê dike.” Li birayê xwe dipirsin, salixî wîna hilnanîn. Ew dibê qey hina kuştiye. Dûrbînên wana li ber çavên wîna ne, li ser riyan digêrin. Carekî nêrîn ko siwarek ji wê ve tê. Şewq ji wî siwarî diçe. Ewana got:

-Qey belkî siltan hatiye bajarê wan!

Her du lawên hêkim pêrî wî siwarî ve diçûn, serê hespê wîna gitin û anîn. Banî xistin jorr, hespa wî kişandin tewlê. Her du lawên hêkîm lê dinêrin û digirîn. Ûsif ji wan re got:

-Çima hin digirîn? – Jê re gotin:

-Birakî me hebû, bavê me ew ji malê mehrûm kiri bû û me ew bi der kir û em poşman bûne û em lê digerin. Em wîna nabînin.  Tu di şiklî wîna de yî. Me li te nêrî, birayê me hat bîra me û em giriyan. Ûsif ji wan re got:

-Heger hon birayê xwe bibînin, hon nas nakin? –Gotin:

-Belê, heger tu niha ne di vî şiklî de bûna, minê bigota tu î. Ji wan re got:

-Ez brayê we me!

Kêfa wan pir hat û jê re gotin:-

-Ya birayê me, ev mal ji te re ji kû hat? –Ûsif ji wan re got:

-Ez di nav bajêr de bûm, min ji xwe re pars dikir. Yekî cuhî ji min re got: “Were cem min bişixile!” Ez pê re çûm. Min nêrî ko malê wî zehf e û min ê cuhî kuşt û ez di mala wî de rûniştim.

Her du birayên wî jê re gotin.

-Lazim emê sibehê herin, li mala te bifericin.

Sibehê her sê rabûn, li hespên xwe siwar bûn û berê xwe dan qesrê û meşiyan. Heyanî êvarê meşiyan, gihane ber qesrê, nêrîn ko derî di kesrê de vebû ji keviran. Gava her du birayên wîna din ko hewşa qesrê timam zîv e, nêrîn ko sê text ji wan re hazir bûne; şîva her siyan her yekê bi tenê, hat ber wan.

Her du birayên wîna mane acêbmayî û ji hev re gotin:

-Lazim e, sibehê em wîna bi xwe re bibine çolê û em bikujin û em vê qesirê ji xwe re bihêlin. Ev qesir ji bajarê me hemî çêtir e.

Sibehê ji birayê xwe ê biêûk re gotin:

-Emdixwazin herin nêçîrê.

Birayê wan got: -Bila be!

-Her sê siwar bûne hespên xwe û meşiyane heyanî êvarê. Rastî şikeftekê hatin. Her du birayên mezin gotin:

-Emê îşev di şikeftê de razin! –Ûsif ji wan re got:

-Hon bi ya min dikin, em di şikeftê de ranazin.

Her duya got:

-Belê emê razin. –Û di dilê wan de ko birayê xwe Ûsif bikujin di şikeftê de.

Her diwa a xwe kiriye yek û bihirtin hindurê şikeftê Ûsif bi wan re. Carekê nêrîn ko derê şikeftê li wan hate girtin. Nêrîn ko hûtek di devê derî de ye. Ûsif şûrê xwe kişand û çûye, bi şûrê xwe li wî hûtî dixîne, çiqa lê dixîne, tiştekî pê nabe.

Hût ji wan re got:

Ez Canpola me! Ji niha heta sed salî hon li min xînin, tu tadayî bi min nabe. Şertekî min heye, heke hon bikin, xelas bin, heger hon nekin, honê bimînin di şikeftê de heyanî ko hon bimirin. Birayê mezin got:

-Şertê xwe ji me re bêje!

Hût got:

Şertê min, ez, lingê xwe ji hev bikim, honê di nav lingê min re derbaz bibin, herin ji der ve.

Birayê mezin got: -Ez hatim. -Hût lingên xwe ji hev kir û birayê mezin di nav lingên wî re derbas bû. Hût çirek mîz bi pişta wî re berda, heft destê goşt ji laşê wî hiland. Heft parsû di laşê wî de şikenanadin, heft rihê mêraniyê ji pişta wî qetandin, mala wî xira kirin.

Di fikira birayê navê de ko birayê wî ê mezin xelas bû, ewî jî got:

-Ez hatim. -Hût çirek mîz bi wî de jî berda. Ew jî ket halê birayê xwe, her du ji derve li hevdu rast hatin, hevdu nas nekirin tiştê ko bi serê wan hatiye.

Birayê biçûk Ûsif di şikeftê de maye, şûr, xwe dileyîzîne û li hût dixîne:

-Dibe bela, ez bimirim di şikeftê de û ez di nav lingên te re derbas nabim.

Hût jê re got:

-Tu xortekî delal î, çi heqê te heye ko tu xwe di şikeftê de bimirî? Şertekî min ê di heye, heger tu bikî, tu ê xelas bibî.

Ûsif jê re got:

-Şertê te ê din çi ye?

Hûtê jê re got:

-Şertê min ê dî Gulbarş keçika mîrê Cinan. Tu yê ji min re bînî, tu yê soz bidî, ezê te xelas kim. -Ûsif jê re got:

-Baş e, hidûdên mîrê Cinan pêş min bike!

-Baş e, were bi dû min be!

Canpola pê re çû heta hidûdên Cinan û jê re got: “Ji vir û wilo de ez nema karim bêm, de Xwedê bi te re be!

Ûsifê tenbûrvan, tenbûra wîna pê re ye, çil têl li ser tenbûra wîna heye, her teleke çil hawî heye, dengê wîna zehf xweş . Meşiya û di nav bajarê Cinan de; li ber dîwarekî rûnişt, tenbûra xwe li ser çonga xwe danî û lê dixîne û delalê xwe di ber re dibêje. Ehlê bajêr heçî dengê wîna dibihîse, dev ji kar û xebata xwe berdide û tê lê diferice. Di wî hewayî de du sê rojan ma. Xeber ji mîrê Cinan re çû û jê re gotin:

-Delo Eliyek hatiye vî bajarî û ehlê bajêr dûk û dikanên xwe gitine û şuxlê xwe hemî betal kirine û li wî Delo Elî difericin. Mîrê Cinan got:

Ez dixwazim Delo Elî bê cem min, ev tiştê wiha xweş lazim e em jî bibînin.

Yekî ji xulamê xwe şand dü Delo Elî û jê re got:

-Rabe, mîrê me te dixwaze!

Ûsif rabû ser xwe û bi xulam, mîr re hat dîwanê. Tenbûra xwe li çonga xwe danî û bi wî dengê xwe ê xweş bi tenbûra xwe re got. Adeta mîr heye, ew di qesrekê de ye, jina wî di qesrekê de ye û keçika wîna di qesrekê de ye. Heyanî ko her sê bi hev re taştî  û firavîn û şîv bixwin, bê hevdu tiştekî naxwin. Ewê rojê mîr xwe ji bîra kir heya êvar, ne xwarin û ne jî jina wî û ne qîza wî ne hatin bîra wî, Jina mîr ji cêriya xwe re got:

Rabe here, bê çi hewal, mîr e, em birçî bûne.

Cêriya wî rabû çû, hate dîwana mîr û nêrî ko tiştekî ecêb di dîwanê de ye. Cêriyê ji xwe re got:

-Mîrê me rokê xwe ji bîra kiriye. Heger ev Delo Elî bê cem xatûna min, wê ew sê rojan xwe ji bîra bike.

Bi sûnda cêrî vegeriya xatûnê, jê re got:

-Ya xatûna min, tiştekî ecêb min di meclisê de dît! Û jê re qala deng û tembûra Delo Elî kirîye. Xatûnê gotê:

-De here, bila bê cem me jî! Ma kêf ji mîr re divê, ji me re navê?

Cêrî çû ji mîr re got. Mîr got: -Baş e. –Ji Delo Elî re got:

-Rabe here aliyê malê cem xatûnan!

Delo Elî rabû hate cem xatûnê. Rojekê li cem wê jî ma, qîza wêna du rojan bê xwarin maye. Cêriya xwe şand cem diya xwe, got:

-Binêr, bê hewal çi ye!

Cêriya Gulbarî hat û vegeriya, xeber anî jê re hewala Delo Elî jê re got. Keçikê got:

-Bavê min û diya min pir in û kêf ji wan re divê, ê me, em qîz in, ji me re navê? De here, bila bilezînin û wî bişînin cem min!

Cêrî hat, ji wan re got? Diya keçikê ji Delo Elî re got:

-De rabe, here çem keça me Gulbarîn û kêfê jê re bibuhêre!

Delo Elî rabû û bi cêriyê re hat cem Gulbarînê. Gava çavê Gulbarînê bi Ûsif ket, hiş û aqilê wîna çû û jê re got:

-De rûne, tiştê ko tu lê digeriya û ez lê digeriya Xwedê da me. Çend rojan di wê kêfê de man. Ûsif jê re got:

-Wiha nabe, lazim e ji me re îşekî tu safî bikî: Ez ji bona te hatime vê derê. –Gulbarînê jê re got:

-Bavê min bi qelenan min nade, şertekî wî heye. Gelek mîr û beg û axa hatine min û ev şertê bavê min hilnanîne. Ez newêrim vî şertî ji te re bêjim, ev şert tiştekî zehmet e.

Ûsif jê re got:

-Bêje çi şert e!

Gulbarînê got:

-Hemamek bavê min heye li ber avê, dixwaze wî hemama xwe ave bike. Her sal ave bike. Wextê ko timam dike, teyrik heye, tê baskê xwe li wê hemamê dixîne û ismê sihrê lê dixwîne, hemamê xira dike. Heçî ko karibe wê hemamê bisilimîne, wê min bidiyê û heçî nikare, serê wî jê dikin.

Ûsif got:

-Ez dxwazim herim, vî şertî hilînim.

Gulbarînê jê re got:

-De here, di dîwanê de tu kursî hene, yek zîv e, yek zêr e; heçî xwezgîniyê min e, li ser a zêr rûdinê, heç bê ko ji xwe re tiştekî bixwaze, li ser a zîv rûdinê.

Ûsif rabû, çû dîwanê û li ser kursiya zêr rûnişt. Mîr jê re got:

-Kuro, ev ne cihê te ye. Tu Delo Elî yî. Tu hatiyî, ez tiştekî bidime te. Li ser kursiya dî rûdinî! –Ûsif jê re got:

-Ev cihê min e, ez ji bo xatirê vê kursiyê hatime!

Mîr jê mesela hemamê got, Ûsif got:

-Baş e, ez karim vî şertî hilînim.

Mîr histe berda hemam xwe. Ava kir. Roja ku timam bû, Ûsif çû, li ser pişta hemamê rûnişt, tembûra xwe li ser çoga xwe danî û dengê xwe ê xweş pê re dibêje. Ehlê bajêr ji dora hemamê reviyane û ji xwe re dibêjin: "Wextê teyir bê, wê qî xortî û hemamê berde bi avê de!" Ûsif carekî dî ko teyir hat xwe berda bi ser hemamê de. Dengê Ûsif û tenbûra wî kete guhê teyir. Pir kêfa teyir hat û di ser serê re baskê xwe kir sî û guhadariyê lê dike. Ûsif destê xwe avêt lingê teyir; ji destê Ûsif filitî, tiştek ket dawa wî, nêrî ko hingulîskek e. Çiqa lê dinêre, li wî hingulîskê, tiştê wiha ne dîye.

Xeber bi mîr re çû ko hemama te silimî. Bi def û zirna ve hatin pêşiya Ûsif, li hespekê siwar kirin û anîn dîwanê û gelekê jê dilxweş bûne. Ûsif ji mîr re got:

-Tu li ser soza xwe yî? –Mîr got:

-Belê, kurê min, rabe here cem Gulbarînê; min daayî te, tu dixwazî here, tu dixwazî li cem min bimîne.

Ûsif çû cem Gulbarînê; kêfa wan bi hevdu hat û jê re got:

-Va diyariyek baş, hingulîskek min  ji te re anîye!

Kêfa Gulbarînê hat. Ûsif jê re got:

-De rabe, emê herin!

Her yekê lin hespekê siwar bûn û hatin hidûdê Canpola. Canpola bihna wan kir û hate pêrî wan ve. Li wê derê Ûsif ji Gulbarî re got:

-Hewala min û Canpola ev e: tu ne ji min re yî, tu ji wî re yî. Li wê derê ma'dê keçikê nexweş bû. Dulê wê gelekî bi kul bû. Canpola hat û rahişte keçikê ji ser hespê û bihin kir, xwîna wê hemî ziwa kir. Ji Ûsif re got:

-Here, muhneta sê roja ji te re ye. Piştî sê rojan ez te li kî der bibînim, ezê te bikim ax!

Canpola çû şikefa xwe û Ûsif ma bi dilekî kul. Ji xwe re goncalek kola û xwe tê de vedişêre di miqabilê şikeftê de. Îşê canpola çi ye?  Sibehê derdikeve, diçe nêçîrê û êvarê tê. Wexta ko diçe, Ûsif tê cem Gulbarîn, kêf û heneka xwe dikin heya êvarê û êvarê diçe, di goncala xwe de xwe vedişêre.

Çend rojan di vî hawayî de man. Rojekê Ûsif ji Gulbarîn re got:

-Lazim e tu bi hawakî li rûhê Canpola bipirsî, binêre rûhê wî li kû ye, ko em bikujin, heger ne wilo be, em xelas nabin.

Êvarê Canpola hat. Keçik xwe digerîne, Canpola jê re got:

-Çima tu digirî? -Got:

-Te ez anîme di vê çolê de bitenê te ez danîme. Ne kes heye sebra xwe ez pê bînim. Ez ji dê û bav xwe kut bûme û ez mame ji te re. Ez pir aciz dibim: tiştekî ji min re divê koez sebra xwe pê bînim. –Canpola jê re got: -Te çi divê? -Keçikê jê re got: -Min rûhê te divê. –Canpola keniya û jê re got:

-Rûhê min dûr e, ezê ji te re bêjim; rûhê min di qutikê de ye û ev qutî di kaba xezalekê de ye, ev xezal di dişta heywanan de ye. Kehnîk di wê deştê de heye, çiqa heywanên wê çolê têne ser vê kehniyê avê vedixwin. Ev xezal heya ko heywanek hebe, ew nayê, piştî ko heywanan hemî vexwarin, wê ewê bê ser kehniyê û heger bihna insanan jî bike, wê bireve û ev xezal tu carî namire heyanî ko tîr û kevanek ji sindiyanê başhedadî Dîyarbekirî lê keve. Û ev sindiyan tu carî naşkê ko ne du mu ji riha min di bin de bê şewitandin. Piştre wê bişkê ev sindiyan Îcar, ya Gulbarîn, tu li rûhê min dipirsî kî kare bîne. Gulbarîn got:

-Îcar dilê min rahet bû, gumana min jê qut bû.

Piştî ko Canpola raza, Gulbarîn meqesek anî, çend mû ji nav riha wî qusandin. Sibehê Canpola çû nêçîra xwe. Ûsif hat cem Gulbarîn. Gulbarîn hewal jê re got. Ew çend mûyên riha wî dane Ûsif. Ûsif çû bajarê Dîyarbekirê, çû dikane başhedad, li ber dikana wî sekinî. Başhedad jê re got: -Tu çi dixwazî? –Ûsif jê re got:

-Ez dixwazim tu min li cem xwe bişuxlînî. –Başhedad jê re got:

-Baş e, tuê çi bixwazî ez bidim te roja te? -Ûsif jê re got:

-Ez peran ji te naxwazim, soz tu yê bidî ji min re, heger sindiyanê te şikest, tu yê ji minre tîr û kevanek jê çêkî?

Ê başhedad keniya û got:

-Lawo, ji ji xwe re tiştekî dî bixwaze, sindiyanê min tucar naşkê.

Got:

-Bila qe ez vî şertî bi te re bikim.

Li cem ma heft-heşt rojan. Roja înê bi ser wan de hat, başhedad û Ûsif re got:

-Çavê te li dikanê be, ezê herim limêja înê.

Piştî ko çû, Ûsif ev mûyên di xwe derxistin û di bin sindiyên de şewitandin. Sindiyan teqiya. Di hindurê mizgeftê de dengê wî çû başhedad. Başhedad hat û gelekî xeyîdî û ma'dê wî nexweş bû. Piştî saetkê bihna wî firek bû. Ûsif jê re got:

-Soza xwe bi cih bîne, ji min re tîr û kevanekê çêke!

Başhedad jê re tîr û kevanek çêkir. Ûsif çû deşta heywanan. Li ber kehniyê ji xwe re goncalek çêkir û xwe tê de veşart. Dinya germ bû, nêrî ko heywan sef bi sef hatin ser avê şêr, piling, rovî, gur û

Fîl. Çika heywanên ko hene hatin av vexwarin û çûn. Ûsif nêrî ko xezala wîna ji wê ve tê. Hêdî ji xwe re diçêre û nêzîkî li avê dike. Giha ser avê, bihna însanan kir. Ew xezal reviya, mişwarekî xurt beziya ber bi çolê de. Gelekî tî bûye, carek dî vegeriye, hat û devê xwe xiste avê. Ûsif ji xwe re got:

-Ez vê xezalê li ser avê nakujim, îro nebû sibê. -Piştî ko xezalê av vexwar, ji ser avê bi paş de çû, li xwe fitilî û bi stureyên di xwe dixurîne. Ûsif tîr û kevan berdayê, xezal kuşt, çû lingê wîna şikênand, ev qutî ji qaba wê bi derxist, anî û hate cem Gulbarîn. Qutî vekirin, dîtin ko sê kurmik tê de ne, dido kuştin, ma yek, tayê bi qirika Canpola girt. Hêdî ber bi şikeftê ve tê, ban kir:

-Ez li bextê Xwedê û we me, honê min nekujin! We du kurm kuştin, yekî bihêlinî heyata min winda mekin!

Ûsif dixwest vî kurmê bidiyê, Gulbarîn rahiştiye û perçiqand. Nêrîn ko Canpola di cihê xwe de mir.

Her du hatin, di qesra xwe de man bi dilxweşî. Sibehê Ûsif rabû û çû bajêr, her du birayên wî kuştin û ma hakimê bajêr.

Kurdistan û serê haziran sax be!

### 1.2.4. Dîtinhezar

Ji ber dirêjbûna çîrvanokê me nikaribû ev çîrvanok li vir bida.

### 1.2.5. Manga Bisêr û Keçika Sêwî

Hebû tunebû, li gundekî qîzek û lawikekî sêwî hebûn ku dêya zarokan mir, bavê wan carekê din dizewice. Damariya wan ji zarokan qet hez nedikir, zarokên damarî jî çê bûn û ku mezin bûn jî tim zarokên sêwî dişandin ber dewaran.

Ji bo xwarinê ji herduyan re nanekî garisê yê kilor dikir tûrê wan. Ji zarokên xwe re jî tim xwarinên xweş çêdikir û dixwarin.

Zarokên sêwî diçin çolê dewarên xwe diçêrînin ku nîvro dibe tên bin siya daran, ku xwarina xwe bixwin. Li tûrê xwe mêze dikin. Ka çi bixwin çi nexwin. Di rojên dirêj ên havînê de nanê wanê biçûk qîmê/têrê zarokekî jî nedikir. Keçikê nanê para pir jî dida birayê xwe ku bira têr bixwe lê bira jî têr nedixwar. Keç û bira li çolê tiştên giya miya çi hebû dixwarin, lêbelê tim jî birçî bûn. Rewşa wan wiha dewam dikir.

Rojekê keçik û bira li ber dewaran nanê xwe yê tisî dixwarin. Mêze dikin ku manga wan "uriya uriya" hat cem wan, serê xwe danî ber wan, ji aliyê Xwedê ve qapaxa serê wê rabû, gelek tiştên xwarinên bi tehm tê de hebûn. Zarok tirsiyan û bi paş ve vekişiyan, mangê got:

-Ji min netirsin, ez ji bona we hatime ku hûn van xwarinên di serê min de henin bixwin.

-Ez ê wextê nîvro tim û tim wiha bêm cem we xwarina xwe bixwin lêbelê şertê min heye, bila tu kes pê nizanibe, ku rojekê hebe ku mirov pê hesiyan û goştê min xwarin, hestiyên min neavêjin. Hestiyên min berhev bikin û bibin cihekî têxin bin erdê. Zarokan gotin:

-Erê, em sond dixwin ku ji kesî re jî nebêjin.

Zarokên sêwî keçik û bira tim diçin çolê ber dewaran, her roj wexta ku nîvro dibe manga wan ê zer tê ber wan, xwarina nîvroyê dixwin. Zarok roj bi roj xurt û qelew dibûn.

Damariya wan mêze dike ku çi qas serê sibê nan dike tûrê wan, êvar dibe tên mal ku nan bi wekî xwe ye, qet pariyekî jî nexwarine û nan tim şûnde tê mal. Damarî ji wan dipirse:

-Zarokno! Ez ji we re çiqas nan dikim tûrê we, hûn naxwin! Gelo hûn çi dixwin? Zarokan jî:

-Dayê dilê me naçe nan, em li çolê pincar û tiştan dixwin.

Çend roj diçin. Damariya wan mêze dike ku nanê ku ji wana re amade kiriye qet zarok naxwin jî dîsa xurt in û qelew in, mirov qêmîş nabe ku li wan zarokan mêze bike. Kîlo digirin û rind dibin, lê zarokên wê jî tim zeîf û lawaz in. Guman ji zarokan digire. Ka ev zarokan çi karî dikin û çi dixwin li çol û beriyê. Ji zarokên sêwî re:

-Hûn gelek sal û roj diçin ber dewaran bila birakê we jî sibê bi we re were ber dewaran.

Damarî paşê ji kurê xwe re bi dizî dibêje:

-Sibê tu jî bi van zarokan re here ber dewaran li çolê zarok çi dikin, çi dixwin, êvarê were ji min re bibêje. Sibe dibe dewaran derdixe, taştiyê hazir dike dide ber zarokan. Zarok tev taştiya xwe dixwin, dewarên xwe digirin û diçin beriyê, ber dewaran.

Zarok li beriyê dewarên xwe diçêrînin, dem nîvro dibe zarok dewarên xwe digrin û diçin bin siya darê, bîstekî diçe, lawikê damarî mêze dike ku manga wan “uriya” hat ber zarokên sêwî hewiya û mexel hat, qapaxa serê mangê rabû, çi tehm û xwarin hene tê de hene. Zarokan ew xwarinên ku çi dilê wan diçûyê digirin, paşê jî dîsa qapaxa serê mangê tê girtin û mange diçe. Keçik bangê birayê damariyê jî dike ser sofrê tev dixwin û têr dixwin. Keçik jî birayê xwe yê damarî re:

-Tu vê bûyerê neçî mal qe nebêjî! Ku tu bibêjî ez nahêlim êdî tu bi me re werî çolê û tu yê ji van xwarinên bi tehm bimînî. Ku tu nebêjî tu yê tim bi me re werî çolê.

Birayê damarî jî dibêje:

-Na, ez nabêjim.

Dibe êvar, zarokan dewarên xwe kom kirin û ketin rêya mal. Diçin mal şîva xwe dixwin, herkes diçe cihekî rûdine, keçik û birayê xwe jî tên cem hev rûdinin, gavek diçe damarî bangê zarokê xwe dike, dibe cihê xewle dibêje:

-We îro çi xwar û we çi kir? Kurê jinê ewil deng nake û naxwaze bibêje. Dêya wî zorê didiyê, kurê jinikê:

-Dayê wele me xwarinên pir xweş xwarin. Dêya lawik:

-We çi xwar îro û kî da we?

Kurê jinikê:

-Dayê kesî neda me, nîvro manga me ya zer hat ber me hewiya, qapaxa serê mangê vebû tê de çi bixwestana hebûn, xwişka min çi xwest girt danî ser sofrê, qapaxa serê mangê hat girtin û mange çû. Me jî xwarinên wê xwarin.

Dêya lawik dibêje:

-Baş e, loma ez ji wan re nan dadigirim nan naxwin û tim qelew dibin. Jinik dibêje:

-Ez jî herim cem mangê ka mange ji min re jî qapaxa serê xwe venake ku ez jî bixwim û ji te re bînim.

Jinik diçe ber mangê, destê xwe li serê wê dide, ji mangê hez dike nake qapaxa serê xwe jê re venake, diqehire, xwe bi xwe “çima ji zarokan re vedike lê ji min re venake serê xwe!” Jinik pir hêrs dibe û tîne serê mangê jêdike goştê wê hûr dike û dike beroşê dide ser ar/agir dikelîne goşt dike feraxan tîne ser sifrê, dibêje:

-Zarokno, werin em goşt bixwin.

Ji aliyê Xwedê Teala ve goşt ji jin û zarokên wê re tehl dibe, lê ji zarokên sêwî re ne tehl bû.

Zarok û dê tev dest bi xwarinê dikin. Kurê jinê mêze dike ku goştê mangê pir tehl e mîna jehr e, kurê wê:

-Dayê çiqas tehl e, ez vê goştî naxwim. Zarokên sêwî jî xwarina xwe dewam dikin "tehlbûn" ji wan re belî nake.

Jinik ji zarokê sêwî re:

-Goşt pir tehl e, hûn jî nexwin pir tehl e, ka tê xwarin ku hûn dixwin? Zarokên sêwî:

-Tiştek nabe, em dixwin.

Damarî:

-Ez ê vî goştê birijînim.

Zarokên sêwî herdu jî:

-Na, dayê vî goştê nerijîne, em ê bixwin, heyf e, bila qe tehl be. Damariya wan:

-Baş e, bixwin.

Zarok goştê xwe dixwin têr dibin. Damarî goşt û hestiyan tev top dike ji malê gelek dûr dirijîne û tê mal. Zarok jî sibê zû diçin wê derê, goşt û hestiyên mangê berhev dikin, li cihekî pak erdê dikolin hestî û goşt dikin çalê, axê dikin ser hestiyan, keviran didin ser hev û quçê li ser çêdikin.

Gelek dem diçe herdu zarokên sêwî ji hev re dibêjin:

-Me hestiyên manga xwe kiribûn binê erdê, em herin mêze bikin ka çi bûye? Zarok diçin ber quçê, axê li ser hestiyan davêjin mêze dikin ku tiştek li hestiyan nebûye, çal tijî zêr, zîv, morî, sol û kincên hevreşîm in, ku çi bixwazin heye, li gorî herduyan jî tê de her tişt heye. Zarok kinc û solên xweş li xwe dikin, morî, zêran dikin stû û destê xwe kêf dikin, tên mal.

Damarî mêze dike ku zarokên sêwî kinc li xwe kirine û solên xweş li piyên xwe kirine, moriyên xweş kirine dest û stûyên xwe, pir zora damariyê diçe, li zarokên xwe mêze dike û li wan mêze dike gelek zora wê diçe. Ji zarokên sêwî re:

-Ka werin cem min zarokno! We ev tiştên xweş ji ku anîne, kî dane we?

Zarok dibêjin:

-Li kûçê, kalekî bi rîspî bi xêra xwe da me. Jinik zêrên mezin ji wan digire yên din dide wan. Zarok kêf dikin li dora malê digerin, dileyîzin, kêfa damariyê tev nayê, dixwaze ku zarok kêfê nekin, bangê keçikê dike, keçik tê mal, damarî:

-Satilan bigire zû here ji bîrê avê bîne.

Keçik satilên xwe digire û diçe, solê xwe yê zêrîn jî pê kiriye û kêf kêfa wê ye. Keçik diçe ser bîrê satilê bera bîrê dide ku satilê bikşîne, solê/pêlav bi zêr ferek dikeve bîrê, sol diçe binê bîrê. Keçik ‘ewil ber sola xwe dikeve lê paşê xemgîn nabe dibêje “tiştek nabe, solên min pirr in, ezê herim carek din jî bînim.” Keçik satilên xwe tijî av dike û dibe mal.

Wê rojê jî dîlanek mezin çêdibe, xort û keçikên wê derê bi kincên xweş xwe xemilandine û baz didin, lawê padîşah jî bajêr hatiye gund, li ber wan de diçe hespê xwe dibezîne tê ser bîrê ku hespa xwe av bide, tê ser bîrê li binê bîrê mêze dike ku tiştek di binê bîrê de dibiriqe, diçe binê bîrê çoyê xwe pêdixe, mêze dike ku ferekî sola zêr e, derdixe û dibe dawetê, xeberê dide mirovan, dibêje:

-Min ferek sola zêr dîtiye, ji nigê/ling kê re dibe bila were cem min.

Keçên wê derê tev tên, solê dikin nigê xwe qet ji yekî re nabe, yan teng e yan jî fireh e. Lawikê padîşah:

-Li gund kesek ma yan na? Kî ku maye bila ew jî were.

Keçên wê derê dibêjin:

-Kesek nemaye li gund.

Yek di nav keçan de:

-Wele keçikekî sêwî nehatiye, ew keçik jî pir pîs e, ji tiştekî re nabe, qet bangê wê neke.

Lawê padişah:

-Na, ka herin bangî wê jî bikin, bila were, kesek nemîne.

Diçin bangî wê jî dikin. Keçik tê, lawê padîşah li keçikê mêze dike ku keçikek wiha rind e, bejn dirêj û xweşik e. Tê cem lawê padişah, solê dixe nigê xwe, çer solê dixe nigê xwe, li nigê wê tê.

Keçik li xweşa lawê padîşah diçe û dilê wî dikeve keçikê. Ji xwe re dibêje "ev keçik tam layiqê min e, a ku min ji dil dixwest ev e." Keçikê vedixwîne mala xwe, xeberê dide damarî û bavê keçikê tên mala padîşah hevûdu nas dikin. Paşê jî padîşah û malbata xwe diçin mala keçikê ji dê û bavê keçikê dixwazin, nîşan dikin. Keçik û lawik ji hev razî ne, lêbelê bê dilê damariyê bû.

Hefteyek din dîlanek mezin li gund çêdikin, destê zava û bûkê hene dikin, keçikê dikin bûk mara wan dibirin, heta çend rojan daweta wan dewam dike. Damariya keçikê diqehire dibêje "çima qîza min negirtiye ev keçika pîs girtiye?"

Gelek dem diçe, nêzîkê salekê kurê keçikê jî çêdibe, ew û mêrê xwe bi kêfxweş in, qet pirsgirêkên wan tunene, keçik jî qet nare/naçe mala bavê xwe. Damariya keçikê tê mala padîşah ji lawik re:

-Salek e ku keça min nehatiye mal, ez hatime keçika xwe carekî bibim malê.

Lawê padîşah:

-Dibe, bila jinik bi we re were mal. Damarî, keçik û kurê wê bi hev re dibe malê. Damariyê ji keçik û kurê wê qet hez nedikir, lêbelê bi wan nade der, li pêş wan tim xwe şîrîn dikir. Çend rojan li mal dimîne. Roja ku mêrê wê were, damarî dixwaze ku planekê çêbike, dibêje:

-Keça min, ka ez serê te bişom.

-Îro dê mêrê te were tu yê herî mal, ka ez carekî serê te û yê kurê te bişom. Keçik:

-Baş e, dibêje.

Damarî tîne serê kurê wê xweşik dişo, ziwa dike, kincê wî lê dike dide ser mînderê. Ji keçikê re:

-Ka were keçika min, serê te jî bişom. Keçik dikeve teştê, serê wê sawûn dike, di kefê de dihêle; şûjînê jî li ber xwe bi hêdî derdixe û di serê keçikê re dike. Keçik jî dibe kevok û difire, û wiha diçe. Ji keçika xwe re:

-Keçika min tu jî zû were? Serê xwe bişo, porê xwe şeh bike û xwe xweş bike, kincên keçikê jî li xwe bike ku tu bibe jina lawê padîşah, ku ew keçika kêf bike û têkeve rehetiyê, tu kêfê bike. Keçik dibêje:

-Baş e, dayê

Mêrê keçikê tê mala xezûrê xwe, rûdine li kurê xwe mêze dike ku kurê wî bi giriyê sor û mor bû ye, kurê xwe dike hemêza xwe, ji damariyê re dibêje:

-Çima ev zarok pir digirî? Jinik jî:

-Wele tim wiha digirî, nizanim ku ji çi ye? Nexweş e an zikê wî diêşê nizanim. Mêrik li baldûza xwe mêze dike dibêje qey jina wî ye, dibêje:

-Lê tu çi qas reş bûyî?

Keçik dengê xwe nake, dêya keçikê qisên zavê dibire:

-Keçika min hewqas kar kiriye, li ber rojê geriya ye loma reş bûye. Lawê padîşah xatir dixwaze, jin û kurê xwe digire, dêya keçikê wan bi rê dike û diçe mala xwe.

Keçika ku bûye kevok tim li ser daran digere. Rojekê cotkarek ji gundiyên wan tê nêzîkî darê, erdê xwe cot dike, erd dajo; kevok li ser darê bangê cotkar dike:

-Lo cotkaro, lo cotkaro! Te Mihemedê min nediye lawo?... Cotkar diçe mêze dike ku tiştek tuneye, çi qas cotkar tê ser erdê xwe cot dike wext ku dibe nîvro, kevok tim tê ser darê bang dike. Cotkar jî diçe mêze dike ku li ser darê û bin darê tiştek tuneye. Cotkar çi qas tê ser erd bi vî dengî dibihîze. Rojekê cotkar dibêje "ev deng tim û tim tê nizanim ku çi mesele ye? Îla tiştek tê de heye" cotê xwe dike, hêvar dibe diçe mal. Ga û nîrî xwe datîne mal dibêje: "Ez herim bajêr mala lawê padîşah, ew mezin û zavayê me ye, ku fermanekî bide tenê ew dikare hal bike?"

Cotkar diçe mala lawî padîşah jê re dibêje:

-Ez çiqas derim cot, dengek li ser darê tê tim û tim dibêje "Lo cotkaro! Lo cotkaro! Te Mihemedê min nediye, lawo?" Ez derim mêze dikim ku tew tiştek tuneye. Ez şaş bûme û nizanim ku çi ye, çi mesele ye?

Roja din serê sibê lawê padîşah û cotkar bi hev re tên gund, diçin nav erd, lawê padişah li wêrê rûdine, cotkar jî dest bi cotê xwe dike, çer wexta wî demê hat kevok tê ser darê vedine û dibêje:

-Lo cotkaro! Lo cotkaro!.. Te Mihemedê min nediye, lawo? Çer ew deng tê lawê padîşah dibeze diçe binê darê, Lawê Padîşah diçe bin darê li dora xwe mêze dike ku tu tiştek tuneye, bang dike:

-Tu kî yî? Mihemed ez im, were xwarê? Kevok jî mêzedike ku dengê Mihemedê wê ye û nas dike, xwe bera xwarê dide.

Mihemed jî mêze dike ku kevok e, kevokê digire, destê xwe li serê kevokê dide, jê hez dike, mêze dike ku şûjin di serê wê de heye. Şûjinê derdixe kevok jî di carekî de dibe keçik û keçik rût dibe, mêze dike ku jina wî ye, mêrik dibêje:

-Çi bû bi te? Ev çi mesele ye? Jina wî:

-Hal û mesele ev e ku; damariya min dek li serê min çêkir, şûjin di serê min de kir û ez bûm kevok, wiha kir ku qîza xwe bide te.

Mêrik kincê xwe lê dike û dibe mal; kincê jina xwe lê dike, diçe cem jinika din kincên wê jê dike şilf û rût dike, digire dibe mala bavê wê dihêle û ji dêya wê re:

-Ha ji we re keçika we.

Lawê padîşah êdî tê mal. Mêr û keçik digihêjin miradê xwe, vê malbatê bi jiyanek dilxweş jiyana xwe dewam kirin.

### 1.2.6. Serhatîya Mîrê Ereba

Rojekê sê lawka hev girtin, gotin, "Emê herine keleşîê". Ewana hev girtin û çûn. Êvarê çûne mala mîrê erebe. Mîr got:

-Gelî lawka, hûn ê ku de herin?

Gotin: -Emê herine Keleşîê, bona karê,

Mîr got: -Gelî lawkaî werin meçine Keleşîê, hûn gune ne, heyfa min li we te, hûn tu karî ji Keleşîê navînin.

Gotin: -Qe nave, gerekê em herin, ebûra me nave.

Mîr got: -Ez ê herekê we risqekî bidime we, meçin, hûn gune ne.

Gotin: -Nave gerekê em herin.

Mîr got: - Lawkno, rojekê ez û sê hevala va, mîna we em rabûn çûne Keleşîê. Em çûne perrê be'rê ketine gemîê, gemî rê ket. Pir, hindik çû, wextekî orta be'rê da ba li gemîê hat, gemî ji hev bela kir. Hevalê min gemîyê va batmîş bûn. Ez tenê li ser textekî mam. Wextekî texte pir, hindik çû, çû perrê adekê sekinî. Min textê xwe ji avê deranî, danî kêleka qûmê, ez çûme nava adê rûniştim. Min bala xwe daê, ji êmîş pêştir tiştek adê da tunebû. Min hetanî muxdarekî ebûra xwe bi êmîş kir. Wextekî min bala xwe daê, merivê be'rê derdikevin, li ser qûmê dileyîzin. Rojekê ez rabûm, çû – min qûm wê da kir, ez ketime nava qûmê, min xwe veşart. Wextekî min bala xwe daê, merivê be'rê hatin, xwe ra ser qûmê leyîstin. Min hêdîka destê xwe avîtê, yek girt. Min bala xwe daê, eva jinik e. Min jinik girt, anî hate nava adê.

Salek, dudu derbaz bûn. Jinik hemîle derket: du kur anî. Kur mezin bûn. Rojekê jina min min ra got:

-Ez meriva be’rê me, îsal çend sal e tu nahêlî ez bikevime avê.

Min got: -De dilê te dixwaze, rave em herin bikevine avê.

Em çûne kêleka avê. Jinik jî çû kete avê. Wextekî jinikê gote min:

-Kurekî min bide min, em xwe ra tevayî bikevine avê.

Min got: -Tu zanî were bive.

Jinikê hat yek bir,  yek jî ma li bal min. Qasekî sekinî, careke dinê hat, got:

-Kurê minî dinê jî bide min, em têkevine evê, tu çima ditirsî, teze em ê ku da herin?

Ez arxayîn bûm, min herd kur jî danê. Çûn ketine orta avê. Wextekî min bala xwe daê, hersêk jî batmîş bûn: ez mame metel. Rabûm çûm. Min careke dnê textê xwe hilanî avîte be’rê, ez lê siyar bûm. Min got: “Cenimê da, hemîn ez ê li vira bimirim”. Wextekî pir, hindik textê çû, min bala xwe daê, ku textê çû kêleka be’rê ra derket, min texte girt, avît. Ez rabûm çûm. Êvarê çûme gundekî, bûme mêvanê malekê. Wextekî min dîna xwe daê sekî belek hat, ser cî velezya. Min gote jinikê:

-Eva çi se ye?

Jinikê gote min: -Eva se mêrê min e.

Min got: - Çawa mêrê te ye?

Jinikê got: -Lê wextê ku jinê yalê me radizên, kura tînin, se ne, qîza tînin, xwe qîz in.

Êvarê, çaxê razanê, jinikê min ra got:

-Mêrê min divêje, mêvan nave xulam?

Min got: -Ez divime xulam, -ez bûme xulamê malikê.

Wextek kete ortê, min orta xwe û jinikê saz kir, me herda serê xwe kire yek. Jinikê min ra got:

-Were min hilde birevîne.

Ez şevekê rabûm, min jinik hilda revand. Jinikê min ra got:

-Çiyakî wê derê ye, jê ra divêjin çiyayê Xurnîka.

Berbangê hêdî-hêdî sve jêla zelal dibû. Me bala xwe daê jêla êrîşa sa çawa tê. Sê devê-dev, me kirin. Ez revîm, min xwe avîte çiyê. Se ghîştine jinikê. Jinik bela – belayî kirin, para pey min ketin. Hetanî xêlekê hatin, bû kûstakûsta wana. Careke dinê şûn da vegeriyan,çûn. Min berê xwe da welatekî, ez çûm. Çûme nava gundekî, bûme mêvanê malekê. Xudanê malkê min ra got:

-Tu navî gavan?

Min got: - Ez divim gavan, -ez bûme gavanê wî gundî.

Sê-çar meh sekinîn, ez zevicîm. Edetê wana jî wa bû,herkê mêr bimira, jin pê ra saxî dikirin çel. Eger jin bimira, mêrê wê pê ra dikirine çel.

Rojekê êvarê min dewar anî, min bala xwe daê, sê-çar meriva hatin ez girtim birim. Min got:

-Hûn min çima divin?

Wana min ra got: -Jina te mirîye.

Ez birim çûm. Berbangê mehît hildan, ez jî pêra birim: nanê çil rojî dane min. Ez mehît va avîtne mxazekê. Min bala xwe daê hundurê mxazê da nêza-nêza merivê tê, hinek teze dimirin, hinek jî mirine.

Ew du roj bû kurê padşê berî mkin miribû, jina wî jî wî ra avîtibûne mixazê. Ez çûm min jina kurê padşê anî bal xwe. Çendekî em man. Rojekê min bala xwe daê, çawa ne kirte-kirtek nava cendeka da tê. Min terîê da destê xwe gerand, min bala xwe daê, eva r»tik e. Mkn boçka rûvî girt, jina min jî deyla min girt. Rûvî qulekê da çû. Wextekî rûvî cîê zaxekê rav derket. Min bala xwe daê, rê tunene em herin. Bnetera zaxê behr bû, wekî din jî rm tinebû em biçûna. Min rûvî berda. Rûvî xwe ra qapirûka rûyê zindêr ra bezya, çû. Ez jina xwe va mane metel, ber devê qulê man.

Min bala xwe daê, jina min û herd kurê min va orta behrê da serê xwe deranîn. Jina min min ra go:

-Merik, tu deymîşî me navî, emê bên te ji wê tengasîê xilas kin.

Min got: -Jinik, ez ê çima deymîşî we bivim? herkê hûn ê bên –werin. Jina min û her kurê min hatin. Ez jina mi va em hilanîn birin qraxê behrê danîn, xatirê xwe ji me xwestin, careke dinê ketine behrê. Mi jî jina xwe hilanî hatime mal.

Mîr gote wan lawika:

-Werin meçin hûn gune ne, heyfa min gelekî we tê: hûn gune ne, ez ê herekê we çend zêreka bidime we, herine mala xwe, hûn gune ne.

Ewana got: Navê, gerekê em herin, qe nave.

Mîr got: -Gelî lawika, rojekê dîsa ez sê hevala va em rabûn çûne karê. Em çûne nava mêşekî, me bala xwe daê, nava mêşê da dûk quloz dive. Em çûn, me bala xwe daê, eva zaxak e, kerî pezî tê da ye. Em ketine hundurê zaxê. Me lê nihêrî dêwekî korî wê ber balxênîê rûniştîye.

Dêw got: -Ez li erd ezman digeriyam, ancax hûn ketine destê min.

Dêw rabû beraşekî aşa anî, da ber dêrî, em birin bal xwe dane rûniştandinê. Me wextekî bala xwe daê, jineke bedew mile nan anî danî cem wî, çû.

Dêw rabû şîşek anî kire nava êgir, sor kir. Wextekî me bala xwe daê, şîş hilanî jor da da ser zikê hevalekî min. Zikê wî qul bû, hilda kire nava wî nanî, xar. Mame ez tenê. Min got: “mala min şewtî, wê min jî buxe”. Qasekî sekinî şîşa xwe dîsa kire nava êgir, velezya raza.

Min hêdîka şîş hilanî, jor da da ser çavê wî. Min jor da xwe ser şîşê da avît. Min xwe ser şîşê da avît, ew vecêniqî, ez ji vir dera hana avîtim. Ez rabûm revîm, ketime nava pez, dêw sivê rabû beraşa aşa ji ber dêrî hilanî, şeqeke xwe danî valî, yek jî danî walî dêrî. Yeko-yeko pez bin şeqa xwe ra deranî.

Nêrîkî wî hebû: Min dsanî erdê şer jê kir, postê wîya li xwe kir, zengilê nêrî kire hustîyê xwe. Ez hatim bin şeqa wî ra derbaz bûm, min got: “Bir da were”. Ewî para da pey min. Ez revîm çûm binetara zaxekê sekinîm. Min got: “Vir da were”, wekê ku hat, zaxê da ket, ji hev bela-belayî bû. Ez rabûm çûm, min jinik û pêz va anî.

Mîr gote wana:

-Hûn gune ne, meçin, hûn xêrê navînin.

Ewana dîsa got:

-Nave, emê herin, îlaca me nave.

Mîr got: -Geşî lawka, carekê dîsa ez sê hevala va me hev girt, em çîne dizîêç Em çûn-çûne perrm mexberekî. Me bala xwe daê, merivê merzel da gişt hetanîber qirkê erdê da ne, serê wana derva ye. Me lê nhêrî dêwek wa ye, çawa tê, hespekî bozî siyar e, zixdênîke pêra ye, hat. Em hersêk hetanî ber qrikê kirine çel, lê da çû. Zxdênî ma li bal me.Bû êvar. Zxdênîyê hat binetara ningê hevalekî mi da vekola, zikê wî qelişand, dil hinavê wî xar, çû xwe ra velezya. Qasekî dinê hat hevalê minî dinî jî xar. Mem ez tenê.

Westekî min bala xwe daê,  hat binatara ningê min da kola. Min hêdîka devê xwe avîte guhê wê, guhê wê kire devê xwe. Ewê vir da-wê da ba kir, milekî min derket. Min destekî xwe avîte guhê wê, kaş kir anî nêzîkî xwe. Min dora xwe, pê destê xwe xulî danî alîkî, ez hêdî hêdî derketim, min zxsênî kuşt. Min got: “Ez çawa bikim, çawa nekim, dêwê bê min bikuje”? Ez rabûm çûm hilkişîm ser darekê. Min bala xwe daê dmw wa ye, çawa tê. Hat bala xwe daê- zxdênî kuştine. Vir da-wê da geriya hat ser darê ez dîtim, gote min:

-Peya ve!

Min got: -Ez ji te ditirsim, -min gotê da,-ji hespê xwe peya ve, şûrê xwe qaşa zîn da darda ke, paşê ez peya vim.

Ew ji hespê xwe peya bû, çû xêlekê wê da dûr sekinî. Ez ji darê hêdî-hêdî peya bûm, hatim orta darê, nişkê va min banz da ser pişta hespê, min şûrê wî kşand. Şûrek da hustukura wî, serê wî pekand. Ez hespê wî siyar bûm, min serê xwe pê dezmaleke spî girê da, serê hespê berda. Hesp çû êvarê derê mala dêwsekinî: xulama hat ez birim. Çûme odê. Êvarê jinik hat. Min rabû derî dada, min dezmala serê xwe vekir. Min jinikê ra got:

-Jinik, min dêw kuştîye.

Jinikê min ra got: - Ez jî yeke usa Xadê dixwezim, te çawa pêsîra min xilas kir?

Şev ez rabûm min du-sê hesp anîn. Ez jina xwe va lê siyar bûn, hatine mal. Mîr herekê wana risqek danê, ew her sê heval çûne mala xwe. Mîr jî ma mala xwe.

### 1.2.7. Ehmed Çelebî

Carek ji cara rehmet li ser da û babê guhdara... Dibêjin carekê şivanê gundekî û gavanê gundek dîtir gelek dostên hev bûn. Heroj di çolê de digihan hevûdû. Rojekê gavan dît şivan bê kêf e. Gavan got-ê, bira xwedê xêr bikit çi xewin e? Şivan got, min dîtiye ez dirêş kirî bûm; roj li milê min ê rastê bû û hêv li milê min ê çepê bû. Du stêr li ser singê min dileyistin. Gavan got şivan, tu xewina xwe nafiroşî min bi çêleka min. Şivan got, belê min daye te. Êvarê gavan hat mala xwe got gundiya, li gavanekî ji xwe re bigerin, lewre riyek ya min heye ezê biçim. Sibehî rabû çû; berê xwe da oxurê, pişta xwe da felekê. Rojekê dema mexribê çû ber dergehê Diyarbekirê. Dergehvana derî girti bûn. Gavan ma li ber derî, sekinî. Gavan got, ezê ji ber derî biçim li ber sûrehê bisekinim çêtir e.Gavan ber sûrehê ve çû, dît mirovek li wê derê razihaye; hespê wî jî li wê derê. Gavan jî li nik wî rûnişt; hişyar ne kir. Demekê dirêş ma. Dengek ji serê sûrehê seh kir, got, bigre. Gavan rabû girt, dît xurcek tijî zêr in. Got, dane ser hespê, arî min bike, da ezê jî bêm. Gavan arî kir ew jî hat. Ew kî bû. Keça hakimê Diyarbekirê bû. Keçikê got, siwar be; da em biçin. Gavan siwar bû, keçik li pişt xwe siwar kir; çûn. Heta bû roj. Keçikê dît ne mêrikê wê ye. Keçikê got min di xewa xwe de dîtiye ez bûme jina şivanekî; xwedê bike

şivan bê, ne î gavan bê. Paşê, demekê çûn. Keçikê di dilê xwe de got, ezê biceribînim. Keçikê got, xwezî ev mêrg û çimena ha tijî pez biwa, tu li ber biwayî; du sey paş te hebûna. Mêrikî deng ne kir. Jinikê di dilê xwe de got, gavan e, ne şivan e. Paşê, demek dî çûn. Dîsa keçikê got, xwezî ev mêrga ha tijî dewar biwa; tu li ber biwayî, çawan dibû? Gawan got, xwezî gelek qenc dibû. Keçikê zanî gavan e, ne şivan e. Hema dey ne kir. Çûn heta gihan Mûsilê. Xanîk ji xwe re kirê girtin; mehra xwe kirin, rûniştin. Navê gavan Ehmed bû; çelebî li ser zêde kirin, gotin Ehmed Çelebî. Rojek Ehmed Çelebî çû hemamê. Ji hemamê derket zêrek da hemamçî. Hemamçî deriyê hemama xwe girt, çû mala xwe. Jina wî got-ê, tu çire hatî ji hemama xwe? Got, tucar min wek îro kar ne kiriye; yek hatiye zêrek daye min. Piştî du sê rojan Ehmed Çelebî dîsa çû hemamê û zêrek da hemamçî. Hemamçî çû mala xwe, got jina xwe. Jina wî got-ê, ev zilamê ha yan mirovekî zahf ehmeq e, yan mirovekî zehf mezin e. Ezê sibehî taştê jê re çêkim. Tu wî bîne mal da ez wî bibînim. Hemamçî got Ehmed Çelebî, sibehî tu beî mala me taştê. Ewî got, qenc e, lê mirovek yê min heye ezê jê pirs bikim.

Ehmed Çelebî çû ji jina xwe pirs kir. Jina wî got qenc e; here mala wî taştê. Belê tu jî wî dusibehî bîne mala me taştê.

Ehmed Çelebî sibehî çû mala hemamçî taştê. Jina hemamçî taştê anî. Firaxek birinc, hinek nanê genim û firaxek nîsk, hinek nanê ceh. Ehmed Çelebî du kefçik birinc xwarin, hinek nîsk xwar. Jinikê got, Çelebî çima birincê naxwî? Çelebî got, ez ji birincê aciz bûm, yanî jê kerixîme. Jinikê got mirovekî mezin e ne î ehmeq e. Dema Ehmed Çelebî rabû got hemamçî tu jî were mala min taştê. Hemamçî gelek dilxweş bû biçe mala Çelebî bibîne. Dema bû roj, hemamçî çû mala çelebî. Dema çû dergeh, kuçkê çavê wî li jina çelebî ket. Hişê wî çû, qe nikarî rûnit. Jina Çelebî got, tu birayê mêrê min î, an kurmamê wî, tu çira mêrê min dibî taştê. Dest avêt darekî, rabû gelek li hemamçî da. Hemamçî revî çû cem hakim, kir hewar. Got, mal ji min re, jin ji te re. Ji hakim re bi temamî got. Hakim got herin wî bikujin jina wî bo min bînin. Wezîr qebûl ne kir; got hakim, tiştekî jê bixwaze ko nikarît dikit paşê wî bikuje. Hakim Çelebî xwest cem xwe; got, Çelebî min hinek sêvên cenetê ji te divêtin. Eger tu ji min re neyînî ezê te bikujim. Çelebî çiqa hêvî kir hêviya wî ne borî. Çelebî hat cem jinika xwe, xemgîr. Jinikê got, Xuda xêr bikit, çi li te dest da?

Çelebî bo jina xwe temamî got. Jina wî got-ê, here nik hakim bêj-ê mihleta çil rojan bide min, ezê biçim ji te re bînim. Mesrefa min û mala min ji kîsê hemamçî. Çelebî çû cem hakim ev xeber gotin. Hakim got hemamçî zû peran pêk bîne, bibe mala çelebî. Çelebî zivirî hat mala xwe. Jina wî derket ser banî, got: Çelebî were ez bêjim te, jinikê berê xwe da çiyayî û got mêrê xwe; tu wî heşînahiya henê dibînî. Abidek li wê derê heye, ibadet dike û quranê dixwînit. Here cem wî, ewê sêva ji te re peyda bikit. Ehmed Çelebî siwar bû, berê xwe da ewî cihî. Çû li wê derê; abidek dît quranê dixwînê. Gelek abidek ixtiyar e, pîr e. Ehmet Çelebî silam kir, çû destê abid maç kir got-ê: Xuda xêr bikit Ehmed Çelebî, tu ji bo çi hatî? Ehmed Çelebî gotê; ez bi te, tu bi Xudê. Îşê xwe jê re got. Abid got-ê tu bi xêr hatî. Li aliyê qublê heşînahiyek heye gelek dûr e, tu dibînî yan nabînî? Ehmed Çelebî got: Belê ez dibînim. Abid got: Sibe în e. îşev here nizîkî heşînahiyê, hespê xwe li newalekê girêbide. Here nav heşînahiyê, ew rezê serdara periya ye. Birkek ya avê li nava rez de heye. Darek ya gula li ser birkê heye. Li nav dara gula de xwe xef bike. Dema bibe sibe, roj bilind bibê sê kevok wê bên li ser dara sêva danin. Didûyên wê biçîn li nav rez yek wê bêt li ser birkê danit, kevelê xwe ji xwe bêxit, biçit nav avê de. Ew serdara periyan e; kevelê wê jê bidize, bîne cem xwe. Ew jî wê bigehê te, ewê sêva ji bo te bîne. Ehmed Çelebî çû wek abid got-ê, we çêkir. Kevelê wê jê dizî. Ewê got-ê: Tu îns î, tu cin î, libasekî bide min ezê xwe pê setir bikim.

Ehmed Çelebî ebayê xwe da-yê. Ewê wergirt, hat cem Çelebî got: bixwaze te çi divêt? Ehmed Çelebî got min hinek sêvên cenetê divên. Ewê got Ehmed Çelebî, sêvên cenetê mihal in, lê belê ezê ji baxê irem ji bo te bînim. Serdara periya ba kir hevalek ya xwe û got-ê: zûka kefîk sêvên cenetê ji baxê îrem bîne.

Perî çû û sêvên cenetê anîn. Ehmed Çelebî serdara periya li pişt xwe siwar kir; ziyare a abid kir; hat mala xwe. Wê şevê serdara periya li xwe mehir kir. Sibehî sêv birin ji hakim re. Xelkê hemiyan got ev sêvên cenetê ne. Serdara periya ji hewiya xwe pirs kir, got sebebê wî çi bî, mêrê min hat pê min ve? Hewiya wê bi temamî jê re got. Serdara periya got Ehmed Çelebî, tu bi xudê kî hemamçî bîne ez bibînim. Sibehî hemamçî anî taştê. Dema hat derî de, dîsa hişê wî çû; ma sekinî. Her du jinên Çelebî her yekê destê xwe avêtin darekî, qenc li hemamçî dan. Hemamçî dîsa revî çû cem hakim got: Heta niha yek bû vêca bûne dido.

Hakim got, herin Çelebî bikujin, her du jinên wî ji min re bînin. Dîsa wezîr qebûl ne kir, got-ê: Tiştekî jê bixwaze nikarit bikit, paşê bikuje. Hakim got ba kin Çelebî bila bêt cem min. Dema Çelebî hat, hakim got-ê: min ji te divêt tu îşev heta sibehî qesirekê ji zêr û zîv li ser avê ji min re çêkî. Heke ne, ezê serê te bidim jêkirin. Ehmed Çelebî gelek hêvî kir, hêviya wî ne borî. Çelebî xemgîn hat mala xwe. Jina wî ya serdara periya got-ê: Xuda xêr bikit çi li te dest da? Ehmed Çelebî bi temamî jê re got. Jina wî got-ê: here bêje hakim baş e, ezê çêkim. Lêbelê bila hemamçî bi nîvê mesrefê arî min bikit. Ehmed Çelebî çû gote hakim. Hakim ba kir hemamçî temamê malê wî jê stend, teslîmî Ehmed çelebî kir.

Jina Çelebî ya serdara periya misexerên wê ji cina hebûn; emrî wan kir got: Îşev heta sibehî min ji hewe divêt qesireke zêr û zîv, herwekî hakim got: Li ser avê çêkin. Gotin, qenc e; çûn. Sibehî bûn, dîtin qesirek herwekî hakim gotiye çêkirine, Ehmed Çelebî rabû çû got hakim, rabe da em biçîn qesira me çêkirî. Hakim rabû, digel wezîrên xwe û digel hemamçî çûn nava qesirê. Hemiwan ecêbmayî, man. Serdara periyan emirî misexirên xwe kir got: Mêrê min digel wezîr ji qesirê derêxin, qesirê digel ên din hemiwan li avê de winda bikin. Misexira weke wê got çêkirin. Wezîr kirin hakimê bajêr. Ehmed Çelebî li mala xwe rûnişt heta Xuda du kur dan-ê, ji her du jina. Rojekê Ehmed Çelebî xwe dirêş kiriye; serdara periya li milê rastê rûniştiye, keça hakimê Diyarbekirê li milê çepê rûniştiye, her du kurik li ser sîngê wî dileyizin. Ehmed Çelebî hemdê Xuda kir got: ev e xewina min ji şivan kirî temam bû. Her du jinan got: me xewina xwe dîti bû em bibin jina şivanekî. Çîrok çû deştê, da û babên me çûn bihuştê.

### 1.2.8. Çerxê Felekê

Mûsa pêxember cem rabê alemê buhurtî bû. Diçe çîyakî nona vê elegeza me, dinêre konek vaye vegirtîye, qîzek ber kon diçe tê –qîzeke usane meriv şerm dike lê binêre: bedewe, mîna zêr diçûrise, bedewya wê meriv şaş dimîne, zef bedewe. Dilê wî havijî keçikê divê.

Divê: -Qîza qenc, tu min nastînî?

Keçik divê: -Wekî ez te bistînimî qelenê min girane, dikarî qelenê min bidî?

Divê: -Ez Mûsa pêxemberim, wekî ez nikaribim qelenê te bidim, îda kî dikare bide? -divê, -qelenê te çîye?

Divê: -Qelenê min kîlo kevirê qîmetlîye.

-Ê, divê, ew kevirê qîmetlî ku hene?

Divê: -Flan berê dane. Kevirekî reş nîşangî wî heye. Wekî meriv têkeve wê avêda -wir kevirê qîmetlî heye.

Mûsa pêxember diçe ber wê berê. Cem wî kevirî xozneber hebûne berê, xoznebera dike avê kevira derdixe. Kîlo kevirê qîmetî ji berê derdixe. Dixe derdana xwe, terkûya hespê xwe girêdide, lêdixe tê. Tê diçe Elegezê, dîsa diçe ber wî konî. Dinêre qîzik ne ber kone: pîreke porê wê sipî ber kon diçe û tê. Pîrê tê pêşiya Mûsa pêxember.

-Ha, Mûsa pêxember, divê, te qelenê min anî? Bala xwe didê qîz nîne, qîza wê rojê nîne -pîrê. Divê:

-Pîrê her min dûr keve.

Divê: -Çima Mûsa pêxember, divê, tu poşmam bûyî? Ne wê rojê min qelenê xwe te ra kivş kirîye, te çûye qelanê min anîye.

Mûsa bala xwed didê, canim pîrêke, porê wê çîlî qerqaş.

Divê: -Pîrê, tu û emelê xwe, here, ji min dûrkeve.

Mûsa pêxember dajo, hinekî jê hinekî jê dûr dikeve. Pîrê ew qîze, zanî ketîye diqekî mayîn.

Divê: -Mûsa pêxember, tu poşmam bûyî? -divê: -Hergê tu poşmam bûyî, gilîkî min heye te ra bêjim.

Mûsa divê: -De bêje!

Divê: -Wekî tu poşmam bûyî, wekî usane min berde û here.

Divê: -Çawa te berdim?

Divê: -Sê kevira erdê hilde têxe destê min, bêje -tu xûşka minî.

Mûsa kûzî erdê divê, sê kevira na, deh kevira dike destê wê, divê:

-Min tu berdayî.

Berdana jinê wî çaxîda bûye edet.

Mûsa pêxember dajo hinekî jê dûr dikeve ser stûyê xwe dizivire, lê dinhêre, dinêre pîrê nîne -dîsa qîza wê rojêye, bedewe. Divê:

-Qîza qenc, te çima ha kir? -axir kirîye xûşka xwe, îda nikare.

Keçik divêje: -Lê, çerxê felekê ne, lê çi divêjî?

Mûsa pêxember disekine ser pişta hespê, dinêre sê xort wêda tên. Mûsa pêxember serpişta hesê sekinîye. Keçik divê:

-De tu bala xwe bidê.

Jinik ser rê, rîya şoşê bûye, hema ser rê divê kulîca zêr disekine.

Ew hersê peya tên dinêrin kulîca zêr vaye -eva zêrin. Mûsa pêxember hê ser pişta hespê guhdarî dike. Hersa peya dibin-dinêrine va zêr. Divê: -Welle, Xwedê da me!

Dudu kurapê hev bûne, yek xerîb bûye. ew herduyê kurapê hevdu, ew ê hevalê xwe xerîb ra divêjin, Divê: -Ha te ra deh qurişê hana, here stansîya Elegezê, vira Elegezê, baltekî bîne, em îca evan zêrê ha têxin sê cîya, bê balte nave, bê hacet nave.

Ew herduyê kurapê hevdû yek yekî ra divêje:

-Wekê hevalê me balte anî, ez ê dest bigirim bikujim, bira zêr bigîjin me herda.

Ewê çûye balte bîne, evê xerîb, ew ji dide aqilê xwe: Elegezê, stansîya katekî jêre perwerde dike. Divê: “Ezê bidime herdu hevalê xwe kate, bira bixun pê bimirin, bira zêr bigîjin min”, ew jî usa divêje, ha. Katê xwe tîne, baltê xwe tîne, çawa digîje hevalê xwe, Mûsa pêxember hê li ser pişta hespê guhdarî dike, ew jinik jî hê li wir sekinîye, bûye zêr sekinîye. Çawa digîje hevalê xwe, ew herduyê kurapê hevdu, yek balte dest digire, balte lê dixe ewî xerîb dikuje.

-De werin, em katê xwe bixun, îjar em zêrê xwe bikin du cîya.

Kate dixun, herdu jî dimirin, axir jere, kete jerê perwerde kurîye, dilê wan axir hev ra ne saxbûn, her sê jî çûn.

Keçik çik radive ser xwe disekine ser rê hemîn bûbû zêr -çik radive ser xwe disekine.

Divê: -Mûsa, çawane?

Mûsa pêxember divê: -Erê welle, çerxêd felekêne!

Mûsa pêxember wê hingê divêje: -Heft xwezil wî evdî felek pê ra yar be, ne xwezil wî merivî, felek pê ra neyar be.

Xilaz bû.

### 1.2.9. Jinika Nerihet

Dibê yek hebûyi carê, dibê kulfeta wî nerihet bûyi, nebaş bû. Berê xelkê digo, "Nerihetê lêgeryayî!"

Îja mêrik ji kulfeta xwu di şipê da bû. Dibê mêrik ji kulfeta xwu ra go:

"Musulman!"

Go:

"Ha!"

Go:

"Wele ez ê sibe herim Mardine" -Berê bi niga diçûn, peyati diçûn-

Ê qaîl i, Jinik qaîl i.

Dibê: "Xwedê tu hefza mera biki, dibê îja tu yê çend...?"

Dibê:

"Ez belkî çar pênc rûya gêrî neyêm, ez venegerim. Dibê li mal mala xwu miqate bi, dibê ez çar pênc roya gêrî nayêm."

Meydan jê ra xweş dibi, ji jinikê ra ha. Dibê îja deri ji nava gund derdikevi midetkî deri deri li xwu diki êvar, şev, esir, muxurbe, vedigeri tê li dîharê xanî disekini dibê di rocina xanî ra li jina xwu sêr diki. Dibê, "Eger hevalê wê, dostikê wê hebinse ew ê werin îşev. Çimkî dibê ew dibê vîya çar pênc roya venageri, ez jî gêrî vegeryami" Deneme diki. Dibê bala xwu didê sebyakik ket hundur gedakik revya revya revya revya dibê ket hundur go:

"Amojnê!"

Gede jê ra go. Ew ji wa di ser ra sekinandîyi.

Go:

"Ha qurba!"

Go:

"Bavê mi ji Helebê hatîyi, ji qaçaxçitîyê, go gotîyi çen hebana metre bûn berê hêrin bû- ava sê çar heb hêrinana bibi ji amojna xwu ra ez hinkî westîyami ez ê êvarê werim ."

Dibê cîyê xwu jî danîyi, wer cîyakî temîzî bilind. Dibê hema doşegê bilin diki û wa hirinana dixi binî, dixi binê doşega xwu dibê:

"Temam qurba!"

Dibê ew deri gedakî din tê. Dibê gedakî din tê, gotî:

"Amojnê -a dibê du heb zebeşê wa di desta da ni- bavê mi ji nava bîstan hatîyi, gotî va her du zebeşa bibi ji amojna xwu ra, ez hebkî westîya mi ez ê niha werim, êvarê"

Dibê:

"Temam, dibê wa zebeşana tê x' çeviyê kûlînê, -berê di binê hêstirê nivîna da bi dara çevî çêdikirin tişt, eşya dixistinê- binê wê çevîyê, dibê temam layê mi heri"

Ew jî deri. Mêze diki gedakî din hat. -Tew heval pir in ha!-

Gedakî din hat, dibê:

"Wele, bavê mi dibê çibû seydê, seyîdvanî bû dibê, gotîyi a vê kewa gozel, kew kuştibû du sê heb, bibi ji amojna xwu ra, ez hebkî westîyami ez ê êvarê werim"

Dibê:

"Erê lawê min, dibê temam ser çeva. Dibê kewê tê xi pacê"

Lawik kewê pacikê da datîni, lawik deri. Mêze diki lawikiki di hat, gedakî di hat. Dibê:

"Wele bavê mi çibû bajêr, Diyarbekrê, helaw aniyi helawa sipî, nanê somî anîyi. Dibê bavê mi goti tu vî nanê somî û helawê bibi ji amojna xwu ra, ez ê êvarê werim?

Ê dibê:

"Temam qurban"

Mêrik dibê , “Wele ka ez xwu bera xar dim, dibê bû gazî, bû qiyamet li mala min" Mêrik hema ji diharê xanî peya dibi, tê xwari li derî dixi.

Jinik dibê:

"Ki yi?"

Dibê:

"Ez im.

" Dibê: "Hîîîîîîî! Jinik dibê ha hooo! Dibê de te go ez sê çar rûya nayêm, mehrûmo dibê tu di ku ra zû hatî dibê çi bû bi te?"

Mêrik dibê:

"Hela ka em herin hundur, hela em herin hundur, dibê îşê me nexweş i"

Dibê:

"Çi yi hela weri? Dibi hundur, wer didi seknandin. Tê hundur mêze diki, dibê:

"Hela bis e ez bîna xwu bidim hebkî, nefesa mi..." Mêrik dibê.

Dibê:

"Wele dibê ez îdare nakim çi hat serê te, çer bûyi? Wecê te dibê tuni, dûrima te nexweş i"

Dibê:

"Keçê m'erîk hat pêşya min m'er"

"M'erê çi wî, çere bû dibê mezin bû?"

Dibê:

"Welehî dibê hat pêşya mi dibê ez mejbûr gêrî hatim"

Dibê:

"Wer mezin bû, wer dirêj bû wek wan hêrinê bin doşegê da, wer dirêj bû zalim. Ê dibê, Xwudê qewetik da min, dibê mi her kevirik bi ser ve kir, weke wan zebeşê di bin çevîyê da. Dibê eger ez nefiryama mîna wê kewa pacê, ew ê ez bixwarama wek helawa bin teyştê.

Helawa xwu ji kirî bin teyştê.

Mersela mi li dihara rihmet lê dê û bavê guhdara.

### 1.2.10. Fethê Çilxerz

Zemanê berê, fes hebûn. Zilama dida serê xwe û li dora fes jî şemil yan jî şahr digerandin. Îja Fethê me yê berî ku bibe çilxerz, piştî ro û meha dîsa rokê ji bo qaçaxê berê xwe dide Binxetê. Li bajarê Şamê, çav li fesa dike. Radibe ji xwe ra yekî dikire. Qaçaxa xwe bar dike tê. Tê, xwe li sînorê Serxet û Binxetê diqewimîne. Bi elf û du belaya qaçaxa xwe xelas dike derbasî Serxetê dibe. Li gor gotina ê ku ew nas dikirin dibên:

"Fetxê Çilxerz merivkî pir jêhatî û wêrek bûye. Di tayê wî da kêm zilam hebûn. Pir bi xwe bawer û mêrxas bû".

Me go ji qaçaxê vedigere tê. Tê, digîje gundê xwe derbasî hewşa malê dibe. Ji meraqa bê çi ji Binxetê bi xwe ra anîye, ê ku dibîsin Fethê Çilxerz hatiye xwe li derîyê mala wan diqewimînin. Her kes li bendê ye ku barê xwe dêne û veke. Datîne, têr û heqîba xwe vala dike. Tiştê ku bi qaçaxî anîne hema li hewşê bera ber ê ku li dora wî vehewîyane dide. Her kes bi qaçaxa wî bawer e. Dibên:

"Apê Feth, qaçaxa baş tîne. Qaçax wek qaçaxa wî tune ye. Di ser a her kesî ra ye" Û li dora tiştik û firaqê ku anîye çilwazka didin. Lazimîya kê bi çi heye, çav li wî tiştî digerînin. Çavê gişa li buxçikê apê Feth e. Hîn were, fes bi ber çavê wan dikeve. Fes jî fes e ha! Yek ji wan mişterîyê ku li dora wî kom bûye û navserekî ku bi destê xwe nikare, radibe destê xwe dirêjî fes dike: Çavê wî bel, guhê wî miç in. Di ber xwe da gir vedibe û bi bişirîn radije fes. Digre. Dike ku bide serê xwe, hema apê Feth xwe çeng dikê û hişk bi zenda destê wî digre. Dibê:

"Bisekin! Ev fes ne ji bo firotinê ye û ne ê serê te ye?

Extîyarê me, di dewsa xwe da sar dicemide. Çavê wî derin nav serê wî û zoq li apê Feth dinêre. Dibê:

"Apê Feth bi gora bavê te, mi çawa çav lê kirê, hema bê hemd kêfa min jê hat. Lê tu dibê qey mi xwarîye. Ma ew fesê di destê te da, ji mi çêtir e ku te wiha dilê min hişt?

Apê Feth dibişire û dibê:

"Lawo tu jî zanî ku ji te ne çêtir e. Lê mi ev fesê han, ji bo xwe kirîye. Loma ez naxwazim ji xeynî mi kes bide serê xwe. Lê ez karim ji te ra qala fes û mesela vî fesî bikim. Ev fesa, mi li şamê kirrî. Fes ji cawê qêdîfe hatîye dirûtin. Ev kêlê li kêleka fes bi desta hatine avêtin û bi derzîya hûr hatiye qûnderzkirin. Ev gulik û rêsîyê li dora fes, yek bi yek bi desta hatîne honandin. Her rêşiya ku li dora fes hatîye honandin û bi ser pêçavka fes da diherike xerz e. Îja li derdora vî fesî çil heb ji van xerza hene. Ji vî fesî ra jî dibên, fesê çilxerz. Fesê çilxerz, sultan û dewletî didin serê xwe. Qiymetê vî fesî, pir zêde ye. Hema tu karî bibê ku bi qasî fiyetê hemû qaçaxa min e. Loma ez dibêm ancax ev fesa li gor serê min e. Yekî wek mi kare bide serê xwe. Ma çîyê mi ji sultan û dewletiya kêm e? Yek ji wan nagîje neynûka min. Ez bi keda xwe ya helal, bi xwêdana enîya xwe vî perî kar dikim, pê dikirim û didim serê xwe. Lê, sultan û dewletîyê ku ji vî fesî didin serê xwe, wî mal û milkê xwe ji ku derê tînîn? Ew perê ku pê hirboqîya û kêfê dikin hemû ê me belengaz û feqîr û fuqara ne. Ew keda me dixwin û pê kêfa xwe dikin. Ê wan heram e."

Apê Feth fesê xwe digre, bi nazikî dide serê xwe û dibê:

"Ji niha û pê va, êdî ez jî Fethê Çilxerz im. Ma dê qîyamet rabe? Êdî ji mi ra bibên Fethê Çilxerz. Mi xwe li serê we nekirîye sultan. Tenê hinekî forsa xwe davêm. Bira çil xerzê mi ji hebin."

### 1.2.11. Me Îro jî Zîyan Kir

Wextek di bajarokek da, zilamekî dikandar hebûye. Wî zilamî, her roj ji sibê heta êvarê di dikana xwe da tişt firotine mişterîyên xwe û pere qazanc kirîye. Lê belê her êvar dema ku dûwayî li karê xwe yê wê rojê anîye û derê dikana xwe girtîye, li kesên derdora xwe nihêrtîye û gotîye:

-Me îro jî zîyan kir.

Hem dikandarên cîranên wî, hem jî kesên dî ji wê peyva wî pirr şaş bûne. Aqilê wan negihaye wê yekê ku mêrik çawa her roj zîyan dike û dîsa dikare karê xwe bidomîne. Dikandarên cîran carna ji hev re gotine:

-Ev zilam jî wek me her roj dikana xwe vedike û ji sibê heta êvarê tiştên xwe difiroşe, ticareta xwe dike û pere qazanc dike. Dikana wî ji mişterîyan qet vala namîne. Em jî wek wî dikandar in, lê em zîyan nakin. Şikir ji Xwedê ra, em kara xwe dikin û Xwedê rizqê me dide. Welew ku carna biqewime em rojek zîyan bikin jî, dortira rojê em kar dikin û ewêzîya wê zîyana xwe derdixin. Lê ev cîranême, digel ku ew jî wek me, her roj gelek mal difiroşe, her êvar dibêje "Me îro jî zîyan kir". Gelo çima her roj zîyan dike? Yek jî, eger bi rastî her roj zîyan dike, vêca çawa îflas nake, çawa dikare dikana xwe bişixulîne û karê xwe bidomîne?

Lê mêrik ji adetê xwe şaş nebûye. Her êvar dema dikana xwe girtîye, wek hemî caran dîsa gotîye:

-Me îro jî zîyan kir.

Rojek ji rojan, dikandarên wê sûka ku dikana wî tê da bûye, hemî li hev civîyane û bi hev ra biryar dane ku dortira rojê çu kesek ji wan dikana xwe veneke, da ku mişterîyên wan jî gişt biçin dikana wî dikandarî û mal ji wî bikirin, paşê jî binêrin ka mêrik dê êvarê çi bêje.

Li gora wê biryara tevayî, roja dî dikandar hemî li malên xwe mane û di wê sûkê da ji bil dikana wî dikandarê ku her êvar gotîye "Me îro jî zîyan kir", çu dikanek nehatîya vekirin. Wî dikandarî tenê dikana xwe vekirîye û mal firotîye. Bi wî awayî, hemî mişterîyên ku wê rojê çûne wê sûkê, berê xwe dane dikana wî û mal ji wî kirîne. Ji ber wê yekê, dikana wî wê rojê wisa boş û gewz bûye ku, ji sibê heta êvarê ew dikan bûye wek kana mûrîyan. Mişterî li ber dezgehê mêrik li pey hev rêz bûne û ketine dorê, her yek ji wan demeka dirêj di rêzê da paye, heta ku dora wî hatîye. Mêrikê dikandar jî wê rojê ji sibê heta êvarê ling nedaye binê xwe, tim mal firotîye mişterîyên xwe û bi wî awayî ji rojên dî pirr zêdetir pere qazanc kirîye.

Berê êvarê dema ku wextê girtina derê dikanê hatîye, dikandarên dî yên cîranên wî ji malên xwe derketine û çûne, li dora dikana wî rawestane. Mêrik dema ku ji dikana xwe derketîye û derê dikanê girtîye, dîsa berê xwe daye kesên derdora xwe û wek hemî caran gotîye:

-Me îro jî zîyan kir.

Li ser wê peyva wî, dikandarên dî gişt çûne ber derê dikana wî, wek xelekek dora wî girtine, bi hêrs qîrîyane ser'ê û gotine:

-Gidî çavbirçîyê virrekê rûreş, te her roj berê êvarê digot "Me îro jî zîyan kir", me nedizanî ku tu derew dikî û rûyê xwe reş dikî. Me ji wê derewa te bawer dikir. Lê îro? Îro çu dikandarek di vê sûkê da dikana xwe venekir û mişterîyên sûkê hemî hatin dikana te û ji te mal kirîn. Ji sibê heta êvarê dikana te jimişterîyan vala nebû. Ma tu şerm û fedî nakî ku tu derew dikî û dîsa dibêjî "Me îro jî zîyan kir"!

Mêrik qet deng ji xwe nanîye; bi xwînsarî guhdarîya wan kirîye û qasek li wan nihêrtîye, paşê gotîye:

-Rojek jî ji umrê me çû, me îro jî zîyan kir!

### 1.2.12. Qsa Aqilmenda

Merîk rohilatê, merîk jî roavaê, navê wana eyan bû nava dinyaê da, lê wan herdu merîya hev nedîtibûn. Navê wan ku bela bû nava dinyaê, wana hev nas dikirin, yekî digot: "Ew rastî min bê, ez ê nas bikim», yê dinê digot: «Ew rastî min bê, ez ê nas bikim». Usa qewmî yê roavaê rastî yê rohilatê hat, selam daê da, yê roavaê, wekî derbaz dibû, selama wî vegirt, navê wî jî pê ra got. Yê roavaê pirsî, got:

-Tu çawa zanî ez ew meriv im?

Go: -Min navê te zûva bihîstîye, lema jî te nas dikim!

Ewî jî got: -wekî usa ne, tu jî ev meriv î!

Go: -Belê, ez ew meriv im, lê min berê tu nas kirî, te ez nas nekirim, lema jî tu gerekê bivî mêvanê min.

Ewî jî razlixya xwe daê, go:

-Belê, wekî te ez nas kirime, ez ê jî bivim mêvanê te.

Go: -De, ez ê herim, pêş da karê te bikim, heta tu û hevalê min tên.

Ew jî razî bû . Mêrik ji wana qetîya, hat dîna xwe daê cotkarekî cot dike, gote cotkarî:

-Te ra qewat be!

Cotkar selema wî vegirt:

-Ser çeva, û ser sera!

Go: -han, zêrekî bidime te, weke sehetekê duda gaê xwe ters girê de, berê gakî bide rohilatê, berê yê dinê bide roavaê, merî pey min tên, wê bê: "Tu çawa cot dikî". Tu jî cavê bide: "Çawa, tu ne yê vî walatî î? Em zevîê xwe ha radikin". Wexta te dûr dikevin, dîsa gaê xwe rast girê de, cotê xwe bike.

Ew meriv ji cotkar dûr ket. Aşek rastî wî hat. Dageriya êş, got:

-Ev nanê kê ye ser dewlê?

Xortekî got: -Ev nanê min e!

Go: -Çiqas nan e?

Go: -Çar kod nan e!

Go: -Bihaê heyşt kod nan bidime te, dewla êş ber hilde, bira ar tev avê here. Merîê pey min bên, wê bêne vî aşî, wê ji we pirs kin: «Axir, arê we tev avê diçe, dewla êş bidine ber». Hûn cava wî merî bidin, bê: «Çima tu ne meriyê vî welatî î? Em nanê xwe ha dihêrin". Wexta te dûr dikevin, dîsa dewla aş bide ber, bira ar tev avê neçe».

Perê wî daê, derbaz bû, çû. Çû dîna xwe daê, merîk he xwe ra avaîkî çê dike. Selam daê da. Ewî merî selama wî vegirt, go:

-Ser çeva û ser sera!

Go: -Eva xanû manê kê ye?

Xayê xan û man go: -Yê min e!

Go: -han te ra haqa pere, dewsa kisir-hecirê şîr û lobîya bide xevatê.

Go: -Ez ê çawa bidime xevatê?

Go: -Xwe tê mjûl ke, heta merî pey min tên, wê ji we pirs kin: "Hûn çima kisir-hecirê nadine xevatê, şîr û lobîya didine xevatê?". Tu bêjî: "Çima tu ne vî welatî î? Em avayê xwe wa çêdikin". Gava ewana dûrî we ketin, dîsa xevata xwe bikin, çawa lazim e.

Ew çû karê wana bike. Em vegerin ser mêvanê wî. Mêvanê wî hat, pêş da rastî cotkar hat. Dîna xwê daê, ecêvmaî ma, wekî gaê wî ters hatine grêdanê, go:

-Tu çawa cot dikî? Te gaê xwe ters girê dane.

Go: -Çima tu ne vî welatî î? Em zevîê xwe ha radikin.

Derbaz bû, çû rastî aşekî hat, dageriya aş, dîna xwe daê ar tê xarê, dewl li ber tune, ar tevî avê diçe, go:

-Canim, heyfa arê we, go, dewlê bidine ber.

Go: -Çima tu ne merîê vî welatî î? Em nanê xwe ha dihêrin.

Derbaz bû, çû rastî avaykî tezeçêkirî hat, dîna xwe daê, hostaê ku avaî çêdike, dewsa kisir-hecirê dide xevatê şîr û lobîya. Wexta şîr dide xevatê, şîr nola avê ser kevira bela dive, lê lobî dipekine erdê.

Go: -Tu çima kisir-hecirê nadî xevatê, şîr û lobîya didî xevatê, şîr nola avê ser kevira bela dive, lê lobî dipekine erdê.

Go: -Çima tu ne vî welatî î? Em avayê xwe wa çêdikin.

Eva mêrka çû rastî gavanê gund hat. Dîna xwe danê dewarê wî mexel e, selam nedaê, derbaz bû. Gavan gazî kire, go:

-Filankes!

Eva mêrka ser milê xwe zivirî, go:

-Tu çawa zanî ez filankes im?

Go: -Ez zanim bona wê yekê, wekî te selam neda min, tu xayê xwe wî aqilî, diçî mêvanê filankesê, wê serê te lê xe.

Go: -Çima serê min lê xin?

-Bona wê yekê wê lê xe, te çi dît welatê wî da tu nikarî şrovekî nêta wana.

Go: -Min tişte nedîtiye, tiştek min cotkarek, wekî gaê xwe ters girê dabû, aşek jî min dît, wekî dewla êş ber tunebû, ar tev avê diçû, yek jî min dît dewsa kisir-hecirê li ser xan û manê xwe şîr û lobî dida xevatê.

Gavan gotê da: -Bêje menîya her sê pirsa?

Go: -Wella, ez nizanim!

Got: Wekî usa ne, wê serê te lê xe, go, lê tu gune î, go, ez ê te ra bêjim, tu cava wî bide, lê ew ê bizanibe, wekî tu cava wan pirsa nikarî bidî, tu hatî şiretkirinê, wexta ew zef zorê dide te, bê: «Welle, gavanê gundê te min ra gotiye». Gotê da, - cotkarî gaê xwe ters girê daye bona wê derê - miîna du birê bê tifaq: Her kesek xwe ra dikşîne. Menîya aş - çawa kevanîke bê pergal, malxê malê çiqa bixevite, xevata wî tev avê here; menîya avaî – ew e, wekî merivê bêaqil, tu çiqa şîreta lê bikî, şîretê te hilnade, wê usa bipeke, çawa ku lobî kevira diketin, dipekyan.

Ew meriv şirovekirina her sê menîya hildide diçe mala qonaxa xwe. Nan tê ber. Nan dixun, paşî nanxarinê malxê malê divê:

-De bêje, te çi welatê min da dît?

Go:-Tiştek ku min dît cotkarek, wekî gaê xwe ters girê dabû, aşek jî min dît, wekî dewla êş ber tunebû, ar tev avê diçû, yek jî min dît dewsa kisir-hecrê li ser xan û manê xwe şîr û lobî dida xevatê.

Go: -De menîya wana bêje?

Gotê da: -Cotkarî gaê xwe ters girê daye bona wê derê mîna du birê bê tfaq, her kesek xwe ra dikşîne. Menîya aş çawa kevanîke bêpergal malxê malê çiqa bixevite, xevata wî tev avê here. Menîya avayî ew e, wekî merivê bêaqil tu çiqa şireta lê bikî, şîretê te hilnade, wê usa bipeke, çawa ku lobî kevira diketin, dipekyan.

Go: -Te ew nizanbû şrove kira, wekî te zanîbûya, te ê ez nas kirama, rast min ra bêje, kê tu şîrek kirî?

Eva mêrika xwe mukur hat, go:

-Welle, gavanê gundê te got!

Gote du xulamê xwe, go:

-Hespa zîn kin. Go, de rave, siyar be.

Berê xwe dane gavan. Dîna xwe danê, dewarê gavan mexel e, noginek dûrî naxirê mexel e. Selam dane gavan, go:

-Gavan, ew nogina hana avis e, yanê stewr e?

Gavan go: -Avis e!

-Golika wê nêr e, yan mê ye?

Gavan go: -Nêr e!

Go: -Çi nîşan lê hene?

Go: -Nîşana jî tu bêje!

Go: -Rast e, avis e, golika wê nêr û beş e.

Gavan go: -Ne beş e, be'z e, serê dêla wê zivirîye ber enîê, te trê beş e.

Go: -De zû şer jê kin.

Nogin şer jê kirin, gotina gavan derket - ne beş bû, be'z bû.

Ewî merivî gote gavên: -Wekî tu haqa zanî, tu çima gavan î, ez axa me?

Gavan go: -Ez û tu tev rojekê bûne, tu ketî ser dawa berên, ez ketime ser struê berên, tu dawê dixwî, ez ji stru.

### 1.2.13. Kera Xweliyê

Hebû tunebû keçikeke xwişka heft birayan hebû. Rojekê heft keçik li hev civiya bûn; vê keçikê digot çi bûye? Wê digot çer bûye? Ew dibêje "Serê golika min a enîbeş," ew dibêje "Serê birayê min…" Keçikek jî dibêje tu çima dibêje "Serê golika min a enîbeş?" Xwişka heft bira jî dibêje "Lê ka ez bêjim çi?" Keçikek dibêje "Ma birayê te tune nin?" Xwişka heft bira jî dibêje: "Na, birayê min tunene."

Xwişka heft birayan wexta ku çû mal, ji dêya xwe dipirse: "Dayê birayê min tune nin?" Dêya wê jî dibêje "Çer/çawa birayê te tunene, birayê te heft heb in û li falan şikeftê de ne." Xwişka heft bira dibêje: "Lê ka ez çawa herim cem wan? " Dê dibêje: "Ez ê ji te re kera xweliyê çê bikim" Dêya keçikê tîne ji keça xwe re kera xweliyê çê dike, keçik jî li kerê siwar dibe û dikeve rê.

Keçik diçe diçe li ser rêya xwe moriyek sor dibîne, ji kerê re çer dibêje "hoyîşşşş" ker dibe xwelî. Keçik vedigere malê, ji dêya xwe re "dayê kerê min bû xwelî" dibêje. Dê dibêje: "Baş e ez ê ji te re car din jî çê bikim lêbelê nebêje "hoyîş" ku tu bibêjî "hoyîş" ê bibe xwelî, tim bibêje "ço, ço, ço…û here"

Keçik car din li kera xweliyê siwar dibe, tim û tim dibêje "ço, ço, ço…" û diçe û diçe. Diçe ber deriyê şikeftê, li malê mêze dike qet kesek li mal tune, tiştên malê gişk tevlihev in, mala wan qilêr e/gemar e, dibêje "mala vana wiha nabe" keçik zû bi zû malê dimale û dişo, şîva wan hazir dike û diçe dikeve teqê.

Heft bira êvarê tên malê, mêze dikin ku mala wan maliştiye, her der paqij e û şîva wan jî hazir e, dibêjin "qey yekî bi xêra xwe kiriye" şîva xwe dixwin û radikevin. Dibe sibe, serê sibê zû diçin seydê.

Keçik sibê dîsa bi malê dikeve, malê dimale û paqij dike, goştê ku do anîbûn ji wan re çêdike, dike şîv û diçe dikeve teqa xwe. Dibe êvar heft bira tên mal, mêze

dikin mala wan cardin jî wiha ye û şîva wan hazir e. Dîsa dibêjin “qey yek hatiye bi xêra xwe çêkiriye.”

Rojek wiha, du roj wiha, sê roj wiha. Ku dibe sibe, serê sibê bira tev ji hev re dibêjin wiha nabe, dibêjin: “Em ê îro bipên “ka kî tê mala me, çi ye, çima tê, çi kes e?” Hinek bira diçin seydê, hinek jî li hindur dimînin, hinek jî diçin der li mala xwe dipên. Mêze dikin ku keçikek di teqê de derket mala wan dimale, firaqê wan şuşt, şiva wan hazir kir û çû ku têkeve teqê bira diçin hişk bi keçikê digirin û dibêjin “Tu kî yî? Tu çi kes î? Tu hatî mala me, mala me paqij dikî û şîva me hazir dikî?” Keçik jî dibêje: “Ez xwişka we me, dêya me gotiye ‘heft birayên te hene, di filan şikeftê de ne,’ ji min re kera xweliyê çêkiriye û ez hatime cem we.”

Ev bira êdî ji xwişka xwe hez dikin. Goştên ku ji seydê tînin didin xwişka xwe, xwişka wan jî tim û tim xwarina goşt çêdike, tev dixwin û kêf dikin. Keçik wexta ku xwarina xwe çêdike û dipêje, di argûn de her tim jî agirê xwe vedişêre.

Rojek pisîk diçe di argûn de li ser xweliyê mîza xwe dike, agir vêdisê. Wexta berêvarê keçik haziriya şîva xwe dike ku agirê vêxe, mêze dike ku agir vêsiyaye û agir tune. Keçik nizane ku çi bike, li mal ne ar/agir heye ne jî heste, cîran jî tunene ku here ji wan bistîne.

Keçik, tê der dora xwe mêze dike ku li cihek dûr dûyek bilind dibe, dibêje: Ez ê herim ji wê derê ar/agir bînim, xwe li dû digire û diçe çiyê. Keçikê diçe, diçe dikeve hewşa şikeftê, giloka rîsê li piştê dikeve erdê, keçik jê hay nabe. Keçik diçe ber deriyê, hindur guhdarî dike ku dengê keçan tê. Di qulika derî de mêze dike ku pîrek mezin û bi sal e û porî wê pir dirêj e, keçikên wê jî li dora dêya xwe civiyane in û porê dêya xwe şeh dikin.

Keçik li derî dide. “Teq, teq, derî vekin”.Keçikek pîra himhimî mêze dike ku deng tê dibêje:

-Qey dengê xerîba tê? Keçikên pîrê:

-Na, dêya min, deng tune ye dengê bizina me ye?

Keçikek zû diçe ku dêya wan pê nehise û zerarê nede kesan. Keçika pîrê diçe derî vedike û dibêje:

-Hişşşşş! dengê xwe hêdî bike, dêya me pîrek pîrebot e û himhimî ye ku bi te bihese yê te bixwe. Keçika pîrê dibêje:

-Tu dibêjî çi? Zû bibêje, tu hatî çi? Xwişka heft bira dibêje:

-Arê me vêsiya ye, arê me tuneye, ka biçêk ar bidin min, xêra xwe.

Keça pîrê dibêje:

-Baş e, dengê xwe neke. Xwişka heft bira:

-Baş e. Keça pîrê tîne ar dide Keçikê û dibêje:

-Li paş xwe mêze neke, zû here ku dêya me te nebîne.

Keçik jî ditirse û bi lez diçe mal û deriyê xwe digire.

Pîra himhmî jî radibe û dibêje: "Yek hatiye mala me, bêhna xerîban tê, bêhna xerîban tê…" Keçikên pîrê pêdikevin û dibêjin "na, dayê wele kesek nehatiye vira…kesek nehatiye mala me" Keçikên pîrê pêdikevin nakevin wê qanî nakin. Pîra himhimî dibêje "Na bîhna xerîba tê…" pîrê ji wan bawer nake tê der û dora mala xwe mêze dike û digere li der li benda giloka rîsê rast tê û gilokê dibîne. Pîra himhimî dibêje "Min ji we re negot yek hatiye vira û bîhna xerîba tê…"

Pîra himhimî giloka rîs dizê û dizê, bi şopa bendê rîs dikeve, li pey keçikê diçe. Pîrê diçe û diçe, diçe tê ber şikeftê ji dûr ve dibêje:

-Ku ez tirekê bikim heft rojengan dilşînim, ku ez fisekê bikim heft deriyan dişkînim…

Keçik li mal bi tena serê xwe ye, pir ditirse û nizane ku çi bike deriyê xwe digire. Pîrê jî dibêje:

-Derî veke, derî veke. Keçikê zû derî veke. Ku ez tirekê bikim heft rojengan dilşînim, ku ez fisekê bikim heft deriyan dişkînim…

Keçik ji gotinên pîrê pir ditirse û deriyê xwe hê jî zexm dike. Pîrê tê ber deriyê şikeftê, li derî dixe û dibêje: “Keçikê derî veke, keçikê derî veke, ku tu venakî jî tiliya xwe di qulika derî de derxe ku ez pê bimêjim. Keçik ji tirsana û bi xof tiliya xwe di qulika derî de derdixe, pîra himhimî bi tiliyê dimêje, dimêje.. xwîna keçikê dixwe û diçe malê. Pîra himhimî du-sê roja wiha dewam dike.

Birayên keçikê li xwişka xwe mêze dikin û dibêjin: “Xwişka me her roj xirab dibe û zeîf dibe, bi rastî xwişka me karekî jî nake, xwarina wê xweş e gere qelew bibe, çima tim lawaz dibe, gelo?” Birayek ji xwişka xwe re dibêje:

-Ma tu xwarinê naxwî an derdekî te heye û tu çima zeîf bûyî?

Keçik dibêje:

-Na, derdê min tuneye û tiştek jî tuneye.

Du-sê rojên din diçin mêze dikin ku xwişka wan tim diçe perîşan dibe, birayê mezin bangê Xwişka xwe dike û dibêje:

-Tu çima wiha zeîf bûyî qey derdê te heye?

Keçik dibêje:

-Na na…” Birayê wê zorê didiyê, keçik neçar dimîne, êdî eşkere dike û dibêje:

-Rojek min ar/agir veşartibû. Pisîk çûbû di argûn de mîz kiribû ar vêsiya bû. Min jî got; ez ar peyda bikim. Min mêze kir ku li cihekê dûr di şikeftê de dû bilind dibe û min xwe li dû girt û ez bi dû ar ketim. Ez çûm ber deriyê şikeftê min mêze kir ku heft keçik porê dêya xwe ya himhimî şeh dikin, bi dizîka ar dan min û ez vegeriyam mal, ez ji ber ku bi lez ji wir derketim giloka rîsê jî ji min de ketiye tew ez pê niaznim; pîra himhimî jî benda rîsa min şopandiye û pey min hatiye mal. Ji min ra got derî veke, wê çi kir min venekir, got qene tiliya xwe derxe ez pê bimêjim, ez jî tirsiyam min tîliya xwe derxist û bi tiliya min mêjiya û çû, her roj tê bi tiliya min dimêje û diçe, tim xwîna min dixwe.” Birayê wê got:

-Baş e, netirse ez ê sibê bipêm, wexta ku hat dengê xwe neke.

Bû roja din ji dûr ve dengê pîrê hat û bû himhima pirê, pîrê hat û got:

-Keçikê derî veke, keçikê derî veke, ku ez tirekê bikim heft rojengan/kulekan dilşînim, ku ez fisekê bikim heft deriyan dişkînim…

Birayê keçik di kozikê de mêze dike ku pîrê çû, çû ber derî ku keçikê tiliya xwe bidiyê, bira bi tîrkebanê li pîrê nîşan digire û tîrek lê dixe, pîrê dikuje, dikeve erdê û hişk dibe.

Ji wê rojê şûnda keçik ji tirs û bela mezin xilas dibe û ji birayên xwe re "Birayên min heft keçikên pîrê hene, pir delal in, ez wan jî ji we re bînim, hûn jî heft xort in. Bira li hev dicivin û qebûl dikin, ku diçin mala pîrê keçik jî qebûl dikin. Birayên xwe li wan keçikan mar dike û bira tev dizewicin.

Keçik, heft bira û bûkên xwe diçin gundê xwe, cem dê û bavê xwe, tev kêf dikin û jiyana xwe li gund dewam dikin.

### 1.3.Fıkra ve Anekdot

#### 1.3.1. Hêka Hêstiran

Gundiyek diçe bajêr li nav bazarê digere. Heyam payîz e, bazar bixuroş e. Kirrîn û firotin pir e, her cure zerzewat û dikak lê tê firotin. Gundiyê me jî li ber deriyê zerzewatfiroşekî disekine û kundirên pitatî pir bala wî dikêşînin. Lewra kundirên pitatî hem ji her cure kundira mezintir e û hem jî rengê wî piçekî bi ser sor ve ye. Ango wekî kundirên din keskoyî nîne.

Gundî baş li kundir dinêre, çavê zerzewatfiroş pê dikeve ku gundiyê me li hember kundir sosret maye. Xwe nêzîkî gundî dike û dibêje:

-Kerem ke bira, tu tiştekî dixwazî, te çi divê?

Gundî kundirê pitatî şanî wî dide, dibêje:

-Ev çi ye?

Zerzewatfiroş jî mirovekî nehs û binheram e ku hew tê zanîn û baş dizane ku gundiyê feqîr nizane ew çi ye. Dibêje:

-Bira ev hêka hêstiran e.

-Çawa?

-Tu bixwazî vêna bikirî, tê bibî mal, ew jî dê heta 20 rojên din biqelişe û dê cehşê hêstirekê jê derkeve.

Kêfa mêrikê gundî pir tê. Lewra bê hêstir bû. Wî jî dixwest ji xwe re hêstirekî bikire, lêbelê biha bûn. Kundirê xwe kirî û kete rêkê ji bo çûna gund. Di rê de dest bi xeyalan kir ku ewê çawa hêstirê xwe mezin bike, dê çawa pê baran bikêşe û hwd. Gihîşte berwariyekî, hêka wî di bin çengê wî de ye û ew di nav xeyalan de ye. Çima kundir ji destê wî nakeve û nagindire xwarê. Hêka wî gêr bû, ew bi dû ket lê ma dê çawa pê re bigêhe, hêk çû… çû li pişta teraşekî berekî ket perçe-perçe bû. Ma tesaduf nîne! Çima ji bin teraşê kîvroşkek xwe neavêje, gundî çawa kîvroşkê dibîne, hizra wî çehşika hêka wî ye. Hema li nav serê xwe dixe û dibêje:

-Wey hewar û bêlome, ev çehş heke hê berî derketinê ku bîst roj hene wiha bireve, dema mezin bibe dê çi hêstir jê derketiba… û li nav serê dide û tê mala xwe. Bi wan hinavên şewitî bi wî mirûzê tal û tirş dema jîna wî wî dibîne hizir dike ku merê wê nexweş e, berve diçe û dibêje:

- Te xêr e evdê Xwedê?

-Evda Xwedê, ma îdî çi be, ya hatî serê min neyê serê dijminên min.

Û çîroka xwe ji serî de ji jina xwe re dibêje. Jina wî pir bi xemgînî dibêje:

-Xwezî ji xêra Xwedê re te bi saxlemî ew hêk anîba û hêstira me derketiba. Tu dizanî em bê dewar in, me dê ji xwe re biriba bêrê… dibêje dibêje lê xwezî negotiba. Lewra mêrê wê hêrs bû û bi kulman û mistan û şîmaqan lê dide û di ber de jî dibêje:

-Ker keça kerê, te dê çehşa min biriba bêrê da ku pişta wê şikestiba ha.. dibêje û lêdixe.

### 1.3.2. “Gelo Çima?”

Rojek li gındek, hin jinên ciwan li hev civîyane û ji xwe ra peyivîne. Yekê ji wan, qala zewaca zwe ya du-sê sal berê ji wan ra kirîye û weha gotîye:

-Rojek berê êvarê ez ji kanîya gundê me, ji ava şîvê hatim malê. Min dît ku hin zilamên bîyanî hatine mala me. Min di dilê xwe da got “Gelo çima?” êvarê bû kurepista wan zilaman û bavê min, bi hev ra peyivîn. Min di dilê xwe da got “Gelo çima?” Sibetirê ew zilam li hespên xwe siwar bûn û çûn. Çend roj paşê wan zilaman hin zilamên dî û birrek jî jin bi xwe ra anîn û dîsa hatin mala me. Min di dilê xwe da got “Gelo çima?” êvarê wan jinan û hin jin û keçên gundê me ez dam navbera xwe, hin cilên gulgulî yên nû li min kirin û xêlîyeka sor avêtin ser rûyê min. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Paşê ez li ser balgîyek dam rûniştandin, li dora min civîyan û hin stran gotin, tiştekî wek rêxê jî anîn di her du destên min dan.[44] Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Sibetirê dê û bavê min hatin rûyê min û ez teslîmî wan jin û mêr^n bîyanî kirim. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Wan jî xêlîyeka sor avêt ser rûyê min û ez li hespek siwar kirim, ew jî li hespên xwe siwar bûn û dora min girtin û em bi rê ketin. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Em çûn gundekî dî, li be derê malek wan ez peya kirim û birim hundir, li wir ez kirim odeyek  û pişta min dan dîwarek. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Hin jinên bûkin û keçên xama qasek li dora min rawestan û stran gotin, paşê hemî derketin çûn û ez li wir tenê hîştim. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Êvarê min hew dît ku derê odê vebû û hat hundir zilamekî sersindoq û enîdoq û çavbeloq û simbêlboq. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Mêrik hat, xêlîya sor ji ser rûyê min hilanî û ez tazî kirim, xwe jî tazî kir û ez kirim nava nivînên xwe. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Ji wê êvarê û pê ve ew zilam her şev dihat û ez dikirim nava nivînênxwe. Bi wî awayî demek derbas bû; min bala xwe dayê ku zikê min hin bi hin dinepixe û dawa pêşîn a fistanê min kin dibe, dawa paşîn jî dirêj dibe. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Çend meh paşê min pêjn kir ku es dêşim. Hingê çend jinên gund hatin û ez dam rûniştandin û ji navikê berjêr ez tazî

[44] Mexseda wê ji “tiştek wek rêxê”, hene bûye.

kirim. Min dilê xwe da got “Gelo çima?” Qasê paşek min hew dît ku dengê “waqîn”a dergûşek ji ber lingên mn hat. Min vêca bi dengê bilind got:

- “Gelo çima?”

Hingê, yekê ji wan jinan got:

-Çawa “gelo çima?” Nê tu zawicîbûyî, nuha ji te dergûşek anî dinê û tu bûyî dayik!

Min got:

-Nexu ez zewicîme û jinîtî û mêrîtî weha ye?

Jinikê got:

-Belê, tu zewicî û jinîtî û mêrîtî weha ye!

### 1.3.3. Bîn Bekir

Go mêrik û jinikik bû. Go navê mêrik Bekir bû, jiniki jî keçikik wê heyî û tî û birçî ni. Mêrik newêrî ji hundur derkevî, tirsonek i. Û arvanê wan diqedi. Jinik bi wê rap ev diçini dibe:

“Hey ar bi malê keto! Ma tu yê arvanê xwu kere ki û herî êş û qeraş ê ji te re alê te deyni û wê bihiri û tu yê bîni. Dibê kesî ji te ra go merheba, tu yê bê merheba ne go tu jî denge xwu naki, tu yê weri.”

Dibê deri, arvan kere diki û diki ber û deri. Deri, di rê da deri kesî nabîni. Deri êş, qeraş tê barê wî datîni. Merheba, merheba. Arvanê wî dihêri û cardin barê wî bar diki û tê. Tê qotik şûrê wî jî heyi. Têêê tê binya malê, diniri çel mişkî serê çel mişkî jê dikî.

Tê, jinik dibe:

“Ar bi malê keto! Hey mala te şewitîyo! Ka tu mir, kesî tu kuşt. A te çû aşê xwu kir û tu hatî.”

Go:

“Wele jinik go ez hatim, go çel mişkîgo, serê xwu di koxmirîşkê ra derxist, go min çel jî kuşt.”

“Te kuşt?”

Go:

“Erê.”

“Mala bavê şewitiyo go! Go me bê me çel mişk kuştîyi, go bê mi çel mêr kuştîyi.”

Mêrik xeyîdî go:

“Çîyê min û tiradê eşîra, kê  bide xwûna çel mêrî”

Û hat, cîrana hat cem min ji mi ra go, çû cem te ji  te ra go .

Go , “Bekirê me îro çel mêr kuştîyi.”

Ji her kesî ra go û xwedîyê mera tuni, kes nabê peye me hatibû kuştin.

Û cûyab çû gîha Binxetê, gîha mala paşê. Go, “ Yekî çel mêr kuştîyi û go xwedyê mera tew newiri bê mêrê me hatî kuştin.”

“Kî yi. kî nin i?

Go:

“Li welatî yi, go navê wî Bekir i,”

Go nirî du  sûyar hatin. Paşê şand

Go:

“Bekir tu yî, çel mêr kuştî, tu yî?”

Go:

“Erê go, navê wî Bîn Bekir i.”

Go:

“Çel mêr kuştîyi û go xwedyê mera deng nekir?”

Go:

“Na. Go newêrin tew bibên, tew nabêjin.”

Go:

“Wele paşê e şandim pê te go, tu yê weri em herin cem paşê.”

Hat hela malê:

“Jinik, mi di gora bavê nîyê! Ma va çi bû, tiradê eşîra, qîzê vaya çi ecêb i te anî serê mi?”

Go:

“Xwelî li serê te bûyo! Go ma va nava ji te ra bes i. Go tu yê herî go mêrikê bê te çel mêr kuştî, tu yê bê, erê û tu yê werî.”

Rabû hat nav mala, kurk û ebê mala anî lê kir, hespik mala anî lê kir, mêrik xemiland, qondere û çek û mêrik (Bîn Bekir) şand. Mêrik çû. Mêrik bi sûyara ra çû. Ey bû rûya din rûya din, teselya wê ket mêrkê idi ney. Rabû hey mangak wê hebû hey kerak wê hebû îdî çi hebû, hundurê mala xwu giş, heqê çeke mala da( jina Bin Bekir). Heqê hespa mala da, heqê kurk û ebê xelkê da. Tiştik nema, ew qîza xwu, qoşxanekik ma. Û rabû qîza xwu îdî bi pişta xwu hilda, qoşxana xwu girt, nirî boşik deve fenî ji Geltê da derkevi û tê. Û vîya şera reş pê da kir û çû. Çû deve di rê da tê, ew sê rê ra çû. -Şera reş, yanî ez heznî mi haaa!-

Go:

“Karvano, bazirgano! Ji boy Xwedê, ji boy Pêxember, go sûyarkî me wê da hatibû, go navê wî Bin Bekir bû, go çel mêrê xelkê kuştibû, go xelkê ji tirsa wî

newêribû bigota  û rüya çû go pişt da (paşê), go xelkê hat talanê me giş bir, tişkî me nehîşt.”

Go vana go:

“Tu pîreka Bîn Bekir î?”

Go:

“Erê.”

“Ê go bira Bîn Bekir sax bi, paşa sax bi, malê dinyê çi yi?”

Devaki mexel kiri û lê kir û çû.

Ê Bîn Bekir jî li wi ra gotî, “Mala mi pir i, nikani weri.”

Deve pir şandîyi. Bîn Bekir jî (kare) der û hundur diki.

Nirî karwan vay jor da tên. Ew paşa ber bê gat go:

“Xêr i, çer bûyi”

“Çi çer bûyi, go ar bi mala te keto go, ma tu çû nehat. Go çer bihîst tu çûyî go xwedyê mera hatin, go tiştê me giş birin, go a va beroşa me li cîrana mabû, go va beroşa me neçû. Go bi zorê mi xwu nû keçik xilas kir”

Paşê go:

“Bira serê me sax bî.” Paşê anî serê malê tejik kon anî, kon bi vê dirût, konik vegirt, çît da dorê, qatê nivîna  ji mala anî û malik tev kir, malik delalî kir, nivîn hat û…

Go:

“Jinik go mi di gora bavê nîyê go, îja gere êvar ez herim odê  û go e newêrim herim.”

Go:

“Hey mala te şewityo ma cîranê me pir i, ma xel giş deri odê. Ji vir da ez ê te bibim…

Jinikê êvarê go:

“Malno, şenno go golika me tuni, we nedîyî?”

Heya ew heri bigê odê, jinik qilavûz bi vê ra çû. Û ji wê da jî xel hat tu yê jî weri go.

Çû, êvarê li odê rûniştin paşê go:

“Malno, şênîno, peyano! Go her kes kare xwu miqate bi, go tebaki heyi go te kera dixwu.”

Û nirî Bîn Bekir  wecê tehl bû û rabû. Go:

“Wele Bîn Bekir çû.”

-Bîn Bekir ji tirsa rabû çû- Bîn Bekir çû hey teba way li ser ziblê wî sekinîyi. Nizanî teba yi, ji wî wenê kera wî yi. û ‘işk bi guhê tebayê digri û ço ço ço.

“Jinik, jinik mi di gora bavê nîyê! Te ker gire nedayi go îşev tebak heyi te kera dixwu.”

Jinikê rabû ben avêt nigê teba girê da serê sibê jinik rabû ser xwu ew di xew de yi. ser wî tije nivîn kirî ji tirsa ta girtîyi.

Jinikê go:

“Malno, şênîno! Ji bo Xwedê, we êvarê qala çi kirî li odê, go Bîn Bekir go vay tiştik anî di hundur da gire dayî, go enewêrim li hundur bisekinim. Go qe wer ji mala me derxin.”

Go peya hatin tev paşê, lê nêrîn, derxistin devre pê lîstin teba yi.

Paşê go:

“Wele daaniki Xwedê dayî mi, Bîn Bekir li pişta min i. Xwedî dujmin im.”

Êvarê go:

“Malîno, şenîno! Go giş gede xwu tê kin orta xwu û go tebak heyi bi şev di rocinê ra tê geda ji ber dîya digrê û dibi.”

Cardin bîn Bekir  rabû hat. Cardin go:

“Wele Bîn Bekir çû. Bîn Bekir derhal îşev teba dikujî.”

Hat:

“Jinik jinik, min gora bavê nçiyê! Çi min û tiradê eşîra? De nan heba me dixwar tune ba jî em birçî ji xwu ra malika xwu da bûn, te ez kirim ve qebhetê. Keçekê tê ki orta min  ê xwu û orxanê bavê ser min, nivîna, mi germ bineximî, mi ta girtîyi û tu gudar bi.”

Jinikê şonikik da ber cîyê xwu û jinik ket hela rocinê û nirî teba xwu di rocinê ra diki berdi. Jinikê şonik çeravêtê teba tep û hat. Hat kuştinê li erde ket.

“Malîno, Şênîno we  îşev qala çi kirîyi? Vî mêrikî tebakik kuştîyi, e newêrim herim hundir.”

Peya hatin, taba jî derxistin lê nirîn û keniyan û pê çîk bûn.

Bîn Bekir, tew rabû hema misînê xwu girt, tew newiri bi wê da nêze ki,aaa bere xwu bi wê da kir. Paşê go:

“Wele vaya ji mi maqûltir bû, go tewlê meze naki, bi şev kuştîyi û bir o li xwu danaynî lê meze ki.”

Êvarê cardin çû odê, go:

“Malno, şênîno go tiştik dikevi rez, go tiş di rez da nehîştîyi go, dibe xenzîr i dikevinê, Go îşev peya giş herin ber rez. Go herin ber rez go, bira xenzîr nekevî rez.”

Hat cardin jinikê ra xeber da go:

“Çiyê min û tiradê eşîra, ka ez ê çer herim?”

“Wey mala bavê şewityo! G oma hûn birri pey ani go, her yekê li derke biseni, tu yê jî ji xwu ra li derkê bisekinî û go win ê”duh” kinê go xenzîr e heri.”

Çû. Çû darik li ber rez i. Dar çev xwu ra kir go, “Ez ê hilkişim ser darê.” Û peyak wa şand, yek wa şand, yek wa şand, go:

“Herin nobetkê bigrin.”

O peya kir teqîn, bera xenzîra da û xenzîr hat qula xwu kuta darê û li bin darê da sekinîyi. Û ew jor da hezya hezya, hezya û hat xwarê û şeqa wî li histûyê xenzîr hat danîn î ‘işk bi her du guhê xenzîr girt. Û:

“Lawo wernê xenzîr! Lawo wernê xenzîr!

Û peya vir da wê da giş revyan çûn, hey li xenzîr sûwar bûyi û bi guha girtîyi. Û êdî peya girt û bir mala paşê ben kir serî, go:

“Hal û mesele… Go Bîn Bekir xenzîr girtîyi û lê Sûyar bûyî.”

“Lawo go, Daanik i, Xwedê va mêrxasa dayî mi, go baş i.”

Paşê êvarê cardin peya deri odê, dibe:

“Gelî malno, şênino! Dibe Havin Paşa, dujminê wî, cûyab şandîyi gotî, sibê herb i. Em ê sibe heri herbê.”

Û hesp anîn

“Bîn Bekir tu yê li kîjan sûyar bi?”

Ket nava hespa go:

“Vay ani, vaya ni vay ani…”

Cehneyakê çûçikkê şîre girt go:

“Ez ê a li vîya sûyar êm.”

Ê rişma nakevi serê vîya. Rabû hebinik anî kiri serî. Ê navê mêrik jî hevin Paşa yi. Hebin kir serê cehnyê û Mihîna Hevîn Paşa jî cehnî nuh ji ber girtîyi. Mihîn li wê hêlê hîşya  cehnî li vê hêlê hîşya. Û cehnîyê xwu ji cî cije kir û berî da gaziya wan û gaziya vana gişa da ser pişte. Ji wî wenê, Bîn Bekîr wer mêr i hicûm diki haaa. Û gazî gi çû û Hevin Paşa baz da û hebinê wî (Bîn Bekir) ji desta filitî û tim go:

"Lawo bermedin hebin, Lawo bermedin hebinê!"

"Oooo! Hevin Paşa go, tew navê min kirî Hebin."

Û Hevin paşa reviya û gazîya wi giş revya û vana li dû çû. Mêrik çû xwu li mala xwu hil kir û vana li dû çû, hebinê xwu girt, vegerya û Hevin Paşa hat ber destê vî  paşayî tobe kir, go:

"Va Mêrxasê te l imin wa kir go ez êdî dujminatiyê bi te ra nakim."

Û li hev hatin.

Û xelîşoka me qediya, rihmet li dê bavê guhdara, Xêncî şêytanê li ber dîhara.

### 1.3.4. Dîkil Axa

Dibêjin hebû tunebû, pîreka uncuzî û dîkekî wê hebû. Pîrê wisa pîr bû ku tenê du diran di devê wê de mabûn, loma jî jê re digotin Pîra Dudiran. Rojekê, dema pîrê mala xwe şirt dikiri, serîyek çortan li erdê dît û rabû danî ser kungîyê. Di wê navberê de dîk jî birçî bû û ji xwe re li wan deran li qûtekî digerîya. Dîk rastê serîyê çortên hat û rabû ew xwar. Dema pîrê dît ku dîk serîyê çortanê wê xwarîye gelekî hêrs bû û rabû şonikek li qorika dîk xist, qorika wî şikand. Dîk ji ber derba şonikê pîrê pengizî derve çû li tepikê rêxê qelibî. Tepikê rêxê got:

-Xêr e xalê Dîk, ma tu bi ku de diherî?

Dîk got:

-Wey mirina bavê xalê Dîk!

Tepikê rêxê got:

- Lê bibêjim çi?

Dîk got:

-Bibêje, Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Tepikê rêxê got:

- Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Dîk got:

-Diçim çol û çolistan, Diçim ber û beristan, Da bînim leşkerekî giran ser Pîra Dudiran, Ku qorika min şikand, Ji bo serîyek çortan.

Tepikê rêxê got:

-Ez jî bi te re têm.

Dik got:

-Baş e, were.

Dîk û tepikê rêxê ketin rê û çûn. Çûn, çûn rastî marekî hatin. Mar got:

-Xalê Dîk, ma tu weha bi ku de diçî?

Dîk got:

-Wey mirina bavê te xalê Dîk!

Mar got:

-Lê bibêjim çî?

Dîk got:

- Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Mar got:

- Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Dîk got:

Diçim çol û çolistan, Diçim ber û beristan, Da bînim leşkerekî giran ser Pîra Dudiran, Ku qorika min şikand, Ji bo serîyek çortan.

Mar got:

-Ez jî têm.

Dîk got:

-Baş e, were.

Dîk û tepikê rêxê û mar ketin rê û çûn. Pir çûn hindik çûn rastî kerekê hatin. Kerê got:

-Xalê Dîk, tu weha bi ku de diçî?

Dîk got:

- Wey mirina bavê te xalê Dîk!

Kerê got:

-Lê bibêjim çî?

Dîk got:

- Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Kerê got:

- Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Dîk got:

-Diçim çol û çolistan, Diçim ber û beristan, Da bînim leşkerekî giran ser Pîra Dudiran, Ku qorika min şikand, Ji bo serîyek çortan.

Kerê got:

-Ez jî têm:

Dîk got:

-Baş e, were.

Dîk û tepikê rêxê û mar û ker ketin rê û çûn. Çûn çûn, rastî bangêranekî (loxekî) hatin. Bangêran got:

-Xalê Dîk, tu weha bi ku de diçî?

Dîk got:

-Wey mirina bavê xalê Dîk!

Bangêran got:

-Lê bibêjim çî?

Dîk got:

- Bibêje,Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Bangêran got:

- Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku?

Dîk got:

-Diçim çol û çolistan , Diçim ber û beristan, Da bînim leşkerekî giran ser Pîra Dudiran, Ku qorika min şikand, Ji bo serîyek çortan.

Bangêran got:

-Ez jî bi we re têm:

Dîk got:

-Baş e, were.

Dîk, tepikê rêxê, mar, ker, û bangêran bi hev re berê xwe dan mala pîrê. Tepijê rêxê çû ket tifikê, mar çû xwe li kutê gerand, bangêran çû ser xênî, kerê li pişt derî xwe veşart û dîk jî çû ser darê. Serê sibê dema Pîrê çû ku tifikê dade, tepikê rêxê xwe di destê wê gerand, destê wê giş di rêxê de ma. Dema pîrê çû destê xwe bi paçê ku bi kutê ve bû paqij bike, mar bi destê wê veda. Pîrê ji ber jana destê xwe baz da derve, lê li ber derî ker bi zîtikan çûyê, ew virvirand hewşê. Li ser vê, rabû revîya çû ser xênî, ji bo ku li cîranan bike hawar û gazî û alîkarûyê ji wan bixwaze. Lê îcar jî bangêran xwe bera ser da. Pîra Dudiran êdî nizanîbû çi bike, hema ji erdê rabû dawa xwe xist devê xwe û revîrevî ji hewşê baz da û çû. Bi vê serkeftina li hember Pîra Dudiran dîk gelekî kêfxweş bû û dest pê kir bang da, got:

-Qîqila qîîîîî.....qîîîîîî....

### 1.3.5. Sewîlê Sofî

Sofîk hebû; sewîlê xwe bir û çû serê kaniyê, da ko destmêj bigirê. Vêca sewîlê danî bin latekê û çû ko destê xwe bişo. Vegeriha cem sewîlê xwe dî lat bi ser sewîlê wî de ketiye, sewîl şikestiye. Sofî gote latê: Çima te sewîlê min şikand?

Latê go: Na xwe, çima giya di bin min de şîn dibe?

Sofî gote giyê: Ji bo çi tu di bin latê de şîn dibî.

Giyê go: na xwe, ji bo çi pez min dixwin?

Sofî gote peza: Ji bo çi hon giyê dixwin?

Peza go: na xwe ji bo çi gur têne me?

Sofî gote gura: çima hon têne pez?

Gura go: na xwe, çima se têne me?

Sofî gote sa: çima hon têne gur?

Seya go: çima kebanî me têr nan nakin?

Kebaniya go: naxwe, çima mişk hebana min qul dikin?

Sofî gote mişka: çima hon hebana qul dikin?

Mişka go: na xwe, çima kitik têne me?

Sofî gote kitika: çima hon mişka dikujin?

Kitika go: em mişka dikujin û di dora mala xwe de didine xwe.

Sofî dev ji van berda û perçeyê sewîlê xwe dane hev. (Ronahî, Hejmar: 22, Kanûna Paşîn 1944)

## 2. TEZİN İKİNCİ BÖLÜMÜNDE ANALİZ EDİLEN MASALLAR

### 2.1. Hayvan Masalları

#### 2.1.1. I. Şêr û Xulamê Şêr

Li şêristanê şêrek pir bihêz hebû. Bi tu awayî bi şêran re lêknedihat. Bi xwe jî bi hêza xwe nedizanîya. Ji ber vê hêza zêde û bi xwe jî bi xwe nedizaniya, gava bi şêran re jî bileyîsta ew tehl dikirin. Di eynî gavê de nedikarîya nêçîran jî bi hêsanî bigirta û goştê wan bixwara. Hêza zêde goştê wan heywanan nêçîrkirî ji hev dertêxist

û taromar dikir. Welê dikir ku ew goşt êdî nedihate xwarin. Ji bo sehî kirina hêza wî qe nebe, di nêçîrê de, jê re xulamek peywist bû. Ew jî di şêristanê de nedipeyidiya. Ji bo pêkanîna vê kêmasîyê bivê nevê dê ji welatê xwe derkeve. Xwezayî dilê wî bi welatê wî ve bû û destê wî ji heval û hogiran, bav û biran, pismam û lê ziman û ji cihê bav û kalan nedibû. Lê karê bihata kirin jî tunebû. Li wir hemî şêr bûn û şêr nedibûn xulamên şêran û nabin jî. Şêrê hêzdar biryara derketinê da û dest bi amadekariya xwe kir.

Her çiqas hinek heval û hogirên tikaya neçûnê kirin jî wec negirt. Hinek hevalan jî pê re çûn daxwaz kirin, ew jî nehate pejirandin. Bi kurtasî ji bo neçûnê, çi dixwest hate kirin, hêç kêr nehat. Lê nêrîn ku çara neçûna wî tune, dev jê berdan.

Şêrê hêzdar amadehiya xwe qedand, ji her kesî xatir xwest û derket çû. Xwezayî bereka wî ne kifş bû. Qasî tê zanîn tenê ew e ku şêr ji xwe re li xulamekî digere. Rastî kîjan celeb heywanan tê bi çavên xulamiyê lê dinêre, çavên wî nabire û pêşniyar jî li wan nake. Gelek çiya gelî, newal, deşt û zozan gera, gore mercên xwe tu heywan bi ber çavên wî neket.

Şêrê hêzdar çiyakî de ber bi jêr dadiket. Rovîkî jar, weza û pirçonekî rastî wî hat. Ji serî heya lingan mêzand. Zanî ku ev rovî bê kêmasî kêrê wî celeb xulametiyê tê. Şêr biryara xwe da ku pê re bipeyive û pêşniyara xwe lê bike. Heger li hev hatin peymana xwe çêkin û hêdî hêdî dest bi xebata xwe bikin.

Şêr:

- Tu ji ku yî?

Rovî:

- Ez ne ji vir im, ji bakur hatime vir.

Şêr:

- Tu çire ew qas jar û weza yî, qey tu nexweş î?

Rovî:

- Na, ez nexweş im. Ji birçiyan ez ketime vê hewala bed.

Şêr:

-Nexwe ezê pêşnîyarekê li te bikim, heger tu bipejirînî tu yê her roj têr bixwî. Di nav du sê mehan de tu yê wisa zexim bî, bibî mîna şêr. Êdî tu heywan jî naxwî. Bi wan heywanên eware re jî nagerî. Her dem dê tu bi mehqûlan re bigerî. Dê qedir û rûmeta te jî di nav hevalan de zêde be. Bi kurtasî di her karî de tintêl biguhere. Xwezayî ew pêşnîyara min him kêra min tê him jî ya te. Tenê girîngiyek tê de heye. Ew jî xweneşaşkirin û ji ser xwe neçûna te ye. Heger tu bikarî xwe ragirî, şaş nekî, ji ser xwe neçî û nebêjî "pêşî ez çi bûm û niha bûme çi" dê ji te re pir baş be û heger tu vajiyê van gotinan bikevî, dibe ku serê te jî tê de here.

Rovî:

- Ez heywanekî bê çare û belengaz im. Bê kes û bê hêz im.

Jar û waza me. Pence û diranên min jî bê kêr in. Her çiqas hindek candar me ji cinawiran dihejmêrin, bi zanîna min ev çewt e. Belê, em goştxwer in û carna jî heywanên mîna mirîşkan didizin û dixwin. Ev nabe nîşana cinawiriya me. Zêdeya jîna me li ser axayên mîna we ne. Pilbûn û berxwe re çûn ne karê yên mîna min in. Fermo, guhdarê pêşnîyara we me.

Şêr:

- Dixwazim bibî xulamê min.

Rovî:

- Ji xwe ez li karek welê digerim. Lê belê ezê çi kêra we bêm û dê peywira min çi be? Heger bizanim dê ji we şermî nebim û kêra peywirek we bêm, bi dilxweşî ezê pejirînim û bi xulametiya zatê we serfiraz û bextiyar dibim.

Şêr:

- Hemin e tu kêra karên min têyî, lewra ez vê peşniyarê li te dikim. Wisa hezir dikim ku di vî karî de tu şermî jî tune. Rovî ji peywirên xwe re pir hajdar in.

Peywira te pir hêsan e. Peywira te, tenê di nêçîran de ye. Ew jî nikarim hêza min e. Ez bi hêza xwe nizanim û tenê jî nikarim hêza xwe bisazînim. An kêm dimîne, nikarim nêçîrê bigirim, an jî zêde dibe û nêçîrê taromar dikim.

Rovî:

- Erê, axayê min ezê rebenê Xwedê, bi çi awayî û bi çi rewşê, hêza şêran dê bisazînim? Ev kar bi min pir kotek e. Di hezra min de, tu gavî ez ji bin vî karî dernakevim.

Şêr:

- Na, na, ne ew qas kotek û zor e.

Şêr:

- Axa! Çawan hûn dibêjin, "ne ew qas kotek û zor e" tika dikim ji bîr mekin ku ez rovî me û dizê mirîşkan im. Ji dizîna mirîşkan girantir min heya niha tu karek nekiriye. Min wisa hezir dikir ku dê hûn di hokara min de kar bidin min û min bidin xebitandin.

Ew jî rehberiya riya qinika mirîşkan e. Na, na, ev karên hûn dibêjin ji min pir dûr e. Tu gavê ez vî karî nikarim bikim. Ji we bexişandina xwe dixwazim. Ezê herim ji xwe re li rizqekî bigerim.

Şêr:

- Çawan tu dihizirî ne welê ye. Ezê ji te pirsan bikim. Tenê peywira te rast û dirst bersiv dana pirsan e û bi wan pirs û bersîvan ezê bi hêza xwe bizanim û xwe bisazînim. Di vî karî de yek berpirsiyarî heye. Ew jî ne rast bersiv dana pirsan e ku tu jî vê yekê nakî.

Rovî:

- Tuyê pirsên çi ji min kî?

Şêr:

- Tenê ezê sê pirsan bikim: Yek - pirsa soraya çavên min, dudu - pirsa gizirbûna pirça pişta sitûyê min, sisê - pirsa qêrbûna dûvê min dê bêt kirin. Gava ev pirsên han dirist hatin bersiv dan mijara me dipişkive. Ev jî ne karekî kotek e.

Rovî:

- Min têgiha vî karî nezanî.

Şêr:

- Têgih pir hêsan e, gava soraya çavan, gizirbûna pirç û qêrbûna dûv di binê qeydê de bin nikarim nêçîr kim û gava li ser qaydî re bin nêçîrê taromar dikim. Ji te re vê jî bêjim: Ew nêçîrên ji alî min ve têne kirin, têne ez mejiyê wan dixwim. Yên din dê ji te re bimîne. Te divê hemî bixwe û te divê bi heval û hogirên xwe bide xwarin.

Rovî:

- Belê, axa min zanî û pêşniyara te dipejirînim.

Piştî peymanê, şêr axa û rovî xulam bi hev re çûne nêçîrê, geran tu nekirin. Her du jî zehf birçî bûn. Demek zûtir bidestxistina nêçîrê peywist bû. Di çiyan de gelek geran lê wec negirt. Her du jî westan û xwe dane binê darekî rûniştin. Piştî qasek hesîne kirinê dîtin ku rêwîkî hespan di serî çiyê de qulipî. Axa û xulam ji ciye xwe rabûn û bi alî rêwiyê hespan ve çûn. Li nêzîkî rêwî, di her kevirekî de, şêr xwe li ber hespekî ciwan qelizand pirsan û bersivan destpêkir.

Şêr:

- Xulam! Çavên min sor bûne?

Rovî:

- Belê axa.

Şêr:

- Xulam! Pirça pişta sitûyê min gizir bûye?

Rovî:

- Belê axa.

Şêr:

- Xulam! Dûvê min qêr bûye?

Rovî:

- Belê axa.

Piştî qedana pirs û bersîvan,şêr mîna babelîsk xwe avêt li ser pişta hespê ciwan û qelew girt. Hespên din revîn û çûn. Hespê girtî di dest şêr de wek hêsîrekî ma. Şêr di du sê rahejandinan de can jê derxist. Gava hesp bê can ket erdê, rovî şad bû. Ango ji gostê wî re şad bû. Şêr pencek li serê hespê xist û şikînand. Mejî jê derxist û xwar. Dû re gazî rovî kir û ,'were keda xwe bi xwe. Ev goşt bi keda te hatiye himatê. Ji îro paş emê her dem keda hevdu bixwin' got û bi zikê têr çû li bin siya dara hêrvist veket.

Rovî jî bi dilekî xweş û bê tirs çû li ser goştê hespê rawesta û paşê dest bi xwarinê kir. Di xwarinê de lez nedikir. Çend rojek bû ku rovî tu xwarin nexwaribû. Heger lez bikira ango zêde bixwara, bê ewle bû. Rovî bi vê yekê dizaniya. Dema domek dirêj birçî bimînin,divê hindik û hêdî bixwin, heya firişka wan qasek nerim bibe. Rovî jî ev pêktanî.

Piştî du demijmêran rovî dîsa çû li ser cendek û dîsa qasekî ji wî goştê qelewê xweş xwar. Bi vî awayî heya du rojan domand. Piştî du rojan êdî tu xeter nemabû. Înca rovî bi hemdê xwe xwarin dixwar û roj bi roj zexim dibû.

Axatî û xulamiya şêr û rovî gelek domand û rewşa nêçîa wan hêç neguherî. Lewma şêr ji wî awayî zêde nedikariya nêçîr bikira. Şêr dîsa tenê mejiyê heywanan dixwar û cendek ji rovî re dihişt. Rovî jî qasek jê dixwar û yê din pêşkêşî hevalên xwe dikir. Bi vî awayî roviyê me bi lehengî û merdaya xwe navdar bû. Zeximayî û hêza wî jî roj bi roj zêde dibû. Rovî ji ber namidarî, zeximayî û hêzdariya xwe, pil bû û ber xwe re çû.

Rovî bi xwe ji xwe re:'Va çand sal in ku ez li bal şêr im, tevger û rewşa nêçîran jê hînbûm. Hunerên wî, pîşeyên wî û sedemên serkevtinên wî giişk têgiham. Nexwe çire venaqetim,naçim û bi serê xwe najîm. Ne ku bi tena serê xwe bijîm, dikarim xulaman jî bigirim. Serfesala min û hêza min di cih de ye. Zerpodestiya min û xortiya min ji ya şêr çêtir e. Dost  û hevalên min ji yên şêr hê pirtir in. Ji ber ku şêr ne ji vî welatî ye, bê pismam û lêzim e, yên min gelek in. Di vî deravî de jî şansê min ji yê şêr pir zêdetir e. Nexwe ji îro xweştir roj tune. Divê herim şêr bibînim û pêşniyara veqetanê lê bikim' got û li şêr gera. Lêgerana şêr gelek dem hilanî û paşê di bin siya darekê de veketî xwiya. Rovî xwe amade kir û hêza xwe hemî berhev kir,pêşniyara xwe danî ber şêr.

Rovî:

-Axayê min, va ye çendî çend sal in ez xulamê w eme. Min tu tehliya xwe ji we nedîtiye. Jar hatim li bal we zexim bûm. Xizan hatim dewlemend bûm. Bê hêz hatim bi hêz bûm. Bi kurtasî jîna min deyndarê cenabê we ye. Xwezayî nikarim van başiyan ji bîr kim. Ezê başiyên we ji weledên xwe re bibêjim.Hêvîdar im cenabê we dê li kêmasiyên min nemêzînin. Hûn dibînin ku ez gelek westame û êdî  bê kêmasî kêra karên we jî nayêm. Ji wan sedeman bexişandina xwe ji cenabê we daxwaz dikim. Heger hûn vê başiyê b imin re bikin, dê bextiyar bim.

Şêr:

-Ez di te de hêç westanê nabînim. De ka j imin re sedemên binyatî bêje.

Rovî.

-Axayê min ê berêz, ji bil westanê hêç sedem nîne.

Şêr:

-Ez bi van gotinan naxapim. Hê di serî de min dabaşa hinek xeteran kiribû.

Rovî:

-ji min bawer bikin, mebesta min ew bû min ji we re got.

Şêr:

-Min dixwest ku ez bawer bikim. Lê di bin vê mijarê de ez du bûyerên girîng dibînim. Yek jê zexeliya roviyan e. Ya dudan êdî girîng e; tu gorê xwe zexim bûyî, hêza te jî hatiye cih, domek dirêj b imin re mayî, tu li nik xwe dizanî ku tu hînî pîşê şêran bûyî û di nav heval û hogirên te de,rûmeta te çêbûye. Dixwazim tu bizanî ku ev bûyerên han te dixapînin. Ev xapandox in. Tu ji vê sewdayê wec nabînî. Hilo guhdarê min be, dev ji vî karî berde û rovîtiya xwe ji bîr meke.

Van şîretên durust jî li rovî bandor nekir û ji yeka xwe ne hate xwar.

Rovî:

-Na, axayê min,hizirînek min ya welê nîne. Tenê dixwazim qasekî hesîne bikim û ji zatê we jî şermî nebim. Başiya we pir gihiştiye min û hûn zatekî mezin in. Naxwazim di xizmeta we de, kêmasiye min bimîne. Baweriya we dixwazim ku hemî ev qas e.

Şêr:

-Wekî  tu dixwazî, va ye ji alî min ve tu destûrdayî yî. Fermo here. Qewîtiya min li te, tu carî tu ji hêza xwe û ji bejna xwe zêde nekevî bin tu karî û tu carî xwe jî, ji bîr mekî. Heger tu van qewîtiyên min pêk binî, tu carî nakevî tengasiyan. De ji te re oxir be.

Rovî:

-Ji we destûra ramûsana destên we dixwazim.

Şêr:

-Na, ramûsana destan naxwaze.

Rovî :

-De bi xatirê we.

Şêr:

-Riya ete vekirî be û bextê te ji te re yar be.

II. Roviyê Axa û Roviyê Xulam

Bi vî awayî rovî ji şêr veqeta. Dema şêr û rovî hev dîtibûn heya niha şêr çi gotibû û dabaşa çi kiribû, hemî mîna perda sinemayê li pêş çavên wî re derbaz bûn. Gava qewîtî û şîretên şêr bi bîrê ket, qasek li ser rawesta û bixwe ji xwe re: ‘dibe ez şaş im û bi xwe nizanim? Na, na, ez ne şaş im. Hêz be li bal min heye, zanîn be li bal min heye. Huner be li bal min heye û pîşê nêçîrê be gelek rind dizanim. Nexwe çi ji min kêm e? Na, na, şêr bi min nizane. Ez çêtir xwe dinasim. Di vê mijarê de gotinên mezinan hene:’Kes hingî mirov, mirov nanase. Kes hingî mirov bi xwe nizane’ dibêjin û rasr e jî. Heger şêr hingî min ez bi nasima, mitliq ew qewîtî û şîret li min ne dikir. Yek jî mezin her dem piçûkan bihê piçûk dibînin. Dîsa gotinek mezinan:’Ew riya tu dizanî rast e, heger tenê jî bî pê ve here’ dibêjin. Va ye ez vê riyê rast dizanim û rast dibînim. Şêr bi van karan hêç û hêç nizane weselam’ got û dilê xwe xweş kir.

Şêr jî, ji bo roviyê xulam gelek rencor bû. Lewra şêr dizaniya rovî xwe dixapîne. Bi hêz û zeximaya xwe pil bû ye û bi navdariya xwe jî ber xwe re çûye. Heger ev rovî zû neyê hişê xwe dê felaketekê bîne serê xwe eku nekare ji bin derkeve û xulamîtiya min jî jê re bibe ziyan. Di vê mijarê de tu kar ji destên şêr nedihat. Tenê dikariya ji Xwedê fîzar bikira ku felaketa pêşî piçûk bûya. Belki hişê rovî baniya serî.

Rovî piştî ponijîna xwe biryar da ku ji xwe re xulamekî bigire û welê hizirî ku gelek roviyên birçî hene, betal in jî û li kar jî digerin. Gava pêşniyar ji wan re biçe, bi dilê xweş dê bipejirînin, heger ev hêz û zeximaya di min de heyî bizanin, ji xwe dê ew ji min re pêşniyaran bînin. An jî gava bizanin, ji nêçîrên hatî girtin, tenê ezê mêjiyên wan bixwim, cendek hemî ji wan re bihêlim, dê şev û roj l imin bigerin hey amin bibînin’ hizirî û rabû çû.

Rovî qasekî gera. Rastî roviyekî weza hat. Gava dît tintêla wî ya berê hate pêş çavan û pê re peyivî.

Roviyê weza:

-Hezir dikim ku tu ji malek mezin î û te xizanî û birçîbûn nedîtiye.

Roviyê zexim:

-Heger min nedîbe jî hewalên wan dizanim.

Roviyê weza:

-Nexwe gotin naxwaze.

Roviyê zexim:

Gotina min heye, dixwazim te ji vê hewalê ruha kim.

Roviyê weza:

-Bi çi awayî?

Roviyê zexim:

-Ez nêçîrvan im. Tu jî bibe xulamê min. Tenê ez mejiyê heywanan dixwim. Cendek hemî ji ye re dihêlim. Tu dixwazî wan cendekan hemî bixwe û dixwazî beşek ji wan bide heval û hogirên xwe. Di demek kin de tûyê zexim bibî û di nav heval û hogirên xwe de, bibî xwidan rûmet.

Roviyê weza:

-Erê bira, ez jî rovî me tu jî. Heya niha min seh nekiriye , rovîkî bibe xulamê rovîkî din . Yek jî tu dabaşa nêçîrvaniya xwe dikî. Min roviyê nêçîrvan jî hêç nebihîstiye û di dîrokan de jî min rovî axa, rovî nêçîrvan hêç nebihîstiye. Ew karê han li min biyanî dixwiyê. Heger hokarê roviyan ji min bipirsin, bê rawestan ezê, 'dizê mirîşkan in' bibêjim. Va ye tu dabaşa axatî û nêçîrvaniya roviyan dikî. Dibe ku roviyên ewan şoreşek li dar xistibin, cîhan di lehê roviyan de fetilandibin û hêç agahe min jê çênebibe.

Roviyê zexim:

-Beredayî nabêjim ez nêçîrvan im. Va çend sal in ez tême perwirandin. Dîsa beredayî doza axatiyê nakim. Tu serfesal û zeximaya min dibîni. Te heya niha rovî mîna min zerdodest û zexim hêç ditibûn? Na, ez ne bawer im. Nexwe ji îro paş divê tu ji min re "axa" bibêjî. Piştê bikaranîna vê yekê em dikarin bipeyivin.

Roviyê weza:

-Heger ez pêşniyara we bipejirînim dê peywira min çi be?

Roviyê zexim:

-Peywira te sazandina hêza min e. Ew jî bi bersîvdana çend pirsan pêk tê . Ango Hezâ min carna kêm û carna jî pir zêde ye û ez xwe nikarim bisazinim. Vî karî her gav bi arikariya xulamekî pêktînim.

Roviyê weza:

- Dîsa min nezanî ka ew çi pirs û bersîv in.

Roviyê zexim:

-Ezê pirsa sorbûna çavên xwe , gizirbûna pirça pişta sitûyê xwe û qêrbûna dûvê xwe ji te bikim. Peywira te rast bersîvdan e. Heger bersîvan çewt bidî em bi sernakevin.

Roviyê weza:

- Baş e, ew karî tu jê dabaş dikî , peywendiya wî çi bi nêçîrê re heye?

Roviyê zexim:

-Peywendiya wî karî bi nêçîrkirinê re ev e: Gava sorbûna çavan, gizirbûna pirç û qêrbûna dûv di binê normalê de bin nikarim nêçîrê kim û li ser normalê re bin nêçîrê dêriz dikim. Ji ber vê yekê peywira te ji min re girîng e û nayê ihmal kirin.

Roviyê weza:

- Belê min pêşnîyara we pejirand. Ji îro paş ez xulamê we me û min peywira xwe jî zanî.

Roviyê zexim:

- Min jî tu bi xulamî pejirandî. Ji îro paş tu xulam û ez axa. Xulam bi xwişîş bû. Tu gavî nedikariya lehengî û neçîrvaniya axayê xwe tam bipejiranda. Bi xwe ji xwe re, "Rovî çiqas zexim bibe jî dîsa ji rovîtiyê nikare derkeve. Qey dema axayê min xwe li ber nêçîrêkê mezin amade bike û mirîşkek tê re dervaz be, dê dê dev ji wê nêçîrê bernede û li pê mirîşkê neçe? Belê, dê biçe. Qey pêncên wî ne pêncên roviyan e û diran û şirnikên wî ne diran şirnikên roviyan e? Belê, hemî jî yên roviyan in. Pa dê bi çi nêçiran heywanên gir bike? Nizanim. Qey mîna mirovan çêke hesin çêkirine ku pê nêçîr bike? Na, Pa ev axa bale ye, an xwe di neynika dêw de dibîne? Bi kurtasî min tu ji vî axayî nezanî. Divê ez qasek hewiyê bikim, heya ka dê çawa be" got û çû nik axayê xwe.

Axa û xulam bi hev re rê ketin û çûn. Ew roj heya hingorê, bê rawestan geran. Lê hêç rastî heywanekî nehatin û birçî man. Çend rojan welê li nêçîrê mezin geran, hêç karek bi dest wan ve nehat. Birçîbûna wan gihişte niqira dawî û di vê tintêla birçîtiyê de rastî mirîşkekê hatin. Axê nişkeve xwe havêtê û girt, anî, danî ber xwe û xulam, her dukan bi hev re xwarin.

Cardin li nêçîra heywanên qelew geran. Ne çiya hijtin ne jî deşt. Dîsa westan û tu jî bi dest wan neket.

Axa û xulam li bin siya darekê rûniştibûn û ji dûr ve rêwîkî hespan xwiya. Her du jî şad bûn. Bi alî hespan ve çûn û nêzîkayî li wan kirin. Axê canîkî du salî hilanî çavên xwe û ji xulam pirsî.

Axa:

- Çavên min sor bûne?

Xulam:

- Na.

Ji xwe axa ji wê caniyê du salî tirsa bû. Rabû û ji xulam re: "Goştê vî nexweş e. Dilê min kete goştê wê caniya hûr a sê mehî."

Axa û xulam çûne nêzîkî caniyê sê mehî, li ber kevirekî rûniştin û axê dîsa xwe qelizand, ji xulam pirsî.

Axa:

- Çavên min sor bûne?

Xulam:

- Na welah.

Axa:

- Pa belê welah.

Xulam:

- Pa belê(!) welah, belê (!) welah.

Axa:

- Pirça pişta sitûyê min gizir bûye?

Xulam:

- Na welah.

Axa:

- Pa erê welah.

Xulam:

- Pa erê (!) welah, erê (!) welah.

Axa:

- Dûvê min qêr bûye?

Xulam:

- Na welah.

Axa:

- Pa erê welah.

Xulam:

- Pa erê (!) welah, erê (!) welah.

Axê çavên xwe bel kir, dûvê xwe rep kir, rikê xwe anî û xwe avête li ser caniyê. Canî silikî, rovî axa ket, mehînê fincikek lêxist û kuşt. Xulam rovî ji goştê wî têr xwar û çû.

### 2.1.2. Se û Rovî û Dîk

Carek ji caran seh û dîkê malekê, ji kirinên malbatê aciz bûne. Nemaze ji kêmxwarin û pêlîstokiya zarokan bêzar bûne. Dawiyê dîk gotiye seh:

-Em ji bo çi wiha bende û xulamên benîademan in. Were em jî biçine çiyayekî, zozanekê. Ji bo xwe cihekî xweş bibînin û li wir bimînin. Azad û serbixwe bijîn.

Seh jî ev pêşniyara dîk qebûl kiriye û bi hev re derketine serê çiyayekî. Dema li wan bûye êvar, li cihê razanê geriyane. Dareke xweş dîtine. Dîk çûye ser darê. Seh jî ji xwe re li nav teraşên di binê darê de cihek çêkiriye. Kêfa wan pir xweş bûye. Jixwe ji spêdê heta wextê razanê li kef û destan, gir û çolan li nav mêr û çîmenan geriyane. Ji kêfxweşiyê mest bûne. Dema cihê razana xwe jî dîtine, pix ketine xewê. Heta berê spêdê xeweke şîrîn kirine…

Dema bûye spêde, şeveqê daye dîk, ji xew rabûye. Ji dilekî saf û dengekî xweş bangek daye ku heta wê saetê tu kesî bangeke wisa zelal li wir nebihîstiye. Tu nabêjî roviyek li wan deveran hebûye. Çawa ew dengê zelal û xweş bihîstiye av ji

devî hatiye xwarê. Bi bez nezîkî cihê deng jê tê vebûye. Dîtiye ku dîkek li ser darê ye. Pir kêfa rovî hatiye bi dîtina dîk. Gotiye:

-Ohoo merheba birayê dîk. Çi dengekî xweş û bejnûbalek delal li ser te heye. Ka were xwarê em bi hev re biaxivin.

Bes dîk şareza bûye û rovî jî baş nas dikiriye. Ji ber hindê qet bersiva rovî nedaye. Rovî dîtiye ku dîk di xwe re dernayne vê carê jî wiha gotiye:

-Birayê dîk, xêr e, tu bo çi hatiye vir?

Dîk gotiye:

-Ji bo ku em minneta benîademan nekin hatine. Ji niha û pê de emê li çiya bijîn.

Rovî:

-Madem wisa ye, ez jî bibim  cîranê we.

Dîk:

-Birayê rovî li wêra ha muxtarê me heye. De ka ligel wî jî biaxive, paşê emê biryara xwe bidin.

Rovî kêfxweş bûye. Hizra wî dîkekî din bûye, gotiye:

-Kanê li ku ye muxtarê we?

Dîk:

-Aha wa ye, li binê wê teraşê.

Rovî bi kêf nezîkî teraşê bûye. Hêdîka le nihêriye ku çi bibîne; heywanekî carekê du caran wekî wî li wir razabûye. Dema seh dîtiye xwe bi paş ve avêtiye û reviyaye. Heta roja paştir xuya nebûye. Lê belê roja paştir di eynî saetê de dîk dîsa bang daye. Rovî dîsa dengê dîk bihîstiye û hatiye cem. Dema dîk rovî dîtiye jê pirsiye:

-Birayê rovî kanê tu dê biba cîranê me?

Rovî bi hêrs gotiye:

-Ax ax, birayê dîk. Welleh heta ku ew muxtar muxtarê we be, hûn yek bin yeka we nabe du. Tu kes jî nabe cîranê we…

### 2.1.3. Rûvî û Tozbeg

Rojeke payîzê ya bi sur û serma bûye. Asîmanê girtî, şîlî û şilopê miziginiya zivistan didan. Êdî keriyê pêz û birên garanan li çolê tunebûne. Ji ber vê jî, rûviyekî ji halê xwe raze li çolê digeriya. Gelî û gavan ji wî re mabûn.

Ji piştî rêwitiyeka dûr û dirêj, rûvî hatiye di newalekê da, li ber avakê rastî aşekî hatiye. Ew teletel çûye nêzîkî derêê êş. Rûvî dîna xwe dayê, ku aşvaan di hundurda tenê ye. Wî ji xwe ra agir geş kiriye û li ber rûniştiye.

Rovî hatiye ber deriyê êş û carek din, bi balkêşî dîna xwe dayeb rewşa aşvên. Hinekî sekiniye, paşê deng daye wî; jê pirsiye:

-Êvar baş ji te ra, xorto! Wele kêfa te jî kêf e, ha!

Destûra te hebe, ez jî xwe li ber wî agirê geş xwe germ bikim? Çewa ku tê xûya tu tenê yî. Ku tu bihêlî ango destûrê bidî, ku ez jî xwe germ bikim, ez ê jineke bedew ji te ra bînim. Te jî vê tenêbûnê, ji vê zelûliyê xelas bikim.

Aşvan serê xwe bilind kiriye. Wî lê nihêriye, ku li ber deriyê êş rûviyek sekiniye. Van peyvana, ji wî ra dibêje. Wî lê vegerandiye û gotiye rûvî:

-Were, were! Tu jî xwe bide ber vî agirê germ!

Rûvî hêdî hêdî nêzîkî êgir hatiye, xwe germ kiriye. Paşê hinekî daye hişê xwe û gotiye aşvên:

-Mala te ava be, bira! Ez ê rojekê ji bin vê qenciya te derkevin. Xorto niha guh bide min. Tu dizanî, keçeke waliyê vê herêmê heye. Yeka gelekî bedew e. Eger

tu bixwazî, ez ê wê qîza walî, ji te ra bixwazim. Ka hema em dest bi danîna palana xwe bikin. Niha baş guh bide min. Mêzêneke te heye?

Aşvên bi balkêşî rûvî guhdarî kiriye. Hinekî jî şaş û metel mabûye. Lê wî dîsa jî bersiva rûvî daye; jê re gotiye:

-Belê, heye, Tê mêzênê çi bikî?

Rûvî gotiye wî:

-Tu bersiva min bide. Çend quriş perê te jî hene?

Aşvên bersiva wî daye; jê ra gotiye:

-Belê, hene.

Rûvî destên xwe hevûdi dane û gotiye wî:

-De ka wan bîne vira!

Aşvan rabûye ser xwe, mêzênek û çend quriş anîne, dane rûvî. Rûvî ew alavên ku aşvên anîne, ji destên wî girtine û gotiye wî:

-De were vê mêzênê li ser pişta min bişidîne.

Aşvên mêzên li ser pişta rûvî şidandiye. Rûvî gotiye wî:

De niha jî, van çend qurişan, di mêzênê da biçikîne!

Aşvên va gotina rûvî jî bi cih aniye. Rûvî tivdarekê xwe kiriye. Xatirê xwe ji aşvên xwestiye, rabûye daye ser rê û çûye bajarê walî. Dema ku rûvî digihîje bajarê walî, ji çend kesan pirsiye. Di dawiyê darêya mala walî serast kiriye û çûye ber derê wî. Wî der û dora xwe nihêriye, bala xwe dayê, ku walî û cîvata wî rûniştine.

Walî bi nişkê va dîtiye, ku rûviyek li ber dêrê wî sekiniye. Lê belê rûvî quncilê xwe kiriye, stûxwar îskeîska wî ye, digirî, Walî rabûye çûye ba rûvî; jê pirsiye:

-Rûvî ew çi halê te ye? Tu çima digirî? Kêji te ta çi got?

Rûvî gotiye walî?

-Waliyê min, ez hatime derdê xwe ji we ra bêjim. Giliyeke min heye.

Walî hinekî dîsa, berbe rûvî çûye. Wî xwatiye, ku guhdariya giliyên wî bike; jê pirsiye:

-De bêje, bêje! Derdê te çi ye? Tu kê gilî dikî?

Rûvî gotiye wî:

-Ez benî, ez li ba Toz Begê kar dikim. Lê tu nizanî, ew çi tîne serê min? Ya ku ew tîne serê min, hema zulim bixwe ye aşît e. Haya te jê tune, lê belê zalimekî wekî wî tune.

Walî guhdarî kiriye û jê pirsiye:

-Toz Beg çi tîne serê te? Hela bêje min! Ew çi karî bi te dide kirinê?

Rûvî gotiye walî:

-Waliyê birêz, Toz Beg ji sibê hetanî êvarê peran bi min dide wezinîn. Ez gelekî diwestim. Ew di ser da jî tedayiyê li min dike. Ez ketime ber bextê te û ewladên te, tê min ji vî cizaretî azad bikî.

Walî nizanibû çi bêje. Ew jî, civata wî jî ecêb mayî mabûn. Walî hinekî daye hişê xwe, paşê ji rûvî pirsiye:

-Ma tu çi dibêjî, rûvî? Ev Toz Begê ku, tu qalê dikî, dewletek e, an ew çi ye? Perê wî ew qasî gelek in?

Rûvî gotiye walî:

-Weylê mal ava bî! Gelek in çi ye? Waliyê min ê birêz, hetanî bêjî perê wî gelek in.

Walî gotiye rûvî:

-Rûvî, rabe here ser karê xwe! Toz beg vê jî tedayê li te bike, were giliyê xwe bike. Min hayîdar bike. Ez ê ji wî bipirsim!

Rûvî pişta ziviriye ba aşvaanê xwe. Aşvên jê pirsiye:

-Hela zû were vira! Te çi kir? Hêvî dikim, ku tu gihîştiyî encameke baş.

Rûvî gotiye aşvên:

-Min fenika xwe ki walî kir. Du car mane. Ez ê qîza wî ji te ra bînim.

Aşvên ji rûvî pirsiye:

-Hela bêje min jî, tê vê carê bi çi awayî herî ba wî? Plana te çi ye?

Rûvî gotiye aşvên:

-Ka ji min re çapekê bîne û wê li ser pişta min bişidîne!

Aşvên jê ra çapek aniey, li ser pişta wî girêdaye û baş şidandiye. Rûvî tivdarekê xwe kiriye, rabûye ketiye rê û çûye ba walî. Walî dîna xwe dayê, ku wa ye, roviyê wî dîsa hatiye ber derê wî. Ew ji rabûye ser xwe, berbe rûvî çûye û jê pirsiye:

-Vê carê çi qewimî, rûvî? Xêr e, tu hatî ba min?

Rûvî gotiye walî:

-Waliyê minî ezbenî. Min ya te kir. Ez vegeriyam ba Toz Begê. Lê vê carê, wî barê min girantir kir. Hetanî niha min pere diwezinandin. Min hetanî êvarê barê peran kişandin. Hema ji sibê hetanî êvarê pere li min bar kirin, mi hetanî xezîna wî birin. Eger tu ji min bawer nakî, hema li vê çapa ku li ser pişta min e binihêre. Min bi wê va, pere dikişandin.

Walî şaş û metele mabû. Wî carek di ji rûvî pirsiye:

-Rûvî, ji min re rastiyê bêje! Eger notilanî gotina te be. Ku perên Toz Begê ewqasî gelek bin, ez nikarin tu tedayê lê bikim. Tevaya hewildanên min ê bê sûd

bimînin. Ya ku tu qalê dikî, ew wek dewletekê ye. Here bi awayekî qencî bi wî ra bipeyive. Têkiliyên xee gel wî xurt bike.

Ji piştî van gotinên walî ra, rûvî paşta vegeriyaye ba aşvanê xwe. Aşvên ji rûvî pirsiye:

-De helaa zû bêje min! Te çi kir? Walî çi gote te?

Rûvî gotiye aşvên:

-Ev cara jî çû, ma carek. Lê vê carê, ez ê herim û qîza wî ji te ra bînim.

Ji du sê rajan şûnda rûvî carek din çûye ba walî û dest bi girî kiriye. Walî jê pirsiye:

-Rûvî vê carê çi hate serê te? Ev çito girî ye? Dîsa çi bû, ku tu hêsiran dibarînî?

Rûvî gote wî:

-Waliyê minî Toz Begê ji min ra got, here, keça walî ji min ra bixwaze. Tu nabê derdê wî hema Waliyê min, ez ketime ber bextê te û xwadê! Tu min ji vî zalimî xelas bikî! Tu dizanî, aşvên ji min ra çi got? Wî gote min:

-Eger walî keça xwe nede min, ez ê te bikujim. Tu çi dikî bike, ez wê keçikê bixwazim.

Walî hinekî daye hişê xwe, ketiye mitalan. Di nava eywanga xwe da pêgermok gerandiye.

-Ez dibînim, ku çareseriyeke din tune. Rabe here, jê ra bêje, bira Toz Beg bê. Em ê çareseriyekê bibînin. Hela ka em çi bikin. De dev ji girînê berde, lo! Meke zûrezûr! Rabe here!

Rûvî gotiye walî:

-Mala te ava be! Rûyê te sipî bûye! Yeka te bibe hezarî!

Rûvî hema bi lez û bez rabûye çûye ba aşvên û jê ra yeko yeko gotiye. Paşê jî gotiye Toz Begê.

-De niha rabe! Em ê herin mala walî.

Aşvên ji rûvî ra gotiye:

-Weylê mal ava bî! Em ê bi vê rewşa min va çawa herin mala walî? Kincên min lewitîne. Ez ê çewa bi van kincên pizirî va derketim dîwana walî?

Rûvî gotiye wî:

-De rabe ser xwe lo! Kincan ji xwe ra meke xem! Helbet em ê bi awayekî ji te ra tiştekî bibînin.

Rûvî li pêşiyê, aşvêndaye dû wî, meşiyane û xwe gihandine nezîkî bajêr. Li wê derê rastî çemekî kûr û har hatine. Rûvî ji aşvên re gotiye:

-De niha tu kincên xwe ji xwe bike û xwe bavêje avê. Ez ê jî bikim hawar û gazî.

Aşvên kincên xwe ji xwe kirine û xwe avêtiye avê. Rûvî kiriye hawar û gazî, berbe bajêr çûye. Ehlê bajmr berbe wî hatine û ji wî pirsîne:

-Rûvî,çi bû? Tu çima dikî hawar û gazî? Çi qewimî?

Rûvî gotiye wan:

-Toz Beg û eskerên wî, bi temamî li ber avê çûn. Ew teva roda çûn. Gelek ji wan xeniqîn. Ketime ber bextê we, zûtirkê alîkariyê bidine wan. Qet nebe Toz Begê azad bikin!

Hemû bajarî gel wî hatine, alîkarî dane wî. Toz Beg ji avê derxistine û anîne mala walî. Walî lê nihêriye, ku ew rût û tazî ye; jê pirsiye:

-Ev çi rewş e? Kanê cil û bergên te? Te hema bi vî halê xwe va rêwîtî kir?

Toz Begê gotiye wî:

-Cil û bergên min, di avê da çûn, roda çûn. Avê, eskerê min jî dan ber xwe û birin. Ew jî çûn. Tiştekî min nema, ez hema hakî tût û rût mam.

Walî ji berdestiyên xwe ra gotiye:

-Kurê min, ji nava kincên min, hema seranpê qatekî jê ra werînin.

Xulamên walî çûne, hema wî lezî ji Toz Begê ra kinc anîne. Toz Begê, ew kincana li xwe kirine, lê hema şaşmayî li vî alî, li wî aliyê xwe nihêriye. Wî hetanî wê rojê tiştekî usan nedîtibûye.

Şaş û metel  mayîna Toz Begê bala walî kişandiye. Wê lê mêze kiriye û ji rûvî pirsiye:

-Axayê te, Toz Beg, çima li der û dora xwe mêze dike.

Rûvî gotiye walî:

Walîyê min, kincên wî ji ev ê ku, we niha lê kirine çêtir bûn, lema jî ew niha ji ber van kincana fedî dike, ku ew xwe kirine.

Walî ji Toz Begê ra gotiye:

-Ji xwe ra neke xem! Tiştên weha tên sere mêran.

Rûvî ziviriye ser walî û jê ra gotiye:

-Waliyê min, em ê herin. Rêya me dûr e. De destûra bûka me bide, em derengî nekevin.

Walî gotiye rûvî:

-Li ser herdu çavên min. Divê rêwî di riya xwe da herin. Rêya we dûr e.

Walî ji pişta tivdarekê qîza xwe kiribû. Wî gazî qîza xwe kiriye. Ew li hespê siwar kiriye. Lê belê wî hezar leşker jî amade kiribûn. Çaxê ku qîza wî û Toz Begê dane ser rê, leşkeran jî dane dû wan.

Toz Begê ji rûvî pirsiye:

-Rûvî, niha em ê wan bibin ku derê? Ma evana yê gel me bêne êş?

Rûvî ji Toz Begê ra gotiye:

-Tu ji xwe ra meke xem. Ev karê min e. Ez li pêşiya we diçim. Hûn jî bidin dû min, hêdî hêdî werin.

Rûvî çûye, daye pêşya wan. Demekê rê çûne. Li ser rêya wan dîna rûvî dikişîne, ku vaye qesreke mestimezin li wê derê vik û vala ye. Rûvî lezandiye, ji berî wan kesên dinê ketiye qesrê. Wî xwastiye, ku bizane gelo di qesrê da kesek dijî, anna. Gava ku ew ketiye qesrê, wî nihêriye, ku vaye hûtek tê da razaye. Rûvî bi lingê xwe va niçandiye hûtê û jê ra got:

-Rabe ser xwe, rabe! Ev dema razanê nîne?

Hûtê ji rûvî pirsiye:

-Çima? Heyran te xêr e? Tu nahêlî ez razêm?

Rûvî gote hûtê:

-Dev ji axaftinê berde, rabe ser xwe! Vaye, Toz Beg bi eskerên xwe va hat. Ew ê te bikujin.

Hûtê gotiye rûvî:

-Min çi kiriye? Ew ê çima min bikujin? Wey dayê! Te dît çi hate serê min? Min belengazê! Alîkariyekê bide min. Rêyekê nîşanî min bide! Ez çewa bikim? Ku da herim? Hela min û vê tofanê binêre!

Rûvî gotiye hûtê:

-Zûtirkê xwe veşêre! Çareseriyeke din tune! Ez nikarim te biparêzim.

Hûtê gotiye rûvî:

-Ma ez ê xwe li ku veşêrim? Cihekî nîşanî min bide!

Rûvî gotiye hûtê:

-Hela berê derkeve ber dêrî! Eger ew bên, te li vê derê bibînin, ew ê te bikujin.

Hût bi lez û bez derketiye derva. Rûvî alîkariya wê kiriye, ew veşartiye. Ji wan der û doran hinek pûş, qirş û qal berhev kiriye, avêtiye ser serê wê. Paşê jî çûye kozek agir aniye, daye binê wan qirş û qalan, hût şewitandiye. Ji piştî van kirinên xwe ra rûvî vegeryaye ba eskerên walî, yên ku ba Toz Begê bûne; ji wan ra gotiye:

-Min cihekî baş ji bo we amade kiriye.

Toz Beg û qîza walî jî li ber qesrê ji hespên xwe peya bûne û derketine jorê. Eskerên walî nihêrîne, ku mala Toz Begê mezine û gelekî jî baş e. Edî sedemek nedîtine, ku li wê derê biêînin. Wan xatirê xwe ji Toz Begê û qîza walî xwastine û vegeriyana ba walî. Walî ji wan pirsiye:

-De hela ji min ra bêjin! We çi dît? Gotinên rûvî rast bûn an derew? Hûn ji min ra rastiyê bêjin?

Eskeran ji walî ra gotine:

-Waliyê min, gotinên rûvî rast bûne. Wî ji we ra rastî gotiye. Toz Beg gelekî dewlemed e. Qesra Toz Begê bêhempa ye. Qesreka usa li vê deverê tune.

Rûvî; Toz Begê û jina wî di qesrê da cih kirine. Ew gihîştine mirazê xwe. Rovî ji xwe bi xwe ra gotiye:

-Min ji Toz Begê ra ev qenciya kir. Lê ez ê binêrim, gelo Toz Begê qedrê vê qenciya min bizanibe.

Hema ji piştî çend rojan şûnda, rûvî xwe bi nexweşiyê daniye. Heft roj û heft şevan, rûvî di nava cih û nivîdan da maye. Xwedênegiravî nikaribûye, ku rabe ser piyan, tiştek nedixwar û gelekî bêhal bûye.

Toz Beg êdî jê aciz bûye. Rojekê ji jina xwe ra gotiye:

-Qîzê bi lingê wî vaa bigire û bavêje derva! Te çi ew usa maqûl kiriye!

Rovî di nava cih da bûye. Wî xwe dabû nexweşiyê, lê wî van gotinên Toz Begê jî bihîstine. Hema wê gavê rabûye ser xwe û ji aşvên ra gotiye:

-Qeraşo! Ma nayê bîra te? Tu li ber aşê wêran bûyî. Min çû qîza waliyê herêmê ji bo te anî. Îro jî, tu di qesrekê da jîyana xwe derbas dikî. Ev qenciya min, ji bîra te derket?

Gava ku qîza walî vaan peyvên rûvî bihîstine, ew ziviriye ser rûvî û jê pirsiye:

-Rûvî! Ma qey pêşê mêrê min qeraşî ye?

Rûvî gotiye qîza walî:

-Erê, wele ew hê jî qeraş e. Qeraşekî nezan û bêîtibar e.

Li ser van gotinên rûvî, keça walî xeyîdiye. Wê rabûye tivdarekê xwe kiriye, berê xwe daye mala bavê xwe û çûye.

Qeraş, ango Toz Beg rabûye ser piyam û ji rûvî ra gotiye:

-Rûviyê bira, ez ketime ber bexte û xwedê! Min kir tu meke! Bide xeşîmiya min. Here jina min paşta bîne. Ez di destê te da sond dixwim, tobe be, carek di tiştekî ha nabe!

Rûvî rabûye ser xwe û daye ser rê, hema rasterast çûye mala walî. Wî dîna xwe dayê, ku keça walî ji bavê xwe ra, qala serpêhatiyên xwe û leyîstikên rûvî dike. Ji bavê xwe ra dibêje:

-Bavo, tu dizanî, te ez dame kê? Gelo te dizanibû, ku Toz Beg bi eslê xwe qeraşek e! Rûvî tu xapandiyî!

Walî awirê xwe daye rûvî û jê ra gotiye:

-Malxirabo! Te çewa qîza min ji bo qeraşekî bir? Ev çi bû, te anî serê min?

Rûvî gotiye walî:

-Na, na, waliyê min. Usa nine. Ev edetê me ye. Ez her tim jê ra usa dibêjim. Bawer bikî gelek aşên wî hene. Herçî gava ku, ew diçe, ku teseliya aşan bike, ez ji wî ra dibêjim Qeraş.

Wê gavê, walî ziviriye ser qîza xwe û jê ra gotiye:

-Keça min, tu eyba vê gotinê heye? Gelek aşê wî hene. Ew dewlemed e. Tu êdî çi dixwazî?

Walî destê keça xwe girtiye, dîsa daye destê rûvî. Rûviyê te keça walî aniye, carek din spartiye qeraşê xwe. Qeraş dilxweş bûye, ji şabûna li ser lingekî direqisî.

Çend roj derbas bûne, vê carê jî rûvî rasteqînî nexweş ketiye. Toz Beg xwe di xizmeta wî da bûye. Xwarina baş daye wî, derman kiriye. Ew gelek caran şev û roj ji ber serê rûvî ranebûye. Rewşa rûvî roj bi roj berbe xerabûnê çûye. Ew ji vê nexwaşiyê nefilitiye. Di nava çend rojan da rûvî işk bûye, lê vê carê jî, Toz Begê newêribû laşê wî bavêje derva. Wî wetrê rûvî wî dicerbîne, lema jî xwe avêtiye nexweşiyê. Ji pişt çend rojan ra, jina Toz Begê ji mêra xwe ra gotiye:

-Mêrik, bîhna vî ajalî em xwarin! Laşê wî genî bûye. Divê tu, ji bo vê çareseriyekê bibînî!

Qereş û jina xwe teletel çûne nêzîkî nivîna rûvî, ji vir da, ji wê dalê nihêrîne. Wan dîna xwe danê, ku rastî jî rûvî işk bûye. Hema wê gavê, her yekê lingekî rûvî girtiye, kaş kirine û derxistine ber dêrî. Toz Begê çalek vedaye, rûvî avêtiye çalê û xwelî tijî ser kiriye. Qeraş ango Toz Beg û keça walî çûne ji rûvî azad bûne.

Ji wê rojê şûn da, keça walî û xortê aşvan tevayî jiyaneka bextewar derbas kirine. Ew çûn mirazê xwe şabûn, hûn jî bi mirazê xwe şabin.

### 2.1.4. Bizina Rihspî

Careke ji caran bizineke biaqil hebûye li çolê. Bi mihekê, berxekê û seyekî har dijiyaye. Dema heyamekê li çolê mane, mayîna li çolê xweşiya wan çûye. Bi vî awayî rojên xwe bi çêrê û geriyanê, şevên xwe jî bi henekan û sohbetê borandine.

Rojekê ji rojan, na wellah, şevekê ji şevan dema ji xwe ra bi awayekî xweş di sohbetê de bûne, ji pir dûrî agirek dîtine. Hingê dilê bizinê çûye qelûbekê û gotiye:

-Ax… ax xwezî ji xêra Xwedî re qelûnek heba û min kêşaba.

Heywanên din çawa ev daxwaza rihspiya xwe bihîstine gotine:

-Axayê me qet meraqê neke. Ev karekî pir basît e. Aha vaye tûtin û qelûn. Bila mih jî here hinekî agir bîne were… Emê qelûbekê vêxin.

Li ser van gotina mih demildest ji cihê xwe rabûye û Ya Ellah berê xwe daye agirê dûr. Qederekê çûye û pir nêzîk bûye. Tam di esnayê ku dê ji kêfan lotikekê bavêje, çi bibîne? Diwanzdeh gur li dora agir in û çavzîq li benda wê ne. Feqîrê newêriye pêş ve here ne jî paş ve bireve. Lê mecbûr maye hêdî hêdî bi tirs û lez nêzîkî guran bûye. Silav li wan kiriye. Gur jî bi kêf silava wê wergerandine û gotinê:

-Ohoo… bi xêr hatî miha ciwan, ji ku têyî? Ti û ev dere? Tu çawa û ji bo çi hatî?

Mih bi xof, bi tirs û lerz bûye, lê ji ber ku guran demildest êrîş nekirinê jî kêfxweş bûye. Bi hêviya rizgarbûnê gotiye:

-Ez hatime hindek agir, da ku qelûna bizina rihspiya me pê vêxim. Guran gotiyê:

-Tu were bêhna xwe vede. Paşê agir bibe. Mih jî bêyî daxwaz li cem wan rûniştiye. Dema mih rûniştiye gurekî cehêl û ciwan gotiye:

-Em li benda çi mayîne, bo çi em vê naxwin?

Gurê mezin gotiye:

-Bisekine û bêhna xwe fireh ke, heta hevalên wê tên.

Bi vî awayî guran mih daniye nava xwe û li benda yên din mane. Bes li aliyê din ve jî bizina rihspî pir bêhnteng bûye. Lewra mih jî dereng maye, divabû heta wê demê ji zû ve zivîrîba. Bizinê gotiye berxikê:

-Rabe here lê binêre. Hebe, tunebe belayek hatiye serê wê.

Berxik jî rabûye û berê xwe date cihê guriya agir jê tê û pişta xwe dide hevalên xwe. Qederekê diçe, digihê çem agir. Lê çi bibîne, diwanzdeh guran mih xistine nava xwe û li dorê sekinîne. Berxik ji vê rewwşê pir ditirse lê qet bi xwe nayîne derê û dibêje:

-Ax, ax miha kêrnehatî, şeytana teral. Ma tu hatiyî vêrê çi? Hatiyî ku agir bînî, yan sohbetê ligel van camêran bikî? Tu rabe em biçin, yan na, dê bizin aciz bibe.

-Berxika nazdar, ma ecela te çi ye, hûnê wiha westiyayî û kerixî herin? Were hinekî bêhna xwe vede paşê hûn bi hev re herin.

Berxikê ji tirsan dengê xwe nekiriye û çûye li cem mihê rûniştiye. Gurê ciwan û cihêl dîsa rabûye û gotiye:

-Aha va ye ya din jî hat, em li benda çi ne û bo çi naxwin? Werin da em wan bixwin…

Lê hê êrîş nekiriye, gurê mezin pêşî lê girtiye û gotiye:

-Sebir bike, sebir…

Li aliyê din bêhna bizinê teng bûye. Ji ber ku berxik jî qederek e çûye û nezîviriye. Bizinê vê carê gotiye seh:

-Seyê delal de ka rabe li dû wan here ka ji bo çi nehatin.

Seh jî rabûye û bilez ketiye rê. Lewra wî jî meraqa hevalên xwe kiriye, ka çi hatiye serê wan. Bi lez û bez gihîştiye cem agir. Hey hawar û bêlome. Çi bibîne, diwanzdeh guran doraliyen mihê û berxikê girtine. Seh bi xwe dihese ku nikare bi diwanzdeh guran re şer bike. Lê dîsa jî bi wêrekî bi pêş de çûye û gotiye mihê:

-Xwişka mih, berxika nazdar, hûnb li vir çi dikin? Ma bizinê hûn ji bo sohbetê şandine? Zû rabin…

Hêj se gotinên xwe teman nekirine gurê mezin gotiye:

-Biraya delal, qet xwe ji gotinan aciz meke û qîrewîtê neke. Me nehêlaya ew biçin. Tu jî were rûnê, paşê hûnê herin.

Se jî mecbûr êdî dengê xwe nekiriye û rûniştiye. Lê li aliyê din jî dûkel ji difina bizinê diçûye. Ew jî ji wê hirs radibe û bi dû hevalên xwe dikeve. Lê di rê de piyên wê li tiştekî, kelexekî eliqîne. Bizin dibîne ku kelexê gurekî ye. Qoçekî wisa li qelex dide ku parçeyên wê ji aliyên din ên kelexî derdikevin. Bizin serê xwe radike, kelexê gur bi şaxan ve li serê bûye… Bi hêrs gihîştiye cem agir. Lê çi bigihê agir, dibîne ku diwanzdeh guran hevalên wê zeft kirine û nahêlin bilebitin. Bi hêrs gotiye hevalên xwe:

-Hey hevalino, ma min hûn hinartibûne agir yan sohbet û henekan? Zû rabin…

Gurê mezin nehiştiye bizin gotina xwe temam bike:

-Xwişka ciwan qet xwe aciz neke, ti jî were rûnê bêhna xwe vede.

Bizina rihspî li navendê nêriye ku baş xuya nake. Nêzîkî agir dibe. Jixwe hingê gur bizin jî, kelexê li ser wê jî dîtine. Bizinê bi hêrs gotiye:

-Himmm… bêje hûn in seyên  kurê seyan. Min hûn baş peyda kirin. Ji xwe bav û bapîrên we deyndarê min bûn. Min geft gur xwarin,  yek jî ligel xwe bo seh anî. Bawer e yên din jî hûn in. Seyo bigire wan! Nehêle birevin.

Heta xwe avêtiye ser gurekî, lê hemî bi hev re reviyane.

Li ser vê bûyerê, bizinê gotiye hevalên xwe:

-Hevalino, ev gur hinekî bêaqil in. Naxwe dê zanibûna ku em nikarin wan bixwin. Vêca ya baş ev e ku hê ew nehatine, em bo xwe cihekî ewle peyda bikin.

Van her çar heywanên kedî dane rê û li cihekî zexm geriyane. Dawiyê dareke mezin û belave dîtine. Bizin çûye ser çiqên jorî, seh di bin wê de, mih li jêrtir û

berxik jî li binê hemiyan maye. Dema wiha bi ser darê ve cihê xwe xweş kirine, gur jî êdî rawestiyane. Ji ber ku hin bezine pir westiyane. Gurê mezin bi hêrs gotiye:

-De were vê meselê, nalet li me û aqilê me. De ka bizin li ku gurxwarin li ku ye? Di dinyaym de kê dîtiye ku bizinan gur xwarine. Ev kar berevajî dibe. De ka karê me kar e, em ji ber bizinê direvin. Rabin em zû herin û wan bigrin…

Koma guran zîviriye ku şûna bizinê û hevalên wê jî nemaye li wir… Vir de çûne, wê de çûne nedîtine. Lê tesadufen dawiyê hatine binê wê dara ku bizin û hevalên xwe li ser. Her çenda ku gur nizanîne pez û seh li wir in jî berxik pir tirsiyaye. Gurê mezin gotiye hevalên xwe:

-Heke yekî ji we ilmê fal û femlê dizane, bila fala xwe veke, ka ew bi ku de çûyîne…

Gurê rimildar çawa serê xwe bilid kiriye ku remla xwe biavêje, bo çi berxik ji tirsa li ser serê rimildar nakeve. Gur jî tirsiyaye lê bizinê li jorê kiriye qêrî:

-Berxikê delal tu wî rimildarê seyê kurê se bigire bila nereve. Hûn jî yên din bigirin…

Jixwe bi ketina berxikê ‘orên ji gurê rimildar hatiye. Bi vê ‘orên û gotinên bizinê guran dîsa xwe avêtine, revîne çûne.

Lê bizina rihspî li ser vê revîna wan gotiye:

-Ez wekî navê xwe dizanim ku ev gur dîsa dê bizîvirin vir. Vêca hê ew nehatine, divê em çareyekê peyda bikin.

Van her çar heywanên kedî piştî ser hizr û bîran fikreke baş kirine. Demildest holikeke biçûk bo se çêkirine û gotine ev pîroyê şikeftî ye. Paşî jî dest bi kar û barê xwe yê rojane kirine…

Lê li aliyê din dema gur bi bayê bezê reviyane, roviyek hatiye pêşiyan wan û gotiye:

-Xêr e we, hûn wiha direvin, ji kê direvin?

-Em ji bizina gurgxwer direvin ku me jî nexwe.

-Hey xwelî li serê we û aqilê we. Bizinê hûn xapandine. Kê dîtiye heta niha ku gur ji ber bizinê birevin. Bizîvirin em herin bibînin ka çi bizin e…

Guran îtiraz kirine lm dawiyê rovî ew qanih kirine. Hemî bi hev re ketine rê. Dema nêzîkî kediyan bûne, hê jî dûr ve bi qêrîn gotiye:

-Birayê rovî qey tu deynê xwe diînî? Lewra bavê te bi bîst û çar gurandeyndar bû. Te heftiye din hinek anîbûn, niha jî te yên din anîn… Bîne bîne…

Dema guran ev gotin bihîstine gotine rovî:

-Birayê rovî bawer e, tu me ji bo mirinê dibî?

Rovî bi hêrs gotiye:

Dînekê got, dînên din jî bawer dikin. Kuro lawa bizin derewan dike, qe bizin guran dixwin?

Bizinê jî ji wê ve gotiye:

-Birayê rovî, heke tu rast dibêjî were li ser vî pîroyê pîroz sond bixwe. Ez jî dê qebûl bikim ku tu deyndarê min nînî.

Rovî jî ji dilê xwe yê saf nezîka holika se bûye û bi dengekî bilind gotiye:

-Heke ez derewan bikim bila pîroz xezebê li min bike.

Rovî hê gotiha xwe temam kiriye, nekiriye seh ji holika xwe derketiye û ew xeniqandiye.

Dema ku gurg vî dîmenê xirab dîtine, dîsa reviyane û êdî hew hatine.

Bizina rihspî jî hevalên xwe berhev kiriye û gotiye:

-Hevalino, welleh çol xweş e le koviyên çolê zêde wehşî ne… Ya baş ew e, em bizîvirin mala xwediyên xwe. Naxwe em dê li van deran telef bibin.

Bi vî awayî,  heywanên me yên kedî zîvirîne malên xwe û heta dawiya temenê xwe ligel mirovan jiyane.

### 2.1.5. Kevok û Rovî

Hêbû tunebû, rovîyek hebû. Rojekê rovî pir birçî bû, ji birçîna êdî dilê wî dixerbilî. Demekê fikirî ji xwe re got:

-Bi rûniştinê qismet nayê ber lingê meriv, divê ez rabim ji xwe re derkevim nêçîrê,li qûtekî qismetekî bigerim.

Weha got û bi rê ket. Pir çû hindik çû, gihîşt ber zinarekî mêze kir waye çend kevok li ser zinêr venîştine û qebqeba wan ji xwe re dixwînin. Kêfa wî gelekî hat, tama devê xwe xweş kir, bi qelîz hêdî hêdî xwe nêzî wan kir û xwe ji nişkave çindî ser kevokekê kir û kevok girt. Kevoka reben carê hew mêze kir ku tew waye di devê rovî de ye. Kevokê dest pê kir li ber rovî gerîya, xwe avêt bextê wî, got:

-Rovî ez guneh im, min nexwe!

Lê rovî qet guneh neda gotinên kevokê, got:

- Ez ê te bixwim.

Kevokê baş fêm kir bi bergerê dilê wî nerm nabe û lê nayê rehmê dê wê bixwe. loma jî rabû ji rovî re got:

-Birakê rovî, vaye te ez girtime û tu yê hey min bixwî. Lê belê berî ku tu min bixwî, ez dixwazim bizanibim gelo tu ji kîjan eşîrê yî? Daxwaza min ya berî mirinê ev e.

Rovî di dilê xwe de got,"çi pê ve heye hema ez ê navê eşîra xwe bibêjim û bila bizanibe ew ji kîjan eşîrê me. "Rovî got:

-Ez î Bayikî me.

Dema rovî got "ez î Bayikî me", devê wî hirinekê ji hev çû û kevokê got pirt û firîya, bi hewa ket , çû li ser darekê venîşt. Rovî bi awayekî şaşmayî û şeqizî li kevoka li ser darê nêrî û jê re got:

-Heger min zanibûya dê weha bibe, min ê xwe di hev de biqirçandana û bigota: Ez î Qerrregêçî me, Qerrregêçî...

Kevok li ser darê pê kenîya....

### 2.2. Olağan Masallar

#### 2.2.1. Xwişka Heft Bira

Hebû tunebû, kes ji Xwedê mezintir tunebû. Li gundekî keçikek hebû, birayên wê heft heb hebûn, birayên wê tev zewicî bûn. Keçik jî li cem birayên xwe dima, lêbelê bûkan ji gorma xwe tew hez nedikir û pir jê diqehiriyan.

Rojekê golik dikevin ziyanê wan birayek ji jin û bûkên xwe re;

-Yek herin golikan ji nav ziyanê derxin û bînin mal, jina wî û bûk tev dibêjin:

-Karê me hene, xwişka te vala ye, bila ew here? Bira jî:

-Madem karên we hene, bila xwişka min here. Ji xwişka xwe re:

-Xwişka min golik ketine ziyanê, here jî nav ziyan derxe û golikan bîne mal.

Bûk tev dekbaz bûn, tînin dekekî di nava xwe de çê dikin ji gorma xwe re, fersend dikeve destê bûkan, bûk tev dibêjin “gorma me ku were malê wê tî bibe. Ê bibêje ka avê vexwim, em marê jîndar têxin sewîlê, tas û feraxên avê ji ber veşêrin ku sewîlê ser xwe ve bike, wê gavê marê here têkeve zikî wê.”

Keçik diçe nav ziyanê golikan derdixe tîne mal, keçik pir diweste û tî dibe, bilez diçe ku tasê bigire avê vexwe, li hindur mêze dike ku qet tasek û feraxek avê tunenin, ji bûkên xwe re:

-Ka tasên me yê avê, qet yek jî tuneye?

Bûkan jî:

-Ku tas tunebe av di sewîl de heye, ser xwe veke û vexwe?

Keçik jî pir tî bûye qet hal tê de nemaye ku bigere sewîlê ser xwe ve dike bi qurtîn ava xwe vexwar û got:

-Tiştek cemidî û qalind ket gewriya min û çû xwarê. Bûkan jî:

-Qey qilçix e, dê çi bibe?

Keçik bê hay e ji dekê bûkan. Roj bi roj zikê keçikê mezin dibe û zikê keçikê carna jan dide ji bûkên xwe re:

-Min ku ava sewîl vexwar, ji wê demê vir de zikê min diêşê, ez çer bikim?

Bûk jî dibêjin:

-Qey yê rehet bibe?

Bûk jî çiqas ku etar tên gund, her yek ji etar şeh û neynik dikirin, kom dikin li mal. Keçik jî roj bi roj zikê wê diêşe rehet nabe û zikê wê gir dibe. Bûk jî mêzedike ku zikê wê gir bûye, ji hev re: "Herin neynik û şeh tevan bînin têxin binê balîfa keçikê û em bangê birayên wê bikin, jê re bibêjin." Bûk tev ji mêrê xwe re dibêjin:

-Wele zikê xwişka te tim û tim mezin dibe, qey bi heml e, ku wiha nebe çawa zikê wî gir bûye?

Bûkek jî tê ji mêr û tiyên xwe re:

-Min li nivînê wê mêzekir ku di bin balîva wê de tijî şeh û neynik bûn, qey dergistiyê wê jê re girtine?

Bûk û mêrên xwe tev diçin mêze dikin ku erê bin balîfa wê tijî neynik û şeh in. Birayên wî dibêjin te çikir ku zikê te gir bûye? Ew çi neynik û şeh in di bin baliva te de?

Keçik jî bê xeber û haya wê ji tiştek tuneye, nizane ku çi bibêje:

-Neynik û şehên çi? Ez bi wana nizanim, min nekirine bin balîvê. Birayên keçikê:

-Lê ev çi ye û zikê te çima gir bûye?

Keçik:

-Nizanim birayên min, min ava sewîl vexwar ji wî demê vir de zikê min tim diêşê û gir dibe.

Birayên keçikê:

-Derewan neke, tu bi yekî re yî?

Bûk ji gorma xwe re:

-Qey tu bi yekî re yî? Zikê te gir bûye, binê balîfa te jî tijî şeh û neynik in. Xuya ye ku tu bi yekî re yî?

Bûk tevan ji mêrên xwe re: "Ev xwişk êdî ji mala me re nabe, xelkê me rezîl û riswa bike? Ya ev xwişka ji mala me here ya jî em ê herin."

Birayên keçikê jî di nava xwe de dibêjin "Birano! Em xwişka xwe bikujin, bira birayê me yê biçûk bibe çiyê bikuje, li cihekê têxe erdê û were mal." Tev biryar didin û dibêjin "erê."

Birayê biçûk sibe dibe xwişka xwe dixapîne, digire dibe çiyê diçin ser kaniyek disekinin bîhna xwe digirin û disekinin.

Birayê keçikê li xwişka xwe mêze dike, di heşê xwe de dibêje: "Ka ez ê xwişka xwe çawa bikujim, him em ê bibim mêrkuj û him jî ne gunehe ku ez xwişka xwe bikujim? Ez xwişka xwe nakujim?" Wiha difikre.

Birayê biçûk li ser kaniyê bilûrê lêdixe û lêdixe. Xwişka wî jî tê serê xwe dide ser çoka wî û bi xew ve diçe, bira mêze dike ku xew ve çû, serê wê hêdî dide erdê û bilûrê lê dixe, mêşek jî dikeve hindurê bilûrê, mêş dibêje, "ping" û tim tim "pingînê" dike…

Birayê wê jî xwişka xwe di cih de dêhile û diçe mal. Keçik jî dibêje, “qey birayê min bilûrê lêdixe.”

Demek diçe keçik radibe mêze dike ku ne biraye, ne jî kesek heye, birayê wê tuneye, mêş jî di hindurê bilûrê de “pingînê” dike. Li der û dora xwe mêze dike ku birayê wê ne li wir e, dibêje “Qey çûye cihekê, ê were.”

Gelek dem diçe dibe êvar; mêze dike ku birayê wê nayê, fêm dike ku birayê wê li wir hîştiye û çûye, pir xemgîn dibe, digirî û digirî. Paşê ji kezebê û ji dil bi dengê bilind nifir dike û dibêje:

-Birawo, birawo! Tu herî paş malao, dirî têkeve nigê te, heta ku destê min pê nebe, ne der be, ne jî zer be?

Keçik diçe ser kaniyê avê vedixwe û xwe li ser çîmê dirêj dike, bitirs û xemgînî difikire “ka ez ê çi bikim? Ez êdî bê xwedî mam, ne mal e û ne jî bira..” bi xew ve diçe.

Gavek din diçe mar di zikê keçikê de bang dike:

-Qepquxa qepquxa werin dil û gurçika… Beq jî di gola avê de bang dikin:

-Qepquxa qepquxa werin av, giya û çîman. Beq bang dike, mar bang dike… dawiyê beq hukmê mar dibin û mar didevê keçikê de tê der û diçe cem beqan.

Di wî gavê de jî lawikek bûyera keçikê temaşe dike ku mar çû golê paşê jî tê cem keçikê, ji keçikê re:

-Keçikê rabe, rabe! Mar ji devê te derket û çû golê.

Keçik bi xwe dihese, radibe li zikê xwe mêze dike ku “erê” zikê wê naêşê û werîmiya zikê wê danişîtiye, êdî zikê wî biçûk bûye, bûye weka berê. Lawik ji keçikê re dibêje:

-Tu çi kesî? Li vir çi dikî, li çiyê bi tena serê xwe? Keçik jî dibêje:

-Ez û birayê xwe hatin vira, birayê min, ez li vir hiştime û çûye. Lawik dibêje, ku birayê te wê bihatana, êdî êvar e, em herin mal.

Keçik dibêje:

-Na, ez nayêm mal.

Lawik pêda dikeve, li ber digere:

-Qey êdî hêvar e keçikê, şev bibe tu yê çi bikî li vî çiyê? Keçik mêze dike ku wisa, keçik qebûl dike diçe mala lawik.

Dêya wî ji keçikê pir hez dike û qîmetê didiyê, çend roj diçin kesek li keçikê xwedî dernakeve û keçik jî bûyera xwe ji wan re dibêje, hevûdin nas dikin, keçik û lawik ji hev hez dikin, dêya lawik mara wan dibire û wan dizewicîne.

Birayê keçikê wexta ku xwişka xwe li çiyê, ser kaniyê dihêle tê malê li paş malan, dirî dikeve nigê/lingê wî, ji wê demê şûnda nigê wî diêşê, nig lê helak dibe, zer jî nabe û der jî nabe, timûtim jan dide. Bira diçe kîjan hekîm û doxtoran ji nigê wî re çare nabînin, diçe cem kê nigî wî rehet nabe…

Gelek dem diçe xwediyê keçikê nayên. Keçik û lawik ji hev pir hez dikin, qêmetê didin hev, dêya lawik jî ji keçikê hez dike, zarokên wan mezin dibin, gelek sal diçin û sal dikevin navberê.

Rojek jinik li ser xaniyê xwe hewiya ye û li gund temaşe dike, mêze dike ku waye mêrikek li kera xwe siwar e, nigê wî pêçaye û diçe malekî; rind bala xwe didiyê ku birayê wê ye. Bangê kurê xwe dike û dibêje:

-Kurê min here bangê wî xaloyî bike, bibêje “xalo dêya min dibêje, bira were mala me ez nigê te rehet bikim?” Zarok jî nizane ku mêrik xalê wî ye, diçe cem mêrik, jê re:

-Xalo, dêya min bangî te dike, dibêje, bira xalo were mala me ku ez nigê te rehet bikim” Mêrik:

-De wê de here lo! Ku kesek nigê min rehet nekir, wê dêya te nigê min rehet bike? Mêrik lê pir diqehire, xwarziyê wî jî pêda dikeve, dikeve, dawiyê mêrik dibêje:

-Baş e, ez têm. Xwe bi xwe "ez herim cem dêya wî, belkî rehet bike."

Kurik, mêrik digire dibe mala xwe, xwişka mêrik birayê xwe dike mîvan, xwarina xweş didiyê, nanê xwe dixwin, paşê dibêje:

-Nigê te çer bûye bira? Mêrik dibêje:

-Rojekê ez çûm paş mala dirî ket nigê min, ji wî şûnda nigê min êşiya û kul bû, ez çûm cem kîjan doxtor û hekîmî jê re çare nedîtin. Ez digerim nagerim min jê re şîfa nedît. Jinik ji birayê xwe re:

-Ka ez lê mêze kim. Derziya xwe çer li nigê mêrik dixe, nêmê davêje der û diriyê/strî jê derdixe dibêje:

-Wê êdî rehet bibe. Birayê wê dibêje:

-Xwedê ji te razî bibe û te neke cihê teng. Xwişka mêrik jê re:

-Tu min nas dikî? Mêrik dibêje:

-Na, ka ez ji ku te nas bikim? Jinikê got:

-Ez xwişka te me, ez falan kes im. Mêrik êdî nas dike û pir kêf dike ji xwişka xwe hez dike. Jinik bûyera xwe ji birayê xwe re dibêje:

-Tê bîra te, rojekê golik dikevin ziyana me, te got 'here golikan ji ziyanê derxe.' Ez çûm nav erdê, golik ji ziyanê derxist, hatim mal, ez pir tî bibûm, bûkan jî tas û ferax ji ber min veşartibûn, min tas xwest, gotin 'sewîlê ser xwe ve ke.' Min jî sewîl ser xwe ve kir û av vexwar. Wê gavê tiştek cemidî û qalind çû gewriya min û jî wî şûnda zikê min êşiya û gir bû. Jinên we ji min pir diqehirîn û hez nedikirin. Ji min re dek çêkirin, ji etaran şeh û neynik kirîbûn avêtin bin baliva min, gotin 'dergîstiyê wê heye û bi heml e.' We xapandin, gotin 'bira keçik ji vir here.'

We jî bi gotinê jinên xwe kir, we bi ya min nekir û bimin bawer nekir. We biryara kuştina min da, ku min bikujin. Lêbelê te min bir çiyê, min nekuşt, te min li wê derê hîşt. Ez li wir raketim, mêrên min li wir li min temaşe dikir ku mar ji devê min derdikeve û diçe dikeve golê, êvar dibe mêrê min, anî mala xwe û pê re zewîcîm, ev zarokên min in, em niha bikêf in û rewşa me gelek baş e.

Birayê keçikê jî bi vî bûyerê dihese, pir bi xemgîn û poşmam dibe û diçe mal, ji birayên xwe re dibêje:

-Jinên me, xapandine, li xwişka me dek çêkirinin, me jî bi wan bawer kiriye ku xwişka me ji mala me here.

Bira li hev kom dibin tev biryar didin ku jinên xwe berdin, jinên xwe berdidin û ji nû ve dizewicin.

Xwişka xwe jî tînin mala xwe, li cem mala xwe, jê re xaniyek xweş ava dikin û bi hev re kêf û şa dibin.

### 2.2.2. Hebika Hinarê

Hebû carekê, cebarekê

Heft kûsî rabûne ser darekê.

Kûsî ket çavê wî rijî,

Rehmet li dê û bavê cimaetê yê min jî.

Hebû padişahek. Kurek û keçeke wi hebûn. Jina padişahî dimire. Padişah û her du zarên wî dimînin. Her du zarên padişahî jî hûr bûne. Padişah diçe jinekê ji xwe re tîne û dizewice. Wexta tîne ji jinikê re dibêje; ezê bergiriya xwe bibînim îsal herme hecê. Heta ku ez ji hecê têm, tu miqatî zarên min bibe. Padişah radibe bi rê dikeve diçe hecê. Qederekê dimîne jinik diçe hespê padişahî ji hundir derdixe berdide. Mirov dikevin pey hespî ku bigirin. Jinbava He-bika Hinarê dibêje:

"Hebika Hinarê ca tu jî bikeve pey hespî dibe ku tu bigirî. Hespê bavê te ye, ku were dê ya nebuyî bîne serê me. Hebik dikeve pey hespî. Wisa diweste êdi nikare

bilipite. Lê herî dawî hespî digire û tîne. Jinik tîne marekî dixe di nava cerikê avê de û dibêje, mala min ji te re xirabe Hebika min! Niha keça min tî bûye, ka vê avê bide ser devê xwe vexwe bila tîbûna te bişkê.

Wexta ku Hebik avê vedixwe mar dikeve zikê wê. Hebik bala xwe didê roj bi roj zikê wê mezin dibe. Bi xwe jî xwarinê dixwe naxwe hema her birçî ye. Jinbava Hebika Hinarê ji birayê wê re dibêje:

"Xwîşka te çûye zikê xwe tijî kiriye! Hindik maye ku bavê te were, ku bavê te wê di vî halî de bibîne, dê te jî, min jî bikuje!"

Birayê Hebikê dibêje:

"Baş e. Em dê çi jê bikin?"

Dibêje:

"Tu dê wê bibî li serê çiyayekî bikujî û vegerî.

Jinik roja din radibe du kadan dipêje, kadek jê şirîn yek ji şor e. Tîne dide birayê Hebikê û dibêje:

"Tu dê rabî Hebika Hinarê bibî hêj bavê wê Hebiha Hinare nehatiye tu dê wê bikûjî û werî. Ku em wê nekujin bavê te dê me hemûyan bikuje. Rabe îşev zû wê hilde bi aliyekî ve bibe û bikuje."

Birayê wê radibe Hebika Hinarê hildide dibe serê çiyayekî. Xewa Hebikê tê serê xwe datîne ser çoka birayê xwe û radizê. Dema bi xew ve diçe, Bira li xwîşka xwe dinêre û dibêje:

"Ka ez dê çawa lêxim û xwîşka xwe bikujim!"

Radibe serê xwîşka xwe datîne ser xwirca kadeyan, berjêr dibe tê malê û ji jinbava xwe re dibêje

"Min ew kuşt.'

Jinbava wî dibêje:

"De baş e!"

Hebika Hinarê wextekê çavê xwe vedike bala xwe didê ku birayê wê ne li wê derê ye. Pêşiya ku ew razê wê kadeyeke şor xwaribû. Wisa tî bibû ji tibûnê hindik mabû ku bimire. Xwirca xwe dide ser milê xwe li serê wî çiyayî li avê digere. Di dawiyê de rastî goleke avê tê. Bala xwe didê ku ew av ji kaniyekê tê. Kaniyeke wisaye mirov lê heyran dimîne. Pêşiya kaniyê mîna bircekê girtine. Li dora wê kulîlk, gul û rihan, tu çi bibêjî Xwedê tê de afirandiye. Dike ku avê vexwe, xwe xwarî avê dike, bala xwe didê ku ji nava wê dengek hat.

Deng divê:

“Hûn li van deran çi dikin werine nava dil û hinavên germ. Ev der pir ciheke xweşik e.”

Piştî vê dengê îcar jî deng ji nava mêrê ten:

“Tu li wê derê çi dikî? Were nava mêrg û kulîlkan. Tu çi bibêjî li vir heye. Were vê derê. Were çîmenan, were ava sar, were mêrgan.”

Hebik wexta ku xwe xarê avê dike dibe şerpeşerpa mar ji gewriya wê dikişe ji devê wê re derdikeve û diçe. Wexta ku ji devê wê re derdikeve destên xwe dide zikê xwe bala xwe didê ku tiştek di zikê wê de nemaye. Serê xwe dide ser xwirca kadeyan bêhemd dikeve. Qederekê li ser kaniyê radizê. Wexta ku radibe ser xwe dibêje:

“Gelo ev xewnek bû min dît çi bû! Ev çi ecêb bû hate serê min?!!

Radibe ser xwe tê ser avê, dest û çavên xwe dişo. Paşê lê dinêre darekê li ser kaniyê dibîne û hildikşe çiqilê darê. Xwirca xwe hildide cem xwe li ser darê disekine.

Wextekê bala xwe didê ku hinek siwar ji wir de mîna xezebê tên. Siwar hatin ser kaniyê ji hespên xwe peya bûn. Hespên wan av vexwarin. Wan jî dest, ser û çavên xwe şûştin û av vexwarin. Yekî ji wan di nava avê de siha Hebika Hinarê li ser serê darê dibîne û serê xwe bilind dike lê dinihêre, dibîne ku keçeke wisa ne tu dil nadî lê binêrî.

Yê ku di nava avê de keçikê dibîne padişah bûye. Dibêje:

"Wezîr!"

Wezîr dibêje:

"Keremke ezbenî"

Dibêje:

"Tu jî li serê darê keçikekê dibînî?"

Wezîr dibêje:

"Erê, Padişahê min."

Padişah dibêje keçikê, ji ser darê peya be were jêrê ez ê te ji xwe re bibim.

Hebika Hinarê dibêje:

"Ez bi vî awayî bi te re nayêm. Here ji min re hin kincên rind bîne, dewateke bi def û zirne, bi berbûk bîne, ez bi te re bêm. Heke na, ez bi te re nayêm!"

Padişah ji wezîrê xwe re dibêje keçik mafdar e. Ez ê vê keçika rindik çawa bavêjim ser pişta hespê xwe mîna sêwiyekê bibim. Ew radibin ji wir diçin. Padişah diçe bergeriya dewatê dike ku were keçikê bibe.

Dema ku ew diçin piştî wan bazirganekî mitirban bi wê derê re derbast dibe. Du keçik ji bazirganî diqetin tên ser kaniyê. Dema ku ew dikin ku avê vexwin ew di nava siha avê de keçikê dibînin. Yek dibêje, ya min e, ya din dibêje, na ya min e. Yeke ji wan direve, diçe digihîje bazirganê xwe. Ya din dimîne serê kaniyê li ser Hebika Hinarê dibe bela. Keçika mitrib gazî dike û dibêje.

"Xanim, xanim! Ez ê werim cem te."

Hebika Hinarê dike nake xwe jê xilas nake. Hebika Hinarê wê ji hildikişîne ser darê. Çawa ku keçika mitrib derdikeve ser darê, dehfekê li wê dixe, Hebika Hinarê, ji darê dikeve erdê.

Îcar Hebik nazik e, keça periyan e. Wexta ku ji darê dikeve hêj neketî erdê, dibe gulek bi darê ve hêşîn dibe.

Padişah mirovên xwe pêşiyê dişîne wê derê kincan li keçika mitrib dikin, dixemilînin dikin bûk, berbûkekê bi padişah ve didine pey hildidin û tînin. Dema ku di rê de diçin, berbûkek pê re diaxive. Dibîne ku ne keçeke biqil e û dibêje:

"Gelo çawa bîzê padişahî çûyê ku vê ji xwe re bixwaze!" Berbûkeke din dibêje:

"Ez nizanim. Wî gotiye, me jî xemilandiye va ye em jê re dibin."

Dema ku bi rê dixin, padişah jî tîne wê gulê jî ji darê diqetîne bi xwe re tîne. Qederekê di rê de diçin keçika mitrib wê gulê di destê padişah de dibîne û dibêje;

"Hebe nebe ev keçika ku min ji darê avêtî ev gul ew e. Ew bibû gulek bi darê ve hêşîn bibû." Dema ku têne ber deriyê padişahî bûk xwe dide erdê û dibêje:

"Ku tu wê gula di destê xwe de neavêji, ez nayême hundir."

Padişah radibe wê gulê davêje. Gul wexta ku dikeve erde dibe cehniyek. Her kes şaşwazî dibe, li wê cehniyê dinêrin. Bûk jî dike ku wê cehniyê bide kuştin.

Padişah dibêje:

"Tu bê jî û neyê jî êdî tu dizanî. Lê ez wê cehniya rindik nadime kuştin."

Padişah dike û nake xwe ji destê jinikê xilas nake. Bûk lingên xwe dide erdê nahê hundirê malê. Padişah neçar dimîne cehniyê dide kuştin. Lê berê kuştinê cehnî dibe dareke sipindarê li derê mala padişah şîn dibe. Padişah dewata xwe dike. Jina padişahî piştî ku demek li ser dawetê re derbast dibe rojekê dibêje mirovekî:

Were vê dara han ya sipindarê ji xwe re bibire bibe û bişewitîne."

Ew tê wê darê dibire dike qoç dibe davêje mala pîrejinekê. Pîrê tîne wan daran dişewi- tîne. Dema ku xweliya tenûrê derdixe di nava xweliyê de nêkeke teşiyê dibîne. Pîr jê hez dike. Navêje. Datîne nava dolaba xwe ya dîwarî.

Piştî demekê keçik dibe mirov tê ser rewşa xwe ya berê. Di nava dolabê de xwe vedişêre. Dema ku pîrê ji mala xwe dertê derve Hebik radibe mala pîrê paqij dike, sererast dike. Xwarinê çêdike. Nêzikaya ku pîrê were dîsa dibe nika teşiyê dikeve dolabê.

Pirê êvarê tê mala xwe, bala xwe didê mala wê paqij bûye û karê nava mala wê hemû hatiye kirin, êdî tiştek nemaye ku pîrê bike. Pîrê şaş dimîne, li mala xwe dinêre tu wateyê nade vê rewşê û dibêje:

"Ev çi ye? Heta niha tiştekî wiha nebûye. Ev bergiriya han, ev xwarinên han ên çêkirî ji nişka ve ji ku ve hatine!

Rojekê, duduyan û sisiyan... Pîrê dibêje ez ê xwe li vê derê bitelînim. Ka ev kî ye û kî be ez ê wê bibînim!

Pîrê rojekê deriyê mala xwe vedike dîsa digire, lê dernakeve derve. Dikeve bin îsirê, xwe vedişêre. Demekê bala xwe didê ji nava dolabê keçikeke bi hisn û cemal derket. Kete nava malê karê malê çi hebû hemû pêk anî. Îcar dema ku dê êdî keçik here, pîrê derket, pêsîra wê girt û gotê:

"Ez li ezman li yeke mîna te digeriyam, tu li erdê rastî min hatî. Tu şahbazî (milyaketî), tu periyî tu çi yî?"

Hebika Hinarê dibîne ku êdî xwe jê xilas nake, radibe çîroka xwe jê re vedibêje.

Pîrê jê re dibêje:

"De baş e."

Hebik dema ku çîroka xwe ji pîrê re dibêje êdî nakeve dolabê. Li wê derê dibe keçika pîrê dimîne.

Rojekê Hebik derdikeve ber deriyê hewşa malê paqij dike, padişah û wezîr wê li ber deriyê malê dibînin. Bala xwe didinê ew keçika ku wan li ser darê dîtine li

derê mala pîrê ye. Çawa ku keçik wan dibîne dikeve hundir û derî li ser xwe dadide. Heta padişah û wezîr ji wê derê diçin paşê ew derdikeve karê xwe dewam dike.

Padişah dema ku diçe mala xwe dibêje Pîrê:

"Pîrê!"

Pîrê dibêje:

"Fermo!"

Dibêje:

"Ca ka were karê min bi te heye!"

Pîrê dibêje:

"Xêre!"

Padişah dibêje:

"Min Îro keçikek li derê mala te dît, ew keça kê ye?"

Pîrê dibêje: "Ew keça min e!"

Padişah dibêje:

"Pîrê, ji min re rast bibêje! Heta niha keçikeke te wiha tune bû. Ev keçika han ji te re ji ku derê hatiye? Tu dê ji min re rast bibêjî."

Pîrê dibêje:

"Keça min e!"

Padişah dibêje:

"Tu keça xwe nadî min?"

Dibêje:

"Divê keça min ji te re bibêje erê. Heke ku keçik nebêje erê, ez nikarim tiştekî bibê- jim.

Padişah dibêje:

"De baş e. Ez ê êvarê werme mala te. Em ê biaxivin. Ku Xwedê qeder kiribe, ez ê keçikê ji te bixwazim."

Pîrê dibêje:

"Padişahê min, keça te heye kurê te ji heye. Tu mirovekî xwedî jin i. Ka em ê vê keçika han çawa bidine ser hewiyê."

Padişah dibêje:

"Ew ne mesele ye. Ez ê wan çareser bikim paşê dewata xwe bikim."

Padişah êvarê tê malê. Keçik êvarê mesela xwe ya keçka mitrib û meseleyên xwe yên din çi bi serê wê hatibû hemûyê ji wan re dibêje.

Padişah tîne jina xwe ya mitrib berdide. Hebika Hinarê dixwaze bi def û dewat tîne mala xwe. Xwedê du kuran dide wan. Keçik rojekê dibêje:

"Min bêriya bavê xwe û birayên xwe kiriye. Ez dixwazim herim bavê xwe bibînim."

Padişah radibe mesref û bergiriya wê dibîne gazi mela dike û dibêje:

"Mela ewlehiya min ji aliyê namûsê ve bi kesekî nayê. Ez ê jina xwe teslîmê te bikim, tu dê wê bibî mala bavê wê. Ez jî dê hefteyek şûnde li pey we werim."

Mela dibêje:

"Baş e, ser her du çavên min, ser serê min."

Mela, jinik û her du kurên jinikê bi hev re rê dikevin û diçin. Heta danê êvarê bê rawestan bi rê diçin. Êvarê rastî daristanekê tên.

Mela dibêje:

"Xwîşkê em ê îşev li vê derê bimînin. Sibê em ê rabin rê bikevin û biçin."

Jinik dibêje:

"Baş e."

Radibin du konan vedigirin. Di yekî de mela dimîne, di yê din de jî jinik û her du zarokên wê dimînin. Nanê xwe dixwin, ava xwe vedixwin û radizên. Jinik wextekî şevê bala xwe didê ku mela hate ber derê konê wan. Jinik ji Mela re dibêje:

"Mela te xêre? Tu ji bo çi vê nîvê şevê hatî ber derê konê me?"

Mela dibêje:

"Ez hatime ku tu serê xwe bi min re bikî yek."

Jinik dibêje:

"Mela Çawa dibe?! De mêrê min baweriya xwe bi kesekî nedihanî tenê bi te hanî, tu jî ji min re dibêjî serê xwe bi min re bike yek. Ez ê çawa serê xwe bi te re bikim yek."

Wê şevê mela tiştekî nake, paşve vedigere diçe konê xwe. Sibetirê radibin bi rê dikevin. Dîsa têne cihekî dihêwirin, konên xwe vedigirin. Dema dibe şev mela dîsa tê, bela xwe li jinikê dide û dibêje:

"Heke ku tu serê xwe bi yê min re nekî yek, ez dê kurekî te bikujim."

Jinik serê xwe pê re nake yek. Mela lêdixe kurekî wê dikuje. Mela kurê wê dikuje cendekê kurikî davêje wê derê. Jinik radibe her du guhên kurê xwe jê dike hildide cem xwe. Kurê xwe defin dike wê şevê li wir dimînin. Sibetirê dîsa radibin, dikevne rê. Heta êvarê diçin. Dema dibe şev mela dîsa tê bela xwe lêdide. Mela bala xwe didê ku jinik gotina wî nake lêdide kurê jinikê yê din jî dikuje. Jinik dîsa tê kurê xwe defin dike, her du guhên kurê xwe jê dike, dixe berîka xwe.

Sibetirê radibin bi rê dikevin û diçin. Dibe êvar dîsa li cihekî datînin. Mela bi şev dîsa radibe tê û dibêje jinikê:

"Ku tu gotina min nekî, ez dê vê carê te jî bikujim."

Hebika Hinarê dibêje:

"Mela te her du zarên min kuştin, ez dizanim ku dê min jî bikujî. Ez dizanim xilasbûna min jî ji te tune. Tu mirovekî alimî, tu dê destûra min bidî ku ez herim ser avê destmêja xwe bigrim, paşê ez ê werim, tu êdî çi bibêjiî, ez dê bi gotina te bikim."

Mela dibêje:

"Ez ê destûra te bidim, lê ez ji te ne bawer im. Ez ê destê te girêdim, paşê te bişînim destnimêjê."

Mela radibe werîsekî davêje navtenga Hebika Hinarê misîn dide dest û dibêje:

"De here!"

Hebika Hinarê qederekê diçe, werîsî ji navtenga xwe vedike bi misînî ve girê dide û bi darekê ve talîne û dibêje:

"Seriyo tu qurbana lingan bî, bireve!"

Kort û newal namînin ku Hebika Hinarê nekevê û jê dernekeve. Diçe diçe heta lê dibe sibê. Bala xwe didê keriyek pez li wir e, şivanek li ber e. Seyên şivanî diçinê, ew xwe davêje ber bextê şivanî dibêje:

"Şivano! Ez ber bextê te ketime, tu bi hewara min were, min ji van seyan rizgar bike"

Şivan dibeze wê ji seyan rizgar dike. Şivan bala xwe didê ku jineke pir bedew e. Her wekî ku Xwedê ew bi qelema xwe bi taybet neqişandibe wisa bedew e û dibêjê.

"Diya min xwîşka min! Çi karê te li serê vî çiyayî heye?"

Dibêje:

"Tu ji derdê min vegere. Ha ji te ra vê kulma zêran tu jî wan kincên xwe yên qetiyayî û hûrekî pezî bide min."

Şivan tîne şal û çakêtê xwe derdixe dide Hebika Hinarê. Beranekî jî ser jê dike û hurê wî derdixe didê.

Hebika Hinarê hurê pezî li avê dixe, paqij dike û dikişîne serê xwe. Kincên şivanî jî li xwe dike, ji wir dûr dikeve, tê derdikeve bajarê bavê xwe. Rasterast qesta mala bavê xwe dike û dibêje:

Gelo hûn ji xwe re xulaman nagrin? Ez dixwazim ji we re bixebitim.

Lawikekî ku birayê wî bû derdikeve derê malê dibêjê:

"Erê, xulamek ji me re lazim e."

Hebika Hinarê Dibêje:

"Heke ku wisa ne, ez ê ji we re xulamtiyê bikim. Hûn çi karî bidin min ez ê wî karî bikim."

Hebika Hinarê li wê derê bi cih dibe.

Em werine ser dek û dolabên Mela. Piştî ku Hebika Hinarê direve Mela lê digere nagere nabîne. Mela jî tîne konê xwe radike vedigere. Diçe cem padişah. Dema ku padişah Melayî bi tenê dibîne dibêjê:

"Mela ka jin û zarên min te çi ji wan kiriye?"

Dibêje:

"Padişah min! Ez şevekê rabûm min dêhna xwe dayê ku ne jina te ne jî zarên te tu kes di konê xwe de nîn in. Kî dizane ku dane pey kê çûne ku derê?"

Padişah radibe wezîrê xwe jî hildide Mela dide pêşiya xwe dikevin rê. Piştî rêwitiya hef- tiyekê tên digihîjin bajarê bavê Hebika Hinarê. Ew têne koşkê dibin mêvan.

Ji wan re nanî tînin, nanê xwe dixwin, bi hev re suhbetê dikin. Di suhbeta xwe de behsa Hebika Hinarê dikin.

Keçelok jî li wê derê guhdariya wan dike, lê xwe ranagire û dibêje:

"Padişahê min!"

Padişah dibêje:

"Kerem bike keçelokê min, tu dê çi ji me re bibêjî?"

Dibêje:

"Padişahê min! Ku destûra we û cimaetê hebe, ez ê ji we re çîrokekê bibêjim. Piştî çîrokê ez ê cihê Hebika Hinarê ji we re bibêjim."

Padişah li Keçelokî dinêre, li cimaeta xwe dinêre û ji keçelokî re dibêje:

"Keçelok ku tu rastiyê nebêjî, ez ê serê te bidim jêkirin."

"Belê padişahê min, heke ku ez cihê Hebika Hinarê ji we re nebêjim bila serê min qurbana te û cimaeta te bibe. Lê çend şertên min jî hene, ku ez dest bi çîrokê bikim.

Padişah divê:

"Şertê te çi ne? Ka bêje!

Şertê min ev in:

1. Dema ku ez dest bi çîrokê bikim divê ne kes derkeve derve, ne jî kes ji der ve were hundir.

2. Divê tu gazî jina xwe bikî bila ew jî were guh bide vê çîrokê.

3. Hûn dê yekî bişînin bila gazî şivanê bajêr bike, bila ew jî were guhdariya vê çîrokê bike."

Padişah ji gotina Keçelokî tiştekî fêm nake, lê gotina wî jî bi cih tîne. Diçin gazî şivan dikin şivan jî tînin civatê. Jina bavê wê pêşiyê nayê. Lewre wê nedixwest ku bi gotina keçelokekî were wê derê. Jê re dibêjin, Padişahî emir daye û divê tu teqez werî. Jinik tê kêleka mêre xwe rûdine. Keçelok dest bi çîroka xwe dike û dibêje:

"Hebû tune bû. Keçikeke navê Hebika Hinarê hebû. Bavê Hebikê pedişah bû. Bavê wê radibe diçe hecê. Wexta ku dê padişah ji hecê vegere û bê, jinbava wê dibêje birayê wê:

Here hespî ji tewlê berde. Bila Hebika Hinarê pey hespî bikeve.' Wexta Hebika Hinarê pey hespî dikeve pir diweste, jinbav tîne marekî dixe nava cerikê avê didê. Hebika Hinarê wexta ku av vedixwe mar diçe zikê wê. Roj bi roj zikê wê mezin dibe tê ber devê wê. Jinbav radibe bergeriya wan dike wê dide destê birê wê û xurcikeke kadan dide wan, Kadek jê şor û yek jî şirîn çêdike û dibêje:

"Vê keçikê zikê xwe tijî kiriye. Ku bavê te wê wiha bibîne dê me hemûyan bikuje, Ya baş ew e ku tu wê bibi li serê çiyayekî bikuji û werî."

Wexta ku keçelok wisa dibêje jinbav di qilqile, tebatî lê nayê û dibêje:

"Ez ê qasekî derkevim ber derê malê, Keçelokî bêhna min tenk kir."

Lê belê birayê Keçelok dibêje:

"Yek ji şûna xwe rabe ez ê wê/wî bikujim. Divê tu kes heta dawiya çîrokê ji cihê xwe nelepite."

Jinik careke din rûdine. Birayê Hebikê dibêje:

"Keçelok ez qurbana te me bidomine ka çîrok dê were ser çi?"

Keçelok çîroka xwe dewam dike û dibêje:

"Birayê Hebikê belengaz nizanîbû ka mesele çi ye. Jinbava wî çi digotê bawer dikir. Jinbavê hin caran pere jî didanê. Ew bi xwe ve baş girêdabû. Birayê wê Hebikê hildide dibe serê çiyayekî. Xwişka wî bi xew ve diçe. Tîne serê wê datine ser

çoka xwe qederekê lê dinêre, dike nake destê wî naçê ku xwîşka xwe bikuje, li wir di xewê de dihêle serê wê datîne ser xurca kadan, berjêr dibe û diçe malê.”

Kesên ku di odeyê de ne hemû vedisekinin, li devê Keçelokî dinêrin. Tiştên ku ew lê digeriyan keçelok hemûşkan dizane. Hemû bi meraq û bikelecanî lê guhdarî dikin. Tebatî li Birayê Hebikê nayê û dîsa dibêje:

"Keçelok! Zû bibêje ka dawiya çirokê dê çawa be!"

Keçelok çîrokê dewam dike.

"Wexta ku Hebika Hinarê ji xewê radibe dibîne ku birayê wê çûye. Li serê wî çiyayî bi tena serê xwe dimîne. Ew di xewê de wisa tî dibe, êdî nayê gotin. Ew radibe dikeve wan deveran ji xwe re avê digere. Di dawiyê de goleke avê dibîne, diçe ser avê dêhna xwe didê ku ew der mêrg, çîmen û sosin in. Cihekî pir xwaş e. Wexta ku xwe xwarê avê dike mar ji zikê wê dikişe û derdikeve derve. Çawa ku mar ji zikê wê derdikeve, ew bêhiş dikeve bi xwe ve diçe. Qe- derekê wisa dimîne paşê tê ser hemdê xwe radibe têr avê vedixwe. Xurca xwe ya kadan hildide diçe ser darekê. Li wê derê qederekê dimîne bala xwe didê du mirov tên qesta ser kaniyê dikin tên ser avê, avê vedixwin di nava siha avê de Hebika Hinarê dibînin. Yek ji wan mirovan padişah bûye. Padişah dibêje wezîrê xwe, ez ê vê keçikê ji xwe re bixwazim. Padişah li xwe dizvire û dibêje keçikê ez padişah im. Ez dixwazim bi te re bizewicim. Keçik dibêjê:

"Heta tu ji min re dewateke bi def û zirna çênekî ez bi te re nazewicim." Padişah diçe ku jê re tevdîra dewatê bike. Piştî çûna padişahî karwanekê mitriban di wir re dibore. Du keçik ji karwanî vediqetin tên ser kaniyê. Yek ji wan keçikan li serê Hebikê dibe bela û dibêjê, ez jî dê bême ser darê. Hebik alîkariya wê dike derdixe ser darê. Dema ku ew derdikeve ser darê, ew dehfekê li Hebikê dide ji darê dixe erdê. Hebik dibe gulek bi darê ve hêşîn dibe. Wexta ku padişah tê ber darê li ser darê keçika mitrib dibîne. Mirovên padişah tînin wê dixemilînin, hildidin dibin. Wexta ku dê rê bikevin padişah gulê ji darê vedike gulê bi destên xwe digire û tîne. Dema ku ew diçin ber deriyê padişahî keçika mitrib gulê di destê padişah de dibîne û dibêjê:

"Heta tu wê gulê ji destê xwe neavêjî ez nayême hundir."

Padişah gulê davêje erdê. Dema ku gul dikeve erdê dibe cehniyek û dikeve nava reviyên

hespan. Îcar jinik ji padişahî re dibêje:

"Heke ku tu wê cehniyê nekujî, ez nayême malê."

Dema ku Padişah dixwaze cehniyê bikuje cehnî dibe sipingdarek li ber deriyê padişah şîn dibe. Padişah jina xwe hildide û dibe malê. Di wê navê re çend sal derbast dibin, zarên padi- şah ji wê mitribê çêdibin. Rojekê mitrib rikê xwe ji wê darê tîne, ji yekî re dibêje were vê darê bibire bibe ji xwe re bike ardû. Mêrik wê darê dibire û dibe dide pîrejinekê ku ji xwe re bişewitîne. Pîrê ji sibê heta êvarê diçû êvarê dihate mala xwe. Pîre tîne wan qoçan dişewitîne. pîrê tîne ku xweliya tenûrê bavêje. Di nava xweliyê de nêkeke teşiyê dibîne. Destê pîrê naçê ku wê bavêje. Hildide dixe nava dolabê. Rojekê Hebika Hinarê ji nava dolabê derdikeve nava mala pîrê paqij dike. Pîrê rojekê xwe lê vedişêre dibîne. Pîrê dibêjê derdê xwe ji min re vebêje. Ew jî derdê xwe ji pîrê re vedibêje. Di wê navê re demeke dirêj derbas dibe padişah jî wê dibîne. Padişah keçikê ji pîrê dixwaze. Jina xwe ya mitrib jî berdide. Çendeke din dem derbas dibe, Hebik dibêje mêrê xwe:

"Min bêriya malbava xwe kiriye, ku tu destûrê bidî min ez ê herim wan bibînim û werim."

Padişah radibe bergeriya wê dike, her du kurên wê yên biçûk û jina xwe radestê Melayî dike û dibêjê:

"Mela baweriya min ji te pêştir bi kesî din nayê, tu dê jin û zarên min bibî mala bayê wê. Karekî min heye ez niha nikarim bêm. Ez ê karê xwe bikim, heftiyeke din bême rex we" Mela, Hebika Hinarê bi zarên wê ve hildide bi rê dikeve. Ew tên nava daristanekê bi cih dibin û li wir konên xwe vedigirin û nan manê xwe dixwin ava xwe vedixwin û diçin ku di konên xwe de razên. Mela bi şev radibe diçe konê Hebika Hinarê û dibêjê:

"Tu dê serê xwe bi min re bikî yek."

Hebika Hinarê qebûl nake. Mela wê şevê diçe radizê. Sibetirê radibin bi rê dikevin. Dîsa dibe êvar ew li cihekî dihêwirin. Bi şev mela dîsa diçe konê wê. Hebika Hinarê dîsa gotina wî qebûl nake. Mela lêdide kurekî wê dikuje. Hebik radibe kurê xwe defin dike her du guhên kurê xwe jê vedike dixe berîka xwe."

Dema ku keçelok van gotinan dibêje, hedar û tebat li Mela nayê, radibe dibêje:

"Ez ê qasekê derkevim derve herim destmêja xwe nû bikim."

Padişahê mêrê Hebika Hinarê radibe ser xwe û dibêje:

"Îcar kê derkeve, ez ê bikujim! Ev hinde sal in ku li vê rojê digeriyam!"

Keçelok ez bi qurbana te me, bibêje ka dawiya Hebika Hinarê çawa bû?"

Keçelok dibêje:

"Hûn destûrê bidin min, ezê hemûyê ji we re bibêjim. Min gotiye we ez ê cihê Hebika Hinarê jî ji we re bibêjim.

Mela şeva ewil tişt nake, şeva duyemîn kurê jinikê yê din jî dikuje, jinik dîsa bi gotina wî nake. Şeva sêyemîn dibêje:

"Îcar ez ê te jî bikujim."

Jinik ji Mela re dibêje:

"Ez dizanim ku tu dê van gotinên xwe bînî cih, yan jî dê min bikujî. Ez jî xwe bi te nadim kuştin. Ez neçar im ku gotina te bikim. Serê xwe bi te re bikim yek. Lê pêşiya vî tiştî ez dixwazim ku herim destmêjekê bigirim qet nebe em wî karî paqij bikin. Mela tîne werîsekî davêje navtenga jinikê, misînê wê dide destê wê serekê werîsî jî dide destê xwe. Meqseda wî ew e ku jinik nereve. Hebika Hinarê jî tîne werîsî ji navtenga xwe vedike bi misîn ve girê dide. Werîsî bi darekê ve talîne direve.

Wê şevê heta sibê direve. Diçe rastî şivanekî tê. Hinek zêran dide şivanî kincên ser şivanî û hûrekî pezî jê distîne dikişîne serê xwe tê û dizîvire ji şivanî re dibêje:

"Niha dibe ku hinek kes bifikirin û bibêjin gelo wî şivanî pê re tişt kiriye yan na! Şivan tu bi tesediqa emrê xwe bikî destê te li destê wê jinikê ketiye yan na?"

Şivan radibe dibêje:

"Na. Dê û xwişka min be ne destê min bi destê wê ketiye ne jî min bi çavekî wisa lê ni- hêriye."

Ji jinbavê re dibêje:

"Tu bi baweriya heftê û heft bavê xwe bikî, te xerabiyek ji Hebika Hinarê bihîstibû?"

Jinbav dibêje:

"Na. Hebika Hinarê tu karekî xerab nekiribû. Hema rika min jê dihat ji bo wê min wiha anî serê wê."

Dibêje:

"Mela tu hinde pey ketî qey destê te gihîşte wê?

Mela dibêje:

"Na waleh destê min negihîştê."

Keçelok dibêje:

"Min ji we re gotibû ku ez ê cihê Hebika Hinarê ji we re bibêjim, ma ne wisa ne?"

Hemûyan got:

"Erê!"

Destê xwe avête hûrê pezî ji serê xwe derxist û got:

"Hebika Hinarê ez im! Ev jî kincên ku min ji şivanî standibûn."

Wê kincên şivanî derxistin dan şivanî. Porê xwe berda ser kincên xwe. Bav, bira û mêrê wê qêriyan xwe avêtin ser destê wê. Wan Hebikê hembêz kirin.

Mêrê wê dibêje:

"Ya Rebî! Spas ji te re be, te dîsa Hebika min gihande min!"

De îcar têne ser jinbavê û Melayî. Ew tînin hêştirekê heft rojan tî dihêlin, yekê ji heft rojan birçî dihêlin. Jinbav û Melayî bi hev ve girêdidin, hêştira tî ber bi avê ve diçe, ya birçî jî ber bi giha ve diçe. Herduyan ji hev pirtî pirtî dikin û laşên wan jî davêjin ber kûçikan.

Hebika Hinarê digihîje mêrê xwe diçin mala xwe. Ew û mêrê xwe bila bi hev şa bin.

Ew çûn bi miraza xwe şabûn tu jî here bi miraza xwe şa bibe.

### 2.2.3. Meymûn Xanim û Mîrze Memûd

Mîrza Meûd du bira va kurê padşakî bûn. Ew her sê kurê padşê şêwra xwe nav hev da kirin, wekî “Bira, wextê zewaca me ye, gerekê em bizewicin.”

Birê mezin got: - Bira, ji me kîjanê bêje bavê me, wekî wextê zewaca me ye?

Birê biçûk – Mîrze Memûd got: -Hergê rûê we nagire, ez ê bêjime bavê xwe, wekî wextê zewaca me ye.

Mîrze Memûd çû gote bavê xwe, wekî “ Wexta zewaca me ye.”

Bavê wî got: - Mîrze Memûd, ez qurbana we me, wekî hûn hiz dikin bizewicin, ez qaîl im.

Padşa gazî kurêd xwe kir û got:

-Lawo,  hûn herin ser îşê xwe, ez ê sive cavê bidime şeherê xwe, wekî kurê min wê bizewicin.

Padşê gazî cimaeta xwe kir. Padşa got:

-Cimaet, hûn zanin min çima gazî we kiriye, wekî sêva wê yekê, wekî kurê min dewa zewaca xwe dikin, divên em ê bizewicin. Hûn, cimaet, herça qîzê weye mêran e, hûn gerekê sivê qîzê xwe bişînin baxê Torkirî. Kurê min bên wê derê cem wan qîza, bira sêvê xwe bavêjine qîza. Kurê min kîjan qîz hiz kir, sêva xwe lê da, ew qîz kurê minê bistîne.

Kurê padşêî mezin sêva xwe serê qîza wezîr da, kurê ortê-serê qîza qazî da, lê kurê padşêyî biçûk –Mîrze Memûd, sêva wî kesî neket, va wî ji Xasbaxçe derket çû, kes nizane ku da çû.

Cimaetê cav da padşê, wekî sêva kurê te yî mezin serê qîza wezîr ket, sêva kurê teyî ortê serê qîza qazî ket, lê sêva Mîrza Memûdê te kesî neket, ji Xasbaxçe derket, çû sêva wî.

Padşê gazî her sê kurê xwe kir. Hersê kurê wî çûne dîwana bavê xwe. Bavê wan kurê xweyî mezin ra û yê ortê ra gele kêfxweş bû, got:

-Şikir hûn gihîştine mirazê xwe, -lê gote kurê xweyî biçûk Mîrze Memûd, got, ez ji te dixwezim, sêvê, wekî ew sêva te avît serê tu qîzî neket û çû.

Mîrze Mamûd gote bavê xwe, got:

-Bavo, sêv bû, min avît serê tu kesî neket, ez ê herim ku bînim?

-Ku tînî bîne, ez ji te dixwezim wê sêvê.

Mîrze Memûd rabû medê xwe kir û çû mal. Çû duşurmîş bû, got: “Ez ê herm ji ku bînim. “ Lê hema Mîrze Memûd çaxê sêva xwe avîtbû, zanbû sêva xwe kîjan alî avîtîye. Mîrze Memûd rabû da ser rê û xwe li alîê sêva xwe girt û çû.

Kişand muxdarê deh rojaç Dîna xwe dayê be’rekê va ye û got: “Ez ê herim, le’zekî devê be’rê rihet bim.”  Çû dîna xwe daê meymûneke devê be’rê sekinîye û

sêva wî serê meymûnê ye. Û Mîrze Memûd sêva xwe hilda, gele şa bû seva sêva xwe. Sêva xwe hilda û hat meymûnê jî da pey û hat. Mîrze Memûd hat gihîşte şeherê bavê xwe. Merîya cab da padşê, gotin:

-Padşa, Mîrze Memûd hat: sêva xwe û meymûnek anîye.

Gava Mîrze Memûd hat û meymûn pê ra ne gelekî li wî cetin hat. Padşê du merî şandin, got:

-Herin, nehêlin bê nava şeher. Avaîkî ji bajêr der bidine Mîrze Memûd û meymûnê, bira xwe rat ê da bimînin.

Bûkê padşê duşurmîş bûn: “Em ji cihêzê xwe xelateke laîqî padşê ra bişînin. Lê hema Mîrze Memûd se kir, wekî herdu jinê birê wî şêwra xwe kirine, wekî ji cihêzê xwe her yekê xelateke laîqî padşê ra bişînin, Mîrze Memûd divêje: “Herdu jinê birê min wekî meriv in cihê wan heye, wê her yekê xelatekê bişîne bavê min ra , lê ez ê çawa bikim. Ya min meymûn e, ez ê çi bişînim?” Tê mala xwe medekirî. Meymûn xanimê gote Mîrze Memûd:

-Tu çima wa medekirî î?

Mîrze Memûd got:

-Lê ez ê çi mede nekim, wekî jinê birê min ji cihêzê xwe xelateke laîqî padşê ra dişînin, ya min tune ez bişînim, lê ez ê çima medê xwe nekim?

Meymûn xanimê got:

-Mîrze Memûd, tu qe duşurmîş neve, bi îzina xudê merîfeta me yê ji ya wan zêdetir be. Got, Mîrze Memûd, ew cîê te ez anîm, tu here wê derê, wê erebekê ji be’rê derê, wê pirsa min bike. Gava pirsa min kir, tu bêje şikir sax silamet e. Bêje, Meymûn xanimê qutîya xweye biçûk xwestîye. Wê qutîya biçûk bide te, tu bîne. Erebê çû qutî anî da Mîrze Memûd. Mîrze Memûd qutî anî da Meymûn xanimê. Meymûn xanimê gote Mîrze Memûd.

-Kengê wê hedaya bişînin padşê ra?

Got: - Meymûn xanim, wê sivê bivin!

Sekinî heta sivê. Herdu bûkê padşê sivê hedayê padşê şandin. Meymûn xanimê jî ji qutîê deste kiras derpê usa derxist, wekî tu padşa xwe nekiribû. Ew kiras derpê kiras derpê horîya bû. Meymûn xanimê da Mîrze Memûd, got:

-Bive bide bavê xwe, bêje, bûka te Meymûn xanimê te ra pêşkêş şandîye.

Padşa û cimaeta xwe va xelatê bûkê xwe nihêrî, wekî merîfeta xelata Meymûn xanimê zêde ye, ser xelatê herdu bûkên main ra ne. Padşê gote wezîr, wekîlê xwe:

-Bûkê min hedayî min ra şandine, lazim ewekî ez jî gazî bûkê xwe kim, her yekê xelatekê lê kim.

Padşê cav da jina xwe, got:

-Gerekê tu sive gazî bûkê xwe kî, bînî mal, her yekê xelatekê lêkin.

Jina padşê gote padşê:

-Pak, ez ê gazî kimê, du bûkê te meriv in, bûkeke te meymûn e, ez ê çawa bînim huzûra herdu bûkê te?

Padşê gote jina xwe:

-Ew pêşkêşê bûkê min min ra şandîye, ew pêşkêşa meymûnê min ra şandîye, ew pêşkêşê herdu bûkê dinê zêdetir e.

Jina padşê dişîne pey her sê bûkê xwe. Jina padşê kar dike, wekî bişîne pey her sê bûkê xwe. Mîrze Memûd se dike, wekî wê gazî bûkê xwe bike. Mîrze Memûd çû male medê xwe kir. Meymûn xanimê gote Mîrze Memûd.

-Mîrze Memûd, te çima medê xwe kirîye?

-Lê ez çimedê xwe nekim. Wekî dya mine sivê bişîne pey bûkê xwe wê bive, teglîf bike. Herdu bûkê wê meriv in, wê herin huzûra dya min, lê ya te tu meymûn î, lê tê çawa herî huzûra dya min?

-Mîrze Memûd, wekî dya te ê gazî me bûkê xwe ke, wekî usa ne tu here devê be'rê, dîsa ew erebe wê derê, wê bêje: "Mîrze Memûd, Meymûn xanimê çi xwestîye?" Tub êje: "Meymûn xanimê qutîya xwe meznî, çil carîê xwe xwestîye." Erebê bide te tu bînî.

Mîrze Memûd çû devê be'rê, ereb derket, got: "Meymûn xanimê çi xwestîye?" Mîrze Memûd gotê: "Meymûn xanimê gotîye bira qutîya mine mezin, çil carî va bira min ra bişîne." Ereb ji binê be'rê derxist, anî hat daê da, qutî daê got: "Eva jî çil carîê wê." Mîrze Memûd dîna xwe daê çil meymûn da pey hatin cem Meymûn xanimê. Mîrze Memûd gelekî duşurmîş bû, got: "Heta niha meymûnek bû, lê niha bû çilyek meymûn." Meymûn xanima jina Mîrze Memûd gote Mîrze Memûd:

-Tu çima duşurmîş dibî? Tu duşurmîş nebe, lezekê serê xwe dayne, rihet bibe.

Mîrze Memûd serê xwe danî, xwe xewarî danî. Mîrze Memûd dîna xwe daê, wekî Meymûn xanima jina wî, derê qutîê vedike, çilyek dest kinc derxist. Destek ewê xwe kir, çil destê dinê carîya xwe kir. Mîrze Memûd digot: "Gelo eva xewn e, vane rast e?"

Meymûn xanimê gote Mîrze Memûd.

-Hela rave çika aqilê te forma me dibire, yanê na?

Mîrze Memûd wê derê gele şa bû. Mîrze Memûd hinge zanibû jina wî meymûn nine, horî ye.

Dya wî dişîne pey her sê bûkê xwe. Bûka wêye mezin û ya ortê herekê hiltîne du carîê xwe û diçine mala xezûrê xwe. Lê jina Mîrze Memûd, ya biçûk Meymûn xanim çil carî vat êne mala xezûrê xwe. Meymûn xanim û çil carîya va dilqê horîya da têne malê. Cimaeta padşê cavê didine padşê: "Padşa, te digot jina Mîrze Memûd meymûn e, te qe nedigot jina Mîrze Memûd horî ye, çil carî pê ran in, ew çil carî hela ser meymûnê ran in." Jina padşê- xasîya wan nan anî da ber bûkê xwe, lê ewan bûkê wê şaş bûn huzûra jina Mîrze Memûd û carîya va. Lê wexta nan xarinê jina Mîrze Memûd carîê xwe şîret kiribû: "Hûn ki nan dixun, hey bixun, him jî bikine ber pişta xwe. Bûkê padşê wê çev bidine me, ew jî wê usa bikin, him jî ewê

bikin ber pişta xwe. Çaxê rabûnê emê pêsîrê xwe dawşînin: me ki dawşand ew ê jî dawşînin.”

Rabûn xwe dawşandin, ji ber pişta jina Mîrze Memûd û çil carîê wê va zêr ketin, lê bûka padşêye mezin û ya ortê çi êmekê wan xaribû ew ji ber pişta wana ket. Bûkêd padşê rabûn çûn maled xwe. Padşê gava dîna xwe da jina Mîrze Memûd û carîya va- hiş û aqilê wî sêrî çû. Dilê padşê ji carîê bûka wî xirav bû. Padşê şande ba Mîrze Memûd: “Mîrze Memûd, gerekê tu carîke xwe bidî min, bira dîwana min da qulix bike.” Mîrze Memûd dive: “Bira be.” Çaxê padşa dişîne peu Mîrze Memûd, jina Mîrze Memûd va eyan e, çimkî horî ye. Wî çaxî sê carîya dişîne, lê du carîya bal xwe dihêle. Çawa ku dilê padşê ji carîê wê xirav bûye, Mîrze Memûd tê male divêje Meymûn xanimê ra, divêje:

-Bavê min dive bira here bêje Meymûn xanimê, bira carîke xwe bide min, wekî ez xwe ra bistînim.

Meymûn xanimê dîna xwe daê, wekî nikare destê xezûrê xwe derxe, Meymûn xanim û herdu carîê xwe va destê xwe lev dan, bûne sê kevotka û firiyane ber pencerê, gotin:

-Mîrze Memûd, Mîrze Memûd, em îdî çûn, hergê hatineke te heye pirsa şeherê Şaê Bilûrvan bike û were.

Û Mîrze Memûd dîna xwe daê, jina wî herdu carîê xwe va çûn. Diçe cem bavê xwe, divê:

-Bavo, tu bûyî sebebê jina min û carîya va, jina min û carîê xwe çûn. –Mîrze Memûd gote bavê xwe û dya xwe: ez îdî pey jina xwe herim.

Bavê wî û dya wî gelekî Mîrze Memûd da ketin, gotin:

-Were gura me bike neçe, emê te bizewicînin, yekê bînin ela ser wê ra be.

Mîrze Memûd gote bavê û dê:

-Tu cara ez nazewicim. Hebe ya min Meymûn xanim e, tunebe Meymûn xanim e.

Dya wî dîna xwe daê, wekî Mîrze Memûd nasekine, dya wî got:

-Mîrze Memûd, ez ê te ra bêm.

Dya wî jî pê ra çû. Mîrze Memûd û dya xwe diçin qeraxê mêşekî va dertên. Dîna xwe didinê, otaxeke va ye, diçin xwe rat ê da rûdinîn. Mîrze Memûd got:

-Daê, ez ê herim xwe ra nêçîrê. Belkî ez diçim tiştekî ji me ra bînim, em pê ebûra xwe bikin.

Mîrze Memûd dice nêçîrê, lê xayê wê koçkê dêwek bû. Navê dêw Babir bû. Babir û dya Mîrze Memûd sozê xwe kirine yek, hesavê çawa jin û mêr. Babir divêje dya Mîrze Memûd, divê:

-Hemîn Mîrze Memûd dice nêçîrê, êvarê tê, ez û tu ê roê miqîm cem hev bin, lê êvarê bîreke min heye, ez ê bikevime bîrê, bira Mîrze Memûd min nevîne, wekî qewata Mîrze Memûd ji ya min zêde ye, ez pê nikarim.

Babir dîna xwe daê, wekî vî hesavî nave, Mîrze Memûdê pê bihese, "Min jî, dya xwe jî bikuje." Babir gote dya Mîrze Memûd, jina xwe, got:

-Jinik, aha boş e.

Dya Mîrze Memûd dîna xwe daê bi wan Mîrze Memûdê pê bihese, wê bikuje. Rabû xwe nexweş avîte nava cîya. Êvarê Mîrze Memûd ji nêçîrê hat, got:

-Daê, tu çima ketî nava cîya?

Got: -Lawo, ez nexweş im. Hale min tune.

Sekinî heta sibê, sibê Mîrze Memûd çû nêçîrê. Babir lê da hat cem dya Mîrze Memûd, jina xwe ra got:

-Jinik, tux we nexweş davêjî nava cîya da jî boş e. Ew mêşê pêjberî me, ew mêşe mêşê şêra ne, tu bêjî Mîrze Memûd: " Ew mêşê han tê da hene sêv, here min ra

sêva bîne, ez ê qenc bivim.” Ew ki çû nava mêşê şêra, wî çaxî şêrê bikujin, ez tu ê wî çaxî emê îdî bigîjine hev.”

Êvarê Mîrze Memûd ji nêçîra xwe hat, got:

-Daê, tu qe çawa nî?

Go: - Lawo, ez werimî me, tu dikarî ji min ra herî vê mêşê hana, ji min ra sêva bînî, ez bixum, belkî ez pak dibim.

Mîrze Memûd dilê xwey sax bû, nizanibû, wekî dya wî Babir yartîê hev ra dikin. Mîrze Memûd çû mêşe, çû hine sêv çinî, dîna xwe daê mezinê şêra rast hat. Dîna xwe daê, wekî Mîrze Memûd mêrekî zor e, wekî hêrsa xwe rake, wê nava mêşe da koka şêra bîne. Mezinê şêra got:

-Mîrze Memûd, were ez tu bibine birê hev. Ez ê du şêra bidime te, wekî rojeke tengasîê kêrî te bên.

-Ê, got, wekî tu divejî, ez û tu em bibin birê hev.

Mezinê şêra du şêr pêşkêş dane Mîrze Memûd. Mîrze Memûd herdu şêrê xwe û sêv dya xwe ra hilda û hat. Gava ki Mîrze Memûd ji mêşe derket – du şêr pê ra, dya wî û Babir dîna xwe danê Mîrze Memûd hat du şêr pê ra. Babir gote jina xwe, dya Mîrze Memûd, got:

-Ez ê têkevime bîrê, xwe veşêrim.

Mîrze Memûd hat, herdu şêr hiştine ber dêrî, bi xwe çû cem dya xwe, got:

-Daê, tu qet çawa nî?

Got: -Lawo, hale min tunîne!

Mîrze Memûd got: - Daê, min te ra sêv anîne!

Got: -De ka ez bixum!

Mîrze Memûd sêv daê, dya wî sêv xwar. Mîrze Memûd got:

-Daê, ez diçim nêçîrê, tu miqatî şêrê min bî, wekî tu miqatî şêrê min nebî, guh nedî şêrê min, ez zanim.

Teva sivê Mîrze Memûd çû nêçîrê. Babir kir bîrê derê, dîna xwe daê du şêra xwe avîtê, Babir dîsa kete bîrê. Dya Mîrze Memûd dîna xwe daê, wexta Babir e, Babir nehat. Got: "Hebe tunebe şêr nahêlin Babir ji bîrê derê." Dya Mîrze Memûd çû ser bîrê, dîna xwe daê herdu şêr sekinîne nahêlin Babir derê. Dya Mîrze Memûd gote Babirê mere xwe:

-Tu vê axriya me ra çi divêjî, wekî şêr nahêlin tu derêî?

Babir gotê, got: - Jinik, bêje Mîrze Memûd, bêjê, şêrê xwe bire girê de, bê, nahêle ez te ra êmekekî hazir kim. Ber derî wê girê de. Gava girê da, ez ê bîrê derêm bême cem te, ez tê hev bivînin.

Mîrze Memûd ji nêçîrê hat, hate mala xwe. Dya Mîrze Memûd gote Mîrze Memûd, got: -Lawo, te ew şêrê han anîne, qet nahêlin ez ji male derêm, şuxulekî bikim.

Mîrze Memûd got: -Daê, lê ez çawa bikim?

Dya wî gotê, got: -Lawo, ber dêrî jincîl ke, wekî ez jî karibim şuxulekî bikim.

Mîrze Memûd hat herdu şêrê xwe ber dêrî girê da, û çû nêçîrê. Babir hat cem jina xwe. Babir got:

-Jinik, te Mîrze Memûd şande mêşê şêra dîsa sax hat. Mêşekî ji wî mêşeyî dûrtir heye: li wî mêşeî da heye dêwek. Hema çû mêşe, dêwê wî bikuje, em ê jê xilaz bibin.

Êvarê Mîrze Memûd hat. Dya wî got: - Mîrze Memûd, lawo, mêşekî ji mêşê şêra wê da tir e, here wî mêşeî, ji min ra hinara bîne.

Lê hema Mîrze Memûd nizane, wekî dya wî bi yar e, wekî dişîne ser qedaê. Mîrze Memûd rabû da ser rê û çû ji nav mêşê şêra ra derbaz bû, çû kete mêşê dêw. Xwe ra hinara diçine. Qîzek maşoqa dêw bû. Qîzik ber pencerê dinhêre, wekî merîk

wê ketîye nava hinara diçine. Qîzik duşurmîş bû, got: “Ev merî han xam e, wekî hatîye ketîye mêşê dêw, got, ez herim elmet kimê bira here, gune ye bira here hê dêw nehatîye, wê bikuje.” Qîzik rabû, hine nan, hine titûn û çi lazim e hilda û bir bide Mîrze Memûd. Qîzikê got:

-Xorto, hergê tu birçî î, min te ra nan anîye, hergê titûna te tune, min ra titûn anîye. Tu nizanî eva sînorê dêw e, here hela dêw nehatîye, wekî bê wê te bikuje, tu gune î.

Mîrze Memûd gotê, got: -Qîza dela, je’r nanê te keve û titûna te keve, te hê nanê xwe neda min, te kul kuta dilê min. Te bihîşta min parî nanê te bixwe ra, te dîsa bigota dêwê te bikuje.

Mîrze Memûd nanê wê nexwar, got:

-Qîza qenc, riya dêw kîjan e?

Qîzikê got: -Riya dêw eva hane!

Û Mîrze Memûd da ser riya dêw û çû. Çû rastî dêw hat. Dêw dîna xwe daê, benîk pê va derket. Dêw li Mîrze Memûd kire gazî, got:

-Benî, ew çend serê te hene, tu hatî topraxa min digerî?

-Dêw gote Mîrze Memûd: - Heft serê te hebe, tu destê min xilaz nabî.

Mîrze Memûd got: -Gewro, bixwe, paşê bişêkrîne.

Ewî ki got “Gewro”, dêw da dareke mêşe avîte Mîrze Mehmûd, Mîrze Memûd xwe da alîkî. Mîrze Memûd pişt dêw zivirî, şûrek lê da, dêw kuşt. Herdu guhê dêw jêkir, kire xurca xwe, anî hat otaxa dêw. Ber wê qîza dêw girtibû anîbû, ber wê qîzê danî, got:

-Te digot: “Tu riya dêw da neçe, dêwê te bikuje”, min riya dêw da çûm, min dêw kuşt, eva jî guhê dêw.

Qîzikê xwe avîte ser dest pîê Mîrze Memûd, got:

-Mîrze Memûd, şikir te ez ji destê wî dêwî xilaz kirim, gerekê tu min bistînî.

Mîrze Memûd gote qîzê: Tux ûşka min, ez birê te, ez te nastînim.

Mîrze Memûd qîz hilanî hat cem dya xwe, got:

-Daê, eva xûşka min e, min anîye, tu miqatî xûşka min bî, xûşka min belengaz neve.

Mîrze Memûd temî da xûşka xwe, got:

-Ez xaykirina herdu şêrê xwe teslîmê te dikim, wekî tu şêrê min rind xwey kî.

Mîrze Memûd çû nêçîra xwe. Dya Mîrze Memûd tirsa xûşka Mîrze Memûd nikare gazî Babir ke, wekî bêne bal hev. Dya Mîrze Memûd xûşka Mîrze Memûd dixapand, digot: “Here serê sînorê me ava sar heye, min ra bîne ez bixum, ez nexweş im.” Qîzik diçû jê ra avê. Babir dihat, ewê Babirê yare xwe hevdu didît. Ne carekê-du cara dişande çolê, menîya tişta. Qîzîk li dya Mîrze Mmeûd kete şikê, wekî yare wê hene û medê xwe kir. Mîrze Memûd hat dîna xwe daê xûşka wî medekirî ye. Mîrze Memûd gote xûşka xwe:

-Te çima medê xwe kirîye?

Got: -Lê çi bikim, lê ez ê çi medê xwe nekim?

Mîrze Memûd gote xûşkê, got:

-Gerekê tu min ra rast bêjî, çika çima te medê xwe kirîye?

Xûşk duşurmîş bû, got: “Ez bêjim, Mîrze Memûd, wekî dya tem êrê wê heye wê dya xwe bikuje, gune wê bikeve stuê min. Ew pak e, hema Mîrze Memûd çi bêje, ez xwe ker kim.”

Mîrze Memûd nihêrî, wekî xûşk rast navêje. Mîrze Memûd gote xûşkê, got:

-Dive te bîra mala bavê xwe kirîye, ez bizanibim seva mala bavê te ye, ez ê te bivim herim, te teslîmî mala bavê te kim.

Xûşkê tu pirsa rast negote Mîrze Memûd. Mîrze Memûd xûşka xwe hilda, bir çû teslîmî mala bavê kir û hat. Babir û dya Mîrze Memûd dîna xwe danê wa nikarin aşkere derbaz kin. Babir gote jina xwe, got:

-Bêje Mîrze Memûd "Mîrze Memûd, heta niha bîna min xûşka te derdiket, te xûşka xwe bir teslîmî mala bavê kir, lê niha ez tenê mame bîna min dernaê."

Dya Mîrze Memûd dive: -Mîrze Memûd, qeweta te çi da ne, bal min bihêle ez xwe ra mijûl bim. Heta tu êvarê têyî.

Mîrze Memûd got: -Daê, tu şirîtekê bîne, min bi stûnê va girê de pê şirîtê. Qeweta min ew e, ez ê bême bendê.

Dya Mîrze Memûd anî ber stûnê bi şirîtê Mîrze Memûd pêça.

Got: -Daê, qewta min ev e.

Dê got: -Lawo, îdî tu hatî bendê, got, êdî ew e?

Got: -êdî ew e, ez bend bûm çûm, -lê hema wê care rast qeweta xwe negote dya xwe.

Dya wî got: Babir.

Gava ki dya wî got "Babir", hêrsa Mîrze Memûd rabû, niharek rahîşt, bû çirpîna şirîtê qetîya. Mîrze Memûd got:

-Daê, te çima got Babir?

Dibê: -Lawo, Babir tişt nine, min navê baê hildaye. Got, lawo, te rast nego, tî çî bêbext î, rast bêje.

Go: -Daê, pirsa rast ez ê ji te ra bêjim. Got, tîrkevanê min bîne, herdu tilîê destê min bide ser hev û hev va girê de, ez ê bême raê.

Dê anî herdu tilîê Mîrze Memûd da ser hev, pê jîka kevanê wî girê da. Hingê dya wî zanibû Mîrze Memûd hate raê. Dya wî dertê devra, dice cem Babir, divêje:

-Babir, min tilî pêçîê Mîrze Memûd girê daye, guhê te ser min be, ez ê herime hundur cem Mîrze Memûd. Ez ê carekê navê te hilînim, tu neê, ez ê du cara hildim – neê, cara sisya min ki navê te hilda, tu bizanibî ew hatîye raê, wî çaxî tu were bikuje.

Dya Mîrze Memûd hate male. Dya Mîrze Memûd got: “Babir. Hêrsa Mîrze Memûd rabû, zor da tilîê xwe, wekî veke. Mîrze Memûd dîna xwe daê tîrkevan tilîya wî da rûnişt gihîşte hestu. Cara duda dya wî dîsa got: “Babir.”

Divê: -Daê, îdî ez hatime zevtê.

Dya wî dike gazî: -Babir, de were.

Babir tê. Dya wî divê: -Babir de bikuje.

Babir dive: Mîrze Memûd ne yê kuştinê ye. Ez ê çevê Mîrze Memûd derxim, Mîrze Memûd bavême bîrê.

Rabû çevê Mîrze Memûd derxist, çevê rastê kire cêva rastê, çevê çepê jî kire cêva çepê, mile Mîrze Memûd girt, bir avît bîra serê rê. Herdu şêrê Mîrze Memûd dane pey Mîrze Memûd. Çûn li ser devê bîrê sekinîn. Babir hate mala xwe. Bazirganbaşî wê rê da çûn, hatin, şêrê Mîrze Memûd diçûne pêşya bazirganbaşîya. Lê dinêrin, wekî kîjan bare devê nan e, ew bar danîn û hundur da dikirne xwar. Mîrze Memûd ew nan dixar. Muxdarê heftêkê şêra nan danîn didane Mîrze Memûd, hundurê bîrê da xwey dikirin. Dengê herdu şêra dinyaê bela bû, wekî du şêr hene ser riya bazirganbaşîya, lê hema tu zyanê Nadine bazirgana.  Zyana wan şêra ew e, tê dinhÊre bare kîjan deveyî nan xarin e hiltînin, divin diçin. Kesek cilet nake, wekî pey wan şêra here, çika ku da diçin. Bazirganbaşîkî serwext hebû. Ewî se kir, wekî derheqa wan şêra û bazirganê wê ra diçe, şêr diçin pêşîê û bare nan hiltînin divin. Got: “Ez ê seva xatirê şêra, ez ê bazirganê xwe hildim û wê re herim.” Bazirganê xwe hilda û çû tanga şêra. Dîna xwe daê, şêr hatine pêşîya bazirgên. Bazirganbaşî gote şêra, got:

-Bimbarek, sebir bikin ez risqê we bidime we.

Bazirganbaşî gihîşt barê devekî, êmek ser barê devê  anî, da şêra got:

-Bimbarek, eva risqê we ye.

-Şêra hilda û bir çû. Bazirganbaşî gote du berdestîê xweye baş, got:

-Kuro, hela pey wan şêra herin, çika ku da diçin?

Ev herdu merî pey wan şêra çûn. Dîna xwe dane şêra. Şêra ew nan bir çû avîte hundurê bîrê û ber devê birê xwe ra ketin. Ewan merîya hat gote bazirganbaşî, got:

-Şêra ew nan avîtine bîrê û ber devê bîrê sekinîne.

Bazirganbaşî herdu merîya ra çû, dîna xwe daê wê şêr ser devê bîrê sekinîne. Lê hema Mîrze Memûd şêrê xwe hîn kiribû, ziyan nedidan merîya û merîya çi xever dida şêra fem dikir. Bazirganbaşî du xulama va li ser derê bîrê sekinîn. Mîrze Memûd dîna xwe daê dengê merîya li ser bîrê tê. Mîrze Memûd got:

-Ew çi merî ne li ser devê bîrê?

Bazirgan lê nihêrîn, wekî dengê merîkî li hundur tê. Bazirgan lê kire gazî, got:

-Tu çi merî yî, ketî vê bîrê?

Mîrze Memûd hundurê bîrê da gote bazirganbaşî, got:

Ez merîkî kor im, ketime hundurê bîrê. –Mîrze Memûd got: -hûn dikarin min ji bîrê derxin?

Bazirganbaşî gote Mîrze Memûd.

-Tîê çi bidî min, wekî ez te derxim?

Mîrze Memûd got: -Ez ê çi bidime te, çi min heye. Bona xêra xwe min ji bîrê derxe.

Bazirganbaşî gote Mîrze memûd, gotê:

-Tu herdu şêrê xwe bide min, ez ê te derxim.

Got: - Qurban, şêr çî min ran in, ez merîkî kor im, lê hema tu min derxî bivî şeherekî bihêlî.

Bazirganbaşî Mîrze Memûd ji bîrê derxist. Mîrze Memûd û şêra va hilda û bir şeherekî danî. Wî şeherî da xûşka Mîrze Memûd hebû. Ew xûşka Mîrze Memûd jina dêw bû, wekî Mîrze Memûd ji dêw xilaz kiribû. Lê ewê, xûşka Mîrze Memûd zanibû, zeda Mîrze Memûd ji destê dya wî ye. Rabû seva Mîrze Memûd gotibû berdestîê xwe, wekî "Çi merîê xwe xêretxana min girt, hûn bînin cem min."

Bazirganbaşî dîna xwe daê, wekî wî şeherî da xêretxane belengaza rah eye. Bir çû ber derê xêretxanê. Xûşka Mîrze Memûd mezina xêretxanê bû. Dîna xwe daê bazirganbaşîkî du şêra va hatin ber derê xêretxanê. Xûşka Mîrze Memûd teslîmî xûşkê kir. Çaxê bazirganbaşî Mîrze Memûd teslîmî xûşka Mîrze Memûd kir, xûşka Mîrze Memûd gote bazirganbaşî, got:

-Şêrê Mîrze Memûd bide min û here.

Bazirganbaşî gotê: -Ew şêr heqê min e, wekî min Mîrze Memûd jib îrê derxistîye: Mîrze Memûd daye min.

Got: -Qurban, tu bistîne heqê xwe.

Bazirganbaşî da ser rê û çû. Xûşka Mîrze Memûd îdî guh da Mîrze Memûd û xwey kir. Muxdarê mehekê xwey kir. Mîrze Memûd hate ser benga xweye berê. Xûşka Mîrze Memûd hêşka gilîê dya Mîrze Memûd ji wî ra kir, got:

-Mîrze Memûd, tê bîra te wexta min medê xwe kir, te digo: "Xûşkê te çima medê xwe kîrîye?" Min newêrbû te ra bigota dya te yar e, te ê bikuşta, lema jî min medê xwe kir, te ez anîme mal. Min eva xêretxana seva te çêkir. Mîrze Memûd, eva çîyaê pêşberî me çîyaê Kêfê ye. Ez gere hevalê xwe ra herime çîyaê Kêfê: ez îja çawa bikim, ez te xwe ra bivim, çavê te tuneye, ez te xwe ra nevim, sebira min nayê?

Mîrze Memûd gota xûşkê, got:

-Xûşkê, ez dîna xwe didimê, wekî destê te ji min nave, tîê ji hevala paş kevî. Min ji xwe ra bive here nêzîkî çîyaê Kêfê, li ber avekê sya dare dayne û hevala ra here kêfê, wekî hey tu min bivînî bona bîna te jî derê.

Xûşk bi hevala ra çû kêfê. Xûşka Mîrze Memûd li ber sya darê hîşt û çû. Mîrze Memûd serê xwe ber sya darê danî, dîna xwe daê bû pirînîya sê kevotka hatin, li ser serê darê danîn. Kevotkekê got:

-Gelî hevala, bîna benî adema li vira tê.

Kevotka biçûk got: -Xayê, çima tu nizanî, bîna Mîrze Memûd tê, dya wî yar bû, çevê Mîrze Memûd derxist. Niha çevê wî cêva wî da nin, bîrê nakeve. Emê niha bifirin sê perê meê bikeve. Hergê razaye here xewnê, hergê hişyar e- gudar be. Çevê wîyî rastê cêva rast da ne, çevê wîyî çepê cêva wîye çepê da ne. Bira çevê xwe derxe, bike avê nerm bive ser çevê xwe bişo, li vira bigere her sê perê me bivîne, çevê xwe li avê derxe bike dewsê da, ewan perên me çevê xwe bide ser, êmê nîv sehetê bisekine – çevê wî wê qenc bive, wê dinya ronik bivîne.

Bû pirîna kevotka û çûn. Mîrze Memûd gele şa bû, got: “Ezî hişyar im, mi ra divêjin.” Mîrze Memûd destê xwe gerand her sê per dît, çevê xwe şûşt, çevê rastê kire yê rastê, çevê çepê kire alîê çepê. Hersê per çeê xwe dan, da ser çevê xwe girê da. Êmê nîv sehetê sekinî, çevê xwe vekir dinya ronik dît. Mîrze Memûd rabû hinekî gerîya, xûşka wî ji çîyaê Kêfê dîna xwe daê yek wê cem Mîrze Memûd diçe tê. Xûşka wî duşurmîş bû “Gelo ew kî ye cem Mîrze Memûd diçe tê. Gelo ew dost e, yanê dijmin e?” Xûşka wî lê da hat, dîna xwe daê, wekî Mîrze Memûd e, çevê wî qenc bûne rabûye digere. Gelek şa bû, xwe avîte pêsîra Mîrze Memûd: “Bira, şikir vê gavê ra, îjar jî çevê te qenc bûn.” Xûşka wî sand hespek anî lê siyar kir. Çûne mala xûşka xwe. Çû herge muxdarekî ma, rojekê Mîrze Memûd gote xûşkê, got:

-Ez ê herim.

Xûşkê got: -Tê ku da herî?

Got: -Ez ê pey Meymûna xwe herim, çûye bajarê Şayê Bilûrvan. Gerekê ez herim pey Meymûna jina xwe, belkî ez bînim.

Û Mîrze Memûd îzina xwe ji xûşkê xwest, rabû çû ber bi şeherê Şayê Bilûrvan. Mîrze Memûd çû ber bi be'rê rastî sê merîya hat. Dîna xwe daê sê merî şer dikin, gote wana:

-Gelî xorta, hûn çima şer dikin?

Wan her dê merîya gote hevdu: "Eva benîya hat, go, bira îşê me bipirse." Go:

-Benî, bavê me mirye û sê tiştê me hene, em ser her sê tiştê xwe qirka hevdu digirin.

Got: -Mesela her sê tiştê we çî ye?

Got: -Yek kum e, yê dine sicad e, sivir e.

Mîrze Memûd got: -Gelo merîfeta wan çî ye?

Got: -Merîfeta kum ew e –meriv têxe serê xwe kesek navîne, merîfeta sicadê ew e, dayne, wekî tê da rûnên û şive lê xe kî derê dilê wî dixweze, wê derê datîne, merîfeta sivirê ew e, wekî şivê lê da çi tem bêjî, tê da heye.

Mîrze MemEud got: -Gelî hevala, hûn herin sê kevira min ra bînin. Go, ez ê her sê kevirê we bavêjim. Kîjanê kevirî pêşîn anî, ez ê kum bidimê, kîjanê pey wî ra hat, ez ê sicadê bidimê, kîjanî yê kutasîê anî hat, ez ê bidime wî sivrê û şivê.

Mîrze Memûd her sê kevir avît, her sê merîya dane pey kevira. Mîrze Memûd kum kire serê xwe, ber wan her sê meriva unda bû. Ew her sê meriv hatine cîê xwe, dîna xwe daê Mîrze Memûd tune. Wan her sê meriva got:

-Mîrze Memûd, here, te helal xweş be.

Mîrze Memûd gote wan her sê meriva, go:

-Qurban, mirazekî min heye, ez herim biqedînim, ez ê dîsa bînim bidim we.

Wan her sê xorta got: -Mîrze Memûd, mirazê te çî ye, bêje em jî bizanbin?

Mîrze Memûd gote xorta, got:

-Mirazê min ew e, ez herim şeherê Şayê Bilûrvan, Meymûn xanima qîza Şayê Bilûrvan dergîstîya min e, ez ê bînim. Min anî, ez ê anemetê we bidime we û herim.

Ewan her sê xorta got: -Here, mirazê te bû!

Mîrze Memûd kete sicadê, got:

-Ez te dixwezim, tu min şeherê Şayê Bilûrvan daynî.

Mîrze Memûd gihîşte şeherê Şayê Bilûrvan. Çû mala pîrekê bû mêvan, lê hema pîrê herdu qîzê xwe va Mîrze Memûd ne didît. Lê hema Mîrze Memûd guhdarîya pîrê û herdu qîzê pîrê dikir. Herdu qîzê pîrê got:

-Daê, de zû bike, şuxul kuta bike, emê herin cem Meymûn xanima qîza Şayê Bilûrvan, nexweş e.

Dya wan got: -Gelo nexweşîya wê çî ye?

Got: -Daê, çima tu nizanî nexweşîya wê çî ye. Nexweşîya wê seva Mîrze Memûdê kurê padşê ye!

Dya wan gote qîzê xwe:

-Çima nexweş eseva Mîrze Memûdê kurê padşê?

Qîza wê gote dya xwe, got:

-Daê, çima tu nizanî Meymûn xanimê wextekê çûbû Mîrze Memûd kurê padşê standibû. Nizam îdî menîya wê yekê seva çi bû, wekî cem Mîrze Memûd hat, hingî hatîye nexweş e kerba Mîrze Memûd.

Mîrze Memûd dîna xwe daê pîrê qîzê xwe va gilîê xwe kuta kirin, Mîrze Memûd wê derê kumê xeybê li serê xwederxist, xwe nîşanî pîrê da, go:

-Pîrê, Mîrze Memûd ez im!

Pîrê got: -Mîrze Memûd, wekî tu li vir bûyî te gilîê me se kir, lê me çawa tu nedîtî?

Mîrze Memûd gote pîrê, go: -Pîrê, ya min kumê xeybê serê min da ne: ez gava dikime serê xwe, tu kes min navîne, gava min kum serê xwe derxist, merî min divining. –Mîrze Memûd gote pîrê, wekî tu diçî, usa ne ez jî t era bêm.

Pîrê got: -De rave, em tevayî herin.

Mîrze Memûd gote pîrê: -Tu here, ez ê kumê xeybê bikime serê xwe, xeyb bêm, wekî ez t era bêm, wê min bivînin, lê wekî ez kumê xeybê bikime serê xwe kesek min navîne.

Pîrê lê da çû cem Maymûn xanima qîza Şayê Bilûrvan. Mîrze Memûd jî kumê xweyî xeybê kire serê xwe û pîrê ra çû. Çûn çawa daerê qîza şayê Bilûrvan vekirin, Meymûn xanimê got:

-Pîrê, çi bîneke xweş te tê.

Pîrê divêje: -De te va eyan e, wekî bîna xweş ji min tê. Pîrê sekinî heta êvarê û êvarê çû mala xwe. Mîrze Memûd kumê xwe xeybê sera xwe derxist û Meymûn xanima jina wî dîna xwe dayê –eva Mîrze Memûd. Herda dest stuê hev ra birin û hevdu şa bûn. Maymûn xanimê cav da bavê xwe: “Bavo, welle, Mîrze Memûdê zevê te hatîye, ez jî eşqa wî qenc bûme.” Bavê Meymûn xanimê gote Meymûn xanimê, got:

-Şikir vê gavê ra, Mîrze Memûdê mere te hat û tu jî qenc bûyî.

Meymûn xanimê gote Mîrze Memûd: -Rave em herin dîtina bavê min.

Mîrze Memûd û Meymûn xanima jina wî çûn gormaxya xezûrê xwe. Bavê Meymûn xanimê gote Mîrze Memûd:

-Wekî îro te xwe li min girtîye hatî, min Meymûn xanima qîza xwe pêşkêşî te kir, her, mirazê we bû, hilde û xwe ra bive.

Meymûn xanim û Mîrze Memûd hatine otaxa Maymûn xanimê. Maymûn xanimê gazî carîke xwe ye baş dike û diveje carîya xwe, divê:

-Gereke tu min ra bêyî, em herin.

Carîya Meymûn xanimê divêje Maymûn xanimê, divê:

-Tu ku da herî, ez ê t era bêm, terka te nakim.

Meymûn xanim divê: -Mîrze Memûd de rave em herin.

Mîrze Memûd gote Meymûn xanimê, got: -Werin em sicadê da runen, herin.

Meymûn xanimê got: -Mîrze Memûd, sicade çî ye?

Mîrze Memûd gotê, got: -Sicade ew e, wekî em tê da runen, kî derê dixwezin li wê derê me dayne.

Maymûn xanimê gote Mîrze Memûd, got: -Ez sicadê nayêm, tu here, ez û carîya xwe va emêbi perê xwe bên.

Mîrze Memûd bi sicadê çû. Meym:ûn xanim û carîya xwe va bi pera çûn. Mîrze Memûd got: “Sicade ez ji te dixwezim wê cîê te, ez anîm cem her sê xorta, dîsa li wê derê daynî.” Mîrze Memûd lê nihêrî sicadê cem her sê xorta danî. Mîrze Memûd gote wan her sê merîya, got:

-Qurba, hûn îjar werin ez ê anemetê we bidime we.

Gote birê mezin, got: -Kum te ra.

Gote birê ortê, got: -Sicade te ra.

Gote birê biçûk, got: Sivre û şiv te ra.

Her sê xorta gote Mîrze Memûd: -Here, t era oxir be, wekî te para me kivş kir da me, em jî êdî qirka hev nagirin. Mîrze Memûd çû gihîşte mala xûşka xwe. Xûşka Mîrze Memûd gote Mîrze Memûdi got:

-Tu xêr silamet hatî. –Got, bira, te jina xwe anî?

Got: -Erê, xayê, min anî. Gerekê tu îzna min bidî ez herim.

Xûşkê hespek jê ra anî da Mîrze Memûd. Mîrze Memûd siyar bû û herdu şêrê xwe hilda û çû. Çû cem dya xwe. Dîna xwe daê, dya wî razaye kurek anîye. Mîrze

Memûd kurê wê nav male dît, kur kuşt û dya xwe jî kuşt, çû, wekî Babir bikuje. Lê Mîrze Memûd gote Babir, got:

-Te ez çawa nekuştime, ez jî te nakujim, te çawa çevê min derxist, ez ê jî çevê te derxim.

Mîrze Memûd çevêd Babir derxist û herdu şêrê xwe hilda çû şeherê bavê xwe, mala xwe peya bû. Nihêrî Meymûn xanima jina wî û carîya xwe va wê mala wî ne. Padşê, bavê Mîrze Memûd gele şa bû, wekî Mîrze Memûd hat. Padşê şande pey sazbenda, anî heft roj, heft şeva Mîrze Memûd ra kire def û dewat. Padşa gote Mîrze Memûd:

-Lawo, te jina min, dya xwe ra bir kanê?

Mîrze Memûd gote bavê xwe, got: -Bavo, dya min yarek girt – navê wî Babir, min dya xwe kuşt. Min carîya jina xwe t era anîye.

Mîrze Memûd caraya jina xwe da wî, bavê xwe.

Xilaz dive serhatîya Mîrze Memûdê kurê padşê û Meymûn xanima qîza Şayê Bilûrvan.

Ew jî wê derê xwe ra şa bûn (13).

### 2.2.4. Dîtinhezar

### 2.2.5. Keçika Mesî

Hebû tunebû carek ji caran rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran. Xortek hebû, diya xort nexwaş bû. Gelekî feqîr û belangaz bûn. Xort her roj diçû li ser çem mesî digirt, dihanî şeher difirot û pê wî pereyî va debara xwe dikirin.

Rojekê xort ji xewê rabû lê nihêrî ku xule xula şiliyê ye û dibare. Diya wî dibêje:

- Kurê min îro jî neçe mesiyan, tê şilbî û nexweş bikevî.

Xort dibêje:

- Na dayê ez neçim nabe, me ra debar lazim e.

Xort xatirê xwe ji diya xwe ya nexweş dixwaze û dîsa diçe mesiyan.

Wê rojê qe masî tunebûn. Bûbû çend saetan ew hatibû mesiyan, lê yek mesî jî hê negirtibû. Xwe xwe ra got 'xwezil min gotina diya xwe bikira û îro qe nehatama mesiyan.

Usa hinekî dîsa li ser çem dimîne, dixwaze mesiyan bigire. Piştî ku gelekî disekine, mesiyek tê û dikeve tora wî. Xort torê dikişine û lê dinêre di torê da tenê mesiyek heye. Lê mesî usa bedew e ku meriv qêmîş nake lê binêre. Xort dibêje ‘ez vê mesiya bedew nafiroşim û ez ê bibim malê wê xweyî bikim.’ Mesiyê dike nava hinek av û hildide dibe malê.

Mesiyê dibe malê nişanî diya xwe dike. Diya wî jî mesî gelekî bedew dibîne û ew jî dixwaze kurê wê mesiyê li malê xweyî bikin. Mesî dikine hindurê şûşeyekê avê û datînîne koşeyekî. Her roj ava wê diguhirînin û jê ra şa dibin. Xort jî diya xort jî gelekî mesiya xwe hez dikin. Xort dîsa serê her sibê radibe û diçe mesiyan. Sê-çar meh piştî wê diya xort ya nexweş dimire û xort tena serê xwe dimîne. Wexta êvara vedigere malê, derd û kulên xwe hemasa mesiyê ra dibêje.

Xort êvarekê tê malê, lê dinêrî ku yekî mal paqij kiriye, xurek çêkiriye û sifre raxistiye. Xort metel dimîne. Xwe xwe ra dibêje: 'gelo kî ev xarin û xurekên xweş çikirine? kî mal aha bedew kiriye?

Diçe li cînaran dipirse. Lê cînar jî dibêjin 'haja me ji tiştekî tine, me nekiriye.’

Gelekî meraq dike, dibêje gelo ev kî ye?

Rojekê- du roj- sê roj hemasa tê dinêre mal paqij kirine û xwarin û xurek çêkirine. Dibêje "çi dibe bila bibe gerek ez bizanibim ew kî ye."

Sibetirê radibe derdikeve derva, lê naçe mesiyan. Xwe li derê malê li cihekî vedişêre û heviyê dimîna, ka kî tê mala wî? Heta êvarê xwe li derva ditelîne, lê qet kes nayê hindurê malê. Evar dibe, lê hê jî kesek nehatibû. Dibê "yeqîn ew îro nayê." Berê xwe dide hindurê malê. Diçe dinêre dîsa mal paqij kirine û xwarin û xurek

çêkirine, sifre raxistine û çûne. Xort li wir şaş û metel dimîne. Dibêje "Sibêda ez li derê malê bûm kesek nehat, ça min nedit?" Sibetirê dîsa der- dikeve derê malê. Dîsa naçe mesiyan û vê carê xwe li ber deri da ditelîne.

Usa li wir dimîne û malê raçev dike. Wextekê dibîne mesî ji şûşeyê derket, postê xwe li ser xwe derxist û bû qîzeke usa bedew ku mîna hîv û rojê. Xort matel dimîne. Di ciyê xwe da nezane vê çi bike Usa xwe ditelîne û keçikê raçev dike. Keçik malê gişkî pagii dike, xwarin û xurek çêdike, sifrê radixe, xwarin û xurek dide ser sifrê. Piştî ku keçik şixulê xwe xelas dike, berê xwe dide berva postê xwe. Keçik ça ku destê xwe davêje post, xort tê destê xwe dixe nava porê keçikê û dibêje:

- Tu kî yî?

Keçikê dibêje:

- Ez mesiya bi sêhr û efsûn im.

Xort dibêje:

- Ça dibe ku mesî dibe meriv?

Keçikê dibêje:

- Min got ez bi sêhr û efsûn im.

Kî min bê post bibîne û bigire, ez dibime berdestî û xizmetkara wî. Tu çi dixwazî ez ê bikim

Xort ça ku keçik dîtibû dilê wî ketibû keçikê. Dibêje:

- Ez dixwazim tu bibî jina min.

Keçikê dibêje:

- Tu çi bixwazî ez ê bikim.

Dilê keçikê jî çûbû ser xort. Loma dilê wê jî hebû ku xort bixwaze.

Piştî wê rojê keçik êdî nabe mesî û weke meriva dimîne. Di nava rojê de şixulê nava malê dikir û hêviya hatina xort dima. Yê çend roj piştî wê dewata xwe bikirana û bizewiciyana.

Rojekê Mîr li şeherê xwe digere. Bi tevî merivên xwe, tên ber mala xort ra derbas dibin û Mir keçikê dibîne. Mir ça ku keçikê dibîne, dilê Mîr jî dikeve keçikê. Ji dev û dorê dipirse; "ev keçik kî ye." Paşê diçe û fermanê dişîne û dibêje:

- Bira ew gedê mesiya digire, were sereya min.

Piştî fermana Mîr, xort berê xwe dide serayê û diçe cem Mîr. Mîr dixwaze xort bide kuştinê û keçikê ji xwe ra bixwaze.

Piştî xort diçe derdikeve pêşiya Mîr, Mîr dibêje:

- Ez ê tiştekî ji te bixwazim, heger nikaribî bikî ez ê serê te lêxim.

Xort dibê:

- Kerem bike Mîr.

Mir dibêje:

- Tê herî di binê behran da ceniya hespa bin behran bînî.

Xort serê xwe dixe ber xwe û berê xwe dide malê. Diçe male, keçik dibîne ku gelekî bi mirûz û li ber xwe dikeve. Dibêje:

- Çibû tu çima usa bi mirûz î?

Xort dibê:

- Mîrê min bikuje, dibêje 'tu ji min ra ceniya hespa li bin behran da neynî ez ê serê te lêxim.

Keçik dibêje:

-Tu li ber xwe nekeve. Here li ber behrê û bêje: 'Dê û bavê mesiya bi sêhr û efsûn, ka ceniya hespa masiya bi efsûn bidin, qîza we dixwaze. Tu usa bêjî yê ceniyê bidine te.

Xort gelekî şadibe û radibe, berê xwe dide behrê. Diçe li ber behrê dibêje:

- Dê û bavê Mesiya bi sêhr û efsûn, ka ceniya hespa Masiya bi sêhr û efsûn bidin, qîza we dixwaze.

Ji nişka dibe xuşiniya avê û av diqelişe û tê da ceniyeke reş a mîna qîrê dertê. Xort ji ceniyê siyar dibe û berê xwe dide sereya Mîr. Diçe ceniyê dide Mîr, Mîr vê carê dibêje:

- Şerteke min dîsa heye. Heger tu wê neynî cî ez ê serê te lêxim. Tê herî ji min ra têjika hûtê bin avê bînî.

Xort dîsa serê xwe dixe ber xwe û berê xwe dide malê. Dîsa bi mirûz û bi keder.

Keçik dibêje:

- Vê carê çima usa bi mirûz î?

Xort dibêje:

- Mir vê carê jî dibêje ji min ra têjika Hûtê binê avê bîne.

Keçik dibêje:

- Qe li ber xwe nekeve. Here li ber behrê bêje dê û bavê min 'qîza we dibêje bila têjika hût bişînin.'

Xort diçe ber behrê û dibêje:

- Dê û bavê mesiya bi sêhr û efsûn, qîza we dibêje bira min ra têjika hût bişinin.

Ji nişka va av diqelişe û tê da têjika hût dertê. Xort têjikê hildide û berê xwe dide serayê. Mîr têjika Hût dibîne, şaş û metel dimîne û ditirse.

Dibêje:

- Têjikê berdin bira here.

Têjika Hût diçe, Mîr dibêje:

- Şerteke min dîsa he ye. Tu nikaribî vê şerta min bînî cî ez ê ese serê te lêxim. Tê herî min ra zareke kurîn bînî, wê di dergûşê da min ra xeberde.

Xort dîsa serê xwe dixe ber xwe a diçe cem keçikê. Keçik dibîne ku dîsa bi mirûze, dibêje:

- Vê carê çi xwest?

Xort dibêje:

- Vê carê jî dibêje zareke kurîn bîne, yê di dergişê da min ra xeberde.

Keçikê dibêje:

- Here bêje dê û bavê min, bêje qîza we bîra birê xwe kiriye, dibêje bira bişînin ez birê xwe bibînin.’

Xort raste rast berê xwe dide behrê. Diçe kêleka behrê dibêje: Dê û bavê mesiya bi sêhr û efsûn qîza we dibêje 'min bîra birê xwe kiriye, bira birê min bigînin, ez wî bibînin!

Ji nişka av diqelişe û tê da zareke kurîn dertê. Xort zarê dide hembêza xwe û berê xwe dide sereya Mîr. Rê da xort her tiştî yek yek ji zarê ra dibêje.

Diçine cem Mîr, Mîr zarê ra dibêje:

- Ka xeberde.

Zar dibêje:

- Çi xeberdim Mîrê zilimkar?

Ça ku zar usa dibêje, her piyên Mîr heta jora çîpan dibine kevir.

Mîrê metelmayî dibêje:

-Tu xeberdidî?.

Zarok dibêje:

- Erê mîrê qecer ez xeberdidim.

Vê carê heta istiyê Mîr, gişt dibe kevir.

Mîr dibêje:

- Ça zarek xeber dide?

Zarok dibêje:

Ove tu jî dibînî û dibihîzî ku aha xeberdide.

Serê Mîr jî dibe kevir. Piştî wê bedena Mîr ya ku bûye kevir, heta hetaye kevir dimîne.

Xort, zarê hildide û dibe malê, Keçika ku bîra birê xwe kiriye, birê xwe paç dike û jê ra şa dibe. Paşê wî dişîne cem dê û bavê xwe. Xort û keçik va dizewicin û heft kurên wan dibin. Bira ew herin ser mirazê xwe, çîroka me xelas.

### 2.2.6. Elo Ecêvî

Wextekê mêr, jinek hebûn. Ewana zef dewletî bûn. Zarê wana tunebûn. Ewana gelekî ber xwe diketin, digotin:

"Emê evê hebûna xwe çawa bikin, kê wê buxwe?". Usa digotin û duşurmiş dibûn.

Rokê dewrêşek tê, dibêje:

-Hûn çima aqasî duşurmîş dibin?

Dibêjin: -Em herdu tenê ne, aqasî dewletî ne, lê ewledê me tunene, nizanin kê wê buxwe evê hebûna me!

Dewrêş dibêje: -herin xanîkî mezin çêkin. Heft pencera tê da bihêlin, heft kloça lê xin, daynine ser rexê pencera. Hûn ê sbê rabin binhêrin, wekî ew bûne heft kur.

Ewana diçin, xanîkî çê dikin, kloça lê dixin, kloçek dibe kût, hildidin. Ser kloçê sax dikin şer, ewê kût jî digirin davêjin ser rexê pencerekê. Sbê radivin, dinhêrin, wekî her seş kloçê sax bûne şeş xortê usa, wekî meriv ne bixwe, ne vexwe, husilcemala wana binhêre. Lê ewa kût dibe kurekî nîvî, navê wî datînin Elo Ecêvî.

Rokê ewan her şeş birê bedew dê û bavê xwe ra dibêjin:

-Karê me bikin, emê herin şerê dêwa.

Dê û bayê wana, dikin-nakin wana nikarin. Bavê wana dibêje jina xwe, dibêje:

-Jinik, rabe karê wana bike, bira herin. Ez zanim, ew çawa hatine, wê usa jî herin.

Diya wana radibe nan lê dixe, karê wana dike, her şeş bira radibin, lê dixin diçin. Diçin, diçin, rastî garanekê tên, gavên ra dibêjin:

-Roja te xêr, biraê gavan!

Gavan dibêje: -Ser çevê min, ser serê min, hûnê ku da herin, gelî lawka?

Ewana dibêjin: -Emê herin şerê dêwa.

Gavan dibêje: -Wekî usa ne, ez ê bînim du gamêşa berî hev dim, herkê we jev veqetand, ji hev dûr xist, hûn ê dêw alt kin, yan na, herin, dêwê we alt ke.

Ewana dibêjin: -De bîne!

Gavan diçe nav garana xwe, du gamêşa tîne, berî hev dide. Ewana sê bira dêla gamêşekî digirin, sê bira jî dêla gamêşekî digirin. Dikin, nakin nikarin gamêşa ji hev veqetînin. Gavan dinhêre nabe, dibêjê da:

-Berdin, hûn ku herin, dêwê we alt ke.

Ewana didin ser rê, diçin. Diçin, diçin rastî keriê pêz tên. Şvîn ra dibêjin:

-Roja te xêr, birangê şivan!

Şivan jî dibêje: -Ser serê min, ser çevê min. Hûn ê ku da herin, gelî xorta.

Ewana dibêjin: -Emê herin şerê dêwa!

Şivan dibêje: -Wekî usa ne, werin ez ê tase şîr we ra bidoşim, ez ê herim heft cara dora pêz herim bêm. Hergê we xar, hûn ê dêw alt kin, hergê we nexar, herin, dêwê we alt ke.

Şivan tîne tase şîr didoşe, dide ber her şeş bira û ew diçe dora pêz, diçe tê. Heft carê wî temam dibe. Tê dinhêre, ewekî şîr hê nîvî nekirine. Şivan dibêje:

-Qurban, de rabin herin, dêwê we alt ke.

Ewana diçin. Zef diçin, hindik diçin, dighîjne soldrûkî. Slave didin soldrû, soldrû slava wana vedigre, dibêje:

-Hûn ê ku da herin, gelî xorta?

Ewana dibêjin: -Emê herin şerê dêwa!

Soldrû dibêje: -Wekî hûne herin şerê dêwa, werin eze vê drêşa xwe wê darê xim, herkê we derxist, hûn ê dêwa alt kin, yanê we dernexist, dêwê we alt ke.

Soldrû tîne drêşa xwe dêr dixe. Her şeş bira xwe drêşê va dadilqînin, nikarin, wekî drêşê jê bikşînin, derxin.

Soldrû dibêje: -De herin, qurban, dêwê we alt ke.

Ewana didin ser rê, diçin. Dêw dibêje qîza xwe:

-Rabe, binhêre, qe îsanet wan dera naxweyne? Koka dranê min dêşe, were bêje min, ezê rabim, wana daqurtînim.

Keçik radibe, dinhêre, wekî toz û dûman hildikşe. Tê dibêje bavê xwe, dibê;

-Bavo, toz û dûmanekî zirav hildikşe.

Dêw dibêje qîza xwe: -Here bêjîngê gûz bive bide ser be'rê û xwe veşêre. Herkê hatin qalçika va kirin devê xwe û xarin, xwe jî avîtin ser rûê be'rê, av xarin, ewanaê min alt kin, yan na, usa nekirin, bira bên, ez ê wana alt kim.

Keçik radibe bêjîngekê tijî gûz dike, dive datîne ser ruê be'rê, xwe vedişêre. Ew her şeş bira tên, dinhêrin - bêjingek gûz va ye, dibêjin:

-Werin, ewan gûza jî buxun û paşê herin.

Her yek xwe ra kevirekî tîne, tê rûdinî, yeko-yeko dişkênin dixun, bi kulma jî avê dixun, radibin, lê dixin diçin.

Qîza dêw diçe dibêje bavê xwe:

-Wele hatin gûz yeko-yeko şkênandin, xarin, kulma jî av xarin, hatin.

Dêw dibêje: -Bira bên, ez ê wana alt kim.

Ewana tên, dibêjin dêw:

-Derê!

Dêw dertê, dibêje: -Hi, çi heye?

Ewana dibêjin: -Em hatine ser te şer.

Dêw dibê: -Sirya min e, yan sirya we ye?

Ewana dibêjin: -Em hatine ber derê te, sirya te ye.

Dêw carekê dike hufînî: sê bira carekê va dadiqurtîne, cara duda sê birê dinê jî dadiqurtîne, diçe mala xwe.

Em wan her şeş bira bihêlin, ji Elo Ecêvî xeber din.

Elo Ecêvî dibêje dê û bavê xwe:

-Karê min bikin, ez ê herim hewariya birêd xwe.

Dê û bavê wî dibêjin: -Elo, ew her şeş birê te çûn, çi kirin, wekî tu herî, tuê çi bikî?

Ew dibêje: -Na, hûn ê karê min bikin, bikin, yanê na ez ê we herda jî bikujim.

Bavê wî dibêje jina xwe: -Jinê, rabe, karê wî bike, bira here. Ew her şeş çûn, bira ew jî here, xûna wî ji xûna wana ne çêtir e.

Diya wî karê wî dike, Eloê te dide ser rê û. Diçe, diçe, dighîje garanekê. Slavê dide gavîn. Gavan dibêje:

-Ser serê min, ser çevê min, Elo Ecêvî!

Elo dibêje: -Elo Ecêvî û zuqurne, tu çima nabêjî, xortê delal, tê ku da herî? Dibêje, ezê herim şerê dêwa.

Gavan dibêje: -Wekî tê herî şerê dêwa, were ez ê du gamêşa berî hev dim. Hergê te ew herdu gamêş ji hev veqetandin, tê dêw alt kî, hergê te veneqetand, dêwê te alt ke.

Gavan diçe ji nav garana xwe du gamêşa vediqetîne, berî hev dide, Eloê te dêla gamêşekî digre davêje pişt çiyakî, dêla yekê jî digre davêje pişt çiyakî dinê.

Gavan dike qarînî: -Wey bira, gamêşêd min, wey bavo, gamêşêd min!

Elo dibêje: -Kureder, kurê kerê!

Elo Ecêvî lê dixe diçe. Pir diçe, hindik diçe, dighîje kerîê pêz. Dîsa mîna gavîn slavê dide şvîn. Şivan jî dîsa dibêje.

-Elêkîmî selam, Elo Ecêvî!

Elo dibêje: -Êş, mirin ji te ra, çima nabêji, xortê egît, tê ku da herî?

Şivan dibêje: -Xorte egît, tê ku da herî?

Elo dibêje: -Ez ê herim şerê dêwa.

Şivan dibêje Elo: -Elo, wekî tê herî şerê dêwa, were ez ê tase şîr bidoşim û herim, dora kerîê xwe heft cara herim û bêm. Hergê te xar, tu ê dêw alt kî, hergê te nexar, dêwê te alt ke.

Elo dibêjê da: -Bîne bidoş!

Şivan tîne, didoşe, dide ber Elo Ecêvî, diçe, wekî dora kerîê xwe here û bê. Şivan hela carekê dora kerîê xwe naçe, naê, Eloê te şîr dixwe, tasê dişkêne, şivdara xwe dixe, lê dixe diçe.

Şivan dibêje: -Wey tasa min, wey bira, tasa min!

Elo dibêje: -Kul, kurê kerê te ra tas lazim e, min ra sîleh lazim nîne? Wekî zikê dêw biqelişînim, -lê dixe diçe.

Zef diçe, hindik diçe, dighîje soldrûkî. Dîsa mîna şvîn, mîna gavîn slavê dide. Soldrû dibêje:

-Ser serê min, ser çevê min, Elo Ecêvî.

Elo Ecêvî dibê: -Kureder li te, çima nabêjî, xortê egît, tê ku da herî?

Soldrû dibêje: -Xortê egît, tê ku da herî?

Elo dibêje: -Ezê herim şerê dêwa!

Soldrû dibêje: -Wekî usa ne, were ez ê drêşa xwe evî darî xim. Hergê te jê kşand, rakir, tu ê dêw alt kî, yanê te ranekir, dêwê te alt ke.

Usa dibêje û drêşê dêr dixe. Elo Ecêvî drêşê dikişîne ji dêr derdixe, dar kokê va radike û dide ser milê xwe, diçe.

Soldrû dike qîrîn:

-Wey bavo, wey birao, dara min, drêşa min!

Elo dibêje: -Kurê kûçka, ji te ra dar û drêş lazim e, min ra sîleh lazim nîne, wekî ez dêw ra şer bikim?

Dêw dîsa mîna berê dibêje qîza xwe:

-Rabe ser xanî, binhêre qe meriv van dera tune, koka dranê min dêşe, ez bavême koka dranê xwe?

Qîza dêw radibe ser xênî, dinhêre, wekî toz û dûmanek hildikşe. Tê dibêje bavê xwe, dibê:

-Bavo, min qe tiştek jî nedît, lê toz û dûmanek zirav hildikşe.

Dêw dibêje qîza xwe mîna cara ewlin:

-Bêjinge gûz bive bide ser be'rê û xwe veşêre. Hergê hatin gûz bi qalçika va kirin devê xwe, xarin, xwe avîtin ser rûyê be'rê, av xarin, ew ê bên min alt kin, yan na, usa nekirin, bira bên, ez ê wana alt kim.

Qîza dêw radibe bêjinge gûz dibe datîne ser devê be'rê, xwe vedişêre. Elo Ecêvî tê dibîne bêjinge gûz vaye. Hildide bi qalçika va dike devê xwe duxe û dikeve ser rûyê be'rê, avê duxe, radive, lê dixe diçe.

Qîza dêw diçe bavê xwe ra dibêje:

-Bavo, wele hat, gûz bi qalçika va xar, xwe avîte ser rûyê be rê, av xar.

Elo Ecêvî diçe ber derê dêw, du-sê cara dike gazî:

-Dêw derê, dêw derê!

Dêw tirsana dertê, dibêje:

-Sirya min e, yan sirya te ye?

Elo Ecêvî dibêje: -Sirya te ye, wekî ez hatime ber derê te, dora te ye!

Dêw dike hufîn, Elo xwe dide alîkî û şûrekî stuê dêw dixe, sê serê dêw carekê va jê dike. Cara duda her şeş serê dêw ji tîne xarê. Zikê dêw diqelşîne, her şeş birê xweye mezin ji zikê dêw dertîne. Dibêje her şeş birêd xwe:

-Hûn ku da çûne?

Ewana her yek tepekê dide serê Elo Ecêvî, dibêjin:

-Em çûbûn mala xalê xwe. Me kap dilîst.

Her heft birava dikine ser qîza dêw, dibêjin:

-Were, ciê xezna bavê xwe me ra bêje, em te nakujin.

Qîza dêw dibêje: -Herin bin afirê hespê bavê min selekî mezin, bin wî da xezna bavê min e.

Diçin, sel hildidin, her şes bira xwe dor-dor dadhêlin dibêjin:

-Wey em şewtîn, peritîn, me derxin.

Elo Ecêvî dibêje: -Ez çiqasî bêjim, ez şewtîm, peritîm, min dahêlin!

Ew çiqa dike qîrînî; -Min derxin, ez şewtîm, peritîm, ewana dadhêlin.

Elo Ecêvî heft bar zêr derdixe. Her şeş bira dibêjin:

-Werin em wîya bikujin, wekî neê malê, me rûreş neke.

Yek dibê: -Werin em çelê da bihêlin û sel jî datînin ser devê çelê û diçin. Elo dike qîrînî, dibêje:

-Sel dûr here, sel dûr here, yanê na ez ê usa bikim qîrînî, wekî tu pirtî-pirtî bivî, jor da bêyî xarê.

Elo wekî gele dibêje: "Dûr here, sel", sel dûr naçe. Elo dike qîrînî. Ji qîrînîya wî sel pirtî-pirtî dibe, jor da tê xarê. Elo gazî qîza dêw dike. Qîza dêw tê, derdixe. Eloê te radibe dide pey biraêd xwe û diçe. Diçe dinhêre, wekî her şeş birêd wî qîyala garanê da razane. Diçe pesarî berev dike, tîne dike piştîê wana û zêrê piştîê wana

xwe ra vala dike. Piştîê xwe dadigre û xwe vedşêre. Her şeş birêd wî radibin, piştîêd xwe hildidin û dibêjin:

-Piştîê min sivik bûye.

Diçin digîjin mala bavê xwe. Dibêjin:

-Bavo, daê, xalî-xalîça raxin, me zêr anîye!

Dê û bavê wana jî radibin û tînin xalî-xalîça radixin: pesarî jî kulekê ra berî nav malê didin. Pesarîk çevê bavê wana dikeve: çevê bavê wan dertê. Yek jî çevê dê dikeve çevê dê kor dibe. Ewana dibêjin:

-Ne hûn bin, ne kurtîya we be, we çevê me derxist.

Elo Ecêvî radibe tê ser kulekê ra dike gazî:

-Daê, bavo, xalî-xalîça raxin, min zêr anîye?

Diya wî ranaxe. Bavê wî dike şer, dibê:

-De bîne raxe, ewana çevekê me derxistin, bira ew jî çevê meyî dinê derxe.

Tînin xalî-xalîça radixin. Elo Ecêvî xurca zêra kulekê ra berdide. Zêrek çevê bavê dikeve, çevê bavê qenc dibe. Zêrek jî çevê dê dikeve, çevê dê sax dibe. Ewana tînin her şeş kurê xweyî dinê derdixin û Elo Ecêvî dikine kurê xwe û pê şa dibin.

### 2.2.7. Mihemedê Pîrê

Hebû tunebû, rehme li dê û bavê min û we û guhdaran, ji bilî şeytanê kor, deherandî, li ber dîwaran... Li gundekî Kurdistanê bi navê Mihemed, xortek hebû. Ji ber ku ew û pira diya xwe bi tene bûn, jê re digotin, “Mihemedê Pirê.” Mihemed, xortekî lihevhatî, bejinzirav, qamdirêj, por, simbêl û çavên wî reş, navmilpan, di çax û benga xwe de, jêhatî, çeleng û çalak bû... Evînn û evîndariya bi qîzan re ne di bîr û bala wî de bû. Her roj wextê xwe li çol û çiyê bi nêçîra balinde (teyr û tûr) û koviyan derbas dikir... Neçîr bû; gelek rojên wî vala diçûn ango tiştek bi dest nedixist û gelek rojên wî hebûn ku nêçîrên bedew digirt û ji pira diya xwe re dikir diyarî. Jixwe nêçîr

û nêçîrvanî jî weha ye. Le sed mixabin, dema tu ji neçîrvanan bipirsî, bersiv weha ye: “Her dem ez biserketî me, tu rojan ez ji neçîrê vala venegerîme. Roja kêm, yek û dudu...”Rojek ji rojên Xweda, Mihemed tîr û kevanê xwe davêje milê xwe derdikeve nêçîrê; ta êvarê li çol û çiyan digere, tiştekî safî nake, destvala bi ser diya xwe de vedigere malê. Li vegerê seriyekî dide dafikên xwe yên li hevrazê çiye vedayî, dinere ku çivîkek di dafan de aliqiye. Çivîkê ji dafikê ve dike, dixe mista xwe û dibêje “îroj nesîbê min ev qas bû.” Yezdanê dilovan ziman davêje devê çivîkê û bi Mihemed re diaxive; dibêje: “va ye te ez bi fen û fûtan girtime, ne bi mêranî û dê min ji xwe re bikî şîva êvarê. Bi xwarina min tiştek li te zêde nabe. Çend roj din dê bê jibîrkirin. Çêlîkên min piçûk in, ew jî di hêlînê de tî û birçî li benda min in. Ka min berde, azad bike, dibe ku di pêşerojê de carekê ez dê bi kêrî te werim; xelefê vegerînim."

Mihemed di pêşniyaza çivîkê de dihizire, ger ji bona pêşerojê dê rojekê pêwistiya wî pê bibe an jî dilê wî bi çivîkê û çêliyên wê ku tî û birçî li benda wê ne disoje, dilbirehm dibe, destê xwe lê sist dike û dibêje: “de bifire, azad bibe. îşev jî nesîbê min li Xweda.” Çivîk, beri ku biçe, dibêje: “ya mirovê dilovan! Periyekî ji perwazê min hilke, li bêrîka xwe deyne. Roja ku tu bikevî tengasiyê û pêdiviya te bi min çê bibe, serê perî bi agirê cixareya xwe bişewitîne, ezê li nik te amade bibim, bi xatirê te!.." Çivîk ber bi azadiyê de difire, digihije azadiya xwe, diçe nav çêlîkên xwe; Mihemed jî bi dilekî şad û kêfxweş lê destvala vedigere malê...

Dotira rojê, Mihemed derdikeve qûntara çiyê nêçîrê, rastî qeflek peza kûvî tê. Dide pey wan. Colê peza kûvî ber bi kûrahiya çiyê de dibeze. Mihemed jî di rexê din re li wan difetile ku pêşiya wan bibire. Bêhemdî xwe tebabekî bi kûrahiya çiyê de diçe lê, kûvî bi hêleke din de dageriyabûn û şopa wan winda kiribûn. Mihemed hinekî din jî bi nava çiyê de diçe; kelehek li ber çavên wî dikeve. Dora kelehê gişt sûrkirî bû. Lê bûbû êvar jî; nema karîbû li gundê xwe vegere. Xwe xwe dibêje: “ezê îşev li vê kelê bibim mêvan, sibe karê xwe, nêqira xwe berdewam bikim.” Nêzî kelê dibe, dinêre ku li tenişta kelê avahiyek ji qoqê seriyên mirovan lêkirî heye. Avahî pir bala wî dikişîne û lê Matmayî dimîne. Jê re dibe etir û meraq. Gelo ji ber çi sedemê ji qoqê serê mirovan?.. Dema digihîje ber derê kelê ji dergevan eger û sedema wê qesrê ku ji qoqê mirovan hatiye avakirinê dipirse. Yê dergevan li bejn û bala Mihemed dinere, rewşa wî di berçavan re derbas dike û dibêje: ‘‘çîroka vê avahiyê dijwar û

xetere ye. Tu jî xortekî nestele yî. Heyfa min bi te tê. Dev jê berde. Mîna ku te nedît, ji hiş û aqilê xwe bavêje. İşev tu mêvan î, sibe bi riya xwe de here...” Mihemed li ber ê dergevan digere, tika û reca jê dike ku çîroka wê avahiyê jê re şîrove bike, bêje... Dergevan dibêje:

-Ev qonax a qîza paşayê vê kelê ye. Qîzeke pirr xweşik, rind, porzer, çavxezal, bejinzirav û dirêj, çermtenik, lihevhatî û nû ji pazdehan derketiye, Xezala kelê û delala ber dilê dê û bavê xwe ye derbasî şazdehan dibe. Çaxa zewaca wê batiye. Bavê wê daxuyaniyek li navgel belav kiriye, ew betl û pêlewanê ku şert û çirûtên qîza wî bi cih bîne dê qîza xwe lê mehr bike, bike zavayê xwe û bi ser de jî wî bike wezîr. Yana dê serê wî were jêkirin... Ta îroj kesekî ew şert û merc bi cih neaniye. Bi hezaran serê xort betl û pêlewanan hatiye jêkirin. Ew qesra ku tu dibînî, ji qoqê serê wan hatiye avakirinê. Dibe ku cihê qoqê serê te jî tê de hebe...

-Min bûyer fêm kir; eceb çîrok û ûsûl çawa ye? Ji kerema xwe re tu dikarî xwestin û xwazgîniyê ji min re rave bikî? Ez mirovekî biyan im. Pêdiviya min bi alîkariya te heye. Mirovê biyan kore...

-Tu wê eywana devbilind û fireh dibînî?

-Erê...

-Biçe wê eywanê; li wir textê xwazgîniyê heye. Li ser wî textî rûne. Li cem text maseyek û li ser wê maseyê zengilek heye. Rahêje zengil, lê bide... Bi vî awayî wê tekiliyên te bi rayedaran re were girêdan... Ji wir û pê de tu û siûda xwe... Yezdanê dilovan bi te re alîkar be. Ji min ev qas, îcar dimîne li ser şens û zîrekiya te...

Mihemed, berê xwe dide eywanê, diçe li ser textê xwazgîniyê rûdine, zengil digire û dihejîne, ango li zengil dide. Di demeke  kurt de du dergevan pê ve tên ; dinêrin ku mirovek li ser textê xwezgîniyê runiştiye. Bi lez û bez diçin ji wezîrê destê çepê re dibêjin. Ew jî diçe ji yê destê rastê ku bi wî karî ve têkildar bû re dibêje. Wî agahdar dike ; dibêje : “xwezgîniyekî qîza paşayê me hatiye… “ Her du wezîr tên eywanê, rewşa Mihemed dibînin. Zehf li ber dikevin. Ji hev û din re dibêjin : çarenûsa vî xortê delal a nebaş, ew aniye van deran …  jê dipirsin :

-Navê te bixêr ? Tu kî yî û derdê te çi ye ?..

-Navê min Mihemed e. ji min re dibêjin “Mihemedê Pîrê.“ ez xwazgîniyê qîza paşayê we me. Min bihîstiye paşe dê wê bizewicîne… Barê min li min bikin. Sert û mercên we çine ji min re xuya û şîrove bikin. ez bi her tiştê xwe amade me ; bi biryarim …

-Şertên me, ne malê dinê, next ,diyarî û cevher in. Barekî pir sivik e. mirovê ku sê şevan li pey hev qîzê biaxivîne, paşayê me dê qîza xwe lê mehr bike. Ev kar jî tiştekî pir zor û dijware. Tu xortekî nestêle yî. Paşe wê serê te jê bike û li wê avahiya keleka kelê de ji devla kevirekî ve deyne. Jixwe şûn da seriyekî tê de maye ; wê avahiyê temam bike. Bila ev qoq neyê te be. Te qîz jî nedîtiye. Tu ne evîndarê wê yî jî. Tu bi ya me dikî, dev jê berde. Işev mêvanê me be sibê bi rê û oxira xwe de biçe…

-Min devê xwe pê kiriye. Ez dizanim dê serê min tê de here. Min digot qey nexta wê bi sipehîtî çalakî, ciwanmêrî û merxasiyê ye. Ez dikarim şîrê şêr, di eyarê şêr de, li ser pişta şêr ji wê re bînim. Min dikarî bû bihûtan re cengê bike… Ev şertên we, şertên pîrekî û şelafiyê ye. Ez rebenê xwedê, dê çawa wê biaxivênim ? Jixwe ev kar ne pîşeyê min e. Madem min devê xwe pê kir, çarenûsa min az anîme ser vê rûdanê serî diçe, veger nîne. Ew bûya ku min biryar negirtiba ; vweger ne karê mêra ye…

Her du wêzîran, Mihemed derbasî salonê kirin. Li wir bi cih kirin. Şîva wî li ber danîn… Kengî karîbû şîvê bixwe. Xwarin di gewriya wî re derbaş nedibû. Di bû girêk û tê de dima. Peroşiyeke mezin ew girtibû. Şertê berevajî, nekar û pîşeyên wî ancex Mirov van şertan davêje ber pîrekan û li ber pira sêhr datîne; ew karibin pirsgirêkeke wisa çareser bikin...

Êvarê her du wezîr, Mihemed û qîza paşayê kelê li salonê rûdinin. Herdu wezîr ji xwe re dikevin sohbeteke kur û dirêj. Qîzê serê xwe berî ber xwe dabû, carinan di bin çavan re li Mihemed dinêrî. Ku awira Mihemed pê diket, serê xwe difetiland, berêxwe dida rexê din. Lê peyv û şitexali tunebii. Mihemed jî li serkursiyekî rûniştibû, xwêdaneke libgirsew hiltanî û yeke dinê ew datanî. Di nav

mirovin biyan de, ne bi exlaqê wan dizani bû û ne jî zanibû bi wan re biaxive. Ji xwe ji wê rewşê re jî ne amade bû. Ka dê ji wan re çi bigota? Wê qala zaroktiya xwe, xortayî û nêçirvaniya xwe bikira? Ji ku zanibû ken û giriyê wan bi çi tê. Heyecan, tirs, xerîbî û nezanî wekî pêlan di ser hev re diqulibîn, mina marekî sar û cemidî li can û cesedê wî xwe dipêçan. Karekî şerm û Iewitî. Karê şelafan, karê pîrên sêhrbaz bû. Lê bi zimanê xwe ketibûyê; nema karibû dev jê berde, ji biryara xwe vegere. Destê xwe dabû ber ruyê xwe, xûz bûbû û diponijî... Ji bo riya sohbetê vebike, tiştek jî nedihat bira wî û nediket serî. Ketibû xeyalên kûrû dûr; bi hezaran tişt di ketin bira wî Iê gişt vala, pûç û bêencam bûn. Cixare ji cixarê vedixist. Dixanê mina luleyên sobê di her du qulên pozê wî re davêt. Di nav wan razan (xeyalan) re bûyera azadkirina çivîka ku ketibû dafên wî jî hat bîrê.

Gelo wê ew çîrok bala wan bikişanda û biecibandina; wê bibûya destpêka sohbet û guftugoyê?..

Ji nişka ve soz û peymana ku çivîkê jê re dabu tê bîra wî.

Hema periyê çivîkê ji bêrîka xwe dertîne û bi agirê cixara xwe serê perî dişewitîne. Biskek bi şûn de çivîka wî di pacê re dikeve salonê. Diçe li ser refikê dadine. Piştî bêdengiyek kurt, çivîk perda bêdengiyê radike û dibêje: “Ev çaxê we bi xêr a civata ji giregiran pêkhatî! Ez dinêrim ku bêdengiyeke kûrgirtiye ser civa¬ta we. Ku bi rêdana we be, min dixwest ku civata we birengînim, geş û xweş bikim. Ji bona şevbûhêrka we serpêhatiyekê bêjim...”

Weziran rê dan çivîkê ku serpehatiyeke ji wan re bêje...

Çivîkê dest bi çîrokê kir û got: "Di mejûyeke bor! de şêxekî ereban hebû. Xwedî êl û malbat, dewlemend, bi terş û talan, keriyen pez, garana dewar heştir û hespan bû. Xwedî tenekeyen zîv û zeran bû. Jineke wî hebû, pir xweşik û rind bû. Diya se qîz û lawekî bû. Şêx zehf hez ji jin û jiyana xwe dikir. Şeveke berî ku rakevin, di nav nivînan de gengeşiyek di navbera şêx û jina wî de pek tê, mînaqeşeyeke di navbera jin û mêraniye de, ango ne pir girîng. Şêx ji jina xwe re dibeje:

-Erê tu jinek xweşik û binamûs î lê başiya te bi min e. Îroj tu li mazate bi bihaye deveheke (heştir) naçî...

-Jixwe tu bi qimete min nizanî. Ez heja me berberi xwe zêr û cewahir... Jinikê got.

Minaqeşe hinekî berdewam dike. Şêx hêrs û germ dibe, diqe- here; ta Sibehê ew germiya wî jê naçe. Bi sariya sibehê (spêdê) re bang li ebîdekî xwe dike:

-Rabe vê jinê bibe bajêr, mazata mirovan binâre bê ma bi çi bihayî dê were firotinê. Tembiya min li te, gelekî li ber bazarê mede...

Ebîd (kole) jina wî dibe bajêr mazata mirovan, difiroşe yekî bazirgan, bi kîsek zêr... Kîse zêran tine li ber şêxê xwe datîne.

-Kuro! Ev çi zêr in?..

-Min jina te firot, da bi van zêran. Wele ku min li ber bazare bidaya dê hîn bihatir biçûya; lê te ji min re gotibû gelekî li ber bazarê mede. Min jî li ber bazarê neda...

Şêx têdigihîjê ku çewtiyeke zehf mezin kiriye. Ji ber ku ji ebîdê xwe re negotibû we nefiroşe. Bi şêx pir zor tê; bûye û çûye, îcar li çareya ku wê vegerînê digere. Dibêje:

-Kuro! Te firot kê?

-Ez çi zanim. Min firot yekî bazirgan...

-Dirûvê wî çawa bû, dişibiya ye kîjan bajarî, kîjan herêmê?.. Navê wî çi bû?

-Wele ez tiştekî nizanim. Bi gumana min ji Dilokê bû. De- vokê wî mina yê dîlökiyan bû. Ez çi zanim! Niha were min bişelîne, dîsan wî nas nakim. Çi têkiliya min pe re heye? Min jinik firotiye bir û çû. Nav û nişanen wî ji min re ne lazim bûn. Loma min li navnîşana wî, esi û fesle wî nepirsî...

-Lawo, baş birame! Ji nîşanekê, ji tiştekî... Min mala xwe bi destên xwe xirab kir...

-Wekî çi?

-Wekî kincên li wan, axaftina wan. Ji hev û din re tiştek ne- digotin?..

-Ha!.. Wele şêxê min tu cihêti di kincên li wan de tunebûn. Dibe ku hebe lê, bala min ne li ser wî û zilamen wî bû. Min ji te re got ya! Devokê wan mina yê herêma Dilokê bû, dibe ku ji Dilokê be...

Şêx, xurcikek zêr û dirav bi xwe re hiltine, li hespê xwe siwar dibe, bi tena serê xwe, berê xwe dide bajarê Dilokê... Mala bavê xwediyê bajarê Dilokê bişewite, bajarekî zehf mezin û fireh e. Li Rojhilata Navin, navenda bazirganiyêye. Li Dilokê sed bazirgan bi zoltakî ye. Çi zanê bê bazirganê ku jina wî biriye li kijan taxê, kijan qonaxê, di kijan avahiyê de ye...

Her roj ji beyanê ta nivê şevê li tax û kolanên bajêr digeriya. Her ku avahiyeke sipehî didît, bi guman û baweriya ku jina xwe bibine, radiwestiya, li pacan dinêrî. Lê ji ber ku xerib (biyan) bû, tu saloxan ji jina xwe hilnayine. Mîna sewsiyan, mîna dînan her çavên wî li avahiyan, li pacan bû. Rojê du sê caran di ber dikana Qesabê Comerd re derbas dibû. Rewşa wî geleki bala Qesabê Comerd kişandibû; bang li Şêx dike; wi li dikanê rûdinînê. Qahweyekê didiyê. Peyvek ji vir, yek ji wir... Dawiyê tê ser ka çi kes e, derdê wî çi ye. Jê dipirse: “Ya mirovê delal! Pirs ne eyb e; mîna ku tu mirovekî biyan û bi derd i. Dibe ku tu ji vî bajarî be lê bi min wisa xuya dike. Tu çi kes î? Derdê te çi ye? Ger hêza min pê bigihîje û pêkan be, ji bona te texsîr nakim. Heta dawiyê Ezê bi te re bim. Bi derde te re bibim hevpar. Li gorî hêza xwe alîkariye bi te re bikim...”

Şêx dît ku Qesabê Comerd pir samimî ye û ji dilê safî dibêje, derde xwe (bûyera ku bi serî de hatiye) jê re dibêje. Li wir destê biratiyê didine hev. Şêx li mala Qesabê Comerd dibe mêvan û bi cî dibe. Qesabê Comerd li ber dilê Şêx digere û dibêje: “Ev karê min e. Ger li bajarê Dîlokê be, sererd, binerd ezê saloxekê jê hilînim, wê derxînim holê..." Baweriya Şêx bi Qesabê Comerd tê; hinekî be jî bêhna wî dertê; dilê wî xweş dibe...

Dotira rojê Qesabê Comerd çend pîrekan kirê dike; wan berî nav tax û kolanên bajarê Dîlokê dide. Ên ku buxçikên pertêl digerine, ên ku falan vedike. Kolan bi kolan, tax bi tax mal bi mal digerin. Di demeke kurt de saloxê jê hiltînin bê li cem kîjan bazirganî ye. Dinêrin ku di koşkeke sê tebeqe, di tebeqa jorîn de ye. Cih, bazirgan û avahiyê tesbît û destnîşan dikin. Li hal, wext û rewşa wê dipirsin ku daweta wê li dar e; roja êvara înê dê bazirgan wê mehr bike, pê re bizewice... Pîrek agaha xêrê didine Qesabê Comerd...

Her du destbirak bilez diçin ber avahiya bazirgan, bi çavan qeysa bilindahiya avahiyê digirin; vedigerin dikanê. Plan û ber- nameya revandina jina şêx datînin. Qesabê Comerd diçe dikana xeratekî nas, li qeysa avahiyek sêtebeqe sêlimeke (nêrdewan) dirêj pê dide çêkirin. Êvarê bi şev sêlima xwe hildigirin û diçin li ber koşkê datînin. Şêx bi nêrdewanê ve hildikişe, di pace re dikeve odeya jina xwe. Ez çi serê we biêşînim. Şex li ber jina xwe digere; bi çi awayî be wê haşt û qayîl dike. Ji kêf û heyecanê re, nêrdewanê li ber koşkê dihêlin, jinikê direvînin, tînin û ten mala Qesabê Comerd. Li wir bilez û bez amadehiya xwe dikin, xatir ji malbata Qesabê Comerd dixwazin, pişta xwe didin felekê, berê xwe didin oxirê û tên mala xwe, nav êl, zar û zêçen xwe... şêx digihîje mirad û mebesta xwe; em werin ser Qesabê Comerd...

Qesabê Comerd wê şevê bi dilekî şad radikeve. Dotira rojê bazirgan bi bûyerê dihese. Diçe giliyê xwe li nik waliyê Dîlokê dike. Walî paşa xeratên bajêr gişan dicivîne; gef û guran li wan dixwe, stem, pest û çewisandin... Xeratê ku nerdewan çekiribû dibêje: "Ya paşayê min! ji te te veşartin lê ji Yezdane dilovan naye veşartine. Wele min ev selim çekir û ji Qesabe Comerd re.” Bi vî awayî xerat li xwe û Qesabe Comerd mukir te...

Walî paşa destura xeratan dide, wan serbest berdide; her kes diçe ser kar û îşê xwe, du serbazan dişine pey Qesabe Comerd... Ferman dide, wî talan dike, mal û milke wî dide ye bazirgan û wî ji bajare Dîloke celi dike...

Qesabe Comerd perîşan dibe. Serî le digere. Nema zanê we çi bike, bi kû de biçe. Dawiye biryar digire ku biçe ba destbirakê xwe Şex, li we dere bisitire. Qesab,

tevî jina xwe û sê kûrên xwe berê xwe dide ware ku Şex lê ye. Warê destbirakê xwe, warê eşîran, qencî û ciwanmêriye, ware sitare...

Şex dinerê ku destbirakê wî Qesabe Comerd di halekî nexweş de, bi ser de hat. Wî li tenişta xwe rûdinîne. Ferman dide xulam û ebîdan; konekî çarsitûn je re vedigire; tera kuflete wî mih, dewar, heştir û hestir li ber kone wî datîne. Pewistiya maleke bi çi heye li bin kone wî datîne. Ango tu kemasiya mala wî nahêle; malê tekûz dike. Her du destbirak ji sibehê ta razanê bi kef û evîn li bal hev in; bi hev û din re ne. Wexta razana her yek diçe bin konê xwe, rexê malê. Min navê ku pir dirêj bikim, sere we bieşînim. Bi kurtasî wextekî pir xweş bi hev û din re diborandin...

Lawê şêx 10-12 salî bû; ew jî timi bi zaroken Qesabe Comerd re bû û bi hev re dilîstin. Êvaran dihate malê. Şevekê Qesabe Comerd tê bin konê xwe aliyê malê, dinêre ku mirovek di nav nivînen jina wî de dirêj kiriye. Hedîka şûrê xwe dide qirika wî û wî dikuje. Jina wî pê dihise, pê ve radibe û dibêje: “Te çi kir? Lawikê Şêx e, bi zarokên me re dilîst; pir westiyabû û li ba min ketibû xewê...” Qesabê Comerd Zarokên xwe hişyar dike, Tiştinin sivik bi xwe re hiltînin û di reşahiya şevê de warê xwe terk dike, direve...

Sibehê Şêx li benda destbirakê xwe dimine, dibe wexta taştêyan dinêre ku tu deng jê nayê. Du ebîdan dişîne bin konê Qe¬sabê Comerd. Dinêrin ku konekî vala û lawikê Şex di nav xwine de gevizandî, miriye... Agahê didin Şêx; Şêx çend siwaran bi pey wan de derdixe. Wan digire û tîne nav êle. Mîna berê, Qesabê Comerd li tenişta xwe datîne; je re dibêje: “Xem nine. Behemde te bû. Jixwe qenciya ku te bi min kiriye, namûsa min xelas kiriye. Ez te efû dikim..." Ji ber ku lawe Şêx e bitene kuştibû Qesabê Comerd nema karibû li hizûra Şêx serê xwe rake, li wechê wî binere. Her Şêx li ber dilê wî digere le dîsan serê xwe ji ber xwe ranake...

Rojekê Şêx jê re dibêje:

-Birayê delal! Çima tu serê xwe ranakî?..

-Min kurê te kuştiye. Ez şerm dikim ku li wechê te binerim...

-Ka ez çi bikim ku tu dikaribî mîna berê bi min re bidî û bistînî?..

-Ku tu jî laweki min bikujî...

-Dibe. Sibe yekî ji min re bişîne...

Qesabe Comerd, lawekî xwe ji Şêx re dişîne. Şêx lawik nakuje, vedişêre, winda dike...

Piştî çend rojan dîsan Qesabe Comerd serê xwe berî xwe dide, naaxive... Şêx sedema bedengiya wî jê dipirse:

-Dîsan çima tu wisa bêdeng î?..

-Ma ezê çawa karibim li hizûra te sere xwe rakim...

-Çima?..

-Min kurê te kuştiye...

-Xem nine. Min ji kurekî te kuşt; em wekî hev bûn...

-Na wele em ne wekî hev in; ê min he du kurê min hene...

-Ka ez çi bikim

-Ku tu lawekî min î din jî bikujî...

-Belê, yekî din jî bişîne...

Qesabe Comerd lawekî xwe yî din jî ji Şêx re dişîne. Şêx wî jî vedişêre...

Qesabê Comerd çend rojan tê civata Şêx le dîsan sere wî di ber de bû. Nedikelimî. Şêx sedema giranî û nerehetiya wî dipirse:

-Bira! Çima tu wisa bêmadî?..

-Min lawê te kuştiye...

-Min jî du Iawên te kuştin...

-Dîsan em ne wekî hev in...

-Çima?..

-Ê te lawek bû, tu kordûnde mayî; ê min, he jî lawekî min heye...

-Bira! Qezeyek, behemdiyek bû, bi ser me de hat; bûyerê ji bîr bike...

-Na wele tu caran ji bîra min dernakeve; li hemberî te ez xwe tawanbar dibinim...

-Ka ez çi bikim?

-Tu lawe min e din jî bikujî, eme wekî hev bibin...

-Kuro! Bi me her duyan lawek maye...

-Na wele ku tu wî jî nekujî, dilê min venabe...

-Sibe wî jî bişîne...

Dibe sibeh, Qesabê Comerd Wî jî ji şêx re dişine... şêx wî jî dişîne ba birayên wî, vedişêre...

Her du destbirak kordûnde dimînin; Ji tenişt hev rûdinin lê, dîsan Qesabê Comerd bi mitale û di ramaneke kûr û dûr de bû.

Şêx Ii ber dile wî digere, di bêje: Çarenûsa me wisa bû, ne di des¬tê min û te de ye. Teqdîra Yezdan e; çare lê nabe... Piştî çend rojan Qesabê Comerd nema hat civata Şêx jî. Şêx diçe bin konê Qesabê Comerd; dibêje:

- Tiştên te gotibû, min ew hemî bi cih anîn. Çima dilê te venabe; mîna berê em ne li tenişta hev û din in?.. bes biponije; serê xwe rake li min û bûyerên dinê binêre. Tiştê mayî ji yên çûyî pirtir in…

-min lawê te kuşt, tu kordûnde hiştî; te jî her sê lawên min kuştin, kordûnde kirime… Em ê bi çi rûyê li tenişt hev rûnin? Tiştê ez ji te dixwazim, rê bide min ezê ji cem te biçim cihê din; nema çavên me bi hev din bar dibe…

Şêx dike û nake Qesabê comerd ji biryara xwe venagere; jê re dibêje:

-Amedehiya xwe bike, sibê ezê te bişînim.

-Mala te ava, ez ji te pir memnûn im…

-Ku ti neçûya çetir bû; sebra me bi hev dihat…

-Na! Wilo çêtir e… Teqdîra îlahî wisa bûye,

Şêx êvarê bang li mele dike, her sên qîzên xwe li her sê lawên Qesabê Comerd mehr dike. Sê sindoqên mezin çê dike. Her sindoqekê qîz û lawekî tê de bi cî dike. Bîst hêstiran ji malê din ê bar dike. Sindoqan jî bi wan re bar dike, çênd xulaman bi wan re kar dike. Ji xulaman re dibêje: Wan bibin heta filan mêrgê; ji wir û pê de îşê xwe ji wan neyinin. Wan bêhêlin û werin… Sibehê xulam wan dibin mêrga ku şêx ji wan re gotibû, piştî nîvro barên wan li wir datînin, ji wan re dibêjin: îşev li wir di bin ewlehiya me de dimînin . Emê vegerin; hûn jî dê sibê bi riya xwe, oxira xwe de biçin…

Qesabê Comed û jina xwe ji hev re dibêjin: “Em du şexs in, bi nav salan de jî çûne, emê çi bikin bi vî qas malî. Em nizanin konê xwe jî vegrin. Emê çi vî qas malî li serê xwe bikin bela, tiştên sivik, pêwist û biqîmet bi xwe re bibin û mal û tiştên din li vir behêlin û biçin… “Jin û mêr li hev û din dinêrin. Heyamên berê, mala şên û qelebalix tê bîra wan; bi ser hev de digirîn. Dawiyê radibin tiştên sivik, pêwist û bi qîmet ji nav mêl dineqînin. Dû re devê sindoqan vedikin ku her sê kurên wan û her sê keçen şêx di wan de ne. Bi lez û bez ji sindoqan derdikevin; Konê xwe vedigirin; malê rast dikin; bi hev û din şa dibin. Rojên mayî bi kêf û şahî li wê mêrgê, di bin ewlehiya de derbas dikin... Çîroka ji we re xweş.

Gelî civata hêja! Îcar pirsek emin ji ve civata bilind heye, (gelo ji her du destbirakan qenciya ke bi ser a ye din ketiye? Şeva we xweş! Bimînin di xer û xweşiyede..." Çivîk di pacê re difire û diçe...

Her du wezîran bi hev re guftûgo kirin; dawiyê biryar dan ku qenciya Şêx qat bi qat bi ser a Qesabê Comerd ketiye. Qîza paşê ji berve biryara wezîran a çewt hêrs dibe; nema xwedigire û dibeje: "Hûn mala xwe xirab dikin, bi Bacoliyan dikelin! Qenciya Qesabê Comerd ji ya Şex pirtire. Qesabe Comerd namusa şêx xelas kiriye.

Li ser ve bûyere talan bûye. ji cih û ware xwe, ji pîşeyê xwe bûye. Celî û xwînî bûye. Hûn çawa dibêjin qenciya Şêx ji ya Qesabê Comerd pirtir e...” Pişti van peyven keçikê her du wezîr matmayî dimînin. Diçin ji paşê re dibêjin: “Îşev qîza te peyivî...”

Dotira şevê piştî şîvan, her çar leheng li salonê dicivin. Mihemed cixareya xwe vêdixe; serê periyê çivîkê dişewitîne, çivik tê li ser refikê datîne. Dibêje: “Bi baweriya ku we bersiva pirsa min, a şeve din bi dadî daye. Bi redana we be, ezê îşev jî çîrokeke bal kêş ji we re bêjim; şevbuherka we xweş geş bikim.” Wezîran destura wê da. Çivîkê dest pê kir û got:

- Li bajarekî Kurdistanê paşayek hebûye; qîza wî giha bûye çaxa zewacê. Se biraziyên paşê hebûn, her se ji talibe qîza wî bûn. Paşe, rojekê bang li her sê biraziyên xwe dike û ji wan re dibêje: “Ji îroj û heta du salan mûhlet ji we re, biçin li welatan bigerin; kî ji we berhemeke baş biafirîne û hûnera berhemê şanî me bide; qîza min de ji wî re be...”

Her sê pismam ji bajêr derdikevin, li duryana Serêkaniye ji hev û din xatir dixwazin. Ji hev û din re dibêjin: “Bi xer piştî du salên din wek îroj, em dê hev û din li ser vê kaniyê bibînin...” Her yekî bi riya xwe de diçe... Li fergeh, dibistan, zanko û pîşexanan digerin, dixebitin, berheman diafirînin. Du salê wan diqede, her sê pismam tên li ser kaniyê hev dibînin. Hev û din hembêz di¬kin; li hal û wextê hev dipirsin. Her yek berhama xwe derdixe û dest bi pesnê we dide...

Yekî ji wan got: “Min neynikek afirandiye; hûn kû derê jê bixwazin de wê deverê şanî we bide...” Ye din dibêje: “Min der- manek afirandiye, her curê nexweşan sax dike...” Ye din dibêje: “Wele min jî secadeyek çekiriye, mirov dikare li ser rûne û bifire. Di demeke kurt de riyeke dirêj biçe...”

Gotin: “Berhemen me her seyan yek ji ya din çetir e.” Dû re ji xwediye neynike re gotin: “Ev sere du salan e em ji bajare xwe bi dûr ketine. Rabe li neynika xwe binere be dotmama me di çi rewşe de ye...” Neynik vekirin, le nerîn ku dotmama wan li ber xirina mirinê, di sekratê de ye... Xwediye dermen dibêje: “Dema dermanê bi saxî bigihîje ser û vexwe, de rehet û sax bibe...” Xwe¬diyê secadeyê lê vegerand û got: “Ma ev secade ne ji bona rojeke wisa ye...” Her sê leheng li ser secadê rûdinin;

heta hûn çavên xwe bigirin û vekin, secade wan dibe nik dotmama wan... Der¬man didinê; sax û rehet dibe... Çîroka min ji we re xweş...

Gelî civata hêja! Gelo qîza paşê ji kîjan pismamî re dikeve?.. Bimînin di xêr û xweşiye de. Bi xatire we...

Çivîk di pacê re difire û diçe... Vê carê raman û biryara wezîran ji hev û din cûda bû; bi hev û din dikevin. Wezîrê destê rastê dibêje: "Ji xwediyê secadê re dikeve. Ma ku secade tunebûya wê neynik û derman bi kêrî çi bihatina?.." Wezîre deste çepe di¬beje: "ji xwediye neynikê re dikeve. Ma ku neynikê rewşa qîzê şanî wan nedaya û nedîtina ku di xetereyê de ye, jixwe bi saxî nedigihan ser..." Ji ber vê raman û biryara herdu wezirana çewt, keçik di nava xwe de dikele û ji nişkan ve dibêje: "Ne wekî we her duyan e jî! Ji xwediyê dermen re dikeve; mafê wî ye. Her du pismamên din tiştekî xwe winda nekirine; berhemên wan di destê wan de ye. Dikarin ji wan sûdê wergirin lê, xwediyê dermên, dermanê xwe winda kir û pê keçik vejandiye..." Wezîr çûn ji paşêre gotin: "îşev jî qîza te axivî..."

Şevtira din, şeva sisiyan, ango şeva dawiyê, dîsa civata wan digere; çavên hemiyan li pacê, li benda çivîkê bûn ku were çîrokekê ji wan re bêje, şeva wan bixemilîne û şeva xwe pê derbas bikin. Jixwe ku ne ew çivîk bûya dê bêdengiyekê bigirta ser wan, zivêr (aciz) bibûna; şeveke ne xweş derbas bikirina û serê Mihemedê Pirê jî bihata jêkirin. Piştî ku qahwe ji wan re tê, Mihemed cixareyekê ji qotiya xwe dipêçe, vêdixe, periyê çivîka xwe ji bêrîka xwe dertîne û serê perî dişewitîne. Çivîk tê li ser refikê datîne... Dibêje: "Êvara we bi xêr! Daxwaziya min xweşî û saxiya we ye. Xuya ye we qîza paşê bi dadî zewicandiye." Ger tu babet, mijar û dabaşa civata we nîn be; ji bo şevbûhêrka we, ezê ji we re çîrokekê bêjim..." Jixwe dilê wezîran jî ji Mihemedê Pirê re dixwest, xortekî nestêle bû... Wezîrê destê rastê dibêje: "Wele çavên me jî li riya te bû. Ku ne tu bûya ev şevên me yên bêhis û deng rehet derbas nedibûn. Fermo çivîka delal!.." Çivîk dest pê dike, dibêje:

- Di zemanekî borî de sê mirovên rêwîng hebûne; di geliyekî kûr û dîdirêj de diçûn; li wan dibe êvar. Wê şevê di şikeftekê de bi cî dibin. Çiya hov û şev tari bû. Warê cûr be cûr sewalên hov, wehşî, diz û keleşan bû. Yek ji wan dirûnker (terzî), yek xerat (necar) û ye din jî mela bûye. Şeveke tarî, çiyayekî hov, şikefteke bêbinî,

tirseke mezin... Li şikeftê agirekî vêdixin, hem xwe li ber germ dikirin, hem jî hundirê şikefte ronî...

Derengî şevê xewa wan tê, gotin: "her yekî ji me du saetan hişyar be, nobetê bigire, wê li me bibe beyan (sibeh).” Ewilî yê xerat nobetê digire; her du hevalên din radikevin. Ji bo hişyar bimîne û wextê xwe pê derbas bike, yê xerat darekê tîne, dinecirîne û peykerê jinekê çêdike... Piştî du saetan, ê dirûnker (terzî) hişyar dike; serê xwe datîne û dikeve xewê. Ê dirûnker radibe, çavên xwe difirkîne, çav li peyker dike ku tiştekî pir xweşik û minasîb e. Ev jî di nobeta xwe de kinc in pir sipehî jê re didirû û li bejna wî pêykerî dike. Bejn û bala zirav û li hevhatî, bi wan kincên xweşik pêyker dibe keçika ciwan, li ber şewqa êgir ji jineke ciwan û zindî nedihate ferq û naskirin piştî du seatan terzî, mela hişyar dike.

Mela di bin çavan re dinêre ku jineke zehf sipehî li ber dîwarê şikeftê şipiya rawestiye… win jî dizanin ku tolaz û nefstenik in. Piştî yê terzî (dirûnker) dikeve xewê,mela  ber bi pêker ve diçe; destê xwe tavêjiyê, ber bi xwe de dikişîne ku hembêz bike; pêyker gêrî erdê dibe. Dinêre ku ne jin e, pêyker e; ji darê hatiye necirandin… Ev jî du qam nimêj dike, ji Yezdanê dilovan tikan û lawan dike. Yezdanê dilovan giyanê dide wî pêykerê hişk û bêjiyan…

Mela hevalên xwe hişytar dike. Her sê hevalan bi angaşta ku jin mafê wî ye, li hev û din nekirin.  Her yekî digot: “jinika min e …” gelî civata hêja! Gelo ew jin para kê dikeve; mafê kê ye?.. Bimînin di xêr û xweşiyê de; şev baş! Bi xatirê we… çivîk di pacê re difire, diçe …

Wezîrê destê rastê dibêje: “ para yê xwerat (necar) e; mafê wî ye …” wezîrê destê çepê dibêje: “na , mafê yê dirûnker (Terzî) ye. Pêwist e ji wî re be…” gengeşî û mînaqeşayekê mezin di navbera vêzîran de derdikeve… Qîza paşê ne ma xwe digre û bêhemdê xwe dikeve nav minaqeşê; dibêje: “hûn mirovin zircahil û nezanin. Bavê min hûn çawa kirine wezîrê xwe, birêvebirî û dadiya we ji wisa ye?.. Niha hûn vê bêdadiye di nav gel de jî dikin û dimeşînin. Mela jiyan û giryan pê aniye; mafê wî ye…”

Her du wezîr radibin Mihemed pîroz dikin; dawiyê wî dibin meqam nik paşê; dibêjin: “Em ji bo Xwedê dîtyar û dîdevan in ku ev sê şev in li pey hev qîza te diaxive… va ye Mihemed! Îcar tu û wijdana xwe . Te divê em serê wî jêbikin û di qesrê de deynin û te divê bang melê bikin; qîza xwe lê mehr bikin. Biryar û ferman ya te ye …” Paşe ferman dide, mele tînin mehra Mihemedê Pîrê û qîza paşê divbire. Mihemedê Pîrê hem dibe zavayê paşê û hem jî wezîrê wî yê destê rastê; digihije mesbet û miradê xwe…

### 2.2.8. Dostaniya Kêlûlê û Dijminatiya Kimkimê

Dibêjin, dema bavê me Îbrahîm (e.) pûtên li perestgeha Nemrûdiyan şikandine û bivir jî daniye ser milê pûtê ji hemiyan mezintir. Kerba Nemrûd, wezîr û qumandarên wî pir vebûye.

Aciz bûne û biryar dane ku ger Îbrahîm li kiryara xwe poşman nebe wî bi mencinîqê bavêjin nav agir û bisojin.

Bi vî awayî ji mezintirîn cezayî bidinê ku tu kesekî din newêre li hemberî pûtan rabe. Îbrahîm sucê xwe qebûl nekiriye û henekê xwe bi wan kiriye.

Dawiyê jî înkara pûtên wan û dewlet û sazûmana Nemrûdiyan kiriye. Ji ber hindê jî Îbrahîm girtine û avêtine nav agirekî pir mezin.

Ev agir bi darên ku ji her maleke bajêr barek hatiye hêlkirin. Lê dema Îbrahîm avêtine nav agir, Xwedê fermana agir kiriye ku ew Îbrahîm nesoje û wî biparêze.

Wisa jî bûye û cihê Îbrahîm lê ketiye erdê çîmen şîn bûye û kaniyeke xweş çêbûye. Îbrahîm jî li wir şukra Xwedayê xwe kiriye.

Bes di vê demê  de dîtiye ku du heywanên piçûk li wir in; Kêlûle û Kimkime.

Heçî Kimkime ye pif kiriye agir ku gurrtir bibe. Lê Kêlûle jî ava ji kanîkê biriye û bi agir werkiriye. Wê jî xwestiye agir bitemirîne.

Îbrahîm pêxember ji van karan pir şaş bûye û ji Kimkimê pirsiye:

-Ey heywanoka Xwedê. Ma ev agire min bisoje têra şewitîna min nake ku tu jî pif dikiyê? Kimkime, çendekê bêhna xwe vedaye û gotiye:

-Ya Îbrahîm! Ez dizanim ku ev agirê te bisoje têra şewitîna te heye. Lê dîa jî dilê min rehet nabe. Ji ber ku tu bizanî ez dijiminê te me.

Îbrahîm (e.) bi vî awayî hay ji dijminatiya kimkime çêbûye. Vê carê jî ji Kêlulê pirsiye:

-Ey Kêlûleya delal! Tu dibînî ku vî agirê hinde mezin ez nesotim. Bi îzna Xwedê dê min nasoje jî. Lêbelê ez dibînim ku tu hê jî dixwazî vî agirê mezin bitemirinî. Ma tu dibêjî tê bikaribî bi vî devê xwe yê piçûk vî agirê wiha mezin bitemirinî?

Kêlûle bi vê pirsa Îbrahîm (e.) pir kêfxweş bûye. Ji ber ku kar û xebata wê hatiye dîtin û teqdirkirin. Bi kêf û eşq gotiye:

-Ya Îbrahîm! Ez dizanim ku nikarim bi vî devê xwe yê piçûk vî agirê mezin bitefînim. Lê Xweda jî dizane ku ez dixwazim tevê bitefînim. Bes evqas ji min tê. Ez vê dikim ku tu bizanî ez dostê te me.

Bi vî awayî Îbrahîm (e.) dostaniya Kêlûlê jî zaniye

### 2.2.9. Daûd Pêxember

Daûd bavê Aqûb bû. Îdî mezin bûbû, gazî kurê xwe dike, divê:

-Ez ê bimirim, were ez hebûna xwe nîşanî tedim.

Bir çû derê hebûna xwe vekir, lê derîk hebû-ew derî venekir, nîşan nedayê. Kurê wî go: “Canim, çira nîşanî min nade?” Çû rûyê wî da kilît dît, hat derî vekir. Dît merîk tê da ne, got: -Tu kîyî?

Go: Ez Sixrî Cin im, go, bavê te heft sale min girtîye, gotîye: “Bive birê min”, ez nebûme, ez girtime, -divê, -ez ê bivim birê te, te derî min vekir.

Aqûb Sixrî Cin aza dike. Daûd hişyar dive, divê: -Ka kilît, -kurê xwe ra divê, -te çi kir?

Divê: -Mêrik min ra gotîye: “Min ferza biratîyê nedaye bavê te, ez ê bidim te”.

Gote kurê xwe: -Ez dimirin tu neyêyî ser mezel, bira cimêt bê min heqke, tu neyêyî!

Daûd pêxember mir. Wexta mir, kurê wî go: “Çawa ez meçim ser mezel?” Wexta diçe ser mezel, kareke xezalê dikeve pêşiyê. Dide pey kar: vira na-dere han, vira na-dere han… Terî kete erdê, dîsa ew kar jî unda bû. Wêderê ma heta sivê.

Sivê rabû, dîsa ew kar ber nigê hespa wî derket, dîsa da pey kar. Da pey, çû gihîşte gundê Sixrî Cin. Çûn mala Sixrî Cin: Ewî go: -Bira, te xêre?

Gilîyê xwe temam jê ra got. Sixrî Cin go: -Ew qîza padişêye, tu ku karî wê bigrî? Lê sivê ew tev du kevotka wê bê xwe ser kanîyê avêxe. Hergê bikarîbî ser kincê wê rûnêyî-tuyê wê bigrî, yan na tu nikarî wê bigirî. Wexta kevotk têne ser kanîyê, tê ser kincê wê rûdinî. Meyanê digire, hildide tîne.

Lê jineke Aqû hebû, kurê wî hebûn Meyane gotêda: -min ra nevêjî here dewata, cîya, yan na îdî tu min navînî.

Dewat bû gundda. Gava çû dewatê bû kevotk, firî çû welatê xwe. Wextaçû, Aqû pêxember jî çû mala Sixrî Cin, go:

-Bira, hal û hewalê min û Meyanê ev e.

Go: -Bira ez ê çawa bikim? Bere-tuyê çawa herî? -Go, -şiva qudretê sivrik-wekî ser rûnê, kumê cina, cem apê min e-wekî herî hildî, tuyê bighîjî, -dişîne cem apê xwe.

Ap divê: -Wê bîne!

Didê, diçe devê berê sivrikê datîne, şivê dixe digihîje wî alî berê. Diçe mala pîrekê. Kumê cina datîne serê xwe, zîyar ditirsin. Pîrê divê:

-Bidî xatirê Xwedê, te zîyarê min tirsand.

Kum serê xwe derdixe divê:

-Ez pey Meyanê hatime!

Divê: -Meyanê aksor kirine, gotine -te evdê serreş stendîye, bîna merîya te tê.

Pîrê diçe gazî dîya Meyanê dike, divê:

-Zevê te hatîye, were.

Tê divîne xortekî baş, diçe padişê ra divêje, divê: -Ha, ha…

Divê: -De bira bê, ez bivînim.

Aqû divîne, divê: -Here, min qîza xwe da te!

Meyanê hiltîne tînê, dîsa derbazî avê dive, diçe gundê Sixrî Cin, şîv, kum dive dide apê wî, Meyanê hiltîne tîne. Meyanê tîne, du jinê wî divin. Ji jina pêşîn deh kurin, ji Meyanê du kur divin-Ûsiv, Bînamê.

Aqû, wexta çeva belangaz dive, divê: -Kî here dermanê çeva bîne?

Diçin: Binamê, sê,çar hev hev ra diçin, lê Ûsiv-sê, çar hev tev diçin. Re va tî divin. Bîrek rastî wan tê, Ûsiv dadixin avê derxe. Ûsiv avê derdixe, Ûsiv bîrêda dihêlin, de çevnebariyê lê dikin.

Aqû divê: -Ka Ûsiv?

Divê: -Em çi zanin Ûsiv çawa bûye?

Ûsiv bîrê da ne. Bazirganek tê ser bîrê datîne. Xulam diçin avê bînin, divînin avêda merî heye. Derdixin -zef bedew bûye. Bazirganbaşî datîne ser devekî xwe ra dive Misirê, dive bazarê wîya bifroşe. Jina padişayê Misirê dinhêre bedewe, divê:

-Çi bidim?

Divê: -Kaşa wî zêr!

Zêr dikşînin -Ûsive ranave. Ûsiv xanimê ra divê:

-Çenge xalî bike nav, ez ê ravim.

Usa Ûsiv dikire, tîne tê, çawa dike Ûsiv berê xwe nadêda. Tîne dîwarê otaxê temamî eyne dike, Ûsiv deverû xwe davê erdê. Dîna xwe dide-boşe, destê xwe davê berstûya wî, dîsa ranave. Diçe şikyata padişê.

Padişa Ûsiv dike kelê. Kelêda du girtî xewn divînin: yek xaçparêz, yek îslam-kurmanc bûye. Ûsiv ra xewn xwe divêjin. Ûsiv divê:

-Helalî xewnê xwe biguhêzin, ez ê xewnê we bêjim.

Evana xewnê xwe hev dugihêzin, Ûsiv divê ewî îslam:

-Sivê wê te berdin, yê din ra divê-sivê wê te bikujin.

Ewî kurmanc sivê berdidin, yê xaçparêz dikujin.

Padîşa xewn divîne. Telal dikine gazî:

-Kê xewna padişê şiro veke?

Ewî îslam divê: -Merîkî min heye, ew merî kelê da ne.

Ûsiv berdidin, tê dîwana padişê, padişa divêje:

-Min xewn dîtîye -heft gayê têr hatine erdê, heft jî çûne ezmana. Divê, -padişayî xweş be, heft sala nanê usa bê, zef bê, heft sala jî wê xelayîbe.

Padişa divê: -Wekî usane, bive xeznedarê min, nan bikire.

Ew heft sal temam dive, padişa divê:

-Ûsiv, ez birçîme!

Ûsiv zane, ji arê dara du totik çêkirî bûye, totika dide- padişa dimire.

Wexta dive xelayî, Aqû divê kurê xwe ra:

-Tê ra hildin herin bikirin.

Birê Ûsiv têne cem Ûsiv. Ewana Ûsiv nas nakin, lê Ûsiv wana nas dike. Bînamî jî wan ra hatîye. Wexta koda genim çap dikin, Ûsiv ew kod û dezmalê xwe dike têrekîda. Têr didirûn, digerin-kod tune. Bira divên:

-Bînamî dizîye!

Ûsiv zane kod kuye, lê divê:

-De wekî Bînamî dizîye, hûn herin, ez ê bînamî bigirim.

Wexta nan bar dikin, tên, Aqû divê:

-Bîna Ûsiv tê!

-Çawa? -divê, -Ûsiv tune, ewî din jî girtine.

Divê: -Na, bîna Ûsiv tê!

Têr vedikin, dezmalê derdixin, çevê padişê dixin, çev qenc divin.

Em bên ser jina padişê. Ûsiv jinikê-Zelîxê, distîne, birê xwe, bavê xwe tîne cem xwe.

Ew çûn mirazê xwe şabûn, hûn jî mirazê xwe şa bin.

### 2.2.10. Xortekî Kesîb

Wextekê xortekî kesîb hebû: tirî dibir diçû şeher, arşivêrşî dikir. Çû, xwe ra rê da çû, merîkî kal gihîştê para, go:

-Xortê delal, tu ê kuda herî?

Go:-Welle ez ê herim arşivêrşiya tirîya bikim!

Go: -Perê min tune, go, hergê gûşî tirî bidî min, go, ez ê şîretekê bikim te.

Go: -Ê, şîret jî baş in , û gûşî tirî dayê, xar.

Go: -Wexta îro ez ê şîretekê bikim, go, şuxulê îro nehêle sibê, go, ya dinê jî, tu diçî nêzîkaya şeher, zenga êvarê ku kişandin, go, Kî derê te ew bihîst, wê derê jî bisekine. Go, ya dinê jî, çûyî şeher, heta zenga sibê nekişîne, paşê derê.

Eva xorta lêxist çû gihîşt perê şeher. Zenga êvarê kişand: wê derê mezel bû, ew jî xwe ra rûnişt, barê xwe danî, sepetê xwe û xwe ra rûnişt.

Wextekê xêleke şevê çû, lê nihêrî deng hat: „Wey, wey!". Ber bi mezel çû, merîkî qûreqûra wî ye, dibê: „Wey min xilaz kin“. Çû ser mezel sekinî, go:

-Tu kî yî?

Go: -Boy Xwedê be, tu çi merî yî, tu min aza ke.

Pîçke vêxist, lê nihêrî qîzeke bedew xûnê da mewicî: kincê wê xûn . Go:

-Birao, tu min xilaz ke!

Wî xortî destê xwe avîtê, derxist. Anî hat danî ser cila kerê, şinêlê xwe lê wer kir, heta sekinî sibê. Sibê go:

-Xorto, nave te çî ye?

Go: -Navê min Ahmed e!

-Ahmed, go, tu min xilaz kî, go danî cem min heye, ez ê bidim te.

Birînê wê hebûn, birîndar bû xwe xwe jî. Keçik qîza mezinê wî şeherî bû. Hatibû çûbû baxê xwe, du xorta dilê wan wê da hebû, ewana nava baxçe da girtibû, gotibû: "Serê xwe me ra têxe yek". Keçikê gotibû: "Dikujî, bikuje, dilê min tune, nastînim". Ewan jî kêra lê xistibûn, anî bûn kiribûn mezel.

Go: -Ahmed, wa tamekî wa ye, perê şeherî tek. Go, min kerê ke, bibe ber wî tamî.

Hûrmûrê xwe temam hiştin, keçik bir çû ber wî tamî, şinêlê xwe avît ser, paşê vegerya tirîyê xwe bir. Keçikê go:

-Ahmed, go, dest bir nava gulîyê xwe, kevirekî qîmetî hilda da gede, go, tu xwendinê zanî?

Go: -Ez zanim!

Go: -Filan ûlîsê, nomêra deha, go, here wê derê, go, tu ku çûyî, derbaz be, bipirse, bê kevira hûn nakirin? Wê bê: "Qîmetê kevirî çî ye?" Go, kêm bêje.

Gede kevir bir çû cem dikançî, go: "Qîmetê wî çî ye?" Go:

-Pênsid manat pere.

Dikançî dilê xwe da go: "Wekî pênsid e, go, eva deh hezarî hêja ye, çira nastînim". Pênsid manat perê wî hilda dayê.

Gede çû nava şeher, du dest orxan, doşek kirî, rabû hilgirt, anî hat gihand keçikê. Ew keçikê va tê da razan: destek ew, destek ew.

Go: -Kuro, here filan ûlîsê, nomêra, go, bîst hevta, go, here, bê: “Ez doxtir dixwezim". Ew ê bêje: "Çi ye, nexweş e, birîndar e?" Bê: “Birîndar e". Ew ê bêje: "Birîndarê xwe bîne". Bê: "Na, tu were ser". Doxtir, go, çi ku xwest, bidê, bê: "Min da". Go, ewî ku go: "Ez ê bêm", ew ê bi xwe - xwe bifiştîne faytonê: faytonê bê, hûn ê rûnên, bên. Go, lê tu bêje birîndar e, wekî ew jî dermanê xwe, sazê xwe xwe ra bîne.

Go, doxtir anî. Keçikê pê ra xeber da: keçik xwendî bû, her ziman zanibû. Av da germkirinê, canê keçikê temîz şûşt, xûna wê temîz kir û kew dayê, derman kir. Keçikê jê ra got:

-Tê çiqas wextî min rakî, qenc kî?

Go: -Ez dikarim nava bîst şevî da te qenc kim!

Go: -Ez dixwezim ez pera zêde bidim, nava panzde şevî da min qenc kî.

Go: -Bira ve, ez ê royê du cara ser te da bêm.

Pere qaîm dayê. Doxtir royê da du cara dihate ser.

Bera doxtir wêya qenc bike. Gede çû cem xayê tam, go:

-Klîtê tam bide, ez ê mehekê tê da bim, mehek temam bû, ez ê klîtê te bînim bidim te.

Xayê tam dayê, perê xwe stend, çû mala xwe. Doxtir çû, hat nava panzde şevî da keçik qenc kir. Keçikê go:

-Ahmed, kuro, tu herî filan ûlîsê, filan nomêrê, go, wê derê du qema me ra bide çêkirinê: yekê ji min ra, yekê ji xwe ra. Go, ew ê bêjin: «Qeme wane». Bê: «Ez wana naxwezim, ez yê usa dixwezim tu çêkî, wekî kêderê xe, qet ke».

Çû wana dît, ewan go:

-Pênc zara bide me, em ê qemê usa te ra çêkin.

Qemê usa da girêdanê. Go:

-Ez kengê bêm?

Go: -Here, go, çar roja bisekine, lêxe were.

Çar rojê wî temam bûn, gede rabû çû, dît baş in, perê wî girt danê û anî hat. Anî hat, keçikê go:

-Rabe here vî kevirî bive cem wî mêrikî, bê: “Kevirê usa gelek cem min hene, pere bînin werin ez bidime we, ez îdî nayêm, hûn werin".

Go, bir nîşan da, go:

"Kî derê?" Rast nomêr jê ra go.

Go: -De tu here, em ê îdî bên.

Gede hat cem keçikê.

Dikançî rabû gazî hevalê xwe kir, perê xwe jimartin, kirin dezmalê xwe, lê dan çûn. Keçikê lê nihêrî ew herdu hatin, go:

-Ahmed, go, ewê min dixwestin, go ev in. Go, ez ê xwe bidim piş dêrî, tu derî veke bêje: “Kerem kin, werin hundur". Go, ewan ku dû te hatin, go, ez ê yê paşin xim, tu jî yê pey xwe xe, go netirsî!

Go: -Çira tu jinî natirsî, ez nikarim yekî xim?

Usa hatin hundur, her yekê du qeme, sê qeme wan xistin, herdu jî kuştin. Rabûn ew hundur da hiştin, derî ser dadan, her yekê hespek kirî bûn, tivdarek dibûn: siyar bûn, gazî Xwedê kirin, çûn.

Çûn, pir çûn, hindik çûn, çûn ser kanîkê hespa peya bûn, ser çevê xwe şûştin, nanê xwe danîn, nanê xwe xarin û keçik hevekî hênijî, serê xwe da ser çonga Ahmed, raza. Ahmed dilê xwe da go: "Gelo min eva xilaz kir, gelo wê min bistîne, yanê na?" Gulîyê wê aha hilda, aha danî, duşurmîş bû: ew jî razabû. Lê nihêrî kevirek bin gulîyê wê da bû. Hilda pêra şa bû. Hew lê nihêrî sî hat ser serê wî: teyr hat ew kevir hilda, weke deh-panzdeh gava dûr danî. Ewî serê keçikê nerm danî û pey teyr ket. Teyr ha çû, ha danî. Ew jî pey çû. Teyr çû ser serê dar, ber hêlina xwe danî.

Ew keçik rabû, Ahmed tune. Vê da Ahmed, wê da Ahmed, Ahmed tune. Dest bir bin gulîya xwe, go: "Wa, ewî kevir dizîn birin". Haj mesela Ahmed nîne, çi zane çi hatîye serê wî. Ahmed hew lê nihêrî xayê bêx hat, go:

-Xortê delal, tu çi dikî?

Go: -Dixwezim bivim baxvançiyê te.

-E, go, xorto, çi heye, go, heqê xwe bêje.

Go: -Heqê min çî ye, go, tu îsafa xwe.

Ahmed bû baxvançîyê wî. Ser wê darê av birî, yê dinê av da. Ew dar hişk bû. Axê rokê hat, go:

-Ahmed, go, eva dara çira hişk bû?

Go: -Axa, av didim, av nadim ber nagire.

-Ê, go, bira qurbana te be.

Go: -Axa, hergê dilê te hebe, ez ê vê darê bibirim, go, şureta bax xirab kirîye.

Go: -Bibire, lawo, destê te ye!

Ewî çû mal, balte anî û dar birî. Dar birî, gava dar ket hêlînê va, kevirê wî hêlînê va pekyane wê derê. Ewî kevirê xwe hildan û çû mala axê xwe, go:

-Axa, go, heqê min bide min, ez ê îdî herim, go, ez naxwezim.

Go: -Çira, lawo?

Go: -Heta niha ber baxê te bûme, lê îdî ezê herim mala xwe.

Girt perê wî danê, û gede rê ket hat.

Em bên ser keçikê. Keçikê lê nihêrî Ahmed tune, hespa xwe siyar bû, hespê dinê jî dizgîna wî girt, rex xwe xist û çû - ketye welatê xerîb û diçe. Keçik çû derket şeherekî, şeherekî xerîb, nenas. Çû pirs-pirsyar kir- cîkî, starekî. Go: "A, Qanlî xan wa ye, here". Çû ber derê wê xanê. Xayê xanê go:

-Çi dixwezî? Go: -Ez ê îşev vêderê bim.

Çû derî vekir, hespê xwe birin hundur, go, xayê xanê ra go:

-Ka çirakê, tiştekî bide min heta sibê ez ber rûnêm.

Go: -Çira tune, ev e.

Derî ser keçikê kilît kir, çû. Ew xan jî sêra xanê heye. Keçikê çi zanibû? Xerîb bû, çi zanibû feqîrê? Nîşev derbaz bû, seheta yekê, hew nihêrî yekî go: "Ez bême te?" Go: "similayî". Carekê got, cara duda dîsa go: ez bêm? Keçik tirsîya, tenê ye. Cara sisîya keçikê go:

-Tê bêyî, were, tê bêyî min bikujî, çi bikî?

Gotina keçikê ra, xurîn kete dîwêr, dîwar hilsîya. Gava keçikê pîçke vêxist: dît temam zêr. Peynê hespa wê derê hebû: zêr veşartin, peyn avîte ser, sekinî heta sibê.

Xayê xanê usa sêr çêkirîye, xelqê tê da ziravqetandî kirîye, mirine, ew jî hatîye hûr mûrê wan, zêrê wan hildaye, çendikek jî avîtiye padvalê. Keçik wan dera geriya, dît dergek wa ye, nola derê qutîkî. Vekir, lê nihêrî temam cendekê merivan in tê da. Keçik ber dêrî sekinî, tirsa raneza. Sekinî heta xayê xanê hat: hişk pêsîrê girt, go:

-Tu navêjî ez merîkuj im, meriva dikujim, hûrmûrê wan jî hildidim? Go, vê sehetê ez ê elamî mezinê şeher kim, te bidim xeniqandinê.

Go: -Boy Xwedê be,- keçik forma mêra da ne, nizane qîz e, go, xorto, min vegere, go, çi dixwezî ez bidime te.

Go: -Were, go, tu bide min vî tamê xwe sînorê wî va: ez ê îda şikyatê te nekim.

Tam hilda da keçikê.

Keçik çû nav şeher, merî dît, go: "Înjinêr kêderê ne, go ez dixwezim tam xwe ra çêkim" Go: "A, filan ûlîsê ne".

Plana tam avîtinê, forma plana mala bavê xwe: nomêra wî, sazê wî - hema usa da çêkirinê. De pale ser xebitîn, du xortê nola Hemo jî dan ser wan pala.

Bera xwe ra keçik tam çêke. Gede usa çû, çû, hukumê Xwedê derket wî şeherî, hat ser wî tamî sekinî. Hat, go: "Ez ê jî bixebitim". Pere destê wî tune, kevir jî destê wî naçe hûr ke. Elamî keçikê kirin, go:

-Axa, go, merîk hatîye, dixweze bixebite.

Go: -Bêjinê bira bê cem min.

Gede birin qatê jorin, cem keçikê. Keçikê ew nas kir. Go:

-Ew çî ye pişta te va?

Go: -Torpê min e!

Go: -Çi te heye bihêle û lê xe here bixebite. Çend roja dixebitî, bixebite, tu zanî. Kuro, go, kîskê xwe dayne, hinek ji te didizin, pere-mere dayne vira here.

Go: -Na, axa, ez nikarim, amanetekî min tê da heye, ez nikarim daynim.

-Kuro, go, metirse, bihêle.

Herneyîse keçikê zorê jê stend, kir îşkava xwe. Ew çu xebitî. Keçikê gava kîs vekir, dî ew her şeş kevirê wê tê da nin. Dî û merî şand, go:

-Ewî xortî bînin.

Anî hat, go: -Xorto, go, ew kîsê te çi tê da bû tu tirsîyayî?

Go: -Qet, go, tişt tê tune.

Go: -De hela derî veke çi tê heye.

Zorê derî vekir, lê nihêrî kevirê qîmetî tê da.

-Kuro, go, te qaçaxî kirîye, dizî kirîye, eva kevira te ra ji ku hatîye?

Go: -Axa, ew kevirê min in.

Go: -Kuro, tu min nas dikî?

Go: -Na!

Go: -Kuro, go, ê ne ez ew qîz im, te ez qenc kirim, ê ne ez te ra bûm, kevir jî te ra bûn, te çira dizî?

Gede mesela xwe jê ra got, go:

-Te serê xwe danî, min kevir derxist, teyr hat, go ha-ha hat serê min.

Gede anî da dewsa xwe, kir mezin. Kincê xwe qîztîyê xwe kirin. Keçikê go:

-Rast e, te ez xilaz kirim, lê ez te nastînim. Kengê min dê û bavê xwe dît, ewan ez te helal kirim, wî çaxî ez ê te bistînim.

Em bên ser diya keçikê. Diya wê mêrê xwe ra got, hergav digirya, got:

-Qîzek me bû, çû baxçe û unda bû. Ê ne tu padşa yî, tu nikarî salixekê, sûlixekê bikî em bigerin?

Rabûn zêr hildan, ketin faytonê û geryan, çika go, çawa bû. Dilê wan dêşîya, qîza wan bû, go, em bigerin çika salixê wê cîkî hilnaynin?

Gelekî geryan, derketin wî şeherî, şeherê qîza wan. Hew nihêrî eva tama mîna tamê wan e. Diya wê ji mêrê xwe ra got, go:

-Eva çawan e, go, eva nomêra mala me ye, eynî plana tamê me ye.

Çasavoy go: -Hûn çira egle bûn?

Evan gotin: -Eva tama eynî bi plana tamê me çêbûye. Go, eva çi yêre?

Go: -Filan şeher e!

Keçikê akoşkê ra lê nihêrî, dê û bavê xwe nas kirin. Xulamê xwe ra got:

-Nehêle fayton here, heta ez jor da têm.

Xulam wana egle dike. Keçikê gede ra got, go:

-Evana dê û bavê min in, em herin têkevin bin milê wan, bînin bên.

Çûn ketin bin mila, anîn hatin, dan rûniştandinê. Ezet qulix jê ra kirin, pirs jê kirin: "Merive çi topraxê ne, kî ne? Ewan jî caba wan dan. Mesela qîza xwe gotin.

Go: -Qîzeke me hebû, çû baxçê, bê sebeb unda bû, em seba wê derê jî digerin.

Go: -Wekî ez ciyê qîza we bêjim, hûn ê çi baxşişê bidine min?

-Ha, go, em nikarin ruhê xwe bidin, wakî din tu çi dixwezî, çi devê te digere, em sekinîne.

Go: -Eva çend salê qîza we ye?

Go: -Eva deh salê wê ye unda bûye, çûk bû, unda bû: niha cem me be jî em nas nakin.

Bû qirîniya keçikê, xwe avît pêsîra bavê xwe, go:

-Bavo, ne, ez im, qîza we me, navê xwe go, nas kirin, ser hevdu girîyan. Keçikê paşê mesela xwe, ya wan mêrika je ra go, go, evî xortî ez xilas kirim. Ew birê min e, ez xuşka wî me: îda çawa dikin, bikin, Xwedê ez xilaz kirime, evî xortî ez xilaz kirim. De temam çi ku hatibû sêrî yeko-yeko dê û bavê xwe ra got:

Dê û bavê wê wê derê dane wî xortî. Gelekî mala qîza xwe, zevê xwe man, dilê wan baristan bû, lê dan vegeryan çûn.

Ew çûn mala xwe, ew jî man yêra xwe.

Kuta bû, çû.

### 2.2.11. Hinca Zîrek

Rojekê, jinek dema dihere ser kaniyê bi rê ve rastî hebek hinar tê. Wê hinarê dixwe û mirazekê xwe ji Xwedê dixwaze. Ji Xwedê re dibêje:

- Xwedêyo! Ez bextê te de me ku tu zarokekî bidî min.

Xwedê piştî demeke kurt hawara wê qebûl dike û keçikekê dide wê. Ew jî navê wê dike Hinc.

Ku Hinc hinek gir dibe kar û barên malê bi cih tîne. Rojekê li gel hevalên tayê xwe diherin qirşikan. Ku hê dest bi karê xwe nekirine Hinc danekî gêrmî çêdike û dibêje:

- Kerem bikin, em nanê xwe bixwin paşê dest bi karê xwe bikin. Ku nanê xwe dixwin û şûnde Hinc hinek gêrmî jî dike pêşa xwe ku li gel karî bixwe. Heval dest bi karê xwe dikin lê Hinc hê li ser xwarinê mijûl dibe. Heval karê xwe dikin, Hinc nên dixwe û karê xwe nake. Ku hevalên xwe qirşikên xwe kom dikin û dibêjin:

- Hincê de rabe ku em herin!

Hincê jî dibêje:

- Lê hê! Danê min î germ germî bixwin: nanê min î nerm nermî bixwin: ava min a sar sarî vexwin û paşê jî bibêjin, "Hincê de heydê!"

Heval tu çareyan nabînin û ji neçarî ji Hincê re qirşikan kom dikin. Dûre dikin ku di bin piştiyên xwe kevin û herin malê, dîsa dibêjin:

- Hincê de heydê!

Hincê jî dîsa dibêje:

- Lê hê! Danê min î germ, germî bixwin: nanê min î nerm, nermî bixwin: ava min a sar, sarî vexwin û paşê jî bibêjin, "Hincê de heydê bikeve bin piştî!"

Heval dîsa neçar dimînin û yek dikeve bin barê Hinca biaqil. Piştî hilgirtina barê Hincê hevalê wê dîsa dibêjin:

- De kerem bike em herin malê!

Hinc dîsa dibersivîne:

- Lê hê! Danê min î germ germî bixwin, nanê min î nerm nermî bixwin, ava min a sar sarî vexwin û paşê jî bibêjin, "Hincê em bi peyatî herin malê!"

Heval dibînin ku dîsa tu rê li Hincê nabe, hevalek Hincê dide ser pişta xwe û riya malê digirin. Lê çima ku xwe pir eware kirine, dereng dimînin û dikevin şevê. Bîstekî diherin, paşê fehm dikin ku riya mal winda kirine. Ji ber ku Hincê li bilindiyê ye dibêjin:

- Hincê tu li bilindiyê yî, lê mêze bike ka tu çira û mirayan nabînî?

Ku Hincê li doraliyên xwe dinihêre, pêçiya xwe dirêj dike, devereke dûr nîşan dide û dibêje:

- Çirayek li dera han e!

Ew jî xwe li wê çirayê digirin û diherin. Ku digihêjin çirayê, dibînin ku malek e. Li deriyê malê dixin. Pîrek dêrî li wan vedike. Ew pîr pîra merxur e, lê Hincê û hevalên wê nizanin ku ew pîra merxur e. Pîr wan vedixwîne hundir û şîvekê ji wan re çêdike. Piştî şîvê çima ku pir westiyane xewa wan tê û dikevin xewê. Pîrê jî xwe daye benda ramedina wan ku yekê ji wan bixwe. Piştî demekê pîr dixwaze binihêre ka kî ketiye xewê kî neketiye xewê. Ji bo fehmki- rinê dibêje:

- Hay may kî payî?

Hincê dibêje:

- Diya pîr Hinca te payî.

Pîr dibêje:

- Hinca min tu çima payî yî?

Hincê jî dibêje:

- Şeva çûyî di van çaxan de diya min ji min re berx li ser kozan sor dikir. Ew hate bîra min û dilê min dîsa ew xwest. Loma ez payî.

Pîr radibe, ji Hincê re berxekê serjê dike û li ser kozan sor dike. Di vê hingirmê de hevalên din jî bi xwe dihesin. Ku goşt dikele, lê digihên hev. Heta ku her yek ji wan cêniyekî dixwe, pîra merxur berxê giyê dixwe. Paşê giş radimedin. Piştî demekê pîr dîsa dibêje:

- Hay may kî payî?

Hincê dîsa bang dike û dibêje:

- Diya pîr Hinca te payî.

Pîr dîsa dipirse:

-Hinca min çima tu payî yî?

Hincê dibêje:

- Şeva çûyi di van çaxan de diya min ji min re teştek şilkî çêdikir. Loma xewa min nayê.

Pîr jî tavilê radibe û hemû haziriyên xwe dike û dikeve ber şilkiyan. Bi lez teştek şilkî çêdike. Dîsa heval giş ji dengê wan bi xwe dihesin. Heta ku her yek şilkiyekî dixwe, pîr dîsa şilkiyên mayî tev dixwe. Ji xwarinê û bi şûn ve dîsa radikevin. Piştî demekê pîra merxur dîsa tê û dibêje:

- Hay may kî payî?

Hinc dîsa dibêje :

- Diya pîr Hinca te payî.

Niva Hincê fehm dike ku ew pîr merxur e, seba wê ew nakeve xewê. Pîr dibêje:

-Hinca min çima payî yî?

Hincê dibêje:

- Şeva çûyî di van çaxan de diya min ji min re bi bolvirê av ji Ferêt dianî.

Ku pîr radihêle bolvirê û dihere Ferêt, Hinc jî hevalên xwe hişyar dike û dibêje:

- Ew pîra merxur e, hîn ku ew nehatiye em zû herin, ku were ew ê me gişkan bixwe û direvin.

Pîr jî dihere ber Ferêt, bolvîrê di binê avê re dike û radike. Heta ku bolvirê bilind dike av tê de namîne. Carek, du, sê... dibîne ku nabe. Nîva hindik maye ku dinya jî ronî bibe. Aciz dibe û pir diqehire. Ji xwe re dibêje:

Ez ê herim male. Niva payî nepayî, ne xema min e, ez ê Hince bixwim! Berê xwe dide malê.

Di vê mayînê de, Hincê jî berî revînê keça pîrê ya biçûk kiriye şûna xwe. Ku pîr tê malê. Qet li nava nivînê nanihêre û bi kêrê çend caran ji jor de lê dixe. Paşê, xwîna wê vedixwe û dibêje:

-Oxx, xwina Hincê çi xweş e!

Paşê pê dihese ku ew ne Hinc e, keça wê bi xwe ye. Pir diqehire lê êdî kes nemaye, her kes reviyaye û ji wir dûr ketine.

Hincê û hevalên xwe jî diherin ba axê û ji axê re dibêjin:

- Axa! Pîrek li dera han e ku tijî qazên wê ne û tev ji liyaqê hewşa te ne!

Axa dibêje:

- Kî here, kî nere?

Heval ji berakî ve dibêjin:

- Bila Hincê here!

Hincê jî piştî vê gotinê dihere û hemû qazên pîrê didize û tîne û dide axê. Dîsa hevalên Hincê dibêjin:

- Axa berxin pîrê hene ku pir liyaqê hewşa te ne!

Axa dîsa dibêje:

- Kî here, kî nere?

Heval dîsa dibêjin,

- Bila Hincê here!

Hinc dîsa dihere û hemû berxên pîrê didize. Berxan tîne û dide axê.

Hevalên Hincê dîsa dibêjin:

-Axa! Pîrek li dera han e, pîr liyaqê mala te ye. Bila Hincê here pîrê jî ji te re bîne.

Hincê dihere ser xaniyê pîrê, bang dike û dibêje: -

Ez Ezreîl im, ez hatim ku rihê te bibim!

Pîr jî pir ditirse û nizane ku çir bike. Dibêje:

- Ez çir bikim?

Hincê dibêje: Sindoqeq li kêleka te heye, ger tu têkevî nav sindoqê ez te nabim.

Ku pîr dikeve nav sindoqê, Hincê jî radihêle sindoqê ku bibe ji axê re. Di vê demê de pîr fehm dike ku ev ne Ezraîl e, Hinc e. Fenek tê bira pîrê. Ji Hincê re dibêje:

-Mîza min tê.

Ji ber ku Hincê rewş fehm kiriye dibêje:

- Tiştek nabe ez te danînim.

Ku hinekî din dihere, pîr dîsa ji Hincê re dibêje:

- Çola min tê.

Hincê pîrê datîne ku çola xwe bike. Pîrê girê dide û kêndirê jî di destê xwe de dihêle, seba ku pîr nereve. Ku pîr dertê derve, dide ger Hincê. Hinc jî direve û rastî qorek spîndar tê. Hinc bi spîndarekê ve hildikişe ku pîr wê nexwe. Pîr dibêje:

-Hincê dakeve jêr!

Hinc jî dibêje:

- Na.

Paşê jî kêndirê berî jêr dide û dibêje:

- Pê ve hilkişe û were min bixwe!

Pîr kêndirê digire û pê ve hildikişe. Ku nêzikî Hincê dibe, Hinc kêndirê berdide. Ku kêndirê berdide, pîra merxur li erdê dikeve û parçe parçe dibe. Hinc, bi vî awayî hemû hevalên xwe û gundiyan ji pîrê xilas dike.

### 2.3. Fıkra ve Anekdot

#### 2.3.1. Bûk û Golik

Çîrvanokbêj: Servet Uçak, Agirî.

Hebû tunebû, bûkek hebû, navê wê Xezê bû. Mala xezûrê Xezê, malake zef dewletî bû; pez, dewar, zevî, mêrg û zozanên wan, zef bûn; Sewa wê, kar û şixulê wan jî zef bû.

Xezûrê Xezê, merivekî kumreş bû; çiqasî ku şixulê wan zef bû, dîsa jî tu xulam û berdestî nedigirt û nedixwest kes bê nava jin û zarên wî.

Rojekê bi serê sibê ra Xezê diçe tewlê û alifê dewêr didê. Wextê ku Xezê xwe xwar dike û sepeta kayê hilde, zor dikevê û ba ber diçe. Xezê ku pişta xwe dizivire dinêre ku golik çevên wê dinêre, dibêje ‘hey wax yeka ça bû, deng çû golikê û yê herkesî ra bêje û min di nava xelqê da rezîl bike.’ Diçe li ber golikê digere, dibêje:

-Golikê ez ketime ber bextê te ku tu ji kesî ra nebêjî, ku tu bêjî yê min rezîl bikin.

De golikê heywan e, çi fehm dike, ji xwe ra zûr dibe çevê Xezê dinêre. Xezê dibêje ‘bi xwedê kim ev golika yê ji her kesî ra bêje.’ Dîsa diçe ber golikê digere, derdixe kemera xweya zêrîn pişta golikê va girêdide û dibêje:

-Golikê canê han ji te ra ev kemera min a zêr, tenê sira me kesî ra nebêje.

Xezê usa kemerê ser pişta wê va girê dide û dîsa şixul dike. Vir da û wê da hinekî zeman derbas dibe. Xesî tê, dibîne ku kemara zêrîn e li ser pişta golikê ye. Dibêje:

-Bûkê, ev êceba giran e ku te kemer daye ser pişta golikê?

Xezê dibêje:

-Dayê, ka yeka ça hate serê me, her xwedê zane.

Xesû dibêje:

-Xwedê xêr bike, çi ye ka bêje?

Dibêje:

-Dayê, haşa ji te hêca wexta ku min sepeta kayê quluz kir, zor kete min û ba ber min çû. A evê golika han jî bihîst, ez tirsiyam ku golik ji her kesî ra bêje, loma min kemera xwe dayê sewa ku ji kesî ra nebêje.

Xesû, vir da û wê da dora golikê diçe û tê, dibêje:

-Bi xwedê bi xwedê ez dibêjim golikê ji her kesî ra bêje û me di nava xelqê da rûreş û rezîl bike.

Xesî jî derdixe zêrên stuyê xwe da, dixe stûye golikê û dibêje:

-Golikê, golikê ez ketime ber bextê te, han ji te ra ev zêrên min jî, tenê tu kesî ra nebêje.

Zêrên xesiyê jî dikine stuyê golikê û dîsa dest bi şixulên xwe dikin. Qasekê şûn da xezûr tê, xezûr ku bala xwe didê di stûyê golikê da zêr hene, li ser pişta golikê jî kembera zêrîn, dibêje:

-Heyran hûne dîn bûne, ev çi zêrên we ser golikê da kirine?

Xesî dibêje:

-Qe nepirse, afatek bû ser me da hat. Bûka te zor ketê, ba ber çû, golikê jî bihîst. Bûkê jî sewa golik ji kesî ra nebêje, kembera xwe dayê, lê dîsa jî ez tirsiyam ku golik bêje, min jî zêrên xwe dayê

Xezûr destê xwe dide ser pişta xwe û vir da û wê da dora golikê diçe, tê û dibêje:

-Bi xwedê aqilê min ê birrî, ez dibêjim golikê bêje.

Jina wî dibêje:

-Ê mêrik, de bêje em çi bikin?

Dibêje:

-Em ê çi bikin, em mecbêr in golikê şerje bikin.

Xezê, xezûr û xesiyê va golikê tînin şerjê dikin, posteve goştê wê dibine malê.

Pişti ku golikê şerjê dikin û goştê wê tînene malê, Xezûr, jina xwe ra dibêje:

-Ez dibêjim hemî me golik şerjê kir, em gazi pismama û cinara bikin.

Jinik jî dibêje:

-De wexta tu usa dibêji, em gazî wan kin, bira bên û em wan ra qeliyekê baş çêkin.

Gazî pismama û cînara dikin, qeliya xwe dixwin û mevan dibêjin:

-Xwedê sifra te tim ter û tijî bike, me xwar û vexwar, xwedê bereketa Xelil Îbrahim ser mala te da bibarine. Lê me tiştek fehm nekir; te çima çêlekek yan pezek şerjê nekir û te golika piçûk şerje kir? Gelo nexwaş bû?

Merik dibeje:

-Qe nepirsin, eva bûka min a hane, sere sibe çûye tewle û alifê dewêr daye, wexta ku xwe xwar kiriye û sepeta kayê hilde, de jine quwet e kêm e, ba ber ketiye û tirrek kiriye, vê golikê jî bihîstiye. Bêke jî sewa ku golik ji kesî ra nebêje û me rûreş neke, girtiye kemera xwe a zêr ser pişta we da kiriye. Zara jî bihistiye, we îna nekiriye ku golik nebêje, we jî çûye zere xwe stıiye golike da kirine. Ez jî çum rnin

dit ku du stûye golike da zer û ser pişta we jî kember beye, min pirs kir ku ev çi ye. Min ra yek yek her tişt gotin, le min îna nekir ku golik veşere, min got ye bêje û me di nava we pismaman da lezîl bike. Sewa we me got ya baş ew e ku em we şerjê kin. Me şerjê kir, îja me got hemin me şêrjê kir, em gazî pismaman bikin. A cimaet ya me golike jî ev bû.

Cimaet gişt dike tîrqe tîrq û dikenin, teze hişe mêrik te serî ku her tişt xwe bi xwe ji herkesî ra rave kir.

### 2.3.2. Bûk

Bûkek hebû bi ehmeqiya xwe dihate naskirin. Rojekê merivek ji wî gundî ji xwe re jinekê dixwaze. Piştî xwestinê xêlî diçin û bûka xwe tînin. Dê û bavê zavê şerbikekê tijî gwîz dikin da ku li mêvanan belav bikin. Tu nabê lawikek jî çav li gwîzan dikeve, dilê wî dibije wan. Hema lawik destê xwe dixe nav şerbikê û derdixîne. Ji bo ku destê wî ji şerbikê dernakeve dibe qîzewîza lawik û dest bi girî dike.

Dê û bavê lawik tên û dikin nakin nikarin destê wî ji şerbik derxînin. Eman û yeman û ferman bi nav gund dadikeve kî tê xwe diceribîne, lê destê lawik ji şerbik dernakeve. Gundî rabûn ketin nav şêwr û mişêwran. Hinekan digot, em ê şerbik bişkînin, hinekan digot, na emê destê lawik jêkin. Her yekî pêşniyariya xwe digot û hunera xwe derdixistin meydanê.

Rabûn dawiya dawî li ser du pêşniyaran sekinîn, an dê şerbik bişkînin, an jî destê lawik jêkin. Bavê lawik ma heyirî, rabû li nav gundiyan kire gazî:

-Lawo ji bo Xwedê qenc li nava gund binêrin bê kes nemaye ku aqilekî bide me. Beriya ku em şerbik bişkînin yan jî destê lawik jêkin vê meselê hel bikin.

Yekî li wir lê vegerand û got, welle filankes maye, rabûn bûka nuh anîn. Bûkê jî bi zimanekî xweş ji lawik re got:

-Kurik wan gwîzên di destê xwe de berde!

Kurik gwîzên di destê xwe de berdan, destê wî vala ma û ji şerbik derket. Kêf û şahî bi gund ket. Êdî nav û dengê bûkê belav bû. Qedr û qîmet jê re hate girtin û pesindariya wê di felekan re derket. Êvarî xezûr û xwesiya bûkê bi hev şêwirîn û gihan vê biryarê:

-Bûka me pir biaqil e. Divê em qedr û qîmetê wê bigirin û jê re cihekî ne li erdê û ne jî li esman çêkin. Rabûn şerîtek di bin zikê xalî ve daliqandin û bûka xwe bi dar vekirin. Herçiqas bûkê li ber xwe jî da fêde nekir. Bûkê can da û zimanê wê bihustekê ji dev derket û diranên wê qîç bûn. Serê sibê xwezûr xwesiya wê hatin nêrîn ku zimanê wê derketiye û diranên wê qîç bûne. Kêfa wan pir hat û bi hev re gotin:

-Erê bûka delal!... ma tê çima nekenî!... ciyê te xweş e, ne li erdê û ne jî li ezman e. Ma ev tişt bi destê kê dikeve?

### 2.3.3. Meletiya Keşe Ezîz

Keşe Ezîz keşeyê gundê Qilîtê bû. Mirovekî sîtemkar û di mijara dîn de gelek renc û tade dida gundiyan. Rojekê gundî tev civînekê çêdikin û biryarê didin ku sibê herin gundê Hemêdiyê cem şêx û Misilman bibin, da ku ji zilma Keşe Ezîz xelas bibin. Lê di her civakê de sîxur hene. Di wê civînê de jî sîxûrê Keşe ezîz hebûye, diçe bûyerê jê re rave dike. Keşe dibêje: “Giha Xwedê, giha min. Ev tiştekî hêsan e.”

Dotira rojê bi spêda re Keşe Ezîz li hespê xwe siwar dibe û diçe Hemêdiyê cem şêx. Ji şêx re dibêje: “Qurban, ez hatime ber destê te bibim Misilman.” Pir kêfa şêx ji Keşe û biryara wî re tê. Misînekî dide dest û odeya kut ê de bihêwire şanî didê û dibêje: ’’Çend rojan mêvanê min bimîne, em ji xwe re galegalê bikin. Jixwe tu her tiştî dizanî. Keşe Ezîz diçe odeya xwe, nêzîkî nîvro Qilitî giş tevî hev pîrek û zarokên xwe têne Hemêdiyê cem şêx, dibin Misilman. Dotira rojê ji şêx rê dixwazin ku vegerin Qilitê û ji bo hînî îslamê bibin melayekî jîr û zana dixwazin. Şêx gazî Ezîz dike, dibêje: “Ji te çêtir, jîr û zanatir nîne.ji te re şaşik û cibe, ji îro pê ve tu meleyê Qilitê yî.”

Mele Ezîz sipas dike, destê şêx maçî dike. Lê Qilitî şaşmayî dimînin. Sed caran li hatina xwe poşman dibin. Di vegerê de Mele Ezîz ji wan re dibêje:

-Gelî Qilitîno, ger hûn Misilman in, ez Mele Ezîz im, ger hûn Mesîhî ne ez Keşe Ezîz im. Îcar hûn dizanin, dixwazin Misilman bin, dxwazin jî em giş Mesîhî bin. Biryar a we ye.

Gundî dibêjin:

-Ji bo ku em ji zilma te xelas bibin bûne Misilman. Çi îşê te bi Misilmaniyê heye? Madem xelasiya me ji destê te nîne, emê li ser dînê bav û kalên xwe bimînin. Em Mesîhî ne, tu jî Keşeyê me yî.

### 2.3.4. Du Nêçîrvan

Rojekê du nêçîrvan diçine civatekê, di rê de ji hev re dibêjin: "Cıvata ku emê herinê, wexta ku dora gotinê hate ser me, emê tiştên bi dilê xwe bibêjin. Ku civatê ew derewkar derxistin, emê alî hev û din bikin, derewên hev rast bikin."

Civat geriya, her kesî gotina xwe got, dor hate ser wan.

Ê ewil dest pê kir, got:

-Rojekê ez çûm nêçîrê, kîvroşek rabû, min lê nîşan girt û berdayê, li çavên wê ket di serê tîliyên wê de avêt.

Ên li civatê ne, tevan bi hev re got:

-Hey mala xweyê virê!

Hevalê wî got:

-Bisekinin wexta ku hevalê min berdayê, belkî wê gavê kîvroşkê bi tiliyên xwe çavê xwe dixurand, dibe ku li çav û tiliyên wê bi hev re ketibe.

Tevan got:

-Welehî çêdibe.

Piştî qasekê dor hat ê din, wî got:

-Welehî rojekê ez çûm nêçîrê. Min dît ku kewek rabû hate raserî min, min berdayê kew bilind bû, bilind bû, bilind bû çû nêzîkî rojê. Carekê min dît di beroşê de goştê pijiyayî li ber min ket û ez ketim serê, min têr xwar.

Civatê tev bi hev re got:

-Welehî ev vir e.

Hevalê wî gerek alîkariya wî bikiraya, lê wî jî wekî civatê got:

-Ev vir e.

Piştî ku ji civatê rabûn çûn, ji hevalê xwe re got:

-Lawo bêbext, min alîkariya te kir, lê te ez li erdê xistim.

Ew jî lê fetilî û got:

-Lawo tu jî hinekî bi pîvan biavêje:

Ma ezê tifikê bibim jor,

Ma ezê beroşê bibim jor,

Ma ezê kebaniyê bibim jor,

Ma ezê kêrikê bibim jor?!

### 2.3.5. Pîrê û Rovî

Carek ji caran, xêr û xweşî bibare li ser hazir û guhdaran, bi tevî sêwî û bêmalan, ji xeynî dizên xiyaran.

Di dewr û zemanekî de, pîreke pir feqîr hebûye, ji xeynî bizina wê tiştekî wê tunebûye. Pîê her roj bizina xwe didoşe şîrê wê dike mast. Pişt re mastê xwe difiroşe û pê debara xwe dike.

Rojek wekî her rojan, dîsa sîtila xwe dimeyîne li pişt derî dipêçe ku heta sibê bibe mast. Serê sibê radibe dêna xwe dêxê ku sîtila wê vala bûye. Pîrê ew roj dîsa

şîrê xwe  dixe sîtilê dimeyîne, derxûmê datîne ser devê sîtilê û datîne ser pişta derî. Danê sibê radibe lê dinêre ku çi! Dîsa sîtila şîr vala ye.

Pîrê xwe bi xwe dibêje:

Gelo kî tê şîrê min didize! Kî tê bi şev tê. Ez ê îşev qerawîl lê bigirim ka dê kî bê şîrê min bidize.

Pîrê dasoka xwe tûj dike xwe li pişt derî vedişêre. Şev tê nîvê şevê, pîrê dibîne ku roviyek hêdîka derî vedike û dikeve hundir. Rovî raste rast diçe cihê sîtila şîrê, derxûma ser devê sîtilê dide alî û devê xwe dixe nav, dest bi vexwarinê dike. Pîrê jî hêdîka dasûka xwe radike yek carê dûvê mamê rovî ji bin de qut dike. Ji tirsan zirav li rovî di qete, nizane dê çi bike, carekê de direve û diçe.

Gava ku direve diçe cih û warê xwe, roviyên wir lê dinêrin li dûvê hevalê wan qut bûye. Ew jî henekên xwe pê dikin, pê dikenin û dibêjin:

Quto muto

Dûv qulato

Kû de hatî

Wê de here.

Rovî bi van gotina pir ber xwe dikeve, ji xwe şerm dike, stûyê xwe xwehr dikeû diçe li ba pîrê û dibêje:

- Pîrê, ez qubana te bim, tu dûvê min bidî min, heval û hogirên min tev ez rezî kirim

û ji sibê heta êvarê bi min dikenin û dibêjin:

Quto muto

Dûv qulato

Kû de hatî

Wê de here.

Pîrê lê vedigere û dibêje:

- Here ew şîrê min ê ku te vexwariye bîne, ez ê wê gavê dûvê te bidim te.

Rovî bi stûyê xwehr ve diçe ba bizinê û dibêje:

Bizin, bizin!

Bizin şîr bide,

Şîr pîr bide,

Pîr dûvê mamê rovî bide.

Bizin lê vedigere û dibêje:

-Ti î here ji min re hinek çilo bîne!

Rovî diçe li ba dehlê û dibêje:

Dehl, dehl!

Dehl, çilo bide,

Çilo bizin bide,

Bizin şîr bide,

Şîr pîr bide,

Pîr dûvê mamê rovî bide!

Dehl lê vedigere û dibêje:

-Here dasekê bîne.

Rovî diçe li ba hedat û dibêje:

Hedat, hedat!

Hedat das bide,

Das çiko bide,

Çiko bizin bide,

Bizin şîr bide,

Şîr pîr bide,

Pîr dûvê mamê rovî bide.

Hedat lê vedigere û dibêje:

-Here ji min re hêk bîne.

Rovî diçe li ba mirîşkê û dibêje:

Mirîşk, mirîşk!

Mirîşk hêk bide,

Hêk hedat bide,

Hedat das bide,

Das çilo bide,

Çilo bizin bide,

Bizin şîr bide,

Pîr pîr bide,

Pîr dûvê mamê rovî bide.

Mirîşk lê vedigerîne û dibêje:

-Here ji min re qût bîne.

Rovî diçe li ba kuwarê û dibêje:

Kuwar, kuwar!

Kuwar qût bide,

Qut mirîşk bide,

Mirîşk hêk bide,

Hêk hedat bide,

Hedat das bide,

Das çilo bide,

Çilo bizin bide,

Bizin şîr bide,

Şîr pîr bide,

Pîr dûvê mamê rûvî bide.

Kuwar lê vedigerîne û dibêje:

-Here ji min re rêx bîne.

Rovî diçe li ba gayî û dibêje:

Gayo, gayo!

Ga rêx bide,

Rêx kuwar bide,

Kuwar qût bide,

Qut mirîşk bide,

Mirîşk hêk bide,

Hêk hedat bide,

Hedat das bide,

Das çilo bide,

Çilo bizin bide,

Bizîn şîr bide,

Şîr pîr bide,

Pîr dûvê mamê rûvî bide.

Ga lê vedigerîne û dibêje:

-Here ji min re giya bîne.

Rovî diçe li ba zeviyê û dibêje:

Zevî, zevî!

Zevî giya bide,

Giya ga bide,

Ga rêx bide,

Rêx Kuwar bide,

Kuwar qût bide,

Qut mirîşk bide,

Mirîşk hêk bide,

Hêk hedat bide,

Hedat das bide,

Das çilo bide,

Çilo bizin bide,

Bizîn şîr bide,

Şîr pîr bide,

Pîr dûvê mamê rûvî bide.

Zevî lê dinêre ku rovî bi kiryarên xwe pir poşman e. Dilê wê pê dişewite, lê vedigere û dibêje:

-Ger ku tu soz bidî min û careke din dizî nekî, ez ê giya bidim te.

Rovî lê vedigere û dibêje:

-Tobe! Ez hezar car tobe dikim ku ez  ê tu car diziya tu kesî nekim.

Zevî giya dide rovî.  Rovî giya dibe dide gayî, ga rêxê dideyê. Rovî rêxê dibe dide kuwarê, kuwar qût dideyê. Rovî qût dide dide mîrîşkê,  mirîşk hêkê dideyê. Rovî, hêkê dibe dide hedat, hedat dasê dideyê. Rovî dasê dibe dide dehlê, dehl çilo dideyê. Rovî çilo dibe dide bizinê, bizin şîr dideyê. Rovî şîr dibe diçe li ba pîrê û jê re dibêje:

-Pîrê ha ji te re şîrê te! De êca dûvê min bide min.

Pîrê radibe dûvê wî yê jê qût kiribû, bi bi morîkên rengîn, poxik û zengilan dixemîlîne. Pişt re bi awayekî xweşik bi rovî ve didûrû. Rovî dûvê xwe pir diecibîne û pê gelek kubar dibe. Bi dilekî şad dûvê xwe dihejîne; şingil mingil direve diçe li nav hevalên xwe.

Hevalên wî tev li dora wî kom dibin û bi heyran di dûvê wî dinêrin. Yek ji wan bi meraq dipirse:

Mamê rovî dûvê te pir rind e, ka te çi kir û çawa kir ku wiha bû?

Rovî difikire û xwe bi xwe dibêje, ew pir bi min kenîbûn, ez ê jî ecêbekî bînime serê wan û tola xwe ji wan hildim.”

Rovî dibêje:

-Ez bi şev çûm min dûvê xwe xist di nav vê gola cemed girtî de û razam heta sibê; gava ez sibê rabûm, min dêna xwe dayê ku dûvê min wiha xweşik bûye.

Hevalên wî tev diçin perava golê radizên û dûvê xwe dêxinê di nav golê de. Gava sibê radibin, dêna xwe didinê ku dûvên wan tev mane di nav cemedê de. Hewl didin ku xwe ji cemedê xelas bikin dûvê hemûyan qut dibe. Vê carê mamê rovî bi wan dikene.

Çîroka me çû nav diyaran, rehmet li dê û bavê guhdaran, bi tevî sêwî û bê malan, ji xeynî mişkên qulê diwaran.

## 3. TEZİN ÜÇÜNCÜ BÖLÜMÜNDE ANALİZ EDİLEN MASALLAR

### 3.1. Hayvan Masalları

#### 3.1.1. Gakûvî û Jûjî

Dibêjin salekê gakûvîyek û jûjîyek rabûn bûn şirîkên hev û ji xwe re hinek genim çandin. Hêvîya wan ew bû ku zivistanê birçî nemînin. Lê dema dinya germ bû û genim ket similan, gelşa wan dest pê kir. Rojekê bala xwe danê ku wa ye hin heywanên din ketine nav erd û li genimê wan çêrîyane. Jûjî ji gakûvî re got:

-Weha nabe. Divê em erdê xwe bipên, yan na heta dema çinînê tiştek ji me re namîne.

Gakûvî got:

-Baş e, ez dê bipêm.

Lê piştî çend rojan jûjî bala xwe dayê ku gakûvî wezîfa xwe baş nayne cih. Ji dêla ku nehêle heywanên din têkevin nava erd, ew bi xwe ketîye nav, di nav de gerîyaye û hemû simil şikandine û têr lê çêrîyaye.

Jûjî qeherî û got:

-Bira weha nabe, ji niha û pê de ez dê bipêm.

Herçiqas jûjî biçûk bû jî lê bi saya sîxên xwe heywanên din ditirsand û nedihîşt yek jî nêzê erd bibe. Bi şev û roj qet xew nediket çavan û wer li dora erd digerîya û heywanên din diqewitand.

Bi saya vê şîyarî û mêranîya xwe bi rastî piranîya genim xelas kir. Dawîya dawî genim seridî û wexta çinînê hat, îcar jî gelşa ku ew dê çawa li hev par bikin dest pê kir. Gakûvî got:

-Divê para min zêdetir be. Çimkî ez ji te mezintir im û loma jî hewcedarîya min hîn zêde ye.

Jûjî got:

-Lê yê bêtir xebitîye û bi şev û roj nobet girtîye ez im. Û di ser de malbata min jî gelekî mezin e, divê ez zexîra wan jî deynim. Loma jî divê para me bi qasî hev be, ne ez zêde bigirim û ne jî tu.

Gakûvî ev pêşnîyara jûjî qebûl nekir û her du ketin gewrîya hev. Çend rojan hevûdin birin û anîn, birin û anîn, dawîya dawî gakûvî rabû ban hevalê xwe yê beraz kir, got “were me ji hev bigerîne”. Berêz got:

-Ez çi bibêjim hûn ê bi gotina min bikin?

Gakûvî got:

-Erê, tu çi bibêjî min qebûl.

Jûjî jî got:

-Erê, min jî qebûl.

Beraz got:

-Wê demê divê hûn bibezin. Kî derkeve ew dê hemû genim bigire û yê li dû bimîne jî dê tiştekî negire. Wekî din tu rê tuneye. Ancax bi vî awayî heq dikane cihê xwe bibîne. Û dû re jî beraz, bi dizî çav qurç kir gakûvî, fena ku bibêje, mêze min çawa jûjî xapand, divê dû re tu para min jî bidî.

Jûjî got:

-Ev ne edalet e, ev neheqî ye! Ez dê çawa kanibim bi gakûvî re bibezim? Hema her kes zane ku ew ji min bezatir e.

Lê berêz got, biryara min biryar e û ez nagherînim. Çimkî we her du serîyan jî ber^qebûl kiriye.

Jûjî bi xemgînîyeka mezin lêxist çû mala xwe. Nizanibû çi bike? Pêşî zivistan bû, dema ev çandinî ji destan biçe ew û malbata wî ew ê ji birçîna bimirin. Bi van fikar û bêhêvîtîyê xwe gîhand mal. Dema xanima wî dît ew pir xemgîn e, meraq kir û jê pirsî, got:

-Te xêr e, çima gewzê te tuneye?

Jûjîyê reben rabû çîroka xwe û gakûvî ji serî heta dawî jê re got. Piştî ku xanima wî li meselê guhdarî kir û şûn de jê re got:

-Qet xeman nexwe û xwe neqeherîne. Em dê niha rêyekî bibînin. Em nahêli gakûvî weha bi rehetî bigihîje armanca xwe. Tu zanî ez û tu pir dişibin hev, ne wisa? Ewz bawer nakim ku gakûvî bikanibe min û te ji hev bigerîne. Û jixwe beraz jî nizane ku jina te heye. Tu û gakûvî hûnê herin ji wî cîhê ku berêz gotîye dest bi bezê bikin û ez jî dê herim li nêzî hênîyê xwe veşêrim. Dema ew ji min ve xuya bibe ez dê bi hemû hêza xwe bazdim û berî wî xwe bigihînim hênîyê, hedefa ku we destnîşan kirîye. Û dû re jî hemû genim dê ji me re bimîne. Piştî ku wî ev bêbextî bi te re kir, div^devê wî bi hebek genim jî nebe!

Û bi rastî jî wer bû. Jûjî qezenc kir û gakûvî li dû ma. Gakûvî û berêz tu carî fêm nekirin ku jûjî çawa dikane ewqasî zû bibbeze. Lê ji bo jûjî ya girîng genim bû, çimkî heq kiribû û ew jî jê re ma.

### 3.1.2. Şengê û Pengê

Dibêjin hebû tunebû bizinek û du karikên wê hebûn. Navê karikekê şengê û yê yekê jî pengê bû. Bizinê ji her du karikên xwe jî pir hezdikir. Dema ew diçû çêrê baş şîret li herdu karikên xwe dikir, ji wan re digot:

-Baş guh bidin min, li van der û doran gurekî pir fenek û zalim heye. divê haya we baş ji we hebe, rojekê neyê we nexapîne. Divê hûn bêyî min derî ji tu kesên din re venekin. Gur yekî şît e. Ew dikare dengê min texlît bike. Lê bila di bîra we de be, dengê wî ji yê min qalintir e û lingên wî jî bi wekî yên min ne spî ne. Dema ez têm ez dê di bin derî re tim lingê xwe nîşanî we bidim. Piştî ku we kalîna min bihîst lingê min nas kir hûn dê derî vekin. Bizinê her roj ev şîret li karikên xwe dikir û dû re jî diçû çêre. Û her danê  êvarê dema ji çêrê vedigerîya jî li ber derîyê kozê dikalîya, bi hezkirineka mezin bangî karikên xwe dikir î ji wan re digot:

-Şenga min, Penga min

Dêya we çûye zozanan

Xwarîye pelên kizwanan

Şir ketîye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

Û Şengê û Pengê piştî ku dengê dêya xwe dibihîstin, derî lê vedikirin û bi kêfxweşîyeka mezin didan lotikan û diçûn diketin bin dêya xwe û dan dibûn, heta ku zikê xwe têr bikirana ew dimêtin.

Rojekê bizin dîsan wekî her tim çûbû çêrê û Şengê û Pengê jî tenê di kozika xwe de bûn. Gur fêm kir ku karik bi tenê ne. Ji xwe re got:

-Weleh fersend ev fersend e, divê ez îro wan herduyan jî bixwim û zikê xwe têr bikim. weha got û dû re jî çû hêdîka li derîyê wan xist û wekî dêya wan kaliya, got:

-Şenga min, Penga min

Dêya we çûye zozanan

Xwarîye pelên kizwanan

Şir ketîye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

Şengê û Pengê dengê gur yê qalind nas kirin, gotin:

-Na, tu ne dêya me yî, tu derewan dikî. Tu gur î.

Bîstek derbas bû, gur dîsan li derî xist, îcar tam wekî dêya wan kalîya û got:

-Şenga min, Penga min

Dêya we çûye zozanan

Xwarîye pelên kizwanan

Şir ketîye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

Vê carê Şengê û Pengênikanîbûndengê gur ji yê dêya xwe bigerandana, lê dîsan jî derî lê venekirin. Gotin:

-Ka di derî  re lingê xwe nîşanî me bide, em lingê dêya xwe nas dikin.

Gur lingê xwer nîşanî wan da. Karikan lingê gur nas kirin û derî jê re venekirin, gotin:

-Ev ne lingê dêya mey e, lingê dêya me spî ye. loma jî em derî li te venakin.

Piştî van gotinên Şengê û Pengê, gur fêm kir ku karik derî lê venakin. Aşek li wan nêzikan hebû. Ji bo ku ew jî lingên xwe wekî yên bizinê spi bike rabû çû ba qerêş, hinek  ard jê girt û di lingên xwe da. Û dîsan çû li derîyê koza wan xist û got:

-Şenga min, Penga min

Dêya we çûye zozanan

Xwarîye pelên kizwanan

Şir ketîye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

Karikan wekî cara din dîsan xwestin lingê wî bibînin. Gur lingê xwe yê ard tê dabû di binê derî re nîşanî wan da. Lingê wî bi rastî jî îcar wekî yê dêya wan spî bû loma jî karikan rabûn derî lê vekirin. Bi vekirina derî re gur xwe çindî ser Şengê û Pengê kir, her du jî xwarin û dû re jî dora devê xwe alast, lêxist û çû. Danê êvarê dema bizin ji çêre vegerîya, bala xwe dayê ku derîyê kozê vekirîye û ne Şengê û ne jî pengê heye. Di cih de fêm kir ku ev karê gur e. Rabû çû ba hesinker û serpêhatiya xwe xwe ji serî heta dawî jê re got. Û dû re jî ji bo ku here herdu karikên xwe xelas bike ji hesinkes xwest ku ew qiloçên wê wekî du şûran jê re tûj bike. Hesinker tavilê her du qiloçên bizinê wekî du şûran jê re tûj kirin. Bizin ket rê û çû. Pir gerîya hindik gerîya, dawîya dawî bala xwe dayê ku wa ye kur zikê wî li ber dev û di bin sîya darekê de pixe pixa wî ye raketîye. Bizin hêdîka çû nêz gur bû û bi wan qiloçên xwe yên wekî şûran tûj, zikê gur ji nav şeqê heta ber sîngê qelişand. Çer zikê gur qelişî neqelişî, Şengê û Pengê gotin meee û şirp û ji zikê gur baz dan der. Dêya wan jî dîsan wekî her tim, bi dengê xwe yê xweşik kalîya û got:

-Şenga min, Penga min

Dêya we çûye zozanan

Xwarîye pelên kizwanan

Şir ketîye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

### 3.1.3. Merd û Nemerd

Hebû tunebû, din gundekî da, du meriv hebûne. Navê yekî Merd, navê yê din jî Nemerd bûye. Xûy û xeysetên wan herduyan jî hema wek navê wan bûne. Merd heya ku tu bêjî merd, camêr û qenc bûye. Nemerd jî her du usa nemerd, xesîs, dexes û tima bûye.

Rojekê herdu cînaran biryareke girtine, ku tevayî herine bajarê mezin, ji xwe ra karekî bibînin û bixebitin. Tivdarekê rêwitiya xwe kirine. Erzaqê xwe yê xwarin û vexwarinê, çi hewce bû dagirtine. Xurc û hewanê xwe hildane û dane ser rê û çûne.

Pir çûne hindik çûne, di rê da birçî bûne. Nemerd gotiye hevalê xwe:

-Merdê bira! Em hevalên hevûdiyê rêwitiyê ne, ango rêheval in. Rerq û cudatî di navbeyna me da tune, ha nanê min, ha yê te. De ka bîne, em berê nanê hewana te bixwin. Dema ku di hewana te da tiştek nema, wê çaxê jî em ê dest bi nanê ku, di hewana min da ye, bikin.

Merd guh daye gotinên rêhevalê xwe û bersiva wî daye; jê ra gotiye:

-Wele hema tu çewa dibêjî, bila notilanî gotina te be. Ji bo min jî, tu ferq û cudatî tune.

Li ser vê gotinê, dest pê kirine, berê nanê hewana Merd xwarine. Çaxê ku nanê hewana Merd qedyaye, dor hatiye hewana Nemerd. Lê belê Nemerd dest bi çur û quran, dek û dolaban kiriye.

Nemerd ziviriye ser hevalê xwe yê rêwîtiyê, jê ragotiye:

-Bira, rêhevaltiya me hetanî vira bûye. Ji vir ha, rêya me ji hevûdi diqete. Ez ê di rêyeke dinê ra herim. De bi xatirê te, ez li ser rêya xwe, tu jî li ser rêya xwe. Ji te ra oxir be.

Nemerd van gotinên xwe gotine û ji Merd qetyaye. Wî berê xwe daye rêyeka dinê û herik tu neçî.

Merd tavilka têgihîjtiye, ku Nemerd zanetî jê ra bêbextî kiriye. Wî xwe ji xwe ra gotiye:

-Qet xem nîne. Camêrtî ev nine, lê her kesek bi şîrê xwe.

Merd bi van gotinan va dilê xwe hêsa kiriye û di rêya xwe da çûye. Ew pir çûye, hindik çûye, êvar di ser wî da hatiye. Li wan nêzîkiyan jî şikeftek hebûye. Merd hinekî daye hişê xwe, paşê biryarek standiye; xwe ji xwe ra gotiye:

-Ka hema ez îşev têkevim vê şikeftê bisitirim. Li ser xêrê, sibê zû rabim û bidim ser rêya xwe, rêkevim herim.

Merd çûye ketiye şikeftê. Wî der û doran nihêriye û ji bo xwe cihekî kort dîtiye. Berê wî hinekî daye hişê xwe, lê paşê xwe di wê kortê da dirêj kiriye. Çend saetan razaye. Wextekî şevê, wî hinek dengên xerîb bihîstine. Dem ji nîvê şevê bûye. Ew dîna xwe didê, ku hurçek, gurek û rûviyek hatin ketin sikeftê. Ji pişt silav û xêrhatiniyê, rûvî hildaye ji hurçê ra gotiye:

-Hurçê bira, tu zanî, ku em salê carekê, di vê roja taybetî da hevûdi dibinin. Li ser rewşa wê salê agahiyan didin hevûdi. Der heqê bûyeran da ramanê xwe dibêjin. Ca hela kerema xwe ji me ra bêje! Ka îsal li cem te çi agahî hene?

Hurçê hildaye ji rûvî û gur ra gotiye:

-Hevalno, li hemberî vê şikeftê qaşekî mezin heye. Bala xwe bidinê, hûn ê bibînin. Di binê wî da xezîna zêra veşartî ye. Ev bû salekê, ewqas xezneger li wan deran xezînan digerin, lê belê tu kesî hela cihê wm nedîtiye. Gelek kes tên û diçin, ji ber vê jî derfet namîne, ku ez herim wê derxînim. Xezîne hela hê jî, di şûna xwe da ye.

Rûvî berê xwe daye gur; jê pirs kiriye, gotiye:

-Gur bira, ka cem te qet çi agahî hene? Tê ji me ra çi bêjî?

Gur hildaye gotiye wan:

-Wele cem min çi hebe! Qîzeke padîşahê vî welatî heye. Derdek lê peyda bûye. Çiqas hekîm û loqman anîne, kesekî çareseriyek jê ra nedîtiye. Padîşahê gotiye, ku kî qîza wî sax bike, ew ê qîza xwe bide wî. Tevaya hekîm û loqmanên wî welatî anîne, kesekî çareseriyek nedîtiye. Dermanî li ber lingên wan e, lê haya kesî jê tune. Kes nizane, ku wekî dermanê keçikê, tenê goştê miya qer a serberanî ye. Ew jî di nava keryê pezê padişê xwe da ye. Min xwe daye bendî ku, ez rêyekê bibînim. Lê belê ez dikim û  nakim, şivanê keryê pez tu mecalê nade min ku, ez miya qera serberaanî bigirim.

Ji piştî van agahiyan ra, vê carê jî hurç û gur ji ruvî pirsîne; jê ra gotine:

-Rûvî bira, me ya xwe got. Te jî dît, ku rewşa me ne baş e. De ka hela niha jî, ti ji me raa bêje! Li ba te çito agahî hene?

Rûvî ji wana ra gotiye:

-Hevalno, li nêzîkî vê şikeftê zeviyeka mezin heye. Di nava wê zeviyê da, mişkekî kor heye. Wî xwe daye ber xezîneyeka zêran. Çaxê ku tav derdikeve, ew zêran derdixe dide tavê. Wana zuha dike, paşê carek din yeko yeko dîkişîne qula xwe. Min xwe ji zû da daye bendî; lê belê min kir û nekir, min nikaribû wê xezîneyê ji destê wî derînim.

Ji piştî van agahiyên balkêş, wê şevê xew nakeve çavên Merd. Lê bêxew mayîna Merd, ji aliyekî ve ji eşqan, ji aliyekî din va jî, ji tirsan bûye. Sibe ronî bûye hirç, rûvî û gur ji şikeftê derketine û çûne.

Merd jî hinekî şûnda derketiye, çûye xwe daye bendî mişkê kor. Çaxê ku mişkê kor ji qula xwe derketiye derva, wî lêxistiye mişkê kor kuştiye. Paşê çûye xezîna zêran derxistiye û biriye. Ji wê derê berê xwe daye wî kaşê ku, di bin da xezîne hebûye. Merd ew xezîne jî, ji binê wî kaşî derxestiye, kiriye heqîwa xwe. Heqîwa xwe avêtiye ser mile xwe û berê xwe daye keriyê pêz. Ew hema rasterast çûye ba wî şivanê ku, keriyê pezê padişê diçêrand. Mert hinekî der û dora nihêriye, çavên wî miya qer digeriyan. Dema ku wî miya qer dîtiye, ji şivên ra gotiye:

-Rojbaş xorto. Maşalah, te pez baş çêrandiye. Tevaya berdîran dûv gerandine. Miya qer jî xwe girtiye. Tu wê miya hanê, a qera serberanî nafroşî min?

Şivan gotiye wî:

-Mal xirab, ev malê padişê ye. Lê paşê ez ê çewa xwe ji destê wî xilas bikim?

Merd gotiye wî:

-Ez ê gelek zêr bidime te. Em ê miyê ser jê kin, hêteka wê ji min ra. Goştê mayî jî bibe, bide jin û zarên xwe. Ji padişê ra jî bêje, gur ketin nava pêz, miya qer a serberanî xwar.

Van gotinên Merd bi şivên jî maqul hatine. Wî rabûye, gotina Merd kiriye û miya qer a serberanî ser jê kiriye. Hêtek daye Merd, goştê mayî jî, ji xwe ra hildaye. Merd hêt ji destê şivên girtiye û kiriye hewana xwe. Wî ji bêrika xwe hinek zêr derxistine, dane şivên û berê xwe daye koşka padişê.

Merd hema bi wê qîtê çûye ber derê koşka padişê. Dergevanan pêşî lê girtine, destûr nedane wî ku, ew derbasî hundur be. Wî gotiye dergevanan:

-Ez dermanê qîza padişê dizanim. Eger hûn mecalê bidine min, ez hatime wê derman bikim.

Dergevanan agahî dane padişê. Padişê ji dergevanan ra gotiye:

-Hûn çi sekinîne? Rê bidinê bila bê hundur. Hela ka dermanê wî çi ye?

Dergevan hatin ba Merd. Derî lê vekirine. Merd hema çewa ku ketiye hundur, ji padişê ra gotiye:

-Ez benî, ez dermanê qîza te dizanim. Eger tu destûrê bidî, ez dixwazim wê derman bikim.

Padişê gote wî:

-Ev çend sal in gelek hekîm û loqman ji bo dermankirina qîza min hatin. Tu jî were, em ê binêrin, ka tê çi bikî? Zû dest bi karê xwe bike.

Merd goştê miya ser a serberanî, ji tûrikê xwe derxistiye. Berê aniye goştê hêta miyê hûr kiriye û daye ser kuçik, hinekî qelandiye. Paşê ew goşta bi keçikê daye xwarinê. Qîza padişê ew goşta xwariye, hema wê gavê reng û rûyê wê hate guhartin. Qîza padişê bi goştê miya reş va sax bûye, rabûye ser xwe.

Padişa û jina xwe bi dermankirina Merd va gelekî dilxweş bûne. Qîza wan sax bûye, rabûye ser piyan. Padişa li ser soza xwe sekiniye. Wî hema wê rojê rabûye, tivdarekê qîza xwe daye kirinê, destê wêgirtiye û daye Merd.

De bira Merd bigihîje mirazê xwe, ji xwe têkeve kêf û zewq û henekan. Em bêne ba Nemerd. Nemerdê me çûye geryaye, negeryaye li tu cihekî karek nedîtiye. Xwe bi xwe ra ketiye mitalan û gotiye:

-Heyran ev çend meh in, ez li van derana, li vê xeribiyê boş û betal mînanî teralê Bexdayê çi digerim. Kar û bar jî tune. Ez li van ortan zelûl bûm. Ka hema ez herim ber derê padişê, hînekî recû jê bixwazim. Qet nebe ez paşta bizivirim, herim nava zar û zêçên xwe. Hema xwe bigînim gundê xwe.

Van gotinan dibêje û berê xwe dide mala padişê. Çaxê ku çûye, ketiye hewşê, rastî Merd hatiye. Hildaye ji Merd ra gotiye:

-Pîhî! Kuro Merdo, tu li vira çi dikî? Dibe ku te jî wekî min kar û xebat nedît? Tu niha jî hatiyî, hinek recû bixwazî, daku bikaribî pê herî derkevî gundê xwe?

Merd gotiye wî:

Na wele, ez nehatîme recû mecûyan. Va dera mala min e. Ez zavê padişê me.

Nemerd jê bawer nekiriye, gotiye wî:

-Heyran tu laqirdiyê xwe bi min dikî. Tu li serê min dikenî.

Çaxê ku Merd lê nihêriye, ku Nemerd jê bawer nake; jê ra gotiye:

-Bira can, ez henek menekan nakim. Hela tu rabe, kerem ke em herin mala min. Çendekî bibe mêvanê min. Îcar ez ê. Ji tera hal û hîkyata xwe yeko yeko bêjim.

Herdu heval rabûne tevayî çûne mala Merd. Berê ezet û hurmet, xwarin û vexwarin, qedirê wî girtiye. Paşê jî çi hatibe sêrê wî, çi rastî wî hatibû, yeko yeko ji Nemerd ra gotiye.

Nemerd demek dirêm mêvanî li mala Merd maye. De Xwedê ava bike, mala têr  û tijî ye. Nemerdê te ji xwe ra xwariye, vexwariye, kêf kêfa wî bûye. Demek wehakî derbas bûye. Nemerd vegeryaye ser eslê xwe, ango dest bi dexesiyê, hesûdiyê kiriye.

Rojekê li malê tenê dimîne, hinekî dikeve mitalan. Paşê xwe ji xwe ra gotiye:

-Hela bisekine! Çima çî min ji wî Merdî kêmtir e? Ew bûye xwediyê vî dem û dezgeyî. Çima ez nikaribim karekî bibînim? Heremî wî tevaya sura xwe ji min ra got. Va ye, çend roj mane, ku salek derbas bibe. Ez ê jî herim têkevim wê şikeftê. Hela ka îcar ew ajalana, çito agahiyên xêrê didin.

Nemerdê me hema bi bendan va roj kişandine. Wî dilê xwe xweş kiriye. Hema wê roja ku, salek derbas bûye, çûye ketiye şikeftê. Ewî jî çûye xwe di kortalekê da telandiye û li benda ajalan sekiniye.

Merd jê ra çi gotibû, yeko yeko rast derketine. Di nîvê şevê da hirç, gur û rûvî hatine ketine şikeftê. Dîsa rûvî berê xwe daye hirçê, jê pirsiye; gotiye:

-Hirçê bira, de hela bêje me. Qe îsal li ba te çito agahî, angi agahiyên nû hene?

Hirç bi dengekî xemgîn bersiv daye,  gotiye wan:

-Mala we xirab nebe. Çi yê ba min hebe? Tê bîra we? Sala par, piştî wê roja ku, dîsa em li vê derê axivîn. Me agahî veguhastin. Hema ji piştî wan danûstandinan, mirovek hat hema ew xezîneya ku min qalê dikir, ji bin wî kaşî derxist, hilda û bir.

Ruvî berê xwe da gur; ji wî pirsî:

-Gurê bira, ka îsal li ba te çi hal û hewadîs hene? Agahiyên te ên nû çi ne? Hela tu bêje me.

Gûr ji rûvî ra gotiye:

-Agahyên min jî ne baş in. Wele yekî miya qer a serberanî bi şivên daye ser jê kirinê. Hêtek goştê miya reş hildaye û çûye koşka padişê. Ewî bi wî goştê miya reş va qîza padişê derman kiriye. Padişa jî li ser gotina xwe sekiniye. Wî qîza xwe daye ewî kesê ku, keça wî derman kiriye, ango ew zewicandine.

Vê carê jî hirç û gur ji rûvî pirsîne; gotine:

-Rûviyê bira, de hela tu me agadar bike! Li cem te qe çi hewadîs hene? Ev sala te çewa bû?

Ruvî hildaye bersivek daye wan; gotiye:

-Agahiyên ba min, ji yên we ne baştir in. Ji piştî axaftina me ya berî salekê, rojekê zilamekî xerîb hatmişkê kor kuşt, xezîneya wî jî hilda û ji xwe ra bir. Rewşa min jî aha!..

Ji piştî van gotinan, rûvî hildaye ji hevalên xwe ra gotiye:

-Hevaalno, yeqîn benî însanek li me guhdarî dike. Hirçê bira, tu yî girî terîkî yî. Tu xwe bide ber dêrî. Ez û gurê bira jî, li şikeftê bigerin. Hela em binêrin, ev kî ye?

Hirçê xwe daye ber derî. Rûvî û gur, ji ber dêrî da dest pê kirine, tevaya kortikan, qul û kuncan nihêrîne. Rûvî dîna xwe dayê, ku merivekî xwe di kortekê da direj kiriye. Rûvî xwe pê ceribandiye, lê kiriye nekiriye, nikaribûye jê derxe. Rûvî gazî gur kiriye. Gur jî xwe lê ceribandiye. Wî jî nikaribûye tiştekî bike. Gelekî hewl daye, lê belê pençê wî jî negîhîştine wî mîrovê ku, xwe di kortikê da direj kiribû.

Rûvî û gur çûne li ber dêrî sekinîne, hirç şandine ser wî mîrovî. Hirç hatiye, hema çewa ku lepên xwe ên terikî avêtine Nemerd, ew bi derbekê va ji çelê derxistiye. Rûvî, gur û hirç Nemerd hildane orta xwe, ew tîştîşî kirine, heyfa xwe jê standine.

Wek hemû çîrokan, di vê çîroka me da jî qencî û xerabî diçe şûna xwe dibîne. Merd bi qenciya xwe, Nemerd jî bi xeraabiya xwe v diçin mîrazê xwe şa dibin.

### 3.1.4. Bizin û Sê Karên Wê

Dibêjin zemanekî bizinek û sê karikên wê li qûntara çiyayekî diçêriyan, jiyana xwe derbas dikirin. Navê karikên bizinê Şengulok, Mengulok û Elîçengulok bûne.

Bizin her roj diçe çolê, li gelî û gavanan diçêriya, zikê xwe têr dikir û dihate malê. Lê herçî gava ku, dihate ber holika xwe, deng dida karikên xwe, digote wan:

-Şengilok, Mengilok, Elîçengilok!

diya we hatiye dana,

Şîr tijî bûye guhana,

derî vekin,

bila diya we, we bimêjîne.

Li ser van gotinên bizinê, karikan derî vedikirin û radihîştin gihandîra diya xwe, zikê xwe têêêr dikirin.

Rojekê bizine xwastiye, dîsa here li bilindciya, çiyê, gul û gupikan biçêre, zikê xwe têr bike û bê. Lê wê berî çûyîna xwe, hinek şîret li her sê karikên xwe kirine. Bizinê gazî karikan kiriye; ji wan ra gotiye:

-Şengulok, Mengulok, Elîçengulok! Karikên min ên delal, niha baş guh bidine diya xwe. Ez ê herin zikê xwe têr bikim. Hûn ê li malê tenê bimînin. Nebî nebî hûn derê xwe ji bo hinekên din vekin!

Karikên wê jê ra gotine:

-Dayê, tu ji xwe ra meke xem. Em ji bilî te, derê xwe ji bo tu kesî venakin.

Diya wan, dîsa tema xwe dubare kiriye; ji wan ra gotiye:

-Dema ku min got;

Şengulok, Megulok, Elîçengulok,

diya we çû çêrya li çiya û zozanan,

giha û gizwan kete ber diranan,

şîr tijî bûye guhanan, dêrî vekin, bira diya we, we bimêjîne.

Wê gavê hûnê dêrî li min vekin.

Lê haya wan ji gurê har tunebûye, ku ew li kêleka malê telyaye û guhdariya wan dike. Gur gotinên bizinê yeko yeko bihîstine. Wî ji xwe bi xwe ra gotiye:

-Wele, niha roj roja min e. Wa ye, navroj û şîva min hema li ber min in.

Bizinê xatirê xwe ji karikên xwe xwastiye û berê xwe daye quntara çiyê û çûye. Dem hinekî derbas bûye. Gurê har hatiye ber derê koxikê, gazî karikan kiriye; ji wan ra gotiye:

Şengulok, Megulok, Elîçengulok,

dêrî vekin, dêrî

diya we hate dana

zû derî vekin, zû zû!

Ez ê we bimêjînim.

Karikan hev û di nihêrîne. Paşê bi yek dengî li serê wî kenyane; jê ra gotine:

-Tu ne diya me yî. Dengê diya me zirav e. Em dêrî ji bo te venakin.

Gur hinekî daye hişê xwe, çareseriyekê geryaye. Paşê berê xwe daye dikana gund. Ew çûye dikanê û hema lez û bez ji dikandar gûzek xwastiye. Dikandar gûzek daye wî. Gurê zalim bi lezgînî reviye, hatiye ber koxikaa karikan. Wî guz kiriye gepa

xwe, dîsa gazî karikan kiriye. Ji wan xwastiye, ku ew dêrî lê vekin. Vê carê jî, karikan ji binê dêrî raa lepên gur dîtine; jê ra gitine:

-Em dêrî li te venakin. Ti ne diya me yî. Lepên diya me sipî ne, lê yê te reş in.

Ew dîsa li serê gur kenyane, henekên xwe li wî kirinee. Gûr zûtirkê reviye, çûye aşê li binatara malan. Wî ji aşvên hinek ard xwastiye. Bi wî ardî va teşkên xwe, pîyên xwe sipî kiriye û dîsa lez û bez revî revî, hatiye ber derê karikan. Wî lepên xwe ji bin derî ra nîşanî karikan dane û gotiye wan:

-Karikno, lê binêrin! Lepên min sipî ne. Ez diya we me. De niha derî vekin, ez we bimêjînim.

Şengulok, Mengulok, Eliçengulok dibînin, ku teşkên wî spî ne. Deng jî wekî diya wan e. Ew dilxweş bûne, bi yek dengî gotine:

-Wa ye, diya me hat. Dayê, daye!

Karikan derî vekirine. Hema bi vebûna dêrî ra, gurê har diranê xwe yên tûj nîşanî wan dane û gotiye wan:

-Karikno, hûn çewa xweşik in. Hela werin, werin! Ez we yeko yeko bişînim hûrê xwe.

Bi vê gotinê va, gurê har Şengulok girtiye û hema bi carekê da daqultandiye, xwariye. Paşê daye dû Mengulokê, ew jî girtiye û daqultandiye. Dor hatiye Elîçengilokê. Gurê har li wê geryaye, lê nikaribûye wê bibîne. Elîçengilok ketibû dolabekê û derî bi ser xwe da girtibû.

Dema ku gurê har nikaribû Elîçengilok bibîne, ji xwe bi xwe ra gotiye:

-De min îro zikê xwe têr kir. Ez dikarim wê jî carekê dinê bixwim. Wey, ez gelekî tî bûm. Ka ez herim ber çêm, hinek av vexwim.

Gurê zalim zikê xwe têr kiriye û derketiye derva. Hêdî hêdî berbe çêmê li binatara koxika karikan çûye. Berê, li ber çêm hinekî veketiye, xwe daye tavê, lê bele zikê wî lê bibû def. Halê wî tunebû, ku gavekê bavêje. Hedûriya wî nedihat.

Bizina dayîk jî, hema di  dema xwe da hatibû ber dêrî. Çaxê ku dîtiye, derî vekiriye, notilanî haran kiriye meke mek û ketiye koxikê. Deng  daye  karikên xwe, gazî wan kiriye:

-Şengulok, Mengulok, Elîçengulok hûn li ku ne? Çi hate serê we? Min ji we ra negot, derê xwe ji tu kesekî  ra venekin?

Elîçengulok dibîne, ku ev dengê diya wê ye. Wê deng daye diya xwe û derketiye holê; ji diya xwe ra gotiye:

-Dayê,  gurê  derewîn hat,  em xapandin.  Me jî derî lê vekir. Wî herdu xûşkên min xwarin. Min xwe veşart. Bibexşîne, me guh neda şîretên te!

Bizinê, ji wê ra gotiye:

Ne dema wê ye. Hela tu ji min ra bêje!Te dît, gurê har berbe ku çû? Tu dikarî rê nîşanî min bidî?

Elîçengulok gotiye, diya xwe:

-Dayê, min baş nedît, lê bele dibe, ku ew berbe çêmê binatara malan çûbe.

Bizina cegerperitî destê Elîçengulok girtiye û berbe çemê li binatara malan lezandîye. Wê ditiye, ku gur hema li ser pişte ketiye xeweke kûr. Çaxê ku wê dîtiye, ku gur di xewê da ye. hema lez û bez paşta ziviriye, çûye ji koxika xwe kêreke tûj aniye. Paşê hêdîka çûye cem gur, zikê wî qelaştiye. Şengulok û Mengulok ji zikê gur derketine.

Bizinê û hersê karikan,  ji ber şabûna nizanibûn çi bikin. Herdu karikan ji diya xwe ra gotine:

-Dayê, daye! Me ji destê vî gurê har azad bike!

Bizinê û karikên wê, hinek kevir kom kirine û tijî zikê gurê zalim kirine. Diya wan çermê zikê gurê har dîsa gihandiye hev û dirûye. Bizin û karikan xwe dane aliyekî, li gurê har mêze kirine. Demeke kurt derbas bûye, gurê derewîn şiyar bûye. Wî lepê xwe li ser zikê xwe gerandiye û gotiye:

-Wey, wey, wey! Karik di zikê min da bûne kevir. Ez hinek av vexwim, bila hişê min bê serê min.

Gur hêdî hêdî çûye ber avê, lê halê wî tunebûye. Dema ku wî xwe qûz kiriye, ku avê vexwe, wî nikaribû, lê gere wî av vexwara. Wî nikaribû ji ber giraniya keviran xwe bigirta an jî xwe serast bikira. Çaxê ku wî xwe xwar kiriye, hema gotiye terp û ketiye avê. Gurê zalim bi wê xerawiya xwe va xeniqiye.

Bizin û karikên wê jî, ji şabûnan dane lotikan., bi ken û henek berbe koxika xwe va çûne. Wê berê hersê karikên xwe mêjandine; paşê jî ji wan pirsiye:

Karikên min, Şengulok, Mengulok, Elîçengulok, de hela ji dayîka xwe ra bêjin! Îro çi hate serê we? We çima derî vekir?

Karikên wê dest pê kirine, wê rojê çi hatibû serê wan, yeko yeko ji diya xwe ra gotine:

Diya wan, carek dine ji wan ra gotiye:

- Şengulok, Mengulok, Eliçengulok, diya we qurbana we be! Min ji we ra negot, derê xwe ji tu kesî ra venekin. De bira va roja hanê, ji bo we bibe şîretekê. Nebî nebî careke dinê, derê xwe ji bo xerîban vedikin!

Bizinê û her sê karikên wê, dest dane hev û di, tevayî bi dilekî geş, berbe zozanan va derketine. Ji wê rojê şûn da, Şengulok, Mengulok û Elîçengulokê guh dane şîretên diya xwe û tevayî jîyaneke berxtewar domandine.

### 3.1.5. Çûk û Fîl

Hebû tunebû çûkek hebû. Dibêjin çûkê rabû hêlÎna xwe li ser rêya fîl çêkir û dû re jî hêkên xwe tê de kirin û çêlikên xwe derxistin.

Rojekê fîl dîsa wekî her tim di ber hêlîna çûkê re derbas dibû, ji bo ku here avê vexwe. Fîl bala xwe dayê k u wa ye hêlînek tije hêk û çêlik li ser rêya wî ye. Çû bi qestî li pê hêlînê kir, hêk û çêlikên tê de giş pelixandin û kuştin. Û dû re jî da rê û çû. Dema çûk hat, dît ku ne hêlîn heye ne hêk û ne jî çêlikên wê. Çûkê ji xwe re got:

-Hebe tunebe ev karê fîl e, miheqeq wî ev xerabî bi min kirîye. bêyî fîl bi tu kes vê zilmê li min nake.

Çûkê Firek da xwe û çû li ser serê fîl venîşt. Ji fîl re got:

-Birakê fîl ma te çima ev zilma li min kir. Te hemû hêkên min pelixandin û çêlikên min jî kuştin. Te ez li darê dinyayê tik û tenê hîştim. Û qaşo em cîranê hev bûn! Heta niha bi qasî serê derzîyê xerabîyek min negihîştiye te. Te çima weha kir? Ma qey te ez biçûk û reben dîtim loma te ev neheqîya han li min kir?

Fîl awirekî tûj da çûkê û bi quretîyek nedîtî jê re got:

-Eyni wekî tu dibêjî, ji ber ku çavên min te dibire loma min hêlîna te pelixand. Ez mezin û xurt im, dilê min çawa bixwaze ez wer dikim. Hema ji destê te çi tê texsîr meke. Te fêm kir?!

Dema fîl weha got, çûkê êdî gotin zêde dirêj nekir, firek da xwe û bi hewa ket. Çû ba refê çûkan, gilîyê xwe bi wan kir, serpêhatîya xwe ji serî heta dawî ji wan re got. Û dû re jî ji wan daxwaz kir ku ew alîkarîya wê bikin. Çûkan got:

-Em bi dil û can dixwazin alîkarîya te bikin, lê belê tiştek jii destê me nayê. Em çûk in ew jî fîl e. Ma em rebenên Xwedê dikanin çi bi fîl bikinku?

Lê çûk li dijî vê dîtina wan derket, li ber wab gerîya di daxwaza xwe de israr kir. Got:

-Got :

-Dema em giş qela xwe bikin yek û hemû bi hev re herin li ser serê fîl venijin û bi nikilan bi ser û çavên wî kevin heta wî kor dikin. Ew nikane tiştekî jî bi me bike.

Çûk hemû qanî bûn gotin weleh tu rast dibêjî. Û dû re jî giş bi hev re firîyan, çûn li ser serê gur danîn û serî çavên wî dan ber nikilan. Nikil kirin, nikil kirin heta ku her du çavên wî jî rijandin. Piştî ku fîl ji her du çavan jî bû ma bê ronahî bê xwarin û vexwarin. Ji ber êşa çavên xwe dikir hawar û orrîn. Tavilê mêş, kelmêş û mûrîyan girtin ser birîn û çavên wî. Dest pê kirin lê çêrîyan. Lê belê çûkê dîsan dev ji

fîl berneda got evîya hîn jê re hindik e. Firîya çû ser goleka tije beq. Çûkê ji beqan re jî serpêhatîya xwe got. Beqan jî li çûkê guhdarî kirin û dû re ji jî jê re gotin:

- Hey çûka pepûk! Ma em beqên reben dikanin çi bi fîl bikin? Ne qeweta me li fîl tê û ne jî ya te.

Çûkê ji beqan re got:

-Na, qeweta me lê tê. Lê belê divê em alîkarîya hev bikin, dema em hêza xwe bikin yek, em dê kanibin zora wî bibin. Loma jî ez dixwazim ji we çend heb bi min re bên, em herin ba korteka nêzî fîl. Hûn ê di kortê de bikin qurre qurr. Dema fîl dengê we bibihîze dê bawer bike ku dengê we ji nav avê tê. Ji ber ku niha gelekî tî bûye loma jî ew dê xwe li dengê we bigire û were dû re jî ew ê werî nav kortê be. Beqan daxwaza çûkê qebûl kirin û çûn ketin kortê û tê de kirin qurre qurr... Fîl dema qurre qurra beqan bihîst tîbûnê hîn bêtir zor dayê. Bi awayekî korane berê xwe da dengê çûkan û çû. Dema gihîşt ser lêva kortê ku xortima xwe berde nav avê û avê vexwe lê belê hew dît ku, got gurp û di dereka kûr de wer bû. Kort gelekî kûr bû, loma jî fîl nikanîbû jê derketa. Çûkê firek da xwe, çû li ser serê wî danî û jê re got:

- Hey fîlê çavsor, tu bi hêz û mezinahîya xwe pir stûr bûbû, te tu kes di ser xwe re nedidît. Ji ber vê stûrîya xwe te ne ez bi tiştekî hesibandim û ne jî ji min şayiş kir. Niha tu dibînî ku bi vê çûkitîya xwe min tu xistî çi halî. .. Deng ji fîl derneket. Ma di kortê de...

### 3.2. Olağan Masallar

#### 3.2.1. Şah Îsmayîl

Çîrvanokbêj: Sînem Îşler Erdîş -1997.

Carekê ji caran, rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran.

Hebû Padişahek, navê Padişahî Evdirehman Padişa bû. Kurekî wî hebû, navê kurê wî Şah Îsmayîl bû. Şah Îsmayîl rojekê gote Wezîrê bavê xwe:

"Bavê min hemin ez di hundir de hîştime. Wî rojekê negotye bila kurê min bêhnekê derkeve seyrangehê û li derdora bajarê min bigere." Li ser vê yekê Wezîr diçe cem Padişahî û dibêjê:

"Padişahê min! Kurê te dibêje bavê min, min her tim di hundirê malê de dihêle. Ew na- hêle ku ez ji xwe re bêhnekê derkevim û bigerim. Padişahê min! Kurê te rast dibêje. Gotin gotina wî ye. Ew hêj rojekê derneketiye ji xwe re negeriyaye. Em ê wî sibê derxine seyran- gehê, bila ji xwe re qasekî bigere." Padişah dike nake xwe ji Wezirê xwe rizgar nake û dibêje:

"Min destûra wî daye, wî bibin bigerînin. Ew jî dibin digerînin. Ew di gera xwe de rastî êla mîre ereban tên û ji hev re dibêjin; em û herin nava êlû, nanekî bixwin û werin. Diçin malekê nanekî dixwin. Şah Îsmayîl wextekê serê xwe bilind dike qizekê li wê derê dibîne. Tu li qizikê dinêri; hema ne bike ne bixwe li wê binêre. Ne bi dilekê bi hezar dilî dilê Şah Îsmayîl dikeve qizikê. Radibin xatrê xwe dixwazin, pişta xwe didine qizikê tên. Ew roj diçe roja din Şah Îsmayîl radibe diçe cem Wezîrê bavê xwe û dibêje; Ji bavê min re bibêje, bila min bizewicîne.

Wezîr diçe cem Padişahî dibêje:

"Padişah min! Kurê te dibêje, ji bavê min re bibêjin bila min bizewicîne." Padişah dibêje:

"Bila, dibe. Ka jê re bibêjin dilê wî di kê de heye, bila ji we re bibêje ez jî dê herim jê re bixwazim." Şah Îsmayîl dibêje; navê qizika ku ez jê hez dikim Gulîzar e. Bila bavê min ji min re Gulîzarê bixwaze.

Padişah sibê radibe, ji daholvanê xwe re dibêje li daholê bixe û bibêje; navê keça kê Gulîzar be bila îro bîne ziyareta mala padişahî. De îcar heçî kesê ku navê keçên wan Gulîzer bûne, keçên xwe didin pey xwe û berê xwe didin mala padişahî. Bavên keçan li gorî halê xwe yê ku çêleka xwe, yê ku bizina xwe difiroşin, yê ku dêrek yê ku tiştekî din ji qîzên xwe re distînan, keçên xwe dixemilînin qesta qesra Padişahî dikin.

Vê keft û reftê dikin ku kurê Padişahî qizên wan biecibîne. Qîzikan tînin mala padişahî. Şah Îsmayîl tê dikeve nava qîzan digere nagere Gulîzera ku dilê wî ketibûyê, li wir nabîne. Pa- dişah ji wezîrê xwe re dibêje: "Ka here, Şah Îsmayîl di nava ew qas qîzan de ji kîjanê hez kiriye!" Wezîr tê jê dipirse. Şah Îsmayîl bersiva wî dide: "Ew qîza ku ez dibêjim, di nav van de nîne. Qiza ku ez dibêjejim Gulîzera qîza Mîrê ereban e. Bila bavê min here wê ji min re bixwaze."

Ew wê şevê radizên; sibe li wan zelal dibe. Padişah dengê xwe li wan dike, radibin. Padişah dibêje, Rabin. Şah Îsmayîlî jî radikin da ku biçin nava êla Mîrê ereban. Dibêjin, ku Xwedê qeder kiribe emê qîzikê bixwazin werin.

Radibin bi rê dikevin û diçin. Ew li şûnwarê êlê dinêrin, dibînin ku li şûnwarê êlê tu kes nemaye. Êlê ji wir bar kiriye û çûye. Şah Îsmayîl dibêje:

"Kuro ca li bin kevir û meviran baş binihêrin! Ku dilê wê jî di min de hebe, niha nîşanek ji min re daniye. Ku dilê wê tune be jixwe tune bûye û çû.

Ew keviran werdigerînin dêhna xwe didimê pirtîk kaxiz di binê kevirekî de ye, derdixin didine destê Şah Îsmayîlî. Şah Îsmayîl wê dixwîne. Di kaxizê de waha nivîsiye:

"Heke dilê te di min de hebe, tu dê bê li min bigerî. Heke ku dilê te di min de tune be, êdî tu dizanî. Ne te ez dîtime, ne jî min tu dîtî."

Şah Îsmayîl dizîvire ji leşkerên bavê xwe re dibêje: "Hûn êdî vegerin. Ez ê pey Gulîzerê bikevim û herim. Ka dê Xweda ji min re çi riyê veke."

Ew radibin, Şah Îsmayîl xatirê xwe ji van dixwaze, dikeve pey şopa Gulîzerê. Bi rê di- keve pir diçe, hindik diçe dêhna xwe didê li wir qesrekê dibîne. Lê dinêre ku ji bo temamki- rina wê tenê cihê serê mirovekî maye ku qesr temam bibe; her wiha tenê cihê cendekekî maye ku qesra cendekan jî temam bibe.

Ji te re bibêjim, Şah Îsmayîl, diçe ber deriyekî hespê xwe tewil dide diçe hundir. Dêhna xwe didê ku çaydanê çaya wan li ser e dikele. Çay çêbûye dema xwe girtiye. Dêhna xwe didê ku du sêv di nava sênîkê de li ser sifrekê ne. Her wiha

nanek, hinek zeytûn û hinek helew jî li wê derê ye. Ew diçe li ser sifrê rûdine û dibêje:

"Wale sêvek ji min re ye û yek ji xwediyê wê re ye. Nanek û keriyek ji min re ye û keriyek jî ji xwediyê wî re ye. Çay jîez ê du îskanan vexwim, xwediyê sifrikê jî kîngê tê bila were, êdi ew dizane."

Nanê xwe dixwe, radibe li hespê xwe siwar dibe hinekê dûr dikeve, dêhna xwe didê yekî gazi kirê û got:

"Hey hey gidî! Ev mala han qey maleke bê xwedî ye tu wiha nanê xwe bê minet dixwî û diçî." Şah Îsmayîl dibêjê:

"Lawo nexe zirezir! Were yan dê Xweda bide min an dê bide te."

De gotinên gotinvan, guneh li stûyê gotingêran! Ew heft rojan li ser pişta hespan bi şûr û mertelan li hev dixin. Wextê ku li hev dixin, di dawiyê de Şah Îsmayîl wî datîne erdê, şûr datîne ser stûyê wî. Wextê ku şûr datîne ser stûyê wî, ew hema destên xwe davêje pêsîra xwe vedike, her du çiçkên xwe derdixe derve. Wextê ku Şah Îsmayîl çev pê dikeve jixwe diçe. De heft rojan ne nan û ne ji av vexwariye. Ji te re bibêjim, Ereb dikeve binçenga wî û tîne dixe nava cihê xwe. Dema ku Şah Îsmayîl bi ser xwe ve tê, Ereb diçe cem û jê dipirse:

Te çima ez ne kuştim?"

Şah Îsmayîl dibêje:

"Tu jin î destên min neçû ku ez te bikujim." Dibêje:

"De rabe, em ê nanê xwe bixwin." Tînin nanê xwe dixwin, ava xwe vedixwin, dikevin nava ciheki radikevin. Dema ku radikevin, Şah Îsmayîl şûrê xwe tazî dike datîne navbera xwe û Erebê. Rojek wisa, du roj wisa, Ereb jê dipirse:

"Li gorî te ez ne bedew im. Gelo ma te ji min bedewtir dîtine?" Dibêje:

"Na." Dibêje:

"Te lehengên ji min lehengtir dîtine?" Dibêje:

"Na." Dibêje:

"Binêre, tenê seriyek ji qesrê maye kêm ku temam bibe, tenê cendekek maye kêm ku temam bibe. Min wisa ehd kiriye, mêrê ku pişta min daneyne, ez wî mêrî naxwazim. Tu çima wî şûrî datînî navbera min û xwe?" Dibêje:

"De îcar tu destûra min bide ez ji te re bibêjim."

Şah Îsmayîl jê ra behsa qîza Mîrê ereban dike. Çi hatibe serê wî hemûyê jê re dibêje. "

Şah Îsmayîl, bila gotina te be. Ez jî heta qîza Mîrê ereban ji te re neynim ez jî ji te re jinaniyê nakim."

Ew wê rojê li wir dimîne, roja din radibin, her yekê ji wan xurcezêr û têrikên xwe girêdidin û diçin bi bajarê ereban re derdikevin û dibêjin:

"Hesp miraz e", Em ê lixavê hespan berdin, bila herin. Hesp li ku derê here, li ber derê kê bisekinin, em ê herin bibin mêvanê wê malê.

Lixavê hespan berdidin hesp diçin ber deriyekî disekinin. Dêhna xwe didinê ji hundir pîrek derket. Dibêjin:

"Pîrê em mêvanê te ne! Em di bextê te de ne, tu van hespên me bixe hundir." Pîrê dibêje:

"Erê, bavo ka hûn dibînin ku min koxikekî xerabe û piçûk heye. Baş e, ez ê hespên wê bixim ku derê û hûn dê bêne ku derê? Hûn dibînin ku ez tenê tê de bi cî dibim.

" Şah Îsmayîl kulma xwe di bin zêran re kir avête ber pîrê û got:

"Ha ji te re ev qas zêr, cihê hespên me jî bike."

Pîrê çawa ku zêr dîtin, êdî nizanibû ku wê ci bike. Gihîşte dîzê li kulozî da, kuloz li dîzê da, hemû pêk ve avêtin derê malê û hesp kişandin hundir. Çû piştiyek

giya anî danî ber hespan. Ji te re bibêjim, mêvan jî hatin hundir, dêhna xwe danê ku ji bilî hesîlekê tiştekî raxistina pîrê tune. Rabû kulmeke din jî zêr dane pirê û gotê:

"Here ji me re destek nivîn bîne. Em ê îşev li vê derê razên. Ji me re xwarin û vexwarinekê peyda bike, em birçîne." Pîrê dewlet serê wan zêra zengîn bû.

Pîrê rabû çû ji wan re lihêf, doşek, xwarin û vexwarin anî. Wan ji pîrê pirsîn gotinê:

"Pîrê kesekî te heye yan tu tenê yî?" Pîrê got:

"Hûn halê min dibînin. Heft kurên min hene. Ez bixwe jî di vê rewşê de me. Hin ji wan li defê û hin ji wan li zirnê dixin." Şah Îsmayîl û Ereb dibêjin:

"Pîrê tu diya me, em ji zarên te! Tu me jixwe re wekî ewlad qebûl dikî? Heke ku tu jî bibêjî erê em ê derdê xwe jî ji te re bibêjin." Pîrê dibêje:

"Erê, ez ser çavên xwe erê dikim. Bibêjin ka derdê mêvanên min çi ye?" Şah Îsmayîl gotê:

"Pîrê! Dilê min ketiye Gulîzera qîza Mîrê ereban. Îcar em nizanin ka em ê wê li ku derê bibînin. Em bi pirs û saloxan hatine vir. Bi gotinan, Mirê ereban li vê derê dimîne. Em ji bo dîtina Gulîzerê alikariyê ji te dixwazin. Dibe ku tu ji derdê me re çareyekê bibînî." Pîrê got:

"Tu vî dengê han dibihîzî?"

Şah Îsmayîl guhdariya dengî kir, ku dengê dahol û zirneyê dihat.

Pirê gotina xwe domand û got:

"Ev dewata Gulîzerê ye. Gulîzarê didine mêr." Şah Îsmayîl got, hey na! Got, belê.

Gotin Pîrê! Ku tu çareyekê ji derdê me re bibînî, em ê van zêrên di xurcê de hemûyan bidin te. Dema ku em Gulîzerê bibin em ê vê xurca din jî bidin te. Pîrê li

ser van gotinan rabû kulma xwe tijî zêr kir ji malê derket û hate ber dergahê qesra Mîrê ereban. Dergevan lê civi- yan gotin:

"Pîrê tu dê bi ku ve herî?" Pîrê got:

"Ez ê herim Gulîzerê bibînim. Ez ê dewata wê bikim. Dibe ku êdî ez wê qet nebînim. Ha ji we re van bîst zêrên han rê bidine min ez herim."

Dergevanan rê dan pîrê, pîrê ket hundir. Gulîzerê got:

"Ew kê ye?" Cariyekê gotê:

"Ew pîreke. Hatiye dibêje, ez ê wê bibînim." Gulîzerê got:

"Ez li pîran tobedar im. Bila neyê ba min." Pîre got:

"Gulîzer ew kalînya ku tu dûr di kalî nêzîk bû ye. Rê bide min ez ji te re bibêjim.

Rê dane pîrê, hate ba Gulîzerê. Pîrê gustîla tiliya xwe derxist û got:

"Mêvanênek hatiye mala min, wî ev gustîl da min û got nîşanê Gulîzerê bide. (De Gulîzerê ew gustîl di destê Şah Îsmayîl de dîtibû.) Ez jî ji bo wî mirovî hatime cem te. Gulîzerê got:

"Pîrê!" Pîr got:

"Bibêje"

"Ez ê sibê destûra xwe bixwazim û herim kumbeta diya xwe. Ez ê herim ziyreta diya xwe. Bila ew mirov jî were em ê li wê derê hev û din bibînin."

Pîrê hat vegeriya malê gote Şah Îsmayîl: "Sibê dê Gulîzer here ser gumbeta diya xwe. Tu ji dê herî wir û hûn dê hev û din li wir bibînin." Got:

"Baş e."

Sibê Şah Îsmayîl radibe li hespê xwe siwar dibe, diçe ber kumbetê peya dibe û diçe hundir. Dêhna xwe dideyê ku Gulîzer hêj nehatiye. Rûdinê, radibe, bi

pêgermokan digere. Ha dê were, ha dê were, li benda wê diqerime xew dikeve çavên wî radizê. Wextekî paytûna Gulîzerê tê ber derî. Gulîzer jê peya dibe dêhna Xwe didê ku Şah Îsmayîl razaye. De dil nade ku wî ji xewê rake, çengek mewîj dixe bêrîka Şah Îsmayîl dibêje:

"Tu hêj zarokî. Sibê rabe here nava zarokan mewîjên xwe bixwe.

Radibe paşve vedigere mala xwe. Dema ku Şah Îsmayîl ji xewê radibe lê dinêre ku hêj Gulîzer ne hatiye dibêje; Gulîzer nehat, êdî dereng e. Sekina min li vê derê badilhewa ye. Ya baş ew e ku ez herim. Şah Îsmayîl li hespê xwe swar dibe, vedigere mala pîrê û dibêje:

"Min Gulîzer nedît. Ez gelek li hêviya wê sekinîm nehat. Pîrê Dibêjê:

"Dibe ku hatibe tu razabî. Yan ji tiştekî din bibe ku we hev û din neditibe. Şah Îsmayîl dibêje:

"Ez gelek sekinîm nehat. Xewekê ez girtim min hinekê çavên xwe dan hev. Dibe ku ew jî wî çaxî hatibe." Pîrê dibêje:

"Ka li li berîkên xwe binêre. Dibe ku tiştek xistibe berikên te."

Şah Îsmayîl li berîka xwe dinêre, di berîka xwe de mewîjan dibîne. Şah Îsmayîl ji pîrê dipirse:

"Ev çi ye?" Pîrê dibêje:

"Wateya van mewîjan ew e ku tu hêj zarokî here nava zarokan mewîjên xwe bixwe. Tu ne ew kesî ku mirov li te ewle bibe!"

Şah Îsmayîl pir xemgîn dibe. Wê rojê dimîne sibetirê radibe, ew û Ereb tev têne ber devê kumbetê. Ji hespên xwe peya dibin û bi pêgermokan digerîne. Ereb dibêje:

"Ez ê herim, tu bimîne di cih de, îcar ranezê; hêviya wê bisekine."

Ereb destê xwe dide destê wî ji bo xewa wî neyê Kêrekî davêje gurçika destê wi birîndar dike û dibêje:

"Tu li vir di halê xwe de be heta Gulîzer tê." Ereb diçe. Şah Îsmayîl bi pêgermokan digere. Ji destê wî xwin tê û dişewite. Dêhna xwe dideyê, paytona Gulîzerê hat. Gulîzer ji paytonê peya dibe, ber bi Şah Îsmayîl ve diçe û hev û di hembêz dikin. Bi kêf, henek û laqirdî bi hev û din re dileyîzin. Şah Îsmayîl jê dipirse:

"Em ê çawa bikin?" Gulîzer:

"Wele ew pîra ku hatiye ba min, heft kurên wê pîrê hene. Bila ew heft kurên pîrê alikariya te bikin. Tu mêvanê wanî. Ji wan re bibêje dê sibê Gulîzerê siwar bikin û bibin. Divê ku hûn sibê di nava dewatê de çareyekê ji me re bibînin. Çare jî ewe, bila kurên pîrê werin min birevînin."

Ew ji hev û du vediqetin. Şah Îsmayîl tê malê û dibêje:

"Pîrê heft kurên te hene. Tu wan her heft kurên xwe bînî, bila alikariya me bikin. Ew li ku derê bin divê tu wan bînî vê derê." Pîrê diçe pey kurên xwe. Kurên xwe tîne. Dema ku çavên kurên pîrê bi mala pîrê dikevin dibinin ku mala pîrê wekî qesrekê ye. Li lihêf û doşekên wê dinêrin şaş dimînin û dibêjin:

"Dayê ev cin bûn, perî bûn rastî te hatine. Ev kî ne mala te wiha xweş kirine?" Dibêje:

"Kurên min, Xwedê daye, ew jî rastî min hatine. De îcar hûn jî alîkariya wan bikin. Lewre wan her du mirovan em ji jiyana belengaziyê rizgar kirin. Xwedê ew rastî me anîne, em zengîn bûne. Dilê vî mirovî di Gulîzera qîza Mîrê ereban de heye. Sibê dewata wê ye. Divê hûn alîkariya wan bikin da ku ew Gulîzerê birevînin û bîbin."

Wextê ku sibê def û zirnê lêdan, dewatê dest pê kir. Dewatî siwar dibin û hespên xwe didine cilîdê. Siwarên hespan, zorê li hev dikin hin siwar rêkêbên hespên xwe diqetînin; hin ji wan lixavên hespên xwe diqetînin. Kurên pîrê hin ji wan li defê û hin ji wan jî li zirnê dixin. Ew jî li hespan siwar dibin rex hev dikevin, têne rex Gulîzerê. Wê ji ser pişta hespê wê hildidin û datînin ser pişta hespê xwe. Panî didine

hespan. Gulîzerê tînin didne Şah Îsmayîl. Ew jî Gulîzerê hildide û direvîne. Siwar dikevin pey Îsmayîl û Erebê riya wan dibirin. Ew her du dikevin nava siwaran, wisa dikin yê silamet ew bû, yê ku ji mala xwe nehatiba. Ew Gulîzerê xilas dikin, derdikevin, tinin mala Erebê, Qederê heftiyekê li mala Erebê dimînin. Paşê radibin zêr û zibarên Erebê çi hebûne bar dikin. siwar dibin, têne bajarê bavê Şah Îsmayîl. Agahiyê didinê ku Şah Îsmayîl vegeriyaye tê malê. Dibêjin:

"Padişah xweş be kurê te hat, Bi xwe re Erebek û jinek jî aniye."

Padişah radibe def û zirnan dide kutanê, bi ber kurê xwe ve diçe. Tînin peya dikin. Padişah diçe cem wan. Li Gulîzerê dinêre ku pesnê rindaya wê nayê deyin. Dilê Padişahî bi dilekî na bi hezar dilî dikeve Gulîzerê, Wextê ku dilê wî dikeve bûka wî, gazî celadê xwe dike û dibêje:

"Hûn dê Şah Îsmayîl bibin bikujin. Kincên wî bi xwîne vedin ji min re bînin."

Celad tên Şah Îsmayîlî digrin û dibin cihekî. Celadek dike ku bikuje, yê din dibêje, em ê wî çima bikujin? Ma çi zirara wi gihîştiye me? Em ê wî berdin, tiştekş din bikujin û kincên wî bi xwîna wî vedin.

Celadê din dibêje; na ku em wî nekujin, padişah dê me bikuje.

Di dawiyê de tînin nakujin, lê her du çavên wî derdixin. Çavekî dixin berika rastê, yê din ji dixin berîka çepê. Kincên wi di xwînê de sor dikin, ji bavê wî re dibin. Padişah dêhna xwe didê, ku kincên kurê wî bi xwînî danê. Dizivire dibêje leşkerê xwe:

"Herin Gulîzerê hildin, ji min re binin! Leşker wextê diçin ku Gulîzerê binin Ereb dibêje:

"Jina ku ez bidim we tune. Hûn nikarin bê şer kesê ji vir bibin."

Ereb û leşkerên padişahî dikevin herbê. Xwîn davêje kapê hespan. Ereb tê ji Gulîzerê re dibêje:

"İro du rojin ez di herbê de me. Şah Îsmayîl diyar nake. Ez nizanim dibe ku bavê wî ew kuştibe. Heke ku tiştek nehatiba serê wî, wî hinde ez tenê nedihîştim. Sibê disa ji bo ku leşkerên padişahî te bibin dê bên vê derê. Em ê dîsa bikevine şêr."

Bû sibe ew dîsa ketin herbê. Bila ew di herbê de bimînin, em e werine ser Şah Îsmayîl. Şah Îsmayîl wextekî guh lê bû ku dengê du kewokan li ser darekê nêzîkî wî tê.

Yekê ji ya din re got:

"Dayê ev kê ye li ber koka darê?" Got:

"Ew Şah Îsmayîl e. Bavê wî lê hatiye xezebê. Çav berdaye bûka xwe ya jina wî. Ji ber vê yekê kurê xwe aniye vî halî. Celadan çavên wi derxistine. Yê rastê xistine berîka çepê; yê çepê ji xistine berîka rastê. Heke ku ew di xewê de be bila here xewnê, heke ku hişyar be bila guh bide me. Bila here ser wê kaniya jêrê. Her du çavên xwe bişo; em ê van her du perikên çen- gên xwe danine vê derê; bila perikên me li çavên xwe bide; her du çavan ji bêrikên xwe derxîne bixe cihê wan, dê ji nû ve çavên wî ronî bibin."

Şah Îsmayîl radibe diçe ser kaniyê. Kortikên her du çavên xwe dişo, wisa kelecanî dibe ku cihê her du çavên xwe şaş dike. Çavê rastê dixe cihê yê çepê; çavê çepê dixe cihê yê rastê. Çavên wî disa mîna berê ronî dibin.

Paşê radibe tê bajarê bavê xwe. Diçe dikanekê ji dikandarî re dibêje:

"Hin kincan bide min. Lê niha pereyên min nîn in. Ku tu hin kincan bidî min, ez ê sibê yan di du sibe perên te bidim te. Ne girîng e kinc çawa bin bila wisa bin ." Xwediyê dikanê dibêje:

"Bila, dibe. Ez ê kincan bidime te. Tu kîngê heqê min tînî tu dizanî."

Tîne kinc û çekan didê. Şah Îsmayîl kinc û çekan hildide û diçe. Sibetirê dikeve şer. Ew û Ereb li hemberi leşkerên Padişahî şer dikin. Tam heft rojan şer dikin. Herî dawî dest davêje kembera Erebê. Wê hildide dide ser zînê hespê xwe. Careke din radike datîne ser zînê wê. Çav didin padişahî dibêjin:

"Erebê leşkerekî te hilda danî ser zînê xwe, paşê dîsa hilda danî ser zînê wî. Padişah di- bêje:

"Em ê wî çawa bibînin. Ew leşkerê me bûye yan yekî biyaniyan bûye." Dibêjin:

"Ew li cem dikandarekî dimîne. Dikandar jî mirovekî kal e. Ew esker bûye kurê wî. Ew jî bûye bavê wî." Padişah dibê:

"Herin cem kalî. Çi dixwaze bidinê. Sirf bila kurê wî bikeve herba Erebê. Ew dê bikaribe jinikê jê bistîne ji min re bîne." Ew diçin dikanê dibêjin:

"Padişahî em şandine. Gotiye bila kurê xwe bişîne herba Erebê. Ew çi bixwaze ez ê bidimê. Em dikin nakin bi Erebê nikarin. Dibe ku ew tiştekî bîne serê Erebê." Şah Îsmayîl jî li wê derê bûye. Ji wan re dibêje:

"Herin ji padişahî re bibêjin bila ji min hinde dikan, hinde mal, hinde zêr, hespekî, şûr û mertalekî, tîr û kewanekî bişîne."

Mebesta Şah Îsmayîl ew bû ku şûr û mertala xwe û kincên xwe ji wan bistîne. Ew çi dixwaze tînin didinê. Dibe sibe dîsa dikeve şer. Ew radibe dest davêje Erebê hildide û datine ser zînê hespê xwe, paşê dîsa datîne ser zînê hespê wê. Rojekê leşkeran kom dike û dibêje:

"Gelî leşeran! Niha guhê xwe vekin rind li min guhdarî bikin! Ez Şah Îsmayîl im, kurê padişahî me. Bavê min çav berdaye jina min. Ev Ereb ji jin e. Ew jî jina min e. Ez loma wê nakujim. Hûn alikariya min bikin. Ez ê bavê xwe bikujim û derkevim ser textê wî. Ku tiştek bi min were bavê min dê bi bûka xwe re bizewice. Hûn hemû ji tevî vê gunehê ne.

Leşker jê bawer dikin. Şah Îsmayîl şerî dide rawestandin. Hin leşker li aliyê Padişahî disekinin. Ew jî ji şer direvin. Şah Îsmayîl û leşker rûdinin û bi hev re planekê çêdikin.

Hin leşker diçin ji padişahî re dibêjin:

"Ereb kuştin, jina Şah Îsmayîl ji te re tînin."

Defa hewarê dikutin padişah tê meydana şer. Şah Îsmayîl Erebê jî agahdar dike. Gava ku padişah tê Şah Îsmayîl, lêdixe serê wî jê dike. Leşker jî alîkariya wî dikin. Diçin Gulîzerê ji tînin. Şah Îsmayîlî dikin padişah. Çil roj, çil şevan dikin dewat.

Ew çûn mirazê xwe şa bûn, hûn jî herin bi mirazê xwe şa bibin.

### 3.2.2. Mîrza Mihemed Çavreşa Qîza Mîrê Ereban

Çîrvanokbêj: Selahadin Kostekçî, Erdiş-2001.

Carekê Padişahek hebû. Sê kurên wî hebûn. Navê kurekî Mehmûd, yekî Ehmed û yekî jî Mîrza Miheme bû. Dibêjin, ew mezin bûn, bûne xort. Rojekê Wezîr û Wîzaretên wî jê re gotin:

"Padişahê me! Kurên te behsa zewacê dikin." Padişah dibêje: "Baş e, heke ku ew behsa zewacê dikin, em jî dê çavên xwe lê bigerînin, sê qîzên mîna wan û babetê wan ji wan re bibînin û bixwazin. Hûn jî dizanin ku kurên min xort in, ezeb in, gihîştî ne, kelebenga zewaca wan e, divê ku bizewicin. Lê divê ku bavên qîzan jî hemkûf û babetên me bin. Bila kurên min herin mirovekî wisa bibînin ku sê qîzên wî hebin, qîzên wî babetên kurên min bînû bavê qîzan jî babetê min be."

Ew radibin di nava xwe de dişêwirin û dibêjin, ka de kî here kî neçe, herî dawî biryara xwe didin ku dê her sê kurên wî herin ji xwe re qîzên ku ew pe re bizewicin bibînin. Her sê bira xwe pêk tînin û li hespên xwe siwar dibin û diçin. Diçin li çol û çolistanan digerin û li gund û bajaran digerin. (De îcar bajarên berê wekî bajarên niha bi waliyan nedihatin îdare kirin. Wî çaxî her bajarek padişahekî îdare dikir. Ji waliyên wê demê re padişah digotin.) Her sê bira di dawiyê de diçin mala padişahekî. Dêhna xwe didenê ku sê qizên padişahî hene. Ew li qîzikan, li rabûn û rûniştina wan dinêrin û wan dipejirînin. Her sê bira ya xwe dikin yek û biryara xwe didin. Ya mezin ji lawê mezin re, ya navîn ji lawê navîn re, ya piçûk jî, ji Mîrza Miheme re diniqînin. Pitşre ji wir vedigerin tên û dibêjin cemaeta bavê xwe,

em çûn me sê qîzikên babetê xwe ditin û em vegeriyan û hatin. Bila bavê me here ji me re erêkirina wan deyne.

Bavê xortan wezîrên xwe ji bo xwestina qîzikan pêk tîne û dişîne mala bave qîzikan. Ji ber ku kes li bajar nemabû Mîrza Miheme li malê li cem bavê xwe dimîne. Jixwe her du bi- rayên din nehiştibûn ku Mîrza Miheme bi wan re here. Mîrza Miheme li wî alî û li vî ali tê û diçe, dike û nake tebatî lê nayê û dibêje:

"Birayê min ê mezin dê here cem destgirtiya xwe, birayê min ê din jî dê here cem destgirtiya xwe, lê kê dê here cem destgirtiya min. Dê destgirtiya min bi tenê bimîne. Heke ku wiha ye, nexwe ez ji dê herim cem destgirtiya xwe. Li vê derê çi dibe bila bibe, ji min re ne xem e."

Ew jî bi pey wan dikeve û diçe. Wezîr û bavê wan dema ku bûkên xwe dibînin ew jî qîzikan dipejirînin. Radibin qelenên wan çi bû didin, rihala wan çi hebû pêk tînin û dikevin ser riya xwe tên.

De îcar çirok e, bi ziman tê gotin, zû bi ser hev tê. Dibêjin, wexta ku diçin du def û du zirne bi xwe re dibin. Dahulvan û zirnevan lê dixin, leşker jî bi hespan cirîdê dikin. Kêf û şa- hiyê dikin dileyîzin. Paşê, bi rê dikevin û tên. Rê dûr bûye. Nikaribûn di rojekê diduyan de bên. Ew wê rojê heta êvarê tên di rê de li ciheki dihêwirin. Konên xwe vedigirin, wê şevê li wir radikevin û sibê hêj zû radibin. Ew bi rabûna xwe re ecêbeke neditî dibînin. Dibînin ku ziha- yekî xwe li dora konê destgirtiya Mîrza Miheme alandiye, leşker dikin û nakin nikarin xwe nêzikî zihayî bikin. Leşker gurz û şûr û hemû çekên di destên xwe de bi kar tînin, lê dîsa jî pê nikarin. Zihayî çawa ku bi dêla xwe lêdide leşker bi yek derbê dida aliyekî. Lawên Padişah bi wezîrên bavê xwe ve dikin nakin tu çareyî jê re nabînin.

Mîrza Miheme jî di wê demê de xwe digihîne wan. Her du birayên Mîrza Miheme jê re dibêjin:

"Lawo ma me roja roj ji te re negotibû tu li ber malê li cem bavê me bimîne? Tu çima hatî? Me kir û nekir me bi te nekarî. Wexta ku tu hatî dê êdî ya bê serê te dê bikişînî! Tu dê li wir bisekinî heta tu bimirî."

Ew radibin bi rê dikevin, tên. Padişah dema ku li wan dinêre birayê wan ê piçûk di gel wan nabîne ji wan dipirse û dibêje:

"Kuro! Ka Mîrza Miheme çima ne bi we re ye?" Dibêijn:

"Zihayek hat xwe li dora konê wî aland heta me xwe gihandê zihayî ew jî û bûka te ya biçûk jî her du daqurtandin, Padişah dibêje:

"Hey na!"

Dibêjin:

"Belê" Bila ew nîvşahî nîvşînî dewata xwe bikin.

Em werin ser Mîrza Miheme. Ka dê ew belengaz ji destê wi zihayî çawa rizgar bibe. Mîrza Miheme radibe ser xwe ji zihayi re dibêje:

"Ya heywanê Xwedê! Ka sûc û gunehên min çi ne? Tu vê zilmê vê heqaretê li min dikî? Ez xortekî ezep û bê miraz im. Birayên min destgirtiyên xwe birin û çûn, dewata xwe kirin, ka bibêje tu ji min çi dixwazî? Heke ku tu dê me bixwî were me bixwe, heke ku tu dê me nexwî çima tu nahêlî em herin?"

Ziha dibêje:

"Mîrza Miheme! Daxwazeke min ji te heye, lewma ez derketime ser riya te. Ku tu daxwaza min bînî cih ezê destgirtiya te berdim. Lê heke ku tu neynî cih ez ne destgirtiya te ber didim û nejî te ber didim."

Mîrza Miheme dibêje:

"Daxwaza te çi ye?" Dibêje:

"Daxwaza min ew e ku tu dê herî Çavreşa Qîza Mîrê Ereban bînî. Ez bûme aşiqê wê. Heke ku tu bînî ez ê destgirtiya te bidim te. Heke ku tu neynî ez ê destgirtiya te bikujim. Lê ez baş dizanim heke ku tu bixwazî, tu dê bikaribî bînî." Mîrza Miheme dibêje:

"Çavreş li ku derê ye? Ez ê herim wê ji ku derê bibînim û bînim?" Ziha dibêje:

"Ew li Erebistanê ye, qîza Mîre Ereban e."

Mîrza Miheme dibêje:

"Ku ez herim dê destgirtiya min çawa be, de li rex kê bimîne?"

"Dê li rex min bimîne. Ma tu bi min ne ewlewyî, ku wê biparêzim. Ew qas leşkerên bavê te hatine ser min bi min nekarîn. Min bi yek carê bi dêla xwe didane ser hev û didan aliyekî. Cihê ku ez lê bim kî dikare zirarê bide destgirtiya te? Lê binêre ez ji te mêrxastir tu kesî nabînim, lê tu bi xwe jî nikarî destgirtiya xwe ji min bistînî? Wekî ku tu nikarî ji min bistînî dê kesekî din çawa bikare ji min bistîne? " Mîrza Miheme dibêje:

"De baş e."

Mîrza Miheme radibe bi rê dikeve û diçe. Pir diçe û hindik diçe rastê kaniyekê tê. Li ser kaniyê rûdine. Bi dilekî kul ava xwe vedixwe û dest, ser û çavê xwe dişo, li wir demekê radiweste û pal dide hinekê radizê. Piştre, ew bi dengekî ji xewê hişyar dibe. Dibêne ku luve luveke wisa kete gelî û tê tu dê bibêjî qey hêwirze ye.

Çi qas heywan hene ji ber direvin. Mişk bi aliyekî direvin, mar bi aliyekî ve direvin. Ew jî ji xwe re qulekê dibîne xwe tê de star dike û dibêje; gelo ev ajelên han ji çi direvin?

Qasekê disekine, dibîne ku ev dengê şêrekî ye. Lingekî şêr werimî ye bûye mîna meşkekî, pê ve dahelaye ji êşa lingê wî luve luva wî ye.

Mîrza Miheme lê dinêre ku ew heywan belengaz bûye, dilê wî pê dişewite û dibêje divê ez birîna wî der bikim. Şêr tê ser avê, av vedixwe, tê xwe li ber kenarê avê li cihekî dirêj dike. Mîrza Miheme xwe di çeperekî de mit dike. Tîra xwe dixe kevanê û dikişîne. Çawa tîrê berdide tîr diçe li werma pêyê wî dikeve bi aliyê din re derdikeve. Qîrîn ji şêr diçe û dibêje:

"Ew kî ye, ku ez wî bigirim, ez ê wî pirtî pirtî bikim!"

Qasekê dimîne birîna şêr hinekê rehet dibe, ew kêm û edab jê dikişe. Şêr radibe ser lingên xwe dibîne ku birîna wî mîna berê jan nade û dibêje, tu kî yî derkeve miraza xwe ji min bixwaze!

Îcar Mîrza Miheme derdikeve û dibêje:

"Ez im. Ez Mîrza Miheme me."

"Mîrza xwe bibêje. Mirazê te çi ye bixwaze!"

"Mîrza Miheme dibêje, tu heywanekî, piyên te werimîne, tijî kêm û edab bûne, te nikaribû kêma piyên xwe der bikî dê çawa miraza min hasil bikî?" Şêr dibêje:

"Tu bibêje ?" Ew dibêje:

"Şêrê min! Ez kure padişahekî me. Em sê bira ne. Em çûn, me ji xwe re sê qîzik dîtin. Bavê me mirov şandin ji me re erêkirina wan danîn. Dema ku em vegeriyan li cihekî hêwirîn, sibê ku em rabûn me dît ku zihayekî xwe li dora konê min alandiye. Me kir û nekir me pê nekarî. Birayên min mirovên bavê min hemûyan dev ji min berdan, ez di destê zihayî de hiştim û çûn. Min jî gote zihayî tu çi ji min dixwazî? Wî got, ez bûme aşiqê Çavreşa Qîza Mîrê ereban, tu dê herî ji min re Çavreşa Qîza Mîre Ereban bînî. Heke tu neçî we ji min re neynî, ez destgirtiya te nadime te. Niha miraza min ew e ku ez herim Çavreşa Qîza Mîrê ereban bînim û destgirtiya xwe ji destê zihayî rizgar bikim."

Şer dibêje:

"Qurban! Waleh ez nikarim herim ji te re qîza mîrê ereban bînim. Ew qas hêza min tune. Lê tu van her du mûyên min ji birûyên min bikişîne, bila ew her du li cem te bin. Dema ku tu ketî tengaviyekê wan her duyan li hev bixe ez li ku derê bim, ez ê li ber te amade bibim."

Mîrza Miheme her du mûyên wî dikişîne, dixe nava pînekê dixe nava hebana xwe, xatirê xwe jê dixwaze û bi rê dikeve û diçe. Pir diçe hindik diçe, îcar hewa germ e, germa nîvro ye mirov ji german diqele. Ew jî diweste tê li ser avekê disekine, hinek avê vedixwe, dest, ser û çavên xwe, ser û piyên xwe dişo hênik dibe û bêhna xwe hinekê vedide. Li ser avê darek hebûye, diçe li binê darê qasekê rûdine. Dareke din jî li aliyê din yê avê hebûye, ew dar ji darên din mezintir û kevnaretir bûye. Li ser wê dara bilind hêlîna teyrekê hebûye. Ew qederekê lê dinêre paşê, xwe dirêj dike afrinciya xwe dikişîne serê xwe datîne li wê derê bi xew ve diçe.

Wextekê radibe dibîne ku qîrînî bi çûçikên teyrê ketiye. Serê xwe bilind dike dibîne ku zihayekî mezin xwe li darê alandiye nêzikê çûçikan bûye, hindik maye ku  wan bixwe.

Mîrza Miheme radibe ser xwe û dibêje:

"Kuro! Ev ziha ji me belengazan çi dixwazin? Yek destgirtiya min digire yek çûçikan dixwe."

Radibe şûrê xwe dikişîne ziha qet qet dike qetên wî datîne ser hev. Çûçik jî çûçikên teyrê enqayê bûne. Teyr wexta ku tê çav bi wan qetên zihayî dikev dîn û har dibe. Lê dinêre ku mirovek li wê derê razaye. Hema êrîşê ser dike û dibêje:

"Niha ez ê vî bilind bikim û li erdê bixim pirtikên wî di devê wî re derînim!"

Dema ku teyr wisa dibêje qîrîn ji çûçikan diçe û dibêjin:

"Dayê tu çi dikî? Ku ew nebûya zihayî dê em hemû bixwarina. Ew zihayê ku te ji me re digot ev ew ziha ye."

Teyr qederekê radiweste li Mîrza Miheme dinêre, ku tavê dayê, şirkên xwehê bi ser rûyê wî têne xwarê. Teyr diçe baskên xwe raserê wî vedike li ser serê wî wekî konekî jê re dike sih. Mîrza Miheme wextekî çavên xwe vedike, dibîne ku teyrê enqa li raserê wî sekiniye û baskên xwe dihejîne. Dema ku teyrê zanî Mîrza Miheme hişyar bûye jê re dibêje:

"Ey mirovê qenc! Bixwaze miraza te çi ye?"

Mîrza Miheme dibje:

"Ka min ji te re çi kiriye ku ez ji te miraza xwe bixwazim?" Dibêje:

"Îsal heft sal in ku ez li vê derê me, çûçikan derdixim, ev ziha tê çûçikên min dixwe. Te ez ji vî derdî rizgar kirim. Bixwaze miraza xwe!" Mirza Miheme dibêje:

"Ka heywana Xwedê tu ji derdê xwe re çareyekê nabînî, tu dê ji derdê min re çawa bibî derman?" Dibêje:

"Tu bixwaze te çi ji derdê min e?"

Mirza Miheme dibêje:

"Ez kurê padişahekî me, em sê bira ne, em çûn me ji xwe re sê qîzik dîtin. Bavê me mirovên xwe şandin ji me re xwestin. Dema ku em vegeriyan li cihekî hêwirîn, sibê ku em rabûn me dît ku zihayekî xwe li dora konê min alandiye. Me kir û nekir me pê nekarî. Birayên min, mirovên bavê min hemûyan dev ji min berdan û çûn, ez di destê zihayî de hiştim. Min gote zihayî; tu çi ji min dixazî? Got, tu dê herî ji min re Çavreşa Qîza Mîrê Ereban bînî. Ez bûme aşiqê wê. Heke ku tu neçî wê ji min re neynî ez destgirtiya te nadime te? Niha miraza min ew e ku ez herim Çavreşa Qîza Mîrê Ereban bînim û destgirtiya xwe ji destê zihayî rizgar bikim." Dibêje:

"Ew hêza min nin e ku biçim qîza mîrê ereban bînim. Ev karekî giran e. Lê tu van her du perikên min hilde rex xwe, dema ku tu ketî tengaviyekê van her du perîkên min li hev bixe ez ê li ber te amade bibim. Wê demê çi ji min bê ez ê ji te re bikim." Mîrza Miheme dibêje:

"De baş e."

Mîrza Miheme wan du perikan hildide rex xwe û bi rê dikeve. Ew bi salix û saluxan diçe û diçe nêzîkê bajarê mîrê ereban dibe. Ew li cihekî li ser coyeke avê re derbast dibe. Li xwe dizîvire dike ku avekê li ser wê coyê vexwe. Dema ku avê vedixwe tiştek bala wî dikişîne. Dibîne ku moristang dikin ku ji avê derbas bibin, lê nikarin. Ew mîna keriyekî pezî li hev kom bûne. Kîjan xwe davêje avê bi avê de diçe. Hinekî li wan dinêre paşê radibe darekê dirêjî ser coyê dike. Moristang xwe bi wê

darê ve digirin û derbasî aliyê din dibin. Piştî derbastbûnê komeke moristangan tên li ber Mîrza Miheme disekinin, yek ji wan dibêje:

"Xortê çeleng! Miraza xwe bixwaze!" Mîrza Miheme dibêje:

"Hey heywanên Xwede! Hûn hêj nikarin ji vê coya avê derbas bibin. Hûn ê miraza min çawa hasil bikin?" Dibêjin:

"Tu miraza xwe bixwaze, ku em bikaribin em ê bînin ci. Ku me nikarî ma em ê çawa bikin!" Mîrza Miheme dibêje:

"Heke ku tu îlimzanînê dixwazî ez ê miraza xwe ji te re bibêjim. Ez kurê padişahekî me, em sê bira ne, em çûn me ji xwe re sê qîzik dîtin. Bavê me mirovên xwe şandin ew ji me re xwestin. Dema ku em vegeriyan li cihekî hêwirîn, sibê ku em rabûn me dit ku zihayekî xwe li dora konê min alandiye. Me kir û nekir me pê nekarî. Birayên min û mirovên bavê min hemû- yan dev ji min berdan û çûn. Ez di destê zihyî de hiştim. Min gote zihayî tu çi ji min dixwazî? Got; tu dê herî ji min re Çavreşa Qîza Mîrê Ereban bînî. Ez bûme aşiqê wê. Heke tu neçî wê ji min re neynî ez destgirtiya te nadim te? Niha miraza min ew e ku ez herim Çavreşa Qîza Mîrê Ereban bînim û destgirtiya xwe ji deste zihayî rizgar bikim." Moristang jê re dibêjin:

"Em nikarim herin Çavresê i te re bînin. Le em dikarim tiştekî din bikin. Yek ji wan dibeje:

"Ha ji te re van her du perikên min, gava ku tu ketî tengasiyê wan li hev bixe, em ê li ber te amade bibin. Em hemû moristang dê di bin emrê te de bin." Dibêje:

"De baş e."

Mirza Miheme perikên ku moristangan dayê hildide û dixe nava pînekî û dixe berîka xwe bi rê dikeve û diçe. Diçe derdikeve perê bajêrekî. Li perê bajêr maleke mîna koxekê dibîne, diçe ber deriyê malê, li derî dide. Ji koxikî pîrejinek derdikeve û dibêje:

"Dayikê tu mêvanan xwedî dikî?" Dibêje:

"Ser çavan ser seran, ez çima te xwedî nekim? Mêvan mêvanên Xwedê ne. Ji mêvanan re cî heye, lê ji hespê mêvan re cihê min nîn e." Dibêje:

"De ha ji te re van her du zêran bigire û ji hespî re jî cihekî çêke." Pîrê dîz û kilozên xwe li hev û du dide davêje derê malê. Cihê wî li qoncikê xanî datîne û dibêje:

"Mêvanê ezîz! Tu ji ku derê tê û tu dê bi ku ve herî?" Dibêje:

"Pîredayê! Ez kurê padişahekî me, em sê bira ne, em çûn me ji xwe re sê qîzik ditin. Bavê me mirovên xwe şandin ji me re xwestin. Dema ku em vegeriyan li cihekî hêwirîn, sibê ku em rabûn me dit ku zihayekî xwe li dora konê min alandiye. Me kir û nekir pê nekarî. Birayên min û mirovên bavê min hemûyan dev ji min berdan, ez di destê zihayî de hiştim û çûn. Min gote zihayî tu çi ji min çi dixwazî? Got; tu dê herî ji min re Çavreşa Qîza Mîrê Ereban bînî. Ez bûme aşiqê wê. Heke tu neçî wê ji min re neynî ez destgirtiya te nadime te? Niha ez hatime ku Çavreşa Qîza Mîrê Ereban bibim û destgirtiya xwe ji destê zihayî rizgar bikim." Dibêje:

"Ê lawo! Çavreş îsal bû heft sal ku dêwê Perende lê bûye aşiq. Ew di nava xaniyekî mifriq û pola de tê ragirtin. Ne dêw ne tu û ne jî kesekî din nikare wê ji wê derê derîne." Dibêje:

"Dayîka min a delal! Ha ji te re van deh zêrên han, here wê ji min re bixwaze."

Pîrê dike û nake xwe jê rizgar nake. Sibetirê radibe diçe dîwana padişahî û li ser textê xazgîniyan rûdine û dibêje:

"Padşahê min! Ez hatime Çavreşa qîza te ji Mîrza Mihemeyê kurê xwe re bixwazim." Padişah dibêje:

"Pîrê belengazê, hêsirê! Tu dê çawa qîza min ji kurê xwe re bixwazî? Dêwê Perende lê bûye aşiq, em newêrin ku derxine derve!" Pîre dibêje:

"De tu qelenê xwe bixwaze tu dê çi bi dêwî bikî? Bila dêw bê bûka min ji min bistîne." Dibêje:

"Şertên min hene."

"Bibêje."

"Ha! Ku tu şertên min qebûl bikî ez ê bidim te. Şertê min ê yekem ew e, li pêşya malê zeviyeke min heye. Ez ê pêncî teneke genim li ser zeviyê bireşînim, divê heta sibê ku tu û kurê xwe wî genimî ber hev bikin. Îcar hûn çawa kom dikin êdî hûn dizanin. Heke heta sibê we ew hemû berhev kir jixwe we ber hev kir, heke ku we ber hev nekir, ez ê te ji kurê te ji bavêjim ber şêrê xwe dê ew we pirtik pirtik bike û dê pirtikên we bi çavê we re bîne der. Ku tu vî şertê min bînî cî, were îcar ez ê şertekî din bibêjime te."

"Padişahê min! Ez ê herim malê werim ji we re bibêjim."

Pîrê radibe bi lez tê malê û dibêje:

"Kurê min! Padişah dibêje şertên min hene, ku hûn bibêjin erê û bînine cih, ez ê qîza xwe bidime kurê te. Ku hûn nebêjin erê herin di mala xwe de rûnin." Mîrza Miheme dibêje:

"Şertên padişahî çi ne ?" Pîrê dibêje:

"Padişah dibêje li pêşiya malê zeviyeke min heye, ez ê pêncî teneke genim li zeviyê bireşînim ji êvarê heta sibê tu û kurê xwe wî berhev bikin. Êdi hûn çawa kom dikin hûn dizanin. Heke heta sibê bê kêmasî hat berhevkirin jixwe hat berhevkirin, heke ku nehate berhevkirin, ez ê te ji kurê te ji bavêjim ber şêrê xwe, ew dê we pirtik pirtik bike û pirtikên we bi çavên we re bîne der. Ku tu vî şertê min bînî cih, îcar ez ê şertê xwe yê din bibêjim we. Îcar ev tişt jî nakeve hişê mirovan. De kurê min! Tu kes dikare pêncî teneke genim di nava şevekê de berhev bike? Mirov bibe moristang jî dîsa mirov nikare hinde genim di şevekê de berhev bike."

Çawa ku pîrê behsa moristangan dike, her du perikên moristangan tê bîra wî. Ji pîrê destûrê dixwaze derdikeve derê malê. Perikên moristangan li hev dixe, dibîne ku hema tiştek mîna agirekî ji wir de tê. De perikên moristangan hene difirin. Ew moristangên ku bi Mîrza Miheme re xeber dabûn, tên li ber wî disekinin û dibêjin:

"Mîrza Miheme emir bike! Tu çi ferman dikî bibêje. Em li ber fermana te amade ne." Mîrza Miheme dibêje:

"Padişah dê li filan zeviyê genim bireşîne. Hûn dikarin di şevekê de berhev bikin." Dibêjin:

"Erê, em dikarin di saetekê de berhev bikin."

Mirza Miheme dibêje:

"De ka pîrê zû here şertên wî qebûl bike û were."

Pîrê diçe şertên wî qebûl dike. Ew jî radibin genim direşînine zeviyê û dibêjin, de îcar kom bikin. Pîrê dibêje:

"Hûn herin malên xwe karê we bi me neketiye em ê êvarê heta sibê berhev bikin. Em naxwazin ku kes li me binihêre. Dibêjin:

"De hûn dizanin. Her çi be dê ev genim heta sibê were berhevkirin. Ku neyê berhevkirin hûn dizanin ka dê çawa bibe."

Dibe êvar Mîrza Miheme ferman dide morîstangan. Moristang jî bi lez û bez di nava saetekê de hemû berhev dikin, datînine ser hev.

Ew genimê biyanî jî berhev dikin datînine ser hev. Wexta ku sibê padişah û şandeya wî tên dêhna xwe didinê ku genim hemû hatiya berhevkirin. Hemû şaş dimînin. Kesî guman nedikir ku wisa genim di şevekê de were berhevkirin. Padişah dibêje:

"Temam şertê te li min ket."

Pîrê diçe dibêje padişahê min îcar şertê xwe yê din bibêje." Dibėje:

"Şertê din jî ew e, ku şêrekî min heye, tu jî dê şêrekî bînî werî, heke ku ew şêrê te karî şerê min, şêrtê te yê duduyan jî dê li min bikeve. Lê heke ku we pêk neanî, ez ê we jî bavêjim ber şêrî."

Pîrê diçe gotina padişahî ji Mîrza Miheme dibêje. Mîrza Miheme şêrê xwe tîne bîra xwe. Radibe her du mûyên wî li hev dide şêr hema tê li ber disekine û dibêje:

"Mîrza Miheme ferman bike û bibêje? Tu çi dibêjî û çi dixwazî, ez li ber te sekinîme." Dibêje:

"Şêrekî padişahî heye, Tu dê pê re şer şer bikî." Dibêje:

"Hay hay ku ez herim fenayê jî min soz daye te." Dibêje:

"Şêrê min! Şêrê wî qelew e, şerker e, lê ku tu wî nekujî hem ez hem pîrê hem jî tu em ê hemû bên kuştin. Jiyana me hemûyan di destên te de ye." Dibêje:

"Baş e."

Meydanvan radibin meydanê paqij dikin, gazî gelê bajêr dikin, gel kom dikin, padişah şêrê xwe berdide Mîrza Miheme jî şêrê xwe berdide. Her du şêr di meydana şer de diçin hev. Çend çaran hev dibin û tînin. Şêrê padişahî dikeve erdê. Wexta ku dikeve erdê, şêrê Mîrza Miheme dev davêje qirikê dişidîne û ziwa dike. Şêrê padişahî li wê meydanê dikuje. Padişah dibêje:

"Temam ev şertê te jî li min ket."

Pîrê jê dipirse: "Padişahê min! Îcar bibêje ka şertê te yi sêyemîn çi ye?" Dibêje:

"Şertê min ê sêyemîn jî ew e, ku teyrekî min heye. Îcar tu jî dê teyrekî bînî, berdî teyrê min, ku teyrê te ew nekuşt, ez ê serê we bidim lêxistin."

Pîrê tê vî şertê padişahî jî ji Mîrza Miheme re dibêje.

Mîrza Miheme dibêje baş e.

Bîra teyrê ser kaniyê tê hişê Mîrza Mihemed. Ew hema radibe baskên teyrê li hev dixe, dibîne ku teyr li pêşiya wî amade bûye û teyr dibêjiyê:

"De miraza xwe bixwaze! Mîrza Miheme Dibêje:

"Padişah dibêje teyrekî bîne, bila bi teyrê min re şer bike.

Hemû tişt maye li ser te. Ku tu bi ser bikevî em ê bigihîjin miraza xwe. Lê heke ku tu bi ser nekevî hem tu dê herî, hem ez hem jî pîredayika min, dê bên kuştin. Jixwe destgirtiya min jî dê ji zihayî re bimîne."

Dibe sibe. Padişah teyrê xwe, Mîrza Miheme ji ya xwe tînin meydanê. Meydanvan jî meydanê paqij û amade dikin. Gelê bajêr jî hemû kom dibe. Teyra Mîrza Miheme çawa digihîje teyrê padişahî bi qirika wî digire davêje erdê ziwa dike." Padişah dibêje:

"Erê şertên te li min ketin. Îcar ez ê Çavreşê bidim te. Çavreş ji ber tirsa Dêwê Perende nikare dernekeve ber derî. Çawa ku Çavreş derkeve, dêw ku bêhna wê hilde dê were wê bibe. Îcar min bawer kir ku ew dê ku ev şertên han pêk hanîne teqez dê wê jî biparêze."

Mîrza Miheme diçe Çavreşê hildide, derdikeve derveyî bajêr. Dêw bêhna Çavreşê hildide. Çawa dike, xwe bi aliyekî re digihîne wan. Dêw Mîrza Miheme digire, davêje çar- mixê. Di ser de hesin dikute. Mîrza Miheme di çarmixê de dihêle û Çavreşê hildide berê xwe dide girava navbera heft behran û dibêje girava heftbehranê tu li ku yî ez hatime te.

Mîrza Miheme qederekî li wê derê dimîne. Di wê navê re karwanek tê di wê derê re derbast dibe. Mîrza Miheme êdî ji hal ketiye. Karwanî dibihîzin ku nale nalek ji wir tê. Diçin dêhna xwe didinê ku va ye xortek avêtine çarmixê. Radibin wî ji çarmixê derdixin, nan û avê didinê, çar-pênc rojan xwedî dikin heta tê ser hişê xwe û ji wan re dibêje:

"Hal meselên min wiha ne. Ez kurê padişahekî me, em sê bira ne, em çûn me ji xwe re sê qîzik ditin. Bavê me mirovên xwe şandin ji me re xwestin. Dema ku em vegeriyan li cihekî hêwirîn, sibê ku em rabûn me dit ku zihayekî xwe li dora konê min alandiye. Me kir û nekir me pê nikarî. Birayên min û mirovên bavê min hemûyan dev ji min berdan û ez di destê zihayî de hiştim û çûn. Min jî gote zihayî tu ji min çi dixwazî? Got tu dê herî ji min re Çavresa Qîza Mîrê Ereban bînî. Ez bûme aşiqê wê. Heke ku tu neçi wê ji min re neynî ez destgirtiya te nadime te? Ez jî hatim

min sê şertên pa- dişahî anîn cîh. Min Çavreşa Qîza Mîrê Ereban anî. Min dê jê re biriba û destgirtiya xwe ji destê zihayî rizgar bikira, lê çawa ku ez û Çavreş hatin vir, îcar vê carê jî Dêwê Perende hat Çavreş ji min stand, ez jî xistime vî halî."

Karwanî dibêjin:

"Ew Dêwê Heftserî yê ku tu dibêji di girava heftbehranê de ye. Tenê teyrekî enqa dê bikaribe xwe bigihîne wê derê."

Çawa ku karwanî vê gotinê dibêjin, teyr dikeve bîra wî. Mîrza Miheme ji karwaniyan dûr dikeve her du baskên teyrî li hev dixe. Teyr tê li hemberî wî disekine û dibêje:

"Miraza te çi ye xortê delal?".

Mîrza Miheme miraza xwe ji wî re jî dibêje. Teyr dibêje:

"Were li ser pişta min siwar bibe, em ê herin."

Mîrza Miheme li pişta teyrî siwar dibe û diçin. Dêw Çavreşê dibe dixe nava bîrekê. Di binê bîre de ji xwe re şikeftekê çêdike. Kes ji tirsa wî nikare di ber bîrê re here. Dêw jî dema ku razaba sê rojan ji xewê ranedibû. Ku biçûya cihekî ji heft rojan nedihate hundirê şikefta xwe.

Mîrza Miheme dema ku tê girava navbera heft behran diçe wê bîra ku dêw tê de ye. Mîrza Miheme tê ber devê bîrê gazî Çavreşê dike û dibêje Çavreşê tu li ku derê yi?"

Deng diçe Çavreşê. Çavreş bersiva wî dide û dibêje:

"Ez di binê bîrê de me."

Mîrza Miheme jê dipirse:

"Dew ji li cem te ye ?"

Dibêje:

"Na, ew niha çûye, heta heft rojan nayê."

Mîrza Miheme dibêje:

"Em ê çawa jê rizgar bibin?" Dibêje:

"Waleh Mîrza Miheme em bi şer pê nikarin. Em ê qesta rihê wî bikin. Ka rihê wî li ku ye, em ê bibînin, bigirn û bikujin û jê rizgar bibin."

Mîrza Miheme dibêje:

"Baş e."

Mîrza Miheme diçe ji xwe re cihekî çêdike.

Xwe wisa vedişêre ku dêw bêhna wî jî hilnede.

Wextê hatina dêwî nêzik dibe. Piştî demeke kin, dêw tê diçe rex Çavreşê. Çavreş jê re dibêje:

"Wextê ku tu diçî heft rojan nayê, ez li vê derê tenê dimînim. Bêhna min dernayê, ez dibihecim. Heke ku tu diçî here, lê ez dixwazim digel riha te bimînim. Ka ji kerema xwe re, ji min re cihê riha xwe bibêje da ku ez jî bi wê re sa bibim heta ku tu ji gera xwe vedigerî tê malê."

Dêw dibêje:

“A riha min di nava vî qoçî de ye."

Çavreş qoçî dixemiline. Wextê ku dêw li Çavreşê dinêre dibe tiqe tiqa wi dikene û di- bêje:

"Hêêêê! Li aqilê jinan binêre. Rih dê çawa bikeve nava qoçî."

Çavreş dibêje:

"Tu çima min dixapînî? Ya rast çi ye ji min re bibêje, da ku ez bi riha te şa bibim. Diyar e ku tu ji min hez nakî. Ku te ji min hez bikira te dê cihê riha xwe ji min re bigota."

Dêw dibêje:

"Riha min di nava vî gêziyî de ye!"

Çavreş îcar vê carê jî tîne gêzî dixemilîne. Dîsa dêw pê dikene. Ji Çavreşê re dibêje ez guman dikim ku tu dê min bilêbînî; tu dê karekî bînî serê min. Çavreş dibêje:

"Pey mala te! Ez jin û hurmet di nava vê girava navbera heft behran de, ma ez dikarim çi bînim serê te?!"

Dêw xwe ranagire, di dawiyê de cihê riha xwe jê re dibêje.

Dibêje:

"Riha min di zikê gakûviyekî de ye. Ew jî li serê vî çiyayî ye. Ne hêza mirovan digihîjê ku bigrin, ne jî kes dikare di ser de here. Ne ez dikarim bînim ne jî tu dikarî!"

Çavreş jê dipirse û dibêjê,

"Îcar gakûviyekî çawa ye?"

Dibêje:

"Ew gakûvî di nava birek çêlekan de ye. Ew her roja înê têne ser filan kaniyê avê vedixwin. Wextê ku têne wê derê bêhn bi bêhn avê vedixwin. Ew gakûvî ku di dawiyê de tê wexta ku avê vedixwe serê xwe bilind dike li esmanan dinêre. Pir bi hêz e. Riha min di hundirê qutîkê de ye û di hundirê wî gakûvî de ye."

Çavreş dibêje:

"Baş e, ez ê çawa herim gakûvî bibînim? Qutiyê çawa derînim û çawa pê şad bibim? Hema ya herî baş dîsa gêzî ye. Ez ê wî bixemilînim û pê şa bibim."

Dêw dibêje:

"De tu dizanî.

Dêw radizê. Êdî sê rojan ranabe. Çavreş radibe giyayekî bi bêhn datîne ber difîna wî û diçe Mîrza Miheme dibîne.

Hemû tiştan jê re dibêje. Careke din dizvire tê li ber serê dêwî disekine.

Mîrza Miheme diçe xwe li ser wê kaniye vedişêre. Bala xwe didê ku dêwî çawa gotiye wisa gakûvî têne ser kaniyê. Di dawiya wan de gakûviyek tê avê vedixwe, serê xwe bilind dike. Lê pir bi tirs e.

Mîrza Miheme Tîra xwe hêdîka dixe kevana xwe û dikişîne, çawa berdide lê dixe û gakûviyî werdigerine erdê. Gakûvi çawa dikeve nahêle rabe ser xwe. Hema kêrê davêje zikê gakûvî diqelêşe û qutiyê jê derdixe. Dêw bi xwe dihise û radibe ser xwe û dibêje:

"Rihê min kete destê mirovekî."

Çavreş dibêje:

"Ne lo! Kî dikare here riha te bibîne, derxine û bigire destê xwe. Ma te bi xwe nedigot, kes nikare here riha min ji zikê gakûvî derxîne? De razê, razê tiştekî wisa nabe."

Qîzik nahêle dêw rabe, tiştekî bike. Çawa ku Mîrza Miheme qutiyê vedike, lê dinêre ku di qutiyê de sê çûçik hene. Ew hema serê du liban dipiçine, dimîne yek. Riha dêwi tê dikeve qefesa sînga wî. Dêw êdi tenê dikare li ser piyan bisekine, gazî dike û dibêje

"Mirovo!"

Mîrza Miheme dibêje:

"Ha!"

Dibêje:

"Wê çûçikê nekuje, ez dê Çavreşê bidim te wê hilde ji xwe re bibe. Ez êdî li pey we nakevim."

Mîrza Miheme dibêje:

"Nexwe Çavreşê derxîne ser devê bîrê!"

Dêw wexta ku Çavreşê derdixe ser devê bîrê Çavreş rizgar dibe. Mîrza Miheme hema serê çûçika din jî diqetîne. Dêw werdigere dikeve binê bîrê.

Mîrza Miheme dibêje:

"Cavreşê rabe! Em ji Dêwê Perende rizgar bûn. Em rabin herin ji destê zihayî jî dest- girtiya min rizgar bikin."

Mîrza Miheme disa her du baskan li hey dide, teyrê enka tê li ber wan datîne. Her du li ser siwar dibin, berê xwe didine welatê xwe û tên. Teyr wan tîne li cem destgirtiya wî û zihayî datîne. Ew diçin ku li zihayî binêrin. Lê ew li wir tu zihan nabînin. Lê dinêrin ku di hundirê konî de du jinên mîna du kewên gozel runiştîhe. Ew her di jin, yek je destgirtiya wî bû, ya din ji ziha bû. Ziha bûye jinikek, bûye hevala destgirtiya wî.

Mîrza Miheme dibêje:

"Ka ziha bi ku de çûye?"

Jinik dibêje:

“Ziha ez im."

Mîrza Miheme dibêje:

Çawa tu yî?"

Dibêje:

"Belê ez im. Min xwe xistibû dilqê zihayekî. Min dizanîbû ku Çavreş ji ber tirsa Dêwê Perende ketiye hepsê, nikare derkeve derê malê. Min xwest ku tu herî wê, ji wî halî rizgar bikî. Ku tu nebûya tu kesî nedikarî here wê rizgar bike. Niha ez rizgar bûme û ew jî rizgar bûye. Hem destgirtiya te, hem ez, hem jî Çavreşa Qîza

Mîrê Ereban, em her sê jî ji te re ne, em her sê jî jinên te ne. Tu êdî çawa dikî tu dizanî."

Mîrza Miheme tiştekî nabêje, dêhna xwe didê ku her sê jî ji hev bedewtir in. Radibe her sê jinan hildide berê xwe dide bajarê bavê xwe. Tê dikeve nava bajêr. Agahî digihîje bavê. Jê re dibêjin

"Mîrza Miheme hatiye sê jin jî pê re ne."

Bavê Mîrza Miheme tê pêşiya wan. Çawa çavê wî bi jinan dikeve aqilê wî ji serê wî diçe. Destên xwe bi stûyê kurê xwe re dibe.

Wan hildide dibe qesrê. Kur û bav bi hev şa dibin. Ew heta nîvê şevê bi hev re sohbetê dikin, paşê Mîrza Miheme radibe jinên xwe dide rex xwe û diçine mala xwe. Ew çûn bi mirazê xwe şabûn. Hûn jî herin bi mirazê xwe şa bibin.

### 3.2.3. Gulê û Sîno

Ji ber dirêjbûna çîrvanokê me nikaribû ev çîrvanok li vir bida.

### 3.2.4. Keçelokê Aqil

Keçelokek hebû, rokê xewn dît, çû cem padşê, go:

-Padşayî sax be, min xewn dîtîye.

Go: -De bêje.

Keçelok go: -Yê mîna te çi ne, ku ez te ra bêjim. (Çimkî jê ra nego: xêr be).

-Kuro, go, vîya bigirin ji topraxa min derxin.

Keçelok ji şeherê wî derket, çû cem padşakî dinê.

Wextekê çû dîwana wî padşayî, go:

-Padşayî sax be, min xewnek dîye.

Ewî jî go: -Bêje.

Keçelok wî ra jî got: -Yê mîna te çi ne, te ra bêjim.

-Kuro, go, milê wî bigirin bavêne zîndanê.

Keçelok zîndanê da ma. Padşakî dinê gilî şand ser vî padşayî, evî keçelok girtîye. Go: "Gilîkî min heye, ez ê te ra bêjim; hergê te tê derxist - ez ê qîza xwe bidim kurê te, hergê te tê dernexist, tu qîza xwe bide kurê min".

Padşê qebûl kir, go: "Bira be".

Padşahê dinê hesinekî burxe şand cem wî padşê keçelok daye girtinê. Orta wî hesinî qul bû. Go:

-Te ku têl qula wî ra derbaz kir, ez qîza xwe bidim kure te, derbaz nekir - tu qîza xwe bidî min.

Qulika wî hesinî usa xilo-xaro bû: çiqa merîyê bilyan hatin kirin, nekirin, nikaribûn têl tê ra bikirana. Cab dan qîza padşê, wekî îcadeke ha padşê şandîye ser bavê te, nikarin têl tê ra kin. Lê hema keçelok zîndanê da hey xwe ra zindan kola, kir mîna tonêla, hat derket bin polê diwana qîza padşê. Keçelok dîna xwe dayê, rastî bin polê otaxê ye. Pol jî qul kir, dîna xwe dayê da avayê qîza padşê ye. Qîza padşê dîna xwe dayê keçelokê bavê wê girtîye - ev e. Qîza padşê go:

Keçelok, tu ku ra hatî vira?

Go: -Wele ez xwe ra zîndanê da mijûl bûme, kolaye, hatime derketime vira. Go, qîza qenc, bidî xatirê xwedê, ez zîndanê da zef birçî dibim: ez ê royê bêm viraye, çi xarina ber te dimîne bidî min ez bixum, şevê jî ezê herim zîndanê.

Qiza padşê go: -Bira be, royê were xarina ber min dimîne, ez ê bidime te.

Wextekê ecêb dan qîza padşê, go: -Padşakî mayîn îcadek ha hatîye cem bavê te, bavê te tê dernaxe: şertê wî padşayî bavê te ket, wê te bide kurê wîya.

Qîza padşa medekirî xwe reş kir hat dîwana xwe. Keçelok hat dîwana qîza padşê xarinê bixwe, dîna xwe dayê da qîza padşê medekirî ye, digirî. Keçelok qiza padşê ra got:

-Qîza qenc, bidî xatirê xwedê, çira digirî?

Go: -Çi te ra ne, çi kul te ketîye, derdê min, kula min, tu dji min dixwezî?

Keçelok go: -Bêje, ez jî pê bihesim, çi heye?

Qîza padşê keçelok ra go:

-Padşakî dinê hesinekî awa şandîye: qula wê ne rast e. Dibê gere têl tê ra kî. Cimaeta bavê min jî çawa kirîye nikarbûye têl tê ra ke. Şertê wî padşayî bavê min ketiye, gere min bide kurê wî: dilê min jî kurê wî da tune, lema digirîm.

Keçelok got:

Ew cem min lap rihet e, karim te ra bêjim - têl tê ra kin.

Go: -De bêje, aqa xarin ez didim te, de bêje.

Keçelok qîzikê ra got:

-Rast e, tu nan, xarinê didî min - ez zef razime ji te, lê / hema şevê ciyê min zef sar e, ez serma dikim: îzinê bide, ez êvara bêm ser polê te xwe ra razêm, îja ez te ra bêjim.

Qîza padşê dil nekir, go:

-Kuro, tu çi dibêji, tu çawa bêyi otaxa min razêyî?

Go:-Tu nahêlî, ez jî navêjim.

Qîzikê dîna xwe dayê da keçelok nabêje, îzin da, go:

-Evarê were xwe ra jêrê, ser pola razê.

Keçelok go qiza padşe.

Go:-Sibê here bêje bavê xwe, bira kevçîkî tijî hingiv kin, bidin destê merîkî, ewî hesinî va bidin ser kola mûrîya, serê têl hingiv kin, mûrîyê têl bigirin, xwe-xwe qule ra derbaz kin.

Qîzik sibê çû bavê xwe ra usa gilî kir. Bavê wê go:

-Kê te ra gotiye?

Go: -Ez xwe-xwe duşurmîş bûm, bavo, usa hatîye ber hişê min.

Bavê usa kir, şand ser kola mûrîya, mûrîya serê têl girt, de şîrin bû, qulika hesin ra derbaz kir. Serê têl hev va girêda û şand padşê ra, go:

Şertê min te ket.

PadŞê dinê dîna xwe dayê - rast e, ewî tê derxistîye û cab dayê, got, go:

-Îcadek dinê jî heye, te ew jî tê derxist, ez ê qîza xwe bidim kurê te.

Du kêr şandin, go: -Binihêre kijan ya ostê ye, kijan ya şagirt e: herdu kêr jî mîna hev - çêkirina wan yek, hesinê wan cûrekî, û şand padşê ra.

Çiqa ostê baş hat, lê nihêrî, kir, ne kir tê dernexist, wekî kîjan ya ostê ye, kîjan ya şagirt e. Dîsa cab dan qîza padşê, wekî padşê dîsa du kêr şandine ji bavê te ra - herdu ji cûrekî, formekê, kes tê dernaxe - kîjan ya ostê ye, kîjan ya şêgirt e. Şertê wî padşayî bave te dikeve, bavê te te ê bide kurê padşê.

Qîzik disa rûnişt giriya. Keçelok êvarê hat, qîzik wê digirî.

-A, go, qîza qenc, îja çi te qewimîye, tu digirî?

-E, go, keçeloko, heramo, te kula min xêr e?

Keçelok got: -Qîza qenc, çi heye bêje, ez jî pê bihesim zef jî ez keçelok im.

Qîzikê got: -Padşê îcar kêr şandine, herdu jî formekî: çêkirina wan yek e, gotiye bira bêje - kîjan ya hostê ye, kîjan ya şagirt e. Çiqa cimaet hatîye, tê dernaxe.

Keçelok got: -Qîza padşê, ew lap rihet e: ez ê te ra bêjim here bavê xwe ra bêje.

Qîza padşê go: -De, keçelok can, de bêje. Tu êvara têyî vira ser pola jî radizêyî.

Keçelok got: -Rast e, ez ser pola radizêm, serma dikim tişkî bide bin min, ez jî serê xwe bidim ser binpiya te - îjar ez ê te ra bêjim, naxwezî navêjim.

Qîza padşê go: -Ê, Keçelok, hazir bê - ez tev te razêm. de?

Go: -Na, haşa ji min, wekî din - naxwezî: nabêjim.

Qîza padşê dîna xwe dayê boş e, go:

-Keçelok, bira be, go, de bêje.

Go: -Sbê here bavê xwe ra bêje, bira sîtile av bikeline herdu kêra bavêjê: ya ostê xas e-wê ser keve, ya şagirt xam e, wê têkeve binî.

Qîzikê sibê çû usa ji bavê xwe ra got. Padşê sîtile av keland, herdu kêr avîtinêda: ya ostê xas bû, ser ket. va sagirt xam bû - kete binî. Padşê ya şagirt şkênand, şand padşê dinê ra.

Padşê lê nihêrî rast tê derxistiye. Padşê go:

-Tişkî min din ji heye, wekî te tê derxist, ez ê îdî qîza xwe bidimê.

Du deve şandin, herdu rengekî: çapa wan yek. Go:"Bira binihêre, kîjan mak, kîjan kudik e". Deve hatin gihîştin padşê. Çiqa merîyê bilyan lê civîyan devê wan nihêrî, çapa wan nihêrî, tê dernexistin.

Padşa melûl bû, go:

-Şertê wî min ket.

Car dinê cab gihîşt qîza wî ra, wekî "padşê îja du deve şandine, bavê te bi gilîyê wîya te dernexistîye, îda wê te bide kurê wî padşayî". Keçik car din rûnişt girya. Keçelok derda hat, qîzik digirî.

Go: -Qîza qenc, çira digirî, îja çi te qewimîye?

Ê go, keçeloko, mxtaro, te kula min xêr e?

Keçelok gelekî ber qîzikê gerya, go: -Tu ji min ra bêje çi heye, çikanê tu çira digirî?

Keçelok gelekî ber lava kir, qîzikê jê ra got:

-Padşê du deve şandîye, çapa wan yek, rengê wan yek, gotiye: "bira tê derxe, kijan mak e, kîjan kudika wê ye" Cimaeta bavê min aqa hatîye tê dernaxe, kîjan mak e, kîjan kudik e.

Keçelok go: -Ew cem min lap rihet e, ez karim bêjim.

Qîzikê go: -Keçelok, de bêje, te çi go, min gilîyê te kir, de tu ji bêje.

Go: -Qîza padşê, rast e tu xarinê didî min, ez serê xwe didime ser binpiya te, lê ser min tişt tune: ez serma dikim, îzinê bide ez bêm piş te razêm, nîvê lihêfê bavêje ser min, îja ez ê te ra bêjim, hergê naxwezî - navêjim.

Qîzikê go: -Keçelok, hazir bê, ez bêm tev te razêm, de?

Go: -Na, qîza qenc, haşa ji te, ez serma dikim, lema dibêjim, ez ji gune me.

Qîzikê dîna xwe dayê, boş e, go:

-Bira şertê wî padşayî bavê min nekeve. -Boyna xîretê îzin da, hişt.

Go: -Bira be, keçelok, de bêje.

Keçelok go: -Here sibê bavê xwe ra bêje, bera du xortê rind deva siyar bin, her yekê alîkî bibin. Bira birçî bikin sê roja. Roja çara nîvro bên ber palata te bisekinin. Kudikê birçî bibe têkeve bin makê bimije: wê hingê jî zanibe kudik kîjan e, bera bjûyê kudikê jêke bişîne.

Qîzik çû usa bavê xwe ra got. Bavê wê jî usa kir, bi gilîyê qîza xwe û rast tê derxist. Bjûyê kudikê jê kir şand padşê ra. Padşa lê nihêrî rast tê derxistîye, go:

-Ma îcadek min din jî, ew jî tê derxist, ez ê karê bûka wî bikim, bira bê bibe here.

Du hesp şandin, ew jî usa rengekî, çapekê, emirê wan yek, go:

-Bera binihêre kîjan kihêl e, kîjan bergîr e.

Padşa dîsa cimaeta xwe va lê top bûn, beytarê hespa lê nihêrî tê dernexist, wekî kîjan kihêl e, kîjan bergîr. Cab gihîşt qiza padşê, wekî "îja du hesp şandine, bavê te tê dernaxe kîjan kihêl e, kîjan bergîr e, îdî gilîyê paşin e, şertê padşê dinê bavê te ket". Qîzik rûnişt xwe ra gelekî girîya, go: "Ev çi mene ne bavê min digere, wê min bibin bidinê".

Keçelok disa der da hat: dîna xwe dayê - qîzik zef ber xwe dikeve, go:

-Qîza qenc, îja çi te qewimîye, ku tu digirî?

Qizikê zanibû keçelokî bilyan e, jê ra rast got.

Keçelok -Qîza qenc, ew cem min lap rihet e.

-De, go, bêje! -E, go, qîza qenc, rast e lihêf ser min e, pişta te dûrî pişta min e, pişta min serma dike. Îzinê bide ez û tu pişta xwe bikutin pişta hev, îja ez ê te ra bêjim.

Qîzikê dîna xwe dayê boş e, îzin da.

Keçelok jê ra got: -Sbê here bêje bavê xwe, bira xamê gîhê nift bike, agir berdê, du xortê baş bera siyar bin her yekî hespekê siyar be, bajo nav wî xamê agirberdayî. Sol bzmarê wana lê sor bibin: bergîrê bimîne, khêlê bikişe derê. Bera dêla wan jê ke bişîne, îjar şertê wî lê keve.

Qîzik çû, usa ji bavê xwe ra got. Bavê wêya usa jî kir, tê derxist, şertê wî padşê dinê ket. Padşê dîna xwe dayê - rast tê derxistîye, cab da wî padşayî, go:

-Îda şertê te min ket, karê qîza xwe ez ê bikim, were bibe.

Ewî karê qîza xwe kir, her tişt hazir kir, cab da padşê, go:

-Were bûka xwe bibe. Padşê siyar hildan çû bûka xwe anî. Anî hat. Padşa duşurmîş bû, go: "Aqa îcad ewî şandin cem min, kesekî tê dernexist, ez ê gazî qîza xwe kim, çika wê çawa zanibû". Padşê gazî qîza xwe kir, jê pirsî, go:

-Rast min ra bêje, ew gilîyê me tê dernedixist, te çawa zanibû?

Go: -Bavo, ez xwe-xwe duşurmîş dibûm, şev dihat ber hişê min, min jî te ra digot.

Bavê jê ra got: -Rast min ra bêje, ew ne gilîyê te ne: dibêjî bêje, nabêjî ez ê serê te lêxim.

Qîzikê dîna xwe dayêda, wekî rast nabêje, wê serê wê lêxe, go:

Padşayî sax be, çi rast, rast e: ew keçelokê te girtibû, ewî dihat min ra digot - min jî te ra digot.

Padşê emir kir xulamê xwe ra, go, go:

-Herin sersûretê keçelok kur kin, bibin himamê himamîş kin, deste kincê baş lê kin, bînin dîwana min.

Xulama çû sersûretê keçelok kur kirin, bir himamê himamîş kirin, deste kincê baş lê kirin. Hat dîwana padşê, ber padşê temene bû. Padşê cî dayê rûnişt.

Padşê go: -Keçelok, ew gilîyê hana te gotin?

Go: -Belê, padşayî sax be!

Go: -Te çawa zanibû?

Keçelok ji padşê ra got:

-Padşayî sax be, min xewn dî.

Go: -Xêr be, bêje!

Keçelok go: -Te negota xêr be, dîsa min ne digot. Go, padşayî sax be, min xewn dî, ro milê minî rastê derket, çepê çû ava.

Padşa jê ra got: -Kuro, vir hada navê te dikim; Ûsiv, qiza xwe jî didim te, bûka min anîye, wê jî didim te, kurê min tune.

Keçelok rabû çû milê padşê, jê ra sê roja def dewat kir, herdu jinê wî danêda û çû cîyê xwe. Keçelok sibê rabû jinek wiya av dest kir, jinekê jî pêjgîr ber girt. Keçelok kenîya. Jinê wî jê ra gotin:

-Ûsiv, bêje, çika çira kenyayî?

Go: -Qîzê padşa, min xewn dî, ro alîkî milê min hilat, hîv jî milekî min hilat: yek ji we qîza rohlat e, yek we jî qîza padşê roava ye. Ew xewna min ket bîra min: yekê av dest min kir, yekê jî pêjgîr ber min girt, lema ji ez kenyam. Eva keremeke rind bû, min ra bû.

Îda ew e, ew çûn mirazê xwe şa bûn, em jî hatin.

### 3.2.5. Kurê Torçî û Mesî

Carekê yekî torçî hebû. Rojekê ew kurê xwe diçim hetanî ser êvarê tora xwe davêje ber'rê, tişt nakeve tora wî da. Ser êvarê dêna xwe didê, masî ketîye tora wî. Wexta derdixe, dêna xwe didê, ew mesî nizanî çi celebî bedew e. Divêje kurê xwe, divê:

- Lawo,- divê, - han devê torê bigre, ez ê herme dera hanêvê vêdro av bînim, ava temîz ji kanyê bînim, em tenê nav da bivin, herin padşa ra, bivin bal berde hewzê xwe, sax be, belkî risqekî dide me em îşev pê îdara xwe bikin. Emê vî mesî bivin bifroşin qîmetê wî wê çi be?

Kurê wî wêderê torê digre, torçîyê te vêdro xwe hildide diçe avê.

Ew mesî gede ra zar tê, divê:

-Xortê delal, -divê,- mi berde, ez herim.

Divê: -Ez çawa te berdim? -divê,- tor daye destê min, hêrsa bavê min hatîye, dêmek îro sivê da mesî neketîye tora wî da. Wê were mi bikuje, çawa te berdim?

-Xortê delal, -divê,- ez ê kêrî te bêm. Ê, hûn ê ji min çi bikin? Heger tu bona sonda xwe, bona gilîyê xwe divêjî, derê torê bigire, binê binê torê têla biqetîne, ez derkevim hertim, ez ê kêrî te bêm.

Ew wexta gede ra usa dibêjî, gede divê: "Canim, welle ez ê berdim". Usa torê diqetîne, mesî dikeve be rê. Gedê te derê torê girtîye, bavê te xudanê ser ra avîtîye tê, divê:

-Torê hilkişîne.

-Te çima mesî berdaye?

-Bavo, derê torê dest mi da bûye, mi bernedaye.

Gede digrî ber bi malê diçe. Torçîyê te bira dîsa tora xwe bavêje avê, gede diçe divêje diya xwe, divê:

-Dayê, vê sondê, vê adê, -divê,- ez nasenim.

-Lawo bona çi?

Divê: -Hal- hewalê bavê min ev e, ez ê serê xwe hildim, terkeserî dinê bim.

Dike-nake gede nasene. Jinik diçe maleke cînara tase ar distîne, tîne jê ra dike du nan, sê nana, didêda, divê:

-Lawo, tu nasenî, nasenî. Here, lê, -divê,- temba min, weyseta mi te ev e, here, heger rêwîk rastî te hatîye, tu bûyî heval, te dêna xwe dayê, xwe çerxa xwe da egle ke, ew rêwî hîvîya te sekinîye, hevaltîyê wî bike, wexta hîvya te nesekinî, hevaltîyê pê neke. Wekî hevalê te bû hevalê te, hûn çûn cîkî rûniştin, we nanê xwe xar, heger kerê zef daye destê te, kerê hindik daye destê xwe, hevaltiyê wî bike, heger kerê zef daye destê xwe, yê hindik daye destê te, hevaltîyê pê neke, wesyetea mi te ra, go, de here, xwedê şuxulê te ra be.

Gede da riya xwe çû. Zef çû, hindik çû, dêna xwe dayê, du hev, sê hevê cahil hatin gihîştine gede.

-Te ra oxir be.

-Oxira xêrê be.

-Tê ku da herî?

-Ez ê herime şeherê Rewanê, xwe ra herim hembalyê bikim, xwe ra herim bixevitim.

-Welle, emê jî herin. Em hevalê hev in. Erê welle heval heval, were em tev herin.

-Gede qederekî çû, ew gotina diya wî kete bîrê, xwe çarxê xwe da egle kir, dêna xwe dayê, ew xever didin, xwe ra derbaz bûn, qe guh nedane gede. Go: "welle, eva hevaltîyê min nakin." Qederekê çû dêna xwe dayê, rê divê du riya. Yek wê riya mayîn hate ser riya wî. Yekî kal. Selam da kalê:

-Welle, apo, - go, - ez jî dixwazim xwe ra herim, bivime hembal, xwe ra bixevitim.

-Erê lawo, were em tev herin, ew kalê tev çûn. gotina diya wî kete bîrê, xwe çarxa xwe da egle kir. Dêna xwe dayê kalê ser sekinî

-Apo, go,- lawo, çima siyar im, tu peya yî? Go, -çarxa xwe girêde, -go, - were em tev herin.

Çû avek kete pêşîyê.

-Lawo, - go, -em ser vê avê rûnin, parî nan bixun.

-Erê apo, - go,- em rûnin.

Ser wê avê rûniştin, nanê xwe derxisitin, kalê kerê mezin da destê wî, kerê biçûk da destê xwe.

-Apo,-go,- tu merikî mezin î, evî nanê han buxwe, ez cahil im, ev kerê hanê kêm bira mi ra be.

-Na, lawo, ez kal im, ancax vî kerî xilaz kim, -go,- tu buxwe.

"Welle, -go,- yê hevaltîyê min bike, ev e".

Çû, go:

-Rav emê herne nava şeher. Emê xwe ra pirtî ortax bigirin, kirê bidin, xwe ra tê da bimînin, ez ê axkatîyê bikim, tu jî xwe ra hemalyê bike, xwe ra bixevite, emê cîkî bimînin, xwe ra xwe xay kin.

Ew herdu usa wêderê man. Bla kalê te kaltîyê bikê, bila ew xortê te jî cahilitîyê xwe ra bike. Heger chal rojê tîne manatekî, kalê tîne deh manata. Gelek perê xwe dane hevdu, h,nekî halê wana xweş bû. Ça nola kur bav, usa he ra derbaz dikin. Gotê, go:

-Lawo, -go,- xwedê malka te ava ke, ez merikî hemal, -go,- axkat, -go,- qîza padşê,- go,- çi kêrî mi tê?

-Na, welle, ez ê hermê xazgînî,

Qîza padşê jî bi hezara çûne, serê hemya lêdane, kela cendeka maye, cendekek serî wê da girtin, kela seriya maye, serî wira girtin.

Kalê çû ser textê xazgînya qîzê, lingê xwe textê xazgînya da. Padşa ersewilê xwe şand go:

-Binihêrin ka ew kî ye ser textê xazgînya?

Çû hat, go:

-Padşa sax be, -go,- yekî kalî axkat e, -go,- ew ê axkatî digere- ew e.

Go: -Here gazîkê bira bê.

-Kalê,-go,- tu çima hatî ser textê xazgînya?

-Padşa sax be,  -go,- ez hatime bona kurê xwe.

-Kalê, go,-heger tu deyndar î ez deynê te bidim, eger xûndar î - xuna te bidim, heger birçî yî ez nan bidime te.

-Na hewce min tiştekî tine, de'wa wê derê dikim, wekî tu qîza xwe bidî kurê min.

-Baş, bidim, bidim, lê tu gune î, binêr ez ê serê kurê te lêxim ha. -Erê, padşa sax be, kurê min caav xwe neda - serê wî lêde.

Padşa gotê, go:

-Bira kurê te were here herama qîza min, qîza min pê ra xever daye, -go,- ez ê bidimê, -go,- wexta pê ra xever nedaye, -go,- ez ê serê wî lêdim.

-Erê.

Çû gotê kurê xwe, go:

-Lawo, -go,- rave here herama qîza padşê, qîza padşa, -go, -tenê otaxekê da ne, - go, - derî veke here hundur, go,-selamê bidê, xwexwa selama xwe vegre. Go: - Cî da rûnê, - go, -qawe heye, fîncana qawê bixwe, cxarekê xwe bikşîne, rave bêje colanê, bê "colan, ne mi merîfet te dî, ne jî xaye te dît". Kanê çi divêje?

Ew xortê te usa çû. Selam da, xwexwa selama xwe vegirt. Ew jî hemin du ersewil şandîye ber dêrî, guhê xwe bidine ser. Fîncana qawa xwe xar, cxwareke xwe kşand, ewî lingê xwe sola da pê kir, go:

-Colan, -go,- ne merîfet mi te dît, ne xaya te dît.

Colanê gotê, go:

-Xortê delal, -go,- kerem ke, - go,- serhatîke min heye te ra bêjim.

Cî da rûnişt, go:

-Xortê delal, - go, - wextekê, -go,- jinawezîr, jina qazî, jina gavîn carîya wan bû, tev hersê çûne nav baxê wezîrî torkirî da, xwe ra çûn seyramîş bin. Nava wî baxî da dilekcewahrek kete pêşya wana. Îşqa wê heye. Revîn, hersêk birevin, bighîjnê.

Herdê din gran bûn ne ghîştinê. Jina gavan berî hemûya gehîştê, dil hilda. Dest avîtnê.

Ewê go:- Min ra.

Ewê go:- Min ra.

Ewê go:- Min ra.

Go:- Canim, bihêlin. -go,- kîjan ji me, -go,- etla serê mêrê xwe kirîye,- go,- bira ew dil bighîjê.

Jina gavên go:

-Wekî usan e,- go,- min hildaye, berê dora min e.

Jina gavên çi kir? Mêrê wê gavan e. gotê mêrê xwe, go:

-Evdê xwedê,-go,- ez ê herim,-go,-cotê filankesê jê bixwezim, -go,- îro here zevînga me rake.

Cot lê xwest. Mêrê wê çû zevî rakir. Mesî hatin. Ewê pêşa mesî stand, derket çû nanê mêrê xwe bir çû, çû. Nanê mêrê xwe danî, mêrê wê ga berda.

Go:

-Bernede.

Go:-Ga bernede, -go,-gayê xelkê ne, te anî hatîye, -go,- ez ê maça cot bikim, serikî duda bajom, tu rûnî nanê xwe bixwe.

Ew rûnişt naê xwe xar, ew ê mesî hilda, usa pêşa xwe cot girtîye, devê xetê da davêje diçe hêtanî sêrî. careke din zivirî hat, mêrik rabû maça cot girt, ew rex ket, gotê mêrê xwe, go:

-Evdê xwedê mesî ber cotê me derkevin?

-Ya, keçê, kanê?

Ew zane çiqa mesî avîtîye. Berev dike, berev dike pêşa xwe.

Go: -Evdê Xwedê, -go,- were em serîkî din jî vegerin,- go,- belkî derdikeve.

Go: -na, evda xwedê,-go,- xwedê dide- bira xet nîvê bide,-go,- nade bira qet nede.

-Ê,-go,-bira be, welle.

Mesîyê xwe hilda derket çû, çû mal. Mêrikê te êvarê şa diçe. "Jina min savar çêke, mesîya bavêje ser savar, ez ê mesîya buxum." Jinikê çi kir? Tasa dew du nana va anî hate pêşyê. Gavan hêdî -hêdî lê nihêrî, dêna xwe dayê tişt tine. Gotê jinikê, go:

-Evda xwedê, axir ne,-go,- mesî te anî, ka mesî?. Te go:

"Ez ê çêkim".

-Kuro, -go,- mesîyê çi?

-Ça? Go: -Mesî ber xeta cor derketin.

-Kuro, -go,- mesî derkevin? Mesî, -go,- ava da heye, mesî nav xalyê derkevin?

Yekê jinikê, yeke mêrik, mêrik jinik kuta. Bû hewar hewra jinikê. Dêrî va derket revî.

-Bidine xatirê xwedê, -go,- werin mêrê min dîn bûye,- go,- min dikute.

Hatin.

-Kuro, çi ye, ç, be's e?

Go:- Ha divêje,-go, -mesî ber xeta cot derketine, te anîye hatîye, çima te ne petîye?

Xelkê dêna xwe dayê: "Çawa mesî nav xalyê derkevin?

Rastî jî eva dîn bûye". Anîn hatin stûnê va grêdan.

Go: -Stûnê grêdin, -go, wê mi bikuje îşev.

Stûnê girê didin, evana pişta xwe danê çûn. Mêrkê te dişurmîş bû:" Rastî jî, -go,- mesî mesî nav xalîyê da çima hebin?"

Go: -Evda xweda, -go,- were min berde.

Berda. hilda xwe xar. ma sivê. Sivê dîsa çû cotê yekî jê xwest. Rast çû cot. Êvarê hat. Jinikê savar çêkir, masî avête bin savarê, serê masî kêleka bolmê va derxist. Ew hat, dest çevê xwe şûşt, hat were ser nên. Erê, dêna xwe dayê, çev serê mesya ket, paşda revî,

Go:-Tu çima direvî?

Go:-Ewê ez lê tirsyame, ev in.

-Ê,-go,-evdê xwedê, min gotîye dilê çûçik, welle îro hatîye nava gun, mi kirîye, anîye hatîye.

Kul mala jinê keve. Erê.

Nanê xwe xar çû.

Go:-Welle mi serê mêrik xapand.

Jina wezîr go:

-Sivê dora min e.

Erê jina wezîr çi kir? Yekî dûrgar dît, go:

-Ez ê zêrekî bidime te, tu were nava baxê meyî torkîrî da sîngê vê darê-sipingdarê usa sandoxê tê derxî, derê wê qalkê wê derxî, wekî kifş neke, bidî navê. Tu usa bikevî tê da. Ez ê mêrê xwe bîneme nav baxê torkîrî, ez çi divêjime te, tu usa bike.

Anî hat usa çêki, kire darê da. Çû gote mêrê xwe, go:

-Evdê xwedê,- go,- were kêfa vê jinê usa dixweze,- go,-

-Erê welle, -go,- em herin.

Çûn gerîya, ber wê darê sekinîn. Jinikê go:

-Eva dara, -go,- dara me çiqa bilind e. Gelo , -go,- merî dikarine herne sêrî.

-Ê,-go, evda xwedê, çima nikarin, -go,- çiqê wê va hilkişim herme sêrî.

-Ê, -go,-kanê kanê hilkişe, kanê tu dikarî?

Mêrik hilkişîya çû serê darê, jinikê derê darê vekir, mêrik tê derket, jina wî şa bû. Eva jor da bikare axir ser sêr^,i were, gere paşope jor da were. Paşope hate erdê, ha-ha peya bû, jina xwe ra da çêra. Jinikê go:

-Evdê xwedê, derê baxê me yî torkirî,-go,-kiliîtkirî,-go,- kilît bal min e, me vekir. Kes tuneye. Go, -divê darê va du hev xuya nin. Bihêle ez hilkişime serê darê.

Jinik jî hilkişya, qederekî çû serê darê, gote mêrê xwe :

-Ha, ha te hato, lê ew jina filankesê çima bal te ye?

Jinik jor da peya bû hat:

Go: -evda xwedê,- go,- hilbet darê va du hev têne xuya.

Jinikê cava wana da, go:

-Welle min jî,-go,- eva qefeta hanê anî serê mêrê xwe.

Jina qazî got:

-Erê dora min e.

Jina qazî çû yekî qelat dît, gote delakda:

-Vî zêrê hanê,-go,- te ra,-got,- tu were bêje qazî, -go,- bêje bê "Me'ra min bide birîn". Wêderê mi çi kirîye, çi anîye sêrê wî, gere tu mêrê min hildî bêyî here bal wî. Evê delak şîret kir.

Go: -Ez hatime bal te, -go,- ez zewicîme,-go- gere tu me'ra min bibirî.

Go:-kerem ke rûnî,-go,- ez ê çaya xwe bixwum. cxwara xwe bikşînim,-go,- ez ê bibirim.

Jinikê ber xwe va dermana nehişyê avîte nav çay. wexta ew ser xwe da kir, nehiş ket. Temiz, delal rabû ser rûyê qazî ( ne qazî rûyê xwe dihêle) ser rûyê qazî temiz kur kir, girt kincê xwe ginciriyê, axkata qazî kir, qazî hilda nava şeher bir avîte kêlekêdai pişta xwe dayê derket hat.

Qazîyê te wexteke şevê serma tê bitevize, ew dermanê nehişyê berdêde berde, were ser hemdê xwe, dina xwe bidê, steyrik ezmana bûye len, nav vê xêne da avîtine. Kincê xwe, serê xwe, rûyê xwe nihêrî,go: "Radive sivê, êdî nikare were nava şeherê hanê, merî divîne him şerma xwe, h,m jî nizanî çi karî, çi hesavî hatîye serê wî. tê serê kûçê, serê şeher, cîk heye şorbê lê çê dikin, şorbê lê difroşin. Tê vêderê bal şorbeçî, divê:

-Qurba, xevat te lazim navei ez vira ber destê te bixevitim.

Divê: -Welle lazim divê, wekî tu herî şorbê çêkî, xevat heye. Erê welle divî şorbeçî.

Evê te ber destê şorbeçî dixevitehetanî meha wî temam divê, ser rûyê wî tê nola berê, hemîn wî halî da şorba wî çê dike, ew şorbe difroşe, ebûra wî ew şorbe ye.

Jina wî pê dihese, erê ser rûyê wî hatîye, hatîye bal şobeçî dixevite. jina wî dîsa ewî delakî hildide tîne datîne cîkî xewle. Kinca temîz xwe dike, hilbe xatûn e, diçe wêderê, ciyê şorbeçî rûdinê, divêje:

-Mi ra amane şorbê bînin.

Amana şorbe dide ber. Hildide dide ber wî da, divê:

-Tu buxwe, amaneke din mi ra bîne.

-Canim, -divê,- ez ser şorbê me, şorbê çê dikim. Buxwe ez çima nikarim?

-Na, na gere tu evê şorbê buxwî, amaneke din min ra bînî.

Ew diçe aman din bîne, ev digre dermanê davê nava şorbê, Ew dîsa wêderê nehiş dikeve. Ewê hildide dide pişta delak, hildide dive datîne cîyê wî. Dive diçe himamîş dike, kincê wî lê dike, cixara wî -serê cixarê dixe nîvî dikişîne, nîvî datine, îstegana wî datîne ser textê wî. Ewî dermanî dide ber pozê wî, wekî banzde ser xwe. Pozê xwe miz dide. Mêrik wêderê skinîye.

-Evdê xwedê,- divê,- eva mêrika sekinîye.

-Çawa, -go,- ev çî ye?

-Çi sivê ye, -go,- dihênijî, mala te ava be, -go,- mêrik sekinîye, hîvîya te ye. -go,-axir hatîye,-go,- me'ra wî bibirî.

Divê: -Canim, ez halekî ha hada bûm.

-Tu çi divêjî? Îja xwedê mala te xirav nekirî, hilbe xewn e te dîtîye.

Dive:-Wekî ku meriv rastî xever de - jina gavîn ra dikeve.

Colang divêje:-Jina wezîr ra dikeve.

Qîza padşê lingê colangê dixe, divê:

Jina gavên kirîye rojek. Jina wezîr kirîye çar sehet. Jina qazî nkiriye mehek çil şev. Jina qazî ra dikeve.

Divê: -De wekî usan e, helalya xwedê, tu jî mi ra dikevî. Radive pişta xwe didê, derdikeve diçe.

Eva ersewilê wî diçin divêjine padşê, divên:

-Xwedê mala te ava ke, lê îşev qîza te zimanekî usa derxistibû, serhatîke usa digo, zende serê me diket.

-Hey nave?

-Erê welle.

Dîsa seivê axkatê te diçe ser textê xazgînya. Lingê xwe text dixe.

-Kuro, -divê,- derkeve, ew kî ye?

Divê: -Dîsa axkat e hatîye.

Divê: -Gazîkinê bira bê.

-Axkat, tu gune yî, dest wêderê bikşîne, ez ê serête lêdim.

-Na, - divê,- padşa sax be, gere tu qîza xwe bidî kurê mi da.

Divê:- De here bêje kurê xwe, bira here. Qiza min pê ra xeverdaye- ez ê bidimêda.

Te divêjî kurê xwe ra, divê:

-Lawo, heger şevê dinê tu çûyî te selam da, selamê bide, xwexwe selama xwe vegre. Eger te şevê dinêîsteganek qawe xar- îşev duda bixwe. Te cixarek kişand- îşev duda bikşîne. Rave lingê xwe sola xwe- pê ke bêje "şemdan, ne min merîfet te dît, ne xaya te dît". Kanê çi divêje?

Eva usa vî karî diçe vî karî duxwe. wexta radive derkeve, şemdan divêje, divê:

-Xortê delal, -divê, kerem ke rûnî, -divê,- te ra serhatîkê bêjim.

Cîda rûdinî.

Divê: -Xortê delal, -divê- wextekê sê bira hebûn.

Qîzapeke wan hebû, dilê hersê bira jî ketibû wê qîzapê.

Ewî digo: -Mi ra.

Ewî digo: -Mi ra.

Ewî digo: -Mi ra.

Qîzapê dêna xwe dayê ser wê derê wê hev bikujin, gote kurapê xwe, go:

-Kurap, -go,- kîjanî we merîfeteke pak anî hat, kîjanî merîfet bû, pak bû, ez ê wî bistînim, -go,- çima ser gunê hev digrin.

Hersêk rabûn terkeserî dinê bûn, derketin çûne şeherekî. Herdu bira -yek çû steyrnasîyê hîn bû, yek jî çû doxtirîyê hîn bû. Birê wanî biçûk jî hema usa xwe ra çû gerîya, rojekê xevitî, yekê nexevitî, perê xevata wî jî çi bû, gi da teyrikekî, teyrikek stend. Hetanî wexta wana temam bû, hatine ser hevdu.

-Filankes, -go,- were îdî em ber bi mala xwe herin.

Go, ewî, go:- Min xandîye, xandina xwe temam kirîye - bûme doxtir.

Ewî jî go: -Min xwandîye steyrnasî, -go,- temam nas dikim.

Go:- Kuro, te çi kirîye?

Go: -Mi eva teyrika xwe ra stendîye.

Ê,-go,-mala te xirav neev, de rave, -go,- em bidinê riya xwe herin.

Dane riya xwe, gotina gotîya, wî çaxî ne maşîne hebûne, ne jî avdo hebûne, gerkê pîyê xwe werin. Divê riya deh-donzdeh roja. Qonaxekê hatin, gotine hevdu, gotine birê steyrnas, go:

-Carkê steyrka qîzapa me, -go,-hema rêtine -birêje.

Ewî steyrkê nihêrî, go:

-Welle steyrka qîzapa me, -go,- hema rêtine- birêje.

Ewî doxtir go:

-Ez çawa bikim, -go,- wekî ku nêzîk bûme, welle min ê derman bidayê, derman bikira, dibê tişt pê nehata.

Ewê xayê teyrê go:

-Ka derman bîne, -go,- çêke, -go,- perrê teyrkê mi da bidrû,-go,-bişîne.

-Weylê, -go,- xalî serê te bûyî, -go,-teyr e, -go,- berdin,-go,- teyrê bifire, teyrê çi bike?

Hevdû şêwirîn, go:

-De were em usa bikin.

Ewî doxtir sê dest derman nivîsî, kirê kaxezê da, perrê wî teyrikî va dirût, teyrik berda. De teyr e dikare nava sehetê da dinê bixemilîne.

Cimaet rûniştiye ser qîzikê, wekî qîzik ber mirinê ye bimire. Te dî teyr jor da -kulak bû, heger pencere bû, tê da çû-hat, li ser qîzikê danî. Evana go:

-Canim, eva teyrê hanê, -go,- teyrika beredaye çawa bû, -go,-eva kete vira, çima hat?

Hineka girt, got:

-Bigrin gune ye. hinek ziyar-mar pê şa bûn, dêna xwe danê tiştek nav qetê wî da birîye girêdaye. Vekirin, dêna xwe danê wa ser nivîsîye: "Eva derman, bidinêda. Flan dermanî bidinê, filan dermanî paşê bidinê, filan dermanî paşê bidinêda". ew hersê dermana danê emrê xwedê qîzik hat ser hemdê xwe. Evana hetanî deh-donzde roja hatin. Qîzik êpêce ji nexweşîya xwe qenc bû, evana hatin.

-Xortê delal, ev hersêk xortê hanê, ew qîzik,-go,- kîjanî ra dikeve?

Xort go: -Welle,-go,-doxtir ra dikeve,

Şemdan go: -Steteyrnasê ra dikeve.

Qîzik go:-Çima, -go,- steyrnasê ra dikeve, -go,-wekî ku steyrnasê rast e stêyr nas kirîye, doxtir jî, -go,- wekî ku steyrnas rast e stêyr nas kirîye, doxtir jî, -go,- dermanê wî heye, -go,- hetanî deh- donzde roja, wekî bigihîje cava qîzikê -qîzikê bimire. Go, -xayê teyr ra dikeve. Xayê teyr nava sehetê da, teyr anîye hatîye ew ew derman gîhandîye qîzikê, qîzik qenc bûye.

Gede çû mala te ava ke, -go,- qîza te îşev serhatîkê usa go,-go,-wê serhatîya serê te xaş tê.

Bavê gede gote gede, go:

-Çawa bû?

Go: -Bavo,-go,- çawa be,-go,- bide xatirê xwedê, -go,- herge dilê te heye tu min bidî kuştin, -go,- were vê derê vegere, -go,-çi ez xevitîme ew jî te ra

-Na queba, -go,- ez ê qîza padşê te ra bixwezim. Go,- şevke din jî, -go,- çi ez xevitîme ew jî te ra.

Dîsa çû ser textê xazgînîya, lingê xwe texte da.

Dîsa çû ser textê xazgînîya, lingê xwe texte da,

-Kuro, -go,- derkeve kî ye?

Go: Axkat e.

Go:- Bêjinê bira were.

-Axkat, -go,- tu çi dixwzî, tu gune yî,- go,-ez ê kurê te bikujim.

Go:-Na, padşa sax be, -go,- gerkê tu qîza xwe bidî kurê min.

-De here, -go,- bira kurê te îşev jî here. Heger qîza min pê ra xever daye -ez ê bidimê.

Kalê gote kurê xwe, go:

-Lawo, tu îşev diçî, şevê dine te du fîncan qawe xarîye -îşev sisya buxwe. Te şevê din xwe ra di cixare kişandîye- îşev sisya bikşîne. Rave solê lingê xwe xe, bêje colangê:

"Ne mi merîfet te dît, ne xaya te dît". Wê bêje te ra: "Xortê delal, kerem ke rûnê, te ra serhatîkê bêjim".

Eva usa karî diçe, radive derkeve, colang divêje, divê:

-Xortê delal, wextekî hebû sê merî, xwe ra çûne xevatê. hersê merî- yek dûrger bû, yek duaqebûl bû, yek jî terzî bû. Hersê çûn xwe ra şeherekî xevitîn hetanî wextê wana temam bû. Hersêk rabûn dane ser rê hatin. De ew wext e- pîyê xwe tên, ne wî çaxî maşne bye, ne avto bye, pîyê xwe tên. şev hatine nava mêşekî tarî ketine ser da, go:

Filankes, îşev nava vî mêşeyî da xirî,xalî dimînin, -go,- gere em hişyarêxwe bikin, gue heye, hirç heye, qaçax hene, miqatîyê xwe bikin. Em têne sirê, her yekê me du seheta- sê seheta hişyar bimîne, hetanî sivê me ron dive.

Hersêka wêderê şêwra xwe kir. Dûrger go:

-Dora min e,- go,- ez ê hişyar bimînim sê seheta, -go,- ez ê razêm, yekî din rave.

Dûrger hişyar ma, xwe ra agirê xwe dada, go:-"Ez ê mijûlya xwe çi bikim? Xewa min neê". Rabû darek anî hat, hacetê xwe derxist, ew dar temîz usa teraşt, çê kir ça şiklê meriya. Nola meriya danî wêderê sekinî. Wexta wî temam bû, gote terzî, go:

-Terzî, -go,- rave- go xewa min tê. Sê sehetê min temam bûne, tu jî rave sê seheta bisene.

Usa jî terzî rabû sekinî. Terzî çevê xwe miz da, dêna xwe dayê qeretû pêşberî wî sekinîye çawa merîkî tezî. Berê fikar lê kir, paşê duşurmîş bû, go:"Canim,-go,- eva dive dûrger çêkiribe". Paşda çû hat. Wexta gavê xwe girt cîda ket, dêna xwe dayê, go: "Erê, dûrger e çêkirîye, nola şiklê meriya çê kiriye danîye. Go,-welle xwedê baş e". Ew jî hema derziya xwe derxist, belgê dara anî hat dirût, go: "Ez ê deste kinc belgê dara bidrûn, lê kim, mijûlya xwe bikim, hetanî sê sehtê mi temam dive". Ew jî karî demek deste kinc anî ha lê kir. Sê sehetê wî temam bû, deyn dua qebûl kir, go:

-Rave,-go,- sê sehetê min temam bûye, - go,- rave hişyar be tu jî sê seheta bisene hetanî sive me ron dibe.

Dua qebûl rabû sekinî. Çevê xwe miz da, dêna xwe dayê , qeretûyê kulfetekê wê pêşberî wî sekinîye: "Canim,- go,- evê şevê çi kulfet". Berê fikar kir, paşê banzda çû. Wextê destê xwe dayê cîda ket. Dêna xwe dayê-eva dar e. "Welle,-go,- eva dûrger çê kirîye, eva kincê ha jî terzî lê kirîye. Welle ez ê jî gazî xwdê kim, dua bikim, belkî dive benî adem". Danî ber xwei ewî jî dua lê kir. Hetanî sive lê ron bû-bû qîzeka usa, merî hizmekar e dêna xwe bidê.

Rabû wêderê sekinî.

Go ewî: -Mi ra.

Ewî go: Mi ra

Ewî go: Mi ra

Yê din go: -Mi ra.

-Xortê delal, -go,- kê ra dikeve?

Colangê go:- Dûrger ra dike ve.

Qîzikê rabû pihînek colangê da, go: -Dûrger, -go,- dara çêkirîye -mijûlya xwe pê kirîye, -go,- terzî rabûye destek kinc, dirûye lê kirîye. Go, -dua qebûl ra dikeve. Wekî duayê wî qebûl nebûya, qîzik nebûya bende, -go, -wê çima li dinyayê biketa. Go, -dua qebûl ra dikeve.

-Ê,-go,- usan e, -go, -tu jî mi ra dikevî.

Ê, -go,- usan e,- go,-tu jî ra dikevî.

Rabû lingê xwe li sola da, derket çû. Bavê wî gotê, go:

-Lawo ça ne?

Go: -Welle hal- hewal ev e.

Ersewilê padşa jî çûn gotine padşa, go:

-Canim, -go,- qîza te, go, -zimanekî usa derxistîye, -go,-bawer bikî ew serhatî ew divêje her xwedê bizanbe.

De sivê dîsa çû ser textê xazgînîya, lingê xwe textê xazgînya da.

Go: -Gazîkirinê bira bê.

Gazî kirinê, çû.

Go:-Kalê

Go: Çi ye?

Go:-Ez tera divêjim, gerekê evê otaxa tu tê da dimînî

Hetanî ber mala min xalî-xalîçe raxist bin, sêsid siyar siyar bin, her siyarekê dêmek formekê be. Kincê wana formekê be. Hespê destekî boz be Kincê wana sipî be. Hespê destekî kumêt be, kincê wana forma wan be. Sêsid siyar gere bileyîzin. Ber derê te xalîçe werne raxistin hetanî ber derê min. Usa jî bax-baxçe hebin, wekî ku siyar bileyîzin, tu bûka xwe siya kî.

Hilda gote bavê:

-Bidî xatirê xwedê, -go,-erê,- -go,- evê ji ku bê, evê ku bê, evê kuderê bive? Hazir, -go,- tu dixwazî min bidî kuştin.

Go:-Lawo, razê hetanî sivê, ez ê binihêrim belkî xwedê tiştekî bike.

Sivê wexta rabû, dêna xwe dayê heft dest def û zurne tê lêdanê. Sêsid siyar direqisin, ber bi mala padşê çûn. Qîza padşê siyar kirin anîn peya kirin. Nav da bû şayî, kêf, eşq. Jê ra bazirgan danîn, çi lazim bû, qîza padşê bû, jê ra danîn. Bir çû ber mala xwe peya kir.

Hilda gote kurê xwe, go:

-Lawo me ra lazim e em ber bi warê xwe herin.

-Erê bavo,-go,- gere em herin.

Rabûn devê-delîlê xwe bazirganê xwe rê xistin. Bla ber bi yêra xwe herin. Hatin derketine wê yêrê. Usa jî soz daye gede:"Tu nêzikî qîzikê nevî hetanî em diçine yêra xwe". Derketine wê duriyanê. Herdu gehîştine hevdu. Wê duriyanê gote gede, go:

-Em bazirganê xwe daynin.

Bazirganê xwe danîn. Gote gede, go:

-Em vira gehîştine hevdu, me çi anîye, çi zêr bûye, çi zîv bûye, eva, bazirganê padşê çi me ra danîye, -go,- temam gere biratî hevdu cuda bikin. Nîvî min, nîvî te. Temam hev cuda kirin. Başqe kir, danî. Ma qîzik. Go:

-Qîzik maye. Bihêle,-go,- ez ê şûrekî ortê xim kerîkî min, kerekî te.

Go:-Bavo,-go,- apo, xwedê mala te ava ke,-go,- tê kuştin. Go, çima tu yê bikujî? An, -go,-bila mi ra be, an te ra be.

-Na,-go,-gere ez bikujim.

Wexta şûr anîne serê qîzikê, me'rek nav porê qîzikê pekya kete erdê. Lêda ew me'ra kuşt, go:

-Lawo, -go,- sêra wî qîzikê, -go,- ev me'r bû.

Qîzika wan re xeverda. Careke din gote gede go, go:

-Bazirgan jî, qîzik jî te helal be. Go, -tu zanî ez kê me? Ew mesîyê, wekî be'rê da te ez berdam, ew mesî me.

Ew çûn gehîştine mirazê xwe, hûn jî bigehîjne mirazê xwe.

### 3.2.6. Silêman û Bilbil

Gotina gotiyan, Silêman Pêxember xwedanê desthilatdariyeke gelekî xurt bûye. Hukmê wî, ne tenê li ser mirovan hebûye, her usa teyr û tilûrên li rûberî dinê jî, di bin bandora wî da bûne. Fermana Silêman Pêxember li ba teyran jî derbas dibû.

Tê gotinê, ku moreke Silêman Pêxember hebûye. Herçî gava ku wî mora xwe dizivirand, tevaya terewil, teyr û tilûr dihatin ber wî kom dibûn.

Navê jina Silêman Pêxember Belqîz bûye. Belqîz hurmeteke gelekî bedew bûye. Wê tenê ji xwe hiz dikir, gelekî bi naz û xwerazî bûye.

De jina Silêman Pêxember e, hema bi şev û roj bi xwe va mijûl bûye. Destê xwe nedida sar û germ, kar nedikir. Heta bêji, karê mala xwe jî nedikir. Cî û balgiyên wê, yên pembû hertim li erdê bûne.

Rojekê Belqîz di nava nivînê xwe da bûye. Kujekî doşega wê ketibûye ber kêleka wê, ew êşandibûye. Evar bûye, Silêman Pêxember hatiye malê. Belqîzê hinekî jî bihers, jê ra gotiye:

-Tu çito hukumdar î? Hukumdariya te serê te bixwe. Tu nikarî ji bo min doşegeke usa bidî avêtinê, ku kêlekên min neyêşîne. Îşev perekî wê ketibû bin kêleka min, ez êşandim.

Silêman Pêxember gelekî ji Belqîzê hez dikir. Ew ber jina xwe geriyaye, jê ragotiye:

- Delala min, tu qet ber xwe nekeve, ji xwe ra meke xem. Ez ê sibê doşegeke gorî dilê te bidim avêtinê. Bira tenê hêrsa te neyê, xemgîn nebî.

Belqîzê gotiye Silêman Pêxember:

Silêman, ez tiştekî din jî dixwazim. Divê tu min ra, ji pûrta bin piçenga teyran va doşegekê bidî avêtin, lê bi baskên wan va jî, ji min ra koşk û serayekê bidî ava kirinê.

Silêman Pêxember sibetirê hema bi şewaqa sibê ra rabûye, derketiye derva û mora xwe zivirandiye. Wê gavê tevaya teyr û tilûran hatine, li ber derê Silêman Pêxember civiyane, lê belê bilbil nehatiye.

Qijika belek hêdika çûye ba Silêman Pêxember; jê ra gotiye:

- Silêman Pêxember, tu dibînî tevaya teyr û tilûran hatine, xêncî bilbilê. De tu dibînî ha! Yeqîn bizane, ku ew qedrê te nagire, lema jî nehatiye.

Silêman Pêxember gelekî xemgîn bûye, ber xwe ketiye. Wî hema wê gavê qasid şandine pey bilbil. Wî gotiye teyrên qasid:

- Hûnê zûtirkî herin, wi bêxeletî bînin ba min. Cika çend serê wî hene, ku ew nehatiye.

Hema wê gavê qalmeqalm ketiye nava teyr û tilûran jî. Perçemek hêdîka hatiye nêzikî Silêman Pêxember; jê ragotiye:

- Ez benî, ez ketime ber bextê te. Çêlikên min di hêlîna min da bêxweyî ne, benda min in. Hema destûrê bide min, ez xwe birûçikînim, herim.

Silêman Pêxember erêniya xwe ji bo xwerûçikandina perçemekê daye. Perçemekê dest pê kiriye, hema zûtirkê, bi lez û bez xwe rûçikandiye û çûye gihîştiye çêlikên xwe.

Ji demekê şûnda, qasidên Silêman Pêxember bilbil girtine, anîne dîwana Silêman Pêxember. Silêman Pêxember gotiye bilbil:

Bilbil, ev kirina te çi ye? Tu dewa çi dikî? Tevaya teyr û tilûran hatin, li vira amade bûn. Tu nehatî. De hela ji min ra bêje, tu çi dixwazi?

Bilbil gotiye Silêman Pêxember:

-Silêman Pêxember sax be! Min hesawê mirî û zindiyan dikir. Ji ber vê ez hinekî derengî ketim.

Silêman ji bilbil pirsiye:

- De hela bêje min, mirî gelek bûn an zindî?

Bilbil gotiye wî:

-Padişahî sax be! Wele ya rastiyê bêjî, mirî gelek bûn. Lê belê di nava wan da yek heye, ku ew ne li ser miriyan, ne jî li ser zindiyan e.

Silêman ji bilbil pirsiye:

-Hela bêje min jî, gelo ew kî ye?

Bilbil jê ra gotiye:

-Silêman Pêxember sax be! Ew meriva hema cenabê we bi xwe ye, ez benî.

Hêrsa Silêman Pêxember hatiye. Wî qerfê xwe bi bilbil kiriye; jê ra gotiye:

-Hela tu li çavên wî binihêre?

Bilbil gotiye wî:

- Çavên min wek çavên şêra ne!

Silêman Pêxember gotiye wî:

- Hela serê wî binihêre?

Bilbil bersiva wî dayê, gotiye:

- Serê min wek serê mêra ye!

Silêman Pêxember gotiye wî:

- Hela tu paşya wî ya çîrt binihêre?

Bilbil gotiye Silêman Pêxember:

-Edeb Silêman edeb! Anegorî devê xwe bipeyîve. Tu hêrsa xwe di ser min da dirêjinî, çima ku min ji te ra got, tu ne li ser miriyan, ne jî li ser zindiyan î. Ca tu ji min ra bêje! Ma mirovê sax, yê ku li ser hişê xwe ye, van giliyana dike? Tu ketiyî ber hişê jina xwe, te gazî van teyr û tilûrên belengaz kiriye, ku ew teva xwe birûçikînin. Ca çi ye, ku tu dixwazî ji Belqîzê ra doşegekê bidî avêtinê, bi baskê wan va jî, ji bo Belqîzê koşkekê bidî avakirinê. Guh bide min, gelo ev çima nabe:

- Yek! Ma qet kê ditiye, kê bînaye, wekî bi per û baskên teyran va koşk û sera bêne çêkirinê? Ku bayek rabe, yê her perekî bibe welatekî, toz û dûmana koşk û serayê jî nayê xanê.

- Ya dudan jî, tu pêxemberê me yî. Tu ji xwedê natirsî, ku purta me gişka didî rûçikandinê. Ne sibê zivistan ê di ser me da bê. Em ê çewa debara xwe bikin?

Silêman Pêxember hinekî daye hişê xwe, li ser van gotinên bilbil fikiriye. Wî di dawiyê da gotiye:

- Gotinên bilbil rast in.

Silêman Pêxember hema wî lezî, tevaya teyr û tilûran belav kirinê. Tevaya wan çûne mal û hêlinên xwe. Tenê bilbil li wê derê maye. Ew hinekî nêzikî Silêman Pêxember hatiye, ji wî ra gotiye:

- Silêman Pêxember, tu gelekî dû gotinên jina xwe diçî. Ew jî naziyên xwe li te dike. Te ew daniye li ser cih û nivînên pembû, hê jî pê ne dilxwaş e. Ez ê şîretekê li te bikim, hela li ser Belqîzê biceribine. Cika ew ê rabe ser xwe, kar bike yan na? Çaxê ku tu îro çûyî ba wê, jê re bêje:

- Belqîz, tu keça Sixrî Çînî. Tu gelekî nazik û delalî hatiyî xweyikirinê. Lê niha ji tu bêkêf î, ne sax î. Ez ê jineke dinê jî bînim, bila alikariyê bide te. Hûn dikarin tevayî zarokan xweyî bikin, karê malê bikin. Wê gavê tu gelekî nawestî.

Çaxê ku Silêman Pêxember çûye malê, qala anîna hêwiyê kiriye. Belqîz hetanî sibê ranezaye, ketiye mitalan. Sibetirê hema berî şewaqa sibê Belqîz bi lez û bez ji nava cih û nivînan rabûye, dest bi karê xwe kiriye. Wê hetanî êvarê kar kiriye, êvarê jî hema li ser xesîlê razaye.

Evarê Silêman Pêxember hatiye malê, ditiye, ku Belqîz li ser xesîlê razaye. Silêman şaş û metel maye, jê ra gotiye:

- Ev çi hale Belqîz! Ne kêlekên te yê bêşin! Tu çewa li ser xesîlê razayî? Rabe ser xwe, here têkeve nava nivînên xwe!

Belqîzê gotiye wî:

- Silêman Pêxember, êdî ez usa saxlem bûme, ku wekî hema nû ji dawa diya xwe ketime. Tu dereke min nayêşe. Eş mêşa min jî nemaye.

Silêmîn Pêxember gotiye wê:

-Şikir ji xwedê ra, ku tu disa hatî ser xwe, wekî nû ji dayîk bûyî saxlem bûyî. De wekî usa ye, êdî ez jî jineka dinê naynim. Jixwe tê karê malê bikî, zara binêrî, xwarinê çêkî.

Sibetirê Silêman Pêxember qasid şandine dû bilbil. Bilbil hatiye ba Silêman Pexember. Silêman Pêxember ji bilbil ra gotiye:

- Bilbil, gotina te rast derket. Ji piştî ku, min qala anîna jinekê kir, êdî Belqîz ne qala pûrta bin baskên teyr û tilûran, ne jî qala koşkê dike. Xên ji vê jî, hema li ser xesîlê radizê.

Silêman Pêxember ji bo vê şîretê, dilxweşiya xwe ji bilbil ra gotiye, spasdariya xwe pêşkêş kiriye. Bi vê şîreta xwe va, bilbil tevaya teyr û tilûran ji wê fermana Silêman Pêxember azad kirine. Tenê pelçemeka belengaz hema rût û tazî li wê ortê maye. Gotina gotiyan, ji ber vê yekê ye, ku pelçemek hetanî îro jî, rût û tazî maye. Ji ber şerma, tenê şevê derdikeve derva, digere û nêçîra xwe dike.

### 3.2.7. Sê Şîret

Rojekê Behlûl li ser riya mala xwe diçû. Pişberê wi sîvfiroşek dihat.

Behlûlî ji sêvfiroş re got:

Tu sîvekê bidî min, ezê şîretekê li te bikim.

Sivfiroş razî bû û sîvek da Behlûl.

Behlûlî got:

Zelamê ku tu vêre danhostandinê bikî û biaxivî, navê wî bizane.

Hinek dî rêve diçin. Behlûl carek dî got:

Sîvek dî bi de min ezê şîretek dî jî, ji te re bikim.

Sevfiroş sîvek dî jî da Behlûl.

Behlûlî got:

Erdê ku tu halekê jê rabûhêdi lê nerûne. Cihê xwe bizane û bi rûne.

Eyamek derbas bû carek din Behlûl ji sîvfiroş re got:

Tu sîvek dî bide min ezê şîretek din jî, ji te re bêjim.

Behlûl sîvek dî jî stand û got:

Heta tiştek ji te neyê xwestin, xwe ne de pîş û wê daxwaziyê bi cîh neyne.

Sîvfiroş rabû li Behlûl bû mêvan û çûn malê. Wê şevê Harun Reşît şîv çêkiriye û bankiriye Behlûl jî. Behlûl û sîvfiroş li kerê xwe suwar bûn û li ber mala Harun Reşît ve ketin rê. Nîva rê de, kerê sîvfiroş ji kesîret ket û xwe berda erdê. Belûl li paş xwe nefekir û li ser riya xwe çû.

Sivfiroş ket pî Behlûl û bang kirê:

Hevalo! Ka bisekine kerê min xwe berda erdê, ka li hîviya min bisekine.

Behlûl, gûh neda gotina wî û çû. Sîvfiroş bi bênek çikayî ve giha Behlûl û ew sekinand.

Sîvfiroşî got:

Çima ez bang dikim te û tu nasekinî?

Behlûlî got:

Te banekiriye min

Sîvfiroşî got:

Min ji te re ne got hevalo bisekine, kerê min xwe berda erdê.

Behlûl got:

Navê min ne havalo ye.

Welhasil em gelek dirêj nakin serê gûhdaran gêj nakin. Ev her du camêr gihan mala Harun Reşît. Sîvfroş çû serê koçkê runişt. Gava Harûn Rêşît hat, sîvfiroş ji cihê xwe rabû û hat xartirê rûnişt, dema wezîr hat ji wî cihî jî rabû piçek din çû xwartir rûnişt. Bi vî halî sîvfiroş çû heta ber şîpika deriyê koçkê. Bû demê şîvê, xulaman şîv anî, şîva xwe xarin. Bênek derbas bû fêkî hat li ber wan.

Mêhvanan ji êkdu re gotin:

Kêrka kê heye em pê fêkiya spî bikin û bixwin?

Sîvfiroşî xwe da pîş û got:

Ve min kêrik heye, ha ji we re sêvên xwe spî bikin.

Ev kêra ku sîvfiroş ji kûrka xwe derêxistî ji xezîneyê hatiye dizîn. Dema Harûn Reşît ev kêrik dît, dîn bû û got xwilamên xwe serê vî dizî jê bikin.

Behlûlî got:

Gelî birano! Ka ezê sîvfiroşî bibim mala xwe, îşev bila nik min be da ku ez hinek pisyaran jê bikim, ka ji ber çi ev kêrik ji xezîneyê diziye ez bizanim. Sibehî siharê ezê ji we re bînim, vêca hûn û bextê xwe.

Harun Reşit gelek hiş Behlûl dikir, ji ber vê ji nevêya dilê wî bihêle û gotina wî qebûl kir.

Behlûl, sîvfiroş bir û kir guva kerî ve. Teşkên kerî yên pêşiyê jêkdu vekir û sîvfiroş kir nav teşkên wî re.

Belûl çû li ber serê kerî sekinî, fekir rûyê keri û got:

Wey ker kurê kerê. Min ji tere got, zelamê tû vêre biaxivî navê wî bi zane. Te, navê min ne zanî, kerê te dirê de kete erdê tu li piş min bezî heta bêhn li te çika.

Dema Behlûl ev gotin got, heta jê hat zeleyek hişka li rûyê kerî da û cardîn dest bi gotinê kir: Min got te, ne rûne erdê tû jî rabî, cihê xwe bizane û birûne. Tî çûyî rûnştî cihê mîr û wezîran. Tu ji wê derê rabirî ketî ber derî. Behlûl zeleyek din jî li kerê da û got:

Paşiyê jî, min ji te re got, heta tiştek ji te neyê xwestin, xwe ne de pîş û wê daxwaziyê neyne cih. Te çikir, te kêrik derêxist û fermana jêkirina sere xwe anî.

Cardî Behlûl zeleyek xweş li kerê da. Sîvfiroş ji tirsa dibin lingên kerî de bûye wek zarokek bê ezman û nizane Behlûl va gotina ji wî re dibêje an jî ji kerê re dibêje.

Belûl ji nûka fekir rûyê sîvfiroşî û got: Sibehî wextê te bibin sêrjêkirinê, tu yê bîjî ew kêrika we li nik min dîtî, min li ser cenazê bawê xwe anî bû. Bavê min ticar bû. Rojekê riyekê de yekê bavê min kuşt û ev kêra he danî ser cesedê wî. Vêca ez jî biçim kî erdê, ez vê kêrikê didanime meydanê. Hûn li vê kêre xweyî derketin. Bawer e, neyarê bawê min hûn in.

Bû sihar sîvfiroş birin ji bo serjêkirinê. Sîvfiroş wek gotina Behlûl destûr ji Harun Reşît xwest û wek gotina Behlûl mesela kêrikê jê re got.

Harun Reşît ji sîvfiroşî re got: Ev gotin ji devê te derdikevin, lê belê gotin yê Behlûl in.

Behlûl derket meydanê û got: Birayên ezîz! Welehî min tiştek ne gotiye vî camêrî. Min çi gotina gotî, ji kerê re min gotiye.

Harun Reşît ji serjêkirina Sîvfiroş geriya û ew efukir. Bi aqilê Behlûl serê sîvfiroş ji destê celadan xilas bû.

### 3.2.8. Bav û Sê Kûr

Li memleketekê dûr zelamek gelek jêhatî hebû. Ev mêr, bazirgan bû. Her car diçû deverên dûr û ji xwe re bazirganî dikir û du sala carekê dizîvirî, dihat mal nik jina xwe. Her dema dihat rebê mezin kurek dida vî camêrî. Bi vî halî sê kurên vî zelamî çêbû. Zelamî navên her sêya jî kir Ehmed. Kurên xwe rêkir ber destê alim û zanayan. Kurên wî mezin bûn, bûne zelam.

Rojekê jina zelamî bang li mêrê xwe kir û jê re got:

Ve çend sal e wîjdana min nerihet. Min ne dizanî ka ez çawe ji te re bêjim. Camêro kurek yê me ne ji te ye. Dema tu diçûyî bazirganiyê şevekê ji gund zelamek di tariyê de hate mala me û bi min re raza. Min jî got qey tuyî. Vêca ez tirsam û min ji te re negot.nija jî ez ni xwe nizanim kîjan ji van kuran ne yê te ye.

Dema zelamî gotinên jina xwe bihîst ji qehra ket nivînê û bankir kurên xwe.

Zelamî got:

Kurên min, ev e ez diçim li ber rehmeta Xwidê. Guhê xwe baş bidin min,

Ehmed ji malê min xweyî bar.

Ehmed ji malê min xweyi bar.

Ehmed ji malê min bîbar.

Ev gotin bûne axaftina paşyê ya zelamî û çû ber rehmetê. Kurên wî jî li ser gotina bawê xwe ketin nêv êkdu, her sêyan jî ji malê bawê xwe êkdu bûbar dikirin. Zanîn bi halî naçêbe, qerar dan biçin nik qazî şirîetê, xwe lêkdan her sê ketin rê û çûn. Di rê de dîtin ku heywanek ji pîşiya wan çû ye û şûnpê wê dixwehî.

Birayê mezin got: Ev heywan deve ye.

Birayê nêvê got : Ev deve bi çavekê ye.

Birayê kiçik got: Barê vê devê çibe bila ew be, lê belê milek şirîn e milek tirş e.

Bêhnek çû dîtin kû zelamekê li ser riya wan tê.

Zelamî got: Birano we ti deve di vê rê de nedît?

Birayê mezin got:

Ma ev deve ne kûr e, bi çavekê ye, barê wê tirşî û şirînahî ye.

Zelamî got: Belê rast e. Ilah wekil hewe deva min biriye.

Birayan got: Dad medet wileh ne me biriye.

Lê zelamî bawer nekir û bû hevalê wan da ew jî bê nik qazî şirîetê.

Her çar li ser riya xwe çûn. Di rê de şûn pêyek din jî dîtîn.

Birayê mezin got: Ev şon pê jinekê ye.

Birayê nêvê got: Ev jin dicanî ye.

Birayê kiçik got: Ev jin, ji mêrê xwe enirî ye.

Zelameke din derket pêşiya wan û got:

Birano we ti mirov di vê rê de neditiye?

Birayê mezin got: Ev mirov jin e, bi hale û enirî ye.

Li ser van gotinan vî zelamî jî ew sucdarê revandina jinikê kirin. Rabûn ew jî kirin hevalê xwe. Heft roj û heft şevan piya çûn. Welhasil em gerek dirêj nakin serê hazir û guhdaran gêj nakin ev zelamên he gihan mala qazî. Qazî ji wan re berxek şerjêkir û şîva wan da çêkirin. Xwarin hate ber difna wan çûn ser sifrê.

Birayê mezin got: Ev nan, nanê mirîyan e.

Birayê nêvê got: Ev goşt, goştê kûçikan e.

Birayê kiçik got: Qazî jî kurê Filhan e.

Qazî şaş ma. Hima cêhde bezî çû nik cotyar û jê pirsi:

Çima mêhvanên min ji nanê min re gotin ev nanê miriyan e!.

Cotyarî got: Rastî ev zeviya ku dexlê te jî tê, ji berê de ziyaret bû. Me ziyaret xira kir û me ji te re kir zevî.

Ji wê derê bi çavek tarî ve bezî nik şivanî û got: Çima mêhvanên min ji goştê berxikê re dibêjin; goştê kûçikan e?

Şivanî got:

Ev berxik kiçik bû û maka wê mir. Ti mihên me yê xweyî şîr jî ne bû. Me jî rabû ev berxik bi şîrê dêhlikê xweyî kir.

Mane hêdî dest û lingên qazî nagire. Bi dilê xweyê kul ve çû nik diya xwe û got:

Hudê, Hinek camêr hatine nik min ji bo ku ez şirîeta wan bikim. Van camêran hinek tişt gotin û ev tişt rast derketin. Ji min re bêje, ma ez kurê filham e?

Diya Qazî got:

Kurê min rastî jî tu kurê fileyekêyî. Min nedikarî ez ji te re rastiyê bêjim. Fileyek siwarî rojekê bû mêhvanê me û Qazi bi çavên sor ve hat nik mêhvanên xwe û ji her sê birayan re got:

We çawe zanî ku, heywana vî camêrî deve ye, kor e, barê wê şirînahî û tirşî ye ?

Birayan gotin: Ji sima wê me zanî ev heywan deve ye. Ji milek yê rê giya xarî bû û ji milek yê rê jî giya nexarî bû. Bi vê me zanî ku çavek ê wê kor e. Hûn jî dizanîn hinek mêş hene ku diçin li ser tiştê tirş û hinek mêş ji hene ku diçin li ser tiştên şirîn. Li ser riya deveyê, milekê mêşên tirşitayiyî, milekê jî mêşên şirînahî yê hebûn. Bi vê jî, me zanî ku barê vê deveyê ka çi ye?

Qazî zanî ku ev birayên he rast dibêjin û ne deveya vî zelamî biriye. Xweyê deveyê rê kir.

Qazî carek din got:

Erê erê. We çawe zanî ew mirov jin e, dicanî ye û enirî ye?

Birayan gotin: Şonpê wê kiçik bûn. Me zanî ev lingên kiçik yê jinekê ye. Pehniya lingê wê nav erdê de çû bû, me zanî ku ev jin giran e û dicanî ye. Di riya wê de jî li ser axê hinek şunên wek dilopên avê hebûn. Mane em dizanin ku ti baran jî nehatiye. Me zanî ku ev jinik girîye û ew erdê şil jî cihê hêstirên çavê wê ne. Bi vê me zanî ev jinik enirî ye.

Qazî heq da van birayan û rabû xweyê jinikê jî rêkir.

Qazî got:

Baş e. Heta nihu werast got. Ka ji min re bêjin we çawe zanî nanê min yê miriyane, goştê min yê kûçikan e û we çawe zanî ez ji kurê fileham e?

Birayê mezin got: Ji rengê nanî me zanî ev ne nanê zeviyen beyara ni. Ji ber ku nanê em dizanin ne bi vî rengî ye. Goştê berxika te jî gelek sor bû. Goşte kuçikan tinê heqes sor e. Ji rabin û runiştina te jî me zanî ku tu ne kurê mislimanayî.

Qazî ji van birayan ma ecêpmayî û got:

Hij min şirîeta we nekirî ez ê ji we re meseleyek a xwe bîjim. Rojekê ez çûm nêçire, şêv ser min de hat û ez ji mala xwe gelek dûr ketibûn. Dinya tarî bû û min riya xwe winda kirî bû. Ketim li ser riyekê û çûm. Ji dûr ve zirûnahiya rehnayiyeke min dît. Ez li ber rehnayê ve çûm û çûm. Giham e nêzik wê rehnaye, min dît ku qesrek mezin li pêşiya min e. Min destê xwe li zengila deriyê qesrê da, keçek ji heyva çarde şevî tezetir derî li ber min vekir. Ez û ev keç di 13 deriyan re derbas bûn û gihan koçka qesrê. Keçikê şîv anî, me bi vêkre şîv xar. Ew li kuncikî ya qesrê runişt, em bêdeng welî sekinin. Bu demê nivistinê vê hirmetê cih ji min re danî û çû. Mane ez gelek wasta me, min xwe kir nêv cihê xwe re, min dît deriyê qesrê vebî û ev keça heqes dalal hat xwe kir nêv cihê min re. Ji tirsa Xwide û fihêtiya xwe min xwih da ez wek taki dar lê hatim.

Min ji Xwe re digot: Gelo ma dê û bay vê keçê nîni? Ma hima ev tinê divê qesrê de dijî.

Baweriya we ji Xwidayê mezin bê min pişta xwe nik vê keçikê ve kir û ez welî bê nefes sekinîm heta zelaliya rojê. Hima dinya rehnî bû min dest avêt cilikê xwe û ez derketim, ketim li ser riya mala xwe.

Li ser mesela qazî birayê mezin ji Qazî re got:

Helal bi ji te re, Wileh tû kurê bay xweyî.

Birayê nîvê got:

Tu zelamek xweyî nefsî û tu şîr helalî.

Birayê kiçik got:

Heylê min serê te kirî nêv dîzga xwelîyê re, wileh tu ne zelamî, ew ez bima, ezê bi ketima li ser sîngê wê heta berê siharê.

Mane qazî hestiyek avêti bû li ber van hersê birayan. Qazî kenê xwe kir û ji birayê kiçik re û got:

Tu ne paqijî. Ehmedê ji malê bay xwe bêbehr tu yî. Hûn her du birayên mezin xweyê mal û milkên bay xwe yî.

Wî demê birayê kiçik zanî kurê bêbehr ew e.

### 3.2.9. Qerekos

Çi hebû çi tune bû, Qerekosek û du birayên wî hebûn. Rojekê Qerekos, birayên xwe digire û diherin ku ji xwe re li karekî bigerin. Pir diherin hindek diherin rastî pîreke merxur tên. Pîra merxur Qerekos nas dike, ji wî re dibêje:

- Qerekosê min tu bi ku de diherî?

Qerekos dibersivîne:

- Qet welleh, dapîrê! Ez ji xwe re li karekî digerim.

Pira merxur dibêje:

- Tu li ba min naşuxulî? Heger hûn şuxulê ba min qebûl bikin, sê keçikên min hene. Ez ê wan jî li we mehr bikim.

Qerekos dibêje:

- Em dişuxulin, çima neşuxulin.

Pîra merxur dibêje:

- Niha hinek cotê min maye. Hûn herin mala min, ez ê jî werim.

Qerekos û birayên wî diherin mala pîrê. Ku dibe êvar pîr cotê xwe xilas dike û tê malê. Ku pîr tê, ji ber ku westiyayî ye dibêje:

- Pişti şîvê em rakevin. Şîva xwe dixwin û şûnde keçikên pîrê li hêlekê, Qerekos û bi- rayên wî jî li hêla din radimedin. Demsal zivistan e, serma û seqayê daye ser erdê û eyam pir cemidî ye. Pîr xwe dide ber sobê û dibêje:

- Zarokino zû ramedin û têr xew kevin ha, em ê serê sibê zû rabin, herin cot!

Ku pîrê hung dibêje: her kes bi lez dikeve nava nivînên xwe. Pîr şîşa xwe dike nav sobeyê û pir êzingan jî dike ser. Seba ku wê şîşa xwe pir sor bike. Ku agir şên dibe, şîşa pîrê ji pê re sor dibe. Ku Oerekos rewşê dibîne şik dikeve dilê wî. Fehm dike ku pîr dixwaze wan bixwe û payî dimîne. Ku şev dişikê bi şûn de pîr dibêje:

- Hayî mayî kî payî?

Qerekos:

- Diya pîr, ez payî!

Pîra merxur dibêje:

- Qerekosê min çima tu payî?

Qerekos dibêje:

- Qet wele, diya pîr! Duh van çaxan me kêsme û pastix dixwarin. Ew hatin bîra min û dilê min ew xwestin ji bo wê xewa min nehat.

Pîra merxur, tavilê sindoqa xwe vedike û jê re hinek kêsme û pastix tîne. Ku Qerekos kêsme û pastixê xwe dixwe û şûnde jî ranamede. Dîsa li pîrê dipê. Pîr bîsteke din careke din bang dike:

- Hayî mayî kî payî?

Qerekos dibêje:

- Diya pîr ez payî.

Pirê dibêje:

-Qerekosê min tu çima raneketiye?

Qerekos bersivê dide:

- Qet wele pîrê! Duh van çaxan diya me ji me re nok diqewirandin. Ew hat bîra min, loma ez raneketim.

Pîra merxur radibe jê re nokinan diqewirîne. Ku nok tên ber Qerekos, rûdine dest bi xwarina nokan dike. Di wê mayînê de pîra merxur tê û li ber sobeyê hinek bi xew ve dihere. Ku Qerekos dibîne ku pîr bi xew ve çûye, hêdika radibe, keçikên pîrê tîne dike nav cihên xwe, bi xwe û birayên xwe jî dikevin şûna keçikên wê. Qerekos dîsa dipê. Piştî demekê pîr bi xwe dihese û bang dike:

- Hayî mayî kî payî?

Piştî bangkirina pîrê Qerekos vê carê dengê xwe nake. Ku Qerekos deng nake, pir kêfa pîrê tê. Pîr kêf dike û ew şîşa xwe ya sorkirî derdixe û dihere ser nivinên Qerekos û birayên wî. Şîşê radike û di ser dilê her sêyan re dike. Paşê vedigere nav cihê xwe. Pîra merxur dibêje qey ewên ku kuştî Qerekos û birayên wî ne, lê nizane ku ew keçên wê bi xwe ne.

Pîr sibehê zû radibe ku here cot, bang li keçikên xwe dike:

- Keçikino! Va ez diherim cot. Hûn jî rabin, goştê wan lawikan ji min re sor bikin û bidin ser dan. Di wexta firavînê de û bînin nav êrd.

Pîr temiyên xwe li wan dike û dihere cotê xwe. Ku pîr dihere, Qerekos bang li birayên xwe dike û hal û medên pîrê ji wan re vedibêje. Qerekos û birayên wî goştê keçikan dikelînin, didin ser dên û ji pîrê re dibin. Wexta ku diherin nav êrd, kincên keçikan li xwe dikin. Pîra merxur wan ji dûr ve nas nake. Bi dengekî hêl bang dike:

Neynin vir, li wir deynin û herin karê xwe yê malê bikin.

Qerekos firavîna pîrê datîne wê derê û li gel birayên xwe ji wir dûr dikeve. Piştî demekê pîr tê ku xwarina xwe bixwe. Dibîne ku li ser dên cêniyên goştê keçikên xwe hene. Bi lez dihere mal. Lê dibîne ku kes li malê tune ye. Fehm dike ku her sê keçikên xwe bi destê xwe kuştine. Li çokên xwe dixe û xembar dibe. Bi xwe û xwe dibêje:

-Axx Qerekos ax! Ger ku hûn bi destê min biketana min ê hûn di devê xwe de bikirana tayek dezî û cumek benîşt.

Pîra merxur pir digirî, bi rojan hêstiran dibarîne û dikeve pey dijminên xwe. Di wê mayînê de Qerekos û birayên wî diherin gundekî, li ba axeyekî karekî xwe dibînin. Pir dihere hindek dihere gundî û axa pir ji Qerekos û birayên wi hez dikin. Lewma li ba gundî û axê qedr û qîmeta wan pir dibe. Lê birayên wi hesûdiyê dikin û dixwazin ku Qerekos bidin kuştin. Her du bira şora xwe dikin yek û diherin ba axê û jê re dibêjin:

- Axayê me! Pîreke merxur heye û çirayeke wê ji heye ku ew çira jî malî qonaxa te ye.

Axa dibêje:

- Ka kî dikare wê çirayê bîne?

Dibêjin:

- Qerekos.

Axa ferman dide dibêje:

- Ka tavilê herin bang li Qerekos bikin.

Ku Qerekos tê, axa jê re dibêje "Here çiraya pîrê ji min re bîne!" Qerekos dibêje:

- Axayê min, aman! Ma ez ê çitol herim çiraya pîrê bînim? Tu jî dizanî ku ew pîreke merxur e.

Ku Qerekos çir dike nake nikare axê di ser rê de biêxîne. Dibîne ku tu çare tune ye, bi neçarî dikeve ser rê. Dikeve rê û tê ber mala pîrê. Ku tê ber mala pîrê, dibîne ku pîr şûna keçikên xwe digerîne û hem jî xwe bi xwe dibêje:

-Ax Qerekoso ax! Bila tu bi destê min bikevî, ez dizanim ku ez ê li te çer bikim. Ez ê te bikim tayek dezî û cûmek benîşt.

Qerekos hedîka nêzikê dibe. Ew hedî nêzikê dibe lê hespê pîrê ji pîre re dibêje:

- Hîr hîrr! Diya pîr Qerekos hat!

Qerekos bi şûn ve vedikişe, xwe vedişêre. Pîr radibe û li dorhelên xwe dinihêre lê tu kesî nabîne. Ku tu kesî nabîne hêrsa xwe bi serê hesp ve derdixe. Radihêle şivekê û diçerpîne hêsp. Ku hêrsa pîre hinekî derbas dibe, dihere nav malê. Ku pîr dihere, Qerekos careke din nêzikî male dibe. Ku nêzik dibe hesp careke din dike hîrehîr û dibêje:

- Qerekos hat!

Careke din pîr direve derve û li dorhêlên xwe dinihêre. Lê dîsa tu kesî nabîne. Pîra bihêrs dîsa li hespê xwe dixe heta ku hespê reben ji hal de dikeve. Qerekos digihêje ber teqeyê. Vê carê hespê neçar dengê xwe nake. Qerekosê jîrek nêzikê çirayê dibe. Pifî çirayê dike û dibêje:

- Diya pîr! Ez Qerekos im, va min çira te jî bir.

Piştî vê gotinê Qerekos ji wir bi hêl direve. Pîr di tariyê de dimîne û dîsa li juniyên xwe dixe.

Dibêje: Ax Qerekos axx! Hespê min got lê min îna nekir.

Qerekos tevî çiraya pîrê tê û digihêje gund. Ku her kes dibîne ku wî çira jî aniye şaş dibin. Tu wext di nav re derbas nabe, her du birayên Qerekos dşsa diherin ba axê û jê re dibêjin:

-Ayayê me! Hespekş wê pşrê heye şora dike. Malş te ye!

-Axa dibêje:

Ma kî dikare wî hespî bîne?

Birayên Qerekos bi dengekî dibêjin:

- Qerekosê me dikare. Ku çitol çira aniye ew ê hêsp jî wiha bîne

Axa Qerekos dişîne ku here hêsp jî bîne. Ku Qerekos nêzîkî hêsp dibe, hesp dîsa dike hirehir û bang li pîra merxur dike:

- Pîrê! Qerekos hatiye ku min bibe.

Ku pîr derdikeve derve. Qerekos dîsa xwe vedişêre û pîr dîsa tu kesî nabîne. Dîsa vedigere hundir. Ku pîr dihere hundir Qerekos dîsa derdikeve û hinekî din nêzikî hêsp dibe. Hesp dîsa dike hîrehîr. Ku pîr dêng dibihîze dibeze derdikeve derve. Dibîne ku dîsa tu kes tune ye. Diqehire, radihêle şivekê û dihere ser hêsp. Him li hêsp dixe him jî dibêje:

- Ne tu bî ne jî Qerekos, soxeyê soxe!

Çend şivan diçerpîne hespê xwe paşê jî vedigere nav cihên xwe. Piştî çûyîna pîrê, Qerekos careke din derdikeve holê û nêziki hêsp dibe. Lê hespê reben ji tirsa xwarina şivan îcar dengê xwe nake. Ku hesp dengê xwe nake, Qerekos jî lê siwar dibe û diajo. Bi ajotinê re bang li pîra merxur dike. Dibêje:

- Diya pîr! Va ye ez im Qerekos, min hespê te jî bir.

Pîra reben li juniyên xwe dixe lê tiştekî ku bike tune ye. Qerekos kulan li ser kulan li ser dilê pîrê çêdike û dihere. Qerekos, hêsp ji tîne û dide axê. Axa jî bi vê pir kêfxweş dibe. Qedr û qîmeta Qerekos li ba axê zêdetir dibe. Lê hesûdiya her du birayên Qerekos berdewam e. Diherin ba axê û ji wî re dibêjin:

- Axayê me! Kêmasiyeke vê qonaxê heye. Ew jî pîre. Hewce ye ku ew pîra xizmetê ji qonaxa te re bike.

Axa dibêje:

- Lê kî dikare here wê pîrê ji min re bîne?

Bi yek dengî dibêjin:

- Qerekosê me!

Axa careke din bang li Qerekos dike û jê re dibêje:

- Qerekosê min! Here ji min re pîrê jî bîne.

Qerekos dibêje:

- Axayê min! Ma ez ê çawa herim pîra merxur bînim? Yê me hemiyan bixwe.

Ku çi qas dibêje jî tu feydeyê nake. Neçar dimîne ku here. Dihere, lê vê carê bi awayekî din dihere. Rihên xwe ber dide, kirasekî li xwe dike û dihere hewşa pîre û li bin dara tûyê disekine. Pîr wî dibîne û jê dipirse:

- Çi bû apê xoce?

Qerekos dibersivîne:

- Qet wele diya pîr! Li vî gundê han yek miriye. Dibêjin navê wî ji Qerekos e. Lê belê darbest tune ye ku em wî bidin ser û bibin veşêrin. Ez loma hatim.

Pîra merxur dibêje:

Te got Qerekos miriye? Bila dar gişî bi qurbana te bin.

Qerekos darekê jê dike û dike darbest û bang li pîrê dike:

- Diya pîr min darbest çêkir lê ez nizanim gelo yê ji bejna wî re bibe yan na? Te qet Qerekos ditibû berê?

Pîr dibêje:

-Erê min ditibû, bi qasî min bû bejna wî.

Qerekos dibêje:

- Ka were em telesiyê bikin. Hele ka bûye yan na?

Gava pîr dikeve darbestê, ew jî tavilê darbestê di ser pîrê re mix dike, dibe qonaxa axê û jê re dibêje:

- Axayê min, va ye min ji te re pîr jî anî.

Wiha dibêje û radihêle tevşoyê xwe. Ku yên din jî darbestê vedikin, pîr yek bi yek hemiyan dixwe. Dor tê ser Qerekos. Qerekos ji pîrê re dibêje:

-Diya pîr ji xwarine re tê min bixwî! Ez dizanim. Ka em nan û xwêya xwe li hev û du helal bikin. Ku pîr serê xwe di derî re derdixe, Qerekos têvşo li serê pîrê dixe û sêrê wê difirîne. Piştî mirina pîrê tu kes di gund de namine û gund tevahî ji Qerekosê me re dimîne. Çiroka me çû liqatê, rehme li dê û bavê civatê.

### 3.2.10. Fenên Dêw

Di zemanê berê de merivekî kor hebû. Kurekî xwe ê dehsalî hebû. Li parsê digeriya. Rojkê ji gundan dihat. Di newalekê de, li ber zinarekî rûnişt. Keserek kişand. Di zinar da, derî vebû. Dêwekî serê xwe biderxist; ji mêrik re go: Tu li çi digeri?

Mêrik şaş bû; go min lawê xwe anî ko tu bi xwendin bidî.

Dêw go: Salekê di vê çaxê were kurê xwe bere.

Derî hate girtin; mêrik çu mal. Salkê li mal rûnişt. Sala xwe bû temam, ewê were lawê xwe bere.

Jinikên dêw dido bûn. Yek rind; yek pîs. A rind ji lawik ra go: Sibe da dêwê banî te ke; ji te bipirse; jinên min kijan rind e. Tu bêje ez nizanim, kîja ko bi te rind e, ew rind e. Ewê ji te bipirsê, te ilmê min hîn kir, hîn ne kir. Tu bibêj ez hîn ne bûm. Ewê bibêje eyb e, sibe bavê te ê were, ezê jê şerm bikim.

Dêw jê pirsî, lawik gotê: Wexta ko te ders dida min, ez hîn dibûm. Wexta ko tu ji cem radibûyî, mi xwe ji bîr dikir. Ez niha tiştekî nizanim.

Bû sibe, bavê lêwik hat. Ew li ber zinar sekinî, destê xwe lêxist. Derî vebû, dêw destê lawik girt, teslîmî bav kir. Bav lawikê xwe girt, çû mal.

Lawik ji bavê xwe re got: Ezê îşev bi hespekî rind bim. Sibe min bibe mezadê. Ewê sed zêrî bi te din. Pereyê xwe bigire, hevsarê min me de kesi, bîne mal.

Bû sibe, bav rabû, di ko hespekî rind di xanî de hatiye girêdan. Hevsarê wî girt, çû mezadê. Xelk gişk hatin. Sed zêr tê dan. Bav pereyê xwe girt. Bav go herê. Lawik go ezê îşev bi devekî spî bêm. Min bibe mezadê, ewê bîst zêra di min din. Pereyê min bigire, hevsarê min jêke, bîne mal.

Bû sibe. Bav rabû, dî ko devakî spî hatiye girêdayîn. Hevsarê wî girt, bire mezadê. Xelk gişk hatin. Bîst zêr tê dan.

Dêw di mala xwe de go, însanê vî zemanî emel pê nabe. Dibe ko wî lawik ilmê min hîn kiriye; din av xelkê de heşkera bike.

Dêw rabû, tebdilî qiyafet kir, hate mezadê. Di mezadê de, deveh nas kir. Çû bi bavê lêwik re bazar kir. Go tu vî devayî bi çi didî. Extiyêr go, ez bi bîst zêran didim. Dêw bîst zêrê wî danê. Hevsar ji dest girt.

Extiyêr go, ez hevsarê xwe nadim. Dêw go, mala min e li vire. Li şûna hevsar da zêrekî din dayê, Hevsar ji dest girt û çû.

Lawik zanî ko paşî xerab e. Çawan kir ne bû. Çu heta ber zinar. Wexta ko dêw çû hundir. Lawik serê xwe da serdara derî da. Hevsar di serî da jêbû. Lawik li xwe xwend, bû kevok ket hewa.

Dêw dî ko lawik firî; wî jî li xwe xwend, bû bazek kete pey. Lêwik dî ko xelas nabe. Bexçekî mezin dî; hewzek di ortê de ye. Di dorhêla wî hewzî ra paşaler rûniştine. Lêwik li xwe xwend, bû guleke sor. Kete orta hewzî.

Dêw jî li xwe xwend bû mitirbek, saz bi piyê wî ve; hat temena kir, bi edeb rûnişt, sazê xwe lêxist.

Xulamekî ew gul girt, da paşayê mezin. Paşa jî destê xwe kir berîka xwe, pere biderxista ko bi mitirb bide.

Mitirb go ez pera naxwazim; bira paşa wê gulê bide min, ji min re bes e.

Paşayê mezin ew gul da mitirb. Lêwik dî ko îş xerab bûye. Li xwe xwend, bû garisê zer, rijiya erdê.

Dêw jî li xwe xwend bû qurkek bi deh çêlîkên xwe ve û garis ji erdê dineqandin. Lawik li xwe xwend bû roviyek, qurk jî xwar, çelî jî xwarin.

Lawik dîsa bû merî. Paşaler lê ecebmayî man; gotin ev çi îş e? Lewik ji wan re qise kir û mesele got.

Ji hingê va dêw însana hînî fenê xwe nakin.

### 3.3. Fıkra ve Anekdot

#### 3.3.1. Çêlika Şûjinê

Germa havînê gundî li ser rê rastî derziyekê tên li serî kom dibin tu kes jê fêm nake ka ev çi ye. Bi rastî jî ev tişt derziyeke ku qula wê şikiyaye. Yek ji gundiyan dibêje: “Werin em xeberê bidin mamê maman xwediyê aqil û fehman”. Xeber digîhije mamê maman û xwediyê aqil û fehman. Ew tê ser vî tiştê ku dibiriqe. Radihêjê ji redê radike. Cerekê duduyan dide ber çavê xwe lê mêze dike. Gundî hemû bi hev re jê dipirsin: “De ka bêje ev çi ye? Te em di mereqê de kuştin.” Mamê

maman xwediyê aqil û fehman carekê bala xwe dide xelkê derdora xwe û bi dengekî nerm dibêje: “Ev çêlika şûjinê ye. Mêze bikin hê çavê xwe jî venekiriye.”

### 3.3.2. Ez Nemirdim

Li aliyê Soran axayek hebûye. Tenê keçeke wî axayî hebûye. Dilê wî axayî pir li ser keça wî ve bûye. Rojekê xeber li nav gundiyan belav bûye ku keça axê miriye. Gundî tev bi erz û eyal ve li mala axê berhev bûne, şîn û girîn çûye ber ezmanê ezîm. Hinek kes çûne goristanê gora keçikê jî kolane û keçik birine ku wê bişon da kefen bikin.

Tu nabêje keçik nemiriye, tenê jixwe çûye. Dema birine ber serşoyê keçik veciniqiye û hişyar bûye. Bi vê xebera xweş kêf û şahî ketiye nav gundiyan. Axê jî pez şerjêkiriye û dawet û dîlan kirine. Din nav şahiyan de axê gotiye: “Kî îşev here nav ziyareta keça min û heta sibê bimîne ezê keça xwe bidim wî.” Lê kes newêriye ku here. Mirovekî Soran ê rût û rewal rabûye û gotiye ezê herim. Xencera xwe xwe xistiye ber xwe û çûye.

Axa pir hêrs bûye. Di hizra wî de kanê dê kurê kîjan axa û giregir û maqûlî here. Lê kesî newêraye here, lê mêrik derketiye û çûye. Axa gotiye xulamên xwe: “Herin wî rûtî heram din nav qebran de bitirsînin da ku îşev lı wir nemîne. Yan na ezê mecbûr keça xwe bidimê. Ez jî hez nakim ku keça min bigihê.”

Du xulamên axê çûne nav qebran. Dîtine ku mirovê xwe li nav qebra keçikê dirêj kiriye. Gotine:

-Men rabbûke? (Rebbê tek î ye?)

Mêrik gotiye:

-Min nemirdim. Li gel axa qirarim heye. (Ez nemirime. Bi axa re qerara min heye.)

Xulaman dîsa gotiye:

-Men rabbûke?

Cara sisêyan jî pirs kirine, lê sebra mirovê me jî neqediyaye. Xencera xwe ji ber xwe derxistiye û bi pêsîra zilamê axê girtiye û xencer li nîvê qelbê wî daye. Xulam gindiriye nav gorê. Mêrik jî xwe dirêj kiriye û heta sibehê razaye.

Sibetirê çûye nav gund û gundiyan jê re gotiye: ‘’Lawo çi bû çi nebû?’’ Mêrikê Soran bi dilekî xweş gotiye: ’’Ma wê çi bibe! Wele Munker û Nekîr hatin pirs kirin. Min jî gote wan ez nemirime. Lê wan pirsên xwe domandin. Ez jî mecbûr mam, min Munker kuşt, Nekîr jî reviya.”

### 3.3.3. Cibo… Cibo.. Ez Nayêm

Di bajarekî Kurdistanê de mizgeftek heye, li hewşa mizgeftê jî feqî hene. Feqiyên medresê wek tê zanîn bi ratibên xêrxwazan debara xwe dikin û abor dibin. Di vê medresê de jî wekî hemî medreseyan adetekî wisa yê ratiban heye. Lê kesên ratibê dibin kêm in, feqî jî pir in ji ber hindê xwarina feqiyan têrî wan nake. Lêbelê li ser hemî halan jî sofiyek muselletî ratiba wan dibe û her car tê xwarina wan bi wan re dixwe. Feqî ji vê rewşê dikerixin û planekê çêdikin.

Carekê berbanga spêda dema sofî tê nimêjê, feqiyekî dengxweş diçe ser mizgeftê û bi dengekî şîrîn û zelal dibêje:

-Sofî… sofiyê baş û qenç…

Sofî serê xwe radike û bawer dike ku ew deng ji xeybê tê. Dibêje:

-Kerem ke birayê Cebraîl, tu çi divê?

Feqî dibêje:

-Sofî, Xwedê ji te gelekî hez dike. Wî ez şandime ku ez sibê berî banga sibê te bibim esmanê heftan, da ku tu ji xwe re hinekî bigerî… divê tu spêdê seet çaran li vir amade bî, ezê di kuleka banê mizgeftê de werîsekî daxînim û te hılkêşim… niha bi xatirê te, ji bîr neke.

Kêfek wisa tê ser sofî ku heta roja din xew nakeve çavê wî. Roja din seet çaran diçe mizgeftê, li ber kulekê disekine. Li aliyê din du-sê feqiyên girs û bihêz diçin ser banê mizgeftê û werîs dadixînin xwarê, dibêjin:

-Sofî tu amadeyî çûna esmana?

-Belê

-Baş e, vî werîsî li bin çengê xwe bialîne û baş girêbide ku tu nekevî.

Sofî werîsê daketî di bin çengê xwe de re aland û girêda. Feqiyan dît ku sofî amade ye.

Gotin:

-Ez niha te hildikêşim.

Û qederê du metroyan ji erdê rakirin, paşê dîsa bi erdê ve berdan. Sofî ding li erdê ket û piçekî êşiya, got:

-Ya hezretî Cebraîl ez êşiyam.

Feqî got:

-Sofî bibexşe, werîs ji destê min zeliqî. Vê carê ezê te bikêşim.

Sofî dîsa rakirin, nêzîkî ber ban kirin û berdan erdê gum li erdê ket, vê carê zêdetir êşiyabû got:

-Cebraîl te ez êşandim, min xweşik bikşîne.

-Qusûra min mêze neke, ez yekî destsist im, tu ezîzê Xwedê yî, bi îzna Xwedê emê vê carê te baş bikşînin.

Û dîsa hilkêşan heta ber ban, lê kulek teng e û sofî jî girs, bedena sofî dı kulekê re derbas nabe, ew jî zoriyê didinê û ber bi kulekê ve dişidînin, ax ax û wax waxên sofî ne. Feqiyan fêm kir ku sofî pir aciz bûye, cardin berdan erdê. Sofî vê carê ji binê piyan bi qêrîn got:

-Kuro Cibo ez nayêm… ez nayêm Cibo, Cibo…

### 3.3.4. Ji Dînan Dîntir

Demek ji deman, li gundekî ji gundan, xortekî cotkar, dema ku wextê zewaca wî hatîye, ji xwe ra keçeke xama xwestîye, paşê ew kirîye bûk û birîye mala xwe û pê ra zewicîye. Piştî zewaca xwe demek li malê maye, paşê dîsa det bi karê xwe kirîye, her sibe çûye cot û her êvar vegerîyaye hatîye malê. Dema ku ew çûye cot, pîra dîya wî  û xêzana wî ya bûkîn li malê mane û karê malêkirine.

Çend meh paşê rojek ji rojan, xêzana wî ya bûkîn elba xwe ya şîr girtîye û çûye axurê, da ku li pey çêlekê rûniştîye, çawa bûye bûye, di wê gavê da çima ba bi ber wê neketîye! Hingê xesûya wê jî li axurê bûye; deng çûye xesûyê jî. Bûka reben li ber xesûya xwe fedîkar bûye û ji şerman serê xwe xistîye ber xwe. Lê belê nekarîye tiştek bike; bûye û çûye.

Ew jî, xesûya wê jî ji wê yekê gelek xemgîn bûne. Ji ber ku deng çûye çêlekê jî, tirsane ku dê çêlek dortira rojê di garanê da ji çêlekên gundîyan ra bêje ku ba bi ber bûkê ketîye, çêlekên gundîyan jî dê biçin ji xwedîyên xwe ra bêjin, bi wî awayî ew xebera nexweş û kirêt dê di nava gundîyan da belav bibe.

Bûk û xesû li ser wê şolê fikirîne û peyivîne. Pşê, jibo ku pêşî ji belavbûna wê xeberê bistînin, biryar dane ku di wê gavê da çêleka xwe serjê kin û goştê wê li gundîyan belav kin. Bi wê biryarê, hema rabûne çêleka xwe serjê kirine, goştê wê parçe parçe kirine û li nava gund gerandine, serê malê parçeyek dan'ê. Her mala ku goşt dan'ê, ji xelkê wê malê ra gotine:

-Me demek berê nezir kiribû ku em'e çêleka xwe bikin qurban. Nuha me ew serjê kir; ev goştê wê ye.

Êvarê dema ku kurik ji cot hatîye malê, dîya wî û xêzana wî jê ra qal kirine ku  wê rojê di axurê da çi qewimîye û wan çêlek serjê kirîye û goştê wê li gundîyan belav kirîye. Li ser wê yekê, kurik hem gelek xemgîn bûye, hem jî ji dîya xwe û xêzana xwe xeyîdîye û gelek hêrs bûye. Bi wê hêrsê ji wan ra gotîye:

-Bi Xwedê, di dinê da ji we dîntir çu kesek tune! Maden ku hun ew qas dîn in, ez Êdî nikarim li bal we bimînim û bijîm! Ez'ê serê xwe hilînim û biheyibim, biçim hey biçim!

Kurik bi wê peyva xwe ra hema rabûye, bi lez û bez ji malê derketîye, çolbirr çûye û hey çûye. Bi wî awayî heta sibê meşîyaye. Sibetirê piştê ku Roj hilatîye, rastê gundek hatîye. Ji ber ku heta hingê gelek westîyaye û gelek jî birçî bûye, xwestîye ku here maleka wî gundî û li wir hem piçek xurek bixwe, hemjî ji xwe ra piçek hêsa bibe, paşê rabe û ji wir here. Bi wê armancê çûye ber derê maleka li perê gund û li derî xistîye. Dema malxoyÊ malê jê ra derî vekirîye, kurik jê pirsîye, gotîye:

-Gelo hun mevanan dihewînin yan na?

Malxoyê malê gotîye:

-Mêvan mêvanên Xwedê ne. Kerem bike were hundir. Kurik jê ra spas kirîye û çûye hundir. Ew û malxoyê malê rûniştine û dest pê kirine ji xwe ra peyivîne. Qasek paşê kevanîya malê ji wan ra taştê anîye. Piştê ku taştêya xwe xwarine, malxoyê malê deng li keça xwe ya mezin a xama kirîye û jê ra gotîye:

-Dotamin a xweşdivî, em gelek tî bûne. Ka rabe here kanîyê. Dema ku li rîya kanîyê meşîyaye, di dilê xwe da weha gotîye:

"Ew xortê ku hatîye mala me, hemin hatîye ku min ji xwe ra bixwaze. Bavê min jî hemin dê min bid'ê. Ew'ê demek paşê min bike bûk û bibe mala xwe. Piştê ku neh meh bi ser zewaca me ra derbas bibe, Xwedê dê kurek bide me. Em'ê navê kurê xwe Memo daynin. Ez'ê salê sê-çar car Memoyê xwe bigirim û bêm mala bavê xwe zey. Dema ku Memoyê min bibe sê-çar salî, dîsa ez ''e wî bigirim û bêm mala bavê xwe. Hingê ez'ê bi destê Memoyê xwe bigirim û wî digel xwe bînim ser kanîyê".

Keçik çûye çûye, gihiştîye ser kanîyê. Li wir cerê xwe dagirtîye û kirîye ku bide ser milê xwe û bizivire here malê. Li binîya kanîyê lîçek jî hebûye. Ava ku ji kanîyê herikîye, di wê lîçê da civîyaye. Li qeraxê lîçê ji kulîlkeka pirr xweşik a rengîn hebûye. Keçikê piştê ku cerê xwe dagirtîye û kirîye ku bizivire, çima çavê wê bi wê kulîlkê neketîye!

Keçikê bala xwe daye kulîlkê, dîtîye ku kulîlk, tam li qeraxê lîçê ye. Zanîye ku lîç jî bi qasê navek kûr e. Qesek li kulîlkê û lîçê temaşe kirîye, paşê xwe bi xwe weha gotîye:

"Dema ku ez Memoyê xwe bi xe ra bînim ser kanîyê û bilîyê dagirtina cerê xwe bibim, haya min dê ji Memoyê min nemîne. Memoyê min dê wê kulîlka ha bibîne û dê destê xwe dirêjê wê bike, da ku wê biçine. Bi Xwedê, hingê dê destê xwe dirêjê wê bike, da ku wê biçine. Bi Xwedê, hingê dê lingê wî bişemite û ew'ê bêje "şelp" û bikeve lîçê û tê da bifetise!"

Keçikê piştê ku xwe bi xwe wisa gotîye, hema di cîyê xwe da gotîye "kûûûûr" û dest bi girînê kirîye, bi girîna xwe ra jî deng li "Memoyê xwe" kirîye û weha gotîye:

-Wax, mala min ji te ra bişewite, Memoyê min! Çavê dîya te ya reben ji te ra birije, Memoyê min! Xwezî ku lingê min bişikya û ez nehatima ser vê kanîya mîrat û weha nehata serê te, kurê min ê delalî! Ku ez bihatima jî xwezî ku min tu bi xwe ra nanîyayî vir, kurê min ê ezîz! Xwezî di şûna te da ez birima, berxê min! Xwezî ku tu bê min bimayayî, ne ku ez bê te bimama, lawo!

Ji alîyekî dî ve, ji ber ku keçik dereng maye, dîya wê ketîye tatêlê û deng li keça xwe ya ji wê biçûktir kirîye, jê ra gotîye:

-Dota min, ka bazde here ser kanîyê û binêre xuşka te çima venegerîya. Xwedê bike ku tişt-mişt nehatibe serê wê.

Xuşka biçûk bi lez û bez ji malê derketîye û bi bayê bezê çûye ser kanîyê. Dema gihiştîye wir û dîtîye ku xuşka wê hella ye digirî, bi meraq û tatêl jê pirsîye, gotîye:

-Tu çima wisa digirî, xuşkê? Gelo çi qewimîye?

Xuşka mezin ji alîyek ve girîna xwe domandîye, ji alîyek ve jî nîşqîyaye û semedê girîna xwe bi xuşka xwe ya biçûk daye zanîn. Hingê dilê xuşka biçûk jî bi "xwarzayê wê Memo" şewitîye. Wê jî hema di cîyê xwe da li çokên xwe xistîye û

gotîye “kûûûûr” û dest bi gîrînê kirîye, deng li “xwarzayê xwe Memo” kirîye û weha gotîye:

-Wax xwarzayê min ê xweşdivî û ezîz, Memo! Çavê xaltîya te ji te ra kor bibe, Memo! Xwezî ku ne tu bûyayî, lê di şûna te da ez bûma, Memo!

Bi wî awayî, her du xuşk êdî bi hev ra li ser Memo girîyane û dengê wan bi hev ketîye.

Qasek derbas bûye, dîya wan dîtîye ku her du keçik venegerîyan, vêca deng li kurê xwe kirîye û gotîye:

-Kurê min, ka rabe here ser kanîyê û binêre ka her du xuşkên te çima nezivirîn. Xwedê bike ku tişt-mişt nehatibe serê wan.

Kurik rabûye û bi lez û bez çûye ser kanîyê. Dema gihiştîye wir û dîtîye ku her du xuşkên wî deng bi hev xistine û hekka ye digirîn, ketîye tatêlê û ji wan pirsîye, gotîye:

-Xuşkno, hun çima digirîn? Gelo çi qewimîye?

Her du xuşk ji alîyek ve girîyane, ji alîyek ve jî bi nişqîn qala semedê girîna xwe ji birayê xwe ra kirine. Kurik dema ku semedê girîna wan bihistîye û fam kirîye, dilê wî jî bi “xwarzayê wî Memo” sewitîye. Wî jî hema gotîye “kûûûûr” û digel her du xuşkên xwe girîyaye, di eynê demê da jî deng li “xwarzayê xwe Memo” kirîye û weha gotîye:

-Wax, xwarzayê min ê xweşdivî, Memo! Mala xalê te ji te ra bişewite, Memo! Tu per û baskên xalê xwe bûyî Memo! Tu ronayîya her du çavên xalê xwe bûyî, Memo! Tu’yê mezin bibûyayî û bibûyayî mêrê pişta xalê xwe, Memo!

Bi wî awayî, kurik jî li tenişta her du xuşkên xwe daniştîye û her sê bi hev ra ji Memoyê biçûk ra girîyane û deng bi hev xistine.

Pêlek derbas bûye, dîya wan nihêrtîye ku kurik jî nehat. Ji ber wê yekê, tatêla wê uekcar zêde bûye. Vêca ew bi xwe rabûye çûye ser kanîyê, da ku binÊre ka

zarûkên wê çima nehatin. Dema gihiştîye wir û dîtîye ku her du dotên wê û kerê wê wa ne deng bi hev xistine û digirîn û wek barana buharê histiran ji çavên xwe dibarînin, pirrtir ketîye tatêlê û ji wan pirsîye, gotîye:

-Zarûkno, hun çima wisa digirîn? Gelo çi qewimîye?

ZArûkên wê ji alîyek ve girîna xwe domandine, ji alîyek ve jî nişqîyane û jÊ ra semedê girîna xwe gotine. Hingê dilê wê jî bi "nevîyê wê Memo" şewitîye. Wê jî gotîye "kûûûûr" û dest bi girînê kirîye û digel her sê zarûkên xwe girîyaye; bi girîna xwe ra jî deng li "nevîyê xwe Memo" kirîye û gotîye:

-Wax, nevîyê min ê xweşdivî, Memo! Çavê dapîra te ji te ra birije û kor bibe, Memo! Mala dapîra te ji te ra bişewite, Memo! Tu delalîyê ber dilê dapîra xwe bûyî, Memo! Xwezî di şûna te da ez bûma, Memo!

Demek jî wisa derbas bûye, malxoyê malê bala xwe dayê ku ne zarûkên wî hatin, ne jî xêzana wî hat. Ew jî ketîye tatêlê û ji mêvanê xwe ra weha gotîye:

-Yek jî ji wan venegerîya û nehat. Hebe-tunebe tiştek qewimîye, loma ku yeka-yek çûn û nehatin. Xwedê bike ku qezayek, belayek nehatibe serê yekê ji wan. Ka vêca jî ez biçim binêrim mesele çi ye. Ji kerema xwe bibûre ku ez'ê nuha te tenê bihêlim. Lê ez zêde namînim, ez'ê zû vegerim.

Mêrêk mêvên li malê hiştîye û derketîye çûye ser kanîyê. Dema gihiştîye wir û dîtîye ku her sê zarûkên wî û xêzana wî wa ne deng bi hev xistine û hella ye digirîn, tatêla wî zêdetir bûye û deng li wan kirîye, gotîye:

-Êra hun çima digirîn? Xwedê xêr ke, çi qewimîye? Xêzana wî û her sê zarûkên wî ji alîyek ve girîna xwe domandine, ji alîyek ve jî nişqîyane û qala semedê girîna xwe jê ra kirine. Hingê, dilê mêrik jî bi "nevîyê wî Memo" şewitîye. Wî jî hema gotîye "kûûûûr" û dest bi girînê kirîye, digel xêzana xwe û her sê zarûkên xwe girîyaye, di eynê demê da jî deng li "nevîyê xwe Memo" kirîye û gotîye:

-Wax, nevîyê min ê hêja û xweşdivî, Memo! Mala bapîrê te ji te ra bişewite, Memo! Te bi mirina xwe em xistin derd û xemên giran, Memo!

Demek derbas bûye, mêvên dîtîye ku malxoyê malê jî nehat. Vêca jî ew ketîye tatêlê rabûye çûye ser kanîyê, da ku binêre ka li wir çi qewimîye. Dema gihiştîye ser kanîyê û dîtîye ku hemîyan deng bi hev xistîye û hella ye digirîn, semedê wê girîna wan meraq kirîye û pirsîye, gotîye:

-Gelo xêr e, hun çima wisa digirîn?

Malxoyê malê girîna xwe domandîye û di eynê demê da semedê girîna xwe û xêzana xwe û zarûkên xwe jê ra gotîye û pê daye zanîn. Mêvên ji wê yekê wisa şaş bûye ku, ji şaşbûnê devê wî vekirî maye. Di dilê xwe da gotîye:

"Min got ku dîya min û xêzana min dîn in. Lê belê ez bala xwe didimê ku ev mirovên ha ji wan jî, ji hemî dînan jî dîntir in. Nexu divê ku ez ji dîya xwe û xêzana xwe nexeyidim û şikra xwe bi halê wan bînim û dîsa vegerim herim mala xwe. Li ber van dînên ha, dîya min û xêzana min aqilmend tên têwkirin".

Paşê zivirîye ser mazûvanên xwe û gotîye:

-Na na, firîqet bin û qet meraq mekin. Ez nehatime xwazginîya dota we. Ez zilamekî zewicandî me. Tenê bi rêbûrîn ez li we qesidîm. Eva ez vedigerim û diçim mala xwe.

Kurik bi wê peyva xwe ra xatir ji wan xwestîye, pey xwe daye wan û berê xwe daye gundê xwe, bi lez û bez ji wir bi rê ketîye û çûye hey çûye.

### 3.3.5. Şivanê Derewîn

Hebû tunebû şivanekî derewîn hebû. Rojekê ji rojan li mergê kire hewar:

-Gelî hevalan! Werin arîkariyê. Gur hatiye pezê min.

Hevalên wî hatin û dîtin ku derew e. Tevan bi hev re got: "Çi şivanekî derewçîn e."

-Ez henekan dikim lo.

Rojekê şivan dixwest ku pezê xwe biçêrîne. Gurekî mezin hate pezê wî û cih de kire hewar:

-Hewar, werin arîkariya min îmdat! Gur hatiye pezê min.

Hevalên wî vê carê bawer nekirin û gotin:

-Derewan dike, em neçin lo.

Lê derewa şivan jê re bû karekî giran. Gur gelek pezê wî xwarin.

Gotina dawî ya hevalên wî bû:

-Piştî çi? Te mala xwe bi destê xwe wêran kiriye.

### 3.3.6. Derewa Mezin

Çîrokbêj: Erdal Aydın, Semsûr.

Rojekê, li devereke dûr sê hêval hebûne. Her sê heval rojekê qirarê didin û bi hev re diherin seydê[45] û li kêrguhekî[46] dixin. Wî kêrguhî li heft deveyan bar dikin û tînin nav gund li hev û du par dikin. Paşê goştê kêrguh dikelînin, bi dilê xweş dixwin û di ser de jî radimedin. Ku radimedin, roviyek tê û der û dorê devê wan ê dongirtî dadilêse. Di wê mayînê de ji wan yek bi xwe dihese û rovî digire. Ku rovî digire, çil şivî tê re dikişîne û çil bar cihaw[47] jê derdixe. Dûre her sê heval li ser wî çil bar cihawî li hev û du nakin û li hev dixin. Ew dibêje; "Cihaw ê min e." Yê din dibêje; "Yê min in." Bi wî halî diherin ba qêdî.[48] Ku halê xwe jê re dibêjin, qadî jî dibêje:

- Bila her yek ji we derewekê bike. Ku derewa kê ya herî mezin be ez ê cihawan bidim wî.

Hevalê siftê dibêje:

[45] seyd: nêçîr.
[46] kêrguh: kîvroşk.
[47] cihaw: caw, qumaş.
[48] qadî: dadger, hakim.

- Qadî Efendî! Rojekê em çil heval di beroşekêde bi mûrc û çakûçan dişuxulîn lê dengê me yekî nediçû yê din.

Hevalê duyemîn dibêje:

- Qadî Efendî! Ez rojekê li ber çemê Ferat dixebitîm. Min ji beriya xwe çiaxareyek derxist ku ez bikişînim, dendikekî kundiran ji berîka min derket. Min ew avêt erdê. Bawer bike, heta ez çûm aliyê din û hatim min dît ku kundirê min hêşîn bûye, mezin bûye, guliyekî xwe daye ser Ferêt. Xelkê wir ew ji xwe re kiriye pir. Çil wesayît ji vî alî ve diherin, çil wesayît jî ji wî alî ve tên.

Hevalê sêyemîn jî dibêje:

- Qadî Efendî! Rojekê şivanê gundê me hat got, miha te ya çavreş winda bûye. Min fiskaniyek[49] lêxist, dîkê min hat li ber min sekinî. Min derziyek di pişta dîkê xwe re kir û çûm ser derziyê. Min dît ku miha min a çavreş li ser Çiyayê Spî diçêre. Min silimek[50] çêkir. Li dîkê xwe siwar bûm û min çû miha xwe ya çavreş anî. Paşê pişta dîkê min, yê ku min derzî tê re kiribû, kul bû. Min got, çi derman e, çi ne derman e? Gotin, gûzeke Hindê derman e. Min jî got, li ba kê hebe, li ba kê tune be? Gotin, li ba pîrekê heye. Ez çûm ba pîrê. Min got, "Pîrê pîrê! Ji min re gûzeke Hindê lazim e." Pîrê jî ji min re got, "Bîst û pênc salan berî vê min gûzek Hindê Xwaribû. Were li nav didanên[51] min bihihêre." Min jî devê pîrê vekir û dora didanên wê bi têvir veda. Min gûzek Hindê a tûmî[52] ji nav dinanên pîrê derxist û hatim malê.

Hevalê sêyem şora xwe dirêj dike û dibêje:

- Qadî efendî! Min şekir nebir ku gûza Hindê bikûtim. Min rabû gûz bi tûmî da ser pişta dîk a kul û ez wê şevê raketim. Sibê bû, ez rabûm ku gûza min a Hindê di birîna dîk de hêşîn bûye û mezin jî bûye. Min jî gûza xwe dişand[53]. Embar, xanî û dûkan bi gûzan tijî kirin. Cotek gûz li jor ma. Qadî efendî, min şik nebir ku kevirekî biavêjimê, min rabû kêsek ax avête cotê gûzan. Ku min kêsa axê avêtê, ew kês li jor

[49] fiskanî: sîle, şimaq.
[50] silim: diran.
[51] didan: diran.
[52] tumî: sax, bi temamî.
[53] daşandin: daweşandin.

bû heft tilm[54] erd. Êdî min debara xwe bi wî erdî dikir. Ku çi jim re lazim bikira min jî wî erdî radikir. Sal derbas bû, bû sala din. Min got, ez îsal çi biçînim, çi neçînim? Xelkê ji min re got, zebeşan biçîne. Min jî toximê zebeşan çand. Piştî demekê zebeşên min giş mezin bûn. Carekê min got, yekî hûr bikim bê ka bûye yan na. Çima kêra min kete nava zebeş? Min jî xwe di pey kêrê re avêt hindirê zebeş. Li ber min deriyê bajarekî vebû. Min dest bi gerîna kêra xwe kir…

Qadî Efendî di wir de dibêje;

- Bes e, bes! Van cihawan bere(bibe) bila giş ê te bin, ne lazim.

### 3.3.7. Destbiratîya Rovî û Quling

Dîbêjin hebû tunebû, rovîyek û qulingek hebûn. Rovî û qûling bûbûn destbirakên hev. Rovî rabû rojekê birakê xwe yê quling vexwend malê lê ev vexwendina wî ne ji siqnê safî bû, yanî ne ji dostiyê bû. Divê miheqeq nerindîyek bikira û quling bikenîya. Û ji xwe wer jî dike. Dema roj û saeta çûyînê hat quling rabû çû  mala birakê xwe. Piştî ku silav li hev kirin û hal û demên hevûdin pirsî, rovî rabû çû şîva birakê xwe jê re anî, rijand ser tahtekî û got:

-Kerem bike!

Şîv pelok bû û rovî rijandibû ser têht, loma jî her cara ku quling nikilê xwe li têht dixist janê dida dilê wî û tiştek jî bi dev nedibû. Quling kir nekir, n,kanîbû zikê xswe têr bikira. Lê rovî kişyabû ber pelokê, têra dilê xwe taht dialast û ji alîkî ve jî tim bi şitî ji quling re digot:

-Birakê quling, tu bi xatirê Xwedê dikî tu yê şerm nekî û têr bixwî. Lê çi bixwe çi hal, itştê hatibû serê quling nehatibû serê tu kesÎ. Quling ji hêrsan dikira biqetîya. Dawîya dawî quling spasî rovî kir, got me kêm kir Xwedê zêde bike û ji ser sifrê vekişîya. Quling berî ku bi rê keve ji rovî re got:

-Birakê rovî, mala te ava ji bo hurmet, mêvanperwerî û vexwendina te. Lê divê hefta bê roja şemîyê tu jÎ bibî mêvanê min.

[54] tilm: pîvanek e ku bi qasî du hezar metreyên çargoşe ye.

Rovî ev vexwendina quling bi  dilxweşî qebûl kir û got:

-Ser seran ser çavan, roja şemîyê ez mêvanê te me. Quling rabû wê rojê danoyek çêkir û bera kûzekî devdirêjî wekî misiînekî da. Rovî, wekî ku li  hev kiribûn bi rastî jî tam di wexta xwe da hat. Piştî çend gotinên vir de û wê de quling anî kûzê tije dano danî ber birakê xwe yê rovî û got:

-De kerem bike! Rovî zimanê xwr bi vî alîyê kûz xist, bi wî alîyê kûz xist lê hebek dano jî neket devê wî. Lê quling bi saya wî nikilê xwe yê dirêj danoyê xwe têr xwar û di ber re jî tim carnan ji rovî re digot:

-Birakê rovî, tu qedrê Xwedê dikî tu yê şerm nekî û têrbixwî. Bi van gotinên bi mane quling heyfa xwe ji rovî digirt. Rovî jî ev yek baş zanîbû lê nedida der. Berî çûyînê rovî got:

-Birakê, quling, ji ber vê xizmet û mêvanperîya te mala te ava. Ji ber vê camêrîya te ya îro ez jî dixwazim çêyîyekê bi te bikim, ez dixwzim  çivan bikim. Quling bi mereqdarî got:

-Bira tu dê çawa min fêrî çivan bikî?

Rovî got:

-Gelek hêsan e. Ez ê te bi dêla xwe ve girê bidim û dû re jî bidim çivan, her cara ku min çiv da xwe tu yê jî wekî min bikî û bi vî awayî tu yê fêr bibî.

Ev pêşnîyara rovî ket serê quling û soz da ku rojekê here li ba rovî fêrî çivan bibe. Çend roj derbas bûn quling rojekê rabû lêxist çû ba rovî ji bo ku fêrî çivan bibe. Rovî bi hatina quling gelekî kêfxweş bû. Dû re rabûn çûn nava qişêkî gelekî asê. Rovî, quling zexm bi dêla xwe ve girê da û di nav qîş da dest bi bezê kir û heta jê hat çiv dan xwe. Li pey rovî quling bi erdê re dikşîya û li vî alî û li wî alî li keviran û li dar û beran diket û pûrt jê diweşîya. Di wê navberê de herçiqas quling dikir qareqar jî lê rovî wekî ku deng nediçûyî beza xwe didomand. Bi vî awayî quling weha bû ku hebek pûrt pê ve nema û laşê wî jî giş birîn bû. Piştî ku rovî têr kêfa xwe bi quling qewitand jê re got:

-Birakê quling, ez hêvî dikim ku tu baş hînî çivan bû, ne wisa? Quling bi halekî xerab bersiv da, got:

-Erê ez baş fêr bûm. ji bo vê qencîya te mala te ava!. Bi rastî jî te ez baş hînî çivan kirim! Divê êdî ez biçim malê. Dû re xatir ji rovî xwest bi halekî perîşan berê xwe da malika xwe. Quling heta demeka dûr û dirêj ji ber birînên xwe ne kanîbû ji hundir derketa der û ne jî bifirîya. Ji ber ku bûbû wekî mirîşkeka rûçikandî. Demek di ser re derbas bû, pûrta quling bi temamî derket û birînên wî jî hemû kewîyan. Êdî baş hatibû ser hikim û hêla xwe. Lê ew nemertîya rovî qet ji bîra wî nediçû. Û ji alîkî de jî tim difikirî ku dê çawa heyfa xwe ji rovî bigire? Axir dawîya dawî rojekê rabû lêxist çû mala rovî. Rovî dema çav li quling ket mat ma, û ji heramî jê re got:

-Birakê quling, ev ewqas wext e tu li ku yî, tu qet xuya nakî? Min pir meraq dikir, lê qet rojekê jî ez venehesîyam ku werim serîyekî bidim te, li hal û demê te bipirsim.

Quling zanîbû rovî bi van gotinan kuçan li quling dixe û tînazê xwe pê dike. Lê quling qet tiştek neda der û got:

-Mala te ava. Bi rastî min jî dixwest werim te bibînim, lê ji ber kar û barê dinyayê min nikanîbû li hev ragirta.

Demekê bi vî awayî şêwir û mişêwr xwe domandin. Dû re quling got:

-Birakê rovî, ez hatim vir ji bo îro te fêrî firînê bikim.

Rovî got:

-Tu yê çawa min fêrî bikî? Çimkî ez nikanim wekî te bifirim.

Quling got:

-Tişt nabe. Tu yê li baskê min siwar bî û ez ê bifirim. Bi vî awayî tu yê jî bi min re fêrî firînê, yanê gera li asîmana bibî. Kêfa rovî ji vê pêşnîyarê re gelekî hat û rabû li baskê quling siwar bû. Quling bi hewa ket û bilind bû, çû di nava ewran de wenda bû. Carekê ji rovî pirsî, got:

-Bira, dinya ji te ve çawa xuya ye?

Rovî got:

-Dinya ji min ve wekî tara bêjingê xuya ye. Quling hinkî din jî bilind bû û dîsan pirsî:

-Birakê rovî, lê îcar dinya çawa xuya ye?

Rovî got:

-Wele îcar bi qasî tara mixilê xuya ye.

Quling hinekî din jî bi hewa ket û cardin pirsî:

-Birakê rovî, lê îcar çawa xuya ye

Rovî got:

-Bira dinya îcar ji min ve wekî kuniya (qulika) derzîyê xuya ye.

Dema rovî got dinya ji min ve bi wekî kunîya derzîyê xuya ye, quling got:

-Birakê rovî, ev baskê min qerimî, ji kerema xwe re were ser baskê minê din.

Çaxa rovî xwest lingê xwe bavîje ser baskê din, quling baskê xwe ji bin kişand û rovî ser serî, noqî erdê dibû ji tirsa hem bi xwe de berdida û hem jî ji alîkî de digot:

-Hela mela, ez bikevim ser kurkê mela, hela mela , înşelah ez bikevim ser kurkê mela!...

Tam di wê taftafê de meleyekî li mêrgekê nimêj dikir. Mele hew carê dît ku ji hewa de tebayek tê, tiştek jê dibare û dengekî pir ecêb derdixe. Meleyê reben cunî bû. ji tirsan kurkê xwe, tizbîya xwe û şaşika xwe li şûna xwe hîşt û baz da. Rovî jî ji qeza qudretê re rasterast, hat li ser kurkê melê ket û rovî rabû tizbî da destê xwe, kurk li xwe kir û şaşik jî da serê xwe û da rê û çû. Pir çû hindik çû, rastî hirçekê hat. Hirçê bala xwe dayê bavo çi bibîne, ku rovî şaşik li serî ye, kurkekî herwanî lê ye û

tizbîyeka nodûnehhebî jî di destan de ye û xwe li ba dike û ji hember de tê. Her du li hev sekinîn. Hirçê got:

-Rovî, te ev kurkê xweşik ji ku anî?

Rovî got:

-Ma tu nizanî ez ji bav û kalan de kurkvan im.

Hirçê got:

-Law wele min ev hostetîya te nizanîbû, ez nû dibihîzim ku tu kurkvan î. Wê gavê ez dixwazim tu ji min re jî kurkekî çêkî.

Rovî got:

Ser seran, ser çavan. Lê ji bo çêkirina kurkekî weha, sê berindîrên xam lazim in, ku tu sê berindîrên xam ji min re bînî ez dê ji te re kurkekî baş çêkim. Hirçê ev daxwaza rovî qebûl kir û ji cem rê ket. ÇEnd roj di ser re derbas bûn, hirçê sê berindîrên xam , yek bi yek kişandin ber qulika rovî û jê re got:

-ma tu yê heta çend rojan bikanibî biqedînî?

Rovî got:

-Piştî şeş rojan kurkê de hazir e.

Li ser vê soza rovî, hirçê da rê û çû. Piştî şeş rojan hirç çû ku kurkê xwe bibe ji rovî re got:

-Rovî, maşalah te qedandîye?

Rovî got:

- Bi serê bavê min û te li ber qedandinê ye. Bes stûkur û berzendika wî maye. Ji ber ku berindîrên te anîbûn qîm nekirin.

Hirçê got:

-Çend berindîrên din ji te re lazim in?

Rovî got:

-Du berindîrên din hebin ez bawer dikim dê têra te bikin.

Hirçê jî mecbûrî got:

-Baş e, ez dê herim du berindîrên din jî ji te re bînim. Bes dîvê kurkekî bai ji min re çêkî. Bi şev hirç çû ket nav kerîyekî, du berindîrên baş avêtin ser milê xwe û berê xwe da qulika rovî. li ber qulika rovî sekinî û got:

-A va ye min ji te re du berindîrên din jî anîn.

rovî got:

-Sê rojên din kurkê te hazir e.

Çer hirç çû, rovî û zarokên xwe wekî gurên har ketin ser goşt, têr xwarin. Piştî sê rojên hirç dîsan çû ba rovî û got:

-Rovî ma te kurkê min qedandîye?

Rovî got:

Wey tu bi xêr û xweşî hatîyî, ser serê min û ser çavê min! Bawer bike ji roja tu çûyî û vir ve de ez wer li ser dixebitim. Lê bi gora bavê te eyaran dîsa têr nekir. Tenê berzendika çepê maye. Heger berindîrek din jî hebe dê têrê bike.

Hirçê ji mecbûrî ev daxwaza rovî jî qebûl kir, got baş e, ez dê herim berindîrek din jî bînim. Û wê şevê çû berindîrek din avêt ser milê xwe û çû mala rovî. Li ber qulikê dîsan ban rovî kir, got:

-Rovî, were va ye min berindîr anî. Rovî derket der û dest bi nangenimîyan kir, got wey tu ji wir hetanî vir di ser serê min û di ser çavên min re hatîyî, wey nizanim te pê li rohnîya çavên min kirîye û gelek gotinên weha. Hirçê got:

-Lê divê tu êdî serî li min negerînî!

Rovî got:

-Sibê danê êvarê kurkê te hazir e. Hirçê xatir ji rovî xwest û çû. Piştî hirç çû, rovî ban çêlikên xwe kir û ji wan re got:

-Sibê danê êvarê hirçê were kurkê xwe. Wê gavê em ê li derve bin. Min ji we kîjan şand hundir ji bo ku hûn herin kurk bînin paş de venegerin, ez çiqasî bangî we bikim jî dengê xwe dernexin. Çêlikan gotin "baş e". Dawîya dawî ew dem jî hat û hirç dîsan çû ber derîyê rovî. Dema hirç hat, bala xwe dayê ku rovî û çêlikên xwe li ber qulika xwe dilîzin. Hirçê got:

-Rovî, ma kurkê min hazir e?

Rovî got:

- Erê, min bîska berê qedand. Û dû re jî ji çêlikekî xwe re got:

-Lawhere kurkê xalê xwe bîne!

Lawo çû hundir lê belê bi paş de venegerîya. Bîstek derbas bû, rovî çend caran bangî lawo kir. Lê deng bji hundir nehat. Îcar rabû qîza xwe şand. Lê keçik jî ket hundir û êdî hew derket. Rovî vegerîya ser hirçê û got:

-Wer xuya ye her du xulamên te di di hundir de li ser bexşîşê li hev nakin. Lawik dibêje ez dê bibim bila bexşîş ji min re be, keçik dibêje na ez dê bibim bila ji min re be. Ya çêtir ew e ku ez herim ji dest wan derxim nû bînim.

Rovîweha got û çû ket qulika xwe. Lê deh deqiqe, bîst deqîqe, nîv saet di ser re derbas bû rovî ji qulikê derneket. Hirçê çend caran bang kir, got "rovî, ma tu çima dernakevî der?" Rovî ji hundir bersiv da, got:

-Tu çi ji dixwazî, ji bo çi ez dê derkevim der?

Hirçê got:

-Law kurkê min bîne!

Rovî got:

-Kurkê çi halê çi?

Hirç şepleyî bû, got:

-Çawa kurkê çi halê çi rovî? Ma ne min hewqas pez dan te ku tu ji imn re kurkekî çêkî?

Rovî got:

-Hirça kêmaqil, ma ez kurkvan, bavê min kurkvan, kalê min kurkvan e ku tu hatîyî kurkan ji min dixwazî? Dema rovî weha got, hirç gelekî hêrs bû û hema serê xwe rada qulika rovî. Lê devê qulikê pir teng bû û loma jî serê hirçê tê de asê bû. Rovî û her du çêlikên xwe ji dawîya qulikê derketin der . Rovî çû li pişt hirçê sekinî, babûsek avêtê û bi tinazî jê re got:

-Hirça totikvala, aqil taca zêrin e û ew jî di serê te de nîn e û loma jî ji ber derîyê min kên nabe goştê xamberindîran e.

## 4. TEZİN DÖRDÜNCÜ BÖLÜMÜNDE ANALİZ EDİLEN MASALLAR

### 4.1. Hayvan Masalları

#### 4.1.1. Hecî Gur

Hebû tunebû gurekî pir kone hebû. Rojekê ewqas birçî bû ku, dikira ji birçîna bixewirîya. Ji bo ku ji xwe re nêçîrekê bike rabû bi çol û çepelan keti Vir de gerîyaa wê de gerîya, lê tu tiştek bi dest nexist. dawîya dawî, çû li ber gomeyekî mezin rûniştû ji xwe re kûr û dûr fikirî. Ji xwe re got:

-Wele heger ez dest bi hin fenan nekim ez dê ji birçîna bimirim!

Rabû çû ji xwe re şahrikek ji derekê peyda kir û li dor serê xwe gerand û tizbîyeke nodûneh hebî jî da destê xwe û berê xwe da deştê. Pir çû hindik çû, rastî mîhekê hat. Dema mîh çav li gur ket û ji tirsan qutufî û baz da. Gur ban mîhê kir û jê re got:

-Erê erê, ez Hecî Gurê li ser rîya Hecê Tobedarê ber destê Xwedê ev mîha şêrîn û dilpaqij. Ji min Ditirse, ber min baz dide hezar carî heyf! Dema mîhê ev gotinên gur bihîstin tavilê paş de vegerîya û ji gur re got:

Apê gur ev çi şaşik û tizbî ye ma tu weha bi ku de diçî?

Gur got:

-Wele ev demek e min li ber destê Xwedê tobe kirîye ku ez hew heywanan dixwim, hew xerabîyê dikim. Lê ji bo ku ez ji gunehên xwe yên berê xelas bibim, ez diçim hecê. Ez dê ji niha û pê ve li mala xwe rûnim û ji xwe re tenê zikir û îbadeta xwe bikim.

Mihê got:

-Min efû bike, apê hecî hecî Gur, min nizanîbû tu li ser rêya Hecê yî. Madem tu diherî Hecê, Hema xêra xwe ji dêl min ve jî çend caran wîkevirê bimbarek maçî bike! Û ez hêvî dikim ku tu yê bi xêr û xweşî herî û werî.

Gur got "mala te ava" û dû re jî xatir jê xwest û çû. Pir çû hindik çû rastî kerekê hat. Dema ker çav li gur ket hema da zîtikan û baz da. Gur ji pa re bang kirê û got:

-Erê erê, ez Hecî Gurê li ser rêya hecê, tobedarê ber destê Xwedê , ev kerê dilpaqij, ji min ditirse û ji ben min baz dide. Hezar carî heyf!

Piştî van gotinên ker gur ker paş de vegerîya û got:

- Min efû bike apê gur! Min şaş fêm kir. Ma tu weha bi ku de diçî?

Gur got:

-Ev demek e min li ber destê xwedê tobe kirîye ku ez hew heywanan dixwim. Lê gunehên min yên berê pir in. Îcar ji bo ku ez ji wan gunehên xwe yên berê xelas bibim ez diçim Hecê.

Ker got:

-Oxira te ya xêrê be û Xwedê Hecê te qebûl bike! Û heger hat bîra te ji bo min jî çend dueyan bike û ji dêl min ve jî wî kevirê bimbarek ramîse. Gur got "baş e" û dîsan ket rê û meşîya. Pir çû hindik çû rastî hêstirekê hat. hêstîrê dema gur dît gelekî tirsiya û baz da. Gur bi pê ket û bang kirê got:

-Erê erê, ez Hecî Gurê li ser rêya Hecê, Tobedarê ber destê Xwedê, ev hêstira dilpaqij ji min ditirse û ji ber min baz dide. Hezar carî heyf!

Piştî van gotinên gur, hêstir bi paş ve vegerîya û got:

-Min efû bike Apê gur, ma tu weha bi ku de diçî?

Gur got:

-wele ev demeke min li ber destê Xwedê tobe kirîye ku ez hew heywanan dixwim, hew xerabîyê dikim. Lê ji bo ku ez ji gunehên xwe yên berê xelas bibim ez diçim Hecê. Ez dê ji niha û pê  ve li mala xwe rûniim û ji xwe re zikir û îbadeta xwe bikim.

Li ser van gotinên gur, hêstir nerm  bû û got:

- Wê gavê oxira te ya xêrê be û Xwedê Heca te qebûl bike!

Gur dîsan ket rê û çû. Lê piştÎ ku hinekî meşîya, ji xwe re got:

-Law ma ez çi ehmeq im! Va ye ez dikim ji birçîna bimirim, lê min berê xwe daye heca bi derewan. Ma bavê min çûye Hecê ku ez jî herimê. Bi Xwedê ya herî baş ew e ku ez vegerim û hemûyan bixwim û zikê xwe têr bikim.

Gur piştî ku ev tevdir di serê xwe de gerand, rabû bi paş de vegerîya. Çû berê xwe gihand mîhê. Mîhê got:

-Te xêr e apê Hecî Gur, ma qey te tiştek ji bîr kirîye?

Gur got:

-Min ji bîr kir ku ji te tiştekî bipirsim. Ez fikirîm ku ji te re diyarîyekê bi xwe re bînim û 'emrê (temenê) te jî li ser bidim nivîsandin; ji bo ku têxî stûyê xwe. Lê ez nizanim tu çend salî yî. Min got ez li diranên te binêrim ji bo ku 'emrê te fêr bibim.

Dema mîhê xwe nêzikî gur kir ku diranên xwe nîşanî wî bide, gur hema xwe ji nişka ve çindî ser kir û ew xwar. Piştî ku mîh temam kir, îcar da rê, çû ba kerê. Bi vegera gur re, ker şaş ma û jê re got:

- Apê Hecî, ma tu çi zû çûyî û hatî? Qey Hec ewqas nêzik e?

Gur got:

- Min ji bîr kir ku ji te bipirsim. Ez fikirîm ku ji te re diyarîyekê bi xwe re bînim û 'emrê te jî li ser bidim nivîsandin; ji bo ku tu têkî xwe. Lê ez nizanim tu çend salî yî. Min got ez li diranên te binêrim ji bo ku 'emrê te fêr bibim. Ker got "baş e" û devê xwe hirinekê vekir ji bo ku gur diran wî bijmêre. Lê gur ji dêlî ku diranên wî bijmêre, hema xwe çindî ser kir û ew jî xwar. Dû re jî berê xwe da hêstirê, ji bo ku wê jî bixwapîne û bixwe. Lê hêstirê fêm kir ku nîyeta gur xerab e. Hêstirê xwe li xamîyê danî û got:

-Xêr e apê Hecî Gur, tu çima weha zû vegerîya, ma qey te tiştekî xwe ji bîr kir?

Gur got:

-Min ji bîr kir ku ji te bipirsim. Ez fikirîm ku ji te re diyarîyekêbi xwe bînim û emrê te jî li ser bidim nivîsandin; ji bo ku tu têxî stûyê xwe. Lê ez nizanim tu çend salî yî. Min got ez li diranên te binêrim ji bo ku 'emrê te fêr bibim.

Hêstirê got:

-Wele ez nizanim ez kîjan salê hatime dinê. Lê çaxa ez hatim dinê, dêya min 'emrê min li bin simê min yê dawî nivîsan. Were tu bi xwe bixwîne, mêze hela ez kîjan salê hatime dinê.

Gur got baş e û dema çû pişt hêstirê ji bo ku nivîsa binê simêwê bixwîne, hêstirê zîtikek baş avêt orta enîya wî û ew bêhiş xist û li erdê kir term. Dû re jî rabû ew avêt ser pişta xwe û bir li orta gund danî. Çaxa kûçikên gund çav li gur ketin, hema gişan bi hev re êrîş birin ser û dinava gund de birin û anîn. Hecî Gur bi zor û bi halekî gelekî pir xerab xwe ji nav lepên kuçikên gund xelas kir çû xwe gîhand qulika xwe. Piştî ku hinekî bîna xwe bgirt ji xwe re got:

-Ev halê min heq û misteheqê min e! Ma bavê min xwenda bû, kalê min xwenda bû ka ez jî rabim herim nivîsa bin simê hêstirê bixwînim! Hezar tobe li min û bavê min ku ez careka din bi derewan bibim hecî û xwe li katibîyê rakişînim! Tobe!

### 4.1.2. Kûçik û Gur

Dibêjin rojekê kuçik rabû xwe ji ber mala xwedîyê xwe vedizî û bi çolan ket, çû serê çîyan û nava daristanê. Bi rê de ji xwe re got:

-Halê min ne tu hal e, ji bo parîyek nan ez şev û roj ji xelkê re notirvanîyê dikim. Ez dê herim li serê çîyan û li daristanê ji xwe re azad û serbixwe bijîm ji vî halî çêr e. Pir çû hindik çû, rastî kergoşkekê hat. Kergoşkê baz da û wî jî da ser piştê, ha li vir, ha li wir, hew carê dît ku ji nav devîyekê gurekî cûn xwe çindî ser kir û li stûyê wî suwar hat. Gur got:

-Kero, min tu girt! Jixwe ez pir birçî bûm. Tu yê bibî şîva min.

Gur got:

- Bawer nakim ku tu bixwazî min bixwî. Ji ber ku ez pir zeîf im. carê bala xwe bidê, ez tenê hestî û çerm mame. Loma jî tu bi min têr nabî.

Gur qîlên xwe hinekî li stûyê wî sist kirin û dû re jî dest pê kir pençên xwe hêdî hêdî li pişta wî gerand. Piştî ku baş dest kir, got:

-Ji bo min tu ne zeîf î. Ev qelewîya te têra min dike.

Kuçik got:

-Îcar kî bîra xwe û qelew? Hela carê tu min piştî xwarineka baş bibînî ku ez çawa qelew dibim û di ser hev re bigerem. Guh bide min û min niha nexwe. Hefta pêş me daweta keça xwedîyê min e. Bi dehan mîh û berx dê werin şerjêkirin. Her kes ji min hez dike. Dê hestîyên herî mezin bavêjin ber min. Ez dê hestîyan têr bikojim û di ser hev re bigerim. Piştî dawetê ez dê wer qelew bibim ku, dê bibim mazmaze û nikanibim ji cihê xwe bilivim. Pêşnîyara min ji te re, tu yê niha min serbest berdî, ez dê di dawetê de ji her demê bêtir goşt û birincê bixwin û hestîyan bikojim. Dû re, gava ez baş qelew bûm û şûn de êz dê werim vir. wê demê tu yê bibînî ku goştê kûçikê bi kêf û qelew çiqas xweş e.

Gotinên kûik ketin gur û rabû çû ew berda. Kûçik baz da û çû malê. Gur hefteyekê, du hefteyan pa, lê kûçik nehat. Dawîya dawî biryar da ku here fêr bibe hela kûçik ji bo çi nehat. Dema dinya tarî bû, gur rabû lêxist, çû ber mala kûçik. Bala xwe dayê ku wa ye kûçik li ber derî ketîye. Deng lê kir û hinekî jî bi hêrs jê rew got:

-Ma tu ji bo çi nehatî? Ne te soz dabû min ku tu yê bihata. Ev du hefte ne ku fi nava daristanê de ez li bedna te kevzîkî bûme. Tiştê ez dibînim wa ye tu baş qelew bûyî. Rabe em herin! Ez hew dikanim bipêm.

Kûçik got:

-Birakê gur,êdî wê çîrokê ji bîr bike! Ez êdî bi tena serê xwe hew diherim serê çîyan û nava daristanê. Min carê ders xwe girt. Û careka din jÎ wê şaşîyê nakim. Ez yê vir im û ez dê li vir bim. Zû ji ber derîyê min here. Yan na ez dê niha bireyim û hemû kûçikên gund bi te bihesînim. Û dema kûçik bi te hesîyan jÎ tu zanî ku dê çi were serê te!

Gur bêyî ku tiştekî bibêje, dêla xwe kir nava şeqa xwe, lêxist û çû...

### 4.1.3. Kerê Di Bîrê Da

Rojekê li gundekî kerê gundekî gundîyekî di bîreke miçiqî werbû. Heywanê kerr û lal di bîrê de bi saetan li ber xwe da, bênabên zirîya ji bo ku hinek pê bihesin û werin gazî û hawara wî. Piştî demekê axirê xwedîyê wî pê hesîya û çû ser devê bîrê. mêrik bala xwe dayê bîr pir kûr e û heywan jî di halekî perîşan de ye. Fêm kir

ew bi tenê nikane heywên ji bîrê derxe, loma jî bazda çû nava gund, j, gundîyan alîkarî xwest. Gundî bi hev ketin çûn ser bîrê, ji bo xelaskirinê hinekî li ber xwe dan lê bi ser neketin.

Dû re bi heb şêwirîn gotin, heywan ji xwe wa ye di halekî xerab de ye, nuha gelek êşê jî dikşîne û belkî nigên wî jî şikîyabin. Heger ew xelas bikin jî êdî ew ê bi kêrî tu karî neyê. Loma jî biryar dan ku heywên xelas nekin, ji dêlî wê ve axê bavêjin ser, bîrê dagirin û wî heywanî jî di bîrê de bihêlin. Her yekî bêrek, tiştek bi destê xwe xist û ax avêtin ser kerê di bîrê de, bi vî awayî dest bi dagirtina bîrê kirin.

Her ku wan ax ji jor da diavêt ser wî, wî jî tim xwe ji axê dawdişand û ax di bin wî de kom dibû û ew jî pê re bilin dibû. Bi vî hawayî, bi xêra axa di bin wî de kom bûbû, ew hêdî hêdî berbi jor ve bilind bû. Û dawîya dawî bîr tije ax bû û ker jî ji bîrê derket.

Gundî bi vê yekê matmayî man, fêm nekirin bê ker çawa ji binê vê bîra kûr hêdî hêdî bilind bû dû ra jî derket jor...

Belê, hûn bala xwe didinê, ker bi kertîya xwe di binê bîreke kûr de jî dest ji ber xwe berneda û saya liberxwedana xwe ji binê bîrê derket û xelas bû.

Di jiyanê de, di şertên herî dijwar de jî dibê meriv tu carî teslîmî şertan nebe û test ji berxwedanê bernede. Berxwedan jiyan e!

### 4.1.4. Çûk û Kelem

Wextekê çûkek ji xwe ra li zozanan, çiya û baniyan digeriya. Wê ji ser vî darî firdida li ser darekî din datanî. Ji ser zindarekî firdida li ser yekî din datanî. Rojên xwe derbas dikir. Jîyaneke azad dimeşand.

Rojekê kelemek di lingê wê ra çûye. Ew gelekî pê mijûl bûye, lê nikaribû wî kelemî ji lingê xwe derxista. Ji ber êşa lingê xwe, hinekî jî bêhemdî xwe di vir da, wê da firyaye, gelekî pê dêşiya.

Çûkê dîtiye, ku pîrejinek dixwaze kuçikê xwe vêxe, lê belê agirê wê nagire. Gava ku wê, pîrê di wî halî da dîtiye, ew firyaye çûye, hema nêzîkî kuçikê pîrê

daniye. Berê hinekî bala xwe daye rewşa pîrê û agirê wê. Paşê xwe bi nezanî daniye, ji pîrê ra gotiye:

-Daka pîra delal, ez dîna xwe didimê, ku tu dixwazî kuçikê xwe vêxî? Lê usa xûya ye, ku agirê kuçikê te nagire? De tu were, vî kelemî ji lingê min derxe! Tu dikarî bi vî kelemî va agirê kuçikê xwe şên bikî.

Pîrê serê xwe bilin kiriye, bala xwe daye çûkê. Wê berê bêdilî xwe, hinekî daye hişê xwe. Serê xwe bakiriye, lê di dawiyê da gotina çûkê aniye cih.

Pîra te çûye, hema li ber çûkê çong vedaye. Kelem ji lingê wê derxistiye û biriye daniye binê êzingên kuçikê xwe. Rastî jî, agirê kuçikê pîrê vêketiye. Alava êgir quloz bûye. Agirê kuçik geş bûye.

Pîrê sêla xwe daye ser kuçik. Girikên xwe vekirine û yeko yeko avêtine ser sêlê û pahtine. Dema ku karê pîrê qedyaye, ew ji ber kuçik rabûye ser xwe. Mêzera xwe dawşandiye, paşê ziviriye ser çûkê, jê ra gotiye:

-Ez gelekî razî me, bi alîkariya kelemê te va, min nanê xwe lêxist.

Çûka guhbel ji pîrê ra gotiye:

-Pîra delal, ez kelemê xwe paşta dixwazim. Ka kelemê min bide min! Ku tu kelemê min nedî, wê gavê tê şeş nanan bidî min.

Pîrê gotiye çûkê:

-Çûka delal, min tiştek ji te nexwast. Ne te xwe ji min alîkarî xwast. Min jî kelem ji lingê te derxist û danî binê qirş û qalan. Ew şewitî çû. Ez ji bo çi şeş nanan bidime te?

Çûkê gotiye pîrê:

-Tu fita wê tune. Hema vê gavê, tê an kelemê min an jî şeşek nan bidî min.

Pîrê çareseriyeke din nedîtiye, por û poşman şeşek nanê xwe ji teştê derxistiye û daye çûka guhbel. Çûka guhbel şeş nanê xwe hildane û ketiye rê. Ew

demekê rê çûye. Di rê da dîtiye, ku keriyek pez li quntara çiyê diçêre. Şivanê pêz yê cîwan jî, li ser zinarekî rûniştiye. Tasek şîr di destê wî da, bê nan vedixwe.

Çûka guhbel çûye ba şivên, jê ra gotiye:

-Xorto, tu çima şîrê miya qer bênan vedixwî?

Usa tê xûya, ku nanê te tune. Ha ji te ra nan, pê şîrê xwe bixwe.

Herşeş nanê xwe dane şivanê ciwan. Şivan gelekî birçîbûye. Zikê xwe têr kiriye, devê xwe paxiş kiriye û ji çûka guhbel ra gotiye:

-Tu her hebî, çûka delal. Min têr xwar.

Çûka guhbel gotiye şivanê ciwan:

-Xorto, te zikê xwe têr kir. De niha şeş nanê min bide min!

Av li ser şivanê belengaz miçiqiye, şaş û metel maye; gotiye çûkê:

-Heyran, min tiştek ji te nexwast. Te hema ji ber xwe da, bi dilxwazî nan da min. Ez belengazê xwedê, niha şeş nanên te ji ku bînim. Ne min ew xwarin?

Qet ne talaşa çûka guhbel bûye. Hildaye bi hemdê xwe gotiye şivên:

-Ez vêya, wêya nizanim. Hema vê gavê, tê an şeş nanên min bidî min an jî şeş beranan!

Şivan neçar maye, ji nava keriyê pêz şeş beran veqetandine û dane çûka guhbel. Çûka guhbel beran dane pêşiya xwe û daye ser rê. Pîr çûye, hindik çûye, di rê da rastî şahiyekê hatiye. Wê bala xwe dayê, ku bûkekê siwar dikin. Çûka guhbel beran ajotine ber derê wê mala dawetê; ji xudanê dawetê ra gotiye:

-Bira can, mêvanên we gelek in. Hanê ji we ra van beranan ser jê kin, mêvanên xwe rêwî kin.

Xwedanê dewetê pê dilxweş bûye. Wî aniye beranek li ber lingê bûkê ser jê kiriye. Yên mayîn jî ji bo siwarên dawetê ser jê kirine û xwarineke baş daye amadekirinê. Ji piştî şahiyê ra çûka guhbel hatiye, ji xudanê dewetê ra gotiye:

-Pismam ez beranên xwe paşta dixwazim. Ka her şeş beranên min bide min. Tê hema vê lezê an tevaya şeş beranên min an jî bûkê bidî min!

Xudanê dawetê, serdawetî, hemû mezinên gund kom bûne. Wan şêwr û mişêwre kirine çareseriyeke din nedîtine. Di dawiyê da, ew neçar mane, destê bûkê girtine, anîne dane çûkê.

Çûka guhbel destê bûkê girtiye û daye ser rê. Pir çûye hindik çûye, di rê da rastî şivanekî ciwan hatiye. Şivanê ciwan li ser kevirekî rûniştîbûye. Pifî bilûra xwe dikir. Pezê wî jî li dora wî kom bûbûn, guhdariya wî dikirin. Çûka guhbel destê bûkê girtiye, hema rasterast çûye ba wî şivanê ku, li bilûrê dixist. Silavek daye wî, hinekî kirine galegal. Paşê çûkê ji şivên ra gotiye:

-Qurba, were em bazarekê bikin. Hema va bûka ji te ra, wa bilûra di destê te da jî, ji min ra. Tu ji bo vê bazarê çi dibêjî?

Şivên bala xwe daye bedewiya bûkê, hişê wî ji sêrî çûye. Ji ber şabûnan lingên şivên li erdê nediketin. Wî hema carê da, bilûra di destê xwe da, dirêjî çûka guhbel kiriye. Çûka guhbel jî, destê bûkê daye destê wî. Şivên destê bûkê girtiye û tavilka berê xwe daye gundê xwe. Çûkê jî bilûra xwe hildaye, çûye derketiye ser girekî. Bilûr daye ser lêvên xwe, pifî wê kiriye; gotiye:

tût, tût, tût

tût, tût, tût

Çûka guhbel paşê jî gotiye:

-Min kelemek da şeş nanan,

Şeş nan dane, şeş beranan,

Şeş beran daan bûkekê,

Bûk jî da tutukekê

Tût, tût, tût.

Carek di pifî bilûra xwe kiriye.

-Tût, tût, tûtûûûûû…..

Bi kêf û eşq berbe zozanan çûye.

### 4.2. Olağan Masallar

#### 4.2.1. Kalikê Teyş

Carek ji caran, xêr û xweşî bibare li ser hazir û guhdaran, bi tevî bê mal û bê yaran, ji xeynê bekoyê ewanan.

Di dem û dewranekê de li welatekî mêrikekî feqîr û fîqare hebûye, sê heb ji keçên wî yên ezep hebûne. Navê keça mezin Soryaz, a navin Sorxwîn, a biçûk jî Xunav bûye. Rojekê bavê keçan dixwaze here sûkê. Berî ku biçe, diçe li ba keçên xwe, yek û yek ji wan dipirse:

- Keçikên min ên delal, ez diçime sûkê, ka daxwazên we çi ne? Ez ê ji we re bistînim û bînim.

Soryaz dibêje:

- Bavo, ez cotek guhar dixwazim.

Sorxwîn dibêje:

Ez şarpeyekê dixwazim.

Xunav jî dibêje:

- Ez jî ferek bazin dixwazim.

Mêrik dide rê diçe sûkê. Danûsitandina xwe dike, piştê ku danûstandina wî diqede, vedigere tê li ser kaniyekê, bêhna xwe vedide, nimêja xwe dike û difikire.

Dibêje "ka ez binêrim, min tiştek ji bîr kiriye an na." Li têkberên standine dinêre, dibîne ku guharên keça xwe ya mezin ji bîr kirine, nestandine. Pir xem dike û diqehire. Kopalê xwe digire bi hêrs li erdê dixe û dibêje:

- Teyşs! Hew dibîne ku erd dibe du şeq û kalekî bi heybet ji binê erdê derdikeve. Mêrik şaş û mat dimîne, je pir ditirse. Kalo bi sewteke bilind dibėje:

- Xêr e, te çima bangî min kir?

Mêrik bi dengekî nizm dibėje:

- Min bangî te nekiriye! Min ji bîr kiriye guharên keça xwe ya mezin nestandine, ji ber vê min got teyş!

Kalo dibêje:

- Navê min Teyş e. Te ez ji xewa şîrîn hişyar kirim, ji ber vê qasê tu mecbûr î keça xwe ya mezin bidî min. Ku tu nedî min, ez ê te jî û keçên te jî bikujim. Wekî din tu dizanî! De sibê du qijik bêne li ber derê te, keça xwe bi wan re bişine.

Mêrik pişta stûyê xwe dixwirine û diçe mala xwe. Gava digihîje malê, keçikên xwe li dorê xwe kom dike û hal û meseleyê ji wan re vedibêje. Dibêje:

- Ka em çi bikin, xwe ji vê belayê xelas bikin.

Difikirin, dihizirin lê tu rê û rebazekê nabînin. Soryaz bi xemgînî dibêje:

-Bavo tu xem neke. Ez ê herim wî kalikî bistînim, bila qeda û belayek neyê sere we!

Her sê xwişk û bavê xwe ve hevdu himêz dikin, digirîn, dinalin bi wê xemê ve dikevin xewê. Hêj ku şeveq neavêtiye, du qijik tên li ber deriyê wan û dikin qişteqişt. Mêrik Soryazê dibe teslîmî qijikan dike.

Soryaz bê çare dide li pey wan û diçe. Qijik wê dibin li ser wê kaniya bavê wê rastî Kalikê Teyş hatibû. Qijik dikin qişteqişt, Soryaz hew dibîne ku erd dibe du

şeq û Kalikê Teyş jê derdikeve. Bê deng û bê hes, digire milê Soryazê û heft tebeqe dikevine binê erdê.

Gava diçine binê erdê qonaxeke mezin tê pêş wan, diçine hundirê qonaxê. Soryaz matmayî li derûdora xwe dinêre, dibîne ku li ser rûyê dinyayê mirov çi bixwaze di wê qonaxê de heye. Keliyekê rûdinin, piştê bêhnvedaneke kurt, kalo diçe jê re tefsiyek savar û destekî pehtî yê mirovan li ser savare, tîne û datine li ber Soryazê û dibêje:

- Tu ji riya dûr hatî, niha birçî bûyî; ha ji te re vî goştî û savarê bixwe. Hinek karê min heye li der ve, ez ê biqedînim û bêm.

Soryaz bi tirs savarê dixwe. Destê pehtî jî dibe dixe kuna dîwarê Demek şûnde kalo tê ji Soryazê dipirse:

-Te savar xwar?

Soryaz dibêje:

-Belê.

Kalo bi meraq dipirse:

- Te ew goştê li ser savarê jî xwar?

Keçik bi dengekî lerzok dibêje:

- Belê,

Kalo dibêje:

- Tu bisekine, ez ê niha bizanibim ka te xwariye an na.

Bi dengekî bilind diqîre dibêje:

- Gosto moşto! Tu kû derê yî?

Dengekî kûr û dûr tê; dibêje:

Ez di kuna diwarê de me.

Kalo ji keçêkê re dibêje:

- Tu kêrî min nayê, divê ez te bikujim.

Kalo lê dixe keçikê dikuje û cendekê wê di odeyekê de vedişre. Piştê hefteyek, deh roj di ser de derbas dibe, diçe li mala bavê keçikê li deriyê wan dixe û dibêje:

Soryazê got "Min gelek bêriya xwişka xwe ya navîn kiriye. Bila qasekê were li ba min bimîne"

Ji xwe Sorxwîn jî gelek bêriya xwişka xwe kiribû, hema bi lez radibe xwe amade dike û dide li pey kalo diçe. Diçine li ser kaniye, kalo kopalê xwe li erdê dixe, erd dibe du şeq, bi hevdu re dadikevine bine erdê. Diçine li malê, di malê de hinek rûdinin. Sorxwîn dêna xwe didê ku qet pêjna xwişka we nayê. Çavên xwe li derûdore digerîne lê tu kesî nabîne. Kalo pê dizane ku Soryaz li xwişka xwe digere. Jê re dibêje:

Xema xwişka xwe neke, xwişka te silamet e, wê di odê de razaye. Tu ji riya dûr hatî, ez ê ji te re hinek xwarinê bînim, xwarina bixwe dû re em ê bang li xwişka te bikin, bila were li ba te.

Kalo ji odeyê derdikeve û kêliyek şûn de, tefsiyek savar û desteki pehtî yê mirovan li ser savarê tîne, datine li ber Sorxwînê û dibêje:

- Dê kerem bike, tu xwarina xwe bixwe, karekî min li der ve heye ez ê biqedinim û bêm. Sorxwîn li dest dinêre, di dilê xwe de dibêje "hebe nebe ev dest, destê xwişka min e." Tirsek dikeve dilê wê, savarê dixwe, dest ji dibe dixe di çeviya tenûrê re û dimîne li benda kalo. Kalo tê û dibêje:

Te savar xwar?

Sorxwîn dibêje:

- Belê!

Kalo dibėje:

- Te ew goştê li ser jî xwar?

Sorxwîn bi dengekî tirsok dibêje:

- Belė!

Kalo dibêje:

- Tu bisekine, ez ê niha bizanim ka te xwariye an na!

Bi dengekî bilind dibėje:

- Goşto moşto! Tu kû derê yî?

Dengek ji cihekî kûr tê û dibêje:

- Ez di çeviya tenûrê de me.

Kalo, lê dixe wê jî wekî xwişka wê dikuje û cendekê we dibe de ne li ba yê xwişka wê. Di demeke kurt de kalo dîsa diçe mala wan ji Xunavê re dibêje:

- Her du xwişkên te, dibêjin "me bêriya Xunavê kiriye. Em dixwazin bila ew jî were ba me".

Xunavê jî gelek bêriya xwişkên xwe kiribû. Hema bi lez xwe ji bo çûnê amade dike. Pişîkeke wê hebûye: ji pişîka xwe pir hez dike. Ji ber vê dil nade bihêle li malê, wê jî dixe paşila xwe û dide li pey kalo û diçe. Bi hevudu re diçine li ser kaniyê û dadikevine binê erdê dikevine qonaxa kalo. Kalo ji Xunave re jî tefsiyek savar û destekî mirovan li ser savarê tîne. Xunav savarê dixwe û dest jî dide pişîka xwe. Kalo ji der ve tê, dibêje:

Te savar xwar?

Xunav dibêje:

-Bele, min xwar.

Kalo dibêje:

- Te ew goştê li ser savarê jî xwar?

Xunav dibêje:

- Belê.

Kalo dibêje:

- Tu bisekine, ez ê niha hîn bibim ka te ew xwariye an na.

Bi dengekî bilind dibêje:

-Goşto moşto! Ka tu ku derê yî?

Ji cihekê kûr û dûr dengek tê, dibêje:

Ez di nav ûrên germ de me.

Kalo xwe bi xwe dibêje "ev keç li gor min e, ev jî wekî min mirov xwer e. Ez ê vê ji xwe re bi jinanî qebûl bikim."

Ji ber ku tirsa xwe bixe li ser wê, kulmekê li devê wê dixe û du heb diranên wê dişikîne. Paşî jê re du diranên zêr çêdike û dixe şûna diranên wê.

Xunav ji tirsan bê deng dimîne. Çawa ku qedera xwe gebûl kiribe, bi wî awayî tev digere. Kalo bi şev û bi roj nobedariya Xunavê dike. Gelo wê çi bike? Hêdî hêdî bawerî pê tîne, dilê wî fireh dibe ji ber dilfirebûna wî bedena wî sist dibe û xewa wî tê. Keçik pê dihese ku xewa wî tê, je re dibêje:

-Kalo, ev ccçendek e tu ranezayî, were serê xwe dayne li ser çoka min, hinek ji xwe re razê.

Gotina Xunavê li kalo pir xweş tê, serê xwe datîne li ser çoka wê, ji ber ku bê xew bûye hema zû bi zû dikeve xewê.

Xunav destê xwe datine li ser rihê kalo hêdi hêdi mist dide, Dêna xwe didê ku wê çil heb mifte, bi hev re şaran kirî û morikeke xewê di nav rihê wî de veşartî ne. Xunav bi lezgînî morikê dixe nava guhê wî.

Xunav digire qefta miftan, yek û yek deriyên dadayî yên çil odeyan vedike. Di odeya yekemin de cendekên her du xwişkên xwe dibîne. Di odeyên din de ji cure cure, celeb celeb têkber dibîne. Ji cendeka mirovan bigire heta ji zêr û zînetan û ji xwarin û vexwarinan, li ser rûye dinyayê mirov çi bixwaze li wir hebûne. Di odeya dawiyê de rastî siwarekî û hespê wî yê bayî tê.

Gava Xunav wan dibîne pir şa dibe. Dibêje "tenê ev dikarin min derêxine li ser rûyê dinyayê." Ji siwar re dibêje:

- Ji vir şûn de hûn azad in. Min morika xewê xistiye di guhê Kalikê Teyş de. Tu çiqas zêr bixwazî ez ê bidim te. Min jî bi xwe re derêxe li ser rûyê dinyayê.

Keçik û siwar hingê ku dikarin ji xwe re zêr û zînet dixine di nav tûran de û davêjin li ser pişta hespî û bi hevdu re siwarî pişta hespê bayî dibin. Here tu naçî...

Hespê bayî wan di çavgirtinekê de derdixe li ser rûyê dinyayê. Siwar wê dibe di bajarekî de peya dike. Ji ber ku zêr û zînetên keçikê hebûn di demeke kurt de, ji xwe re qonaxeke mezin dide çêkirin û dest bi jiyaneke nû dike.

Xunav, keçeke aqil û pêkhatî û qencîxwaz bûye. Ji ber vê yekê, mirovên bajêr jê pir hez dikin. Di heman demê de keçeke pir bedew bûye. Nav û dengê bedewbûna wê ji çînê heta maçinê belav dibe û diçe guhê kurê paşayekî. Kurê paşa tê dîtina wê. Dema wê dibîne, dilek na bi hezar dilan wê ji dilê xwe dihebîne. Wê ji xwe re bi jinanî dibe, çil roj û çil şev dawet û şahî dikin.

Piştê sal û demsalan, Xwedê du kur dide wan. Jiyaneke xweş û bextewar bi hev re didomînin. Heft sal û heft roj di ser de derbas dibin, rojekê Kalikê Teyş xwe diguhêze. Gava xwe vediguhêze, morika xewê ji guhê wî derdikeve û ji xewa heft salan şiyar dibe. Radibe ser xwe çi bibîne, ku deriyên çil devan tev hatine vekirin û zêrû zînetên wi tev hatine birin.

Pir diqehire û radibe li pey Xunavê dikeve. Tûra xwe tijî morîk û xişir dike. Derdikeve li ser rûyê dinyayê, bajar bi bajar, gund bi gund, kolan bi kolan, digere û dibêje:

- Kijan jin, ji min re bikene ez ê van xişir û morikan belaş bidim wê.

Salek, du sal wiha digere. Rojekê rastî bajarê Xunavê tê. Dikeve nav bajêr, mal û mal digere heta tê kolana mala Xunavê lê ye. Jinên di kolanê de tev dora wî kom dibin, li xişir û morîkên wî dinêrin. Xunav di pacê de dibine ku jinên cinarên wê tev li dora çerçî kom bûne, bala wê jî dikişîne ew jî diçe li ba çerçî û li xişiran dinêre. Ji hevala xwe pirsa bihayê wan dike, hevala wê jê re dibeje:

- Kalo bi kena jinan xişir difiroşe.

Xunav gotina wê wekî henek fêm dike û dikene. Gava ew dikene kalo her du diranên wê yên zêr dibîne û wê nas dike.

Ew dem Xunav ji Kalikê Teyş dinase û tirsek dikeve dilê wê û bi lezgînî diçe mala xwe. Kalo wê teqib dike heta mala wê. Derengê şevê kalo tê ber deriyê wan dibêje:

Ez rêwî me ji riya dûr hatime. Ji kerema xwe îşev min bistrînin. Her çiqas Xunav nexwaze jî merê wê bi dilnermî dibêje:

- Jinik! Guneh e, ma dê kalê reben çi zerarê bigihîne me? Hema bila di kunceke malê de ji xwe re razê.

Xunav çawa dike nikare bi mêrê xwe, ji ber ku nawêre ji mêrê xwe te rastiyê bibêje, bêgav dimîne û ji kalo re deriyê mala xwe vedike. Piştê ku mirovên malê dikevin nav nivînên xwe û şev dibe nivê şevê, kalo sêhrek dike ji bilî Xunavê, mirovên bajêr tev dikevin xeweke giran. Sîtilekê tijî av dike datîne li ser agir. Diçe kurê wê yê mezin davêje nava sîtilê û dibêje:

Ez ê kurê te yê biçûk û mêrê te jî di vê avê de bikelînim û bixwim. Xunav çiqas sewta wê heye dike qêr û dike hawar, dibêje:

- Ji bo Xwedê, kesek tuneye zarokên min ji vî mirovxwerî xelas bike!

Ji ber ku her kes di xewê de ye, ji bilî hûta heft tebeqe di binê behrê de, tu kes dengê wê nabihîze. Hût dibėje:

- Kul û kureder... jan û jehrî... dengê te nehişt ez hinek razêm. Ev çi hawara te ye?

Xunav, derdê xwe ji hûtê behrê re dibêje.

Hût dibêje:

- Ez ê te ji vî derdî xelas bikim, lê şertekî min heye. Tu yê kurê xwe yê biçûk bidî min.

Jinik difikire dibėje, "Qet nebe mêrê min xelas dibe."

Dibêje: - Baş e.

Hût dibêje:

Here, di nav tûrên Kalikê Teyş de dîzikeke tijî morikên xewê heye, wê bigire li erdê bixe û bişikîne.

Xunav diçe dikeve li nava tûra kalo digere, dîzikê dibîne û li erdê dixe. Dema dîzik li erdê dikeve dişike û morîk tev li erdê belav dibin û gelê bajêr tev bi hev re hişyar dibin û tên tewara Xunavê. Dest û piyên Kalikê Teyş bi werîsan girê didin, wî davêjine nava sîtileke qîl û qetranê û dikelînin. Xunav jî li ser soza ku dabû hûta binê behrê disekine. Kurê xwe yê berhimêz dixemilîne, çavekî wî kil dike û çavek kil nake, destekî wî hene dike û destek hene nake, ferek gore lê dike yek lê nake. Dibe dide destê hûtê. Hût zarokî dide ber himêza xwe û weke stranekê jê re dibêje:

Çavek bi kil e yek bê kil e

Dapîro kor e te bixwe

Destek hene yek bê hene

Dapîro kor e te bixwe

Ferek gore, yek bê gore

Dapîro kor e te bixwe…

Hinek bi kurikî şa dibe, ji ber rindbûn û delalbûna kurikî, dil nade wî bixwe. Wî dide diya wî û dibêje:

- Ha ji te re kurê te, here tu û mêrê xwe û bi kurê xwe ve bi bextewarî bijîn.

Çîroka me çû nav zeviyan, rehmet li dê û bavê we hemûyan.

### 4.2.2. Mîrza Mihemed û Çilkezî

Carek hebû caran, rehmet dê û bavê hazir û guhdaran. Mîrza Mihemed hebû kurê padîşahê Misre bû, kurê padişahê Misrê rojekî gote wezîr û wezeratê xwe, ezê herime nêçîrê.

Mîrza Mihemed çû nêçîrê û heftekî li nêçîrê ma. Rojekê li ser kirê geliyekî xezalek dît tîr û kevana xwe hilda û peyê xezalê çû. Walî da peyê xezale çû vali peyê xezale çû, walî xezal, valî xezat, xezal çû kete bîrekê. Mîrza Mihemed li ser bîre ra hêviya derketina xezalê ma. Ji nişka va xezal ji bîrê derket û revî, Mîrza Mihemed jî da peyê. Mîrza Mihemed li peyê xezalê dît ku xezal kete konekî mezin, serê kon hebû binî tunebû. Mîrza Mihemed ber derê kon sekinî û hêviya xezalê ma. Ji nişka va konda pîrek derket, pîrê got:

- Heyran te li vir xêr e? Mîrza Mihemed gotê:

- Nêçîra min, xezala min hat kete vî konî.

Paşê keçikê deng bihîst, ji kon derket, got:

- Heyran te xêr e, tu li kur hatî û re ji kû da herî?

Mîrza Mihemed keçik dît, hiş ji serî cû hidekî din hate serî, keçik mîna roj û hîvê bû. Mîrza Mihemed gotê:

- Nêçîra min kete konê we, xezalê bidin ez herim.

Keçikê gotê:

- Heyran here, li vê derê xezal tune.

Mîrza Mihemed got:

- Na ez naçim, nêçîra min bidin, ezê paşê herim.

Keçikê gotê:

- Wî çaxî şertekî min heye, tu şertê min bînî cî ezê xezalê bidim te.

Mîrza Mihemed got:

Kerem bike şertê te çi ye?

Keçikê gotê:

-Navê te xêr?

Mîrza Mihemed got:

- Navê min Mîrza Mihemed e.

Keçikê gotê:

- Rast e, xezaleke me heye, xwe nişanî neçîrvanan dide, lê tu carî xwe nade dest neçîrvanan. Şertê min jî ew e; were ez û tu, emê destê xwe bavêjine gurz û kemendê quwetê, kî zora kî bir, ew ê şertên ew ê din qebûl bike. Lê bîr neke, ez te alt bikim, ezê te bikujim.

Mîrza Mihemed got:

- Şertê te, ser çavê min ra, lê şertekî min ji heye.

Keçikê gotê:

- Kerem bike şertê xwe bêje.

Mîrza Mihemed got:

-Heger ez zora te bibim, tê him xezalê bidî û him jî bibî jina min, tê min bixwazî.

Rikêfî hev kirin û dest gulaşê kirin. Saetan û rojan, ne Mîrza Mihemed zora keçikê bir, ne jî keçikê zora Mîrza Mihemed bir. Di dawiya dawiyê da, keçikê zora Mîrza Mihemed bir û pişta wî da erdê, lê dilê wê ber Mîrza Mihemed derneket ku wî bikuje. Got:

- Qurban rabe hespa xwe siyar be, tu ji kûderê hatî here wê derê, ez te nakujim.

Mîrza Mihemed rabû bi dilekî kul kete rê, seriyo tu bi qurbana piya bî, berê xwe da şehrê bavê xwe. Sal zemana derbas dibe, zar bi zimana xeber dide. Hesinê xame heta meriv bikute, yê dirêj be: rojek du roj mehek û usa çend meh derbas bûn, lê keçik ji bîra Mîrza Mihemed nediçû. Mîrza Mihemed berê xwe da kon. Çû dît ku ne kon e û ne jî tiştekî din. Mîrza Mihemed valî û walî li ciyê kon îzekê geriya. Xwe di hala da lorand. Ew kevira hilda firand, ew zindara hilda quloz kir Wextekî dît ku di binê kevirekî da kaxizek heye, cem kaxiz jî cote kap. Hilda lê nihêri ku ew nameyek e, keçika nivîsîbû: "Mîrza Mihemed, heger tu kurê paka bî, tê peyê min bêyî. Şehrê bavê min ev der e, ez qîza Mîrê Ereban im. Tu mêr bî, tê peyê min têkevî rê û werêyî. Na heger ku tu kurê şivanekî yan gavanek bî, tê herdu kapê xwe hildî û herî ji xwe ra kap bileyzî."

Mîrza Mihemed wê namê dixwine, hespê xwe dixemilîne seriyo tu bi qurbana piya bî, mîna bayê berê xwe dide şehrê Mîrê Ereban. çolî çolistan, berî berîstan, têkîl sergerdan, bira teze serî li Mîrza Mihemed têkeve paxla giran.

Mîrza Mihemed çû ha li vira na, ha li wira na. Meriv bi pirsê diçe qursê, valî pirsa mala Mîrê Ereban kir, walî pirsa mala Mîrê Ereban kir û di dawiyê da çû mal dît. Derî xist, berdestiyan derî lê vekir; "Selam elîkîm."

Berdestî dibêje:

- Elîkîm selam, qurban tu li kûderê hatî û tê bi kû da herî?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Ez sewa mala Mîrê Ereban hatime.

Berdestî dibêje:

- Mala Mîre Ereban ev e.

Berdestî Mîrza Mihemed hildide malê, diçe malê rûdinê. Wextekî dinêre ku Çilkezî ji hundir derket, ew mîna gulcemalekê bû. Çilkezî lî ber Mîrza Mihemed ra derbas bû û çû. Paşê Mîrê Ereban hat û Mîrza Mihemed pirsî:

- Mêvan tu bi xêr hatî, tu li kû têyî û tê ji kûda herî?

Mîrza Mihemed negot ez kurê padişah im, got:

- Ez rêwî me, ji vê derê ra derbas dibûm, hatim bûme mêvanê we.

Mîrê Ereban gotê:

- Tu nabî rêncberê min?

Mîrza Mihemed jî tiştekî usa ji xwedê dixwest, got:

- Ez ser çevê xwe û ser serê xwe dibim rêncberê te.

Bi sala û bi zemana dibe rêncberê Mîrê Ereban û cem wî û nêzîkî Çilkeziye disekine.

Bi sal û zemana, ne Çilkezî dibêje ev Mîrza Mihemed e û ne jî Mîrza Mihemed dibêje ez ji boyna Çilkeziyê hatime. Axir herdu jî behsa tiştekî nakin. Mîrza Mihemed rojekî diçe ber devê behrê, bala xwe didê ku kerek li wir e. Mîrza Mihemed dibêje ez ê vê kerê ji xwe ra biherim û pê xizmeta xwe bikim.

Mîrza Mihemed guhdirêjê hildide tîne, kerê cî dike û pê şixulê xwe dide kirinê. Wexta şixulekî Mirza Mihemed çêdibe, li kerê siyar dibe, riya saetekî, ker deh deqan da diçe. Ji ber wê, Mîrza Mihemed gelekî baş kerê xweyî dike. Mîrê Ereban jî dizane Mîrza Mihemed merivekî jihatî ye, jê ra dibêje:

-Mîrza Mihemed, ez ê te bişînime ciyekî.

Mîrza Mihemed dibêje:

- Mîr xweş be, bêje tê min bişînî kî derê?

Mîr dibêje:

- Ez ê te bişînim, tê herî li Beriya Şengalê. Tê li wê derê şîrê şêr di eyarê şêr da ji min ra hildî û bêyî. Nexwaşiyeke min heye. Ez çûme ba hekîman ji min ra gotin, dermanê te; şîrê şêr di eyarê şêr da ye.

Mîrza Mihemed dibêje:

- Ser çevê min ra, Mîrê min.

Mîrza Mihemed diçe bi dilekî kul, cehê kerê dixe ber afirê kerê, li ber afir rûdinê û digirî. Mîrza Mihemed navê kerê xwe jî danibû Sikûk. Digirî û ji Sikûk ra dibêje:

- Ka ez ê ça herime Şengalê û ezê ça şîrê şêr di eyarê şêr da bînim?

Gelekî digirî. Ji nişka va ziman dikeve devê Sikûk û dibêje:

- Mîrza Mihemed bila te kul bida min, bila te kulme cehê xwe neda min. Tu çima hatî li ber afirê min digirî?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Sikûk, ez negirîm kê bigirî?

Sikûk dibêje:

- Çima çi bûye?

Mîrza Mihemed dibêje:

Sikûk, Mîr min ra dibêje tê herî Beriya Şengale, şîre şer di eyare şêr da ji min ra hildî û bînî.

Sikûk dibêje:

- Mîrza Mihemed rabe razê. Sibê rabe zîn pûsatê min li min ke û li min siyar be. Em ê têkevine rê.

Mîrza Mihemed gotina Sikûk dike, diçe radizê. Sere sibê radibe, zîn pûsatê Sikûk lê dike û lê siyar dibe. Sikûk dibêje:

- Mîrza Mihemed, çevê xwe bigire û heya ez nebêjim çevê xwe veneke.

Qasekê rê da çûn, Sikûkê gotê û Mîrza Mihemed çevê xwe vekir. Mîrza Mihemed dît ku li Şengalê, di nava du ciyan da di newaleka da ne. Sikûk gotê:

- Mîrza Mihemed tu wê newala han dibînî, şêr di wir da ye. Îsal heft salê şêr e, şêr li wir, îsal heft sal e birîndar e û li erdê ye. Birîna we kêm girtiye, werimiye nikare li erdê rabe. Tu here darikekî bibîne. Serê darikê tûj bike û bavêje birîna şêr. Heger tu bikaribî birîna şêr xî, wê kêmê birêjî, tu çi bixwazî yê bide te. Lê heger darik li cihekî şêr yê din keve wê te têxe gepeke xwe û bixwe.

Mîrza Mihemed rabû çû darikek dît, serê wê tûj kir. Çu gelekî nêzikî şêr bû. Darikê xwe bi kevkîkî havît, darik çû di orta birînê da çikiya. Şêr rabû kire kurekur. Kûre kûra şêr, kete wan rast û bestan. Mîrza Mihemed xwe veşart, got ew min bibîne, yê min pirtî pirtî bike. Şêr gazî Mîrza Mihemed kir û got:

- Ya benîademê şîrê xav mêtî! Tu kî yî, derkeve xwe nîşanî min bike. Tu bi çi daxwaziyê hatî, ez ê daxwaziya te bînim cî.

Wexta ew ê usa gazî kir, Sikûk gote Mîrza Mihemed:

- Mîrza Mihemed rabe here.

Mîrza Mihemed got:

- Sikûk tu usa dibêjî, nebe ku şêr min bixwe?

Sikûk got:

-Ez qiza Meîna çilcenî ya di orta heft adem behran da me. Tu gotina min bike û here.

Mirza Mihemed diçe cem şêr, şêr dibêje:

- Bo bi çi niyetê hatî?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Min ra gotin, îsal heft sal e, birîna şêr kêm girtiye nikare rabe. Min tu rehet kirî.

Şêr dibeje:

-Rast e, lê tu çi niyetê hatî?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Mîrê min gelekî nexwag e. Dermanê wî şîrê şêrê Şengalê, di eyarê şêr da ye. Ez boy wê hatim.

Şêr dibêje:

-Mîrza Mihemed, ev heft sal e ez li erdê me, xwezil ez heft salên din ji li erdê bûma, Bila biboya çardeh salan, tenê te ev daxwaziya min nexwesta. Ez im du kutikên min in, bi mecbûrî ez ê kutikeke xwe bidim te. Kutika min bihere, wê bikuje were şîrê min di hindire eyarê wê da bidoşe, ji Mîre xwe ra hilde û here. Lê wexta tu kutikê bikujî, dengê zûre zûra wê were min, ez ê te perçe perçe bikim goştê te bixwim.

Mîrza Mihemed radibe, kutika şêr hildide ciyekî gelekî dûr da, di geliyekî da dikuje. Kutikê wusa dikuje ku dengê wê naçe şêr. Kutike post dike, eyarê wê tîne, şîrê şêr di eyar da didoşe. Devê eyar girê dide, xatirê xwe ji şêr dixwaze û berê xwe dide ba Mîrî Ereban.

Mîrza Mihemed şîr hildide tê. Şa dibe, dibêje Mîrê pak be û yê qîza xwe bide min. Mîr çiqasî ji wezîr û wezaretên xwe tiştan dixwaze, ew jî dibêjin Mîrza

Mihemed jîhatî ye, bila ew bike. Çiqasî şixulê giran hene, gişt dibine para Mîrza Mihemed. Mîrza Mihemed şîr tîne, ji sê paran parekî dide Mîr, du parên din vedişêre.

Usa roj û meh derbas dibin. Rojekê dîsa Mîr gazî Mîrza Mihemed dike û dibêje:

- Mîrza Mihemed, tê herî di orta heft adem behran da, Meîna çil cenî min ra bînî.

Mîrza Mihemed şaş û metel dimîne. Ka yê ça meîna çil cenî di orta heft adem behran da bîne?

Mîrza Mihemed radibe, bila çolî çolistan, berî berîstan, serî sergerdan, teze serê Mîrza Mihemed kete ber paxila giran. Mîrza Mihemed dîsa diçe cehê Sikûk didê û li ber afir disekine û digirî. Sikûk dibêje:

-Mîrza Mihemed, bila te kul bida min bila te kulme cehê xwe neda min. Dîsa çi bû?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Ka ez negirîm kî bigirî? Mîr dibêje here di orta heft benî adem behran da, min ra meîna çil cenî bine.

Sikûk dibêje:

- Mîrza Mihemed çi zû bîra te çû? Ne min li Şengalê ji te ra gotibû ez qiza meîna çil cenî me. Meîna çil cenî diya min e, sî û neh ceniyên wê niha li cem in, ya çilan jî ez im. Min rojekê hêrsa diya xwe hanî, diya min nifir li min kir û got, "Sikûk tu bibî kerekî û li devê behrê bî." Ez jî bi nifira diya xwe va bûme ker û ketime devê behrê. Tu jî hatî, te ez li devê behrê dîtim û te ez ji xwe ra hanîm. Tu çi ji min dixwazî, ez te digihînime meqset û miraza. Rabe razê. sibê Xwedê mezin e.

Sibe ronî dibe, Sikûk dibêje:

-Mîrza Mihemed, emê niha herine devê behrê. Lê pêşiya wê tu here ji min ra heft çermê dewara, heft bar qîr hilde bîne. Qîrê li pişta min xe, çerman bide ser. Gava

em çûne devê behrê, diya min yê min bibîne û yê gelekî hêrsa vê bê. Yê carê were, gezekî li pişta min xe û wê çermekî rake. Heta heft çerm xelas bin, hêrsa wê yê derbas be û dilê wê yê rehet be. Lê çerm nebin, wê çermê min rake û min bikuje.

Mîrza Mihemed dibêje:

- Ka ezê diya te ça qanî bikim?

Sikûk dibêje:

- Tê jê ra behsa her tiştî bikî, heger gunehê diya min bi te were, yê bi te ra were. Lê heger gunehê wê bi te neyê, wê te bikuje û min jî hilde û bibe.

Mîrza Mihemed diçe çermê heft dewaran, bi tevî qîrê va tîne. Qîrê li pişta Sikûk dixe û çerm dide ser, heft caran qîrê lêdixe û heft qat çerm dide ser. Mîrza Mihemed bi tevî Sikûk diçine devê behrê, Sikûk dike xişîn. Wextekî dinêrin ku xuşîn li behrê ket, Meîna çil cenî bi tevî sî û neh ceniyên xwe li behrê derketin.

Meînê, Sikûk dît, hat carê gezek li pişta wê xist û çermek rakir. Heft cara hat û heft gez li pişta Sikûk xist. Heta heft çerm xelas bûn, hêrsa Meînê derbas bû, bêhna wê fireh bû û Sikûk da ber qefesa xwe.

Meînê ji Mîrzê Mihemed pirsî:

Ya benîadem te Sikuk hanî?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Belê min hanî.

Meinê dibêje:

- Meqset û mirazê te çi ye, bêje.

Mîrza Mihemed xwe dide naskirinê û yek û yek, her tiştî jê ra dibêje. Ya xwe ya xezalê, hezkirina xwe ya Çilkeziyê, daxwaziyên Mîr û her tiştî yek û yek ji Meînê ra dibêje. Meîn dibêje:

- Bi hewl û quweta Xwedê, ez ê meqset û mirazê te bînim cî. De tu li pişta min siyar be, bila Sikûk jî bide peyê me, em herin.

Si û neh ceniyên din ketine behrê. Mîrza Mihemed li pişta meinê siyar bû, Sikûkê jî da peyê wan, da çar gavan û berê xwe dane şehr û bajarê Mîrê Ereban.

Meîn kete nava şehrê Mîrê Ereban, bi peyînên xwe va da yên ku dilê wan xerab. Herkes revî kete mala xwe. Berdestî revîn ji Mîr ra gotin, Mîrza Mihemed Meîna çil cenî hanî. Mîr derkete derva, meîn hat li ber Mîr, li ser herdu piyên piştê sekinî. Mîr, Mîrza Mihemed xelat kir, meîn hilda û bir axûrê. Mîrza Mihemed. Meîn bi şekir va xweyî dikir, rojê şekirek dida meînê.

Usa roj û meh derbas bûn. Mîr gelekî ji Mîrza Mihemed hez dikirj ji ber wê wezîr û wezaretên Mîr li Mîrza Mihemed çevreşî dikirin. Rojekê wezîr û wezaretên Mîr hatin û jê ra gotin, Mîrza Mihemed gelekî jîhatî ye, tu ji gelekî ji wî hez dikî, Bila Mîrza Mihemed here li pişt çiyayê Qaf ji te ra şemdana serê Ziyayê Kor hilde û bîne. Mîr gazî Mîrza Mihemed dike û jê ra behsa daxwaziya xwe ya teze dike. Mîrza Mihemed qebûl dike, lê nizane yê ça wê daxwaziyê bîne cî.

Mîrza Mihemed tê, cehê Sikûk didê li ber afirê wê rûdinê û digirî. Wusa digirî, ji çevên wî xwîn tê. Sikûk dibêje:

- Mîrza Mihemed disa derdê te çi ye, te çima wusa dilê min bi kul kir?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Mîr tiştekî usa min xwest, ez tu carî nikarim bînim ci. Lê min got ez ê bikim.

Sikûk dibêje:

- Çi ye daxwaziya Mîr?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Mîr dibêje here pişta çiyayê Qaf, ji min ra şemdana serê Ziyayê Kor bîne. Ka ez ê ça vê daxwaziyê bînim cî?

Sikûk dibêje:

- Mîrza Mihemed êdî diya min li vir e, ez nikarim tiştekî bêjim, here cem diya min.

Mîrza Mihemed diçe cem Meînê û digiri, Meîn dibêje:

- Mîrza Mihemed çi te hat, tu çima digirî?

Mîrza Mihemed dibêje:

- Hal û hewalê min û Mîrê Ereban aha, dibêje tê herî ji min şemdana serê Ziyayê Kor hildî û bîni.

Meîn dibêje:

- Mîrzê Mihemed, tu sibê rabe zîn pûsatê min li min ke, em herin.

Sibê Mîrza Mihemed radibe, zân pûsatê meînê lê dike. Beriya ku rêkevin meîn dibêje:

- Mîrza Mihemed, wexta ku em çûn, çemekê derkeve pêşiya me. Ew çem gişt bi kêm û xwîn e. Çiqas mexlûqetên wedê hene, wexta li wî çemî ra derbas bûne, gotine "lenet li te, tu çi çemekî gemar î?." Heyjdeh hezar mexlûgetî wusa gotiye. Lê wexta em derbas bûn, tê bibêjî 'oxeşş çi aveke xweş e! Emê usa jê derbas bin û herin.

Mîrza Mihemed meînê siyar dibe, diçine ber çem. Rastî ji çem bi kêm û xwîn e. Wexta Mîrza Mihemed, li çem derbas dibe, dibêje:

- Oxeşş çemo tu çi çemekî xweş î.

Usa ji çem derbas dibin.

Meîn dibêje:

- Mîrza Mihemed, pêşiya me zeviyek heye. Çiqas mexlûqat ji wê zeviyê ra derbas bûne, gotine 'zeviyê Xwedê te xera bike, tu çiqasî zeviyeke pîs î. Ew zevî tijî

denû durî ye. Wexta em ji zeviyê re derbas bûn, bêje 'oxeşş zeviyê tu çiqasî zeviyeke xweş î. Ev çem, zevî û her tişt ji sêhrê çêbûne. Tu usa bêje û derbas be.

Diçine ber zeviyê û zeviyê ra derbas dibin. Wexta derbas dibin. Mîrza Mihemed dibêje:

- Oxeşş zeviyê tu çiqasî zeviyeke xweş î.

Usa ji zeviyê ra ji derbas dibin.

Piştî ku ji zeviyê derbas dibin, meîn ji Mîrza Mihemed ra dibêje:

- Emê niha herine li ser wî çiyayê hanê. Li ser wî çiyayî, gurek û miyek va, ev heft sale girêdayi ne. Li ber gur giha heye, li ber mihê ji goşt heye. Tê goştê li ber mihê bidi ber gur, gihayê ber gur jî bidî ber mihê.

Wexta diçine wê derê, Mîrza Mihemed, gotina meînê tîne cî û rêya xwe dewam dikin.

Meîn dibêje:

- Mîrza Mihemed, niha geliyekê derkeve pêşiya me. Wî geliyê da çil heb şkeft hene. Îsal heft sale, derê bîst şkeftan girtî ye, derê bîst heban ji vekirî ye. Tê wan bîst deriyên vekirî bigirî û bîst deriyên girtî jî vekî. Ev gişt ji sêhrê ne, em usa nekin, wexta zivirandinê, em xelas nabin. Îja em ji wê jî xelas bin, em ê herine dora şemdanê.

Diçine ba şkeftan, Mîrza Mihemed gotinên meînê tîne cî û rêya xwe dewam dikin. Çiyayekî bilind derdikeve pêşiya wan, meîn dibêje:

- Mîrza Mihemed ev çiyaya tijî mer e. Kîjan mexlûqat ji vî çiyayî ra derbas bûye, selam nedaye. Ez ê li jêra çiyê bisekim, wexta tu çûyî, tê selamê bidî milê çepê jî, milê rastê jî. Tê herdu milan jî selamê bidî. Heya tu çûyî cem Ziyayê Kor, hemasa usa her milan jî selamê bide. Wexta tu çûyî cem Ziya, Ziyayê bêje ew kî ye, ha ew kîye. Tu qet dengê xwe neke. Here cem Ziyayê Kor, şemdana serî hilde û bireve û were.

Mîrza Mihemed diçe quntara çiyê. Dinêhêre ku rastî jî mer wusa zef in ku li ser hevdu ra derbas dibin, tirs dikeve dilê Mîrzê Mihemed, dibêje:

- Hewara xwedê, şahê meran.

Bi wê gotinê va tirs ji dilê wî derdikeve. Mîrza Mihemed hildikişe çiyê, heya diçe ba Ziya herdu aliyan jî selamê dide. Mîrza Mihemed diçe dinêhêre ku Ziya kovelan vedaye, meriv ji Ziyê kulê digire.

Ziyayê Kor dibêje:

- Ew kî ye?

Mîrza Mihemed qe dengê xwe dernaxe û nêzikî Ziya dibe. Xwe digihînê, herdu şemdanan jî hildide û direve. Ziya dike qêrîn û gazî meran dike dibêje:

-Werin wî bigirin.

Mer dibêjin:

- Em qe wî digirin: Te rojeke Xwedê selam neda me, wî selam da me gişka. Em qe wî digirin.

Mîrza Mihemed heya ji çiyê berjêr dibe, selamê dide. Heta meran xelas dibe, hemasa selamê dide wan.

Mîrza Mihemed şemdana xwe hildide tê cem meînê. Ziya dengî şkeftan dike, dibêje:

- Wî bigirin.

Şkeft dibêjin:

- Em qe wî digirin. Îsal heft sal e, te bîst derî vekirî, bîst ji girtî hiştiye tu ser me da nehatî. Ewî yên girtî vekir, yên vekirî jî girt, em qe wî digirin.

Ji şkeftan jî derbas dibin û têne ba gur û mihê va. Ziya ji gur û mihê ra dibêje:

- Wî bigirin.

Gur û mih va dibêjin:

- Em qe wî digirin. Îsal heft sal e, te giha dabû ber gur, goşt jî dabû ber mihê, Ewî goşt da gur, giha jî da mihê. Me herduyan jî têr xwar.

Usa ji gur û mihê va jî xelas dibin û têne ber zeviyê.

Ziya ji zeviyê ra dibêje:

- Wî bigire û bernede.

Zevî dibêje:

- Hey Ziyayê Kor, tu kengê ji min ra derbas dibûyî, te digot xwedê te xera bike. Ew î got tu çi zeviyeke xweş î. Ez qe wî digirim.

Usa bi zeviyê ra jî derbas dibin û têne ber çem.

Ziya dibêje:

- Çemo bigire, ha bigire.

Çem dibêje:

- Ez qe wî digirim. Tu kêgavê min derbas dibûyî te digot Xwedê te xera bike, ha xera bike. Wî got tu çi çemekî xweş î.

Mirza Mihemed ji çêm jî derbas dibe. Şemdan di dest da meîn di binî da berê xwe dide şehrê Mirê Ereban. Wexta Mîrza Mihemed dikeve şehrê Mirê Ereban, qêrînî û qujinî dikeve nava şeher. Çûn xeber dane Mîr, gotin:

-Mir xweş be, Mîrza Mihemed bi tevî şemdana serê Ziyaye Kor hat.

Mîrza Mihemed ji derî ra kete hundir, Mîr li wir bû. Mîrza Mihemed ji meînê peya bû, şemdan da ser serê Mîr.

Mîr got:

- Mîrza Mihemed vir şûn da tu wezîrê milê min ê rastê ye.

Mîrza Mihemed hate cem meîne û gotê:

- Çi meqset û mirazê min hebû te hanî cî. Tu niha çi min dixwazi bixwaze.

Meînê gotê:

- Meqset û mirazê min ew e; Sikûk bide min, ez herim.

Mîrza Mihemed Sikûk da meînê. meîn bi tevi Sikak çû gihişte meqset û mirazê xwe. Mîr jî rabû Çilkezî da Mîrza Mihemed, heft roj û heft şevan dew û dewata Mîrza Mihemed û Çilkeziyê va kirin. Ew çûn mirazê xwe şabûn, hûn kozî kulfetê xwe şabin, em jî iman, qur'an û Kurdistana xwe şabin.

### 4.2.3. Mîrza Mihemed û Urfût

Hebû tunebû, carek ji caran rehmet li dê bavê guhdaran. Nêçîrvanekî mesiyan hebû. Nêçîrvan her roj diçû di çem da, masî digirtin dihanî. Ewî jina wî û kure wan e piçûk va dixwarin. Mesiyên ku zêde bimana jî difirotin û pê pereyê wan va debara xwe dikirin. Rojekê nêçîrvan û hevalekî xwe va dîsa çûne mesiyan, lê nihêrin ku sepetek li ser avê tê. Nêçîrvan hevalê xwe ra got:

-Di sepetê da can hebe yê min e, mal hebe yê te ye.

Hêviyê sekinîn. Sepet hat wan sepet girt a hundurê sepetê nihêrin ku tê da zareke kurîn heye. Nêçîrvan got:

- Êdî ev kurê min e.

Zarokê hilda û bire mala xwe. Kurekî nêçîrvan dîsa hebû, navê wî jî Mihemed bû. Got:

- Navê kurê min Mihemed e, ez ê navê vî jî daynim Mîrza Mihemed.

Mîrza Mihemed û Mihemed va mîna du bira bi hey ra mezin bûn. Rojekê gundiyan Mîrza Mihemed ra gotin;

- Tu kurê wan nînî, wana tu li ser çem dîtin.

Mîrza Mihemed hat dê û bavê xwe pirsî. Jê ra gotin:

- Rast e tu kurê me nînî. Lê me tu ferq nekire nava we.

Mîrza Mihemed got;

- Ez ê rêça çêm bişopînim û herim dê û bavê xwe bibinim.

Dê û bavê wî çiqasî gotin neçe lê Mîrza Mihemed bi qerar bû yê biçûya. Mihemed got;

Ez birayê xwe tenê naşînim, ez ê jî bi wî ra herim.

Mihemed û Mîrza Mihemed va ketine kêleka çem û peyê şopa çêm çûn. Çûn çûn gelekî çûn. Lê nihêrîn ku li ber çêm malek heye di derê malê ji kalek heye. Çûne çem kalê û wî ra xeber dan, Kalê ra behsa her tiştî kirin lê kalê di derbarê dê û bavê Mîrza Mihemed da tiştek nizanibû. Wexta ku wan bi kalê ra xeber didan, ji nişka va hewa tarî bû. Serê xwe hevraz kirin û lê nihêrin; ewrekî reş, hîv kiriye devê xwe û dibe. Gotin:

- Ev çi ye?

Kalê got:

- Xortno ev Urfût e, dêw e. Li kû derê qîzên bedew hebin, Urfût wan hildide û dibe. Ew a ku mîna hîvê jî hîv nîne, ew qizeke.

Piştî ku Urfût firiya û çû qulibî, kalê wan ra got;

- Xortno êdî dereng e, werin îşev bibin mêvanê min. Hûnê sibê dîsa herin.

Kalê Mihemed û Mîrza Mihemed va hilda û bire mala xwe. Wan ra got:

- Hûn li malê bin, ez ê herime cihekî. Di axûrê da hesp û heywan va hene. Alifê wan bidinê, kîjan tî be av din, kîjan birçibe ka û giha bidinê.

Piştî ku kalê çû, Mihemed û Mîrza Mihemed va av û alif va dane heywanan û hatine malê. Lê nihêrîn ku derê odeyekê kilît kiriye û venabe, Herdikan jî gelekî

meraq kir di wê odeyê da çi heye. Lê çi kirin jî derî venebû. Herdu biran lê nihêrîn ku derî venabe. Li ser nivînan xwe dirêj kirin û hêviya kalê sekinîn. Wexta kalê hat, herdu bira jê pirsîn:

- Di vê odeyê da çi heye, çima derê wê kilît e?

Kalê got:

- Xortno di vê odeyê da qîza min heye. Ji ber tirsa Urfût ez qîza xwe di odê da dernaxim. Hûn dixwazin wê bibînin?

Herdu biran bi hev ra gotin:

- Erê em dixwazin.

Kalê derî vekir û qîza xwe derxist. Mihemed ça ku qîza kalê dît dilê wi kete keçikê. Kale qîza xwe ra got:

- Qîza min kuçik vêxe û me ra xurek çêbike.

Keçik derkete derê malê daran bîne ku kuçik vêxe. Ça ku derket, qêriniyek hat. Mihemed û Mîrza Mihemed va revîne derê male, ditin ku Urfût keçik hilda û firiya çû. Mihemed û Mîrza Mihemed va hespên xwe siyar bûn û dane peyê Urfût. Urfût çû li serê çiyayekî kete qulikekî. Herdu bira xwe telandin û hêviya derketina Urfût sekinîn.

Qasekê şûn da Urfût derket çû. Mîrza Mihemed û Mihemed va çûne devê qulikê. Mîrza Mihemed got:

- Ez ê berjêrî qulikê bibim, tu li vir bisekine. Wexta ku te dît Urfût tê, gazî min bike ku ez derkevim.

Mihemed ber devê qulikê sekinî, Mîrza Mihemed berjêri jêrê bû. Mîrza Mihemed çû nihêrî ku, di qulikê da her tişt heye; zêr, ziv û hwd. Çû keçik dît, keçikê ra xeber da:

Ez ê niha herim. Wexta Urfût hatinê, jê bipirse ka ew ça tê kuştinê?

Urfût ji nişka va firiya û hat. Mihemed êdî nikaribû gazî Mîrza Mihemed bike, çû xwe veşart. Mîrza Mihemed û keçikê va bihistin ku dengek hat. Keçikê Mîrza Mihemed ra got:

- Têkeve binê vê teyştê bira te nebîne.

Urfût gelek tiştên xwarinê hildabû û hatibû. Urfût ji Keçikê pirsî:

- Bêhna merivan tê.

Keçikê got:

- Ew bêhna min e, tu jî dizanî ez meriv im.

Piştî ku keçikê Urfûr ra xurek çêkir û Urfût xurekê xwe xwar, keçikê jê pirsî:

- Quweta te zef e? Gelo tu tiştek bi te nikare? Ji boy te jî mirin heye an tu bê mirin î?

Urfût got:

- Di dinyayê da ser quweta min ra quwet tune ye. Min ra mirin jî tuneye. Lê cihê ku ez diçime nêçîrê, li wir kewek heye. Li ser sê hêkan rûniştiye, heger hêkên wê bişkên ez ê bimirim.

Mîrza Mihemed, xeberdana Urfût gişt bihîst, xwe teland. Ça ku Urfût çû, Mîrza Mihemed jî da peyê. Mîrza Mihemed li peyê Urfût çû û ew hersê hêk dîtin. Urfût çû qulika xwe, Mîrza Mihemed çû di binê kewê da hêk hilda û çû kete qulika Urfût. Mîrza Mihemed hat derkete pêşiya Urfût, Urfût hewl da ku êrîşî Mîrza Mihemed bike, Mîrza Mihemed hêkek havite erdê û şikand. Bi keştina hêkê va can ji piyê Urfût kişiya û Urfût kete erdê. Mîrza Mihemed hêka duduya jî keştand, can heta stû jê kişiya. Hêka sisiya ki keştand, Urfût mir.

Di qulikê da efsûn hebû; Urfût bimira, yê du ga bihatana û ber devê qulikê bibûna nobedar. Mîrza Mihemed keçik hilda ku ji qulikê derkevin, lê nihêrîn ku li ber devê qulikê du ga nobedarin; yek reş e yê din spî. Keçikê got:

-Xwe bavêje ser yê spî, tê derkevî jorê.

Mîrza Mihemed got:

- Na pêşiyê tu xwe bavêje ser. Pêşiyê tu derkeve jorê, Mihemed li jorê hêviya te ye.

Keçikê xwe havite ser gayê spî û derkete jorê. Mîrza Mihemed jî hewl da ku, xwe bavêje ser gayê spî lê ga xwe wê da bir û Mîrza Mihemed kete ser gayê reş. Mîrza Milemed hetft qatan çû binê erdê. Wextekî çevê xwe vekir ku çi bibîne? Li dinyayeke din e.

Rabû ser xwe û meşiya. Çû lê nihêrî ku li ser darekî cûcik hene. Merek ji boy wan bixwe, dikişe darê. Çive çiva cûcikan e, diqîrin. Mîrza Mihemed çû bi şûrê xwe va, mer xist û mer kire du qetan. Ji nişka va xew kete çevê Mîrza Mihemed. Pişta xwe da darê û kete xewê. Piştî Mîrza Mihemed kete xewê, keweke gelekî mezin hat. Kew diya cûcikan bû. Kewê dît li erdê xwîn heye. Hew dizanibû ku Mîrza Mihemed cûcikên wê kuştiye. Kewê nikulên xwe berva Mîrza Mihemed kir û berva wî firî. Hindik mabû ku kew Mîrza Mihemed di xewê da bikuje ku cûcikan gotin:

- Wî nekuje, ewî em ji mer xelas kirin. Kew hate li ser darê, bi baskên xwe va Mîrza Mihemed ra sî çêkir. Û hêviya hişyarbûna wî sekinî. Piştî ku Mîrza Mihemed hişyar bû, kewê raziya xwe anî ziman û got:

- Wî merî, her sal cûcikên min dixwar. Te cucikên min xelas kir, tu çi ji min dixwazî bixwaze.

Mîrza Mihemed got:

-Ez ji dinyaya ronahî hatim vê dere. Ez dixwazim herim dinyaya ronahî.

Kewê got:

- Ez nikarim te bibim lê ezê desmalekî bidim te. Tu wê desmale rûyê kê bixî ew ê bibe xort. Heftê salî be wê bibe çil salî.

Mîza Mihemed desmal kire paşila xwe, xatirê xwe ji kewê xwest û çû. Çû çû gelekî çû dît ku li wir malek heye. Çu wê malê. Li male pîrek hebû, derî xist û pîrê ra got:

- Pîrê ez zef birçî me, tu dikarî mêvana xweyî bikî?

Pîrê Mirza Mihemed bire mala xwe û nan dayê. Piştî ku Mîrza Mihemed nan xwar, ji pîrê av west. Pîre jê ra av hanî. Mîrza Mihemed ça ku av kire devê xwe dîsa av ji devê xwe havît, got:

- Pirê ev aveke ça ye, şor û germ e?

Pirê got:

- Kurê min qisûra min nenêre, min mîza xwe da te. Çimkî ava me tune ye.

Mîrza Mihemed got:

- Çima ava we tune ye?

Pîrê got:

-Kaniyeke me heye. Dêw berê avê guhirandiye, nahêle kanî were. Em herin wê derê wê me bikuje.

Mîrza Mihemed got:

- Ew Dêw li kû derê ye, ez ê wî bikujim?

Pîrê got:

- Dêw li serê çiyê ye, lê gerek tu tenê carekî bi şûr va lêxî. Tu du caran lêxî ew êdî namire. Te di carekî da kuşt kuşt. Lê te nekuşt, êdî ew namire.

Mîrza Mihemed berê xwe da çiyê. Hat dît ku Dêw li wir e. Ber bi Dêw revî û şûrê xwe carekî berjêrî serê Dêw kir. Dêw got:

- Tu dikarî, carekî dîsa min xe.

Mîrza Mihemed got:

- Na ez carekî ji diya xwe bûme, ez du caran te naxim.

Bi wê gotinê va, Dêw li erdê dirêj bû û mir. Mîrza Mihemed bere avê da kaniyê û ji çiyê berjêr bû. Bi tevî Padîşah herkes li jêra çiye hêviya hatina Mîrza Mihemed bû. Padîşah digot:

- Bira ew were, ez ê qîza xwe bidim wî. Ew bixwaze ez ê wî bikim paşa.

Mîrza Mihemed ji çiyê berjêr bû. Herkesî yek û yek ew paç kir û jê ra spas kir. Padîşah got:

- Ezê te bikim paşa, ez ê qîza xwe bidim te.

Mîrza Mihemed got:

-Na ez dixwazim herim dinyaya ronahî, aliyê min bikin ez herim Heger hûn bêjin erê ez ê qîza we jî, ji xwe ra bibim û têxime jina xwe.

Padîşah got:

- Min giza xwe da te, ez ê hespekî bidim te. Gava hespê gote "av" alif bidê, gava gote "alif" avê bidê.

Mîrza Mihemed hespa Padîşah hilda, xatirê xwe ji wan xwest. Qîza Padîşah havîte terka hespa xwe û berê xwe da dinyaya ronahî. Di rê da kengê hespê gote "av" Mîrza Mihemed alif dayê, kengê gote "alif" Mîrza Mihemed av dayê. Piştî rêyeke gelekî dûrû dirêj, Mîrza Mihemed û qîza Padîşah va xwe gihandin dinyaya ronahî. Hatin dîtin ku, Mihemed û qîza kalê va hin jî li ber derê qulikê hêviya Mîrza Mihemed sekinîne.

Herçar bi hev ra çûne mala kalê û qîza kalê Mihemed ra xwestin. Kalê qîza xwe da Mihemed û berê xwe dane mala bavê Mihemed. Gera dê û bavê Mîrza Mihemed berdabûn. Hatin dîtin ku; dê û bavê Mihemed va piştî çûyîna wan, usa giriyane ku, usa ber xwe ketine ku porê herduyan ji spî bûye. Mîrza Mihemed desmala ku kewê dabû, ji paşila xwe derxist û rûyê herduyan da. Herdik jî dîsa bûne

ciwan. Herdu bira zewicîn û çil roj û çil şevî dewata wan bû. Çiroka me çû serê darê, em mane hêviya biharê.

### 4.2.4. Birê Çûk

Hebû merik, şîûneh kurê wî hebûn. Lê merîk ji nav gundê wan da hebû kurê wî tunebûn.

Derbekê ew merivê kure wî tunebûn, ew derbekê hate ser kuleka ewî meriyê sîûneh kurê wî hebûn, gava lê nihêrî mêrik wê bêşîkê da ye, îşqa wî avîtibû nav mala wî. Dîsa ew merî çû mala xwe. Sivê hate wê male, got:

Kurê te henin, tu kurekî bidî min, ez ê beramberî wî zeêra bikşînim bidime te, tu wî kurê xweyî bêşîkê da bide min.

Ewî got: -Bira ve.

Beramberî wî zêr kişand dayêda. Gedebir, navê wi kire Mîr Mihê. Bir çû, otaxek jê ra çêkir bi şûşa, Mîr Mihe kire we otaxê, gote jina xwe:

-Tu xarinê jê ra çê dikî, bira hestu tê da tuneve.

Ewê got: -Bira ve.- Ew ê nizam derbekê çawa kir, derbekê xarna wî bir hestuk tê da hebû.

Mîr Mihê gava xarinê lê dinihêre hestuk tê da ne. Mîr Mihê xwe ra pê wî hestuyî dilîze, paşê digre davêje. Ew hestu diçe şûşa dikeve. Gava lê dinihêre tîrênca tevê dertê ew pê tîrêncê dilîze, paşê gêj dive, dikeve. Bavê wî gava tê lê dinihêre Mîr Mihê ketîye, gava li şûşa dinihêre - sûsek şkestîve. Ew wêderê destê xwe çoka xwe dixe, paşê Mîr Mihê radike.

Mir Mihê divêje: -Te ez çima kirime vira?

Bave wî divêje: -Min tu kirîyî.

Mîr Mihê divê: -Te ji kê kirîme?

Bavê wî divê: Min tu ji Îsikê xweyê sîûneh kura kiriye, tu ji ser wan bûyî çil kurî. Min gote bavê te: "Kurekî xwe bide min, ez ê bihayê wî zêra bikşînim bidime te". Got: "Bira ve". Tu jî wî çaxî çûk bûyî, min bihayê te wî çaxî zêr kişand da bavê te, tu xwe ra anîyî.

Mîr Mihê dişirmîş dive, divêje bavê xwe, divê:

-Ew mervê ez dame te niha vir e?

Ew divêje: -Erê.

-Niha ew merî ku ye?

Bavê wî divê: -Mala wî merî wa ye, dera han e.

Mîr Mihê divê: -Ez ê herim.

Bavê wî divê: -Min tu kirîyî, tê çawa herî?

Mîr Mihê divê: -Herke te wî çaxî bihayê min zêr daye ez ê niha bihayê xwe zêr bikşînim bidime te.

Ew merî dike-nake xwe ji Mîr Mihê xilaz nake. Ew merî divê:

-De zêra bîne, bihayê xwe bikşîne bide min. Mîr Mihê zêra tîne, bihayê xwe dikşîne, dide wî diçe mala bavê xwe.

Sal sala diçe, meh meba diçe. Derbekê Mîr Mihê bire Xwe diçin digerin. Gava lê dinihêre merî tijî ser mezel bûne, Mîr Mihê divêje bire xwe:

-Ew merî çima wê derê top bûne?

Birê wî divêje: -Merîk mirîye.

Mîr Mihê divê: -Merî çima dimirin?

Birê wî divêje: -Lê çawa?

Mir Mihê û birê xwe va têne malê, divêje:

-Ez ê herme cîkî usa mirin tê tuneve.

Dê û bavê wî divêjin: -Cî tune, wekî merî nemire.

Mîr Mihê dibê: -Na, ez mêvanê weyî îro me.

Sivê Mîr Mihe radive, xwe ra cenîkî sê sale xwe ra zîn dike, xurcika xwe davêje terkîya xwe û siyar dive, du tejiya dide pey xwe û diçe.

Geleki diçe, dighîje mêşekî. Gava lê dinihêre, sê merî va ne nav mêşe da ne. Ew merî divêje:

-Mîr Mihê, tu ser çeva hatî, em zanin ber mirine direvî, were cem me, neçe, emê vi mêşê hanî terikî bişewitinin, paşê emê bimirin.

Mîr Mihê divê: -Emê dîsa bimirin?

Ew merî divejin: -Ci tune merî nemire.

Mîr Mihe dive: -Na, ez ê herim.

Mir Mihe diçe, gelekî diçe, rastî teyrekî tê. Teyr divêje:

-Mîr Mihê, tu ser çeva hatî.

Mîr Mihe diveje: -Tu çawa min nas dikî?

-Tu ber mirinê direvî, were, te eva gelîyê hana dîtiye, tijî garis e, ez ê xwe ra û te ra roje du heva bavêjim. Kengê ew gelî vala bû, paşê emê bimirin.

Mir Mihê divê: -Emê dîsa bimirin?

Teyr divê: -Merî tune nemire.

Mir Mihê divê: -Na, ez ê herim cîkî usa, wekî mirin lê tunebe.

Mîr Mihê diçe, gelekî diçe, gava lê dinihêre rasteke mezin va ye. Lê dinihêre merîkî va ye, du ga wê cem wî diçêre. Gava ew merî lê dinihêre Mîr Mihê wê da hat, ew merî dive:

-Mîr Mihê, tu ser çeva hatî.

Mîr Mihê dive: -Tu çawa min nas dikî?

Ew merî divê: -Ez çima nizanim, tu ber mirine direvî. Te eva besta hana dîtiye, ez rojê xetekê lê radikim, tu jî hatî, ez ê rojê du xeta rakim. Heta eva besta kuta neve em namirin.

Mîr Mihe divê: -Weki ew kuta bû, dîsa emê bimirin?

Ew merî divê: -Lê çawa?

Mîr Mihê dive: -Wekî emê dîsa bimirin, ez ê herim.

Mîr Mihê gelekî diçe, pir diçe, hindik diçe, xwe ji baxe cinetê ra dighîne. Lê dinihêre xezalek ber banz dide. Mîr Mihê deng li tejîya dike. Ew û tejî rikêfî ser dikin, ew xezal diçe dikeve baxê cinetê. Wê derê horî têne pêşiyê divêjin:

-Tê ku da herî?

Mîr Mihê divêje: -Nêçira min hate vira. Bisekinin ez herim nêçira xwe bînim, ez ê dîsa bêm.

Tu usa navêjî, ew xezal xwexwa horî bû. Mîr Mihê diçe gelekî nava baxê cinetê digere, paşê horî diçin Mîr Mihê ra divêjin, divên:

-Mîr Mihê, tu xwe ra digerî, nevî diçî ser wê dara hana.

Mîr Mihê gelekî digere paşê divêje: "Vana çima gotin ser wê darê, hila ez ê hilkişim ser wê darê". Gava Mîr Mihê hildikişe ser wê darê, gotina gotîya, şeherê bavê xwe divîne, wê derê digrî, gelekî digrî. Paşê Mîr Mihê radive ji baxê cinetê derdikeve tê derva. Gava lê dinihêre, hespê wî usa xû daye, tejîyê wî hilke-hilka wan e. Mîr Mihêdive:

-Ez ê herim.

Horî divêjin: -Mîr Mihê, miliona sal derbaz bûye, tuyê ku da herî?

Mîr Mihê divê: -Na, ez duh hatime.

Horî gava lê dinihêrin evdê serreş e, nasekine, horî diçin xurcika wî tijî sêv dikin, sê heva jî sêvê cinetê didine.

Horî divêjinê: -Gava merî rastî te tên, sêvê xwe nedêyî.

Mîr Mihê divê: -Bira ve.

Mîr Mihê diçe, gelekî diçe, pir diçe, hindik diçe, nêzikî cotkar dive. Gava lê dinihêre cotkar wê ew best temam şov kirîye, cotkar bûye xalî, hestuyê gayê wî wêderê ne, her maça cot tenê heye. Paşê Mîr Mihê diçe, pir diçe, hindik diçe nêzikayê teyr dike. Gava lê dinihêre, teyr wê ew gelyê tijî wê vala kiriye, hinek tenê bin zimanê wî da maye, ewqasî rihu berda heye. Mîr Mihê divê:

Te di? Te digo were cem min, min digo - na, ez ê herim cîkî usa, wekî mirin tê tuneve, te dît gilîyê min hate sêrî. Wekî ez niha cem te bûma, niha ez jî, tu jî miribûn.

Teyr divê: -Mîr Mihê, were meçe, bi zoreki tu hatî vira, were tu meçe, mîlîona sal derbaz bûne. -Dike-nake nasekine.

Mîr Mihê diçe, hindik diçe, pir diçe, nêzikayê mêşe dike. Gava lê dinihêre - dewsa mêşe rast dûz bûye. Wê dere derbaz dive, diçe, gelekî diçe, nêzikayê şeherê bavê xwe dike. Gava lê dinihêre bax, baxçe wê dewsa şeherê bavê wî şîn bûne. Gava lê dinihêre merikî rûspî nav baxçe da ye. Diçe lê pirs dike, divê:

We vî şeherî da qe mala Îsikê çil kur ne bihîstiye?

Kalê divêje: -Ez heyştê salî heme, em heft bira ne, min nav dengê Îsik ne bihiştiye. Here birê min î mezin dera hane ye, here lê pirs bike, dive ewî bihîstibe.

Mîr Mihê diçe ji wî kalî pirs dike, kalê divê:

Sed pênc salî me, min nav dengê Îsikê çil kur ne bihîstîye.

Mîr Mihê vedgere dîsa ber bi baxê cinetê. Diçe, gelekî diçe. Gava Mîr Mihê lê dinihêre merîk pêşîya wî diçe. Mîr Mihê dilezîne, xwe pê ra dighîne. Ew merî vedgere divê:

-Syaro, tu wekî tu dihevînî, tê sêvekê bidî min, bîna seva cem te tê.

Mîr Mihê dike-nake xwe ji wî xilaz nake, derdixe sêvekê dide wi, lê derbaz dive diçe. Gava ser xu da dinihêre, de'fê sipî ketine sûretê wî. Mîr Mihê dîsa diçe, hindik diçe, pir diçe, gava lê dinihêre jineke topal rê da diçe. Mîr Mihê xwe pe ra dighîne. Gava diçe cem wê, ew jinik divêje, divê:

-Xorto, bidî xatirê xudê, tê sêvekê bidî min, kurê min nexaş e, tê sêvekê bidî min, ez bidime kurê xwe, wekî sax bive.

Mîr Mihê derdixe sêvekê didêda. Ew merî ber Mîr Mihe unda dibe. Mîr Mihê para dinihêre bû kazîna tejiye wî, para ma. Mîr Mihê divê: "Eva çi bû, tejîyê min çima para ma?". Gava Mîr Mihê ser xwe da dinihêre, rûyê wî sipî bûne, guhê wî giran bûne. Gava ser hespê xwe da dinihêre, hespê wî hema divê: "yek, dudu". Dîsa Mîr Mihe gelekî diçe xwe baxê cinetê ra dighîne, merik disa pêşye dertê, divê:

-Apê kal, tu bidî xatirê xudê, tê sêvekê bidî min.

Mîr Mihê xwe jê xilaz nake. Horî derdikevin gazî Mîr Mihê dikin, divên:

-Mîr Mihê, sêva xwe nede, hindik ma tu bighîji baxe cinetê.

Mîr Mihê guha gran bûye, tiştekî nabhê. Mîr Mihe divêje wî merî, divê:

-Ew çima gazî dikin?

Ew merî divêje: -Ew jin gazî dikin, divêjin hindik ma tu bighîjî baxê cinetê, ew ê sêvê bide wî merî.

Gava Mîr Mihê sêvê derdixe dide wî merî, ew ser hespe tê xarê. Gava horî lê dinihêrin Mîr Mihê ew sêv jî daye, horî jorda tên, mezelekî Mîr Mihê ra dikolin, Mîr Mihê hildidin, dikine mezel û diçin.

### 4.2.5. Şaîsmaîl

Wextekê hebû-tunebû padşak. Ewled tewledê wî tunebûn. Padşa gele-gelekî duşurmîş dibû. Rojekê wezîrê xwe ra go:

-Wezir, tivdarekê me bike, emê herine gerê, belkî xadê mirazê me bike, ewledekî bide me.

Wezîr tivdarekê xwe kir, rojekê cem padşa sekinî, got:

-Padşaî sax be, gotina te hazir e!

Padşa gote wezîr, go:

-De dey esker bike, bira esker derxin.

Weke polke esker da ser xwe, ew wezîrê xwe va dane pêşîê çûn. Gelekî çûn, hindikî çûn, êvarekê çûne cîkî însizî delal, gul û sosin tê da. Evar bû. Padşa go:

-Emê îşev vira bihêwirin.

Ew der kêleka çemekî bû. Wê şevê li wê derê man.

Sivê xêr ser we da bê, ser wan da jî hat. Padşa rabû çû ber bi avê, wekî ser çevê xwe bişo. Padşa destê xwe avê da kir ser çevê xwe bişo, lê nihêrî sêveke sor ser rûyê avê ketiye, tê. Destê xwe avîtê, girt, go : "Hilbet, ev jî qismet e, go, eva sêva hana vê sivê ser rûyê avê ku hat". Hew lê nihêrî dewrêşek lê diharî bû, go:

-Padşa, go, tu çira duşurmîş divî ser vê sêvê da? Go, diçî gerê?

Padşa go: -Belê!

Go: -Here go, tu vê sêvê bibî herî, sipî bikî, qalikê we bidî mihîneke xwe, mihîna te îsal heft sale cenû neanîne, sêvê jî kerî bikî, kerîkî tu bixwî, kerîk jî jina te bixwe. Îşala elatiela xadê wê ewledekî bide te, cenûkekê jî bide mihîna te. Lê tu car - tu car nav lê nekî, hetanî ez têm. Ez ku hatim, ez ê nav kurê te kim jî, cenûê kim jî. Vegere here ser textê xwe, dest bi xêra bike, edlaê bike - tu gihiştî mirazê xwe.

Padşa zivirî çadira xwe, go:

Wezîr, karê esker bike, emê vegerin herin mal.

Wezîr go: -Padşaî sax be, riya zef em hatine, riya hindik maye, em herin.

Padşa go: -Na, wezir, em gerekê ji vira vegerin.

Eskerê xwe hilda, paş da vegeriya, hat ser textê xwe rûnişt. Padşa êvarê çû herem-odasya xwe: sêv ji cêva xwe derxist - sêveke sore delal. Jina wî kenî, laqirdî padşa kir, go:

-Padşaî sax be, tu teze bûyî xort, ez ji bûme qizik, te çûye sêvek ji min ra anîye.

Padşa kêra çirtilme ji cêva xwe derxist, sêv sipî kir, qalikê wê da ser sinîê, ortê da kerî kir - kerîk jina wî xar, kerîk jî wî xar. Ew qalik hilda, gazî xulamekî xwe kir, go:

-Kuro, qe mihînê min stewir hene?

Xulîm jê ra got: -Padşaî sax be, mihîneke te heye îsal heft sal e ber nagire.

-Kuro, go, eva qalikê sêvê tu bidî mihîna min, bira mihîna min bixwe.

Sivê rabû dest bi xêretxana kir, kesîb û kûsîb kinc kir, nan kirin, av kirin.

Wextekê wexta çû. Rojekê padşa lê nihêrî, wekî jina wîya giran e. Xulîm cab daê da, go:

-Mihîna te avis e!

Neh meh, neh roj, neh sihetê wan temam bûn: jina wî raza, kurek anî. Xulam cab daê, go:

-Mihîna te zaye, cenûkî nêr anîye.

Şabûn kete palata padşa, cimaetê. Padşa şa bû, çevronaî dane wî. De zara padşa bû çend meh derbaz bû, cimaet sekinî, go:

-Tu gerekê navekî kurê xwe kî.

Padşa go: -Min qirar kirîye, ew merivêk min ra gotîye ne hazir be, ez nav kurê xwe nakim.

Gilî devê wan da xeber didan, hew lê nihêrîn dewrêşek dîwana padşa hazir bû. Cimaetê go:

-Dewrêş baba, kerem ke!

Gava padşa çev li dewrêş ket, dewsa xwe rabû dewrêş baba bir kêleka xwe.

Dewreş go: -Padşaî sax be, we gilîk xeber dida, ew çi gilî bû?

Padşa go: -Dewreş baba, go, cimaet top bûye, wekî nav li sanîkî te kin.

Go:-Belê, go, xadê bimbarek pîroz bike, go, herin gede bînine viraya.

Çûn gede anîne dîwana padşa, dewrêş gede da ser çoka xwe, destê xwe li piştê xist, go:

-Kesek milê te daneyne, kesek nikaribe te ra şer bike, kî bê serê te, tu alt bikî. Go, navê wiya Şaîsmaîl xadê bimbarek bike.

Cimaete hev ra go: -Xadê bimbarek bike!

Go: -Em herine tewlexana hespa, cenûyê bînin werin.

Çûne tewlexanê, gazî xulama kirin, xulam cenû anî cem dewrêş. Dewrês destê xwe pişta cenûê da, go:

-Bimbarek, go, kesek ber te xilaz neve, go, kesek para negihîje te, reva te hilnede, go, tu alîê xaê xwe şer bikî, him ji pê ra şer bikî, him ji pa ra şer bikî. Go, navê cenûye te Qemertaîl go bimbarek be!

Cimaete hev ra go: -Bimbarek be!

Wexta vegeriyan, hew lê nihêrîn dewrês tune.

Padşa ser textê xwe runişt. Çend sal derbaz bûn. Zarê hikyatê ne - zu divin, zu jî mezin divin. Şaîsmaîl îdî heft salî bû. Padşa gazî xocekî kir, go:

Xoce, go, tu kurê min bidî xwendinê hundurê mektebê da, tenê rûyê roê, tevê nevîne.

Gazî xulamekî kir, go:

-Kuro, go, tu wî cenûê hundur da xay kî, go, heta ez ji te bixwezim.

Xoce emir kiribû xarina Şaîsmaîl danîn, ciê wî da didanê da. Temî kiribû qeysîya bînin bê denidik, goşt bînin bê hestu bidine Şaîsmaîl, Şaîsmaîl bixwe, wekî diranê wîya neêşin.

Şaîsmaîl usa hînî xwendinê bû, wekî xoce jî nikaribû nola wîya bixwenda. Xoce rojekê ne mekbetxanê bû, derket çû. Wexta xarina Şaîsmaîl anîn, aşpêj bîr kiribû hestûk nav goşt da hiştibû.

Nanê wî datanîn ser îstolê, pişta xwe didanê diçûn, derîn jî pê ra dadidin. Usa jî îjar. Şaîsmaîl rabû, ser çevê xwe şûşt, hat rûnî nan bixwe, nan da ber xwe, nan xwer, hestu kete destê wîya, hilda hestu kot: wexta kot: diranê wî êşya, hêrsa wî rabû, girt hestu avît req şûşe şikênand. Gava ku şûşe şikest, tîrka rojê avîte orta mektebê. Merîê cahil re tev nedîtibû, ewî tîrê dinya usa terî ye, tirsya revî xwe de kûncekî. Carkê maîn xwe-xwe ji xwe ra go, go: «Weleî, eva ruhistîn e». Milê xwe hilda jorê û çû tîrikê ra gulas girt. Tîrikê digire xwe, gava xwe davê ser tîrikê, divê rep erdê dikeve, dîsa tîrik dewsa xwe da ne. Usa gelekî çerçimîş dibe, xû dida, xûdanê da dive av. Xoce derî vedike, hundur dikeve, gava lê dinhêre Şaîsmaîl wê xûdanê da bûye av.

Xoce go: -Şaismaîl, go, serê min qurbana te be, te çira usa xû daye?

Go: -Hay gidî xoce, go, te nedigot ruhistînê bê ruhê te bistîne. Te zanibû ruhistînê bê îro ruhê min bistîne, lema ji tu derketî, nehatî cem min.

Xoce go: -Ka Şaîsmaîl, ka ruhistîn?

Go: -Awa ewê hana ruhistîn e, hat ruhê min bistîne, ez nîvro da pê ra şer dikim.

Xoce hilda jê ra got, go: -Şaîsmaîl, go, canê min qurbana te be, go, ew ne ruhistîn e, go, ew tîrik e, go, go, derva ro heye, go, hîv heye, go, tev heye.

Şaîsmaîl hilda go:

-Xoce, ez girtî me, wekî ez kirime vî avayî?

Xoce go, Şaîsmaîl, go:

-Bavê te emirê usa kiribû. Eva mekteb e, tê da tu dernexistî.

Şaîsmaîl go xoce, go:

-Here ji bavê min ra bêje, go, vê sehetê ez jê derdikevim.

Xoce rabû çû dîwana padşa, li ber padşa temenekir, ning da ser ning, dest da ser dest, ber padşa sekinî.

Padşa go: -Ha, xoce, go, bêje çika tu çi divêjî?

Xoce go: -Padşaî sax be, Şaîsmaîl min çêtir hînî xwendinê bûye, diha xwendinê ez bidime wîya nikarim. Sekiniye divê: «Ez ê ji vê mektebê derkevim, tê da nasekinim».

Padşa ji cimaeta xwe ra got:

-Cimaet, hûn çi rezaê tê ra divînin, wekî kure min sinhetekî xwe ra hilde, bive sinhetçî?

Wezîrê wî hilda got, go:

-Padşaî sax be, go kurê te şahzede ye, go, emir bike bira pêşberî mekteba wîya hedad hedatiê bikin, dûrger dûrgerîê bikin, soldurî sola bidrûn, go bira siyar bin xwe ra cirîd bikin, go, tu jî cimaetê hilde emê herin cîkî rûnin, xwe ra xever din. Bira

xoce here Şaîsmaîl derxe bîne bê. Şaîsmaîl kîjan sinhet qebûl kir, emê bidine ser wî sinhetî.

Xoce çû Şaîsmaîl derxist. Gava Şaîsmaîl derket, çevê wî dinya ron ket, bîna wî derket.

Xoce da pêşiê nava wanaya gerand. Şaîsmaîl jê pirs kir, go:

-Xoce, eva çî ye?

Go: -Hedad e, hedadîê dike!

Go: -Lê eva çî ye?

Go: -Eva jî dûrgerîê dike!

Usa wê formê sinhet tev jê pirsî. Şaîsmaîl jê ra go, go:

-Xoce, lê eva hana, wî heywanî dibezînin, go, lê ew çî ye?

Go: -Şaîsmaîl, go, ew hesp in, meriv lê siyar bûne, go, kurê wezîr e, go, kurê lele ye, lê siyar bûne xwe ra cirîdê dilîzin.

Go: -Lê ew cimaeta hana çî ye?

Go: -Ew jî cimaeta bavê te ye rûniştîye. Go, tema bavê te min heye: go, ji vî sinhetî, ji vê cimaetê tu çi bixwezî, bavê te ê bide ser wî pêşeyî.

Go: -Xoce, evê hana siyarî ye ew min xweş te, wekî din qe tişt min xweş naê, bira bavê min yekî bide min ez le siyar bim.

Xoce çav da padşe, go:

-Hal-hewale kure te bu ev. Hespeki dixweze, siyariê dixweze.

Padşe emir kir, go:

-Kuro, go, Qemertaîl bikşînin Şaîsmaîl ra. Go, wezîr, bira kurê te ji Şaîsmaîl ra here, usa jî çar-pêncê dine.

Şaîsmail, kurê wezîr bû destebirakê wîya, usa jî çar- penc hevê dinê xwe ra hildan, rojê diçûne raw û nêçîrê, êvare dihatine malê. Lê kurê wezîr timê cem Şaîsmaîl radiza şevê.

Rojekê çûne rew û nêçîrê, Şaîsmaîl hevalê xwe ra go:

-Kuro, go, îro nêçîrek rastî min hat, ber ningê hespa kê ra revî, ew tenê gerekê bide pey.

Derketine çiyakî bilind, kareke xezala dîtin. Gava ku siyar lê hatine hevdu, kara xezala ber ningê Şaîsmaîl ra revî.

Şaîsmaîl go:

-Kuro, bisekinin, ez ê herim.

Şaîsmaîl da pey. Şaîsmaîl bir çû, lê nihêrî serê çiê sînorê bavê wî bû, êleke giran lê danîye: hesavê çadira tunene, çadirek tek, serê wê zîvkirî, kara xezala revî kete nava çadirê.

Şaîsmaîl ber derî sekinî, kire gazî, go:

-Xayê malê, xezala min hatiye vira, nêçira min derxin. Qîzikeke di wê çadirê da bû, navê wê Gulîzer bû. Gulîzer derkete derê malê. Gava çevê Şaîsmaîl Gulîzerê ket, aqlê wî ji sêrî çû, ji hespê da ket: îro ne miriye, îro heft roj e mirîye, aqasî qirka wiya hiltê-datê. Gulîzer gelekî ber xwe ket, gelekî duşurmiş bû, go: «Yek bivîne, wê bê wana ev xort kuştiye. Ev xort hat, bû cerma stuê me". Gulîzere cariê xwe ra go, go:

-Qîzê, qîzê, ca here pîrekê bîne, pir zanin çika ev çi ecêb e. Carîkê çû pîrek nava êlê anî. Pîrê gava hat, li xort nihêrî, Gulîzerê go:

-Diya pîr, ez bextê te me, eva xorta hat ber çadira min, min xezala xwe berdabû, pey wê hat ber dêrî awa firî, ket.

Pîrê go: -Lawo, go, tiştek tunene, eşqî te bûta ketîye. Go, çiçikê xwe derxe, ser çevê wî xe, wê rave ser xwe.

Keçê go: -De daê, tu wê da here.

Çiçikê xwe derxist, sûrtê Şaîsmaîl xist, Şaîsmaîl rabû ser xwe.

-Ha, go, qîza qenc, navê te çi ye, go, tu qîza kê yî?

Wî çaxî gustîlkê xwe hev guhêrîn.

Keçikê got: -Ez qîza Êlbeg im, rave zû bike ji vira here, heft birê min hene, wekî te bivînin, wê te pirtî pirtî bikin. Go, ew xezala tu pey ketiyî, go, ew xezala min e.

Şaîsmaîl rabû, por û poşman zîvirî ber bi hevalê xwe, çû. Çû lê nihêrî hevalê wiya neçûne tirsa wîya. Gihîşte hevala o go:

-Bilivin!

Hevalê wî yekî culhet nekir, wekî bigota kanê xezala te, te çû çawa kir?

Êvarê ew û kurê wezîr va ketine cî razan. Sivê wexta rabûnê, kurê wezîr rabû lê nihêrî, go:

-Şaîsmaîl, go, min av anîye, go, ser çevê xwe bişo.

Şaîsmaîl go: -Ez îro naxwezim.

Wextêk Şaîsmaîl rabû destê xwe bişo, çaxa destê xwe şûşt, gistîlk tilya xwe da dît, aqilê wî sêrî çû firî ket. Kure wezîr hilda kire nava cî, çû cem padşê, go:

-Padşaî sax be, go hal-hewalê kurê te bûye ev, wekî min av dest kirîye - firîye ketîye.

Padşa cimaeta xwe va rabû hatin cem Şaîsmaîl. Padşa hilda got:

-Şaîsmaîl, go, serê min qurbana serê te ve go, tu çira ha bûyî?

Şaîsmaîl hilda bavê xwe ra got, go:

-Bayo, go, bişîn sazekî min ra bîne were, go, ez ziman bêjim, zimanê minî wê bişewite, ez bi saz te ra bêjim.

Bi saz jê ra go, go:

-Dilketiya min navê wê Gulîzer e, go, qîza Êlbeg e go heft birê wê hene.

Padşa zivirî ser textê xwe, go:

-Lawo, go, emê ji te ra yekê bixwezin.

Padşa vî gilî da, vê gotinê da, em bêne ser mala bavê Gulîzerê.

Gulîzer qîza Êlbeg e. Êlbeg çûye rehmetê, Qerewezîr dewsa wîya begî dike. Qerewezîrî heftê salî ye, Gulîzer panzde şanzde salî ye, cahil e. Qerewezîr meriv şandine cem Diya Gulîzerê, gotinê:

-Hûn Gulîzerê gere bidine min.

Diya wê jî gotiye:

-Ew heftê salî, qîza min ji panzde şanzde salî, ez çawa qîza xwe bidime ewî kal, ez qîza xwe nadim.

Diya Gulîzerê duşurmîş bû, go: «Wekîk ez nedim, wê bive şer, heft kurê min hene, dive heft kurê min jî bêne kuştinê».

Emirî ser êla xwe kir, go:

-Bar kin, emê ji şeherê Qerewezîr derkevin.

Êla wê rojekê bar kirin, ji şeher derketin. Hatin serê wî çyaî, sînorê bavê Şaîsmaîl da danîn.

Diha îdî paîz bû, malê êlê zef bû. Jina Êlbeg emirî ser kurê xwe kir, go:

-Lawo, sivê zivistan e, go, go, herine cem padşa bira padşa cîkî bide me em herin lê bihêwirin, malê xwe xwey kin.

Her heft kurê Êlbeg siyar bûn, berê xwe dane şeherê padşa, çûn ber derê dîwana padşê peya bûn. Xulam xizmetkara hespê wan kişandine hundur, merîkî da pêşya wana, birin çûn dîwana padşa. Ew jî kurê padşa bûn, çûn padşê ra temene kirin, ning dane ser ning, dest dane ser dest, çûn ber padşê sekinîn. Padşa lê nihêrî xortine delal, cî nişan danê, go:

-Kerem kin, gelî xorta, rûnîn! Her heft bira cêrgekê rûniştin. Padşê pirs jê kirin, go:

-Ourba, hûn çi meriv in, hûnê ku da herin, hûn hatine çi?

Birê mezin go: -Padşaî sax be, em her heft birê hev in, em kurê Êlbeg in.

Gava usa go, padşê lêva xwe gest, dilê xwe da got: “Ya kurê min digo ev in". Padşê go:

-Ê, qurba, bêje!

Birê mezin hilda got, go:

-Padşaî sax be, em hatine, me sînorê te danîye.

Pêşkêşa padşa dezmalek zêr anîbûn. Go:

-Gerek tu cî bidî me, em îsal vê zivistanê malêxwe xwey bikin, heta baharê.

Padşa hilda ji wan ra got, go:

-Qurba, go, xûşkek we heye, navê wê Gulîzer e, rast e?

Birê mezin hilda go:

-Rast e, padşaî sax be!

Go: -Xûşka xwe bidine kurê min, ez ê cî bidime we, ez ê gunda bidime we, ez ê êrê bidime we, hetanî biharê bêheq malê xwe xwey bikin.

Teva jî, şeş heva go:

-Me da.

Birê çûk negot. Îzna xwe ji padşê xwestin. Go:

-Çil şevî dinê şûn da ez ê dewata kurê xwe bikim, we jî cî bikim. Çil şev we ra molet.

Cav dane Şaîsmaîl, go:

-Çevê te ronî, bavê te Gulîzer ji te ra xwest.

Hetanî wî çaxî Şaîsmaîl nexweş bû. Wexta ku jê ra gotin, Şaîsmaîl eşqana rabû ser xwe. Ew kurê wezîr va xwe ra ber pencerê rûniştin, şeher mêze kirin. Lê nihêrîn pîreke hiz- hizî cêrekî ser mila wê ji avê tê. Kurê padşa kurê wezîr ra go:

-Ez ê tîr kevanekî bavêjim kûpê pîrê xim.

Kurê wezîr go:

-Tu nikarî lêxî, dûr e.

Go: -Na, ez ê lêxim.

Tîr kevan çawa avît kûp xist, kûp qul kir. Av li ser pîre da hat, pîrê şil bû: pîrê lê nihêrî kûp qul bûye, lê xistine kûp şkênandine, kurê wezîr kurê padşê va wê jorê dikenin. Pirê gava lê nihêrî wê herdu pîrê dikenin, go:

-Lawo, go, kîjan ji we kûpê min şkênand?

Kurê padşa go: -Min lê xist.

Go: -Şaîsmaîl, go, qirar be, go, kevirekî usa texim, wekî heft govek bavê te jî wî kevirî hilnedin.

Şaîsmaîl zivirî ser kurê wezîr û kenya, go:

-Kuro, lê binhêr ew pîra keftor wê çi min bike, divê: «Ez ê kevirekî texim heft govek bavê te hilnede».

Û pîrê çû mala xwe. Pîrê zanibû, wekû êlek hatîye topraxa padşa, qîza xwe dane kurê padşa.

Em bêne ser heft bira. Her heft bira wexta çûînê, rêva, birê çûk qirika wan girt, go:

-Lê, go, we çira xûşka me da kurê padşa?

Birê mezin go: -Çira?

Go: -Lê xelqê bêje xûşka xwe dan kurê padşa, paşê padşa cî daê da.

Her heft bira çûne malê. Diya wana jê pirs kir, go:

-Lawo, we çawa kir?

Birê mezin go:

-Daê, go, welle hal-hewal bû ev: me Gulîzer daye kurê padşa. Padşa go, ez ê we xwey kim heta baharê bêheq.

Diya wîya hinekî dilê wê xweş nehat. Kurê piçûk jî go:

-Lê, daê, ez qebûl nedibûm, her şeş birê min soz dan.

Diya wan careke dinê duşurmiş bû, go:

-Lawo, tişt nake, go, Gulîzer jî cahil e, kurê padşê jî cahil e, tist nake daye-daye.

Birê mezin hilda Diya xwe ra go:

-Çil şev molet dane me, çil şevî şûn da wê dewata kurê xwe bike, we me ji cî bike.

Em bêne ser wê pîrê.

Pîrê bihîst, wekî Gulîzer dane Şaîsmaîl. Sirsûmê pîrê hebû, merek kire qamçî, girte xwe, li sirsûmê siyar bû, li sirsûm xist, go: "Bimbarek, kê derê êla Êlbeg e tu

min bivî wê derê ". Çu kêleka êlê qûmlix peya bû. Sirsûmê xwe kire nava qumê veşart, deste tizbiê qirêj girte xwe, kete nava êlê geriya, go: “Dost-dostê xadê, ez ji hecê têm, ez ê herime malê”. Çû derkete ber derê çadira Diya Gulîzerê, Gulîzer Diya xwe va rûniştibûn, xwe ra xever didan. Pîrê go:

-Ele dost-dostê xadê, ez ji hecê têm, tiştekî bidine min.

Diya Gulîzerê go:

-Pîre, Diya pir, tu ji kuî?

Pîrê go: -Ez ji şeherê padşa me!

Go: -Diya pîr, go, ew heca te ne para te be, tu ê rast bêji, go, kurê padşa yekî çawa ne?

Pîrê îmana xwe şewitand, gava Gulîzerê nihêrî, axîn hate da, go :

-Sed heyfa vê cahilê, wekî we daye kurê padşê.

Diya wê go: -Çira?

Go: -Lê çevê min birêje, go, destekî seqet e, ningekî topal e, go, şevê jî cina dikeve ji nava cîya direve.

Gava pîrê usa got, dilê Gulîzerê şewitî, Gulîzerê xwe zeft nekir, go:

-Daê, derewa dike.

Çawa Gulîzerê go "derewa dike", Diya wêya ser xeyîdî, go:

-Porkura porkur, tu ji hecîya ra divêjî derewa dike, go, tu ber min xever didî?

Diya Gulîzerê da aqilê xwe, go: «Kurê padşa ye, destekî seqet be jî, tiştekî nake, go, ningekî topal be jî, tiştekî nake, go, lê wekî cina dikeve, go, Gulîzera min tûnsiz e, wê paşlê da bitirse» .

Pîrê lê da, zivirî çû. Jina Êlbeg emir kir, go:

-Kuro, bar kin, go, emê dîsa herine şeherê xwe.

Kosteka devê avîte milê Gulîzerê, avîte serê lokê pêşin, Gulîzer pêxas kir, go:

-Forqê, go, te ber min xever daye, go, ez ê te bivime herim bidim Qerewezîr.

Gulîzer rabû gelekî giriya, kaxezek nivîsî ji Şaîsmaîl ra hilda kire binê kevirê kuçk.

Û koça xwe barkirin careke maîn zivirîn çûn şeherê xwe. Cav dane Qerewezîr, wekî „Emê Gulîzerê bidine te". Qerewezîr Gulîzer nîşan kir. Gulîzerê kêra çitirme girte xwe, îstikana jê`rê da ber xwe, go:

-Kî bê cem min, ez ê îstikana jê 'rê bixum, kêrê jî xwe xim. Çil şev ji we ra molet, çil şeva şûn da yanê ez ê bêjim - erê, yanê bêjim - na.

Em bêne ser padşa û Şaîsmaîl.

Çil şev temam bû, padşa du qewazê xwe şandin, go:

-Herin cavê bidine her heft birê Gulîzerê, karê bûka min bikin, ez ê bêm bûka xwe bivim.

Qewaz gava çûne dewsa warge, lê nihêrîn wergene xire-xalî, kesek lê tune, koç kirine, lê dane çûne. Qewaz zivirîn hatine cem padşa, go:

-Padşaî sax be, go, temam koç kirine çûne, kesek dewsê tunene.

Padşa gava eva yeka bihîst, go:

-Kuro, go, Şaîsmaîl ra nevêjin.

Divên yêk nan bidine meriva, tunene, yêk ziman bavên devê meriva, hene. Cav da Şaîsmaîl, go:

-Mala xezûrê te koç kirine, Gulîzer hildane çûne.

Şaîsmaîl merî şand cem bavê xwe, ji diya xwe ra got, go.

-Daê, go, ji bavê min ra bêje, bira hespekî bidine min, ez ê herim.

Diya wî çû ji padşa ra got, go:

-Hal-hewalê Şaîsmaîl bû ev.

Şaîsmaîl çû tewlexana hespa, destê xwe da ser kîjan boenî, pişta xwe dadanî. Gava destê xwe da pişta Qemertaîl, ewî pişta xwe hilbirî. Çû cem zînkira, zînek ji hespê xwe ra da çêkirinê, temamî zîn ji qaş û taş, hate cem Diya xwe, go:

-Daê, ez ê herim, te ji bavê min ra gotîye, çi divêje?

Diya wî çû cem padşê, jê ra go:

-Şaîsmaîl diçe, nasekine.

Padşa emir kir, go:

-Bira here xwe ra xurce zêr hilde, go, şûrê bavê min wê dar da ye, go, bira ewî şûrî jî bigire xwe. Padşa gote xulama: -Kuro, ningê Qemertaîl qeyd û çîdar bikin.

Şaîsmaîl sivê zû rabû, gazî xadê kir, zînê hespê xwe li piştê xist, şûr girê da, nola merîkî pîyan haj qafê xwe nînbû, nizanbû hespê wî qeyd kirîye. Hesp kişand derê malê, hespê siyar bû. Padşa emir kir, go:

-Kuro, derga dadan, bira neçe.

Dergevana dergê sûra dora palatê dadan. Şaîsmaîl kî alî ajot derge dadaî bûn. Gazî xadê kir û hespê xwe qamçî kir, hespê sûr qewaz kir, derbazî wî alî bû. Wextekê çû kurê wezîr pey ket, go:

-Şaîsmaîl, go, ez ê jî te ra bêm.

Şaîsmaîl go: -Na, qurba, dive ez herim neêm, dive herim bêm, çira gunê te bikime stuê xwe.

Şaîsmaîl tenê berê xwe da yûrdêd mala bavê Gulîzerê û çû. Çû derkete yûrda, dît kesek yûrda da tunene, xên ji çivîka. Şaîsmaîl çû li ber çadira Gulîzerê, peya bû li

wan dera, geriya. Dilê wiya tijî bû, hinekî stra, hinekî giriya. Wextak rabû hespê siyar be, ningê xwe da ser kevirê kuçik, kevir bin ningê wî da welgerîya. Lê nihêrî pamojnîkeke çûçik. Gava derê pamojnîkê vekir, lê nihêrî kaxazekî tê da ne. Kaxez vekir xwend. Gulîzerê nivîsîbû: «Şaîsmaîl.can. çil şev te ra molat, herge tu çil şevî da gihîştî min-ez ya te me, herge negihîştî min-ez ji destê te çûm». Şaîsmaîl notla merîê pîyan li hespê xwe siyar bû, ajot.

Gelekî çû, hindikî çû, çû derkete rasteke dûz. Lê nihêri kelake temîz wê çêkirîye. Gava çû ber kelê sekinî, bala xwe daê da, derê kelê bi sêrê girê dane, derê wê tunene. Dora kelê vegeriya zîvirî, wêderê çend kilam gotin, go: «Kela, go, derê te kanê, rê bide min», Hêrsa wî rabû, şûrê xwe kişand, şûr riknê kelê xist kêlekek lê hate xarê. Kete hundurê kelaê, hilkişya qatê duda. Lê nihêri qîzek wê rûniştiye kergekî kerge çêdike. Qîz mîna husulcemalek e, awqasî bedew e, Kurmancî silam daê, silama wî venegirt, ecemî silam daê, keçikê dengê xwe nekir. Kurê padşê danzde zimana va silam dayê da, keçikê dengê xwe nekir. Keçik alîkî digirî, alîkî kerge çêdike. Şaîsmaîl go:

-Qîza qenc, go, tu eva digirîyî, go, tu derdê xwe min ra bêje, belkî ez derdê te derman bikim.

Go: -Xortê qenc, tu ê çi derdê min derman kĩ?

Go: -Bêje, gilîê xwe min ra bêje.

Navê keçikê Gulperî ye. Gulperîê hilda got, go:

-Bira, wekî ez negirîm, wê kî bigirî. Go, heft birê min hene, go, padşak hatîye zorê min dive, go, her heft birê min jî çûne şêr.

Go: -Qîza qenc, go, şer kê derê ye, go, ez ê herim şêr.

Gulperî rabû hate ber pencerê, go:

-A, go, bira, go, te çîyaê han dîtiye, go, a serê wî şeherî ye. Eva han jî riya wê ye, ew rê diçe ser wî çîyaî.

Şaîsmail peyaî jêrê bû, "Ya ehral, ya xadê" go, siyar bû, kete wê rê, ew riya Gulperîê digot. Çû derkete serê çiyê. Gava bala xwe daê da, çi binhêre, wekî alîlî esker usa heye, hesabê steyr û peyra heye, hesabê esker tune. Lê alîkî jî çadireke tenê, şeş meriv ber sekinîne diçin û tên. Şaîsmaîl da aqilê xwe, go: «Ez herime alîê her şeş merîya, dive kubarî, go, ez herim aliê yê zef, go, ew jî - dersî. Go, ya qenc ew e, ez herim ortê bisekinim, silamê bidim, kê silamê min vegirt ez ê herim alîê wîya». Şaîsmaîl çû orta wana sekinî, selam da, go:

-Selam elêkim!

Eskerê zef çi talaşa wan bû, ewî her şeş bira go:

-Elêkime selam, xortê delal, ser çevê me ra hatî. Şaîsmaîl çû cem wan xorta, lê nihêrî her şeş meriva ruhê merîkê tê tunene, usa reng avîtine. Go:

-Xortê delal, çira hûn şeş hev in, ew eskerê wanaya zef e?

Birê mezin go, go:

-Xortê delal, go, em heft bira bûn, go, xûşkek me heye, eva padşaê hana hatîye zorê xuşka me bive, em jî nadin. Go, eva heftê me ye em şer dikin, birak me hatîye kuştinê, em mane şeş bira. Go, wele em qe haj xwe nînin, go, xewê em qers kirine.

Şaîsmaîl go: -Gelî xorta, go, go, hûn bikevin çadira xwe razên, go, ez ê qerewilî we bikim.

Birê mezin lava lê kir, go:

-Xortê delal, go, ya bext!

Şaîsmaîl go: -Qurba, serê min here, go, tiştekî we nave, razên firêqet, wexta şer ravin.

Wexta ew ketine hundurê çadirê razan, bû wexta şêr, eskerê wan borîê xist, wekî şer e. Şaîsmaîl vira teng û berê Qemertaîl ştand, go: «Ya ala, ya xadê», hespê xwe siyar bû. Heta wî çaxî Şaîsmaîl hunurê hespê xwe nizanbû. Gotina gotîya, gava

Şaîsmaîl kete nava şêr, nola gurekî çile bikeve nava kerîê pêz. Şaîsmaîl kete nava wanaya. Gotina gotîya hespê wî him ji pa ra merî dixistin, him jî ji pê ra qepa dikuştin. Şaîsmaîl jî ser pişta hespê şûr diqetand. Esker usa qir kirin, yê sax ew bû ji mala xwe nehat. Rev li esker ket. Şaîsmaîl berdaê hetanî derxiste topraxa wîya. Şaîsmaîl paş da zivirî hat, hespê wî xûnê da maye, çekê wî xûnê da maye, ber derê çadirê sekinî, kire gazî, go:

-Qurba, derkevin, wedê min e, ez ê herim.

Gava her şeş bira derketin derê çadirê, bala xwe danê hespa Şaîsmaîl va xûnê da maye. Zivirîn lê nihêrîn esker usa qir kirîye, wekî xûn dikişe mîna avê. Eva şeş bira şabûna nizanbûn çawa bikirana, go:

-Xortê delal, navê te çî ye?

Go: -Navê min Şaîsmaîl!

Her şeşa hev ra go:

-Şaîsmaîl, xadê me qurbana te ke, tu ji ku têyî, xadê tu şandî, teyra tu anî, tu çawa hatî îmdada me? Go, îsev tu mêvanê me yî, emê herine mala me.

Her şeş bira hevdu şêwirîn, go: "Evî qoçaxê hana, tistek lazimî wî nave, em gerek xûşka xwe pêşkêşî wî kin". Birê xweyî çûk rabûn pêşîê şandin, go:

-Here bêje xûşka me, bira kincê xwe xwe ke, xwe bixemilîne, me îgîtek anîye, emê wê bidin wî xortî.

Birê biçûk çû ber kela xwe, lê nihêrî derê kelê vekirî ne. Hilkişya çû, lê nihêrî xûşka wîya ser kerge rûniştîye digirî. Xûşka xwe ra go:

-Forqê, go, em seva te ketine şêr, rûyê te da birakî me hate kuştinê, te jî vira derî vekirîye, meriv anîye cem xwe?

Xûşka wîya zarî bû jê ra got, go:

-Bira, go, xortekî delal hate ber dêrî, gelekî kire qare- qar, min derî lê venekir, rikinê kelê xist hilşand hat hundur, cem min. Gelek zimana min ra xever da, min cava wî neda, axirîê bi saz min ra got, go: "Kula te çî ye, go, min ra bêje belkî ez derdê te derman bikim". Go, min gotîye, wekî heft birê min hene, çûne şêr, go, gotîye "Riya birê xwe nîşanî min de, ez ê herim", min riya we nîşan daê da, lê daye çûye.

Bira wê lê nihêrî ew gilîê wê rast e. Birê wê jê ra go:

-Gulperî, de rave xwe biniqişîne, emê te bidine wî xortî. Bira Gulperî kincê xwe xwe ke, xarinê hazir ke. Bira mêvan va derê malê peya bûn. Gulperîê lê nihêrî, wekîk ew merî ye. Çawa birê xwe çûk ra got, usa ji birê xwe mezin ra got, salixê wî da. Nan danîn, kirin xarin, vexarin hetanî êvarê. Evarê her şeş bira hev ra got, go:

-Şaîsmaîl, go, tu ne hewcê malê dine yî, go, eva xûşka xwe me cebayî te kir, helaliya xadê me da te.

Wexta razanê her yek çû cîê xwe raza, cîê Şaîmaîl û Gulperîê kontekî da danîn. Wextêk razanê ketine nava cî, Şaîsmaîl şûrê xwe kişand da orta xwe û Gulperîê. Gulperîê hilda jê ra got, go:

Şaîsmaîl, te çi qisûra min dît, wekî şûr kişand kir orta me?

Şaîsmaîl got: -Gulperî, go, go, mirazê min heye, go, heta ez mirazê xwe neynime sêrî, ez gunê tu kesekî nakime stuê xwe.

Gulperîê go: -Mirazê te çi ye?

Go: -Gulîzer qîza Êlbeg e, go, ew dilketiya min e, go, ez ê herim, go, herke min anî, ez ê bêm te jî bivim, herke min neanî, ez gunê te nakime stuê xwe.

Wê şevê razan heta sivê. Sivê xêr ser we da bê, ser wan da jî hat. Sivê xûşk ji bira ra got:

-Hal-hewalê min û Şaîsmaîl ev e.

Bira dew li Şaîsmaîl kirin, go:

-Çi qisûra xûşka me heye, wekî te şûr daye ortê?

Şaîsmaîl ji bira ra jî got, çawa Gulperîê ra gotibû. Heke "rokê sekinî, heke çara sekinî, xadê zanibe, rokê rabû go:

-Gelî bira, gere hûn îzina min bidin, ez ê herim.

Wexta siyar bû here, bira ra go:

-Rê kîjan e, ez herim?

Ewan bira jê ra got, go:

-Şaîsmaîl, du rê hene, go, go, tu li vê rê herî, tu ê çil şevî da herî nava wî seherî, go herke tu vê rê herî, tu ê heft roja herî nava şeher.

Şaîsmaîl go: - Ewê çil şevî diçin, evê heft roja diçin, mena wan â ye?

Bira jê ra got, go:

-Riya heft roja kî diçe, silamet naçe, lê riya çil şevî silametî ye.

Şaîsmaîl go: -Welle, ez ê riya heft şevî herim.

Kete riya heft roja, berê xwe daê, çû. Sê-çar roja çû, rokê çû lê nihêrî çaîr-çîman, gul û sosin in, serê kulîlkekê nepekyaye: kêleka rê kanîk temîz hebû. Serê kanîiê peya bû, hespê xwe av da, hespê xwe şitav kir, ser çevê xwe şûşt, parî nanê wî hebû, derxist xar, qapûtê xwe kişande ser serê xwe ji xwe ra raza. Himberê wî kelake mezin hebû, koçk serê temîz. Tu navêjî ew cî ciê Erebî Zeng e. Erebî Zeng, xulama, bala xwe danê, lê nihêrî merivek nava çayîr çîmana razaye. Xulama cav da Ereb. Erebî Zeng go:

-Kuro, go, eva serê xwe bihurtîye, go, herin bigirin, werin.

Xulamekî dînî hema ji kelê derket çêr kirin, go:

-Tu xayê çend serîyan î, tu hatîî sînorê me da danîî?

Qalme-qalma wî Şaîsmaîl hişyar bû. Lê nihêrî xulam çomaxê xwe dihejîne, dide xebera tê. Go:

-Kuro, kuro, ez kerr im, deng naê min, hela were cem min, tu çi divêjî?

Xulam hate cem Şaîsmaîl. Şaîsmaîl qalim milê wî girt, go:

-Kuro, go, tu çima didî xebera, go, go, min tase ava te sar xarîye, tu bistîn heqê wêya.

Xulîm hilda jê ra got:

-Çivîk çivîktîya xwe vir ra naçe naê, evaya sînorê Erebî Zeng e, heft serê te hevin, serîk ji destê wîya xilas nave.

Şaîsmaîl diranê xulîm kişand, enîya xulîm da kuta, go:

-Çi ji destê we tê, bikin.

Xulam lê da, çû. Erebî Zeng lê nihêrî tiştekî serê xulîm e, go: «Weleî ewîya pêşkeş daye xulamê min». Gava Erebî Zengî çev xulîm ket, wekî diranê wîya enîya wî da kuta ye, hundurê Ereb qetîya. Ereb got:

-Kuro, go, çira tu usa kirine?

Go: -Axa, go, ew îgîtê min dîtîye, heft serê te hevin, serîk ji destê wî xilas nave.

Navê hespê Erebê Aleparçe bû, go:

-Kuro, go, Aleparçe bikşînin, ez ê herim.

Ereb hespê xwe siyar bû, ber bi Şaîsmaîl çû. Şaîsmaîl jî hespê xwe zîn kir, ber bi Ereb hat. Herda wê derê hevdu xistin, usa hevdu xistin, hetanî êvare. Yekî yek alt nekir. Ereb hilda Şaîsmaîl ra go:

-Qoçax, go, heta naka me hev xistiye nola dijmina, go, emê naka jî herine mala min nola dosta - çawa mêvan, heta sivê. Emê sivê ravin, îjar şerê me şer e.

Hatin peya bûn, hespê wana kişandin, otaxek vala kirin dane Şaîsmaîl. Ereb emir kir ser aspêjê xwe, go:

-Kuro, go, tu pezekî şer jê kî, tu birinc çêki, xûna wê pezê dewsa rûn û birinc kî, bixî sinîke mezin, bidî ber wîya.

Aspêjê wiya usa jî kir. Hilda bir çû danî ber Şaîsmaîl. Wexta danî ber Şaîsmaîl, lê nihêrî, wekî pêncî merivî xilas nake, aqa zef e. Şaîsmaîl bê dilê xwe vegerîya ser nîn - nan xar. Gotina gotîya, wekî loqek lê dixist, her carî çil loq jê kêm dibû. Ew xarin temam xar. Sinî vala bû, girt sinî qurifand - kewkî kir, avîte xulîm, go:

-Wekî tu axê xwe va nikarin meriva têr bikin, çira mêvana tînin mala xwe?

Xulêm sinîya şikestî hilda, revî çû cem Erebî Zengî, go:

-Erebî Zengî!

Go: -Çi ye?

Go: -Erebî Zengî, heft serê te hevin, serîkî wî îgîtî xilas nakî. Go, ew xarin temam xarîye, sinî jî quraftîye avîte min, gotîye ne bira tu bî, ne axê te be, wekî nikarin mêvana têr kin, çira ez anîme mêvanya xwe?

Wê şevê sekinî heta sivê: tirs hundurê zikê Erebî da bû.

Sive xêr ser we da bê, ser wan da jî hat. Sivê rabûn teştîya xwe xarin, herdu ser pişta hespa siyar bûn, orta meydanê hevdu xistin: dîsa hetanî nîvro yekî yek alt nekir. Ereb hilda jê ra got:

-Şaîsmaîl, eva heywanê bin me gune ne, were peya ve, ez tu emê gulaş bigirin, kîjanî me kîjan erdê xist, bira serê wî jê ke.

Şaîsmaîl go - Bira ve.

Herdu hespê xwe berdan, ya alah, ya xadê, gihîştine hevdu. Hevdu birin anîn, gotina gotîya, dewsa ningê wan mîna şêpêd kotanê erd diqelişî. Şaîsmaîl Ereb hilbirî li erdê xist, çok da ser sîngê wî, şûrê xwe kişand. Ereb lava lê kir, go:

-Şaîsmaîl, go, bisekin, serê min jêneke, ez pêsîra xwe vekim, wekî zû ruh bidim.

Gava Erebî Zengî pêsîra xwe vekir, agirê kulê mala bavê Erebî Zeng keve, ser sîngê wê du çiçik, çiçikê wê nolanî sêvê Xirtizê: koka wan sipî, serê wan sor. Gava Şaîsmaîl çev li çiçikê wê ket:

-Hey, go, xadê mala min xirav bike, îro du roj e ez jinekê ra şer dikim.

Serê wê jê nekir. Gava Erebî Zengî rabû ser xwe, gava liqapê ser sûretê xwe hilda - qîzeke usa ne, merî nabke, ne bixwe, lê binhêre. Herdu rabûn hev ketin, hatin hundurê otaxê. Erebî Zengî bire otaxa xwe, deste kincê jinaî xas derxist û xwe kir. Erebî Zengî aqa bedew e hesavê kulîlkeke niqişandî. Kirin, xarin, kêf kirin hev ra. Evarê Erebê cî danîn. Şaîsmaîl go:

-De were em têkevine cî.

Rokê, duda, sisya, çara wê derê man, lê Erebê jê ra go:

-Şaîsmaîl, go, tu ax tu cara nekî, ax mala me naê, hema axê bikî, ez tu emê hev xin.

Rojekê ew, Şaîsmaîl rabûn ser banê kelê erdê temaşe bikin. Gava rabûne ser banê kelê, Şaîsmaîl rê nihêrî, axîn hate da.

-Hey, go, kurê nemerda, pey be, şerê min şer e, ne min ji te ra got, tu gerekê „ax" nekî.

Şaîsmaîl go: -Ereb can, mexey de, go, tu qe ji min napirsî, qê derdekî min heye, tu seva te nehatime.

Go: -Derdê te çî ye?

Go: -Ereb, go, ez seva Gulîzerê hatime, wedê min ma du şev, sê şev, ez gerekê herim, bighîjimê da.

Go: -Xadê mala te ava bike, go, duh na pêr hat vira, çû, go, go, dezmale zêr min ra anîn, go, min riya wan berda, çû. Go, wekî tu zû hatibûyayî, minê Gulîzer ji wana bistanda. Go, talaşê nekşîne, go, wa nêzîkî me ne.

Wê şevê razan. Sive xêr ser we da bê, ser wan da jî hat. Herdu rabûn siyar bün, berê xwe dane şeher. Çûn daxli nava şeher bûn, lê nihêrî girme-girma def zurnan e. Erebê go:

-Şaîsmaîl!

Go: -Çî ye?

Go: -Ez ku peya divim, tu wê derê peya bî.

Erebî Zengî ajot çû ber derê pîrekê sekinî.

Şaîsmaîl go: -Pîrê, ciê te heye îşev tu me sitar bikî?

Pîrê go: -Ez qurba te, go, cîê min tune, koxikê min teng e.

Go: -Pîrê, go, ha ji te ra kulma zêra, ava me jî heye, nanê me jî heye, cî bide me.

Pîrê rabû qaf û qacaxê xwe avîtine derva, hespê wan kişandine hundur. Lê hundurê pîrê ji Erebê qetiyaye, dirtise jê. Şaîsmaîl çû hundur, lê Ereb sekinîye xwe ra. Şaîsmaîl hilda ji pîrê ra got, go:

-Daê, tu sura ra çawan î?

Go: -Ez zef baş im!

Go: -Ew çi şaî ye nava gund da, çi dewat e?

Pîrê go: -Ez qurbana te, go, qîza Êlbeg e dane Qerewezîr. Go, mala bavê wê ji vira koç kir, çû. Gulîzer dane kurê padşa, divê, navê wî Şaîsmaîl e. Carke din ji wê derê anîne dane Qerewezâr.

Şaîsmaîl go: -Daê!

Got: -Çî ye?

Got: -Wele, Şaîsmail ez bi xwe me!

Got: -Çi divejî?

Got: -Erê!

Got: -Gulîzerê jî tasa je'rê danîye ber xwe, kêra çirtme girtiye destê xwe, divê: «Kî bê, ez ê xwe bikujim». Eva çend meriv diçin, Gulîzer soz nade.

Şaîsmaîl got: -Daê!

Go: -Çî ye?

Go: -A ji te ra vê gistîlka min, têxe tilîya xwe, bive here: tu çawa gistîlka xwe nîşandî, go, ew ê zanibe ez hatime.

Pîrê gistîlk kire tilya xwe, kincikek lê pêça, çû cem Qerewezîr. Wekî yekî jê dipirsî, digot:

-Pîrê, tilya te çi bûye?

Digo: -Lawo, tilya min birîn e.

Pîrê çû cem Qerewezîr, go:

-Qerewezîr, tu hinê didî cahila, yê cahil diçin nav Gulîzerê didin, tu bide min, ez bivim herim, ez çawa serwext bikim.

Qerewezîr hilda pirê ra got, go:

-Pîrê, wekî tu herî Gulîzerê serwext bikî, ezê beramberî te zêra bidim te.

Oerewezîr hine da anînê, girt da destê pîrê û emir nivîsî daê, wekî "Kesek degmîşî pîrê neve".

Pîrê tasa hinê girte xwe çû ber palata Gulîzerê. Carîê Gulîzerê gotin:

-Pîrê, tu ê ku da herî?

Pîrê kaxez nîşan da, go:

-Eva emirê Qerewezîr e, ez ê herim cem Gulîzerê.

Pîrê çû derket qatê sisya, ber derê otaxa Gulîzerê, derî vekir, girt. Gulîzerê go:

-Kî ye, neê hundur, ez ê xwe bikujim.

Pîrê kincikê ser gistîlkê vekir, carekê duda derî vekir girt dîsa. Gulîzer rabû hate ber dêrî. Wexta Gulîzerê derî vekir, pîrê tilya xwe gistîlkê va nîşan daê. Gulîzerê qalim bîleka pîrê girt, kaş kir hundurê otaxa xwe, go:

-Daê, ez qurbana te vim, eva gistîlka te ji ku anîye?

Go: -Lawo, kurê min çûye xevatê, xevitîye, qazanc kirîye, anîye hatîye.

Go: -Na, daê, kurê te nikare bixevite, gistîlka usa qazanc bike. Rast min ra bêje, hela te ji ku anîye?

Pîrê got, go: -Lawo, xaê gistîlkê mala min da ne, navê wî Şaîsmaîl e.

Gulîzerê go: -De rave, em herin mala te.

Pirê jê ra got: -Na, lawo, Qerewezirê serê me jê ke, evaya hina Qerewezîr e, min anîye, wekî qebûl bikî. Kaxezekê binivîse, bê: "Qerewezîr, te serê min hiz kirîye, min ningê te hiz kir. Kî dihat nav min dida, ji min ra rast ne digot, lê evê pîrê ez serwext kirime, emir bike, bira îşev lamboçkê şeher neşxulin, kesek nava şeher negere - ez ê herime Xasbaxçê xwe, bikevime himamê bêm, sivê dewata xwe bike".

Pîrê ew kaxez hilda çû cem Qerewezîr. Gava Qerewezîr kaxez xwend ber rabû şipya, du cara paç kir, danî ser serê xwe. Qerewezîr emir kir, go:

-Kuro, pîrê têxine mêzînê, beramberî pîrê zêr bikşînin bidine pîrê. Usa jî emir kir, wekî êlêktrîskê şeher neşxulin, kesek nav şeher negere, "Kî bigere, ez ê lêxim",-ewî go.

Pîrê zêrê xwe danî pişta xulamekî, bire mala xwe. Erebî Zengî lê nihêrî pîrê wê tê, xulamekî mêşokek pişt kirîye, pê ra tê. Erebî Zengî gihîşte xulîm, mêşok girt. Pîrê derxist perê xulîm daê, xulam çû. Erebê mêşokê zêr anî malê. Wexta pîrê hate mal, Şaîsmaîl jê ra got:

-Daê, Gulîzerê qe çi got?

Pîrê bi kilam jê ra got, go:

-Lawo, Gulîzer zef xirav min dit, zef bed bû.

Şaîmaîl dorê geriya, go:

-Daê can, tu ê pirsa rast min ra bêjî.

Pîrê go: -Ez Gulîzerê bedewtir im.

Şaîsmaîl bi kilam jê ra got, go:

-Daê, tu pîra keftor î, tu ê çira nola Gulîzerê bî.

Erebê ber dêrî lê kire gazî, go:

-Pîrê, tu ê rast bêjî, yanê na, ez ê bêm şûrekî serê te xim serê te bifirînim.

Pîrê lê nihêrî boş e, hilda Şaîsmaîl ra got, go:

-Lawo, min Gulîzer zef baş dît. Gulîzerê kaxez nivîsî da min, min da Qerewezîr, wekî êvarê ronkaya şeher neşxulin, kesek nava şeher negere. Gulîzerê digot, ez ê herim Xasbaxçe. Lawo, herge hûn qoçax in, êvarê herin, bivin.

Êvar ser wan da hat. Ereb û Şaîsmaîl siyar bûn, çûne nav Xasbaxçe. Ereb ber dêrî sekinî. Şaîsmaîl çû hundur.

Erebê lê nihêrî Şaîsmaîl û Gulîzer zef xever dan. Ereb ser Şaîsmaîl hêrs bû, dest avîte bîleka Gulîzerê, hilkişand avîte terkuya xwe û ajot nav şeher derket.

Gelekî çûn, herge hindik çûn, ser sînorê padşa Ereb sekinî. Çadireke wana çûk hebû. Çadir lê xistin. Erebê go:

-Şaîsmaîl, tu Gulîzerê va bikevine çadirê, ez ê qerewilîê bikim.

Wexta Gulîzer revandin, carîya cav da mala bave Gulîzerê, wekîk: «Şaîsmaîl Gulîzer revand». Heft birê Gulîzerê hebûn, her heft jî siyar bûn, Qerewezîr da pêşya esker, pey Şaîsmaîl ket.

Sive xêr ser we da bê, usa jî ser wan da hat. Gava Erebê lê nihêri hesavê steyr û peyra heye, hesavê esker tune, Ereb rabû hespê xwe siyar bû, ajote pêşîê, Qerewezîr pêşiê bû, go:

-Ereb, xortekî zerî terkê bû, kuda çû, te nedîtîye?

Erebê go: -Ha wa ne, hundurê çadirê da.

Qerewezîr Erebê derbaz bû. Erebê şûrê xwe avît serê wî firand. Hespê wî bir çû ber hespê Şaîsmaîl girê da û careke mayîn zivirî pêşya esker. Gotina gotiya, Erebê esker usa qir kir, wekî yê sax ew bû, malê nehatibû. Esker kurê xelqe bû: herçê qir bû, herçê maîn jî her yekî alîkî revî çû. Ereb zivirî hat ber derê çadirê. Gulîê xwe kirine saz, wêdere kilam Şaîsmaîl ra got, go: „Min du rûvî kirine qulekê, ber derî sekinîme". Şaîsmaîl serê xwe hilbirî Erebê ra got, go:

-Xadê dîwana te neke, xwe em ne rûvî ne, te kirîye qulê tu ber dêrî sekinîî.

Erebê go, go:

-Wexta te digo, ez jinekê ra du roja şer dikim, hila rave binhêr min qe çawa kirîye.

Gava Şaîsmaîl derkete ber derê çadirê, lê niherî xûnê avîtîye zengoya hespa, cendek usa ketine, wekî cendek ser cendekê sekinîye. Erebê hilda go:

-Min koka eskerê Qerewezîr jê kiriye, eva han ji hespê wî ye min aniye.

Şaîsmaîl, Ereb hespê xwe siyar bun, hespê Qerewezîr Gulîzer siyar bû, rex hev ketin, "ya alah, ya xadê", berê xwe dane ber mala Erebê, Erebê rê va Şaîsmaîl ra got:

-Malava, derdê te Gulîzer bû, me Gulîzer ji te ra anî. Ca meydanekê bide hespê xwe, here, em binhêrin çawa dajoî.

Wexta Şaîsmaîl meydane çû, Ereb rex Gulîzere ket, dest stuê Gulîzere bir, Gulîzer paç kir. Bû qurînya Gulîzerê. Gulîzerê xwe avît erdê, go:

-Eva kî ye, mira were rast bêje.

Şaîsmaîl hat, gote Gulîzerê:

-Çira usa dikî?

Go: -Tu min ra rast divejî, bêje, yanê ez ê xwe bikujim. Ev çî te ye?

Şaîsmaîl ber Erebê geriya, go:

-Ereb can, Ereb, liqavê xwe sere xwe hilde, bira dilê Gulîzerê rihet be.

Erebê liqava xwe ser sûretê xwe hilda, qizeke usa ne, wekî ji Gulîzerê bedewtir e. Gulîzerê hilda Şaîsmaîl ra got, go:

-Şaîsmaîl, tu niha ku da diçî here, ez zanim, wekîk ew jî hevaleke nola min e.

Hersêk çûn mala Erebê peya bûn, çend roja wê derê man. Rojekê Şaîsmaîl gote Erebê, go:

-Em gerekê herine mala xwe.

Erebê go: -Mala te kê derê ye?

Go: -Ez kurê padşa me, Diya min heye, bavê min heye, nihaka çevnihêriya min in.

Erebê rabu malê xweyî sivik, qimetê wî biha hilda xwe ra, malê dinê teslimî xulama kir, go:

-Lawo, eva hebûna çiqa heye, we ra. Dixazin vir bin, dixazin herine malê xwe.

"Ya elah, ya xadê",- gazî xadê kirin, ketine rê çûn şehere Şaîsmaîl.

Rojekê, rojêd xadê derketine ber koçk sera Gulperîê. Birêd Gulperîê derketin, hespêd wana kişandin hundur, ketin milê Şaîsmaîl birine qatê duda, otaxa xwe. Lê birê Gulperîê nizanin, wekî Ereb jin e, zanin, wekî xulamê wî ye. Heke rojekê man, heke deha, xadê zane.

Rojekê Şaîsmaîl hilda birê Gulperîê ra got, go:

-Gelî bira, karê me bikin, emê sivê herin.

Sive xêr ser we da bê, usa jî ser wan da bê. Birê Gulperîê cihêzê xûşka xwe dagirtin, çawa qeydê wan bû. Her çar siyar bûn, ketine rê. Rojekê derketin sînorê padşê bavê Şaîsmaîl. Şaîsmaîl rê nihêrî, şivan, gavan wê mal diçêrînin. Gazî yekî kir, go:

-Tu gavanê padşê î?

Go: -Erê!

Han te ra, go, vê kulma zêra, here padşê ra bêje, wekî «Şaîsmaîl hatîye, Gulîzer anîye».

Erebê çadira xwe lê xist. Ketine bin çadirê, go:

-Şaîsmaîl, go, were em fêlê xwe hev ra bêjin, çika fêlê me çi ne?

Şaîsmaîl go: -Him bedew î, Him qoçax î.

-Şaîsmaîl,- Erebê go,- bive şer, dew-ez, go, bedewîê, temizîê îspihîê -Gulîzer.

Go: -Lê Gulperî, tu?

Go: -Ez remildar im, wekî remla xwe datînim, ez yekê erdê û ezmîn zanim.

Erebê go: -Zef baş e.

Wextêk şivîn kaxez da destê padşa, padşa kulme zêr day da, rabû eskerê giran hilda, çû pêşya kurê xwe. Wexta gihîşte kurê xwe, kurê wî çû destê wîya, ew jî çû serê wî. Hatine kêleka şeher. Şaîsmaîl hilda bavê xwe ra got, go:

Bavo, ez ê çadira xwe lêxim kêleka şeher, gerekê tu min ra avaîkî vira çêkî, ez nikarim bêm nava şeher, xulamê minî hêrs e. Nava şeher wê jê xever din, xulamê minê wana bikuje.

Padşa gava li Erebê nihêrî, hundurê wî qetîya, xwe-xwe dilê xwe da got, go: ‚Rast jî nava şeher da eva nave", Padşa emir kir, kêleka şeher kurê xwe ra koçk serake laîqlî cêkir Wexta kurê wî kişya avaê xwe, Şaîsmaîl ji Gulîzerê ra got:

-Gulîzer, tivdarek bike, nan lêxe, ez ê gazî bavê xwe û cimaeta wîya kim.

Gulîzerê usa jî kir. Rojekê nan çê kir, Şaîsmaîl çû dîwana bavê xwe, got bavê xwe ra:

-Bavo, tu cimaeta xwe va kerem kin, em herine mala min, hûn îro mêvanê min in.

Padşa cimaeta xwe va çûne mala kurê xwe. Gulîzerê çawa qeyde bû usa texte rast kir, nan xarin, ezet û qulix jê ra kirin. Gava padşa çev bi Gulîzerê ket, ruhê padşa derket. Wexta rabûnê padşa hilda kurê xwe ra got:

-Lawo, dem û dezgê te qedîm be.

Padşa hat gihîşte ser textê xwe, gazî wezîrê xwe kir, go:

-Wezîr, ez ê bimirim.

Wezîr ji padşa ra got:

-Padşaî sax be, qe jî na. Mirina te bira min keve. Layqe Gulîzer ji te ra, Gulperî ji  min ra, Ereb jî bira ber destê te here-bê dîwana te da, wî çaxî mirina te wê tunebe.

Padşa go: -Lê em çawa bikin?

Go: -Ber derê xwe da, hundurê sivderê da çeleke kûr bikole. Hundurê çelê da xişte û dûzana tê da dayne, xalîçekê li rûyê çelê werke. Gazî Şaîsmaîl ke, bira bê. Wexta Şaîsmaîl bê, wê bikeve hundurê çelê bê kuştinê. Emê wî çaxî îjar herin Gulîzerê, Gulperîê bînin.

Padşa emir kir, usa jî çê kir. Qewazekî xwe şande pey Şaîsmaîl.

Qewaz go: -Şaîsmaîl, bavê te gazî te dike, were.

Şaîsmaîl çû cem Erebê, go, wekî bavê min gazî min kirîye. Erebê go Gulperîê, go:

-Ca remila xwe dayne, çika çi heye?

Gulperîê li remlê nihêri, ji kêrê pişîkek çêkir.

Gulperîê Şaîsmaîl ra got, go:

-Eva pişîka wê pêşya te here, pişîkê ninge xwe danî ku, tu dewsa ningê pişîkê herî.

Wexta Şaîsmaîl kete hundurê sivdera bavê xwe, pişîk lêva çelêra derbaz bû, çû. Padşa lê nihêrî Şaîsmaîl silamet hate hundur.

Padşa go: -Lawo, go, aha rojê were cem min, bira bîna min bi te derê.

Çend seheta rûnişt, xever dan, rabû lê da here mala xwe. Dîsa pişîk ku ra çû, dîsa da pey pişîkê, çû. Wexta Şaîsmaîl çû mala xwe, padşa bû agir bi wezir ket, go:

-Wezîr, îlacekê bike, wekî Gulîzerê min ra bînî.

Wezîr hilda ji padşê ra got:

-Padşaî sax be, sivê emir bike aspêjê te bira nan hazir kin, para Şaîsmaîl je'rê têxê da, ferê dinê ji bidin ber merîê dinê. Wexta Şaîsmaîl bixwe, wê pê bimire.

Padşa gazî aspêj kir, jê ra got. Usa ji kirin.

Sive xêr ser we da bê, usa jî ser wan da bê. Sive safî bû. Qewazek şand, gazî Şaîsmaîl kir. Wexta qewaz çû, Şaîsmaîl çû cem Gulperîê. Gulperîê remilê nihêrî, gote Şaîsmaîl, go:

-Han te ra vê gistîlka min. Nanê bê ber te: wexta tu nan dixwî, hey zimanê xwe qaşa gistîlkê xe.

Şaîsmaîl gistîlk kire tilya xwe û çû. Çaxa çû derket dîwana padşa, padşa cî nîşanî Şaîsmaîl kir, go:

-Were rûnî.

Gelekî rûniştin xwe ra xever dan. Padşa go:

-Kuro, nan me ra bînin, em nan bixun.

Nan danîn, fera Şaîsmaîl nanê je'rkirî dagirt, ferê yê maîn nanê temiz dagirt. Nan dane ber wana. Padşa got:

-De kerem kin, nanê xwe bixun.

Şaîsmaîl qoçek nên xist, kire devê xwe xar, zimanê xwe gistîlkê xist. Usa nanê xwe xarin. Padşa lê nihêrî tiştek Şaîsmaîl nehat, nan hilat, Şaîsmaîl lê da çû mala xwe. Padşa gazî aspêj kir, go:

-Aspêj, kuro, ne min te ra gotibû, te nanekî çawa hazir kir. Aspêj gazî pişîkê kir, ew xarin avîte ber pişîkê. Gava pişîkê heve xar, pê hişk bû. Aspêj go:

-Padşaî sax be, lê dinhêrî, ez çawa kim.

Padşa gazî wezîrê xwe kir, go:

-Wezîr, îlacekê bike.

Wezîr go: -Padşa sax be, sivê gazî Şaîsmaîl ke, bê: ,,Lawo, ez nexweş im, ez ê bimirim, çika te çû eva jina anî hat - qewata te çiqas bû, wekî te anî hat, qewata xwe ji min ra bêje ". Wexta ewî te ra qewata xwe got, wî çaxî gazî celat ke, bira serê wî jê ke.

Sive xêr ser we da bê, ser padşê neê. Sive safi bû, padşa qewazek şand, go:

-Kuro, here bêje Şaîsmaîl bavê te nexweş e, bira bê.

Qewaz çû gote Şaismaîl: ,Bavê te nexwes e, digo bira bê". Şaîsmaîl çû cem Gulperîê, ewê remil danî, nihêrî, go:

-Şaîsmaîl, remila min îro xûn dikevê, ez tê dernaxim, miqat-miqatî xwe be.

Şaîsmaîl çû dîwana bavê xwe, go:

-Bavo, tu qe çawa nî?

Bavê jê ra got: -Ez nexweş im, halê min tune, dive bimirim. Kulek dilê min da ne, min ra bêje, bira ew kul dilê min derê.

Şaîsmaîl go : -Çi ye, bavo?

Padşa go: -Lawo, tu çûyî cîê dûr, te ew jin anîn, ca qewata xwe min ra bêje, ca qewata te çiqas e?

Şaîsmaîl go: -Bavo, min bide ber stûnê, zincîra peneda kotanê bîne were min pê girê de, ez wî çaxî alt divim.

Padşa emir kir, peneda kotanê anîn, Şaîsmaîl dane ber stûnê, pê peneda kotanê Şaîsmaîl bi stûnê girê dan. Wextêk girê dan padşa emir kir, go:

-Celat!

Celata dane şûrê xwe, hatin, Şaîsmaîl zor daê da, bû vire-vira peneda kotanê qetîya. Wexta qetîya bavê wî hilda got, go:

-Lawo, tu qewata xwe min ra rast navêji, tu kurê min î, ez serê te lênaxim, min tu cêribandî. Ez bavè te me, min ra qewata xwe rast bêje.

Şaîsmaîl go: -Bavo, bişîne jîkê kevana bîne were, herdu pêçîê min mezin bide ser hevdu, girê de, ez ê alt bivim.

Padşa emir kir, jîkê kevara anîn, dest-tilîê Şaîsmaîl danîn ser hevdu (herdu tilîê mezin), qalim girê dan, gava go: «Celat», celat hatin. Şaîsmaîl zor daê da, jîkê kevana tilîê wîya goşt birîn, gihîşte hestu, Şaîsmaîl alt bû. Careke din padşa emir kir, go:

-Serê wî jê kin.

Cimaet rabû qaîl nebû, got:

-Serê wî lênexin.

Şaîsmaîl teweqe ji bavê xwe kir, go:

-Bavo, îzina min bide du gilîê min hene, bi kilamkî te ra bêjim.

Şaîsmaîl got, go:

-Bavo, dola te gihîştîye, ber girtîye, were kokê va jê neke, ez kurê te me, serê min lênexe, ezî cahil im.

Bavê emir kir, go:

-Herdu çevê wî derxin!

Şaîsmaîl disa lavaî bavê xwe kir, go:

-Bavo, şureta merîya ji herdu çev in, go, were herdu çevê min dernexe, ez ê Gulîzerê, Gulperîê bidime te.

Padşê emir kir, herdu çevê Şaîsmaîl derxistin. Çevê rastê kirine cêva çepê, çevê çepê kirine cêva rastê, dane destê du qewaza, go:

-Kuro, bivin herin ji şeher derxin.

Herdu qewaza Şaîsmaîl birin şeher dûr baxçek hebû, hundurê wî baxçeî da kanî bû. Şaîsmaîl birin ser kanîê, ber darekî danîn, lê dan hatin.

Em bêne ser padşa. Padşa merîê xwe şandin, go:

-Herin bêjin Erebê, bira Gulîzerê, Gulperîê bîne bê. Gulîzer min ra, Gulperî jî wezîr ra. Ereb jî diwana min da qulix bike.

Yekî ahayî qeledûmanî çû cem Erebê, go:

-Ereb.

Erebê go: -Çî ye, kuro?

Go: -Padşa divêje, bira Gulîzerê, Gulperîê bine bê: Gulîzer ji min ra, Gulperî ji wezîr ra, bira Ereb jî bê dîwana me da qulix bike.

Erebê go: -Kuro, go, lê Şaîsmaîl kanê?

Ewî xortî go: -Herdu çevê Şaîsmaîl derxistin, birin şeher dûr avîtin.

Erebê çekê xwe girê dan, derê malê sekinî. Gulîzerê Gulperîê xwe reş girê dan. Gede nehiştin herin.

Padşa emir kir, rojê du hev herin şer ser Erebê. Rojê du merî diçûn şêr Erebê ra. Erebê wana dikuşt.

Em îjar xever din ji Şaîsmaîl.

Şaîsmaîl ber darekî rûniştibû, gelekî belengaz, melûl, hêsîr rûniştibû. Sê kevotk hatin ser serê darê danîn. Duda yekê ra gotin:

-Daê, ew kî ye ha belengaz bûye?

Diya wana hilda got:

-Lawo, xadê mala padşê xirav ke, eva kurê wî ye - Şaîsmaîl e. Seva jina wî Gulîzerê çevê wî derxistine, wekî Gulîzerê bistîne.

Go: -Dae, lê em çawa bikin, wekî çevê wî sax bin, heyfa wî xortî.

Diya wan go: -Lawo, go, emê duakê bikin ji xadê. Go, çevê wî çepê cêva rastê da ne, çevê wî rastê cêva çepê da ne. Herge razaye bira be xewna wîya, hergê hişyar e, bira guh bide ser, ez ê perekî xwe bavejim, bira çevê xwe têxe dewsê, ewî perê min avê hilde çevê xwe xe. Îşala çevê wî wê sax bivin.

Bû pirînîya kevotka, kevotk çûn.

Şaîsmaîl hişyar bû, bi guhe xwe bihîst, çevê rastê kire dewsa çevê çepe, çevê çepê kire dewsa yê rastê, destê xwe peland ew per dît, avê da kir, çevê xwe xist. Çevê cimaete işq da, çevê wî jî işq da. Şaîsmaîl rabû li ser xwe, ji nava bax derket, lê niherî himberî wî cotkarîk cot dike. Lê da cu cem cotkarî. Cotkar merîkî kal bû.

Go:-Qewat be, bavo!

Go: -Ser çevê min ra hatîî, lawo!

Go: -Bavê kal, go, kurê te cahil tunebûn? Tu nikarî cot bikî.

Go: -E, lawo, xadê mala padşa xirav bike, padşa çevê kure xwe derxistiye, şand jina wiya xwe ra bîne. Erebek heye, ew Ereb ji padşe ra şer dike, rojê du merîya dişîne şerê Erebê. Erebê koka eskerê padşa anîye. Sê kure min hebûn, her sê çûn şerê Erebê. Ez tenê mame, ez jî hatime cotê xwe.

Go: -Bavê kal, go, kesekî min tunene, tu min naxî kurê xwe, ez dewsa te cot bikim.

Kalê go: -Birave, lawo, ez hiz dikim.

Şaîsmaîl cut ji destê kalê girt, xetek vir xist, xetek wir xist, heta êvarê zevî reş kir. Evarê kalê û Şaîsmaîl hatine malê. Kalê çû cem pîrejina xwe, go:

-Jinê, go, min xortekî cahil aniye, bûye kure min. Pak e, îro sivê padşa ku min bişîne şêr, ez ê dewsa xwe bişînim.

Çend roj derbaz bûn. Evarekê qewazê padşê hate ber derê kale, gotê:

-Kalê, karê xwe bike, sivê diçî şerê Erebê.

Gava Şaîsmaîl bihîst, go:

-Bavo, hêva, ez ê dewsa te herime şer.

Sive xêr ser we da bê, ser wan da jî hat. Şaîsmaîl go:

-Bavo, çi te heye, ez siyar bim, herime şer.

Go: -Hespekî min heye, lawo.

Şaîsmaîl zînê xwe ji çawa çêkir, tarika mirîşka hebû, hilda destê xwe çû şerê Erebê.

Wextêk Ereb derket şêr, Gulperî li remilê nihêri, jê ra got:

-Îro kîk tê şerê te, tu nekujî.

Ereb û Şaîsmaîl ketine meydanê. Gelekî şer kirin. Şaîsmaîl du tarê mirîşka Erebê xist. Padşa ser banê koçka xwe temaşe dikir. Padşa kire gazî, go:

-Wezîr, wekî şûr destê şaş-oxlî da hebûya, wê Ereb bikuşta.

Wexta şer bela bû, şaş-oxlan hat here mala xwe. Ber padşa ra derbaz bû. Padşa go:

-Can, şaş-oxlan, can!

Şaş-oxlan gote padşê:

-Padşaî sax be, hespê Şaîsmaîl, şûrê Şaîsmaîl bide min, ne raê min, raê xadê, ez ê yaxa te bidime destê Erebê.

Go: -Hela lê binhêr şaş-oxlan çi divê. We sivê eseî Erebê bikuje.

Go: -Padşa, çadirekê bide min, ez bivim herim pêşberî koçka Erebê lêxim. İşev ese Erebê bireve, ez ê qerewilîê bikim.

Şaş-oxlan şûrê Şaîsmaîl avîte stukura xwe, hespê Şaîsmaîl siyar bû, çadira xwe hilda, binya mala Erebê da kanîk hebû, nêzikî wê kanîê çadira xwe vegirt.

Ereb ber derê xwe qerewil bû. Gulîzerê cêrê xwe hilda çû avê. Şaîsmaîl lê nihêrî Gulîzer çû avê. Hespê xwe siyar bû, ew ji çû ser kanîê, Gulîzerê ra go:

-Avekê bide min ez bixum.

Gulîzerê go: -Peya ve bixwe bi destê xwe.

Şaîsmaîl hilda go: -Ez nexweş im, nikarim.

Gulîzerê go: -Nexweş nava cî û belgî da nin, tî ne nexeşî, peya ve ava xwe bixwe.

Şaîsmaîl lê nihêrî, wekî Gulîzer nas nake, go:

-Gulîzer, tu min nas nakî?

Gulîzerê lê nihêrî çevê wiya şaş bûn, nas nekir, go:

-Na.

Şaîsmaîl go: -Malxirav, ez Şaîsmaîl im, here Erebê ra bêje, êvarê tarî kete erdê ez ê bême malê, emê sozê xwe bikine yek.

Gulîzer zîvirî çû malê. Erebê jê ra got:

-Forqê, ew kî bû, te pê ra xever dida, kurê xelqê ra xever dida.

Gulîzerê got:

-Ereb, ez qurbana te me, ne ew Şaîsmaîl bû. Şaîsmaîl ji min ra got: «Bêje Erebê, tarî bikeve erdê, ez ê bême malê, emê xever din".

Tarî kete erdê, Şaîsmaîl rabû çû mala xwe. Ew, Ereb, Gulîzer, Gulperî hatine dest rûyê hevdu. Çawak serê wî qewimî bû, usa jî ji wan ra got, go:

-Loma jî çevê min nihaka şaş in.

Şaîsmaîl Erebê ra got, go:

-Ereb, go, çawa hebe dîsa bavê min e, ewî kirîye, ez nekim. Ez ê şer da pişta şûrekî te xim, tu jor da hespê da were xar, bikeve. Padşaê bêje: «Serê wî jê ke». Ez ê dest û piê te têlekî xav girê dim. Ez ê gazî kim: «Padşaî sax be, were bi destê xwe serê wî jê ke». Wexta padşa hat, tu çawa dikî, tu zanî.

Sekinî heta sivê. Sive xêr ser we da bê, ser wan da jî hat. Şaîsmaîl hespê xwe siyar bû çû şerê Erebê. Padşa lê kire gazî:

-Ha ba-bam şaş-oxlî, ha.

Şaîsmaîl got: -Padşaî sax be, îşala ez ê destê Erebê yaxa te bidime.

Şaîsmaîl çû meydanê. Ewî Erebê va gelekî ber hev dan. Şaîsmaîl pişta şûr lê xist, Ereb jor da hate xarê. Şaîsmaîl ser hespê peya bû, dest û pê Erebê bi têlekî xav girê da. Padşa kire gazî, go:

-Ha ba-bam şaş-oxlan, serê wî jê ke.

Şaîsmaîl kire gazî, go:

Padşaî sax be, min dest pê wî girê dane, were destê xwe serê wî jê ke, wekî dilê te rihet be.

Padşa wezîrê xwe va zû-zûka hatin, wekî serê wî jê kin Ereb tik rabû ser xwe, şur kişand serê padşê jî jê kir, serê wezîr jî, herdu ber bi cenimê şa kirin.

Şaîsmaîl Erebê va hatin Gulîzer, Gulperî jî hildan, anîn koçk sera padşa.

Şaîsmaîl rûnişt ser text, dewsa bavê xwe. Emir kir, çêlekek stewr anîn, birinc anîn, şeraf anîn, kanyak anîn. Heft şeva xarin-vexarin, dewata xwe, Gulîzerê, Gulperîê. Erebê kir.

Ew çûn gihîştin mirazê xwe, cimaet, hûn jî herin bigihîjin mirazê kurê xwe.

### 4.2.6. Silêman Pêxember

Sixrî Cin maşoqê dîya Silêman Pêxember bû. Topek fêza gundê wî bû. Hergav forma teyra dihat, semta wê topê, jê vedicêniqî rîya xwe dadigerand. Rojekê Silêman ji dîya xwer ra got:

-Dayê, ca Sixrî Cin pirske, çika çima tê ser wê tpoê,rîya xwe dadigerîne?

Sixrî cin rokê dîsa hat cem dîya wî. Dê jê pirsî, go:

-Sixrî Cin, go, tu çima ji wê topê rîya xwe dadigerînî?

Go: - Wê topêda heye mala mora miqerim, wekî ew mor destê kêdabe-çi ku bixwaze dinyalikê da wê biqedîne.

Dê Silêman ra got, çawa ku Sixrî Cin gotibû, -kurê xwe ra got. Silêman rabû, pale girtin, berdane çîyê, erd kolan, boşe anîn, boşe bêjing kir, go:

-Kîjanî pirtî hesin bivîne têda –bîne bide mi, ez ê zêrekî bidimê.

Pala kola, boşa bêjing kir. Rojekê mor kete bêjingê boşekî. Boşe lênihêrî zef gistîleke başe-mor hesavî gistîla bû, go: “Ez herim evî bidim Silêman pêxember, go, gele pere wê bidê”. Bir çû cem Silêman, go:

-Silêman min tiştekî baş te ra dîtîye.

Silêman lênihêrî, ji destê boşê girt, lênihêrî ku more. Mor kir tilya xwe, cab da pala, go:

-De bela bin, herkes herin malê xwe, go, ez gihîştim mirazê xwe.

Wê wextê Silêman boşe hingêda aza kirine -bê heq, bê xerc.

Silêman miqarim kire tilya xwe. Wekî mor badida çar melek ber disekînin, digo:

-Silêman, em dinê xirab bikin, yan ava bikin?

Digo: Bira ava be, em jî nav da bin. Wekî Silêman çi bogota, ewana diqedand. Mora miqerim destm wî da bû -padişatî dinê tevî kir.

Cihûdek kêlekê wê de bû. Cihûd pîrek dî, pîra wî bû, go:

-Wekî tu wê morê ji silêman bidizî bidî min, ez ê beramberî zêra bidim te.

Rojekê Silêman çû serê xwe şûşt, mor ji tilya xwe derxist, danî ser îstolê, pîrê mor hilda, zû-zû xwe gîhande cihûd. Cihûd mor kir tilya xwe, mor tilya xwe da zivirand, çar melekê miqerim li ber sekînin, go:

-Em dinê xirav bikin, yan ava?

Go: -Dinê xirav nekin, mala Silêman bihêlin, Belqîza jian wî û bi min va hildan bivin ada bera, Silêman jî cîda bihêlin.

Evan mala Silêman bi Belqîzayê va hildan birin çûn, adek berêda danîn. Wê wextê pişîkek Silêman, bocîyê wî va birin çûn. Silêman wetekê rabû ser xwe, çi rave? Tenê, wehîd, belengaz maye. Silêman rabû terkeselatî dinê bû, go: “Ez pêxember, min padîşatî dinê dikir, niha xelq min bivîne ez vî halîdanim, saxî ji min ra naxwaze”.

Rabû serê xwe hilda û terkeselatî dinê bû. Çû derkete şeherekî, çû mala merivekî. Eva meriva jî torçî bû. Evî diçû royê mesî digirtin berê, danî ji xwe difrot.

Ewî Silêman ra got:

-Silêman, go, ez masiya bigirim bînim, tu jî bifroşe. Qîzeke wî jî hebû, go: -ez ê qîza xwe jî bidim te.

Ê Silêman Belqîzêr unda kiribû, wê qîzê çi bike, îda rojê xwe derbaz dikir. Ew bira wî halîda îda ji xwe ra arişvêrşa xwe bike, em bêne ser Cihûd.

Pişîka Silêman û tûlê wîya rojekê bi hev şêwirîn. Tûlê go:

-Pişîk, mala te xirav be, go, Silêman pêxember parîyê devê xwe dida min, pişîk, tu jî ser pêşa wî radizayî, go, niha evî cihûdî em anîne…

Pişîkê go: -Em çawa bikin?

Tûlê go: -Tu nikarî morê ji tilya wî derxî, bighînî min?

Pişîkê go: -Eva min anî, gihande te, lê îja ada berêda em ê çawa bikin?

Tûlê go: -Bighîne min ez sovekarim, ez ê te derxim.

Pişîk li ber cihûd telya. Cihûd rokê razabû, pişîk çû ber telya, pêçîya wî alast, mor ji tiliyê derxist û xwe gîhand tûlê. Tûlê pişîk da ser pişta xwe û li berê ket. Pir hat, hindik hat, hat kêleka berê. Tûlê go:

-Pişîk, ka morê bide min. Go: -Çira?

Go: -Ez morê bînim, bêm te xilaz kim, tu morê bidî Silêman?

Pişîkê go: -Tûlê, tî geveeyî, tê morê têxî devê xwe, tê çev terewila kevî û biewtî, morê ji devê te bikeve. Go, min derxe kêleka berê ez ê bidim te.

Tûlê go: -Na, bide min, tu nedî, ez ê te bavêm berê. Pişîk ma neçar, girt da tûlê. Hatin nêzîkî berê, wekî xilaz bin, derkevin, tûlê çev bi mesîya ket, go: "Hewt-hewt" mor ji dêv ket.

Pişîkê got: -Xadê mala te xirav kiro, min ji te ra negot, tî gevezeyî, tî biewtî, morê ji devê te bikeve? Go, min him mora cihûdê feqîe anî, him jî negîhand Silêman.

Tûlê û pişîk por poşman bûm ji berê derketin, her yek alîkî çû. Em îja bên ser torçî. Torçî rojekê tora xwe avît berê, mesîk derket. Anî hatb malê, qîza xwe ra got: mesîkê girî navda bû, go:

-Evî ji me ra bikelîne, go, yê mayîn bira Silêman bifroşe.

Qîzê zikê mesî qelaşt, lênihêrî mesîk ji zikê wî derket, wê formê heft mesî, yek ji zikê wî qelaşt, mor ji zikê wî derket, keçikê mor girte xwe, go: "Ezê êvarê vê bidime Silêman, ev tiştekî başe". Êvarê Silêaman hat, şîva xwe xarin, û ketin cî, ji xwe ra razan Silêman pişta xwe keçikê da dike her wexta. Keçikê go:

-Silêman berê xwe midake, min tiştekî baş dîye, ez ê bidim te.

Silêman go: -Çika çî ye?

Go: -Gitîlkeke zef başe!

Usa niqitî qelbê Silêman, go: “Gelo divê mora min bê?”

Eva rabû berê xwe keçikê da kir, keçikê gava dayê, lê nihêrî ku mora wî ye. Mor ramûsa û kire tilîya xwe. Mor zivirand, çar melek li ber sekînin, go:

-Em çawa bikin?

Go: -Herin mala cihûd, cihûd dewsê da bihêlin, mala wî bi Belqîzayê va hildin bînin.

Evana çûn cihûd dewsê da hiştin, Belqîzar bi malê va hildan anîn dewsa mala Silêman danîn. Û tezedan def û dewat xwe ra kirin, qîzik jî, anî kir berdestîya Belqîzerê.

### 4.2.7. Ahmed û Mihemed

Wextekî şeherê Şamê da yekî maldar kare kurê xwe kir, wekî heft sala bişîne xwendinê. Şeherê Helebê da jî yekî maldar karê kure xwe kir heft sala şande xwendinê. Nave kurê maldarê Helebê Mihemed bû, lê yê dinê Ahmed. Mihemed û Ahmed her-yekê ji şeherê xwe derketin dane ser rê, herge pir çûn, herge hindik çûn. Herdu rê va rastî hev hatin Çaxê rastî hev hatin pirs pirsiyar hev kirin, hal hewale hev pirsîn. Yekî go:

-Navê te bi xêr?

Go: -Navê min Ahmed e!

Yê dinê go:

-Navê min Mihemed e!

Herdu ji pê hesyan, wekî ew herdu ji wê herin cîkî, şeherekî.

Ahmed got Mihemed:

-Were em îro şûn da bibine birê hev heta xêr xweşî em heft salê xwe xilaz dikin.

Herda dest pê kirin riya xwe, hal vira, hal dera hanê, pirs pirsiyara gihîştine cî. Ahmed û Mihemed usa hev hiz dikirin, te ê bigota eynî herdu kurê dêkê, bavkî ne, xerîbîê ew kiribûn birê temê dê û bavê. Ewan usa hev hiz dikir, heta kevçiê xarna wana jî yek bû, cî-nivînê razana wana yek bû. Yeki bê yê dinê gava xwe nedavêt cîkî da nediçû. Wextekî şûn da Ahmed kaxezek nivîsî mala xwe ra, şand. Nivîsî, wekî "ez û yekî Helebê em bal hev in, navê wî Mihemed". Wî teherî jî Mihemed kaxez şande mala xwe. Ahmed gele cara kaxez dişande mala Mihemed ra. Mihemed jî dinivîsî mala Ahmed ra. Wî cûreî Ahmed û Mihemed şeş salê xwe xwendin mabû saleke wan, wekî heft salê xwe xilaz kin, herne mala xwe. De û bavê wana jî zanibûn, wekî ma saleke kurê wan bên. Em bêne ser gilîê dê û bavê Ahmed.

Dê û bavê Ahmed şa bûn, ber tivdarekê zewaca Ahmed geriyan. Qîzeke cînarê wan hebû, qîzeke azep bû, hela mêrnekirî bû. Dê û bavê Ahmed çev berê wê qîzikê dan, be'sa wê kurê xwe ra kirin, soz ji dê û bavê qîzikê sitendin, wekî qîza xwe nedine mêr heta Ahmed bê, wekî jê ra bixwezin. Bê sebir hîvya hatina Ahmed û Mihemed bûn, lê sala hefta ji ser hevda hatibû, mabû sê-çar meh, wekî Ahmed û Mihemed vegerin. Hertim kaxez dişandin, wekî "Wedê me nêzik bûye, emê bên". Meh jî çûn, mane roj. Mihemed digot Ahmed:

-Bira, çi çax em xêr xweşî vira herin, berê emê herme mala me, herne Helebê!

Ahmed jî digot:

-Na, emê berê herne mala me, şeherê Şamê.

Ew çend roj bûn, wekî ewî digot "Emê berê herne mala me", vê dinê digot: "Na, emê herne mala me". Lê axryê da hatine ser rêkê, hev ra razî bûn, wekî berê herin mala Ahmed, şeherê Şamê. Şam ser riya wan bû, berê riya wan li Şamê diket. Berê xwe dane şeherê Şamê, ra nêzîkaê Şamê kirin, cab dane malê, wekî "Em tên. Emê dehê mehê bên şeher peya bin, werne pêşya me".

Cab hat gihişte dê û bavê Ahmed, der cînara jî bihîst, pêş da hatin, çev ronay dan dereqa hatine Ahmed. Dehê mehê sibê şebeqê merîê wan, der - cînarê wan, gişk bi def, zirne, fayton, karêt hatine pêşya Ahmed û Mihemed. Gelek wede derbaz nebû, Ahmed û Mihemed dîhar bûn. Çûne dest rûîê hev, kêfê hev pirsîn, bi şa û zirne çûne mal. Kêf kirin, xarin, vexarin bona hatina wan. Paşê dest pê kirin Ahmed zewicandin, çûn ew qîza cînarê xwe, ya wekî çend meh pêş da soz jê stendibûn, dest dabûne ser, Ahmed ra nîşan kirin, sê şev, sê roja xarin, vexarin, kêf kirin. Ahmed û dergîstya xwe hev rûvekirî bûn. Mihemed, Ahmed û dergistîya xwe sibê heta êvarê bal hev bûn, hev ra digeriyan, diçûn, dihatin. Wî terî Mihemed û dergistya Ahmed bin va nîsk û nokê xwe tev hev çandin, lê ew sur nehate star kirinê, dîhar bû, Dya Ahmed şik bire Mihemed û bûka xwe, ewê texmîn kir, wekî fêlê wana xirab in, gazî kurê xwe kir, go:

-Lawo, çira destûra Mihemed nadî, ve rê naki, wekî here mala xwe.

Ahmed go: -Çira, daê tu jê aciz bûyî?

Dê gotê: -Lawo, çi ji te veşêrim, çi xwedê, ne hilde, ne dayne, hal hewal ev in, fêlê destbirakê te û dergîstya te ne rast in, ew lingê xwe xirab davêjin. Ve rê ke hingî hê zû ye.

Ahmed go: -Daê, tu ji siya xwe disilkî, tiştê usa orta herda da ne heye, ne jî wê biqewime.

Dê îdî deng nekir. Çend roja şûn da evîntî û bengîtya Mihemed û keçikê usa gurr, geş bû, wekî ewana her tişt bîr kir, sura wana bawer kî eşkere bû. Bengîtîê hiş aqil serê Mihemed stend. Mihemed rojekê kaxazek Ahmed ra nivîsî, ewî nivîsî: "Ahmed, bira, hal hewal ev e, dilê min ketîye dergîstya te, revê, ez narevînim, lê herge tu ê bi qaîlya xwe dergîstîya xwe bidî min, bide, lê xêrk herge nedî, ez ê xwe bikujim. Lê hema ya pak ew e, wekî ez xwe bikujim vê serkesizîê neînime serê xwe û te". Kaxez danî ser textê Ahmed û derkete derva, hema ew derkete derva, lê Ahmed jî çû hundur, lê nihêrî kaxeazeke nivîsî, wê ser texte ye. Ewî hilda xwend, çi bixûne, ecêbeke giran. Gelekî duşirmîş bû, gazî dê û bavê xwe kir, go:

-Daê, bavo, hal hewalê destebirakê min û dergistiya min ev in, hûn çi dibêjin vî gilî ra?

Terk leva bavê ket, xeberdan pê nebû, lê dê gotê:

-Lawo, min nego, te xebera min nekir, heta gilî da mezinkirinê.

Ahmed go: -Daê, bavo, ruê min li bin pîê we, ez ê gilîkî bêjim, min hê qîzik alîê livînê da nedîtye, ne ji bîna ye, tenê we min ra nîşan kirye û hinekî ji mixsa xwe kirye çaxê ez hatim, em hesab kin dewsa şevekê, we sê şeva kire kêf û çevronkayî, dewsa sed manatî em hesab kin we sêsid manat xerc kirye. Ya pak ew e, wekî ez dergîstîya xwe bidime destebirakê xwe, ewî kire nemerdî, lê ez ê tême merdî. Hiz dikî çi dibe, bira bibe, lê ez naxwezim bibînim mirina destebirakê xwe, min û Mihemed me heft sala nan û xuê tev hev xarye, em kiraskî da rabûne rûniştine. Min ra tunene qiz, serî hebin kum zef in.

Dê û bavê Ahmed ji sozê Ahmed derneketin, sozê xwe kirin yek, kincê bûk zavatîê stendin, destê Mihemed û dergîstya wî kirin hev, gotin:

-Lawo, mirazê we hev bibe, çawa tu û Ahmedê min hûn birê hev in, usa jî tu kurê me yî. Bi vî terî Ahmed û dê û bavê xwe Mihemed ve rê kirin ber bi şeherê Helebê. Ahmed û Mihemed çûne dest rûê hev, xatrê xwe hev xwestin.

Mihemed û dergîstya xwe çendekî şûn da gihîştin Helebê. Cihab dane dê û bavê Mihemed: «Çevê we ron, Mihemed zewicî, hat». Bi def û zurne, bi fayton û karêt, nîvê alîê şeher hatin pêşya Mihemed. Mihemed û dergîstya wi birin mal, heft roj, heft şeva xarin, vexarin, def dewet kirin, hûn mirazê xwe şa bûn, Mihemed û dergîstya xwe ji mirazê xwe şa bûn.

Em bêne ser Ahmed. Ahmed salekê heta du sala gelek bextewar derbaz kir. Tu kesî lingê xwe lingê Ahmed nedixist, lê ewê yekê zef nekişand, çira wî neşuxulî heta sibê. Dê û bavê wî wefat bûn. Pey wefatbûna dê û bavê ra Ahmed dest bi xumarê kir, sibê heta êvarê xumar (qumar) dilîst, nava du sê sala da ewî hebûna bavê xwe da der. Usa bû, wekî ebûra wîye rojê nedibû, heta kincê canê xwe ji firot. Çara wî erd ezmana hate birîn. Ewî dest pê kir bi heqtî xelqê ra dixebitî, lê gele cara

diqewimî binelîê şeherê Şamê Ahmed nedibirin xebatê, nas dikirin digotin: "Eva Ahmedê filankesê ye, ketîye vî halî, wekî em bibin xebatê, ewî çi xebat bavê xwe ra kirîye, wê me ra jî bê çi xebatê bike, ne xebat pê dibe, ne tebat". Xelq diçûn dixebitîn, lê Ahmed dima tengezar tî birçî, Ahmed lê nihêrî maîna wî vî şeherî da badilhewa ne, gerekê here cîkî maîn, wekî bikaribe ebûra xwe bike. Ahmed rabû hebûn tinebûna xwe gişk firot, kire xercelixê riya xwe. Berê xwe da şeherê Helebê ber bi Mihemedê destebirakê xwe çû, çû gihîşte şeherê Helebê. Bi pirs pirsiyara, hal vê kûçê, hal vê kûçê, çû ber derê heyata Mihemed, sekinî, zengil kişand, carîk hundur derket. Ahmed ji carîê pirsî, go:

-Xûşkê, eva mala Mihemed e?

Carîê gotê: -Belê!

Ahmed go: -Kê mal e?

Carîê go: -Xatûn mal e!

Ahmed go: -De kerema xwe bêje xatûnê bê meriv gazî te dikin, bira kerema xwe derê derva.

Carîê çû gote xatûnê, xatûn derket, Ahmed silav daê, lê xatûnê slava Ahmed venegirt. Ahmed gotê:

-Xûşkê, birê minî Mihemed mal e, qe kêfê we çi ne?

Xatûnê go: -Mihemedê çi, tu kîî?

Ahmed go: -Tu min nas nakî, ne ez Ahmed im, destebirakê Mihemed im, ji şeherê Şamê.

-Şama çi, ne min Şam dîtye, ne jî min navê Ahmed bihîstîye.

Ahmed go: -Xûşkê, axir tu qîza şeherê Şamê î, navê mêrê te Mihemed e, ez û Mihemed em heft sala çûne xwendine, çima tu xwe mukur naêy.

Xatûnê Ahmed gelekî bê hurmet kir, go:

-Te ra dibêjim zû van dera biceme here, ciê tu dibêji, eva ew cî nîne. Usa got, kete hundur, derê xwe girt.

Ahmed pişta stukura xwe xurand, por poşman ber derê heyatê dûr ket, go: "Lema dibêjin parsîa jinê xar e". Ahmed carîê pirsî go:

-Xuşkê, Mihemedê kengê bê?

Carîê go: -Berî êvarê!

Ahmed çû hinekî wan kûçê nêzik geriya heta êvarê. Carke dinê hate ber derê heyata Mihemed û sekinî, dîsa zengil kişand, carî hundur derket, go:

-Ha îjar çi dixwezî?

Ahmed go: -Malxê malê hatîye?

Carîê go: -Erê!

-De bêjê, bê merî gazî te dikin.

Carîê çû gote Mihemed, Mihemed hundur derket, gava Ahmed çev Mihemed ket, kir ku xwe bavêje pêsîrê, lê Mihemed destê xwe da orta xwe û wî, nehîşt Ahmed nêzîkî wî be.

Mihemed go: -Hela bise tu kî î?

Ahmed go: -Çima ez te nas dikim, lê tu min nas naki?

Go: -Mihemed, ne ez destebirakê te me, Ahmed im.

Mihemed usa kir, hê ji jina xwe xirabtir, got:

-Ez ne Mihemed im, ne jî min Ahmed dîtîye. Mihemed Ahmed usa rezîl risa kir, wekî Ahmed riya xwe şaş kir, ancax ji destê wî zalimî derket. Agiro, kê tu gurr kirî, hêja kela Ahmed tijî bû, ewî ev ecêb ber çevê xwe dîtin. Herneyse, bi dilekî kulî birîn Ahmed ji wê derê dûr ket. Birçîbûnê lê zor kiribû, hinekî kûçê da berjêr çû, rastî xarinxanekê hat. Ahmed destê xwe kire vê cêbê, wê cêbê, pênc kopêk binê cêba xwe

da dît, çu hundurê xarinxanê, sê kopêk da xarinekê, du kopêk jî da hine nan, anî danî ser texte, wekî bixwe, lê nihêrî du diz derda hatin, yekî dada xarina Ahmed, yê dinê dada nan, yekî xarin rêt, yê dinê jî nan hûr-hûrî kir, avît. Diza çevê Ahmed nihêrîn, Ahmed ji çevê wan nihêrî. Ahmed gote wan:

-Qe îsafa we tune, ezî xerib, taq faqê min, hebûn tunebûna min ew pênc kopêk bû, ew î we nekire risqê min.

Diza ji Ahmed pirsîn, gotine:

-Çima tu ji ku hatîî?

Ahmed go: -Ezî ji şeherê Şamê me!

Diza gotê: -Malşewtîo, tu pê pênc kopêka ji Şamê hatîî Helebê kêf kî, bixuî, vexuî, ya pak ew e, tu herî xwe bavêjî çem bixeniqî. Tenê te ra ev yek lazim e.

Ahmed go: -Rast jî xebera van e, min çi kir malê pir, ez ê çi bikim kavirê kur. Min çi kir hebûna bavê xwe, ez ê çi bikim vî emirê pûç, rast jî ew e ez xwe bavêjime avê bixeniqim, ji dinê xilaz bim. Ahmed ji diza pirsî go:

-Gelî lawkno, ka çem ku ye, ez ê xwe bavêjimê.

Diza riya çem nîşanî Ahmed dan. Ahmed ber bi çem lezand, diza jî tele-tel dane pey. Ahmed xwe gihyande derê çêm, kir ku xwe bavêje. Diza para va hişk milê wî girtin, gotinê:

-Hela sebir bike, em te ra gilîkî bêjin. Go, hela tu cahil î, teze bihara emirê te ye, tu were guhdariya me bike, hilketin-daketina dinê heye, herge tu dixwezî pak bijî, were tevî me be, me ra hevaltîê bike, yan emê te derdin. yan jî serdin, were guhdariya me bike, em desp bi dizîê bikin. Vî şeherî da heçkê pak derbaz dikin, ew timam diz in.

Cara ewil Ahmed gilîê wana teslîx kir, lê wekî gele pê da ketin, Ahmed qayl bû. Ew her sêk berjêr ber bi kûçeke tarî çûn. Herdu diza gote Ahmed, go:

-Tu vira ser vê duryanê bisekine, tenê binêre kê jor da tê, tu elamî me ke, têke fitînî, lê kê jêl va jî tê, dîsa têke fitînî, weke nîv sihetê bisekine, emê risqekî pak dest xin. Ahmed sekinî, lê herdu diza xwe berjêr berdan. Nîv sihet derbaz nebû, herdu diz jî bi lez jêl va hatin, her yekê torbekî tijî dest da hatin cem Ahmed, gotinê:

-De bilive, em herin. Dane pey hev çûne xanê, derê torbe vekirin, yek timam perê zêr bûn, lê yê dinê jî perê kaxez bûn. Diza ew herdu torbê pera teslîmî Ahmed kirin, Ahmed jî teslîmî xançî kirin. Gotine Ahmed.

-Ahmed can, tu pênsid manatî xwe ra berdest derxe, daîne, sibê xwe ra deste kinc bistîne û yê mayn jî xwe ra xerc ke, bixwe, vexwe, emê herin cîkî dinê, dibe em çend roja derengî kevin, lê tu xwe belengaz neke heta em bên, sê roja hîvya me be, herge em hatin-hatin, lê herge nehatin, van pera xwe ra bibe, çawa dikî bike, ku da diçî here, bibe te helal be. Xatirê xwe ji Ahmed xwestin, çûn.

Wê şevê xew çevê Ahmed neket, Ahmed bawer nedikir çi çax sibe safî be. Tarîbana sibê Ahmed pênsid manat kire cêba xwe, lê perê maîn teslîmî xanê kir, arxayn çû nava şeher. Berê ewlîn çû nan xarin xar, paşê xwe ra deste kincê laîqlû stend, xwe kir, vegeriya hate xanê. Ahmed bêsebir çev li riya hevalê xwe bû. Sê roj derbaz bûn, hevalê wî nehatin, çar pênc ro derbaz bûn, dîsa nehatin. Ahmed gelekî ber xwe diket bona hevalê xwe, heta roja şeşa jî hîvîê ma, lê nihêrî nehatin, êdî destê xwe lê şûşt. Ahmed go: ”Ha nabe, gerekê ezxwe ra avaîkî dest xim tê da bijîm". Ahmed ji xanê derket çû nava şeher, geriya, avaîkî firotanêî layqlû stend, ewî dest pê kir avayê xwe da cûre-cûre dikan dane vekirinê. Çû çend terzî, çend zêrker, soldirû, pêşekar bi aylixtî anî, xwe ra da xebatê. Çerxa Ahmed carke dinê rast zivirî.

Rojekê Ahmed lê nihêrî kulfeteke navsere qîzeke delal da pêşya xwe hatine hundur, slav dane Ahmed. Ahmed slava wana vegirt. Ewê hurmetê gote Ahmed:

-Kerem ke were bêje zêrker bira gistîleke zêr çapa tilya qîza min çêke, çi hêja ye ez ê bidim.

Ahmed qîzik bir bal zêrker, çapa tilîya wê girt, go:

-Here, sibê were bibe! Ew hurmet û qîza xwe çûn, lê du sihetê dinê şûn da dîsa ew û qîza xwe rex hev ketin hatin hundurê heyatê, çûn hatin, dîsa çûn. Herneyser wê roje ew û qîza xwe heta deh cara çûn hatin. Sibetirê hatin gistîl birin. Lezkê şûn da dîsa herdu hatin cem Ahmed, dê go:

-Ahmed, kerema xwe bêje soldirû bira cote sol çapa lingê qîza min bidrû, çi hêja ye ez ê bidim.

Soldirû jî çapa lingê wê hilda, soldirû go:

-Here dusiba were bibe.

Dewsa dusba, qet sihetek jî nekete ortê, dîsa herdua destê hev girtin hatin cem Ahmed, dê got:

-Ahmed, lawo, qîza min ne hewcê gustîlê ye, ne jî hewcê solan e, lê dilê qîza min ketye te, lema jî em rojê deh cara tên diçin. Texmina min tu jî xortekî baş î, layîqi qîza min î, were qîza min bistîne.

Ahmed go: -Daê can, pak dibêjî, lê gerekê ez bizanbim çika hûn jî hinkûfî min in? Hersêk rex hev ketin, çûn mala wan. Ahmed hebûna wan dît, dem dezgê wana dît, gel qebûl kir. Ahmed gi:

-Herge hûn serê min qayl in, ez lingê we qaîl im.

-Qewil qirar kirin yek, wekî sê rojê dinê şûn da nîşanî- daynin, qîzikê nîşan kin Ahmed ra.

Ahmed hate mala xwe, du roja şûn da çû mala xezûrê xwe, wekî bipirse çika wê dewatê da çend meriv hazir bin, karê xwe bike, şermî nemîne. Ahmed ji xasî-xezûrê xwe pirsî:

-Çend merivê nîşanîya min da hazir bin, wekî ez bizanbim?

Xezûr gotê: -Lawo, çend merivê bên, min navê wan nivisye, hanê vê kaxezê da ne.

Ahmed kaxez ji destê xezûrê xwe girt, xwend, lê niheri hema navê ewil navê Mihemedê destebirakê wî. Hêdika kaxez danî, go:

-Herge hûn gazî Mihemed kin bînin dewata min, ez wê dewatê nakim, min ne lazim e.

Xasî, xezûr gele pê da ketin, lavay jê kirin gotinê:

-Lawo, nabe wekî em gazî wî nekin, ew merivekî maqûl e, em nikarin neynin. Orta te û wî da çi heye, tu bibaxşine. Ahmed gilîê xasî, xezûrê xwe texsîr nekir, hate ser rê. Sibê şebeqê her tişt hazir bû, gazî cimaetê kirin. Cimaet runişt, dest pê kirin vexun. Hema wî çaxî Ahmed pêş da hat, reca ji cimaetê kir, go:

-Kerem kin, ez ê hîvîkê we bikim, wekî hûn îznê bidine min ez ê tasa ewil hildim.

Hineka go: -Na, îzin tune, zava tasa ewil hilde, lê hineka jî got,- tişt nabe, me baxşandîê, bira zava tasê hilde.

Ahmed tas hilda, berê ewil gele nerm merîfetî xeber da, paşê go:

-Cimaet, heçkê şîrhelal e bira rûnê, ser çevê min ra hatine, lê heçkê şîrheram e, hîvî dikim ker lal bira nav we derê. Çaxê Ahmed usa got, cimaetê gişka çevê hev nihêrin, mane şaş heyrî, lê hîvî ji Ahmed kirin, wekî bêje gilîê wî dereqa kê da ne. Ahmed ber cimaetê destê xwe direjî Mihemed kir û go:

-Ez Mihemed ra nim!

Çaxê Ahmed usa go, heçkê zanbû hemik zanbû, jê heckê nizanbû mane şaş. Gotine Ahmed:

-De bêje, çika çira Mihemed şîrheram e.

Ahmed dest pê kir çawa min we ra got ewî serhativa xwe û Mihemed serî da wan ra got. Go eva hal hewalê min û Mihemed e. Gava Ahmed gilî kuta kir, cimaetê go:

-Rast jî usa ne Mihemed şîrheram e.

Mihemed go: -Cimaet, Ahmed çi got yek bi yek rast e. De niha hûn guhdariya min bikin, ez ê we ra bêjim. Çaxê Ahmed hat mala min rast e, min xwe lê nekire xweyî, min dest xwe da zanibû, wekî ew ketiye tinebûnê. Mihemed go, Ahmed can, ew dizê rastî te hatin, ew ne diz bûn. Cimaet, min ew herdu diz pey Ahmed xistin, pere û zer dane wan diza, wekî bi cûrekî bibin bidine Ahmed, wekî qet tê dernexe ku min jê ra şandiye. Usa jî bû, paşê ez fikirîm, min go eva hela hê hindik e, ez timam hê bin qencya Ahmed derneketim, min qirar kir, go,- ewî çawa dergistya xwe da min, ez ji gerekê xûşka xwe bidime wî, wekîem weke hev derên". Ev dewata hana niha dewata Ahmed û xûşka min e, heta vê lezê jî hê ew nizane.

Gava Mihemed usa got, cimaetê timam destê xwe hev xistin, diha kêfa wan xweş bû, gotin:

-Şîre we herdua jî we helal be, xwezil meriv timam nona we bûna.

Cimaetê dîsa dest pê kirin sê roj se şeva xarin, vexarin, bimbarekî danê.

Hûn herin mirazê xwe şa bin, Ahmed û Mihemed jî çûn mirazê xwe şa bûn.

### 4.3. Fıkra ve Anekdot

#### 4.3.1. Cemşo û Gemşo

Du hevalên êkdû hebû. Navê êkê Çemşo nevê êkê Gemşo bû. Rojekê ji gundê xwe derketin û çûn. Qederekê çûn û gihan geliyek gelek dûr.

Cemşo destê xwe nik gelî vekir û ji Gemşo re got:

Xwezî Xwidê tejî vî gelî pez bidaya min.

Gemlo jî destê xwe nik gelî ve kir û got:

Xwezî Xwidê tejî vî gelî gurî bidaya min jî.

Cemlo got:

Jû te yê çi ji giriyan bikirya

Gemşo got:

Min ê ew gurî berdeyan pezê te û qelena wan bi aniya.

Gotinek ji Gemşo gotinek ji Cemşo… Ketin nav êkdu de û danîn êkdû. Zelamek xweyê karekê di wê derê re derbas dibû. Barê kerê wî jî difs dibû. Vî camêrî dît ev herduyê didanin êkdû.

Çûjêk vekir û got:

Babê mino ma hûn har in. Çira hûn lêkdû didî?

Çemşo got: Vî kerê Gemşo, guruyên xwe berda pezê  min.

Zelamî got: Weh! Ka pezê te, kanî giryên Gemşo?

Cemşo got: Mamê min pez hebûya vî kerî yê guriyên xwe berdaya pezê min.

Zelam ma ecêpmayî. Elam çû dest avêt barê kerê xwe  danî xar de û cewdikên difsê derêxist, sernişûv kir heta dilopa difsê ma tî de rijand û got:

Mala min xira bibi, çi difs li van cewdikan de heye, iha welî aqil yê li serê hewe dejî heyî.

### 4.3.2. Hema

Mirovekî Goyî hêstira xwe bar dike û dikeve rê, barê wî tiriyê geliyê Goyan e û dikeve rêya hevraz ber bi zozanê tê. Hê negihîştiye zozanan, li serê siwara Tanînê yekî Jirkî tê pêşiyê dibêje:

-Selamun aleykum.

-Hema.

-Babê min, bersîva silavê hema nîne. Tu jî çima wekî camêran bersîva sılava min nadî?

-Hema.

-Ezîzo, bi Xwedê hingê ez bela xwe ji te vedikim. Lê ka tu ji bom in bêje, ev hema çiye?

-Hema, hema ye. Dema min got: “Eleykum selam.” Tê bêjî: “Tê herî ku?” Ezê bêjim: “Ezê tirî bifroşim.” Tu dê bêjî: “Kanî tirî.” Ezê bêjim: “Ev barê hêstirê ye.” Tê bêjî: “Ka hinekî bide min jî.” Ezê bêjim: “Ez nadim.” Tê bêjî: “Çima?” Ezê bêjim: “Hema.” Ma ji bo çi piştî ew qas tiştî hema? Hema serê ewil de hema û xilas.

### 4.3.3. Ardû Ji Me Re Çi?

Li gundekî kalek û keça wî hebûn. Havînê gundî giş ji xwe re ardû berhev dikin, keçik dibêje:

-Bavo! Em jî ji xwe re ardû berhev bikin.

-Keçê heta ku zivistan bê, ez ê bimirim. Tu ji xwe re berhev dikî bike.

-Heta ku zivistan bê ezê jî mêr bikim. Îcar ardû ji min re jî çi?

Zivistan tê ne kalo dimire ne jî keça wî mêr dike. Herdu jî di xaniyê sipîsar de dimirin.

### 4.3.4. Derew ji Derewa Mezintir

Sê meriv rabûn çûne seyrangê, xwe ra qasekê bigerin. Lê tejîkê wan hebû, ew jî wan ra çû. Navê yekî Çilo, yê din Şilo, yê sisya Kulo.

Ewana çûne nava mêşe. Wira kêwrîşkeke razayî dîtin. Girtin, şerjêkirin, agir dadan, petin, danîne ber xwe, wekî bixun. Nizam çawa bû Kulo xeyidî -nexar. Çilo û Şilo va ew goşt xwarin. Devê wana ma zep ziha, lê yê ku nexaribû devê wî don girt, tejîyê jî devê wî alast. Hêrsa Kulo rabû, pihînek tejîyê xist tejîyê kire kastîn, revî. Ji tejîyê tope perçê xas ket.

Gelo tu dikarî bêjî -ew perçe wê bighîje kê? Çilo, xayê tejîyê, divêje:

-Ezim xayê tejîyê, perçe dighîje min.

Şilo divêje: -Min jî kêwrîşk girtîye, dewsa kêwrîşkê -perçe digihîje min.

Kulo jî divêje: -Wekî we goşt xar, min nexar: tejîyê jî devê min alast, min jî lêda, ew ê perçê avît -perçe dighîje min.

Vana hevdu nikaribûn razîkirina. Lêdan çûne cem qazîşuro. Go:

Me ra vê şuxulê rast kê -ka perçe wê bighîje kê?

Qazîşuro, go: -Kê ji we derewke mezin bike, perçe wê bighîje wî.

Çilo destpê dike derewa xwe dike:

Go: -Flankes, rojekê gamêşa min unda bû. Ez gelekî lê gerîyam, min nedît. Ez rabûme serê çîyayê Grîdaxê, çarniqal nihêrî -min nedît. Hatim çûme gelîyê hampûrê derzîya kinca nikand. rabûme ser wê, nihêrî. Min dîna xwe dayê, wekî pişta Grîdaxê mişkekî çûçik wê guhê gamêşa min girtîye, kaş dike, dike qulê. Ez revîm çûm, min poçka gamêşê girt. kaşkir, mişk jî berbi qulê kaşkir ancax min gamêş ji destê mişk derxist.

Derewa Şilo: Go: -Min jî rabû, deva xwe barkir, çûme aş wekî nan bihêrim. Heta ketime aş derketim -deve tune.  Ez sivê heta nîvro gerîyam, min nedît. Ez birçî bûm, çûme mal, wekî hine nan bixum.

Jina min nan dipet. Nanek çûbû kût. Min go:

-Qîzê, qîzê, ewî kûtî derxe, ez bixum devê bigerim. Min ew kût kire cêva xwe, ez çûm, ji gund derketim, kût derxist bixum. Gava min kût ker kir -deve ortê da, gurzê gihîya li ber duxe. Min deve ajot, çûme aş, nanê xwe hilda, hatime mal.

Derewa Kulo: Go: -Flankes, wê salê dîkekî min hebû. Ez rabûm rojekê, min heft top genim li dîkê xwe kir, çûme aş. Ez aşda li ber derî sekinîbûm. Wextekî merivekî xerîb hate bal min, go:

-Flankes, bazirganê mê hatîye ber çem sekinîye, çem rê nadê, were em herim, pê dîkê xwe derbaz ke.

Em rabûn, dîk sîyar bûn, çûn. Me bazirgan li ser pişta dîk kir, derbaz bûn. Mêşoke garis rijya nava çêm. Min go:

-Hûn zanin, wekî mêşokê weda çend liv garis hebû?

Wana go: -Em zanin.

Min dîk berî çêm da, ava çêm timam çikand. Ez û dîk va ketinêda live-liv hevda, jimirî, da wan.

Wê rojêda pişta dîk kulbû. Ez çûme ser hekîma, pirskir, ka çi dermane? Wana got, wekî derman -gûza hindêye. Wî çaxî gûza hindê destnediket. Dîya min go:

-Wexta me tu şîrevekirî, pê gûza hindê bû.

Min derzî hilda, orta dranê xwe vekola, heft hoqê gûzê hindê jê derxist, da ser pişta dîk –qenckir.

Qazîşuro, go: -Topê perçe dighîje Kulo!

Kulo topê perçe hilda, çû mala xwe.

### 4.3.5. Derewînên Tekmanê

Rojekê li gundekî Tekmanê civat li malekê kom dibe û bijartina derewçînên baş dikin. Derewçînê yekemîn Xalê Xelîl dibêje:

-Îro ez derketim Textê Leyla, min li wê derê karikek wisa mezin dît ku pênc bir pez lê mexel hatiye lê hêjî aliyekî karikê vala maye.

Derewçînê duyemîn Xalê Selîm dibêje:

-Çend roj berê çûbûme Erzeromê, min bedadxaneyek dît. Li wê derê sîtilek wer mezin çêdikirin ku heft heddad ketibûn hundirê sîtilê dixebitîn û dengê çakûçê hevûdu nedibihîstin.

-Errrik, te çi dereweke mezin kir…

-Êêêê heyran, ew karika te encax di sîtileke wisa de bikele.

### 4.3.6. Rûvî û Liba Gênim

Rojekê payîzê, rûvî hatiye nêzîkî gundekî, li cihê bêderan geryaye. Tiştekî xwarinê rastî wî nehatiye. Der û dora xwe mêze kiriye, li ber kevirekî hebek genim dîtiye. Rûviyê te, hema wê gavê, heba genim ji erdê hildaye û rasterast çûye êş. Genimê xwe dirêjî aşvên kiriye, jê ra gotiye:

-Ji kerema xwe, vî genimê min bihêre! Ez ê paşê bêm, ardê xwe bibim.

Rûvî pişta xwe daye aşvên û çûye nava baxan, hinekî geryaye. Ew paşê ziviriye hatiye ba aşvên û jê pirsiye:

-Pismam, te genimê min hêra? Ka ardê min li ku ye?

Aşvanî ji rûvî ra gotiye:

-Rûvî, ez nikarin libek genim bihêrim. Mala te, libek genim ê di nava kevirê êş da bihele here.

Li ser vê gotina aşvên, rûvî gotiye wî:

-De wekî usa ne, tê vê gavê an genimê min, an jî çewalek ard bidî min. Ez genimê xwe dixwazim.

Erê, na rûvî û aşvên li ser liba gênim şer kirine.

Aşvên dîtiye, ku nabe, aniye çewalek ard daye rûvî. Rûvî çewalê êrd hilgitiye ser pişta xwe, çûye li gundekî bûye mêvanê pîrejinekê. Du gayên pîrê hebûne. Rûvî biriye çewalê êrd daye cem herdu ga. Nîvê şevê, ga ji bendên xwe filitîne û ketine ser çewalê êrd. Herdu ga tevaya êrd xwarine, çewal hema vik û vala kirine.

Rûvî sibetirê ji nava nivînan rabûye, çûye tewlê. Wî bala xwe dayê, ku çewalê wî vala ye. Hema bi kelecn paşta ziviriye ser pîrê; jê ra gotiye:

-Pîrê, gayên te ardê min xwarine, çewal vîkîvala ye. Ez ardê xwe dixwazim. Divê tu niha, an çewalê min tijî ard bikî bidî min, an jî herdu gayan bidî min.

Pîrê ber rûvî geryaye, kiriye zarinî, dîtiye ku çareserî tune, aniye herdu ga ji tewlê derxistine û dane rûvî.

Rûvî herdu ga dane pêşiya xwe û ketiye rê. Ew li ser rêya xwe rastî gundekî hatiye. Wî dîtiye, ku keçeke bedew li ber derê malekê ye. Rûviyê kone nizanibûye, ku ew mala axê gund e. Herdu ga ajotine ber wî derê ku, keçika bedew li ber bû. Wê şevê xew neketiye herdu çavên rûvî. Wexteke şevê rabûye çûye tewlê, herdu gayên xwe ser jê kirine. Kêra bi xwînê geryayî jî, aniyekiriye bêrîka lîbasê qîza axê.

Sibetirê, çaxê ku ji nava nivînan rabûye, çûye tewlê kiriye qareqar, gazî û hawar. Wî bi dengekî bilind va, ji axê ra gotiye, ku gayê wî hatine ser jê kirinê.

Axa hatiye tewlê dîtiye, ku rastî jî herdu gayên rûvî hatine ser jê kirinê. Hema wî lezî, gazî tevaya xulam û berdestiyên mala xwe kiriye. Tevaya wan hatine dîwana axê sekinîne.

Rûvî gotiye axê:

-Axa, ez kêra bi xwîn, di bêrika kê da bibînim, bila ew bibe ya min. Hûn jî herin ji vê xwînê xelas bibin.

Rûvî bêrikên tevaya xulam û berdestiyên mala axê vaca kirine. Wî paşilên wan jî nihêriye, lê kêr nehatiye dîtinê. Rûvî berê xwe daye qîza axê. Jixwe wî dizanibû, ku kêr di bêrika wê da ye. Hema destê xwe kiriye bêrîka qîza axê, kêra bi xwînê geryayî derxistiye. Çaxê ku wî kêr ji bêrika keça axê derxitiye, ziviriye ser axê; jê ra gotiye:

-Axa qewlê me hebû. Qîza te ya min e. Ew ê gel min bê.

Axê dengê xwe nekiriye. Rûvî destê qîza wî girtiye û daye ser rê. Rûviyê guhbel di rê da qîza axê kiriye çewalekî û daye ser pişta xwe. Demekê berbe quntara çiyê ve çûye, li ser rêya xwe rastî şivanekî hatiye. Rûvî rasterast ba şivên. Çewalê xwe daniye erdê, bi şivên ra ketiye galegalê. Ji piştî danûstandineke kurt, ji şivên ra gotiye:

-Heyran, bila ev çewalê min gel te be, ez herim li ber wî zinarî, dest bavêjin doxina xwe û dîsa bêm.

Şivên dora xwe nihêriye. Kurm ketiye dilê wî. Wî xwestiye, ku bizanibe, gelo di wî çewalê rûvî da çi heye. Devê çewêl vekiriye, dîtiye ku qîzeke gelekî bedew tê da ye. Şivatê te hema wî lezî qîzek ji çewalê rûvî derxistiye û kiriye heqîwa xwe. Kûçikê şivaniyê jî kiriye çewalê rûvî û devê çewêl dîsa girêdaye.

Rûvî ji ser destava xwe vegeryaye. Wî çewalê xwe hilgirtiye ser pişta xwe û xatirê xwe ji şivên xwestiye û ketiye rê. Haya rûvî jê tunebû, ku li ser pişta wî çi heye. Ew demekê bi dilekî geş çûye, paşê xwe ji xwe ra gotiye:

-Min libek genim da çewalek ard stand, çewalê êrd da,du ga standin, herdu ga jî dane qîzekê.

Demekê dîsa rê çûye. Li cihekî xewle xwastiye, ku qîza axê ji çewêl derxe. Çewalê xwe ji ser pişta xwe aniye xwarê. Dewê çewêl vekiriye. Wî ditiye, ku kûçikek tê da ye. Rûvî ku kûçik dîtiye, hema çilp û bazdaye. Kûçikê jî serî daye ser wî. Rûvî xwe zorê ji destê kûçikê xelas kiriye. Şivan û qîza axê jî çûne zewicîne, jiyaneke bextewer derbas kirine. Ew çûn gihîştin mirazê xwe, hûn jî bigihîjin mirazê xwe…

# DİCLE ÜNİVERSİTESİ
# SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
# TEZ İNTİHAL FORMU

| **ÖĞRENCİ BİLGİLERİ** | |
|---|---|
| **ADI VE SOYADI** | KENAN SUBAŞI |
| **ÖĞRENCİ NO** | 15940306 |
| **EĞİTİM – ÖĞRETİM YILI** | 2019-2020 |
| **YARIYIL** | ☒ Güz ☐ Bahar |
| **ANABİLİM DALI** | KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ |
| **PROGRAM** | Doktora |
| **TEZ KONUSU** | KÜRTÇE (KURMANCİ) MASALLARIN ANLATI TİPOLOJİSİ (TÎPOLOJÎYA VEGÊRANA ÇÎRVANOKÊN KURDÎ/KURMANCÎ) |
| **İNTİHAL RAPORU BİLGİLERİ** | |
| **RAPOR TÜRÜ** | Tez Savunma Sınavı Sonrası |
| **SAYFA SAYISI** | 697 |
| **BENZERLİK ORANI** | % 3 |
| **RAPORLAMA TARİHİ** | 24/12/ 2019 |

Yukarıda başlığı/konusu gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler, sonuç ve tartışma kısımlarından oluşan toplam 697 sayfalık kısmına ilişkin, 24/12/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan intihal raporuna göre, tezimin benzerlik oranı % 3'tür.

Uygulanan filtrelemeler:

☐ Kabul/Onay sayfaları hariç,
☐ Kaynakça hariç
☐ Alıntılar hariç/dâhil
☐ Diğer

Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Lisansüstü Programlarda Tez Çalışması İntihal Raporu Uygulama Esasları'nı inceledim ve bu Uygulama Esasları'nda belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edilmesi durumunda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini saygılarımla arz ederim.

Kenan SUBAŞI
24.12.2019

| | |
|---|---|
| Doç. Dr. Hayreddin KIZIL<br>**Tez Danışmanı**<br>24/12/2019 | Dr. Öğr. Üyesi Osman ASLANOĞLU<br>**Anabilim Dalı Başkanı**<br>24/12/2019 |

**Formdaki bilgiler bilgisayar ortamında doldurulmalıdır. El yazısı ile doldurulan formlar geçersiz sayılmaktadır.**